Abdullah ÖCALAN

# Ji dewleta rahib a Sumer
# ber bi
# fiARISTANIYA DEMOKRATÎK
# Cild II

Kurtçe savunma II. Cilt Kurtçe savunma II. Cilt 22.~j^p016
13:16 Page 3

Abdullah ÖCALAN

# Ji devlata rahib a Sumer

# ber bi
# fiARISTANIYA DEMOKRATÎK

Cild II

Wergêr: Jîr DILOVAN

**Ji dewleta rahib a Sumer**
**ber bi ŞARISTANIYA DEMOKRATÎK**
Cild II
Weşanên Mezopotamya

**Çapa yekemin:** Gulan 2003 **Wergêr:** Jir DILOVAN **ISBN:** 3-931885-50-X
**Basim:** ERAGCO MATBAASI **Tel.:** 0032 89 51 11 51 **Fax.:** 0032 89 51 11 52
**E-Mail.:** eragco@skynet.be

Herausgeber:
Mezopotamya Verlag und Vertrieb GmbH
Stolbergerstr. 200 50933
Köln/Deutschland

# NAVEROK

**BEŞA ŞEŞEM**

**Pirsgirêka Bûyera Kurd a li Rojhilata Navîn û Rêyên Gengaz ên Çareseriyê ...................................................... 13**

A- Danaskirina Hinek Têgînên Bingehîn ...................................... 20
1- Civak ........................................................................ 20
2- Eşîr, Eşirtî, Etnîsîte ...................................................... 22
3- Netew û Dewleta Netewî ............................................... 24
4- Çareseriya Leşkerî û Siyasî ........................................... 26
5- Rêbaza Demokratîk û Hiqûqî ........................................ 27
6- Hemwelatî û Netewîtî .................................................... 28
7- Civaka Kevneşopî Ya Fermî û Civaka Şarwer ...........29
8- Welatparêzî û Entemasyonalîzm .................................. 30

**B-** Di Derbarê Bûyera Kurd de Hinek Nêzîkbûn û Pirsgirêkên Rêbazê ......................................................................... 33

C- Çarçovek Jibo Dîroka Kurd ...................................... 44
a- Serdema Neolîtîk û Kurd ................................................ 44
b- Serdema Koledar û Kurd ................................................ 52
c- Di Serdema Feodal de Kurd ..........................................76
**d-** Di Serdema Kapîtalîzmê de Kurd ..........................105
D- Tevgera Kurdan a Etnîk Neteweyî û Demokratîk...................124
1- Dema Neteweperestiya Feodal a Hoveber..................129



2- Dema Neteweperestiya Burjûva ................................132

3- Meyla Gel a Azadiyê ................................................ 135
4- PKK: Bûyin, pêşveçûnû Pêşeroja Wê ....................... 138

E- Di Pirsgirêka Kurd de Ber bi Çareseriyê ................................ 172
1- Pirsgirêka Kurd a Tirkiyê û Çareseriya Demokratîk . 176
**a-** Dema Begîtiya Feodal û Siltantiyê ............................... 177
**b-** Neteweperestî, Serhildan û Dema Dûrkirinê (tenkîl)... 178
c- Dema Avabûna Komarê Ya Ji Nû ve û
Çareseriya Demokratîk ..................................................... 186
2- Li îranê Pirsgirêka Netewî û Çareseriya îslamtiyê
Ya Demokratîk ................................................................ 194
3- Pirsgirêka Kurd a Ereban û Çareseriya Iraqê ............. 199
4- Bi Destxistina Nasnameyê Ya Kurdên Suriyeyê û
Çareseriya Tevkariya Demokratîk .................................... 206

**BEŞA HEFTEM**

**Bûyîna Şervanê Azadîyê ya Gelê di Dorpêça Komployê de**... 213

**1-** Dîrokên Komployan û Dersên Ku Pêdiviye
Jê bêtin Derxistin ......................................................... 220
**a-** Komplokeriyên (dekbazî) Serdema Pêşî û
Mîtolojiyên Xapînok ........................................................ 220
**b-** Serdema Navîn û Komplokeriya Bi maskeya ol ........... 226
c- Neteweperestiya Kapîtalîst û
Faşîzm Komplokeriya Herî Pêşketî ye ............................. 230
1- Dema 1800-1940an ................................................... 235
2- Dema KDPyan 1940-1975an ...................................... 236
3- Dema 1975-2000an ................................................... 238

**2-** Rasteqîniya Komploya kxi PKK Jiya ye ............................ 239
1- Ji Bûyina Wê Heta Bi îlankirina Fermî .................... 242
2- 1978-1988 Komploya Hundirîn û Tesfîyekerî ......... 245
3- 1988-1998 Çetegerî û Mudaxeleya Emperyalîst a di Tevaya Cîhanê de ........................................................ 250

**3-** Komployên ku liserokatiya PKKê Tên Ferzkirin Mikurhatina Tirsa ji Nasnameya Gêl a Azad e .......................... 261
a- Dema bûyina Serokatiya jibo Gel (1970-1980) ...................... 268
b- Perçebûna Civakî ya di Kesayetiyê de û ji Nû ve Avabûn ..... 276

**4-** Divê Esehiya Komploya Sedsalê Çawa Were Fêmkirin? .... 294
a- Komployên Dîrokî Pêşveçûnan Ranawestînin, Bilezgîn Dikin.................................................................. 294
b- Kompoya 15ê Sibatê Dikarin jibo gelan veguherînine Aştiya Payîdar û Demokrasiyê ............................... 313

**BEŞA HEŞTEM**

**Di Pirsgirêka Kurd de Hiqûqê Ewropa yê Bikaribe Derfeteke Çareseriyê Derêxe Holê** .......................... 327

**1-** Bûyina Hiqûq û Pêşveçûna Wî........................................... 329
**2-** Di Çareseriya Pirsgirêkên Civakî de Rola Hiqûq ............... 332
**3-** Hiqûqa Ewropa Komara Tirkiyê û Pirsgirêka Kurd ........... 333
**4-** Pêvajoya Darizandina Îmralî PMME û DMME.................. 346
**a-** Pêvajoya Revandina Min û helwestên li Derî Hiqûq .. 351
**b-** Cizayê Mirinê û Weke Amûreke Gefê Bikaranîna li Hember Gelê Kurd........................................................... 354
c- Li DMME çareseriya Dostanî, Lêgerînên Guftûgoyê û Peywira KEyê ............................ 365

**BEŞA NEHEM**

**Nasnameya Apo: Ji BavikBer bi Gelbûnê** ............................ 371

**1-** Bûyina Xwezayî, Hilweşîna çanda Bavik û Ketina Nav Daristana Şaristaniyê ............................ 372
**2-** Civaka Burjûva û Hevnasîna bi Komarê re Guman û Helwesta Şoreşger ............................ 384
**3-** Xwe Afirandina bi Şer lê Heta bi Kûderê? ............................ 393
**4-** Lêgerîna Aştiyê Rexne û Xwerexnekirin ............................ 407

PEYVADAWÎ- 1 ............................ 424
PEYVA DAWÎ - 2 ............................ 433

**PARÊZNAMEYÊN RIHAYÊ** **451**

Ferhenga Pareznameyê ............................ 495

*Ev pirtûk ji hemû şehîdîn Kurdistanê re diyarîye*

# BEŞA ŞEŞEM

# Pirsgirêka Bûyera Kurd a li Rojhilata Navîn û Rêyên Gengaz ên Çareseriyê

## Destpêk

Pirsgirêkeke Rojhilata Navîn a herî tevlîhev, Pirsgirêka Kurd e. Ev pirsgirêk taybetiya xwe, ji şêweya çebûna bû- yera ku pêve girêdayî distîne. Heta ku bûyera Kurd bi awa- yek rasteqînî, li holê neyê danîn, weke di dîrokê de û di roja me de, di pêşerojê de jî ev pirsgirêk ê tevlîhevtir bibe û bi giranî yê gelek pirsgirêkên din jî, bi xwe re bîne. Pirsgirêka Kurd, him ji aliyê wer- giriya xwe ve û him jî ji aliyê şêweya xwe ve, di rewşeke ji pirsgi- rêka Ereb û îsrael mezintir û girîngtir de ye. Ev pirsgirêka ku bi te- vayî demakeve holê, dibe mijara nirxandinên kêm û bi şaşîtiyan. Li qasî ku ji aliyê nifûs, erdnîgarî û mercên civakî û siyasî ve, li dera- waya herêmê ya herî stratejîk cîh digire, ji aliyê curbicurbûna pirs- girêkan û giraniya wan ve jî, di serî de tê.

Jiberku di navbera sê gelên herêmê, ereb faris û tirkan de, ha- tine parçekirin, ev yek ji ber xwe ve, rê li ber bandorkirina pirsgi- rêkê ya herêmî vedike. Weke firaqên bi hev ve, çareseriya li par- çeyekî, zorê li çareseriya wan parçe û welatên din jî dike. Bere- vajî vê yekê jî, bandor dîsa bi heman rengî çêdibe. Asêbûna erd- nîgariya wê, timî hêmana têkoşîna bi çekan di rojevê de hiştiye. Di her dema dîrokê de û li hember her dagirkirinekê, berxweda- neke bi şêweyekî derketiye holê. Jiyan bi psîkolojiyeke serhildêr a xwezayî re dimeşe. Bi derfetên tibê ku zêde bûyin re, nifûs ji 40 mîlyonan derbasbûye. Ev hijmar, jiboku hesabekî stratejîk liser bête kirin, bi zêdekariye jî.

Eşîrtiya ku di pêvajoya dîrokê de bûye fonneke kevneşopî, jiber- ku ber bi jevketineke sift ve diçe, yekem car di nava tevaya civakê de, rê li ber gelek nûjeniyan vedibe. Jiberku pirsgirêkên civakî ji çareseriyên hemdem bêpar dimînin, ev nûjenî vediguherine zemîna qeyranên giran. Gelek civak bi nûjeniyan re ji pirsgirêkên xwe riz- gar dibin, lê berevajî vê, nûjeniya Kurdan girêkên din li girêkên kor ên dîrokî zêde dike. Çareserî li dera han, hebûna Kurd ku tê man- dele kirin, weke polîtîkayeke serdestan berdewam dike. Ji aliyê din ve, bi derfetên teknîka ku zêde dibe, cîhana hemdem ku tê naskirin, rê li ber hişmendî û daxwaziya gel a mezin vedike. Li Rojhilata Na- vîn, pêşveneçûna rêyên çareseriya demokratîk, dibe sedema teqî- nên bêteraz û gelek bûyerên trajîk. Jiber ku rêyên çareseriya olî ya kevneşopî û rêyên hemdem ên siyasî girtîne, şidetê tenê weke ve- bijarka rizgariyê dibîne. Ev yek jî di dorhêla hêza bêteraz de, tê wa- teya xwînrijandina zêde û kûrbûna êş û demeketinê. Ya herî xirab- tir û bi neyînî, digel ku pirsgirêk evqasî mezin e û cihekî mezin di- gire jî, him dîplomasiya navnetewî û him jî rêxistinên herêmî û ne- tewî, ji dêvla ku bi pirsgirêkê re têkildar bibin, mandelekirin (înkar) û paşdeavêtina pirsgirêkê weke polîtîkayeke herî baqil berdidin. Bi taybetî berjewendiyên wan ên beremberî hev ku ji rewşa stratejîk a herêmê tên, wan dixe nava dîplomasiyeke veşartî, nêzîkayiyên li derî mirovatiyê nîşan didin û vê yekê dikine rêbaza polîtîk a herî bingehîn. Qet girêdayî ti nirxên etîk namînin.

Bêşik, di pirsgirêka Kurd a ku hatiye vê merhaleyê de, ji sede- mên derveyî bêhtir, sedemên hundirîn rola sereke dileyîzin. Bûye- ra Kurd anîne rewşeke wisa tevlîhev û nenas ku di serî de, Kurd bi xwe û yên xwedî nêzîkayiyên bi erênî jî, jibo çareseriyeke ku en- cam bide, nizanên yê çawa bikin û bêçare dimînin.

Herwiha tişta di serî de pêwîst e were kirin ev e ku, bûyera Kurd li holê bête danîn û di derbarê wê de, ji yên mandeleker heta bigî- he kesên bi nêzîkayiyên dilînî, li nêrînên hemû derdoran were hûr- lênêrîn û di terîfkirineke herî nêzîkî rastiyê de bibine yek. Heger ev neyê pêkanîn jî, bi nêzîkayiyeke herî zanistî, pirsgirêkê bi hemû ali- yên wê ve, bi awayek ku xweş were fêmkirin, têxine rojeva hemû derdorên têkildar. Nîqaşeke spartî bûyerên zanistî, yê tevan bixe nava nêrîneke hevpar ku pêdiviye

pirsgirêk çawa çareser bibe. An jî, heta weke îro ku hatiye kirin, dîsa bi guftûgoya kerran (nehisgû- han), nagihe ti encamên çê. Pêwîst e were fêmkirin ku mantiqê her derdorên bi insiyatîfa yekalî yê “min çêkir çêbû”, mantiqekî herî xirab e. Rêbaza guftûgoyê, weke di pêvajoya dîrokê de jî hatiye dî- tin, di roja me de jî, rêya herî baş e ku bingeh bê girtin. Bi rastî jî, bû û qediya yên yekalî, jibo ti aliyan jî sûdmendî ne anîne. Bi vî şê- weyî, ne bûyer ji holê hatiye rakirin, ne ji pirsgirêkî hatiye derxis- tin û ne jî ber bi çareseriyekê ve hatiye birin.

Di vê rewşê de, terîfkirina bûyera Kurd gelekî girîng e. Lihev- kirinên herî mezin liser terîfkirina bûyerê ne, bê yên bi çi rengî bin. Heta ku Ereb bibêjin “Kurd Erebên Yemenê ne”, Tirk bibê- jin “Tirkên çiya ne” û Faris bibêjin “Kurd weke me ne”, an jî be- revajî van, heta ku Kurd weke neteweyeke saf were terîfkirin, nê- zîkbûnên siyasî yên di vî derbarî de jî yên gelekî cihêreng bin. Ev nêzîkayiyên cihêreng, li qasî ku yên sepînên cihêreng bi xwe re bînin, ewqasî jî yên levdana koran bixe rewşeke bi êş ku nikari- bin ji nava wê derkevin.

Pratîkên ku heta niha hatine jiyandin, rastiya serhildanê û sefe- rên dûrxistinê, van destnîşankirinan rast derdixin. Derketinên liv- baziya dawî yên di bin serokatiya PKKê de jî, digel hemû hewlda- nên xwe yên zanistî û angaşta xwe, ji pêşveçûneke yekalî û ji nir- xandineke bi vî rengî, rizgar nebûye.

Bêşik, bûyera Kurd ji ezmanan nehatiye. Ew jî weke bûyerên li cîhanê yên bi vî rengî ne. Lêbelê ev jî rastiyek e ku taybetiyên wê yên cuda û hîkarîker hene. Ya were kirin ev e ku, li qasî aliyên mî- nanî (dirûv), hê bêhtir aliyên wê yên resene derînine holê. Tenê po- lîtîkayên bi mînaniyan (dirûvtî) ve girêdayî, dikarin encamên xirab derînine holê. Lêbelê encex reseniyên wê baş werin peytandin (tes- bîtkirin), bi polîtîkayên rasteqînî ku encamgirtina wan gengaz be werin sepandin, yê serfiraz bibe. Tişta heta niha hatiye ezmûnkirin û herwiha semekeftina hemû aliyan jî, ji ber vê yekê ye.

Di dîrokê de û di roja îroyîn de, gelek nêzîkbûnên ku dişibine bûyera Kurd an jî yên berevajî wê hatine pêşandan. Dema ku em taybetiyên wan ên sereke li ber çavan bigirin, em dikarin van nê- zîkbûnan di bin sê kategoriyan de binirxînin.

Yekemîn, nêzîkbûna bûyera Kurd a mandeleker e. Li gor vê nêzîkbûnê, hebûneke Kurd a li holê tine ye, an jî li kîjan welatî bin, ji aliyê dijminê wî welatî ve têne afirandin û pirsgirêkeke weke cina ye. Herwiha bi navê Kurd çi bête gotin, were nivîsandin û bê- te kirin, karê dijmine û heram e. Ji ber vê yekê jî, pêwîst e ev pirs- girêk tine were berdan an jî were tinekirin. Mixabin sedsala 20an ku herî bêhtir zanistî pêşketî, bi vê nêrîna netewa serdest derbas- bûye. Heçku ev rastiyeke, heger ku Kurd ji heman netewê werin hesibandin jî, taybetiyên wan ên civakî, aborî û zimanê wan ê cu- da, rastiyeke ku çavên kor jî bibînin. Naxwazin bipejirînin ku hê jî gelek neteweyên Ewropî û Amerîkî yên herî pêşveçûyî jî, di na- va xwe de ji tevayiyekê û ji yekîtiya çandekê dûr in. Digel ku cu- dabûn gelekî mezin e jî, nêzîbûnên weke “Em weke hevin, biyanî me cuda dikin”, hikmên mandelekerin ku di dîrokê de mînakên wiha ne hatibine dîtin. Lêbelê him çalakî û livbaziyên bê dawî û him jî, rewişta pêşveçûna zanist û teknîkê ku sansûrê nasnake, xwediyên nêzîkbûnên bi vî rengî xistine rewşeke derewîn û pêne- bawer. Pirsgirêk û bûyera ku pirsgirêk pêve girêdayî, yên herî dij- berên xwe û mandelekirinên xwe jî, mecbûr kirine ku nêzîkbûnên cihêreng pêşvebibin û bê dilê wan jî be, pejirandineke başê xera- ban (ehvenîşer) bi wan bide kirin.

Alîgirên nêrîna duyemîn, di rewşeke berevajî vê yekê de ne. Bi nêzîkbûneke dilînî (hestyarî) û dûrî berbiçavî, bi helwest û sexbêri- yên ku têkiliya wan bi bûyerê re tine be, polîtîkayê dikin. Rêbaza ku bi navê wêjeya mêrxasiyê tê binavkirin ev e. Ev rêbaz, çareseri- ya bûyereke mîna bûyera Kurd ku gelekî tevlîhev li dera han, ji gi- rêkeke kor a din ku lê bixe pêde, bi kêrî tiştekî din nayê. Hinek vê rêbazê bi perspektîfên neteweperestiya hoveber û olî disepînin, ji hinekan jî weye ku liser navê çep û şoreşgeriyê pratîk kirine. Di vê wateyê de Kurdîtiya sedsala 20an, bi van rêbazan temen rizandiye, pirsgirêk girantir kiriye û xistiye rewşeke bê angaşt. Di vê yekê de, sûc timî kiriye aliyê hêzên dewletê, an jî pêşlêgirtina hêzên dijber, pêwîst nedîtiye ku kêmasî û çewtîtiya xwe bibîne û xwe di rexne- kirineke kûr re derbas bike. Ev beşên ku gihane vê yekê, bûne xwedî giyaneke bê angaşt û bêesil û bûne xwedî kesayetiyeke ku teslhnî her mercî bibin. Bi vê yekê xwe bi dev têgihîna

"wiha hati- ye yê wiha here" ya ku ji bav û kalan mayî ve û bi dev têgihîna qe- derparêz û koletiyê ve berdidin.

Pêdivî ye em ji beşeke din a ku di navbera van herdu nêrînan de rolê dilîze jî, behs bikin. Ev beşa ku ji dîroka herî kevin ve rolê di- leyîze, havkariya kevneşopî ye. Lêbelê ev li gor dema xwe, dikarin xwe nûjen bikin. Ev wisa bûne hosta ku kîjan alî giran bikşîne, xwe didine wî aliyî. Weke pargîdaniyeke (şirketeke) malbatê, kesên xwe di nava hêzên navendî de bi cîh dikin û kîjan alî desthilatdar be, li aliyê wan helwesta xwe nîşan didin, herwiha malbata xwe û xane- daniyê timî li jor digirin, berjewendiyên xwe payîdar dihêlin û vê weke polîtîkayeke bingehîn, bi hostayî didomînin.

Ji bo van kesan nêrîn, hêman û etîk, ne dabaşa xeberdanê ne. Berjewendiyên berbiçav li kûderê bin, hêmanên wan û her tiştên wan, bi wira ve girêdayî ne. Yên ku pirsgirêkên civakî bi jehr dikin û tînine rewşeke gelicandî, ev beşa di navberê de ye. Ev li qasî bi hêz in, ewqasî jî xwedî ezmûnên dîrokî ne. Dizanin bi kê re û bi çi şêweyê yê têkiliyan deynin û yê çawa xwe bifiroşin. Qet nizanên rêzê ji nirxên mirûz û nirxên hêmanî yên civakê re bigirin. Ev yek li hesabê wan nayê. Bûyereke resen e ku di cîhanê de nayê dîtin, di vê rastiyê de ye. Ev kesên di vê beşê de, ji van pirsgirêkên civakê ku wiha kûr dibin, berpirsiyar in. Jiberku bi awayek erzan ji serdes- tiya dewletê re xulamiyê dikin, dikevine rewşeke wisa ku, hinek pêngavên dewletê yên bi erênî jî asteng dikin. Bi hostayî bi herdu aliyan jî dilîzin. Bi awayek veşartî, bi aliyê hember re jî têkiliyan datînin û ji wan jî sûd werdigirin. Heta ku ev beşa di nava civakê de, ji her alî ve neyê dahûrandin û bandora wan neyê şikandin, ne têgihîştina bûyerê û ne jî çareseriya wê, nayê pêkanîn.

Nêrîna sêyem, nêzîkayiyên kesên ku di angaşta zanistiyê de ne. Digel ku bi mebesta baş in jî, ev beş ji aliyê behreyên zanistî ve ne xwedî zerengiyeke (kapasîte) hewceyiyê ne. Bûyerên ku helsingan- dine (peyîtandine), parçe parçe ne û ji biserûberiyê dûr in. Ev yek weke ku fîl bi mûyekî wî bête ravekirin e. Herwiha, bi hindikayî li qasî xwediyên wan nêrînên din, yê rola neyînî bilîze. Nêrîneke nîv- co, ji nêrîneke çewt a ku biserûber bûyî, ne hindikî xetertir e. Pêdi- viya nêzîkayiyeke zanistî, bi awayek cidî û di asta bilind de, bi sift- bûnê heye. Heta ku daneheveke

teorîk, lêkolîn û çavdêrîkirinê ne- yê pêkanîn, rêbaza zanistî encamê nade. Gelek encamên nêzîkayi- yên teorîk, lêkolîn û çavdêriyê li holê hene. Lêbelê jiberku van ji serî de, xwe ji bandora dogmatîk û utopîk paqij nekirine û jiberku çareserî ji xwe re nekirine annanc, nagihine encamekê. Xwediyên van nêzîkayiyan, ji dêvla ku jibo polîtîkayeke rast, rasteqînî û ku were sepandin xebatê bikin, weke ku çareseriyeke bi rêya zanistî ne gengaz be, ketina xwe ya rewşeke ne berpirsiyarî, weke zanistiyê berdidin. Heçku zanistî, li gor heyîna pirsgirêkê, amûra bi tenê ya dîtina çareseriyê ye. Heger li tevaya cîhanê pirsgirêkên mînanî tê- tin çareserkirin, sûcê negihîştina çareseriyê di rêbaza zanistiyê de, nayê dîtin. Ev rewş dide çespandin ku ev rêbaz bi tekûzî, duristî û bi annanca çareseriyê nayê bikaranîn. Çawa mirov jibo nexweşiye- ke ku were zanîn û tedawîkirin, nikaribe bibêje "nayê tedawîkirin", jibo pirsgirêkeke civakê ku gihîştî jî, nikarin bibêjin "çareseriya wê tine". Di rewşeke wiha de, encex mirov bikaribe ji bêbehreyî û bê- ehliyetiya bijîjkan, ji ne têrayiya dennan û rêbazên wan, an jî ji çewtiya wan xeber bide. Ji ber vê yekê, israra di rêbaza zanistî de, rêbaza rast a bi tenê ye.

Pratîkên sosyalîst û neteweperestan ên heta bi roja me, ti enca- mên serkeftî nedane. Rola wan a di warê neyînî de, bi zêdakarî he- ye. Xwediyên nêrînên fennî û yên nêzîkayiyên hevkarî jî, bi enca- mên ku rê li ber wan vekirin, weke berpirsiyarên bê çi qezenc kiri- ne û çi dane windakirin, ji xwe li holê ne. Beşek ji van jî, weke li tevaya welat, nikarin behsa erêniyekê li herêmê jî bikin. Pirsgirêka Kurd, bi pirsgirêkên din re di tevaya herêmî de, sedema qeyrana welatê ku lê ye. Ev jî tê wateya îflasa rêveberiyên siyasî.

Têgihîna polîtîk a ku pirsgirêkan ne bi çareserî, bi tepisandin, veşartin, tinekirin û rizandinê çareser bike, bê di nava çi rewşê de ne, ji vê qeyranê baştir tiştekî din nîşan nade. Rastiya qeyrana Roj- hilata Navîn jî, bi vê bîrûbaweriya siyasî ve ji nêzîk ve girêdayî ye. Dîsa heger ku ji serdestiya şaristaniya Ewropa bête behskirin, sede- ma vê ya sereke ev e ku, bi awayek zanistî nêzîkî pirsgirêkên xwe dibe û rêyên çareseriya demokratîk, heta bi dawî diceribîne.

Digel pêşveçûnên derandine holê jî, PKK a ku bi baweriya sos- yalîzma zanist nêzîkî bûyer û pirsgirêka Kurd bûyî, jiberku di pra- tîka

xwe de dûrî çareseriyê bû, mecbûr dimîne ku xwe di rexneki- rinê re derbas bike. Divê baş were fêmkirin ku, baweriya durist a bi sosyalîzma zanist û girêdana nêzîkî şêweya dogmatîzmê re, bi serê xwe têrê nakin û bi têrayî zanistîbûnê pêknayîne, zanistî bi xwe, ne baweriyê gumanberiya bi wate bingeh digire.

Jiber ku ji serî de, bawerbûnê gumanberiya zanistî ji dewrê de- randiye, vê rewşê ketina nav dogmatîzmê hêsan kiriye. Jixwe, her bawriya ku were asta dogmatîzmê, heger ku bingeha wê ya zanistî jî hebe, ev diyar e ku yê di pêşya rastiyê de bibe mîna perdeyekê. Êdî kesayetiyên ku ji civakeke feodal a pêşveneçûyî tên, jiberku di hêvotina (terbiye) zanistî re derbasnebûne, bihêsanî dikevin nava rewşeke dilînî û dogmatîk. Çanda kesayetiya serdest, li pêşya nêzî- kayiyên zanistî, astenga herî mezin weke zemînekê pêşkêş dike.

Dema ku şewşandina bi hişmendî û zanînên ne bitêrayî, bi vê zemînê re dibine yek, rewşeke weke ku xwe bixapînin derdixe ho- lê. Fedekariya ku tê kirin û wêrekiya ku tê nîşandan, çiqas mezin be jî, encam ji aliyê hineke din ve bi awayek ne baş tê bikaranîn û heta bi amûrbûnê dibe. Di rastiya PKKê de jî, tişta ku bi siftî tê jiyandin ev e. Ev rewş pêdivî dike ku, nêzîkbûn û rêbazên bîrdo- ziyî, polîtîk, rêxistinî û çalakî, bi berfirehî di ber çavan re bên der- baskirin, aliyên wan ên neyînî bi xwerexnekirin werin derbaskirin û yên erênî werin serdestkirin.

Ev yek PKKê mecbûr dike ku ji qeyrana sosyalîzma reel a di te- vaya cîhanê de û ji qeyrana şaristaniya kapîtalîzma hemdem, der- sên mezin derbixe, herwiha ji nû ve li pratîka xwe lêkolîn bike û en- caman jê derbixe. Di kongreya xwe ya heftemîn de, pêngavên ku di vî derbarî de davêje, di kongreya heştemîn de, dixwaze ku biqedî- ne û tekûz bike. Dizane ku rêya vê yekê jî, di girtina encama polî- tîk a rêbaza zanistî ku çareserker re derbasdibe. Herwiha, fennan dike ku nêzîkayiyê lê bikin û serfiraz bibin.

Min di beşa parêznameya xwe ya yekemîn de, dahûrandina dî- rok, serdem û herêmê kir, ezê vê weke carcaran bingeh bigirim û di vê beşê de jî bûyera Kurd û pirsgirêkê, ji nêzîk ve li ber çavan ra- xim û hewl bidim ku pêkbînim. Ev ê were wateya dahûrandina te- orîk a ez gihîştimê ku di pirsgirêka pratîk a herî girîng de, were ce- ribandin. Ezê bi hinek

têgînan destpêbikim, di tevaya cîhanê, he- rêm û tirkiyê de, di bingeha zanistî de hewl bidim ku bigihîjim en- cameke herî rast û dibêtiya çareseriyeke polîtîk.

## A- Danaskirina Hinek Têgînên Bingehîn

### 1- Civak

Civak vê yekê îfade dike ku, mirov amûran dafirînin, bi hiş- mendî meşa ber bi annanca hevpar bingeh digirin û bi hemzayen- dên xwe re dibine yek, ji teşeya ajalên herî nêzîk qut dibin û bi hev re dijîn. Di vê terîfkirinê de ya girîng ev e ku, bi van amûran kar û xebatê bikin, vê bi hişmendî bi hemzayendên xwe re bi hev- parî û jibo annancekê bikarbînin. Çawa mirov bi serê xwe nabe civak, bêyî amûran jî civakîbûn pêknayê. Ji aliyê din ve hatina di- gel hev, jibo berdewamkirina jiyana daringî, bidestxistina berhe- ma hevpar û pêkanîna ewlekariyê pêwîst dike. Ev yek jî hişmen- diya hevpar mecbûr dike. Di nava vê çarçovê de, ji malbateke ba- vik bi zêdeyî gihane civakeke mirovan ku ji dozînek (duwazdekî) du dozîneyan ne zêdetir û ji wir jî, gihane civaka cîhanê ya roja me. Civakê li gor terîfkirina xwe, ji çêbûna xwe heta îro, daye çespandin ku di çêbûnên mezin re derbas bibe û xwe bilind bike. Li qasî cîhana fizîk, rîwek û ajalan, ev derûna vê çespandinêye ku, cîhaneke rast a civaka mirovan jî yê hebe. Herwiha, mirov bê civak çênabe. Çawa cîhana fizîk, rîwek û ajalan rastiyek be, civak bi xwe jî bi hindikayî li qasî wan, an jî weke wan rastiyek e. Ev rastî nayê mandelekirin. Mandelekirina vê yekê, weke ku mirov bibêje “xweza tine, genim û mîh ne rast in”.

Ev yek diyar e, dema em li şûnwamasiyê an jî li dîroka nivîskî binêrin, hê berbiçavtir ***bûyera Kurdan*** a heyîna di roja îroyîn de, nayê mandelekirin ku rastiyeke civakî ye. Herçiqas ku dewleteke wan nebe, çiqas were angaştkirin ku bi têrayî nebûne neteweyek û ji mêj de ji holê hatine rakirin, heger ji wan were pirskirin ew ê bibêjin ku, bi mîlyonan li erdnîgariyeke diyar sift bûne. Devokên wan ên cuda hebin jî, weke civakên mirovan ên din zimanekî da- xivin. Heger ne hatibin rewşa civakeke neteweya bilind jî, ji he- zaran salan ve di rewşa civakên eşîrtî

yên bihêz de dijîn, li gelek gund û bajaran niştecîh bûne, li berxwedidin, tên perçiqandin û darizandin, hê jî bi biryar in ku hebin û ji jiyana azadî qet hêvi- yên xwe qut nekirine. Heçku em ji van hemû rastiyan vekirîtir, ti berjengên (birhan) din nabînin. Nêzîkayiyeke berevajî vê, ji wa- teya rêbazên engîzîsyona serdema navîn a ku ne zivirandina cîha- nê, bi zorê bi Galîlle dida gotin, wêdetir naçe. Herwiha dema em pirsgirêka Kurd li ber çavan bigirin, merca me ya bingehîn ev e ku, Kurd jî xwedî rastiyeke civakî ya li gora xwe ne. Bê dewlet- bûna wan, dûrbûna wan a ji netewebûnê, bişavbûna wan a herî li pêş û bê pariya wan a ji yekîtiyê, vê rastiyê naguherîne. Heger ku hê jî, civakeke li mezrayeke piçûk an jî civakeke koçber a mîna 10 000 salan berê ya dema neolîtîkê bin jî, ev rewş bes e ku Kurd bi civakî werine nirxandin. Ev rasteqînî, yê ne tinebûna bûyera Kurd û mandelekirina wê, yê biçespîne ku pirsgirêkeke kûr dijî. Mandelekirin an jî nîşandana bi şêweyeke din, encex bi rêbazên engîzîsyona serdema navîn, gengaz be. Ev rêbaza ku wê demê jî semekeftiye, li hember rastiya teknîka înfonnatîk û civaka zanîna îro, serkeftina wê li dera han, em dikarin bibêjin ku, li hember hi- qûqê raserî neteweyan, ji darizandinê rizgar nabe.

**2- Eşîr, Eşîrtî û Etnîsîte**

Heyîna civakî, piştî ku ji sedî 98ê temenê xwe, di rewşa bavikên hoveber ên 20-30 kesan de derbaskiriye, ji BZ 12 000 salan pêde, bi derbasbûyina civaka ku rîwek çandin û ajal kedîkirin re, derbas- dibine jiyana niştecihî û nifûsa wan zêde dibe. Derbasbûyina ji ba- vikî ya civaka qebîleya ku ji çend malbatan tê holê, di van mercên daringî de, gengaz bû ye. Ev civaka ku di dîrokê de, yekem car li hewzeya Dîcle û Ferada jor a ku bi ***Mezopotamya*** jorîn jî tê bi nav kirin pêkhatî, ji BZ 6000an û pêde, ji çend qebîleyên hê mezintir tên holê û derbasî etnîsîte û civaka eşîrtiyê dibin. Bêşik, di vê de bi- sazîbûna civaka çandiniyê ya niştecîh, rola diyarker dilîze. Ji çêbû- na êşîrtiyê, derbasbûyina hişmendiya pêşketî ya eşîrtiyê, encex bi hêzên hêrîşker ên derve ku derdikevine holê re û bi derbasbûyina ji parastinê ya belavbûn û hêrîşan, qevaztinê bidest dixe. Ev pêvajo ji BZ 3000an heta bi roja îroyîn, li gor cîh û demê, bi kêmbûn û zê- debûn berdewam dike. Çêbûna êşîrtiyê

fonneke civakî ye, gerdûnî ye. Her civaka ku pêşvediçe, gelek hindik vê fonnê dijî. Eşîr, dibe ku koçber û dibe ku niştecîh be. Di bûyera êşîrê de, derbasbûyina çêbûneke di asta dewletê de çênabe, herî zêde konfederasyonek di navbera eşîran de çêdibe. Eşîr, civaka siyasî ya berî dewletê îfade dike. Pêşî derawayeke daykanî û dûre jî, bi bandora pêşketina şa- ristaniyê re, derawaya bavkanî jiyîne. Dewletbûna di sînga eşîrtiyê de, çînçînîbûnê derdixe holê. Bi çînçînîbûnê re jî, girêdanên eşîrtî jî jevdikevin û cîhê xwe didin têkiliyên rêveberî û rêvebirina birê- xistinî.Li vira ne girêdanên û xwînê û xizimtiyê, têkiliyên siyasî û burokratîk serdest dibin.

Dema ku fonnê eşîrtiya civakê belavdibe û dikeve pilana duye- mîn, weke fonnê civakî yê nû, çêbûna qewm û nijad bi wate dibe. Eslê wê eşîr bi temamî belav nebûye, lêbelê hatiye guhertin, liser heman bingeha çandî, gelek eşîrên nû derketine holê. Him mezin- bûna tîkane û him jî ya berwarî hatiye pêkanîn. Di sînga wê de çîn

çêbûne û dewlet lê hatiye ferzkirin. Di bin van rastiyan de, civakên eşîrên fireh ên ku heman ziman û çandê temsîl dikin, yên ku gelek- zêde di erdnîgariyeke bi aram de dijîn û an bi dagirkeriya derve an jî bi rêya rêxistinên siyasî ku di nava xwe de pêktînin, di bin dest- hilatiyê de têne girtin, bi qewm an jî nijad têne bi navkirin. Fonna serdest a dema şaristaniya koledar, hê bêhtir eşîrên saf in, di serde- ma navîn de, fonna civakê ya serdest qewm an jî nijad e. Giregirên eşîrê yên ku çînçînî dibin, dikevine rewşa xanedan û rêveberan, be- şa civakê ya jêr jî, dikeve rewşa kedkarê hejar û kole. Herwiha xwemalîbûna heman eşîrê, girîngiya xwe winda dike, xwemaliya çînê girîng dibe.

Di bûyera Kurd de, fonna herî bihêz fonna eşîrtiyê ye. Hê jî vê hêza xwe berdewam dike. Kurdan BZ beriya 10 000 salan, li xetên der û hundirê çiyayên Zaxros û Torosan, di rewşa civakên neolîtîk de, bi fonna eşîrtî dest bi jiyanê kirine. Tê fêmkirin ku BZ di salên 6000an de, Kurd hatine rewşa eşîrên hişmendtir. Di vê de, birêxis- tinbûna civaka neolîtîk, rola diyarker dileyîze. Ji BZ salên 3000an û pêde, bi pêşketina mêtingehkariya sumeriyan, dikevine rewşeke berxwedana gelemperî. Berxwedan û hêrîşa hember, hişmendî û piştgiriyeke bi hêz a eşîrtiyê derdixe holê. Vê dawiyê hêrîşên ji der ku domdar dibin û bi erdnîgariya bikêrhatî re dibe yek, rê li ber wan vedike ku fonnekî civaka eşîrên çiya bidestbixin. Berdewamiya van hêrîşan heta weke dema me jî, derfetê nade hebûna Kurd a ve- guherînê û weke komên piçûk ku hebûna xwe biparêzin, dike pirs- girêka bingehîn. Ev rewş nîşan dide ku, ji aliyê siyasî ve Kurd qew- mekî lawaz e û rê li ber wan vedike ku fonnekî nijadî qezenc bikin, pêkutî û çewsandinên derve, timî asteng dike ku bibine civakeke pêşketî û hêzeke siyasî. Ji aliyê din ve, lêferzkirina bîrdoziya olî ya ji derve jî, ji aliyê mirûz û giyan ve pêşveçûna wan asteng dike. Ci- vak du bûyeran bi hev re dijî. Civaka fennî ya serdest a ku ji derve tê bi giregirên eşîrê re hevkariyê dike, birêvedibe û beşa nefennî ya ku piraniya civakê û kedkarên wê temsîl dike ye. Pirsgirêka Kurd jî, di vê bingehê de derketiye holê û heta dema me berdewam dike. Taybetiyên eşîrtiyê ku hevqasî bihêz in û li pêşya civakîbûna hem- dem asteng in, ji ber van sedemên siyasî û dîrokî ne. Qewmekî bi fonna eşîrtî ve girêdayî ku weke nijad û gel hebûna xwe parastiye jî, bi vê sedema siyasî û dîrokî

ve girêdayî ye.

**3- Netew û Dewleta Netewî**

Veguherîn û bidewletbûna wan eşîr û qewman îfade dike ku, hê bêhtir li dor bazara hundirîn a ku şêweya hilberîna kapîtalîst afi- randî, weke nasnameyeke raser di rewşa netew de, fonn qezenc ki- rine. Bazara hevpar, ji çand û devokên cîgeyî, rê li ber zimanekî hevpar û fonnên çandeke netewî vedike. Herwiha, yekîtiya aborî bi yekîtiya ziman û çandê re, ji monarşiya ku berjewendiyên xaneda- nên kevin û arîstokrasiya feodal dike yek, derbasî rejîmeke bi şê- weya komarê dibin ku bi pêşevaniya burjûva, hemû beşên civakê digire nava xwe. Bi giranî şêweya siyaseta kapîtalîst, serdestî ko- marê dibe, girêdanên eşîrtî û qewmî, bi hêza bazara netewî, vedi- guherîne girêdanên netewî. Dewleta netewî, vê pêvajoyê bi şêweya bi hişmendî û bi pilantir, cama jî bi zorê bi lezgîn dike. Weke for- mên civakî yên serdema me, weke netew û îfadeya wê ya siyasî, rê- veberiyên komarê wiha derdikevine holê. Kadîbûna zêde dibe, bi taybetî çêbûna hêzên mazatê (piyasê) û bazara di tevaya cîhanê de ya ku pêşveçûna teknîka zanistî zorê lê dike, bazara netewî û dew- leta wê xistine derawaya astengiyê. Herwiha netew û dewleta ne- tewî, dikeve rewşeke mîna rola xanedanên feodal ên doh a kevne- perest. Çiqas ku diçe, yekeyên siyasî, hiqûqî û aborî yên girîng ku raserî neteweyan, derdikevine holê. Di qada herêmî de, çêbûnên aborî û siyasî, girîngiyê qezenc dikin. Civaka navnetewî, dema bi- hêz a dîrokî dijî.

Bûyera Kurd a civakî, li hember pêşveçûna netew û dewleta ne- tewî, hê bêhtir di mercên serdema navîn de dijî. Ji ber sedemên gi- rêdanên eşîrtî yên bihêz û girêdanên hevkarî yên ji ser ve, ne baza- reke netewî ya serbixwe çêdibe, ne jî ber bi dewleta netewî ve di- çin. Derawaya wê ya stratejîk jî, di vê de rola neyînî dilîze. Dewle- tên serdest bi xwe jî, fersendê nadin ku ne bazara hundirîn û ne jî girêdanên pêşketî yên netewî û siyasî pêşvebiçin. Herwiha bi pirs- girêkên aborî, civakî û siyasî yên giran, dikevine mercên civaka modem. Fersend nayê dayin ku ziman û çanda netewî, bi amûrên hemdem pêşvebiçe. Komên netewî yên serdest, bi saya dewletê, him daringî û him jî menewî, derfetên pêşveçûna ji her

alî ve didi- ne ziman û çanda xwe. Para Kurdî jî dibe qedexekirin û mandele- kirin. Ev yek di warê çalakiyên netewî, aborî û têkiliyên siyasî yên azad û rêxistinan de jî, bi vî rengî ye. Aboriyeke bi berjewendî û çavkaniyên civakê ve girêdayî û rêxistinbûneke raman û siyaseta ku îfadeya azad bingeh digire, li dera han, dibe mijara cizakirinên herî giran. Qedexekirinên bi vî rengî, jibo jiyandina azad a nasna- meya çandî jî, têne ferzkirin. Bi vê rewşê, mandelekirin, qedexeki- rin û bişavtina bi zorê ku serdemên navîn jî bi şûn xwe ve dihêle, dabaşa xeberdanê ye. Giranbûna pirsgirêka Kurd a di vê astê de, ji ber van ferzkirinên berevajî serdemê ne.

Ev rasteqîniya hemdem ku bûyera Kurd dijî, zorbûna hatina rewşa netew û dewleteke netewî ya di bingeha neteweperestî de, derdixe holê. Ji aliyê din ve ev yek dide nîşandan ku, netew û dewleta netewî, weke vebijarka hemdem a bi tenê, girîngiya xwe winda dike, hê bêhtir demokrasiya bi şêweya civak, siyaset û dewletê, derdikeve pêş û rêya çareseriya demokratîk bêhtir der- basdar dibe. Bêyî ku bibin dewleteke netewî jî, di nava heman dewleta demokratîk de, jiyandina di rewşa komeke netewî û azad de, baştir û dewlemendkertir e. Gelek dewletên netewî yên kevin, ber bi yekîtiyên federe, peresînê nîşan didin. Wesfê DYA ya fede- ral û YE ya ku ber bi federalîzmê ve diçe, rêya nû nîşan didin. Ev rewş ji aliyê pirsgirêka Kurd ve jî, derfetê dide ku Kurd li wela- tên di nav de, di nava yekîtiyeke demokratîk de bijîn. Bi projeye- ke civaka şarwer, bi çêbûna amûrên siyasetê yên demokratîk ku fersendê nedine pêşdaraziyên neteweperestî û serî li rêbazên şide- tê nexin, yê bikaribin bi rêbazên aştîxwazî, ber bi çareseriyê ve biçin. Bêyî ku bikevine cudahî û şideta neteweperestî, ev rêya ku yê were pêşxistin, bêhtir gengaz dike ku hemû komên etnîk, heyî- nên xwe yên çandî biparêzin û azad bijîn. Ev yek dibe çareseriye- ke ku çiqas diçe cîhana me wê bingeh digire.

**4- Çareseriya Leşkerî û Siyasî**

Mijareke gelek caran hatiye çavdêrîkirin ev e ku, di pêvajoya dî- rokê de civakan, pirsgirêkên giran ên ku ketine nava wan de, hewl dane ku bi şidetê çareser bikin. Bi taybetî dewletên bi civakên bi- çîn, jibo çi pêdiviya wan hebe, ev kirime rêbazeke klasîk ku bi hê- zên şidetê, bi

artêşên xwe bidestbixin. Jibo vê yekê jî, çêkirina hên- cetan weke peywireke dîplomasiyê hewisîne (fêr bûne). Demên ku berhema zêdek bisînor bû û terazên leşkerî ne wek hev bûn, ya ku sazûmana cîhanê diyar dikir, dewletên ku hêza leşkerên wan herî bêhtir bûn. Çiqas ku ev dewlet serfiraz dibû, diçû heta bi hnpereto- riyeke cîhanê, dema semediket jî, dewleta ku li şûna wê dihate da- mezrandin, xwe ji vê rolê re amade dikir. Heta bi nîvê sedsala 20an, rêzikeke bingehîn a dîrokê, bûye ev rastî. Dema ku teraza toqîna nukleer hate damezrandin û şoreşên teknîka zanistî, rêbazên leşkerî bêber kirin, wê hengê jibo çareseriya pirsgirêkan, nêzîkayiya rêba- zên siyasî jênerev dibin. Di dibêtiya şerekî cîhanê de, jibo yê ser- keftî û yê têkçûyî, ti wateyeke zêde çênabe. Di vê rewşê de, ev di- be rêzikeke serdemê ku, giraniyê bidine rêbazên siyasî. Bêşik di vê de, bihayiyên rêya leşkerî û bêberiya wê, rola bingeh dilîze. Herwi- ha çareserkirina pirsgirêkên civakê yên heyîn, yên li gor pîvanên demokratîk, dibe rêbaza bingehîn. Di vê de bêyî ku sînorên siyasî werin guherandin, derfetên çareserkirina pirsgirêkên netewî, etnîk, olî û çandî ku derdikevin holê û pratîkên ku di vî derbarî de tên ji- yandin, rolê dilîzin.

Ji aliyê bûyera Kurd û pirsgirêka wê ve, pêşveçûna bi vî rengî, rewşeke bikêrhatî dafirîne. Ev yek derfeteke nû û rastî pêşkêş dike ku, pêdiviyê ne bi zora xwe û ne bi zora ku ji derve lê tê ferzkirin nebîne, liser rêzikên demokrasiyê yên bingehîn lihev bikin û bi guf- tûgoyan ber bi çareseriyê herin. Dema em dibînin ku rêya leşkerî, bi herdu aliyan gelekî dide windakirin, ev nayê hizirandin ku di en- camê de, ber bi çareseriyeke ku herdu alî qezenc bikin ve neçin. Rêya leşkerî encex bi têgihîna faşîst, mandeleker û tinekirinê gen- gaz be. Lêbelê hêza ku vê yekê diceribîne, di tevaya cîhanê de tê pêşan û vederkirin (cihêgirtin). Gelek mînakên ku di cîhanê de ha-

tine jiyandin, dide nîşandan ku di dema dirêj de, şensê rêbazên faşîst û mandeleker nemaye.

Ev peywireke girîng e ku, pirsgirêka Kurd ji rêbaza leşkerî were deranîn û têkeve platfonneke siyasî. Ev yek ê bide çespandin ku, pratîkeke fireh a civaka şarwer ku pêşdaraziyên neteweperestî şikandin, li qasî ku yê astengên psîkolojîk ên berê derbasbike, yê nî- şan bide ku xweşnêrîna demokratîk û dorhêla aştiyê, jibo her şêwe- ya çareseriyê afirînkeriyê teşvîk dike. Yê pirsgirêkê ji tabûya cudaxwaziya bi salan derbixe, weke pêwîstiyeke hiqûqê hemwelatiya hemdem, yekîtiya dewlet û welatan, di sepandina pîvanên demok- ratîk re derbas dibe. Hemdembûna rêbaza demokratîk a siyasî, vî şensî dide, herwiha derfetên serfiraziyê çi roja diçe zêdetir dike, pê- şan û vederkirina yên li hember hewqasî pêşvediçe û bi jiholêraki- rina wan bi encam dibe.

**5- Rêbaza Hiqûqî û Demokratîk**

Ev bûyereke nayê mandelekirine ku, di dawiya sedsala 20an de, demokrasiyan serfirazî qezenc kiriye. Digel hemû kêmasî û tengki- rina wê jî, demokrasî jibo gelan di serê nimûnakên siyasî de tê ku, herî bêhtir rêyên siyasî vekirî dihêle. Herçiqas hêzên kevneşopî yên serdest û mêtinker, jibo xwe bi şewşînin jî, di heman demê de krî- terên demokratîk, rêyên herî bikêrhatîne ku ber bi mercên civaka azad û wekhev ve herin. Herwiha heger ku hebe, di nava rêzikên demokratîk de daxwazên xwe fonnule bike, ku nebe jibo demokra- siyê têbikoşe, peywira hemû derdor û kesên ku pêdiviya wan bi de- mokrasiyê heye ye. Heta ku ev peywir neyê cîh û bisemekeve, bi- destxistina daxwazên azad ên van kes û derdoran, gelekî zor e. Çi- qas ku demokrasî were pêşxistin û bibe çandeke jiyanê ku bêyî wê neyê jiyandin, jibo wê dewletê û wî welatî, çareseriya hemû pirsgi- rêkan ê ne awerte be, yê bibe rêzik.

Çêbûneke din ku bi vê re, temamiyeke jêneqetîn bi xwe re tîne jî, derbasdariya sazûmana hiqûqê gerdûnî ye. Demokrasî û hiqûq, di wateya hemdem de ku yek ji wan nebe, çênabe. Ev herdu du rê- xistinên bingehînin ku hevûdin xweyî dikin û hemû pirsgirêkên ci- vakê çareser

dikin. Demokrasî, hiqûqê qada siyasî ye. Dema ku mafên mirovan ên bingehîn tevlî vê bête kirin, nonnên dewleta hi- qûq a demokratîk û hemdem derdikeve holê. Di navbera hiqûqê ku li bingeha dewletê rûdine û hebûna hiqûqê dewletê de, cudahiyeke bingeh heye. Heger ku dewlet hiqûq bingeh bigire, yê bibe dewle- ta hiqûq. Berevajî vê, heger dewlet bi serê xwe hiqûq bafirîne, ev yê bibe hiqûqê dewletê. Hiqûqê ku ne ji dewletê tenê were, tore û çanda gelê ku di nav de bingeh bigire, bi pîvanên hiqûqê gerdûnî ve girêdayî be û ji nonnên hiqûqê bingehîn ê dema borî re rêzdar be, yê rê li ber dewleta hiqûq a rasteqînî vebike. Ev yê bibe rêzika bin- geh ku, bi rejîma demokratîk re, di nava dewleteke wiha ku bi hi- qûq ve girêdayî de, hemû pirsgirêkên civakê û daxwazên wan, di nava aştiyê de bi awayek dadmendî werine çareserkirin. Çareseriya hiqûqê demokratîk, yê ewlekariyê bide herkesî û her beşê, yê tev- kariya bingehîn ji pêşveçûna civakê re bike.

Herçiqas ku di civakên Rojhilata Navîn de, dewletên hiqûqê demokratîk ne derbasdarbin jî, pêşveçûnên hemdem ên bi vî rengî, yê van welatan jî têxe vê rêyê. Di vê çarçovê de pirsgirêka Kurd jî, di nava pîvanên hiqûqê demokratîk de, yê zorê li şêwe- yeke çareseriyê bike. Ji dêvla ku di rêyeke şidet û cudaxwaziyê de bikeve nava astengiyê, bi rêbazên siyaseta demokratîk ê hiqûq li rewşa xwe ya berbiçav bîne, yê ji sê aliyên mafê mirovan ê bin- gehîn, mafê parastina rewa bi awayek hişmendî û rêxistinî bikar- bîne û bêhtir biserbikeve. Kurd ên herî zêde di dewleta hiqûq a demokratîk de, yên siyaset û hiqûq ji xwe re bikin mal û mafên xwe yên civakî bidest bixin, yên ji qurbanbûna bêteraziya hêza stemkar a sedsalan û bêwijdaniya serdemê rizgar bibin. Herwiha ji hemû deman bêhtir, xebata li gor rêbaza hiqûqê demokratîk û serkeftin dibe peywira bingehîn.

### 6- Hemwelatî û Neteweyîtî

Têgîna hemwelatîtiyê, girêdana bi dewletê ve îfade dike. Tê wa- teya endambûna dewletê. Ev têgîneke siyasî ye. Nirxekî etnîkî yan jî neteweyîtî nagire nava xwe.Neteweyîtî, xwemaliya neteweyeke diyar îfade dike. Hilgirtina girêdanên neteweyî yên dîrok, ziman û çanda wan a hevpar ku fonna civakî ya bibiryar in, nayê wê wate- yê ku girêdanên

siyasî jî wiha hildigire. Dibe ku mirov ji heman ne- tewê be, lêbelê pêwîstiya hemwelatibûna heman dewletê tine. En- damtiya dewletê, endamtiya neteweyê ya bizorê demaxe holê. Ev encex bi têgihîneke faşîst û otorîter , bizorê bête pejirandin.

Di çêbûna civaka Kurd de, takekesên ku di nava sînorê dewlete- kê de ku hemwelatî ne, nayê wê wateyê ku têkevin rewşa endamti- ya neteweya serdest a wê dewletê. Dikarin nasnameya nijad û ne- teweya xwe bi awayek cuda bijîn. Encex ev yek bi xwemaliya wan a neteweyî re, nakok nabe ku li dewleta nava wê de dijîn, bi navê nasnameyeke raser, girêdaneke neteweyî ya ku navê welat îfade di- ke bipejirînin. Mînak, “Ji neteweya îranê me, lêbelê Kurd im” li qasî ku ne nakoke, nasnameyeke bêhtir bi temamî îfade dike. Ev ji- bo Iraq û Tirkiyê jî derbasdar e. Bi gotina “Ez ji gelê Tirkiyê an jî, ji neteweya Tirkiyê me” re, gotina “Ez xwemaliya xwe ya Kurd jî hildigirim” rasteqîntir e û bêhtir yekîtiyeke di nasnameya raser de îfade dike. Ev yek ê ji jiyaneke azad a bi hev re zêdetir suxreyê bi- ke ku, nasnameya etnîk û nasnameya neteweyî ya ji tevaya welat re derbasdar, tevlîhev nekin, vê yekê li ber çavan bigirin ku herduk jî xwedî wateyeke resene ne û berevajiyê pêwîst nakin.

### 7- Civaka Fermî, Kevneşopî û ya Şarwer

Têgîna civaka fennî, komên mirovan ên ku li gor rêzikên xwe, li dor dewlet û rêxistinên wê çêbûne, îfade dike. Ji rayedarê asta herî bilind heta bi notirvanê gund, ji karker heta bi yê malnişînbûyî (te- qawîd bûyî), ev beşên civakê ku bi rêzik û fennanên dewletê ve gi- rêdayî, dikevine wergiriya civaka fennî. Li vir bîrûbaweriya kar- mend serdest e. Dewletê weke hertiştî dibînin. Li derî vê, ti pêşve- çûnên wan ên jidil tine ne. Di serdema kevin de, di rewşa koleyên dewletê de ne. Di mercên hemdem de, xwedî azadiyeke bisînor in. Lêbelê jiberku xwe weke dewletê dibînin, xwe ji beşên civakê yên din rasertir dibînin. Jiberku jiyana wan di bin ewlekariyê de ye, zê- de rêzikparêz in û ji afirîneriyê qut in.

Civaka kevneşopî, hemî hêmanên civakê yên kevin ku li derî dewletê mane, digire nava xwe. Ya rastir ev, ji ber xwe ve û civaka bêrêxistin îfade dike. Civakên bi vî rengî, aloziya bîrûbaweriyeke feodal û koledar û bîrûbaweriyeke xwezayî di nava hev de dijîn. Ji rêxistinên demokratîk û hemdem û saziyên mafê mirovan bêpar in. Ji hezar salan ve dewlet û ol çawa fennan dabin, wiha dijîn û serî- danîna li ber teslîmbûna qederê ji xwe re weke rûmetekê dibînin. Ev bîrûbawerî û hînbûn, nîşan didin ku koletiyeke bi kûrayî dijîn.

Civaka şarwer, di serî de civaka burjûva ya ku li derî dewleta fe- odal bi awayek azad pêşvediçe, îfade dike. Di pey re, dema ku bur- jûvazî dikeve rewşa civaka dewleta fennî, wergirtina wê hatiye gu- hertin. Di roja me de li derî dewletê, bi şertê ku girêdayî rêzikên hi- qûqê be, digel wê jî hemû beşên civakê yên ku xwedî bîrûbaweri- yeke azad û xwedî bemameyeke civakê ya berbiçav û rêxistin, di- gire nava xwe. Çiqas ku diçe, dikeve rewşa şêweya civakeke ku him fennî û him jî li derî civaka kevneşopî pêşvediçe û diyarker di- be. Di derûna xwe de, ji valahiya ku civaka kevneşopî afirandî ya ne çareserker û ne afirîner tê û dikeve rewşa sazûmana komên ci- vakê ku nirxên çareserkeriya wê bilind.

**8- Welatparêzî û Enternasyonalîzm**

Di pêvajoya dîrokê de, têgîneke dulibî ku timî tê guhertin jî, gi- rêdana di navbera welatparêzî û entemasyonalîzmê de ye. Ji parçe- yê erdnîgariya ku weke civakê bi awayek payîdar liser hatiye niş- tecîhbûn û seresazî û binesaziya hilberîna wê girêdanekê çêdike re, welat tê gotin. Entemasyonalîzm, asta têkiliya bi civaka bi heman welatekî din re ye. Ji dema çanda neolîtîk a civaka pêşî ya niştecîh ve, van têgînan wate qezenc kirine. Welat çiqasî pêdivî be, têkiliya di navbera du welatan de jî hewqasî pêdivî ye. Berevajî vê, pêşve- çûna dîrokî çênedibû. Cama sînorên serdestiya siyasî û welat tê tevlîhevkirin. Dîsa weke ku şert be, zimanek û neteweyek tenê li nava vî welatî bijîn, nêzîkî vê mijarê dibin. Heger ku welatên wiha hebin jî, nayên gelemperîkirin. Li qasî ku liser welatekî, gelek zi- man û gel dikarin bijîn, liser çend welatan jî, zimanek û gelek bi te- nê dikare bijî. Mînak, li Rûsya gelek netewe û ziman dijîn. Tirk we- ke neteweyeke tenê liser gelek welatan dijîn.

Ji aliyê Kurdan ve, du aliyên pirsgirêkê hene. Heger ku ji aliyê dîrokî ve parçe bûbin û zimanê wan bisînor bûbe jî, digel ku welatekî wan heye, Kurd welatê ku di bin banê wî de dijîn jî, weke welatekî fennî dikarin bijîn. Têgihîneke welatê hevpar pêşveçûnê nîşan dide. Di tevaya cîhanê de jî, pêşveçûn di vî babetî de ye. Weke eşîrtiya teng a kevin, hingofiya (fikra sabît) zêde ya sînor jî, li hember tek- nolojiya ku pêşve diçe, wateya xwe winda dike. Parvekirina cîhanê weke welat, çiqas ku diçe dibe meyleke pêşveçûyî. Rêzgirtina heyî- na çandî ya welatan, lêbelê parvekirina bi mirovên din re, taybetiya pêşveçûyî herî girîng a serdema me ye. Herwiha ji her demê bêhtir, welatparêzî û entemasyonalîzm ketine nav hev. Hê bêhtir di sedsala 19an de, wêjeya bostek axa welat ku anîbûne rewşa hêmaneke nete- weperestî ya hişk, di mercên serdema me de, ji suxreya welat bêhtir zirarê dide. Çawa xwedaniya axa ku feodalan bi çîtan dorpêçkirî, li hember netewebûnê hatiye wateya pêşvemayînê, têgihîna welat a bi neteweperestiya teng jî, li hember entemasyonalîzmê ketiye wateya paşverûtiyê. Welatparêziya hemdem, bi dewlemendkirin û pêşvebi- rina welat ve girêdayî, watedar dibe. Welatparêziya rasteqînî ev e ku, welatê xwe dewlemend bikin, ku ji aliyê daringî û menewî ve lê bête jiyandin û vê bi mirovatiyê re, hevpar bikin. Herêmên cîhanê yên herî pêşketî, weke welatên DYA û YEyê, bi vê têgihînê hemû mirovatoyê ber bi xwe ve dikşînin. Digel ku kesek têkiliyê bi wela- tê Zûlûyan nade, rizgamebûna wan a ji hejariyê jî, bi welatparêziya wan a paşverû ve girêdayî ye. Têkoşîna welatparêziyeke hemdem- tir, di xebat û hewldaneke ku welatê liser dijîn, dewlemendtir û pêş- çûyîtir bikin re derbas dibe. Ev yê were wateya welatparêziya raste- qînî ku, ne di ber welatparêziya sexte ya serdestan, di ber welatê hevpar ê gelan de, di bingeheke azadî û mafên wekhevî de, di her astê de bi pevrayiya hevpar û bi rêbaza çalakî, têbikoşin.

Di nava dewletên ku Kurd lê dijîn de, di nava sînorê welat he- mûkî de bi komên ku berjewendiyên wan weke hev re û di binge- ha azadî û wekhevî de, têkoşîna welatparêziyeke hevgirtî pêwîst e.

Bi pêşdaraziyên neteweperestî bikaranîna gelan a li hember hev, di pêvajoya dîrokê de bûye polîtîkaya hevpar a serdest, hevkar û hê- zên mêtinker. Serdema me di demeke ku teknîk û zanistî gelekî pêş- ketî re

derbasdibe, welatparêzî û entemasyonalîzm jî gelekî pêşve- biriye. Liqasî kadîparêziya serdestan, kadîparêziya kedkar û bindes- tan a bi biratî ku digihe wateya xwe ya rastqînî, ewqasî pêdivî ye.

Di bûyera civaka Kurd de, ya herî serdest nimûnaka kevneşopî ye. Ji hezar salan ve Kurd, di rewşa yekeyên eşîrtî de, kevneşopi- yeke bergirtî dijîn. Ji bilî komeke teng a ku bi serdestên fennî re hevkariyê dikin, civaka Kurd bi derû serdeman de hatiye dehefan- din û mehkûmî bêdemiyê kirine. Bêçare û bi bîrûbaweriyeke ku her tiştî weke qedera xwe dibîne, lêhatiye. Ji giyan û bîrûbaweriyeke ku pirsiyarî bike û li çareseriyekê bigere dûr e. Çewsandina sedsa- lan û propagandaya ol, ew hînî qederê kirine ku ji hemû mirin û bê- mafiyan re stûyê xwe xwar bike. Ev rewş cama di sînga xwe de, te- qînên hişk û serhildanan hildigire. Ji ber mercên der û hundir ên ku dijî, ne civaka xwe dafirîne û ne jî tevlî civaka fennî ya ku tê de dijî dibe. Di dema borî û dema me de ***Alayên Hamîdiye*** û ***Yekîneyên Cerdevanên Gundan,*** ji civaka fennî ya serdest têne hesibandin.

Di mercên hemdemî de, cicaka kevneşopî ya ku ji ber sedemên zanistî û teknîkê jevdikeve, rê li ber qeyraneke civakî ya kûr vedike. Civaka bi qeyran a kevneşopî, di roja me de hilweşîneke herî giran, jevketin û belavbûnê dijî. Di vê rewşê de, rêxistiniyên şoreşger û serhildêr ku dikevine dewrê, ji ber bêteraziya hêzê û bêpariya ji dos- tên stratejîk, bisemakevin û nabine çareseriya jibo pirsgirêkan. Her- wiha civaka şarwer, jibo Kurdan hêzeke civakî ya girîng a çareser- ker e ku bête ceribandin. Ji dêvla civakên fennî, kevneşopî û yên serhildanê ku qeyranê kûrtir dikin, pêşnûmayeke civaka şarwer a wergirtî û ahengî ku bi bemameya xwe ve girêdayî, li gor peywirên wergirtî yên li pêşya xwe bi gelek rêxistinên şarwer, yê bibe şêwe- ya civakeke bilind a çareserker. Gelek dezgehên civaka şarwer ên di qadên aborî, civakî, çandî, siyasî, derdorî, hiqûqî, sportîf, hunerî û dîrokî de ku werin pêşvebirin, dikarin gelê Kurd ê di nava demeke- tineke mezin de, bînine rewşa civakeke demokratîk a hemdem.

## B- Di derbarê Bûyera Kurd de Hinek Nêzîkbûn û Pirsgirêkên Rêbazê

Bêyî ku bûyera Kurd bête ronahîkirin, xebitandina wê ya weke ku bi serê xwe pirsgirêkek be, dibe nêzîkbûneke çewt ku hê di serî de dikevine navê. Jibo têgihîştina pirsgirêkê, ev yek pêdiviyeke rê- baza zanistiye ku, bûyerên bingeh ên pêve girêdayî werin terîfkirin û heta bi rawêjên (hîpotez) teorîk bên dahûrandin, ji teoriyan bigi- rin heta bi lêkolîn û encamên taybetmendiyên qadê, di ber çavan re derbasbikin. Heta ku negihin têgînên rast, nêzîkbûnên bi rawêj û dogmayên bîrdoziyî, yê rê li ber encamên ku bi zanistê re nakok ve- bike. Tenê têrayiya bi têgînên rast jî, ji terîfkirina bûyerê ya bi par- çe û wêdetir ti encamên din nade. Ya herî ne baştir, ev nêzîkbûnên ku aliyê wan ên demagojîk zêde ne. Ji mandelekirina bûyerê bigi- rin, heta bi guhertinên herî bêteşe, sexbêriyên bi vî rengî, dibine berpirsiyarên encamên neyînî yên ku di pratîkê de jî derdikevine pêşberî me.

Dema ku em di nava vê çarçovê de, li mijarê ji nêzîk ve binêrin:

**1-** Nêzîkbûne li rastiya (rastî û bûyer têne heman wateyê, terîfe- ke zanistbingeh digire) Kurd a bîrdoziyî: Bêşik, mirovê bê bîrdozî nayê hizirandin. Nêzîkbûneke bîrdoziyî ya herkesî li cîhanê û hemû hebûnan, jênerev e. Dema em dibêjin nêzîkbûna bîrdoziyî, ji nêrî- na mîtolojîk heta bi nêzîkbûnên olî, felsefî û zanistî, ji çar nêrînên bingeh xeber didin. Takekes, bûyerên li pêşya xwe, hindik an jî ge- lek bi têkeliya van her çar nêrînan dinirxîne. Jibo takekesekî serde- ma pêşî, bingeha raveyê yê bi mîtolojiyê ve girêdayî be. Yên ku mî- tolojiyê herî pir dizanin ên di derawaya kesên desthilatdar ku rave- yê herî baş bikin de bin. Ya ku pêngavekê li pêşiya vê û herî bêhtir di nava hev de tê çêkirin, nêzîkbûna teolojîk e. Li vir hewldan ê ra- veyeke li gor nêrîna ol û xwedanasiyê be. Helbet ev herdu nêzîk- bûn yê encameke ku ji rastiyê dûr bide. Lêbelê ev ji aliyê bîrûba- weriya mirovê di destpêkê de, şêweyeke şîrovekirina ku jênerev be ye. Li qadên şaristaniyê yên ku tengbûna hiş lê tê jiyandin û hê fel- sefe û zanist lê pêşneketî, ol û mîtolojî hê demeke dirêj ên bibin şê-

weya ravekirinê. Di roja îroyîn de jî, derbaskirina bandora şêweya vê ravekirinê, hê dûr e.

Nêzîkbûna felsefî, di ravekirina bûyerê ya bi hemû taybetiyên wê de, bikêrhatîtir e. Bûyer ne bi efsaneyan û ne jî bi xwedayan tê- ne ravekirin, ji dêvla vê de, tê hewldan ku bûyer bi xwe, li gor hi- nek sedem, çawabûn û encamên wê were ravekirin. Ev nêzîkbûn, Di dema şaristaniya koledariya Athena-Roma de ku bajarên mezin hatine avakirin û pratîka civakê pêşveçûyî, di rewacê de ye. Pênga- vek ji vê nêzîkbûnê û wêdetir, şêweya zanistî ya nêzîkbûna dawî ye ku şaristaniya kapîtalîst pê ve girêdayî û pêşvebiriye. Digel ku liser yekîtiyek çênebûye jî, nêzîkbûna zanistî, bi rawêjên felsefî yên ku bi ezmûn û çavdêriyan tên rastkirin, hereket dike. Dema ku rawê- jên felsefê yên neberbiçav, bi ezmûn û çavdêriyan tên çespandin, raveya zanistî tê pêkanîn û zanîna herî nêzîkî rastiyê derdikeve ho- lê. Behskirina ji zanîna teqez, berevajî nêzîkbûna zanistî ye. Ev yek nêrîneke zanistî ya tê pejirandine ku, zanîn di rewişteke îzafî de ye, timî pêşvediçe û hêza wateya xwe zêde dike, herwiha hê bêhtir rê li ber pêşveçûnên teknîk û pratîk vedike. Ji neguherîna zanînê bêh- tir, behskirina ji raveyê û zanîna ku kûr dibe, yê rastir be.

Di çarçoveya van terîfkirinan de, çiqas ku di nava nêzîkbûnên bîrdoziyî de para zanistiyê zêde bibe, di derbarê bûyerê de, asta agahdarbûn û zanînê jî yê ewqasî zêde bibe. Kesekî ku tenê rave- yên olî û mîtolojîk bi têrayî bibîne, di derbarê rastiyê de encex bi şîroveyên gotinên pêşiyan, ê hewl bide ku ji bin mijarê derbikeve. Rawêjên felsefî û teorîk jî, jiberku bi temamî berbiçaviyekê nagi- rin, ji ketina nava ne berbiçaviyê ya ku ber bi dogmatîzmê ve herin rizgar nabin. Herwiha perspektîfên bîrdoziyî, çavdêriya zanistî û tecrûbe yên ku bi bingeha herî zanistî ve girêdayî, jibo zanîna di derbarê bûyerê de, gelekî girîng in. Terîfkirinike ku pejirandineke gelemper bibîne, encex encamên çavdêrî û ezmûnan ji aliyê nêzîk- bûnên pratîk ve bête destekirin, yê pêkwere. Nêzîkbûn û şîroveyên li derî vê, yan ên bibine efsane û baweriyên olî, yan jî yê ji rama- nên teorîk ne berbiçav wêdetir ti wateyên din îfade nekin.

Ev mijareke tê çavdêrîkirin ku, bi gelemperî bi çarçoveke bîrdo- ziyî

ya ne zanistî, nêzîkayî li bûyera Kurd tê kirin, ew jî bi bingeh- girtina aliyên wê yên neyînî. Di serdemên pêşî û yên navîn de, ha- tiye xwestin ku bi efsaneyan û vegotina ji devê xwedê , nirxandin werine kirin. Di vî derbarî de, ji devê Hz Muhammed hadîsên sex- te lihevanîne bê çima xwedê naxwaze Kurd bihêz bibin. Dîsa li ve- gotinên bê çawa ji Nûh Pêxember zêde bûne, tê rasthatin. Di mîto- lojiya Grek bi xwe de, Welatê Medya di kesayetiya jinekê de (Me- deûs), bi dawereke herî xeter tê vegotin. Jiberku di wan serdeman de, nikarîbûn serdestiyê li welatê Kurdan bikin û berjewendiyên xwe bidin domandin, ev şîroveyên mîtolojîk û olî, weke rêbazeke propagandayê bikaranîne.

Ne gengaz e ku bi kemnên bîrdoziyî yên serdemên pêşî û yên navîn, bûyera Kurd rast were terîfkirin. Bi taybetî jiberku qada Kurd lê dijîn, dibe mijara dagirkirina pir alî û pir annanc, di der- barê gelê wê de, rê li ber îfadeyên ku nayên gotinê û şîroveyên olî û mîtolojîk vedike. Ev rastî sedema bingehîn e ku Kurd, di warê olî û mîtolojîk de jî be, xwe bi têrayî îfade nakin. Dagirki- rin û mijokatiya vekirî, parastina bîrdoziyî jî, gelekî asteng kiri- ye. Kurd ewqasî hatine daxistin ku xwedî lê derketina li xwe jî, mîna li hember rabûna fennanên xwedê û dewleta pîrozwer dibî- nin, herwiha ketina nava bawerhişkiyeke kor. Mandelekerî, liser vê zemîna dîrokî bilind bûye.

Xwediyên nêzîkbûna zanistî yên pêşî, bi şaristaniya Ewropa ve girêdayî derkrtibûne holê. Di encama şerê ku jibo zanistê dihate meşandin de, zanyarên ku wêrekî qezenckirin, jiberku dest avêtin hemû mijarên ku herî tabû, nêzîkbûneke bi vî rengî ya li mijara Kurd a tabû jî, jênerev bûye.

Bêşik, di vê de berjewendiyên siyasî yên niştecîh, rola bingehîn lîstine. Ronahîkirina bûyera Kurd, jiberku yê gelek berjewendiyên cîgeyî û navnetewî vala derbêxe, hêvî ji qedexekirina wê û ne gi- handina wê ya raveyeke zanistî hatiye kirin, xwestine ku van berje- wendiyan bi pêkutiyan berdewam bikin. Ji ber vê yekê bi tirsa ku di bîrûbaweriyan de hatî afirandin û ji berjewendiyan bêparhiştin, mijara Kurd bêxwedî hiştiye an jî bi mandelekirineke herî bêteşe, li gor berjewendiyên xwe nêzikbûnên demagojîk serdest kirine. Nayê gotin ku hê jî ev rewş bi temamî hatiye derbaskirin.

**2-** Nazîkbûnên neyînî ku serdestî nêzîkbûnên bîrdoziyî dibin, rê li ber berevajiya xwe vedike, weke ku demekê rasteqîniyeke Kurd hebû tê nêzîkbûn. Heta Kurdîtiyeke bihêz, berxwedanvan, serhildêr û serfirazbûyî tê îdalîzekirin. Ev mijar ji nêzîkbûnên neteweperestî re, derbasdartir in. Dema ku felsefeya wan a civakî metafîzîk be, nêzîkbûnên bi vê şêweyê, rastiya heyî bêhtir tevlîhev dike. Rastiye- ke ku weke xwedê bi carekê gotibe çêbibe û çêbûbe, dabaşa xeber- danê ye. Ev sexbêriya ku bi xwe re rê li ber gelek çewtiyan vekiri- ye, dikeve îdealîzmê û bi encamên xwe yên pratîk, wêranker dibe. Şîroveyên bûyeran ên ji hebûna wan cuda, dema ku li xêzka polîtî- ka û livbaziyê vedide, dibine sosret û derdikevine holê.

Heçku di derbarê gelan de, nimûnekên peresînparêz ên herî bê- teşe jî, merhaleyên pêşveçûna xwe danîne holê. Di hhnên ti gelan de safîtî û çû qediya ya ji nişkê ve tine. Civakên ku di mercên de- ma dirêj û cîhê fireh de, bi pêşveçûneke diyalektîk ku rasteqîniyê qezenc dikin, êdî ne rawêjek encameke zanistî ye. Ya girîng ev e ku, civakek mercên dem û cîh li deman dabeş bike, di nava mer- cên resene yên her demê de, berembergirtinan çêbike û bigihe za- nîna bûyerê ya herî pêşveçûyî. Ev pêdiviyeke nêzîkbûna zanisti- ye ku, bi vê rêbaza ku ji her bûyerê re derbasdar, bigihine agah- darbûnên herî nêzîkî rastiyê. Bûyereke ku neyê dahûrandin an jî neyê terîfkirin, nayê hizirandin. Di vî derbarî de, pêdivî ne bi da- hênanên nû û ne jî bi israra rêbazên ku çewtîtiya wan hatî çespan- din heye. Bi hewldaneke nefspiçûkî, nêzîkbûneke dîrokî ya diya- lektîk a rast, bi çavdêriyên bisînor ên di destê me de jî, yê me bi- ke xwedî agahdariyên herî nêzîkî rastiyê.

Dema ku ji vî alî ve lê bête nêrîn, resenîtiya bûyera Kurd a di xêzka gelemper a peresînê de, hê baştir tê fêmkirin. Civak hemû heta bi dema neolîtîkê, dişibine hev, tê zanîn ku bi komên ku herî bêhtir digihane sed kesan, bi nêçîrvanî û danehevê debara xwe di- kirin. Çand û ziman xwedî pêşveçûneke bisînor in û nûka ji hev cu- da dibin. Di vê merhaleyê de, ne gengaz e ku komek ji ya din ra- sertir were dîtin. Civaka neolîtîk li dema elinda (berbang) dîrokê rast tê. Rola civaka ku neolîtîk derandî holê ya di destpêkirina dî- rokê de, diyar e. Hemû dahûrandinên şûnwamasî û ethnolojîk ku hatine çêkirin, didine nîşandan ku ev civak,

liser axa ku gelê kûrd niha liser niştecîhe, hatiye afirandin. Peytandina ji aliyê bûyera Kurd ve ya herî girîng ev e ku, ji hebûnên ku neolîtîk pêşvebirine û jiyane yên herî kevnare ne. Ev peytandin, gelekî girîng e. Lewra li gor ku taybetiyên civaka neolîtîk têne zanîn, terîfkirina dayîk û ka- likên Kurdan hêsantir û gelekî jî girîng e. Di kategoriya gelên herî kevnar û afirîner de, cîhgirtina di rêza yekemîn de, azadiyeke girîng e û encamên wê ji dîrokê re dergûştiyê dikin. Hemû dane jî vê ras- teqîniyê rast derdixin.

Weke vê yekê, jiberku dahûrandinên serdema koletî û feodaliyê, rewşa her civakê ji nêzîk ve diyar dike, herwiha yê taybetiyên Kur- dan ên vê demê û pêşveçûnên nû jî nîşan bide. Çînçînîbûn, siyasî- bûn, rêxistinbûnên seresazî û binesazî yên li gor xwe, yê civakê bêhtir bi pêş ve bibe. Kurdan ji ber mercên xwe, afirîneriyên van deman bisînor be jî gihîştandin e. Ya girîng ev e ku, ev bûyer bi çavdêriyên zexm, di mercên dem û cîhê rast de werin peytandin, li gor vê werin terîfkirin û rawêj bêtine pêşvebirin.

Ev rastiya gelemper hatiye çavdêrîkirin ku, serdema kapîtalîst bi gelemperî civakan ji komên qewm û eşîrtî diderîne, wan li dora ba- zara netewî, zimanekî hevpar û çandekê dike netewe. Her civaka ku heyî, di bin van mercan de dikare bibe netewe, ya ew bi xwe yan jî bi mînakên nêzîk ên cur bi cur re dibine yek û netewebûnên cuda derdixine holê. Hindik civakên ku tevlî pêvajoya netewebûnê na- bin, dimînin., ev jî ji astengên fizîkî yên mecbûrî çêdibe. Ev rastiya han jibo Kurdan jî bi vî rengî ye. Di vê rastiyê de, sê vebijark li pêş- ya Kurdan hene: An Kurd ên netewebûneke saf bijîn, an jî heger ji ber zora leşkerî û siyasî bi vê rêye netewebûn gengaz nebe, weke vebijarka duyemîn, bi neteweya serdest a dewleta ku di nava wê de dijîn re, wê bibine zemîneke ku di nasnameyeke raser de, netewe- yeke hevpar derînine holê. Ya ku bi giranî tê jiyandin ev e. Heger ku ev rê jî serfiraz nebe, li derî kesên serhildêr bi bişavtineke zorê

yê bihelin, cihêreng û tine bibin. Ji aliyê pêdiviyên serdemê ve, li gor ku ev yek ne gengaz e, ev yek jênerev e ku bi şêweyekî yê bi- bine neteweyek.

Weke tê ditin, ji pêşî de neteweyek, qewmekî bihêz, heta eşîreke saf tine ye. Di nava pêvajoyê de, bi veavabûnên tevlîhev veguherîn bêhtir diyarker dibin. Ji navê wê bigirin heta bi bûyerê bi xwe jî, ev peresîn domdar e. Ev baş tê zanîn ku, di dîrokê de navlêkirinên di şaristaniyê de, pêşî ji aliyê sumeriyan ve hatiye destpêkirin. Ev di- bêtiyeke bihêz e ku peyva Kurd jî, ji aliyê sumeriyan ve hatiye go- tin. Di zimanê sumerî de “Kur” çiya ye, vesera “tî” jî xwemaliyê îfade dike. Herwiha ***“KurtV*** tê wateya çiyayî. Tê zanîn ku îro jî ji Kurdan re, gelê çiyayî tê gotin. Tirk dibêjin “Tirkê çiyayî”.

Şîrovekirina bûyera Kurd a ji aliyê siyasî ve jî, ne zor e. Li gor nêzîkbûna bîrdoziyî û dogmatîk, jibo xwedîbûna dîrokê damezran- dina dewletekê qet ne pêwîst e. Heçku dema ku li bûyera siyaset û dewletê tê nêrîn, ev yek baş tê zanîn ku, dewlet ne ya nijadekê, qewmekî an jî neteweyeke saf e, dewlet ji aliyê çînên serdest ên gelek qewm û neteweyan ve hatiye damezrandin, evan dewlet dewrî hev kirine an jî ji hev qut kirine. Dewlet, ne ji aliyê gel û ne- teweyan ve, ji aliyê çînên serdest û mijok ve tê damezrandin. Hi- neke din berdest dikin, diguherînin, an jî ji hev vediqetînin. Dîrok wiha berdewam dike û tê. Lêbelê li gor nêzîkbûna îdealîst, jibo ku herî baş li dîrokê bibine xwedî, mercê herî bingehîn ev e ku bi te- qezî dewletekê damezrînin, an jî bibin xwedî dewlet. Lê rasteqîni- ya dîrokê rast dike ku, rewşeke wiha encex bibe nêzîkbûneke îde- alîst a baş, lêbelê rastî yê ne bi vî rengî be. Herwiha, ev yek yê ne rast be û yê gelekî îdealîst be ku Kurd, dîrokê ji dewleteka ku ya wan be bidine destpêkirin. Jibo ti gelan, tenê nêzîkbûneke siyasî ya bi vî rengî, nabe dabaşa xeberdanê.

Ya giran ev e ku, serdest û mêtinkerên wan, çîn û xanedanên ser- dest ên van dewletan tînine holê. Dewleta eşîrê, ya gel û ya nete- weyê yawe (sefsete) ye. Ya ku li nav Kurdan tê jiyandin ev e ku, ji dewleteke ku serdest û mêtinkerên wan xwedîne zêdetir, ji hevpa- riya dewletên ku xanedan û çînên etnîk ên din serdest, heta bi xu- lamtiya herî nebaş diçe ve, dîrokeke siyasî fermîtî qezenc kiriye. Ev yek taybetiyeke din a dîroka

wê ya siyasî ye ku, weke gel û eşîran, li hember dagirkeriyên der û hevkarên wan ên di nava xwe de, ser- hildanên sift jiyane. Êdî jibo gelan dîrok, tenê bi qada siyasî ne bi- sînor e. Ji aborî heta bi dîplomasiyê, ji qada civakî heta bi siyaset û hiqûqê, ji dîroka çanda gelemper heta bi peresîna gelemper a ci- vakî, gelek pêvajoyan di nava hev de îfade dike. Ev pêvajo hemû, di nava girêdaneke diyalektîk a dîrokî de, pêşveçûnên gelan û civa- kan ên bi temamî û dîrokî îfade dike. îfadekirina dîrokê ya bi pêva- joyeke tenê, gelekî çewt e.

Pêşveneçûna di warê siyasî de, nayê wateya pêşveneçûna di warê çandî de. Mînak, Cihû encex di van 50 salên dawî de, bûne xediyê dewleta xwe. Lêbelê di warê entelektul, olî, darayî û ba- zirganî de, weke serdestê cîhanê tevayî ne. Heta weke do, rewşe- ke wan a niştecîhî jî tine bû. Lêbelê ev şaşiyeke mezin e ku enca- meke bêdîrokiya cihûyan jê were derxistin. Dîsa dîroka etnîk bi serê xwe bûyerek e. Dîroka çandî, tê wateya dîroka herî berfireh. Nêzîkbûnên îdealîst û yên yekalî, li qasî di asta bûyerî de, di mi- jara dîrokê de jî, di derbarê Kurdan de, rê li ber çewtiyên mezin vekiriye. Nêzîkbûna dîrokeke zanistî, li qasî taybetiyên Kurdan ên gelemper, yên nîşan bidin ku, di nava reseniyên xwe de jî, xwedî dîrokeke gelekî bireng û hîkarîker in.

**3-** Ji çewtiyên rêbazê yên din, ya herî girîng jî, yekgirtina pirsgi- rêka neteweya Kurd a bi damezrandina dewletekê re ye. Li gor vê yekê, tenê jibo damezrandina dewletê dê rabe ser lingan, ji bilî vê hemû rêyên din ên çareseriyê yên oportînîzm û jirêderketin bin, xi- yanet û hevkarî bin. Bi taybetî di pirsgirêka netewî de, şîroveya Stalîn a di sosyalîzma reel de, di gelemperîkirina şêweyeke wiha de, hîkarîker bû ye. Zor tê angaştkirin ku ev nêzîkbûneke lenînîst e. Esasê wê ev nêrîneke çînên mêtinker ên kevn e ku, pirsgirêkeke ne- tewî an jî civakî bi damezrandina dewletekê ve an jî jibo vê yekê, bi hilweşandina dewletekê ve girêbidin. Ji gelan re ya bingehîn ne damezrandina dewletê ye, damezrandina rejîmeke demokratîk e. Dema ku em bi rêbaza zanistî binêrin, emê çêtir bibînin ku, damez- randina demokrasiyê ji damezrandina dewletekê darbastir dibe, ji- bo berjewendiyên gelan rasteqîntir û çareseriyeke bikêrhatîtir e.

Belkî jî, dema ku merc ferz bikin damezrandina dewletê, ji aliyê

gelan ve rêyeke dawî ya ku neyê başgirtin be. Lêbelê neteweperes- tiya neteweya serdest û bandora wê ya di nava refên ku xwe sosya- lîst berdidin de, damezrandina dewletê di her mercan de kir rojeva her rêxistinê. Ev zêdekarî û jirêketin e, ev derûna xwe jî, ji îdealîz- ma çîna serdest û mêtinker digire. Çareseriya herî li gor berjewen- diyên gelan, damezrandina yekîtiyên bi têgihînên mafê wekhevî û azadiya wan ve girêdayî û dîsa bi afirandina nirxên havpar in. Hê jî, jibo çêbûna dewleteke piçûk bi deh salan xwîn diherike. Ji dêv- la ku wiha be, tevayiyên welatî û siyasî yên pevrayiyeke azad, ji aliyê dîroka gelan , hebûnên wan ên aborî û çandî ve, derfetê dide jiyaneke herî bêhtir dewlemendker. Cudaxwazî; xizanîbûn, yek- rengbûn û tênêbûn e. Di vê de şîrovekirina bîrdoziyan a dogmatîk, bi taybetî neteweperestî, bandorker bû ye. Di sosyalîzma reel a ku weke berevajî vê tê dîtin de jî, çareseriya pirsgirêka netewî weke damezrandina dewleteke cuda, hatiye fêmkirin. Di derûna xwe de herduk jî, şêweyên neteweperestiya burjûva yên pêşveçûyî ne, ber- jewendiyên çîna serdest û mêtinker zexmtir dikin. Berjewendiyên gelan jî, şêweyên jiyana bi hev re yên ku wekheviya maf û azadiyê bingeh digirin ku bi cudaxwaziyê ve ne girêdayî ne. Rewişta enter- nasyonal a têkoşîna azadî jî, ji vê yekê tê.

Dema ku nêzîkbûnên him neteweperest û him jî sosyalîst a reel, bi vê şêweyê li pirsgirêka Kurd hatin sepandin, ji ber rewşa xwe xwe weke di xefkê de dîtiye. Bêşik, jiberku de serî de ji desteka ge- lên cîran û ya entemasyonal dûr mane, pêvajoyeke ku bi herdu ali- yan bide windakirin û bi salan bidomîne jênerev dibe. Heçku bi te- rîfkirineke rast a bûyera Kurd re, heger pêşnûmayeke çareseriyê ya ku li gor krîterên demokratîk bingeh were girtin, hemû bialî yên bi- hêz bibin û pirsgirêk ê bi pevrayiyeke payîdartir bi encam bibe. Gi- handina dewlet, siyaset û civakê ya sazûmaneke bi krîterên demok- ratîk ve girêdayî, li qasî ku yê şik, tirs, serhildan û hewldanên tepi- sandina sedsalan bêwate bike, yê derfetê bide jiyaneke biratî û

azadî ya birastî. Heger ku Kurd vê rolê weke stratejî û polîtîkayekê bidine ber xwe, yê rê li ber wan vebe ku, di Rojhilata Navîn de we- ke hêza motor a demokrasiyê werin nasîn, werin destekirin û bi hê- sanî werin pejirandin.

Di pêvajoya dîrokê de,dema ku dogmatîzm ketiye rewşeke xe- ter, rê li ber encamên herî wêranker vekiriye. Utopîktiya ku rûyê vê yê dahatûyê jî, dema ku girêdana xwe ya bi zanistiyê re qut dike, rê li ber heman encamên xeter vedike. Ciqas ku nêzîkbûnên zanistî di vî alî de, bûyerên di bingeha pirsgirêkan de terîf dike, rê li ber polîtîkayên rastî bînîtir û çalakiyan vedike û çareseriyên serkeftî gengaz dike. Rastîbîniyên hê zêdetir, mirovîbûna hê zê- detir e. Ev jî îfadeya xwe ya herî vekirî, di sazûmana şaristaniya demokratîk de dibîne.

**4-** Di nêzîkbûna bûyera Kurd de, mijara mirûz û etîk cîhekî gi- rîng digire. Nêzîkbûnên bi hesabên aborî û siyasî yên bi zêdekarî, hatine asteke wisa ku nirxên etîk û sinc li ber çavan ne girin. Pêş- veçûna zanist û teknîkê ya ji etîk û sinc zêdetir, eslê wê bîrûbawe- riya pêşveçûnên herî xeter dafirîne. Zanista ku xema sincî nekişîne, dema ku bi siyaset û aboriyê re hevgirtineke bêhêman bike, rê li ber şerê yekem û duyemîn yê cîhanê, gelek şerên herêman ên bêwate, bikaranîna bombeya atomê, teraza toqîn a nukleerê, xeterkirina der- dor ku lê neyê jiyandin, xeteriyên zêdebûna nifûsê ku her yek mi- rovatiyê ber bi tineyiyekê bibe, vedike. Hê kesek nizane bê yê li ku- derê were rawestandin. Bêşik, rewşên xeter ên ku sincê bi bingeha olî û mîtolojîk rê li ber wan vekirine jî, têne zanîn. Ev diyar e ku, sinc bi serê xwe hêzekê îfade nake, tenê weke helwesta gelemper a civakê rola xwe dilîze. Lêbelê dîsa valahiştina wî, kêmasiya serde- ma zanistê ya herî mezin e. Bi mîsogerî pêdivî bi etîkê zanistê he- ye. Pêşveçûna zanistê ya bê etîk, bingeha nexweşiyên hemdem e. Lawazbûna ol, ev pêvajo xetertir kiriye. Pêdiviye ku zanist bi pûte- pêdayineke mezin, sincê xwe heta weke desthilatiyeke mezin, rê- xistina sincê zanist ê ku di ser dewletan re jî derawayekê îfade di- ke bafirîne û bide xebitandin. Rastiya civaka şarwer, mikurhatina vê kêmasiyê ye û ne bi têrayî ye. Digel ku pêwîst e civaka şarwer hê bêhtir were pêşvebirin jî, pêkanîna sincê zanistî û gihandina wî ya desthilatiyeke ku hêza wê ya sepandinê hebe, pêdivî ye weke rê-

xistineke ji YN jî girîngtir bête nirxandin. Mirovatiya rastî û enternasyonalîzin, bi hêza rêxistinên bi vî rengî, dibe xwedî wate. Dew- let û hemû rêxistinên wê, bi rewşa berjewendiyên aborî û siyasî yên heyîn, jênereve ku mirovatiyê li kendal biqelibînin.

Ev rasteqîniya serdema me, sepandineke xwe ya herî xeter di pirsgirêka Kurd de nîşan dide. Heta ku hemû aliyên têkildar, berjewendiyên xwe yên aborî û siyasî, weke rojane ne di çareseriya dadwerane, di neçareseriyê de bibînin, yê rê li ber qirkirinên bi şêwe- ya Helebçe yên hovane vebikin.

Pêkutiya liser Kurdan, heta bi qedexekirina ziman diçe. Hemû hêzên navnetewî û herêmî, jiberku berjewendiyên wan pêwîst na- kin neteweyan jî li hember vê bêdeng dimînin. Ne biratiya ol, ne humanîzm û ne jî hiqûqê navnetewî, nayê xebitandin. Kurdan dixi- ne nava xefkekê, herkes mayina di nava berjewendiyên polîtîka re- el û aboriya li gora xwe de, rêya herî baqil dibînin. Pirsgirêka Kurd weke kaxezeke tûmûsolê, wijdanê serdemê nîşan dide. Di dîrokê de jî, rewşên bi vî rengî, sedemên trajêdiyên gelan ên rastî ne. Heger wiha berdewam bike, çavkaniyên trajêdiyên sedsala 21an jî, herî bêhtir ên Kurd bin. Ji Helebçe heta bi keştiyên ku li Derya Spî di bagerê de noq dibin û mirov ji wan dirijine deryayê, ev êşên bi rastî ku mînakên van ên pêşî derketine holê, şanîderên wijdanê rast ên serdemê ne. Divê ne tenê bi aborî, netewî û siyasî nêzîkî pirsgirê- kan bibin, bi teqezî veserkirina aliyê sincî, jibo bûyer û pirsgirêka Kurd bi awayek hîkarîker li ber çava ye. Ji vî alî ve, belkî bi ji na- vê rakirina vê kêmasiyê, Kurd roleke dîrokî bilîzin.

**5-** Di ronahiya van rexneyên di derbarê rêbazê de, demeke ku pêdiviye bi awayek rasteqînî, nêzîkayî li bûyer û pirsgirêka Kurd bête kirin tê. Hemû aliyên ku ji pirsgirêkê hîkariyê digirin û derdo- rên navnetewî, jibo ku Bosna, Kosova û Çeçenîstanên nû neyên afi- randin û neçareseriya ku heyî nexine şûna çareseriyê, pêwîst e nê- zîkbûnên xwe nûjen û tekûz bikin. Rastî û daxwazên Kurdan ên ku ji kûraya dîroka wan tên û nayên paşveavêtin, pêwîst e bingeh bê- ne girtin û çareserî bête pêşvebirin. Herçiqas ku demên kevin ne li gor berjewendiyên aborî û siyasî hatibe dîtin jî, di roja me de ev gu- heriye berevajî vê yekê, ango pêdivî ye bête dîtin ku berjewendiyên aborî û siyasî yên hemû derdoran,

êdî di çareseriyê re derbas dibe. Di destpêka sedsala 21an de, pêkanîna aştiyeke Kurd a bi rûmet, gi- rîngiyeke mezin werdigire. Paşveavêtineke dirêjtir û rêbazên rizan- dinê, yê tevaya herêmê ji levdana Ereb û îsrael û şerê Iraq û îranê xirabtir bike. Ji xwe rewşa agirbesta ku heyî, girêdayî terazên ne ewle ne û di bê biryariyeke ku her kêlî xira bibe de ye. Erdnîgarî, bi zêdebûna nifûsê û siftbûna qeyrana sosyo- ekonomîk re, jibo ser- hildan û şerên wergirî, hemû tiştî pêşkêş dike. Teqîneke nû yê bibe windakirina çaryek sedsalî din. Di encamê de dîsa yê werine heman xalê. Bê ewleyî, tirs û nêzîkbûnên dogmatîk ên bi zêdekarî, di pê- vajoya sedsalên 19 û 20an de, nêzîkbûneke hemdemî li derî dewrê hişt. Ev diyar e ku êdî sedsala 2Ian jî wiha neçe. Ji xwe derfet tine ku statuya heyî, bi serdemê bidine pejirandin. Yên ku vê yekê bice- ribînin, mîna rejima Iraqê ji cihêgirtinan rizgar nabin.

Ev yek girîngiyeke jiyanî hildigire ku, Tirkî weke qadeke çare- serker, ji nûsaziyên komarê ku ji nûve veava bibe, sûd wergire, ras- teqîniya Kurd ji danwindakirina hêzê derîne, jibo qezenckirina hê- zê ji nû ve birêkûpêk bike, vê weke fersendeke ku di warê polîtîka der û hûndir de, pêngavên mezin bavêje binirxîne. Ev yek dibe pey- wira wan a dîrokî ku, rewşenbîr û derdorên Kurd ên polîtîk, bi tay- betî astên PKKê yên berpirsiyar, nêzîkbûnên xwe yên kevin, yên ku taybetiyên dogmatîk qezenckirin û neyên sepandin derbasbikin, di krîterên komara demokratîk û laîk de, bi projeyên afirîner ên ku hi- qûqê gerdûnî jibo wan derbasdar bike, rojevê pêkbînin û li gor vê hêzên xwe jibo aşitiyê çalak bikin. Ne serhildan, ne mandele û ne tepisandin, berevajî vê hevûdin fêmkirin û di bingeha berjewendi- yên hevpar de, çûyina ber bi çareseriyê, yê bibe encameke bi wate û hemdem ya ku 1000 salan bi hev re hatiye jiyandin. Danîna ali- yekî ya pêşdaraziyên kevneperest, têgihîna hemwelatiya azad, aza- diya îfadeya hebûna çandî û vekirîhiştina coyên siyaseta demokra- tîk, ji xwe pêwîstiyên komara demokratîk û civakîbûnê ne. Bi keti-

na sedsala 21an re, qeyrana giran a ku Tirkî jiyayî, esasê wê ji vê pirsgirêkê derketiye holê, divê zanibe ku rizgariya wê di bicîhanî- na pêdiviyên komara demokratîk re derbasdibin. Çûyina wê ya ber bi çareseriya vê pirsgirêkê, pêdiviya welatparêziya rastî, yekîtî û bi- ratiyê ye. Bandora vê çareseriyê yê li tevaya Rojhilata Navîn, Bal- kanan, Kafkasya û Navenda Asya belav bibe, yê derfetê bide ku li hember YEyê jî bi tezên bihêz hereket bike, yê weke hêzeke sero- katiya sedsala 21an, bi balkêşî were şopandin û giramiyê bafirîne.

## C- Çarçovek ji bo Dîroka Kurd

### a- Serdema Neolîtîk û Kurd

Girêka dîroka Kurd, di civaka neolîtîkê de ye. Dahûrandina ci- vaka neolîtîk weke têgînekê û diyarkirina pêşenumûneyên Kurdan, yê di ronahîkirina dîrokê de rola kilît bilîze. Çavdêrekî bi bal, yê bi peytîne ku Kurd îro jî bi awayek sift, taybetiyên neolîtîkê dijîn.

Nirxandineke şûnwamasî, peyvnasî û nijadnasî ya beremberî hev, dide çespandin ku, civaka neolîtîk di dîrokê de yekem car, BZ ji 12 000 salan ve li pesarên der û hundirê çiyarêzên Toros û Zaxrosan, li derên ku deşt û çiya digihine hev û li nêzîkî derên avî ku kaş û girik, pêşveçûye. Sedema vê ya bingehîn ev e ku, dew- lemendiya çanda rîwek û ajalan ku jibo çandinî û kedîkirinê bi- kêrhatî û barîna ku weke avdaneke xwezayî ye. Mînakên dexlê yên beyanî û ajalên piçûk û navber ên kovî, li vê herêmê gelekî zêde ne. Jiberku ev herêm di pêvajoya demên qeşayî de, cîhê ku sê parzemîn lê digihine hev e, teşeyê mirovan ku ji rojhilatî Afrî- ka derketî, weke qada herî ewlekar ku lê belav bibe evder hilbi- jartiye. Xweyîbûna bikêrhatî, avhewa û ewlekarî di vê dê rola bingeh dilîze. Birhanên mezin hene ku hemû demên paleolîtîk û mazolîtîk hatine jiyandin. Amûrên dema mazolîtîk û wêneyên şi- keftan, mînakên dewsên gel ên zindî nîşan didin.

Tê fêmkirin ku civaka neolîtîk, piştî dema qeşayî ya dawî li hem- ber mehteşiyeke ku bi texmînî BZ di salên 11 OOOan de hatiye ji- yandin, li pesarên Toros-Zaxrosan derketiye holê.

Di kolanên gelek girên axî yên li Rihayê, li Batinanê ***Çemê Xa- lan,***

li Erxenê ***Çemê Kotê Ber,*** bennayiyên neolîtîk ku hatine dîtin, dîroka cîwarbûna vir dibine BZ salên 11 OOOan. Hemû dîrokzan di hemnêrînekê de ne ku şoreşa dîrokê ya herî mezin, derbasbûyina sazûmana niştecîhbûnê ye.

Birastî jî dema paleolîtîk ku bi sedhezar salan berdewamkirî, bi şûn xwe ve hindik dews hiştiye û bi komên wê yên gerok ku ji 20- 30 kesan dihatin holê, di pêkhatina dîrokê de ti rola zêde nalîze. Çand û kapasîteya wan pir lawaz e, ji taybetiyên ku dîrokê lezgîn bikin bêpar in. Derbasbûyina civaka niştecîh, ango şoreşa çandinî û ajalvanî, dema herî berhemdar e ku çerxên dîrokê bi lezgîn ki- rine. Bêşik ev rola wê, jiberku xebitandina yekaheng bi dawî ani- ye. Piştî vê dîrok, derketineke tund pêktîne. Di BZ salên 6000an de, çanda neolîtîk li vê herêmê bi awayek berfireh birêxistin dibe. Jiberku mînakên wê yên serkeftî li cîhwarê ***Tel (Til) Khalaf (Xe- lef)*** hatine dîtin, ev dem bi navê ***Çanda Tel Khalaf*** tê binavkirin. Ev çanda ku ji rojhilatî Derya Spî destpêdike û heta bi zaxrosan berdewam dike, herî bêhtir li Mezopotamya jorîn sift dibe, li qa- deke berfireh dirûvtiyê (şibandin) nîşan dide, heta BZ salên 4000an rola sereke dilîze û di tevaya cîhanê de xweseriyekê nîşan dide. Dîrok nîşan dide ku, di vê dema 2000 salan domandî de, tek- nolojî û zanîna ku hatî pêşxistin, encex PZ di sedsala 16an de li Ewropa mînakeke wê tê pêşxistin. Tê çavdêrîkirin ku pêngava mirovatiyê ya herî bihîm û hemû dahênanên ku şaristanî derandi- ne holê, ji aliyê çanda vê herêmê ve hatine afirandin. Ev dikare weke dema zêrîn a pêşî ya dîrokê bête nirxandin.

***Serdema neolîtîk,*** ji aliyê berdewamî û wergiriyê ve, dema herî bingehîn e ku heyîna bîrûbawerî û giyana mirovatiyê çêkiriye. Qa- libên ramanê yên pêşî, mezinbûyina giyanî, agahdarbûn, rêvebirin, hişmendiya civakbûnê û weke gihîştina têgîna xwedê, hêmanên bîrdoziyî yên bingehîn, di vê demê de pêşveçûneke mezin pêktî- nin. Di dîroka mirovatiyê de, seresaziya bîrdoziyî, taybetiyên xwe yên sereke ji mercên civaka neolîtîk girtine. Wateyeke vê weke za- roka ku nû bi piya bikeve û bi peyive heye. Ji aliyê din ve, raçan- dinî û lixwekirin, hêrtina ard a bi destar û çêkirina nên, bi xarûf û kûzikan çekirin û hilanîna xwarinê û weke bi birrîna keviran an jî bi kelpîçan çekirina xaniyan,

berhemên vê demê ne. Dîsa ji rîwe- kên ku îro tên bikaranîn û ajalên tên xweyîkirin gelek, vê demê ha- tine çandin û kedîkirin. Bivirên ji kevir necirandî û yê ji sifir, tev- rik, halet, tekelek û gangilî, dahênanên bingehîn ên demê ne. Ev dem ne tenê dema dergûştiya mirovatiyê ye, herwiha merhaleya zaroktî û destpêka xortaniya wê jî teşkîl dike. Hemû têgînên bin- gehîn ên ol û mîtolojiyê, çavkaniya xwe ji vê demê digirin. Yekem car pêşketina mirovan a li gor cîhana ajalan, ji aliyê mirovan ve weke rewşeke derasayî ya nûwaze hatiye dîtin. 01 û mîtolojî, we- ke vedana bîrûbaweriya gel a van pêşveçûnên şoreşgerî, nasname- yekê qezenc dikin. Çawa ku ravekirineke felsefî û zanistî, jibo za- rokan şêweyeke ramanê ya zûka be, jibo mirovatiya vê demê jî, encex ramana olî û mîtolojîk di rewşa pêşveçûnê de be. Civaka ne- olîtîk, di derûna xwe de zemîna ol û mîtolojiyê ya daringî ye. Di şêweyê civakên berî vê de, li nasnameyên bîrdoziyî yên bi vî rengî nayê rasthatin, belkî jî tenê derfetê dide gihîştina hinek têgînên pî- rozwer. Şoreşa çandiyarî û ajalvanî, rêya ol û mîtolojî heta bi dawî vedike û zemîna daringî pêktîne.

Em di tîpê vê civakê de, dîsa li rastî kakilê hoveberiya siyasetê tên. Civaka ku gihaye mezinbûneke li qasî çend qebîleyan, bi pirs- girêka rêvebiriyekê re rûbirû dimîne. Kesên qebîleyê yên ku bi ez- mûn ku bikaribin pêşveçûnê bidomînin, dikevine rewşa serokatiyê, di vê bingehê de, di şêweya şaman û sêhrebendiyê de ber bi dabeş- bûnekê ve diçin. Herwiha cudahiya serokatiyên polîtîk û menewî, di van mercan de destpêdike. Jiberku şoreşa çandiyarî û ajalvanî li do- ra jinê şêwe digire, demeke dirêj taybetiyên civaka daykanî serdest dibin. Kulta dayîka bihêz, berhema vê demê ye. Mêr gelekî nûhiyayî û nediyar e. Jina dayîk, gelekî diyarker û cureyîn e. Ev rewş ji aliyê menewî ve jî, bingeha çanda xwedawendê ye. ***Xwedawendîtî,*** di de- rûna xwe de îfadeya tevaya taybetiyên jina ku neolîtîk afirandiye. Dema ku hişmendiya şoreşa mirovatiyê ya mezin, li cîhane bîrûba- weriyê vedide, rê li ber şêweya mezinkirin û pêrozkirina ku jina

xwedawend navend digire, vedike. Afirînerî, terîfa rîwek, çandinî, kedîkirina ajalan, çêkirina xarûf û kûzikan, raçandin û çêkirina xaniyan, gihandina zarokan, tevrikirin û guhdarîkirina li darên fêkî, hemû bi pêşevaniya jinê tên pêkanîn. Xwedawenda bihêz, bingeha xwe ji vê civaka daykanî digire. Hemû peykerokên ku ji vê demê mane û jinê temsîl dikin, mînakên bingeh ên çespandinê ne. Derke- tina mêr a pêş, bi gelekî di pey re, dema ajotina zeviyan a bi halet û di civakên koçber de dema ku nêçîrvanî girîng bû, derdikeve holê. Kulta mêr, di BZ salên 4000an de derdikeve pêş û bi civaka biçîn a Sumer re, derbasî serdestiyeke mezin dibe. Di vê de pêşveçûna tek- nîkên hilberînê rola diyarker dilîzin. Bi taybetî jiberku halet û bivir bêhtir qeweteke bêteşe dixwestin û dûnnayina ji mal pêwîst dikirin, di warê hilberînê de, şêweya derketina pêş ya mêr ên bingehînin.

Çanda civaka neolîtîk a ku dexma xwe li dîrokê dayî, xweseriya xwe di vê herêmê de dibîne. Ji Derya Spî heta bi risteçiyayên zax- rosan, ji çolên Erebîstana Bakur heta bi torosên Anatolya, bi taybetî pesarên çiyayên ku Dîcle, Ferad û Zap ji wan derdikevin û deştên di navbera wan de, navendên sereke yên ku vê civakê lê şêwe girtî ne. Gotina di dîrokê de ya Heyva Berhemdar jî, ji ber van taybeti- yên wê ne. Mirovatî nêzîkî 10 000 salan, bi rola herêmê ya afirîner xweyî dibe. Bi wateyeke din, di van deman de Heyva Berhemdar, ji civaka mirovên cîhanê re serokatiyê dike. Hatiye çespandin ku di dîrokê de, sê belavbûnên mezin ên çandî, ji vê herêmê derketine. Tê fêmkirin ku vedîtinên neolîtîk ên pêşî, bi derengmayina 2000 salan, BZ di salên 7000an de, li navenda Ewropa, Asya û Bakurê Afrîka belavbûne. Amûrên neolîtîk ên ku li van dera derdikevine holê, bi awayek hîkarîker dişibine yên Heyva Berhemdar, herwiha ev yek jî vê rastiyê nîşan dide. Ev dibêtiyeke mezin e ku, belavbûn ji hêzên fizîkî zêdetir, bi şêweya belavbûna çandî pêkhatiye. Çanda Tel Khalaf (Til Xelef), nezîkî 1000- 2000 salan bi derengî, Ji Okyanûsa Atlas digihe Okyanûsa Mezin. Belavbûna sêyemîn a mezin li şaristaniya Sumer disekine. Şaristaniya Sumer jî, BZ di navbera salên 2000 û lOOOan de, digihe tevaya van herêman. Kolanên ku hatine kirin, wesfê çandê ku dişibe hev, vê rastiyê derdixe holê.

Belavbûna çandî, tenê ne bi teknîka hilberîna daringî bisînor e.

Rastiyeke din a hatiye çespandin ev e ku, çavkaniya bingehîn a koma zimanê Hîndo-Ewropî, joriya hewzeyê Dîcle-Ferad a ku cî- hê vê şoreşa mezin e. Bi berembergirtinên şunwarnasî, peyvnasî û nijadnasiyê tê çespandin ku, ev kevneşopiya dîrokê ya herî gi- rîng ku bi navê koma Aryen a ziman û çandê jî tê nasîn, bi tex- mînî BZ di salên 11 OOOan de dîsa li vê çavkaniya sereke şêwe gi- ritiye. Bi taybetî gelek peyvên ku ji wê demê mane û di roja îro- yîn de jî, di devok û zaraveyên Kurdî de têne bikaranîn, dide nî- şandan ku çavkanî di vê demê de û li vê herêmê pêkhatiye. Çand û zimanê Aryen, esasê wê berhema şoreşa çandinî û ajalvaniyê ye. Hemû qadên ku ev şoreş lê belavbûyî, zimanên ku ji vê binyatê tên dipeyivin. Ya tenê awerte, zimanên semîtîk ên ji çavkaniya ço- lê û zimanên Fîn-Ural-Moxol ên ku ji qadên qeşayê tên e. Yê ye- kem civaka çolê ya koçber û yê duyem jî, civaka li pesarên qeşa- yê û koçber bingeh digirin. Koma Aryen a di nîvî de, di derawa- ya çanda herî berfireh û afirîner de ye.

Weke demekê ku dihate angaştkirin, beşa ziman û çanda Hîn- do-Ewropî ne ji Ewropa û deştên Rûsya hatiye başûr, ango Rojhi- lata Navîn. Berevajî vê ev rastiyeke dîrokî ye ku, ev beşa ziman û çandê ji Heyva Berhemdar ber bi van herêman ve belavbûye. Ji- berku di navbera demên gelek dirêj de û li erdnîgariyeke berfireh belavbûye, pêwîst e were fêmkirin ku yê gelekî dabeş bibe û ve- guhere bi sedan devok û zaravayan. Lêbelê ev rastî nayê mande- lekirin ku, binyata wê mezopotamya jorîn, navbera çemê Dîcle û Ferad e û pêkanîna wê, diçe heta bi BZ salên 12 OOOan. Têgihîş- tina dîrokê, bi şêweya çêbûn û belavbûna wê ve ji nêzîk ve girê- dayî ye. Dema ku weke dayika hemû zanistan, xêzka çêbûn, pêş- veçûn û belavbûna dîrokê rast neyê diyarkirin, ev yek yê jênerev bibe ku, di hemû zanistên civakî de, çewtiyên rêbaz û naverokan ên girîng ê werine kirin.

Herwiha dahûrandina civaka neolîtîk, ne ji aliyê dîroka Kurdan bi tenê ve, ji aliyê dîroka tevaya mirovatiyê ve, girîng e. Belê ev rast e ku dîrok, ango dîroka nivîskî bi Sumer destpêdike. Lêbelê Sumer jî, her tiştên xwe ji civaka neolîtîk, ango ji hewzeya Dîcle û Ferad girtiye. Li qasî hemû teknîkên hilberînê, têgînên sereke yên rêxistinên seresazî jî, di vê civakê de şêwe girtine û derbasî Sumer bûne. Em xwedî

çespînên vê rastiyê ne jî. Ev bi tevayî bi belge ye ku, Sumerî gav bi gav ji mezopotamyaya jorîn ber bi Mezopotam- yaya jêrîn belvabûne. Heçku, dîrok ne bi nivîsê ve girêdayî ye, çav- kaniya wê ya bingeh weke navendên şoreşa neolîtîk, Dîcle, Ferad, Zap û gelek çem û robarên tevlî wan dibin û deşt, gelî û çiyayên ku ev diherikinê yên jibo çandinî û nêçîrê bikêrhatî ne. Sêhra van çi- yan, deşt û geliyan, jiberku dergûşa afirandina dîrokê ne.

Navê herêmê û ya gelê wê yê pêşî, ji aliyê sumeriyan ve hati- ye danîn. Ya rastir, ji çavkaniyên nivîskî em dikarin van bi hêsanî derînin. Yên ku civaka neolîtîk afirandine, ne çandek an jî kome- ke fîzîkî ku ji der hatibe ye, çanda ku ji demê kevin ve li herêmê niştecîh û weke afirîner jî, komên cîgeyî ne. Xwedî taybetiyên otantîk in. Hemû qeydên dîrokî nîşan didin ku, BZ ji salên 20 OOOan ji paleolîtîka raser, heta bi BZ navbera salên 15 000 û 11 OOOan hemû dema mezolotîkê û dema piştî wê BZ navabera sa- lên 11 000 û 3000an ji civaka neolîtîkê heta bi sumeriyan, li vê herêmê çandeke niştecîh û qebîleyên ku timî pêşvediçin hene. Ji xwe ji sumeriyan û heta bi dema me, em êdî di dîroka nivîskî de hemû pêşveçûnên din dibînin. Rastiya derketiye holê ev e ku, he- mû kalik û dayikên Kurd, di hemû demên vê dîrokê de, afirîne- rên herêmê yên ziman û çandê ne. Ev gengaz e ku hemû kom û civakên li herêmê dijiyan ên heta ku digihe sumeriyan, weke Proto-Kurd werine binavkirin.

Bi hemû belgeyên dîrokî tê çespandin ku, hemû niştecîhên vê herêmê, li hember hêrîşên bê eman jî, derketine çiyayên asê û nava daristanan, herwiha xwe ji tinebûnê parastine. împeretorên Asûr, ên ku di derkirina gelan a ji cîh û warê wan de, rola di asta herî bilind de dileyîzin jî, di nivîsên ku liser latan nivîsîn de û di gelek keva- lan (tablet) de, anîne zimên ku, gelek sefer û hêrîş li herêmê kirine lê serfiraz nebûne. Ev mijar jibo hemû dagirkeran wiha ye û bi bel- ge ye. Ev yek diyar e ku, di demên beriya dîrokê de, nifûsa komên ku zorê bikartînin gelekî hindik e, bi awayek sift derbasî niştecîhi- ya sabît dibin, ne li derve belav dibin û ne jî komên ku wan ji cîhê wan derînin, nagirine nava xwe. Jiberku herêm derfetê dide pêşve- çûn û afirandinê, jibo gelê wê, niştecîhbûn û domandina şoreşa dî- rokî ya mezin, gelekî bikêrhatî

ye. Ev yek wisa vekiriye, çandeke ku di rewşa şoreşê de be û timî pêşvebiçe, civakên wê jî yê di vê bingehê de hêzê qezenc bikin û li qasî ku neyên qeliqandin ê rahên xwe berdine erdê. Êdî hemû qeydên şûnwamasîvê domdariyê esehî dikin. Cudahiya zaravayan a di hemû beşên zimanan de, derbasdar e. Dema ku ev bi zaravayên Kurdî re werin beremberkirin, cudahi- ya wan hê kûrtir e. Digel hemû dagirkirinan jî, ji demeke hevqasî dirêj ve ku nêzîkayiyên zaravayan berdewam dike, ev ji aliyê Kur- dan û Kurdî ve, serfiraziyeke girîng e.

Nêzîkbûnên zaravayên gelek zimanên ku bûne zimanê fennî yên dewletan jî, li qasî zaravayên Kurd nabin. Dîsa kartêkera ku vê diyar dike, ji hêza çand û zimanê şoreşa neolîtîk a domdirêj tê û vê yekê esehî dike. Ev rewş tê wateya ku, Proto-Kurdan û Kur- dan cîhên xwe zêde ne guhertine, niştecîh mane û herwiha paqi- jiya çand û zimanê xwe parastine. Gotina dîlokeke beriya çar he- zar sal ku bi naverok û awaza wê demê, hêza vî zimanî û vê çan- dê nîşan dide. ***Destana Gilgamêş*** û dîloka keçka nediyar a bi na- vê ***Giro*** vê yekê esehî dikin. Dîroka van şêweyên wêjeyî, bi hin- dikayî diçe BZ salên 2000an û dişibine destanên Kurdî yên ku hatine heta îro. Dîsa ev yek diyar e ku, çavkaniya ***înanna*** Sumer û heman xwedawenda ku bi Akadî ***iştar,*** îro jî di çanda Kurd de tê wateya xwedê, vê dawiyê di wateya “herî bilind, herî mezin” de, ji peyva star, stêrk hatiye çêkirin. Di çanda Surner de, ev çan- da xwedawendê bi navê ***Nînhûrsag*** ku weke “xwedawendê herê- ma çiyayî” jî tê bi navkirin, têkiliya xwe bi vê kevneşopiya stêr- kê re heye. Ji aliyê din ve, hemû lêkolîn nîşan didin ku, di dema neolîtîkê de xweda û xwedawend, bi stêrkan têne dawerkirin. Stêrka di Kurdî de, him tê wateya stêrê û him jî ji aliyê çandî ve di wateya herî mezin de, dibe xweda an jî xwedawend bi xwe. Dema ku xweda derandine holê, dawerkirina wan a bi stêrkan, ji çavkaniya çanda Kurd tê û piştre bingeha hemû olên ezmanî, pêktîne.

Em dikarin bibêjin ku, ti gelan li qasî Kurdan serdema neolîtîk ne afirandiye û bi kûrayî ne jiyaye. Ev resenetî, ji aliyê dem û wer- giriyê ve, herî sift di bûyera Kurd de hatiye jiyandin. Bandora vê resenîtiyê heta bi îro jî berdewam dike. Kurdan hemû hêz û ener- jiya xwe ji vê serdemê girtine û dane vê serdemê. Bîrûbaweriya Kurdan a ku îro li paş

maye, ji ber sedema mayin û rawestina wan a liserdema neolîtîkê, hiştina wan li wir a bi dilê wan e. Bandora neolîtîkê, hê jî li cîhanê li qasî ku piçûk neyê girtin, berdewam di- ke. Gundîtî, weke jiyana daringî û bîrûbawerî, civakeke ku ji neo- lîtîkê mayî ye. Çanda çandiyariyê, taybetiyên xwe yên sereke di vê serdemê de qezenc kirine.

Herçiqas ku dîrokeke nivîskî ya neolîtîkê ne be jî, ev yek nayê wateya ku gelên ew jiyane bê dîrok in, encex ev tê wateya ku dîro- keke wan siyasî ya nivîskî tine ye. Ji aliyê din ve, ev mîsogere ku çandeke wan a dewlemend, mîtolojî û dîrokeke wan a etnîk heye. Dîrok tenê ne bi naveroka siyasî û nivîskî ye. Dîroka rast û bi wate, dîroka ku bi kûrayî bandor li civaka mirovatiyê kirî û hemû hêma- nên çandê yên daringî û menewî digire nava xwe ye. Dema ku ji vî alî ve lê bête nêrîn, Kurd gelê serdema neolîtîk ê herî li pêşe, xwed- yê çanda ku zanîna afirîner û teknîkê pêşvedibe ye. Bandora wî ya ku evqasî bi kûrayî li çanda Mezopotamya kirî, ji vê hêza wî tê. Ji DYE û YE wergirîtir û domdirêjtir, di pêşveçûna mirovatiyê de ro- la xwe leyîstiye, tevkariya xwe kiriye û di derawaya gelê ku çanda serdemekê afirandî û li cîhanê belavkirî de ye. Kêmasiya wî ya bi te- nê eve ku li dîrokê ne nivîsiye. Ji aliyê din ve dîroka keda gelan bi hêjayî ne hatiye nivîsandin, ji aliyê serdest mêtinkeran ve tine hati- ne hesibandin û çelexwarî hatine nîşandan. Ti zanist mîna dîrokê ji aliyê serdest û mêtinkeran ve, bi awayek şewşandî ne hatiye nivî- sandin. Bi hîkariya rêbaza zanistê, em hêdî hêdî dikevine demeke wisa ku êdî, dîroka kedê û ya gelan ronahî dibe û tê nivîsandin. Ji vî alî ve, bi sepandina rêbaza zanistê, xweseriya Kurd ê bi naverokeke herî rast bête ronahîkirin û yê were cîhê xwe yê hêja.

Çavdêrekî bi bal, li hewzeya Dîcle û Ferad, bi taybetî li Riha Mêrdîn, Amedê û derdorên cîran dikare bi sedan tilên (gir) ji axê bi hijmêre. Ev hemû tilên axî, bi hindikayî dîrokeke 15 000 sal di bin xwe de vedişêrin û xizîneyên bi rastî ne. Ev cîwarbûnên neolîtîkê yên herî pêşîne û qadên şûnwamasiyê yên ku di pêvajoya dîrokê de, gelek çand bi ser hev de hatine. Dîroka rast, dema ku ev til vebin û bêtin dahûrandin ê were nivîsandin. Mixabin weke qirkirineke çan- dê, ev til bi polîtîkaya bendavan, di bin avê de têne windakirin. Ke- da mirovan a bi hezar salan, jibo berjewendiyên daringî yên dem- kurt, têne wêrankirin. Ev yek li

hember dîroka rast heqeret, mande- le û şewşandina ku, ev dîrok û çanda ji mirovatiyê re dergûştî kirî tê mandelekirin, dîrok bi îslamtî, xiristiyantî, cihûtî, bi xanedanti- yên serdest û di roja me de jî bi organîzasyonên neteweperest tê destpêkirin. Dîroka kedê û ya gelan, encex dema ku ev têgihîna dî- rokê were hilweşandin û derbaskirin, yê bête nivîsandin.

**b- Serdema Koledar û Kurd**

Di vê dema ku dîroka nivîskî destpêdike de, di belgeyên Sumer ên nivîskî de bi awayek zexm tê vegotin ku, do dîrokê de civakên bi es- lê xwe Kurd, roleke sereke lîstine. Dema ku bi hişmendiyeke dîrokê ev belge bêtin dahûrandin, yê were fêmkirin ku kesên sumeriyan herî bêhtir binavkirine, cîranên wan Kurd in. sumeriyan herî bêhtir ew bi navê Horrît, Gûtî û kassîtan binavkirine. Dema ku di warê peyvnasi- yê de were dahûrandin, diyar e ku ji kalikên kurdên îro tê behskirin. Horrît, tê wateya “yên bi welatê bilind”, “çiyayî”, Gûtî (Ji peyva Ga tê) tê wateya “Civaka xwedî ga”, Kassît jî, beşa xizanên van koman e ku li bajarên sumeriyan niştecîh bûne û debara xwe bi karkeriya er- zan, bi kannendî û pîşekariyê dikin. Ji dîroka Sumer tê zanîn ku, Su- merî bi van koman re çikasî di nava hev de ne. Bi taybetî li hember Akad û babîliyên ji koka Semîtîk, bi van koman re yekîtî pêkanîne. Bi hev re xanedaniya Sargonê Akadî hilweşandine, Xanedanên Gûtî û Kassîtan, demên dirêj bajarên Sumer rêvebirine.

Dema ku li binyata ziman û çanda Sumer bête nêrîn, Yê bi hê- sanî were dîtin ku, hemû annatûrên xwe yên teknîk, ji horrîtên li hewzeya Dîcle, Firad û Zapê ku neolîtîk afirandine, wergirtine. Za- nîn û têgînên mîtolojîk ên bingehîn jî ji vê çandê standine. Gelek pêrkit (pêşqertaf) û hemanên mê yên di zimanê Sumer de, dîsa ji vê çandê tên. Gelek destan û helbestên Sumer, ji aliyê naverok û şê- weya xwe ve, îro jî di çanda gelek eşîran de derbas dibin. ***Destana Derwêşê Evdî,*** çavkaniya xwe di kevalên Sumer ên ku BZ 2000 sa- lan de hatine nivîsandin de dibîne. Heman destan li herêma Sinca- rê, ji aliyê keçikeke ne diyar ve, bi navê Giro tê bilêvkirin. Helbes- ta Giro ku BZ di salên 2000an de hatî nivîsandin û destana Derwê- şê Evdî ya îro, ji aliyê gotin û şêweya xwe

ve dirûveke hîkarîker nî- şan didin. Li gelek belgeyên bi vî rengî tê rasthatin.

Girêdana înanna-îştar kulta xwedawendê ya bi stêrkê re, hate terîfkirin. Destana Gilgamêş û Tofana Nuh, taybetiyên bi vî rengî hildigirin. Eslê wê dema ku hê bi kûrahîtir lê bête nêrîn, weke ku ji rewşa Iraqê ya îro jî tê fêmkirin, dîroka Sumer ji hevgirtin û levda- nên horrîtên Aryen û amorîtên Semîtîk (Tê wateya yên ji Rojava hatine) derdikeve holê. Her çiqas ku civakên Sumer ên pêşî zima- nekî cuda, yê li gor xwe pêşvebiribin jî, çavkaniyên vî zimanî yên herî mezin, bi peyvên ji koka Aryen û Semîtîk tije ne. Ji xwe jiho- lêrabûna wê ya vê dawiyê, ji ber sedema şaristaniyên Horrît û Amo- rît ên ku li dora wê bilind bûne. Ya rastir, ev herdu komên çandê ku Sumer hebûna bi xwe deyndarê waye, dikevine pêvajoya şaristani- ya civaka biçîn ve girêdayî û herwiha ji wan qut dibe, vediguhere xanedaniyên serdest ên van koman û hebûna xwe berdewam dike. Tine nabin û di bin xanedaniyên ciwan de bi çandeke cuda, hebûna xwe didomînin.

Ev terîfkirina kin jî dide nîşandan ku dîroka Sumer, bi horrîtên cîranê wan re, yên ku girêdana wan bi kurdan re bi awayek zexm hatiye çespandin, di nava hev de ye. Dîrokeke hevpar dabaşa xeber- danê ye. Herwiha çavkaniyeke dîroka Kurd, bi dîroka Sumer a ku dîroka nivîskî daye destpêkirin re, di vê bingehê de, di nava hev de ye. Di vê dîrokê de, di derbarê çiyê de û hêmanên çandê yên ku ji çiyê tên, têkilî û levdanên berbiçav, bandorgirtin û bandorkirin, di heman demê de dîroka gelê Kurd e.

Pêşveçûnên bi dîroka Sumer ve girêdayî, BZ di salên 2000an de hê bêhtir mezin dibin. Dema sumeriyan a derketina derve û avaki- rina mêtingehên nû, di van mêjûyan de lezgîntir dibe. Çavkaniyên kan (rnaden) û daristanan ên dewlemend, pêdiviya pêkanîna mêtin- gehan û çêkirina seferan a li van deran, derdixe holê. Mêtingehên Sumer ên herî girîng, li peravên Dîcle û Ferad, liser rêyên bazirga- niyê, li qadên ku kan û kerestê lê pir, têne avakirin. Di serî de, ***Ri- ha, Heran, Kargamiş, Samsat, Kanîş, Ûrkîş*** û weke ***Nûzî,*** hemû bajarên mêtingeh ku hatine avakirin, çiqas ku diçe vekirina herêmê ya ji şaristaniyê re jî, bi xwe re tînin. Bajarbûn, demeke nû dide destpêkirin. Bi çînçînîbûna di sînga

civaka çandiyar re, bajarbûn û dewletbûn jî bi hev re dimeşin. Belavbûna piştî şaristaniya li Me- zopotamya jêrîn, ya li hemû Mezopotamya dibe karê pêşdatir. Piştî salên BZ 2000an, dema şaristaniyên cîgeyî destpêdike. Bajarên mê- tingeh bi xwe têne rewşa dewlet-bajaran. Hûrrîyên ku di dîrokê de piştî sumeriyan têne naskirin, di nimûnaka Sumer de şaristaniyê navxweyî dikin. Digel konfederasyonên eşîran ên berfireh, hêdî hêdî derbasî rêxistinên dewletê yên navendî ku bi navenda bajaran ve girêdayî dibin. Nûzî û Ûrkîş, navendên herî pêşî ne. Dîsa Riha weke navendeke girîng, derdikeve qada dîrokê. Ûrkîş bajarê Amû- dê yê îro ku di navbera Tirkiye û Suriyeyê de dimîne ye. Paytextên hûrriyan ên pêşî jî ev bajar in. Ji belgeyên cîranên wan Sumer û hî- tîtiyan tê fêmkirin ku, BZ di navbera salên 2000 û 1500an de, keti- ne rewşa hêzeke siyasî ya girîng.

Hêrîşên ku ji aliyê Sumer, Babîl û hîtîtiyan ve li wan hatine ki- rin, li hember berxwedanên mezin rasthatine û bi paş ve hatine pe- kandin. Heger ku hêza siyasî û leşkerî nebe, ev kiryar nayên pêka- nîn. Di van demên dawî de, gelek belgeyên ku bi hûrrî jî hatine ni- vîsandin, derketine holê. Belgeyên ku li Nûzî, Ûrkîş û bajarên Hî- tît hatine dîtin, di derbarê hurriyan de agahiyên girîng didin.

Tê çavdêrîkirin ku, Hûrrî berdewama civakên ku BZ di salên 6000an de neolîtîk birêxistin kirine û çanda Tel Khalaf şêwandin e. Me dabû nîşandan ku cara yekem BZ di salên 3000an de, Hûrrî ji aliyê sumeriyan ve bi navê Horrît hatine bi navkirin. Vê dawiyê ko- mên ku bi navên Gûtî, Sobarî û Kassît tene binavkirin, bi texmînî di bine komên ku di dem û cîhên cuda de heman ziman û çand bi- karanîne, herwiha çiqas ku diçe ev yek tê çespandin. îro jî gelek ye- kîtiyên eşîran ku bi navên cuda tên binavkirin, nayê wateya ku ne ji heman gelî ne. Bi sedan navan bidine van jî, ev yek rewişta wan a hevpar naguherîne,

Binyata zimanê Hûrrî aryenî ye. Tê çespandin ku gelek peyv ji vê binyatê ketine nav sumerî. Bi taybetî navên dexlê û yên ajalan, ji hûrriyan derbasî sumeriyan bûne. Bi vê yekê re, navên deva ya ku keştiya çolê, ji binyata semîtîk in. Gelek teknîkên çandinî û na- vên wan, ji hûrriyan gihîştine sumeriyan. Bi hêsanî mirov dikare bi- bêje ku, ji aliyê bîrdoziyî ve jî hûrriyan bandor li sumeriyan kiriye û têgînên

mîtolojîk ên pêşî jî ji wan çûne nav sumeriyan. Mîtolojî û têgihîna ol a bi ezmên ve girêdayî, çavkaniya xwe ji çanda Hûrrî digire, lêbelê jiberku bi civakî hê çînçînîbûnê nas nakin, îfadeyeke azad û wekhevî nîşan didin. Taybetiya dayîka xwedawend serdest e. Rahîbên Sumer li bajarên bi navê "Ur", ev alavên daringî û me- newî kirine yek û sentezkirine û kirine bingeha civaka biçîn. Mirov dikare bibêje ku perestgehên "Ur" ên rahîbên Sumer, peywira mal- zaroka sereke ya çêbûna dewlet û civaka biçîn a pêşî ye. Perestgeh, destegehên (hnalatxane) rastî yên ku dewlet di wan de hatine afi- randin in. Ji ber vê yekê ti caran dewlet bi temamî laîk nabin. Lew- ra di haveynê wan de, di genên wan de ol heye. Hûn ol derînin û deynine cîhekî, bi navê dewletê tiştek namîne. Jixwe dema ku em behsa ol bikin, pêwîst e em hemû utopyayên dogmatîk û îdealîst jî li ber çavan bigirin. Bidewletbûnê, Sumer serdestiyeke mezin bi dest dixe û dema mêtingehbûna herêma Hûrrî destpêdike.

Herwiha mêtingehkariya di wateya mijokatiya klasîk de, dibe xwedî dîrokeke bilanet, ku ji BZ 2000an heta bi dema me tê. Pê- kutî, biyanîbûn û mojokatî, di van mêtingehan de di nava hev de tê- ne jiyandin. Di dema xanedaniyên Babîl ên ji koka amorîtan ku piştî sumeriyan têne ser kar, li welatên hûrriyan, bi taybetî li dora Rihayê, mêtingehkirin gelekî zêdetir dibe. Li hember vê, dijberiye- ke di bin navê pêxemberan de pêşvediçe. Ev dişibe têkoşîna rew-

şenbîrên dema me, ku li hember emperyalîzmê û hevkarên wan dikin. Riha bi vî aliyê xwe, di dîrokê de yekem car, bi taybetî di kevneşopiya ku bi ***Hz Brahîm*** bi dawerbûyî re, li hember mêtingehka- riyê roleke navendî dilîze. Navê nûnerê mêtingelikariyê yê vê de- mê ***Nemrûd*** e. Têkoşîna Hz Brahîm a li hember Nemrûd, di derû- na xwe de, tê wateya têkoşîna azadî û berxwedana komên gelên cî- geyî ya li hember nûnerên Babîl û Sumer.

Van têkoşînan, qebîleyên Hûrrî û Amorît ên ji koka Aryen û Semîtîk ku hê şareza nebûne, cama bi hev re û cama jî bi serê xwe di- din. Di kevneşopiya Brahîm de, bandora çanda herdu koman, di na- va hev de tê dîtin. Di vê dema dîrokê de, heta bi BZ salên 2000- 1250an, jiberku derdora Rihayê ji Sumer û Babîl û ji Misrê û Hîtî- tê weke hev dûr e, jibo têkoşîna azadiyê, dorhêleke bikêrhatî pêktî- ne. Eslê wê pêxembertî dibe vedana bîrdoziyî ya di bingeha berx- wedana derawaya erdnîgarî û aboriya bikêrhatî de. Tevgera ku pû- tê pêşî têne şikandin, tê wateya derbeya pêşî ya ku li olê koletiyê tê xistin û rola wê gelekî mezin e. Binavûdengbûna Brahîm, ji vê tev- gera wî ya pêşî tê. Êdî dîrok vê kevneşopiyê dişopîne û heta bi Hz Muhemed, weke zincîreke pêxemberan dibe xwedî xêzkeke cuda. Riha yekem navenda pîroz a vê dîrokê ye. Pişt re ye Quds û Mek- ke vê rolê bilîzin.

Ji binyata wan a mîtolojîk jî tê çavdêrîkirin ku, Sumerî piştî se- resazî û binesaziya civaka biçîn zexm dikin, di vî babetî de bandor- ker û serdest dibin. Gel û çanda ku yekem car mîtolojiya Sumer cî- geyî kirine, Hûrrî ne. Xwedayên Sumer, ***weke xwedayê ezmên En, xwedayê erdê Enkî û xwedawend înanna,*** ji aliyê hûrriyan ve, ve- guherîne ***Anû, Kumarbî, Teşûp*** û ***Hepat.*** Ev nav hîtîtiyan weke xwe ji hûrriyan wergirtine. Ev li nav grekiyan veguherîne ***Zeûs, Apollon*** û ***Afrodît,*** romayiyan jî li gor mercên xwe wergerandine ***Jûpîter*** û ***Venus.*** Bi kurtayî, dîrok weke xelekên zincîrekê, di warê mîtolojiyê de jî vediguhere û didomîne.

Ji aliyê çanda Sumer ve, Hûrrî xeleka yekem in ku jibo Anatol- ya, Kafkasya û di ser bakurêrojavayê Iranê re, ji Asyayê re, vebû- nek pêkaniye. Hûrrîyan li qasî ku çanda neolîtîkê bi hezar salan be- lavkirine, çanda Sumer jî li gor mercên xwe xûnifandine û bûne na- vendeke bihêz

ku li derî xwe belavbikin. Vê dawiyê, BZ di salên 1700an de kevneşopiya Brahîm jî veserî vê taybetiya xwe dike, BZ di salên 1500an de li Rojhilat baweriya ***Mazda*** pêşvedibe, pişt re weke Hz Brahîm, ***Zerdeşt*** jî di vê baweriya Mazda de nûsaziyan di- ke û ekoleke pêxemberiyê ya din bi bingeh dike. Taybetiyên neolî- tîkê yên di bingeha çanda herêmê de, zemîna daringî ya nûsazîpa- rêziya van pêxemberan teşkîl dike. Ji aliyê din ve, li hember xwe- dayên Sumer û Babîl ên zalim ku ciza dikin, xweda û xwedawen- dên neolîtîkê yên dost û alîkar jî, bandorê liser xwedayiya nû dikin. Kevneşopî yan jî ola Brahîm û Zerdeşt, li hember sazûmanên xwe- dayên Sumer û Babîl ên kolekirinê, bi têgihîna xwedayê sazûmana neolîtîkê re, ji ceribandina nûsaziyekê derdikeve holê. Jiberku herî bêhtir, xwedî taybetmendiyên li aliyê mirovan, li cem çandên cî- geyî û kedê ne, mîhrîban û dilovan in û bexşandina wan, nîşanên kulta xwedawenda ku pê ve girêdayîne hildigire. Kulta xwedawen- dê, di merhaleya Sumer de, di navbera salên BZ 4000 û 2000an de, piştî ku di merhaleyeke pozberiya înanna û Enkî re derbas dibe, bi mîtolojiya Babîl re, piştî sala BZ 2000an derbeyeke mirinê dixwe û heta weke roja îroyîn jî, nayê ser xwe. Ev yek esasê wê ji tengki- rina rola jinê ya nava civakê û veguharindina wê ya rêxistineke ko- letiyê ya herî kûr tê.

Weke mijareke dawî, di derbarê hûrriyan de ku kalikên kurdan ne, gelek berjeng hene. Di serî de, şibandina di hhnê zimên de tê. Gelek peyvên ku ji heman hîmî hatine çêkirin, têne bikaranîn. Bel- geyên şûnwamasî ku hiştine, dide nîşandan ku herdu çandan, ji sa- lên BZ

11 OOOan ve, domdar bûne. Ti qeydên ku bi pêlên fizîkî yên ku ji derve hatibin û tine kiribin, tine ne. Berevajî vê, ev yek ji aliyê hemû pisporan ve hatiye pejirandin ku, bi cîranên xwe re an lihev- xistine an jî lihevkirine û xwe heta bi dema me gihandine. Weke her civakê, di hemû merhaleyên veguherînê yên dîrokê de, jiyandina wan a guherînan mijareke dibêtiye. Ev nayê wateya ku tine bûne an jî bi temamî hatine guhertin. Cudahiya zaravayan an jî navlêkiri- nan, jibo hemû komên çandan derbasdar e. Ji vî alî ve, belkî jî, ko- ma Hûrrî ya herî paqij mayî ye. Hûrriyan bi şêweyek sift, di rewşa eşîran de hebûna xwe berdewam dikirin. Dagirkeriya ku ji derve di- hat û taybetiyên civaka neolîtîk, di vê

de bandora xwe kiriye. Ev mijareke tê zanîne ku bi konfederasyona gelek eşîran, weke nîv- dewletan jî jiyane. Ji bajarên Urkîş, Nûzî, Riha û Samsat tê fêmki- rin ku, piştî demekî di mêtingehên Sumer de, dibine xwedî dewlet- bajarên navendî. Lêbelê ev jî mijareke tê çavdêrîkirine ku, di asta Misir, Sumer û Hîtît de, nebûne hêzeke hnperetoriya navendî.

Digel ku li hember serdestiya Hîtît zor li wan hatiye jî, lêbelê ge- lek caran pevrayiyeke wan a lihevkirinê jî çêbûye. Bi vê yekîtiyê di sala BZ 1595 de, Babîl berdest kirine. BZ di salên

1500an de, li dewsa hûrriyan komeke xizimi wan Mîtannî derdi- kevine holê.

Mîtannî, di salên BZ 1600an de ku dema Babîl a herî rewneq- dar û ji aliyê yekîtiya Hîtît-Hûrrî ve têne hilweşandin, ji wê vala- hiyê sûd digirin û derdikevine qada dîrokê. Paytexta wan li dera kû Xabûr jê der tê bi navê ***Xweşkanî*** (kaniya şîrîn, xweşik) ye. Tê texmînkirin ku li cîhê Serkaniya niha ye. Zimanekî nêzîkî yê Hûr- riyan bikaranîne û girêdayî beşa Arî ne, ev yek ji belgeyên pey- manên ku bi hîtîtiyan re çekirine û ji nameyên ku ji firewnên Mis- rê re şandine, tên fêmkirin. Di peymanên ku bi hîtîtîyan re çekir- in de, bi navê xwedayên Varûna, îndra, Mîtra û Nasatya sond xwarine û şanenav kirine, ev yek dibe berjenga ku ol û mîtoloji- yeke di beşa Hîndo-Ewropî de, pejirandine. Wisa tê fêmkirin ku, ***Hûrrî, Hîtît, Mîtannî*** û ***Lûwiyên*** li başûrêrojava yê Anatolya, xwedî zimanekî dişibe hev in û heman çandê dijîn. Cudahî bi kûr- bûna cîgeyiyê re, pêşvediçe. Di bingeha wan de, çanda neolîtîkê ya ku di bin navê Aryen de hatiyê têgînkirin, cîh digire. Komên gel ên ku li qadên cuda, dema li pêrgî van têgînên ziman û çandê tên, ji alîkî ve hevşibîn û ji aliyê din ve cudabûn, di nava hev de pêşvediçe. Têkiliyên mîtanniyan ên bi Qerantiya Misrê re, di asta dewletan de ye. Diyariyan didin û distînin. Bi hîtîtîyan re jî, têki- liyên bi vî rengî dabaşa xeberdanê ne.

Piştî hilweşîna Babîl, di rêveberiyê de rola burokrasiya kassîtên ji binyata hûrriyan zêde dibe. Rêveberiyeke bi şêweya Babîl- Kas- sît a hevpar derbasdar dibe. Li bakurê Babîl, BZ di salên 2000an de, xanedanên koma Asûrên ji binyata Amorît ku pêşî bi bazirganiyê bilind bûne, Ji BZ salên 1300an û pêde, derbasî serdestiyeke bihêz dibin. Jiberku bi Mîtanniyan re di nava hev de ne, demeke lihevda- nê di

navbera wan re destpêdike. Asûrî naxwazin ku berberan li hember xwe nasbikin. Ya girîngtir ev bû ku, rêyên kan û daristanên ji wan re girîng, di destê mîtanniyan de bûn û ew serdestî wan bûn. Mîtanniyan ji zaxrosan heta bi amanosan, li vê herêmê venêrana xwe saz kiribûn. BZ di salên 1500an de, weke teknîkeke şer, hesp derdikevine qada dîrokê û Mîtannî di warê hespvaniyê de pispor in. Tê femkirin ku hêza xwe, ji vê teknolojiya ku dîrok guherandiye di- girin. Piştî şerên dirêj ên bi hîtîtiyan û asûriyan re û ji ber federas- yonên eşîran ên sist ku timî bi xiyanetan parçe dibûn û bend digu- hertin, BZ di salên 1250an de jevdikevin. Di herêmê de hêza asûri- yan pêşdikeve. Hîtîtî jî, BZ di salên 1200an de, piştî ku ***Troya*** bi- navûdeng dikeve destê ***Helenan,*** bi hêrîşên komên ku weke qew- mên deryayê tên binavkirin, têkdiçin û belavdibin. Li rojavayê Anatolya, dema ***Frîgiyan*** destpêdike. Li başûr Lûwî komeke gel a bihêz e. Lêbelê piştî ku Helen hesin nasdikin, pêşî li herêma Ege û dûv re li tevaya Derya Reş, Derya Spî û heta bi Kapadokya, çand û desthilatiya xwe belav dikin. Ev pêvajo ji BZ salên lOOOan destpê- dike û heta PZ sedsala 20an ku ji aliyê tirkan ve dirijine deryayê, nêzîkî 3000 salan berdewam dike.

Helen jî weke demekê ku sumeriyan jî dikir, hemû Rojhilata Derya Spî û tevaya Anatolya bi sîstemeke navlêkirinê ya nû, bitê- gîn dikin. Ev çand, bennayiyên frîgiyan, lîdyayiyan, hitît û lûwiyan di sînga xwe de, dihelîne. Eslê wê helenan, derûna çanda xwe him ji neolîtîk û him jî ji çanda çîna koledar a çavkaniya hîtît û hûrriy- an, li rojhilat û başûrê Derya Spî jî, ji Misir û fenîkiyan girtine. Zê- detir ji afirandineke xweser, bi giranî sentezvan in. Di wê demê de cîranên wan ên herî li Rojhilat, ***Ermenên*** bi navê ***Hayas*** û ***Kurdên*** bi navê ***Komagene*** bûn. Navê Mezopotamya jî di vê demê de dane herêmê. Komagene Pirîn, Meletî, Elezîz, Gurgum, Dîlûk û Riha ya îro digirte nava xwe û tê wateya gelê çandiyar û şivan. “Kom” û “gen (gel)” bi Kurdî ne. Li vir helenan tişta ku kirine, li gor zara- vayê xwe weke ku timî dikin, bihev ve kirine. “Kom” îro jî di kurdî de tê wateya gundê piçûk ku bi çandiniyê û şivantiyê debara xwe dikin, “gen an gel” jî te wateya nijad, ango gel. Dema ku dibe yek, tê wateya gelê gundî-şivan. Navlêkirinên Sumer ên Hûrrî û Gûtî, bi helenan vediguhere Komagenes û Mezopotamya. Bi

bilindbûna ***Medya*** û ***Persya*** re, pêvajoyeke lihevdana Rojhilat-Rojava ya liser Anatolya destpêdike.

Bi belavkirina mîtanniyan a ji alyê asûriyan ve, li herêmê rê li ber blokbûnên nû û federasyonan vedike. Di vî babetî de, Fede- rasyona Naîrî pêşî xwe dide nîşandan. Dibine “gelê avê” yên li geliyên Dîcle-Ferad û Zapê ku evder ji aliyê asûriyan ve bi navê “welatê avê” tê bi navkirin. Naîrî ji sedan eşîran hatiyê holê û di rewşa federasyonên ku timî jevketine û avabûn de, jiyane.Digel ku ji aliyê asûriyan ve têne kontrolkirin jî, bi temamî di bin ser- destiyê de nemane. Nivîsên Asûr ên liser latan nîşan didin ku, ge- lek caran serî hildane û li çîhên asê vehewiya ne. Em bi hêsanî ji van nivîsan fêmdikin ku, kevneşopiya serhêldêriya eşîrên Kurd, wê demê jî derbasdar bû.

Ev yekîtiyên eşîran ên bi navê ***Naîrî,*** di salên BZ 900an de, we- ke dewleteke bi navê ***Ûrartû*** derdikeve qada dîrokê. Ûrartû li der- dorê Wana îro, bi navê ***Tuşpa*** paytextekê ji xwe re dadimezrînin û di asta mîtanniyan de, berfirehbûnekê pêktînin. Di warê kankerî (berbesvan) û hespvaniyê de, xwedî derfetên mezin in. Di dîrokê de yekem car coya herî dirêj a avê -nêzîkî 52 km- ji Gurpinar heta bi nêzîkî Wanê vedikin. Heta weke roja îroyîn jî, jê vê coyê sûd tê wergirtin. Tê fêmkirin ku gelek kela, bend û bajar damezrandine. Ûrartû li bakûr heta bi çiyayê Agirî diçin. Gelê binyat bi piranî ber- dewama ***Hûrriyan*** û ***Xaldiyên*** ku nêzîkbûna wan a bi ennenan re tê texmînkirin in. Giraniya wan ji binyata hûrriyan e. Zimanê fennî him asûrî ye û him jî zimanê ûrartûyî yê nêzîkî hûrrî ye. Di roja me de çawa îngilîzî zimanê dîplomasiyê be û hê jî li gelek mêtingehên wê yên kevin were bikaranîn, akadî ya ku asûrî jî ji binyata wî, de- meke dirêj zimanê herêmê yê dîplomasî û çandê ye. Asûrî vê kev- neşopiyê didomîne. Piştî hilweşîna asûriyan, zimanê aramî yê vê kevneşopiyê bidomîne. Lêbelê zimanê ku eşîran bikaraniye, timî zimanê dayika wan e. Herî bêhtir tebeqeya raser a hevkar, zimanê fennî bikaraniye. Di her demê û her herêmê de, pêvajoyên bi vî rengî têne jiyandin. Gel ziman û çanda xwe bikartîne lê hevkar, zi- manê dagirker û serdest bikartîne. Dewletê nû yên weke Hîtît, Mî- tannî, Îbranî ûwd, bi gelemperî di bandora çanda serdest a Misir Sumer de dimînin û xanedanên wan ên serdest, bikaranîna zimanê van weke rûmetekê

dinirxînin. Di roja me de jî pêvajoyên bi vî rengî didomînin. Li hember vê, gel ziman û çanda netewî him di- parêzin û him jî radigirin. Mîtolojiya Ûrartû niçikeke mîtolojiya hûrriyanne. Li sêbareya sîstema xwcdê, ***Xaldî*** liatiyc zêdekirin. Di- bêtiyeke ku gelê Xaldî temsîl dike. Ji aliyê peyvê ve jî Ûrartû, tê wateya 'cîhê bilind" û navlêkirineke ji çanda Sumer e. Ûrartû ve- naguhere rewşa hnperetoriyê, weke dewleteke netewî dimîne. Di warê kankerî û gihîştandina hespan de, bi qasî mîtanniyan hosta ne. Di vebûna ber bi îranê ve, rola pêngaveke pêş dilîzin. Bi asûriyan re dikevine nava şerên dijwar.Nêzîkî 300 salan desthilatiya xwe di- domînin û ***Med*** liser mîrateya wan datînin. Tê texmînkirin ku BZ di salên 650an de ji holê rabûne. Di navbera dewleta navendî û kon- federasyona eşîran de derawayekê digirin. Nayê gotin ku bûye dewleteke koledar a navendî. Piştî ûrartûyan, Kurd û Ennen hê bêhtir ji hev qut dibin. Ji aliyê din ve qewmên îskîtiyan ku ji bakur ve tên, ji aliyê çanda herêmê ve têne helandin.

Di serdema koledariyê de, pêngava şaristaniyê ya ku herî pêşve- çûyî, împeretoriya Med-Pers e. Bingeha vê împeretoriyê li bakurê- rojavayê îranê, ya rastir li Medya hatiye avêtin. Di dema asuriyan de Med cîranên wan ên Rojhilat in. Ji binyata Hûrrî ne. Lêbelê di bandora çanda ku di ser Iranê re pêşvediçe de jî dimînin. Weke ku tê gotin, Med ne ji qewmên Hind-Ewropî yên ku BZ di salên 2000an de, ji bakurê Ewropa û başûrê Rûsya xwe berdane îran û Hindê ne. Heta bi guman e ku koçberiyeke wiha jî çêbûbe. Dibe ku koçberiyên li hember hev ên bisînor çêbûbin. Lêbelê gelekî ku bi tevayî rabe koçber bibe û were di herêmeke ku rûniştvanên wê he- bin de, bêdengî cîh bigire, ji aliyê teorîk ve jî ne gengaz e. Ya rast ev e ku; çandên bihêz bandora xwe ber bi qadên çandên lawaz ve pêşvedibin. Belavbûna çandê, ji îranê ber bi bakur, rojhilat, Hindê û Çînê, bi hezaran salan domandiye. Digel vê, heger ku hinek koç- beriyên bisînor çêbûbin jî, ev di nava çanda bihêz de heliya ne. Ev rastiyeke dîrokî ye ku Navendên çanda Rojhilata Navîn ên bihêz, 15 000 salan li pey hev, çanda neolîtîk û ya civaka biçîn a serdema pêşî, li çannedorên cîhanê belav kirine. Derawaya wê ne ji der ve anîna çandê ye, bêhtir nêzîkî rola birina derve ye. Hewzeya Dîcle û Ferada jor, cîhên ku herî nêzîkî van navendan e û erkeke wan ku timî xweyî bikin heye.

Bi taybetî sê herêmên dîrokî yên Iranê, ango bakurêrojavayê Medya, başur û başûrêrojavayê Persya, bakurêrojhilata Partya, xe- tên derbasbûyina belavbûnê ne. Herwiha aliyê Medan ê bi giranî, teşkîlkirina derawayeke cîwarbûn û veguhêzeriyê ye. Di demeke ku Asûr bilind dibin de, cîranê wan ên rojhilat Med in. Di warê kan, kereste, kevirên binirx û di gihîştina hespan de, di derawayeke bi avantaj de ne. Di dema ku Urartû serdest in de, bi wan re di nava têkiliyan de ne û çiqas ku diçe, nêzîkî wan dibin. Qewmê kurdan Gûtî, nezîkî gelê kurdên Soran ên îro ne. îhtimaleke mezin e ku na- vê Med ji binyata asûrî be. Dibe ku asûriyan jibo van bi wateya we- latê madenê (kan) de, Madaîn bikaranîbin û Med ji vira hatibe. Tê zanîn ku Asûrî gelekî bi kanên sifir, hesin û zîvê dora Amedê re, tê- kildar bûne. Peyvên Amed, navçeya Maden û Med ku dişibine hev, giraniyê dide navlêkirina asûriyan a biwêja “Gelê welatê Madenê”. Ev dibêtiyeke bihêz e ku, çawa sumeriyan gotine hurriyan “yên bi welatê bilind”, asûriyan jî bi wateya “gelê welatê madenê”, peyvên Madain, Mad, Med bikaranîne. Dibe ku navên Maden û Amedê ji vê demê mabin. Med, berî ku di warê siyasî de bilind bibin, di pê- vajoya veguherîna bîrdoziyîke bihêz re derbasbûne. Pêşevanê vê ***Pêxember Zerdeşt*** e. Veguherîn û cîgeyîbûna mîtolojiya Sumer, di şêweya mîtolojiya Aryen a ku beşeke pêşî ji ya Hînt-Ewropî de ye.

Sîstemeke wê ya xwedayan a ku pêşî sêbare û dûvre dubare heye. Ev sîstema dubareya xwedê, bi texmînî BZ di salên 1500an de çe- dibe. Di vê baweriya ku bi navê baweriya ***Ahûra Mazda*** tê binav- kirin de, veqetîneke weke xwedayê tarîtiyê û yê ronahiyê tê jiyan- din. Weke ***Budha*** yê ku di ***Brahmanîzmê*** de, ***Konfuçyus*** ê di ***Tao- parêziyê*** de û ***Sokrates*** ê di ***felsefeyê*** de, nûsaziyên sincî yên mezin çêkirine, Zerdeşt berî tevan di baweriya Ahûra Mazda de, pêkani- ye. Weke nûsaziya Hz Brahîm ku li dora Rihayê di mîtolojiya Su- mer de çêkirî, Zerdeşt jî bi texmînî di salên BZ 1000-500an de, di derawaya kesê ku ev baweriya di nûsaziyan re derbasdibe, bi awa- yek bihêz veguherandiye. Eslê wê pêwîst e bête fêmkirin ku, nûsa- zîparêziya Brahîm jî, di dawiya pêvajoyeke piştî çend sedsalan de, weke pêngava dawî an jî bi şêweya ku demekê bigire û yekê veke ye. Yek li başûrêrojhilat û yê din li bakurêrojhilat vê rolê dilîzin.

Nûjeniya herî girîng ku Zerdeşt anî, azadkirina viyana mirovên ku sazûmana koledariyê ew kiribûn rewşa ku li siya xwe jî xwedî demekevin. Ango rizgarkirina takekes a ji bin serdestiya qederpa- rêz a xwedayên koledar e. Li dij serdestiya mîtolojiya koledar a ku liser bîrûbaweriya mirovan e, radibe. Herwiha di sazûmana koleda- riyê ya hişk de, rêyeke mezin a nermkirin û veguherandinê vedike. Bi vî aliyê xwe ji Hz Brahîm tûndrawtir û têkoşertir e. Rola wî ya di pêkhatina olên yek xweda de, ne kêmî ya Hz Brahîm e. Berî ku Imperetoriyên Med û Pers çêbibin, bingeha bîrdoziyî bi şoreşa vi- yaneke bi vî rengî tê amadekirin. Heger ku ev şoreşa viyanê nebe, lidijderketina sazûmana koledar a şêweya Misir û Sumer, pir zor e. Mezinbûn û hewldanên ewqas pêxemberan, encex derfetê dide nennkirin û veguherînên zêde bisînor. Zerdeşt dibe nûnerê herî bi- hêz ê vê şoreşa viyanê. Çawa ku ***Skender*** pişta xwe daye mamos- teyê xwe ***Arîsto*** û hnperetoriya pêşî ya di dîrokê de damezrandiye, Damezrînerên Imperetoriyên Med û Pers jî, pişta xwe dane sincê Zerdeşt û ev rol leyîstine.

Di bingeha dewletên koledar ên Misir û Sumer de, hewldanên rahîbên Misir û Sumer ên nûsaziyên di perestgehan de, hene. Ti çê- bûnên şaristanî û siyasî yên bihêz, heger ku di bingeha wan de xer- ca bîrdoziyî ya bihêz nebe, ne xwedî şens in ku pêkwerin. Di vî ba- betî de

nasnameya bîrdoziyî, bi hindikayî li qasî mercên binesaziya hilberînê, bandorê li tevgera şaristanî û dewleta ku bilind dibe, di- ke. Ev bandor ji ser û bin ve, bi hev re yan jî di nava hev de dixe- bitin, dewletê yan jî şaristaniyê çêdikin an jî ya heyî vediguherînin. Ravekirina dewletê ya tenê bi aboriyê, çawa çewt û bi kêmayî be, heta ku rola bîrdoziyê bi temamî neyê diyarkirin jî, dahûrandina dewletê rast nayê pêkanîn. Tê zanîn ku Marksîzm di vî babetî de bi kêmayî maye û bi têrayî rol nedaye bîrdoziyê. Di encamê de ev te- rîfkirina çewt, bûye sedema têkçûna sosyalîzma reel.

Berî ku ***Konfederasyona Med*** were damezrandin, di kesayetiya mîtolojiya ***Kawa*** de, berxwedana li hember hnperetorên Asûr a bi teknîka hesin, di wateya pratîk-polîtîk de, roleke girîng lîstiye. Berxwedanên di demên Hûrrî, Mîtannî, Naîrî û Urartûyan de, we- ke dawerî di çanda qadê de, wateya xwe di Efsaneya Kawayê He- sinkar de dibîne. Şîroveya efsaneyê ya rast û pêşveçûna wê di dîro- kê de ya bi vî rengî, dibêtiyeke bihêz e. Şerê gelên kanker ên ku we- latê xwe biparêzin û azadiya xwe bistrînin, ***Efsaneya Kawayê He- sinker*** dafirînin.

Ev herdu kevneşopiyên bihêz, ango yekbûna şoreşa viyana bihêz û sincê Zerdeşt û kevneşopiya Kawayê Hesinkar ku bûye dawera berxwedana eşîran a bi çekên hesin ên sedsalan, di kesayetiya Me- dan de, BZ di sala 612an de, dawiyê li Imperetoriya Asûr tîne. Es- lê wê têkoşîna ku bi sedsalan berdewam dike, di vê mejûyê de bi serfirazî bi encam dibe. Weke ***Cejna Biharê Newroz,*** piştî têkçûna vê amûra zilmê, Ji aliyê gelên Rojhilata Navîn ve, weke ***Cejna Azadî*** bi coşeke mezin tê pîrozkirin. Eynî weke ku Hz Brahîm, dawî li kevneşopiya zalim a ku her sal zarok dikirine qurban anîbû û rê li ber cejnekê vekiribû. Ev herdu cejin jî, rizgariya ji kevneşo- piya sazûmanên koledar ên ku mirov dixwarin, îfade dikin.

Organîzasyona Med, di wesfê Konfederasyona Eşîran de ye. Cu- dahiya wê ev e ku, di vê konfederasyonê de, eşîrên Pers jî cîh digi- rin. Heçku di konfederasyonên Hûrrî û Naîrî de, rêwşa bi vî rengî tine ye. Ev ji eşîrên ku heman ziman û çand parvedikirin, dihatin.

Hevgirtina Med a bi babîliyên ku berdewama kevneşopiya Sumer re, digel ku dawî li Imperetotiya Asûr anî jî, binyata wê ya lawaz û di nava xwe de bi xiyaneta eşîreke xizim ku gelek caran diqewimî, li vir jî rola xwe dilîze. Xwarziyê Persî ***Kîros,*** li hember qeranê Med ê dawî ***Astiyag,*** komployekê lidardixe û desthilatiyê bidest di- xe. Serdestiya ku ji eşîrên medan dikeve destê eşîrên persan, weke ***împeretoriya Pers*** tê binavkirin. Esasê wê rola damezrandinê ya medan e. Lêbelê derketina persan a qada dîrokê ya weke hêzeke te- ze jî, dikare di vê veguherînê de rolê bilîze. Lewra eşîrên ji binya- ta hûrriyan, bi berxwedana ji BZ 2500an heta bi salên 500an, wes- tiyane û nûhiya ne. Herwiha ev ne surprîzek e ku xizimên wan, ji eşîrên Pers yên ku heman zimanî dipeyivin, eşîra ***Akhamenîd*** di kesayetiya Kîros de weke hêzeke teze derdikevine qada dîrokê.

Cîhê medan di dîroka kurdan de, lîstina rola destpêkê ya di ser- dema klasîk a koledariyê de ye. Bi taybetî têkçûna asûriyên ku ser- dema kevin a koletiya dawî temsîl dikin, ji aliyê dîroka Rojhilata Navîn û bi vê ve girêdayî ya hemû cîhana şaristaniyê ve, bidawîbû- na demekê ye. Cudahiya di navbera koletiya serdema kevin û kole- tiya serdema klasîk de, dişibe cudahiya di navbera "kapîtalîzma ho- veber" û "kapîtalîzma şaristanî". Di ya yekemîn de zoreke bêsînor diyarker e, lê di ya duyemîn de, sazûmaneke ku birêzik û hiqûq tê diyarkirin dabaşa xeberdanê ye. Amûrên teknîkê yên serdema ke- vin ji tûnc hetinê çêkirin, lê serdema klasîk ji aliyê teknîkê ve ser- dema hesin e. Ji aliyê bîrdoziyî ve jî, serdema kevin bi mîtolojiya xweda-qeranan ve girêdayî ye, lêbelê şêweyên bingeh ên bîrdoziya serdema klasîk, olên yek xweda û felsefe ye. Di navbera herdu de- man de, ji aliyê teknîk, hilberîn, rêveberiya dewletê û bîrdoziyî ve, cudahiyên mezin hene. Bi taybetî li şûna xweda-qeranan, di rêve- beriya dewletê de, cîgirên xwedê yê di dora pêşî de , ango qeran di- bine dabaşa xeberdanê. Ev diyarbûna nennbûneke cidî ye.

Bi hilweşîna asûriyan re, ev têgihîna koletiyê di dîrokê de binerd bû ye. Têgihîna civak û mîtolojî-ol a ku împeretoriya Med-Pers pê ve girêdayî, giyan û derûna serdema koletiya klasîk e. Kevneşopi- ya Zerdeşt û Brahhn hêza bîrdoziyî ya vê veguherînê dafirînin. Fe- derasyonên eşîran ên herêmê ku di kesayetiya Kawa de, teknîka he- sin

him di hilberînê û him jî di parastinê de bikartînin, dibine hêza amadekar a dema klasîk a nû. Tevkariyeke mezin a şaristaniya Roj- hilat ku li şaristaniya Rojava kiriye jî, di vê xalê de ye. Pêvajoya ku serdema klasîk daye destpêkirin, li welatê Medya yê ku Zerdeşt li giyan û viyana xwe geriya ye û pêşvebiriye, haveyn girtiye. Pêva- joyeke berxwedanê ya ku ji hûrriyan destpêdike, heta bi medan tê û 3000 salan berdewam dike, Bi rastiya berxwedana gel a ku Ka- wayê Hesinkar dawer kiriye, Viyana azad a di kesayetiya Zerdeşt de veguherî ku derandiye holê, herçiqas ku di dîroka nivîskî de cîh negirtibe jî, esasê wê pêvajoya dîrokê ya herî mezin e ku aliyê wê yê azadî bi giranî ye. Bi îfadeyeke berbiçavtir, ji sumeriyan heta bi asûriyan, dîroka koledarî ya herî mezin a bi navê serdema kevin, çi- qas ku rastiyeke girîng be, ji hûrriyan heta bi medan, berxwedana bîrûbawerî û viyana azad a ku di navenda wê de kalik û dayikên kurdan rolê dilîzin, rastiya berxwedana gelan a ku di bingeha wê de eşîr cîh digirin jî, ewqasî rastiyeke dîrokê ya girîng e. Yek ji wan dîroka zordestî û talana serdest û mêtinkera ye û ya din jî, dîroka têkoşîna ked û azadiyê ya ku li ked û azadiya gelan xwedî derdike- ve ye. Pêngava dawî ya ku li welatê Medya hatî avêtin, evqasî bi- nirx û girîng e. Ev bi vê pêşveçûna dîrokî ve girêdayî ye ku, hemû Rojhilata Navîn, Kafkasya û heta bigihe Asya Navîn, gel hemû we- ke nûjeniya herî mezin, ji nû ve vejîn û cejna azadî nirx didinê.

Ev ne rasthatinîke ku, rizgarbûna ji koletiya serdema kevin, ji aliyê şaristanî û dahatûya gelên cîhanê ve, pêngaveke herî mezin a nûsazî û veguherînê ye. Hemû nirxên mirovhez ku mirovatiyê bi ci- vaka neolîtîkê qezenc kirin, bi zordestiya koledariya serdema ke- vin, ber bi kûrahiya dîrokê ve tê avêtin, weke ku mirovatiyeke azad û wekhev tine be, ol û mîtolojiyek tê afirandin. Weke ku qedera mi- rovan tenê koletî û benîtî be, ku nikaribe li siya xwe jî xwedî der- keve, weke ku sazûmana şaristanî ya bi mijokatiyeke şêt û cizaki- rin, sazûmana derbasdar a bitenê be, cîhanek tê afirandin. Olekî mî- tolojîk- bîrdoziyî ku qeranê wê dibin xweda û kedkarên wê dibin zebanî, weke ku baweriya qederê ya bê dawî be, li hemû giyan û bî- rûbaweriyan tê bicîlikirin. Ev dahênana civaka nû, civaka biçîn a ku li perestgehên Sumer û Misir pêkhatî, di dîrokê de pêşveçûneke mezin e. Lêbelê windakirina mezin a mirovatiya

azade jî. Diyalek- tîka dîrokî ya vê demê wiha ye. Feylesofê Alman ***Nîetzsche,*** pirtû- ka xwe ya bi navê ***“Wiha Fermankir Zerdeşt, ”*** ne belaş nivîsî ye. Esasê wê ev, serhildana viyana azad a ku Zerdeşt û kevneşopiya wî temsîl dike, tê wateya ku, xwedayê koledar, herwiha sazûmanên ra- hîb û xweda qeranên benîtiya kûr pirsiyar bike û bihejîne. Pûtên ku dawerên xwedayî yên zilm û mijokatiyê, tên hejandin û şikandin, jibo mirovatiyê rêyeke jiyanê ya ku were kişandin vedibe. Bîranî- nên azadiyê -bîranînên bihişta winda- yên ku ji dema neolîtîkê ma- yin, vediguherine bêrîkirina hêvî û rizgariya mirovatiyê. Xwedayê Brahîm ê dostê bexşînertir -dawî li qurbankirina mirovan aniye- xwedayê ku Zerdeşt ew pirsiyar kirî, li hember tarîtiyê bi serfirazi- ya ronahiyê derbasî serdestiyeke bilind bûyî, di derûna xwe de ji îfadekirina vê têkoşîna ked û azadiyê ya di bin kemna ol pêde, na- yê ti wateyên din. Hemû têkoşînên vê demê, bi şêweya ramaneke mîtolojîk û olî tê zimên. Jibo tevaya mirovatiyê bê awerte ev wiha ye. Heger ku em bixwazin têkoşîna ked û azadiyê fêm bikin, bi da- hûrandina zimanê mîtolojî û ol emê bikaribin vê pêkbînin. Weke ku tê gumankirin, mîtolojî û ol, ne vegotinên nîgaşperest (xeyalper- sest) û bi naverok in. Berevajî vê, dîroka mirovatiyê ya bi hezaran salan ku bi şêweya li gor xwe tîne zimên e. Çiqas ku mîtolojî û ol tên dahûrandin û bi zimanekî zanistî bi awayekî rast tên şîrovekir- in, ji neolîtîkê heta bi serdema nêzîk, di warê gihîştina dîrokê ya îfadeyeke zanistî û vegotineke rast de, serkeftin çênabe. Kêm dimî- ne û çewt dibe.

Dahûrandina rast a berxwedanvaniya kevneşopiya Zerdeşt a ku li “çiyayên bilind (Hûrrî)” û “welatê maden (Medya)” hatin pêka- nîn û kevneşopiya Kawayê Hêsinkar a gel, di rastnivîsandina dîro- ka Rojhilata Navîn û ya cîhanê de, girîngiyeke mezin bi xwe re tî- ne. Ev girîngiya mezin, xwe di serdema şaristaniya klasîk ku ji ali- yê persan ve ber bi navenda Asya û Hindistanê ve tê kişandin de, xwe nîşan dide. Bi bandora Pers, li Navenda Asya, Hindistan û Çî-

nê, demeke nû destpêdike. Li Çînê ***împeretoriya Xan,*** li Hindistan ***împeretoriya Morya,*** li Navenda Asya demên pêşî yên ***Hûn*** û ***Me- teXan*** ên ji binyata Tirk, bi vê bandorê ve girêdayî, pêşvediçin. Li Babîlê demeke nû vedibe. Dema Babîl a dereng,encama vê bando- rê ye. Pêşveçûneke din a ku encamên wê pir girîng, BZ di sala 538an de, serbestberdana cihûyên ku dîl hatibûn girtin û vegera wan a Qudsê ye. Ev pêvajo yê hilatina îsa û xiristiyantiyê amade bike. Ola Cihû, kevneşopiya Brahîm û kevneşopiya Zerdeşt di vê pêvajoya koçkirin û vegerê de dike yek û naverokeke bîrdoziyî ya zexmtir qezenc dike. Rola cihûyan zêde dibe. Wisa diqewime ku Cihû, rizgarbûna xwe ya ji desthilatiya Asûr û Babîl, dixwazin we- ke newînên xwedê û hatina Mesîh şîrove bikin. Herwiha li Rojhila- ta Navîn, kevneşopiyeke Mesîh Mehdî dihile.

Bandorkirineke din a girîng ev e ku rêya diçe serdema klasîk a Greko-Romen, ji împeretoriya Med-Pers bandoreke kûr digire. Di serdema serdestiya Misir û Asûr de, serdema klasîk a Grek û Ro- ma, ne di wê rewşê de ne ku bi serê xwe pêşvebiçin. Êdî nayê go- tin ku heta BZ salên 500an, Roma û Athena demeke dîrokî jiya ne. Di gelek qadan de, pêvajoyeke konfederasyon a bi heman rengî tê jiyandin. Evan ji aliyê bîrdoziyî ve, bi giranî di bin bandora Babîl û Misrê de ne. Yên ku li pêş tên, perwerdeya xwe li Misir û Babîlê dikin. Yên ku li vandera perwerde nebûbin, ne gengaz e ku hêzeke entelektuel qezenc bikin. Ev navend zanîngehênên demê ne. Thales û Ppythagores ên ku felsefe dane destpêkirin, demeke dirêj li van navendan perwerde bûne. Ev dem dema ku Rojava ji her alî ve bi Rojhilat ve girêdayî ye. Heta bi BZ salên 500an, ev girêdan bi kû- rayî berdewam dike. Kengî ku împeretorê Pers Kîros û Darîûs Ba- bîl û Misrê bi temamî berdest dikin (BZ 538-523), wê hingê şensê Rojava çêdibe. Pêşî li peravên Ege, piştre li nîvgirava Grek, dema bilindbûna şaristaniya Athena bilezgînî destpêdike. Bi têkçûna per- san a BZ di 490an de li ***Maraton,*** serdestî derbasî Rojava dibe û di- kevine dema klasîk a di dîrokê de herî pêşveçûyî. Bilindbûna felse- feyê, rê li ber çanda Helen ku bikeve pêş, vedike. Skenderê ku xwendekarê feylesofê mezin Arîsto, bi meşa dîrokê ya ku çûye As- yayê re, ji Egeyê heta bi Hindistanê û ji Mezopotamya heta bi Mis- rê, bandora dema

şaristaniya Helen destpêdike.

Ev ravekirina kin jî nîşan dide ku Helen, di rêya Med û Persan ku vekirin re pêşvediçe. Rê ne tenê bi awayekî fîzîkî (Ji Egeyê ji bajarê Sard heta bi paytexta Iranê Persepolîs ***-Rêya Qeran-*** vebûye. Ya herî girîngtir, bîrûbaweriya serdema kevin a ku bi felsefeya Zer- deşt û sincê wî yê azadî, çareser bûye. Pêşvecûna bingehîn a ku rê li ber felsefe û şaristaniya grek vekiriye ev e. Dema ku Dîroka He- rodot jî were lêkolîn, ev mijar bi awayek vekirî derdikeve holê. Mî- tolojiya Grek, bi giranî di bin bandora lêguncandina Hûrrî û Hîtît de çêbûye. Teknîka tûnc û hesin, ji van deran çûye. Bi kinayî şaris- taniya grek, ji amûrên teknîk heta bi amûrên bîrdozî û siyasî, di ser Anatolya re di bin bandora pêşveçûna rista Hûrrî, Hîtît, Lûwî, Frîg- ya, Lîdya, Med û Pers de çêbûye. Di rêza duyem de, bandora Ba- bîl, Misir û Fenîke tê. Hostatiya grekan, di veguhastin û sentezva- niya wan a baş de ye. Bi vê sentezê, pêşevanî kirine ku pêngava fel- sefeyê bi dîrokê bidin qezenckirin, dîsa di serî de qesirbendî, di wa- rê huner de jî derketinek pêkanîne. Ev qezenceke grek a girîng e ku bi ***Homeros*** ji xwedanasiyê cuda, wêjeyeke zexm pêşvebirine.

Girêdana van pêşveçûnên dîrokî ya bi giyana azadiya li zozanên Medya ve, nirxandineke girîng pêwîst dike. Dema ku mîtolojî û wêjeya grek baş bête lêkolîn, ev girêdan bi hîkarîkariyeke diyar, tê fêmkirin. Yê bihêsanî were fêmkirin ku, bêyî tevgera Med, şarista- niya Grek hebûnê bidest naxe, bi gotineke din pêşvecûna serdema klasîk a ku tê zanîn, pêknayê, belkî jî weke şaristaniya Girît a ke- vin, yê rewşeke mîna koletiya serdema kevin bijî. Jibo şaristaniya Grek, ji dêvla şêweyeke koletiya Misrê, pêvajoya ji Hûrrî û hîtîti- yan heta bi Med û persan ku rêyeke bi şêweya Rojava ya ji azadiya takekesî re vedike û pêşveçûnên di ser Anatolya re, di nava 3000 salan de amade kirine. Damezrandina diyalektîka dîrokê ya bi vê şêweyê, ji aliyê rast fêmkirina rêya ku diçe şaristaniya Rojava jî, gi- rîngiyeke mezin bi xwe re tîne. Fêmkirina têkiliyên Rojhilat û Ro- java yên bi rasteqînî jî, bi vê yekê ve girêdayî ne. Dîrokzaniya Ro- java ku vê girêdanê bi temamî pêknayîne û nûka li vê mijarê dibe xwedî, kêmasiyeke mezin e. Lêbelê hewldana jiholêrakirina vê kê- masiyê jî, pêşveçûneke girîng e.

Bi hilweşîna împeretoriya Pers a di BZ salên 330an de ya ji ali- yê Skenderê Mezin ve, di şaristaniya Mezopotamya de, pêşveçûnên nû çêdibin. Êdî pêşveçûnên bi şaristaniya Rojava girêdayî ve, yê bandorê li herêmê bikin. Navlêkirinên nû jî, weke navlêkirinên Su- mer, yên rastiyên herêmê temsîl bikin. Helenan di serî de, Troya, Frîgya, Lîdya û lûwiyên ku gelên Anatolya yên herî kevin, di nava çanda xwe de dihelînin. Ev helandin li sînorên yên bi eslê xwe Kurd, radiweste. Di vê yekê de, hêza çanda Proto-Kurd, diyarker e. Binyata eşîrtî ya zexm, nizilandina ziman û çanda derveyî asteng dike. Di rewşa çanda ku herî zor bête veguherandin de ye. Di çan- da Helen de, lêkolînên Medya, mijarên balkêş in. Mînaka herî ber- biçav, Qerantiya Komagene ya ku navenda wê Pirîn e. Ev dewleta ku piştî Skender liser bingeha dema Med û Pers, BZ di salên 300an de bilindbûneke girîng nîşan daye, heta dema ku bi sasanî û roma- yiyan re tên hemberî hev, nêzîkî 500 salan didomîne. Qerantiya Ko- magene, di van salan de, mînakeke rewşen a dema klasîk e. Herê- mên wê yên sereke di serî de weke navend Pirîn-Samsat û wekî din Riha, Meletî, Gurgum, Dîlûk û heta bi Elezîzê berfireh dibe. ***Zeug- ma*** ku di van demên dawî de rojanî bûye, navendeke vê demê ya girîng e. Dîsa heştemîn nuwazeya cîhanê Kavilên Nemrûdê jî, ji vê demê mane. Di warê kankariyê de, binavûdenge e. Di warê bazirganiyê de, xetên bazirganiyê yên derbasbûyina Rojhilat-Rojava û Bakur-Başûr digire. Hemû mal û ramanên ku ji Misir, Mezopotam- ya, îran, Kafkasya, Grek û Anatolya dihatin, li co û navendên vira, derfetên pêşkêşbûn û bazarkeriyê didîtin

Herwiha çanda Helen, sentezeke çandên Rojhilat û Rojava der- dixe holê. Ji peyker û Qesirbendiyê, ev yek bihêsanî dikare bête derxistin. Bi vî aliyê xwe, weke çandeke herî pêşî ku senteza Roj- hilat û Rojava pêkhatiye tê nirxandin. Sedema têkiliyên ku di teva- ya cîhanê de pêre tên danîn, Di vê rastiya wê de ye. Ti şaristaniyên din, ev sentez weke heta niha, wiha rewşen nîşan ne daye. Ji aliyê senteza şaristaniyan ve, rawestandina liser pêwîst dike. Ya herî gi- rîngtir, hemû şaristaniyên vê dawiyê, bandorgirtineke yekalî bingeh girtine. Aliyê bigiranî ne sentez e, rêya ku teza xwe bi bîrûbaweri- yeke mêtinkerî serdest bikin, hatiye hilbijartin. Iro jî şaristaniya Rojava, bi serdestiya tezên xwe hereket dike.

Di serdemên pêşî de, nêzîkbûnên şaristaniya Rojhilat jî, bi vê şêweyê ne. Lêbelê ya ku di Komagene de hatiye pêkanîn, sentezeke afirînere û mînaka herî cidî ya derfeta senteza şaristaniyan, temsîl dike. Gelê bingeh ê Ko- magene, bigiranî eşîrên Kurdan ên mîna îro û wekî din, Ennen, Lûwî, Helen û Asûriyên ji koka Semîtîk in. Tê texmînkirin ku Kur- dîbûnê vê demê, pêşveçûneke wesfdarî nîşan daye. Lûwî û Helen dihelin, Kurd û Ennenî girîngiyê qezenc dikin. Ennen herî bêhtir di kankariyê û pîşekariyê de pêşevaniyê dikin, Kurd di çandinî û ajal- vaniyê de serdest in. Vê demê cîranê Komagene yê nêzîk, ***Qeran- tiya Palmîra-Suriye*** ye. Keybanû ya wê ya dawî Zennûbe, PZ di 268an de, dibe dîla destê împeretorê Roma ***Aûrelîûs*** û dawiya qe- rantiyê tê. Bi texmînî di heman demê PZ di 250an de, bi lihevdana Roma-Sasanî ya ku zêde dibe, Qerantiya Komagene hildiweşe û di navbera herdu aliyan de, tê parvekirin. Dema piştî vê êdî lihevda- neke di navbera Sasanî û împeretoriya Roma de ye. Ev lihevdan hê bêhtir rê li ber hilweşanan vedike. Potansiyela herêmê ya bihêz, di dorhêla şer de nagihe hêza şaristaniya ku mafdar e. Mecbûr dimîne ku hebûna xwe weke begîtî û eşîrtiyên piçûk bidomîne. Li gor hê- za aliyan, geh çûyina vî alî û geh çûyina aliyê din, bûye polîtîkaya bingehîn. Pêvajoyên bi vî rengî, ji serdema neolîtîkê ve tên. Herêm di rewşa qevaztina çandan de ye. Xeta belavbûnê ya Rojava-Rojhi- lat û Başûr-Bakur, ji aliyê hemû komên mirovan ve vê rola xwe berdewam dike. Mînak, Misir û Mezopotamya jêrîn, ji ber qadên ku hatine îzolekirin, taybetiyên yeknesak nîşan didin. Pêşveçûn bêyî zoreke derveyî, bi hezar salan hebûna xwe berdewam dikin. Qewsa Toros-Zaxrosan, qada belavbûna sê parzemînan a bingeh e. Şaristaniyeke taybehnendî ya payîdar, demeke dirêj nade doman- din. Hêzên dagirker ên ku ji çar aliyan ve tên, fersendê nadine vê yekê. Encex di derawaya teraza hêzan de, herêm dikare pêşveçûnan pêkbîne. Pêşveçûna Hûrrî, Mîtannî, Urartû û ya Medan jî, di enca- ma terazên bi vî rengî de ye. Di vî derbarî de, mînaka herî rewşen û payîdar ji aliyê Qerantiya Komagene ve tê nîşandan. Derûna ku sentezeke bihêz dertîne holê, ji vê derawaya wê tê. Jiberku dewsên hemû çandan nas dike, di xûnifandinê û gihîştina sentezên nû de, derawayeke bi avantaj dijî. Bawerhişkîyeke wê ya bi kûrayî tine. Gelek çand dikarin ligel hev bijîn.

Herêm weke mozaîkeke olan, zi- manan û çandan e. Yên ku herî baş van nîşan didin, qada peykerên Nemrûd û mozaîkên Zeûgma ne.Xêzkên hemû çandên Rojhilat û Rojava, di van peyker û mozaîkan de xuya dike. Di tîpan de jî, reş û spî, û xêzkên Semîtîk û Aryenîk hildigire. Di şêweyên jiyan û ba- weriyê de, curbicuriyeke dişibe hev ber çavan dikeve. Weke qade- ke ku hemû ol, ziman û hemû hêmanên çandê di nava hev de, xu- ya dike. Ev yek girîng e ku ev hemû resenîtî, li Kmagene bisentez bûn û ketine nava hev. Ji vê rasteqîniya wê ye ku bi hezar salan tay- betiya avhewaya sêr û pîrozweriyê hilgirtiye.

Zanyariya mirovatiyê ya bingehîn, di kûrahiyên neolîtîkê de ve- şartîne, ji wira hilatine û pêşveçûne. Zayina gelek Pêxemberên me- zin û birêxistinbûna wan, dîsa hêzeke din a herêmê ku çand deran- dine holê ye. Rêya ku diçe felsefeya Grek, ji vira di rêçika kevne- şopiya Zerdeşt re derbasbûye. Ev jî ji zanyariya herêmê tê. Herêma bingehîne ku çanda dayîk û xwedawendê lê hilatiye. Xwedawenda hûrriyan ***Hepat,*** vê dawiyê di pirtûkên ol ên pîroz de, dibe ***Hawa*** û derdikeve. Li nav hîtîtiyan bûye ***Kupapa*** û Li nav fîrîgiyan bûye ***Kîbele,*** Li nav ereban bûye ***Kible*** û li Kabeyê cîwar bûye. Di bin- yata hemûyan de, jina afirînera neolîtîkê û xwedabûna wê, kevne- şopiya ku li ezmanan bi stêrkan tê temsîlkirin ango kevneşopiya stêrkan e. Li Sumer ***înanna-îştar,*** li Misrê ***Îsîs,*** li Grek ***Afrodît,*** li Roma ***Venûs*** û di xiristiyantiyê de bû ye ***Meryem.***

Ji aliyê hemû berjengên dîrokî vê tê rastkirin ku, çavkaniya kur- dan a orîjînal, piştî serdema qeşayî ya dawî, Ji BZ salên 20 OOOan ve, Navbera Dîcle û Firad a jor, qewsên nava Xeta Toros-Zagrosan û pesarên derî wan e. Him ji aliyê şûnwamasî û peyvnasî û him jî ji aliyê nijadnasî ve, di vî derbarî de gelek berjeng vê yekê rast der- dixin. Ya girîngtir, di rewşa herêm û gelê ku şoreşa çandinî û ajal- vaniyê pêkanîn de ne. Ev jî hatiye çespandin ku, civaka biçîn a pêşî, xemlên xwe yên daringî û menewî, ji vê çandê wergirtine. Piştî vê demê êdî em di dîroka Sumer û Grek a nivîskî de, di bin navê “Ge- lê çiyayî” de ku Sumerî ji wan re Kurtî gotine, dibînin. Vê têgînê cara dawî grekan ji lûwiyan girtine û Kurdîenne (welatê Kurd) bi- lêvkirine. siltanê selçûkiyan Sancar, di bandora Farisî de dimîne û vê herêmê bi navê Kurdîstan bi

navdike. Navên Hûrrî, Gûtî, Kas- sît, Mîtannî, Naîrî, Ûrartû, û Med, berdewama vê kevneşopiyê ye û di demên cuda de, di bin van navan de, konfederasyonên eşîran û dewlet hatine damezrandin. Heman ziman, çand û pêvajoya etnîkî hatiye vegotin. Guherîna navan, ji aliyê wan û cîranên wan ve tên kirin. Zêdeyiya navan, pêwîst e ku rê li ber encamên weke hebûnên cuda û nediyariyan veneke. Gelek pêvajoyên civakî, di dîrokê de, bi peyvnasiyên bi vî rengî hatine îfadekirin.

Di dîroka serdema koledar de, teybetiya komên nijada Kurd ev e ku, cudahiya xwedî eşîrên berxwedanvan ên di nava xwe de girtî û tebeqeya raser a ku di bingeha hevkarî de, bi cîranên xwe yên xwedî şaristaniyên bihêz re, girêdan pêkanîne. Evan roleke tampon dilîzin. Li gor taybetiyên civaka xwe, çêbûneke siyasî pêknayînin, liser navên hêzên derveyî civaka xwe kontrol dikin û ev yek ji xwe re kirine hunera polîtîk ku çêbûnên siyasî yên biyanî temsîl bikin. Ev derawagirtina wan, jibo roleke pêşverû û afirîner kû di dîrokê de bilîzin, dibe asteng. Kesê ku peywira wî notirvanî be, nabe afirîner, liser navên hineke din timî kontrol dikin. Bi vî rengê xwe kevneşo- piya hevkariya Kurd, di rewişta çineke bêber, li hember derûna xwe xayîn û bêrûmet de ye. Bêşik, tepisandina ji çar aliyan ve, di vê ye- kê de rola diyarker dilîze. Lêbelê dîsa jî vala ne, dema ku rewşa wan gelekî bikêrhatîbe jî, jiberku hînî dûvelangiyê bûne, berê xwe nadine pêşveçûneke afirîner a bibawerî. Serhildanên ku pêşevaniya wan jî dikin, ji ber berjewendiyên malbatî an jî jibo hêzên derveyî ne. Ji dema ku dîrokê destpêkiriye û heta weke niha, ev taybetî timî di aliyê neyînî de bandorker bûye. Mînaka vê ya herî hîkarîker ev e ku, di Destana Gilgamêş de, rêveberên bajêr ê Sumer, ***Enkîdû*** yê ku li çiyê bi awayekî hoveber dijî, bi pêwana jinekê dixapînin û Qe-

ran ***Gilgamêş jibo*** ku meznê daristanê ango meznê eşîrê berdest bike, wî weke rêberekî bikartîne. Meznê daristanê yê bi navê ***Huva- va,*** dema ku tê girtin, Gilgamêş navê bikuje û dixwaze ku wî bikar- bîne, lêbelê Enkîdû digel ku wî nas dike û belkî jî xizimê wî ye, vê yekê xeter dibîne û dibêje "em wî bikûjin". Ji wê rojê ve, hevkarên Kurd ev ji xwe re kirine rê ku, serokên êşîrê û welat diparêzin ber- destî dijmin bikin. Ev helwest û polîtîkaya ku ji qeran qeranparêz- tir, ji dema Gilgamêş ve, ji Enkîdû û heta bi dema me didomîne.

Digel vê yekê, gelê ku li hember dagirkeran timî li berxwe daye û ji ber vê yekê ji fonnê eşîrtiyê derbasnekiriye, bûye pêrêzvanê zi- man, çand û welatê xwe. Hevkarên serdest, ziman û çanda dagirke- ran li nava malbatê xwe bikartînin û gelê ku çand û zimanê xwe di- hebîne jî piçûk dibînin û weke kûsiyê ku qalikê xwe neacibîne zi- man û çanda xwe naecibînin. Ev rastî dide nîşandan bê çima Kur- diya ku zimanê şoreşa neolîtîkê, ewqasî pêşvenaçe û rave dike bê çima weke devokên gelek eşîran cuda cuda tê peyvandin. Heger ku zimanek û çandek di rewşa zimanê perwerdeyî de, birêxistin nebe û pêşveneçe, Jênereve ku yê di nava demê de ji holê rabe. Digel vê helînêriya demê jî, zaravayên Kurdî ku bi awayek bihêz liser lingan dijîn, bi saya komên gel ên berxwedanvan ku rola xwe bi serbilindî lîstine. Herçiqas ku çîna wan a serdest bêesil û bêkesayetî bûye jî, ev rastiyeke din e ku gelê Kurd azad û esîl maye. Mînak, Yên ku Sumer, Misir, Grek û Roma afirandine, serokên çîna serdest û mê- tinker in. Evan gelê xwe helandine û ev rola xwe lîstine. Di nava Kurdan de, çîna serdest timî ji vê rolê reviya ye, debara xwe û ya malabata xwe û mezinkirin û rizgarkirina wê ya bi piçikan (firdik), weke polîtîkaya cîhanê ya bingeh dîtiye. Heger ku ev rola wan ne diyarkerbe jî, weke kartêkereke girîng nîşan dide bê çima Kurd ne gihane şaristaniyên bihêz.

Digel van neyîniyan jî, rola Kurdan di serdema pêşî de, gîrîngi- yeke mezin hilgirtiye ser xwe. Mîna tê ravekirin,weke herêma ku belavbûna bingeh û sentezê, guherînên şaristanî, derawaya wan a di warê kişandinê de û erka wan mezin e. Kurd gel û çandeke bingeh ji yê ku serdema pêşî afirandin e. Di hemû şaristaniyên ku li îran,
Anatolya, Rojhilatê Derya Spî û Mezopotamya jêrîn hatine damez-

randin û di dewletbûnên navendî de, rola çalak lîstine û hevparî ki- rine. Di derawaya rêveberî û kannendiyê de, suxre kirine. Di têgi- hîştina dîroka Kurd de, ev taybetmendî girîng in. Hevpariya wan a bi cîranên wan re damezrandina dewlet û şaristaniya hevpar, taybe- tiya diyalektîka bingehîn a dîroka Kurd e. Di dîrokê de çêbûnên Kurd ên xweser, gelekî hindik in. Lêbelê di her çêbûna nava cîra- nên wî de bi teqezî roleke wî heye.

Taybehnendiyeke din a Kurd, binyata wan a bi fonnasyona eşî- rên berxwedanvan ku ziman û çandê diparêzin û yekîtiyên siyasî yên federal in. Dîroka Kurd a serdema pêşî û ya di pey re, di bin van forrnên sereke de were lêkolîn, yê nêzîkbûneke rasteqîntir be. Lewra orîjînalîteya wî wiha ye. Dîrokeke kurd ku me di serê xwe de lihevanîbe, qet çênebûye. Eslê wê dîrokeke wisa ku pesnê xwe pê bidin jî, ne dabaşa xeberdanê ye. Bi dewlet û şaristaniyên ku ser- destên koledar damezrandine, qet şanazî nabe. Encex mirov zende û dersê jê bigire. Ji aliyê gelan ve, nêrîneke bi vî rengî ya li dîrokê, gengaz dike ku mirov bêhtir rastiyan bibîne, dadmend be û bi nir- xên azadiyê ve girêdayî be. Ji dêvla ku mirov bi wesifdan an jî bi berketin nêzîkî dîrokê bibe, nêzîkbûneke bê rola ked û azadiyê û herwiha rola afirîneriyê çiye, di kîjan pêvajoyê re derbasdibe û di encamê de rê li ber çi vedike, yê bêhtir hînker be. Herwiha dîrok ê wateyeke mezin bigire û jibo afirînerên dîrokê yên rast, rola herî ro- nahîker yê were girtin.

Kurd, çanda afirîner a serdema neolîtîka pêşî, temsîl dikin. Ji xwe, ziq mayina wan a liser dema neolîtîkê, jiberku bi hezar sa- lan ev rol bi kûrahî lîstine. Weke ku hemû hêza xwe di afirandina şoreş û civaka neolîtîkê de qedandine. Gelek û çandekê, çiqas ku şêweyeke civakî bi kûrahî û domdirêj jiyabe, di şêweyên piştî vê, li paş maye. Dema ku em bûyer û dîroka kord lêkolîn bikin, pê- wîst e vê rêzika gerdûnî timî li ber çavan bigirin. Saristaniyên ci- hêreng, bi gelemperî hêzên teze pêşvedibin. Di serdemên feodal û yên nêzîk de, rola Kurdan pir kêm dibe, di serdema pêşî de, rew- şa ku tê de yê berdewam bikin. Di destpêka mirovatiyê de, gel û çanda bi şeml û afirîner, çiqas ku diçe, yê bişibe dayîkeke bite- men. Zarokên wê yên ku anîne cîhanê û di dergûşê de mezinkirin û mirovatî, yê wê nasnekim. Trajediya dayîka Kurd ev e.

Ev tra- jedî di roja me de jî, bi awayek qehrker tê jiyandin, li hember xiyaneta vê dîroka ku bi destê xwe afirandî, dibe pirsgirêkeke me- zin ku xwe bide naskirin û mafê xwe bixwaze. Weke rawestina xemgîn a dayikê, li hember lawê bêxêr.

Weke encamê, Kurdan di sazûmana koledar a serdema pêşî de, weke welat û gelê derdora navendên bihêz, rola xwe lîstine. Di çê- bûn, pêşveçûn û belavbûna sazûmanê de, bandorker bûne. Jiberku di nîvê dewletên koledar ên girîg de mane, timî bûne mijara dagir- keriyan. Vê rastiyê, giregirên eşîrê zorî hevkariyê kirine û gelê din ê sereke di nava xwe de girtî maye û berxwedanvan bûye. Dewle- mendiya erdnîgariya wê ya di warê kan, çandinî û ajalvaniyê de, di çêbûna vê statuyê de, rola diyarker lîstiye. Siftbûna pêkutiyên der- ve û binyata eşîrtiya hişk, çêbûnên siyasî yên pêşveçûyî û payîdar asteng kirine. Bi zêdeyî, pêvajoyek hatiye şopandin ku, bi federas- yonbûna eşîran ve girêdayî, bi organîzasyonên siyasî yên domkin û bêbiryar ku tên damezrandin û jevdikevin, bi encam dibe. Di vê de, berjewendiyên eşîrê yên teng û hişmendiya wê rolê dilîze. Digel ku qismê raser weke hevkarê navenda şaristaniyên biyanî, di nava ci- vaka koledar de cîh digire, gel bi şêweya komên eşîran, di mercên civaka neolîtîk ên azad û wekhevî de, jiyana xwe berdewam kiriye. Di vê bingehê de, weke hêzeke etnîk a Rojhilata Navîn, di zayîn û pêşveçûna feodalîzma Rojhilata Navîn de, cîh girtiye,

**c- Di Serdema Feodal de Kurd**

Di diyalektîka civakan a dîrokî de, rêzikek timî çalak e, Ew jî ku rêxistineke neteweyî, bi kîjan kartêkerên bingehîn ên der û hundir ve girêdayî, derketibe holê, ev ê heta dema rêxistineke civakî ya nû, di bin van kartêkeran de xebata xwe bidomîne. Ev pêdiviyeke diya- lektîka civakî ye. Mercên der û hundir ên ku erka tez û antîtezê tî- nin cîh, heta ku bi sentezekê bi encam bibin, wê rola xwe bi çalakî berdewam bike. Çiqas ku civak bi xweferzkirinên kêyfî ji pêvajoya pêşveçûna wan neyên hiştin, wê li hember mandelekirin û şewşan- dinê jî, hebûna xwe bi israr berdewambikin. Hêz û pêvajoyên bê hişmend, ji ber nezaniyan çiqas ku zorker bin jî, yê ku encamê di- yar bike, kartêker û taybetiyên di bingeha pêşveçûnan de ne. Hêza zêde dikare hilweşîne, lêbelê ti pêşveçûnan

heger ku bişewşîne jî, nikare berdewam bike. Kartêkerin bingeh ên pêşveçûnê, derawaya wê ya taybetiya hundirîn di nava dorhêlê de ku serdestî bûyerê ye.

Dema ku em taybetiyên bingeh ên di bûyera Kurd de û dorhêla ku pêve girêdayî binirxînin, pêwîst e em vê rêzika diyalektîk timî li ber çavan bigirin. Taybetiyên çêbûnê yên di serdemên neolîtîk û koledar de û dorhêla ku di nava wê de hereket dikin, weke ku yê bandora xwe di serdema navîn de jî bidomînin, heta ku di roja me de şibandin veguherînên binyatî pêkbînin jî, yê berdewam bi- ke.Kurd jibo ku xwe ji vê yekê rizgar bikin, an divê ji binî dev ji xwe berdin û cihêreng bibin an jî divê ku ji alyê fîzîkî ve werin ti- nekirin. Dev ji xwe berdan hêsanî çênabe. Tinekirinên fîzîkî jî, en- cex sepînên bisînor bin. Tişta dimîne ev e ku, ji statuya dirizîne û radiwestîne, an bi şoreşên bi binyat an jî bi nûsaziyên nenntir ve- guherînên peresînî bijîn û derbasî pêvajoya nû ya xebitîna diyalek- tîkê bibin. Tişta ku dexma xwe li bûyera Kurd daye, li hundir erd- nîgariyeke ku jibo parastinê bikêrhatî û ji derve timî dibin hêrîşan de ye, li gor van herdu mercan, di bin fonn û hişmendiya eşîrên teng de, weke rastiyeke gelêrî dijîn. Taybetiya erdnîgariya bikêr- hatî, weke ku rêya afirandina neolîtîkê ji wan re vekiriye, dagirkerî jî derandine holê. Bikêrhatina di warê çandinî û ajalvaniyê de, ji aliyekî ve civakê pêşvedibe û ji derve jî temayiyê hişyar dike. Dew- lemendiya kanan, jibo şaristaniyên ku pêdivî bi kanê hene, yê bibe annanca dagirkirinê. Di damezrandina şaristaniyê de, van kartêke- ran digel ku şêwe dane bûyera Kurd, di roja îroyîn de jî, ev rol li gor cudahiya derdorên derveyî, bi guherîn berdewam dike. Dema ku kartêkerên derveyî, di diyarkerbûna înisiyatîfên hundirîn de bi- bin asteng, guherîn ê ji çavkaniyên derveyî be û li hundir yê bi pêş- veçûneke bindestî bizav bide. Ev rêzika ku di serdema pêşî de di- xebitî, yê di serdema navîn de, hîkarîkertir bidomîne.

Ji feodalbûneke Kurd a biserê xwe, nayê xeberdan. Qerantiya Komagene, weke şaristaniya dawî ya mezin a serdema koledariya klasîk, dema ku di bin sazûmanên koledar ên Roma û Sasanî de PZ di salên 250an de hilweşiya, bi şûn wan ve, rêveberên bajêr ên ku ji hevkarên di rola kannendiyê de û civakên eşîran ên azad ku ve- kişiyane çiyan,

dimînin. Liser Mezopotamya jorîn, qayîşkêşiyeke mezin, lihevxistin û pêvajoyeke hilweşanê tê jiyandin. Herêm û ba- jar, timî dest diguherin. Dema ku fersend çêdibe û teraz musaîd di- bin, cama begîtiyên serbixwe tên damezrandin. Şêweyên otonomî- tiyê, di dîrokê de qet kêm nabin. Lêbelê ev jî rastiyek e ku ev oto- nomî ji rêveberiya eşîrekê wêdetir derbasnebûne. Dema lihevxisti- na Roma-Sasanî, heta bi hilatin û belavbûna îslamtiyê berdewam dike. Tê zanîn ku ev herdu împeretoriyên klasîk, li hember îslamti- yê bi awayek lezgîn jevketine. Di vê de kartêkera herî diyarker ev e ku, îslamtî derfetê dide veguherîna sazûmana şaristanî ya şêweya civakeke raser ku em dikarin bibêjin feodal. Hemû raveyên din, en- cex bi vê sedema sereke ve girêdayî, dikarin bi wate bibin.

Di pirtûka yekem de, jiberku min dahûrandina îslamtiyê di asta terîfkirinê de pêkaniye, ez li vêderê dubare nakim, lêbelê tenê ezê hinekî bibîrbînim. Binavkirina serdema îslamtiyê ya bi serdema fe- odal, rast e. Ji ber cudahiyên erdnîgarî û dîrokî, pêwîst e em cihê- rengiyên wê yên ji feodalîzma Rojava, li ber çavan bigirin, bi vê şê- weya xwe ya şaristaniya feodal, liser tevaya herêmê yê bandora xwe bike. Dema ku em têne PZ salên 650an, erdnîgariya ku Kurd liser cîwarbûyî, ji aliyê fetihkerên îslamê ve tên berdestkirin. Îslamtî li qadên çandinî yên berfireh û li navendên bajaran serdes- tiya xwe dadimezirîne, lêbelê li qadên çiyayî berxwedana kevne- şopî berdewam kiriye. Dema ku hê tennê damezirînerê îslamtiyê, Hz Mihemed li erdê û nakokî û lihevxistin destpêdikin, bi kuştina Hz Hiseyn û xizimên wî yên li Kerbelayê, dikeve pêvajoyeke nû. Emewî yên civaka kevin ku beşek ji ya serdestên federasyona Qu- reyş, bi bidestxistina desthilatiyê re, ji bilî beşên xizan û Ereban, pêkutiyeke giran liser gelên din tê meşandin. Iran di bingeha şaris- taniya bihêz a kevin de, li hember vê pêkutiyê, li cem aliyê Ehlî- beyt (Hz Mihemed, Hz Elî û derdorên wan) cîh digire, îslamtiyê ve- diguherîne li gor mercên xwe û bi şêweya şîatiyê bersiv dide. Ev berxwedan, mînaka yekem a veqetîna îslamtiyê ya bingehîne û ve- guherîna wê ya li gor mercên cîgeyî ye. Bersiva ku kurdan daye vê yekê, digel di qadeke bisînor de be jî, bi şêweya elewîtiyê pêkhati- ye. Li deşt û navendên bajaran, sunnîtiya malbata Emewî ya dest- hilatdar ku

şîroveya wan a îslamtiyê, serdest e. Di serî de di nava ereban de û dûv re, di nava gelek qewman de, veqetîn û dabeşbû- neke bi vî rengî pêşvediçe. Di bingeha vê veqetînê de, civakîbûna nû û çêbûna çînan heye. Ji civaka bi şêweya koledar ber bi civaka bi şêweya feodal, veguherînek tê jiyandin.

Ev yek gelekî girîng e ku terîfkirina îslamtiyê, di vê çarçovê de bête kirin. Hewldanên ku îslamtiyê bi serê xwe bi dogmayên olî rave bikin, yê were wateya ku rastiyê hê bêhtir bikemn bikin û tê- xin nava tarîtiyê. Serdestiya feodal, ev raveyên dogmayên olî yên îslamê, weke ku gotinên xwedê yên neguherî bin pêşkêş dike û li- ser gelên Rojhilata Navîn, bi sedsalane ku serdestiyeke bîrî û sincî damezrandiye. Îslamtî, sêyemîn derketina çîna bazirgan a li Nîvgirava Erebîstanê ye. Qebîleyên ereb ên ku bi bazirganiya di navbera Misir, Mezopotamya, Yemen û Habeşîstan de mezin di- bin, pêdiviya yekîtî û bihêzbûna siyasî bi derketina îslamtiyê tîni- ne cîh. Ev pêngava şaristaniya dawî ya binyata Semîtîk e. Herî bêhtir, qebîleyên ereb ên ku bi şaristaniyê ve ne girêdayî, di bin navê îslamtiyê de didine hev û tînine rewşa hêza şaristaniya feo- dal. Bi awayekî berbiçav qewmitiyê bihêz dike. Ramana yekîtiya ku têgihîna qebîleyê derbasdike, di îslamtiyê de pir bihêz e. Ji ber vê sedemê, qebîle û eşîrên ku di serdema navîn de, ji giyaneke ye- kîtiyê dûr bûn, di kevine nava girêdanên qewmî yên nêzîk. Qewm, kategoriyeke feodal a serdema navîn e. Rewşeke di nav- bera etnîsîte û netew de digire. Girêdana zêde ya bi ax û bazirga- niyê ve, zemîna daringî ya yekîtiya qewmî bihêz dike. Esîlên axê yên feodal û bazirganên bajaran, di vê dorhêla qewmî de, têne rewşa xwediyên desthilatiya bihêztir. Pêşxistina emewiyan a qew- mîtiya ereb, ji ber vê sedema daringî ye.

Qewmîtî, hê bêhtir di nava beşa raser de pêşveçûye. Di vê demê de erebtî, kirine sedema rûmet û serdestiyeke dilînî. Nijadperesti- yeke (şovenîzm) neteweperest hatiye jiyandin. Hewldane ku di bin kemna îslamtiyê de, him çîna serdest û him jî netew di nava hev de bidin jiyandin. Di îslamtiyê de, yên desthilatdar, bi gelemperî ji ne- teweya ku jê hatin re, avantajan çêdikin. Di îslamtiyê de, çînên ser- dest ên Ereb, Fars û Tirk ku têne ser desthilatiyê, di veguherandina komên neteweyên xwe yên etnîk ku bînine rewşa qewmên pêşketî de, rolên mezin lîstine. Kesên ku bi ziman û çanda xwe di desthila- tiyê de cîh negirtibin, paşde mane.

Di navbera bûyera etnîk û bûyera qewmî de, cudahî heye. Etnî- sîte herî bêhtir fonna civakî ya serdema neolîtîk û koletiya serdema pêşî ye. Hemû civak di rewşeke wisa de ne ku her yekî di nava ko- meke etnîk de cîh digirtin. Di vî babetî de, heyîna etnîk, kategori- yeke dîrokî û bûyereke berbiçav e. Hişmendiya etnîk, di merhale- yeke cuda de tê rojevê. Bi gelemperî li hember hêzên şaristaniya koledar, di nava pêdiviyên yekîtî û parastina qebîle û eşîran de, pêş- vediçe. Heyîna bûyera etnîk diçe heta bi BZ 10 OOOan, hişmendiya etnîk jî, ji salên BZ 3000an û pêde li hember hewldanên kolekirin û bindestkirinê, pêşvediçe. Heta bi serdema navîn tê û piştre hewl dide ku hêza xwe biparêze. Di bihêzbûna eşîrtiyê ya li Rojhilata Navîn de, ev rabirdûya dîrokî rola bingeh dilîze. Jiyana eşîrtiya kûr a di nava kurdan de, jiberku afirînerên civaka neolîtîkê ne, ev serdem se- ranser jiyane, û di pêvajoya serdema pêşî ya koletiyê de, li hem- ber hêrîşên derveyî liberxwedane. Sedemên eşîrtiya Kurd ên dî- rokî, civakî û siyasî pir berfireh in. Bi dahûrandineke kûr, yê hê bêhtir were fêmkirin.

Qewm, bi giranî weke kategoriyeke feodal a serdema navîn, et- nîsîte, weke fonneke civakî ya ser eşîran re, derdikeve holê. Girê- dana bi axê re, girîngiya bazirganiyê ku pêşvediçe û jiyandina sift a yekîtiya siyasî, pêşveçûneke ji girêdanên êşîrtî ber bi girêdanên qewmîtîyê pêkaniye. Di vî babetî de îslamtiyê, rê li ber bandoreke bihêz vekiriye. Rola ku kapîtalîzm di netewebûnê de lîstiye, îslam- tiyê di neteweyîbûn û qewmbûnê de lîstiye. Çawa ku neteweperes- tiya zêdekar, weke meyldariyeke beşên paşverû û herî rastgir ên ge- merdêrên darayî,

derketibe holê, qewmîtî jî di îslamtiyê de, weke meyldariyeke ku ji aliyê esîlên axê yên herî rastgir û paşverû û çî- na bazirgan ve tê pêşkarîkirin, di nava neteweyên serdest de pêşve- çûye. Heger ne vekirî be û bi kemn be jî, ev meyldarî di îslamtiyê de heye û bihêz e. Li qasî ku berbiçav e, ewqasî xwe di planên ne- berbiçav de jî, nîşan daye. Hz Mihemed, hê di saxîtiya xwe de vê xeteriyê dibîne û wiha dibêje: *"Serdestiya erebeki ji yekî ecem, ji perstîşa wîpêde ne tiştekî din e"* Hişyariyeke bi vî rengî, Lenîn jî di saxîtiya xwe de jibo şoventiya rûsan a mezin kiriye. Li nav ere- ban şoventiya qewm û eşîrtiyê, weke naverokeke têgîna *"eshabti- yê",* bi şêweya dilîneke bihêz tê jiyandin. Pêşveçûna dilînîtiya eşî- rê ya zêdekar jî dabaşa xeberdanê ye. Şoventiya êşîrtî, di civakên etnîk ên qewm û netewayan de, heyîne xwe bi awayek hêzdar di- domîne, cama derawaya xwe ya xweparastinê derbasdike û hêrîş- ker dibe. îslamtiyê xwestiye ku bi taybetî bi destê Hz Mihemed vê dilîniyê bişkîne, lêbelê bi temamî serfiraz nebûye. Di xanedan, qe- bîle û eşîrên serdest de. Anîne asta ku xwe hê bêhtir esîl bidin nî- şandan û pejirandin.

Lêguncandina îslamtiyê, ji aliyê gelan ve ya li mercên cîgeyî û çandê, rê li ber çêbûna gelek terîqet û mezheban vekiriye. Di çan- dên Rojhilata Navîn de, bi taybetî piştî Imperetoriya Asûr, pêşveçû- neke ji yekîtiyên etnîkî ber bi yekîtiyên terîqetan ve, xwe nîşan di- de. Ev yekîtiyên ku yekem car BZ di salên 500an de berfireh dibin, dikevin kategoriya bawerî û ramanê. Mirovên ji her qebîle û her qewmî, yekîtiyên bi heman raman û baweriyê û bi heman helwesta sincî, dadimezrînin. Gengaz e ku ev yekîtî, weke şêweyek rêxisti- bûnên hoveber ên bindest û ên ku tên mêtin, bêtin terîfkirin. Beşên raser ên qebîle û qewman, di nava dewletan de xwe bi rêxistin di- kin, tebeqeyên binî jî, tenêtî û bêçareyiya ku dijîn, dixwazin ku ji hişmendiya etnîkî cudatir, bi nerîn û baweriyên mîstîk ên nîv ve- şartî, derbasbikin. Ev dikarin weke mînakên partîbûnên dijber ên pêşî û hoveber jî, werin nirxandin. Ev weke mînakên rêxistinên xi-

zanên bi baweriya mîstîk ên nîv veşartî ne. Felsefevaniya Grek, zanyariya Mezopotamya û saziyên pêxembertiyê, şêweyên vê meyldariyê yen pêşveçûyî ne.

îsa bi xwe jî, di bandora terîqeteke xizan a bi navê ***Essenî,*** ku beriya wî derketiye holê de maye. Di navbera salên BZ 500 û PZ 500an de, berî ku xiristiyantî û îslamtî bi temamî serdest bibin, demeke terîqetên bi vî rengî dabaşa xeberdanê ye. Mînak di cîha- na Grek û Roma de, di serî de Stoaparêzî, komên baweriyê yên bi vê şêweyê, mirovan dikişînin. Li Mezopotamya, derketineke bi- hêz a vê demê tevgera Manî ye. Ev meyldariya ku BZ di salên 250an de zelal dibe, ji xiristiyantî, Zerdeştî û Bûdîzmê sentezekê derdixe holê û xwestiye ku ronesansekê bafirîne. Ev di destpêkê de, gelekî bandorker bûye. Manî bi xwe, xwestiye ku bi vê bawe- riyê ji paytexta Sasanî ***Ktesîfonê*** heta bi Roma nehiyeyeke aşitiyê damezrîne. Tê zanîn ku ew ne alîgirê şer e. Dixwaze ku senteza Komagene ya berî xwe, kûrtir bike û bide domandin. Lêbelê rahî- bên Sasanî yên ku berjewendiyên wan di şer û dijmintiya navbe- ra serdestan de, bi komployeke hovane wî dikûjin û teroreke me- zin liser emdamên wê didin meşandin. Heger ku Manî serfiraz bû- bûya, belkî pêngaveke şaristaniya bi şêweya Ewropa, ronesansa Rojhilata Navîn çêbûbûna.

îslamtiyê bi xwe jî, ji mezhebekî bi baweriya yek xweda yê bi navê ***Hanîfan*** ku li Mekkeyê hîkarîker, sûd wergirtiye. Hz Mihe- med, ji xiristiyantî, cihûtî, hanîftî û mecûsîtiyê, gelekî sûd wergir- tiye û îslamtî weke sentezeke van raman û baweriyan damezrandi- ye. Islamtî di derûna xwe de, di encama peresîna van bawerî û ra- manan de, di bin mercên nû de jiberku pêdiviyên demê yên aborî, civakî, siyasî û hiqûqî bicîh danîn, pêşveçûneke mezin nîşan daye. Di pişt de, cîhaneke raman û baweriyê ya bi vî rengî ku hêzdar he- ye. Di vî babetî de, Hz Mihemed him nûsazîparez û him jî şoreşge- rekî mezin e. Di dîrokê de, ji dema navbera BZ 500 û PZ 500an re, serdema bawerî û raman a mezin, tê gotin. Sedema vê jî ev e ku, hemû bawerî û ramanên felsefî û sincî yên ku bandor li qedera mi- rovatiyê kirin, ji aliyê damezrînerên wan ên mezin ve, di vê demê de li holê hatine danîn û hatine pêşvebirin. Gengaz e ku em jibo vê demê, bibêjin serdema ekolên raman terîqetê. Digel ku van raman û terîqetan ji hev bandor girtine jî, di rewişteke orîjînal de ne.

Bê- şik, ji mîtolojiya serdema kevin a berî xwe bandor girtine. Zayîna wan a weke bizavekê, encama vê bandorgirtinê ye. Bawerî û rama- nên koledar ên serdema kevin ku hişk û dogmatîk, pirsiyar kirine û sazûmana xwe pêşvebirine. Li Rojhilat ji Konfuçyûs, Bûdha û Zer- deşt, li Rojava heta bi Sokrates, serdema klasîkên hêzdar ên bi vî rengî, bingeha bîrdoziyî û mirûz a ku koledarî were derbaskirin û şaristaniya feodal pêşvebiçe, çêkirine.

Di dema PZ salên 500-1500an de, serdemeke baweriya hêzdar a ku îslamtî, xiristiyantî û bûdîzm diyarker dike, dabaşa xeberdanê ye. Ev dem, serdema feodal e. Di vê demê de, bingeha bîrdoziyî ya sazûmana ku tê damezrandin, bi baweriya yekbûn û heyîna xwedê, tê annanckirin ku ev serdem bêdawî û payîdar bibe. Weke her ser- dema ku xwe sazûmana pêşî û dawî dide nîşandan, serdema feodal jî, xwestiye ku xwe di çarçova bîrdoziya bi yekîtî û heyîna xwedê ve girêdayî de, payîdar bike. Di bingeha vê dema ku weke serdema baweriya hişk tê nasîn de, ev rastî heye. Di derûna têgihîn û bawe- riya “xwedayê bêmirin û sazûmana payîdar” de, têkiliyên reveberî û mijokatiya civaka biçîn veşartî ne. Maskekirin û nîşandana vê ya weke fennanên pîroz û destlênedayî, jibo sazûmana berjewendiyan a ku jê re tê perstîşkirin e. Tişta ku dixwazin nemir û payîdar bikin, di kesayetiya xwedê de, serdestî û berjewendiyên wan e.

Dahûrandina têkiliya di navbera neqşên bîrdoziyî û rêveberiya pêkutî û mijokatiya çînî de, pêşkêşkirina vê bi awayekî ronahîker a jibo kedkar û bindestan, peywireke ronakbûn a ku di serî de tê ye. Heta ku serdema baweriya hişk a hezar salan neyê dahûrandin, ra- vekirina rastiyan bi gelemperî li tevaya cîhanê û bi taybetî li civa- kên Rojhilata Navîn û gihîştina têgihîneke dîroka rast û civakê, gengaz nabe. Bi nirxdaraziyên laiktiya sexte û bi yên baweriyên kor, serdema baweriya hezar salan, ne tê dahûrandin û ne jî tê fêm- kirin. Lêkolîna van dogmayên baweriyê weke rista belgeyên dîrok û wêjeyê, dahûrandin û derxistina holê ya rastiyên çînî, siyasî û ci- vakî ku vedişêrin, mercê herî jêneger ê ronakbûna Rojhilata Navîn e. Laîktiya ji çavkaniya Rojava ya serveyî û vebûna li cîhana bawe- riya ku dixwazin zindî bikin, di rewşa astengên valaderxistina van peywirên dîrokî de ne. Ya rast ev e ku, hemû

şaristaniyên Rojhila- ta Navîn, di serî de hemû belgeyên dewlemend ên mîtolojîk û olî, hemû çavkaniyên bîrdoziyî û şûnwamasî, hemû cureyên çavkani- yên wêjeyê, bi rêbaza dahûrandina zanistî dest bavêjin wan, ji vira çêbûn û guherîna aborî, civakî û siyasî ya civakê rave bikin.

Bandora îslamtiyê ya liser kurdan, di nava çarçova sereke de ye. Tebeqeyên eşîran ên raser û begîtiyên axê, beşên ku herî pêşî tes- lîm bûne û bi xanedaniyên emewî û abbasiyan re têkiliyên xurt da- nîne, şîroveya îslamtiyê ya sunnîtiya fennî pejirandine û hemû tê- kiliyên xwe li gor desthilatiyê birêkûpêk kirine. Ji aliye ziman û çandê ve, ketine bin bandora erebî. Navên xwe, şêweya jiyana xwe û binyata xwe jî bi ereban ve girêdane û xwe mandelekirin çêtir li gor berjewendiyên xwe dîtine.

Di demên serdestiya ereban a li herêmê de, di şaristaniya feodal de pêşveçûn pêkhatiye.Welat seranser li gor peyvnasiya Ereb tê bi- navkirin, yekem car Kurd bi ***Ekrad*** binavdikin. Digel ku kurdan mandele nakin jî, qulpekî bi rabirdûya wan ve dikin û girêdana wan a bi xwe ve, ji siyaseta xwe re çêtir dibînin. Bi beşên sunnî re, ye- kîtiyên têkilî û têgihînan gihane asteke bilind. Li qadên berhemdar ên herêmê, bi taybetî li derên avî û peravên çeman, nifûseke Ereb a mezin tê cîwarkirin. Heta bi pesarên torosan belavdibin, di nava zi- man û çanda Ereb de, bişavtin gelekî pêşvediçe. Li hember vê ye- kê beşên xizan û yên ku li çiyan dimînin, berxwedanvaniya xwe di- parêzin, li hinek qadan di gotinê de îslamtiyê dipejirînin, lêbelê ba- weriyên xwe yên xweser û jiyana xwe parastine. Beşa ku di vê bin- gehê de helwesta xwe nîşan dane, herî bêhtir bi şêweya kurdên elewî cîgeyî bûne û islamtiyeke bisînor a ku li mercên wan gun- candî pejirandine. Ev jî ne bizorê, ji ber bêmafiya ku li ehlîbeyt hatî kirin, bi xwesteka xwe kirine. Elewîtiya Kurd, nêzîkbûneke ku te- kiliya wê bi îslamtiyê re herî hindik e. Herwiha weke mezhebekî jî nayê. Elewîyên Kurd, hinek hêmanên îslamtiyê yên bi erênî, jibo dewlemendkirina jiyana xwe standine û xebitandine. Lêbelê pêla xwe nedane dogmayên olî yên hişk. Bi vî aliyên wan em dikarin bi- bêjin ku, aliyên îslama sunnî yên paşverû red dikin û bi xûnifandi- na aliyên wê yên erênî, helwesta xwe ya herî birûmet nîşan dane. Elewîtî, heger ku vê nêzîkbûna xwe hemdem bike û bigihîne şîro- veyeke zanistî, yê di ronakbûnê de roleke mezin nîşan bide. Ele- wîtî, mijokatiya çîna

serdest a di sînga îslamtiyê de dibîne û di wa- rê lihemberderketinê de, roleke mezin dilîze. Kêmasiya wê ev e ku, şîroveyeke bîrdoziyî ya hêzdar pêşvenabe û ji asta terîqetên dilînî û hoveber derbasnabe.

Zerdeştîtî, li hember îslamtiyê, beşa kurdên herî bibiryar û berx- wedanvan temsîl dike. Hêrîşa sift a bîrdoziya îslamê, pêkutiya wê ya polîtîk û aborî û ji ber sedema ambargoya wê, negihaye wê hê- zê ku rastiya xwe îfade bike. Bi vî aliyê xwe dişibe elewîtiyê. Lê- belê bi berdewamkirina hebûna xwe ya heta dema me, nîşan didin ku di jiyaneke zor re derbasbûne û ev yek berxwedana wan wate- dar dike. Ev hersê ezmûnên ku kurdan li hember îslamtiyê jiyane, jibo pêşveneçûna yekîtiyeke neteweyî, bûne kartêkereke herî gi- rîng. Dabeşbûna etnîk a ku ji serdema pêşî mayî û nirxên feodal ên biyanî ku li hevkariyê tên veserkirin, hê bêhtir rê li ber dabêşbûne- ke kûr û biyanîbûnê vedikin. Digel vê yekê, di asta çînçînîbûnê de pêşveçûn çêbûne. Çîneke girîng a feodal û bazirgan xwedî milk çê- bûye. Di asta wekhevî û azadiya binyata eşîrê de, nûhandin gelekî pêşketiye. Civak bi kûrayî li dabeşbûneke çînî rasthatiye. Li gor ajalvaniyê, girêdana bi axê ve û di warê serfbûnê de, pêşveçûn çê- bûne. Ji taybetiya civaka şivan, derbasbûyina civaka çandiniyê bi- hêztir bû ye. Berhemdariya deştên Mezopotamya, di vê de rola me- zin lîstiye. Di pêşveçûna çîna bazirgan de jî, pêşketin tên dîtin. Lê- belê yên ku dexma xwe li bazirganiyê dixin, bazirganên Ereb in. Ennen û Suryan digel ku ola xiristiyanî diparêzin jî, ketine rewşa hemwelatiyên çîna duyemîn. Lêbelê di bin mercên diyar de, di pa- rastina nasnameya olî de, azad hatine berdan.

Bi vî aliyê xwe îslamtiyê serdestên Kurd, li hember gelê xiris- tiyan, anîne rewşeke bihêz. Bi saya dewleta îslamtiyê, li dij van

gelan dibe xwedî gelek derfetan. Ji xwe şîroveya serdestên Kurd a îslamtiya sunnî, bi berjewendiyên wan ên daringî ve, ji nêzîk ve girêdayî ye. Bi van re, ol û berjewendiyên daringî di nava têkili- yeke hêzdar de ne, hemû taybetiyên xwe yên civakî ku berevajî vê yekê, di plana duyemîn de dihêle û bi hemû heza xwe, cîhgirtina li cem îslamtiya fennî, tîne rewşa polîtîkayeke bingehîn. Berevajî ku tê gumankirin ne jiberku ev gelekî bi dogmayên olî bawer in, bûne misihnan. Jiberku dizanin ê di bin kemna dogmatîzmê û di dorhêla baweriya hişk de, berjewendiyên daringî û hêzdariya si- yasî pêkbînin, pêdivî dîtine ku xwe bi îslama fennî ve bizeliqînin. Vê taybetiyê heta weke roja me bandora xwe domandiye. Ji dêv- la çîna feodal, çîna burjûva ya cîgeyî jî, hewl dide ku ji bîrdoziya îslamtiyê, di vî derbarî de sûd wergire. Mijar, ji temeziya (çarik) serî û jiyandina baweriyan a bi azadî zêdetir, ji veguherîna çîna burjûva derdikeve holê.

Bi îslamtiyê re, veguherîna ku di bîrdoziya serdema navîn de tê jiyandin, di derûna xwe de, merhaleya dawî ya pêşveçûna olê yek xweda ya ku bi mîtolojiya Misir û Sumer ve girêdayî ye. Dema vê bîrdoziyê ya herî saf, efsaneya zayinê ya şaristaniya Sumer e.Orîjî- nala wê ev e. Sazûmana koledar û mêtinker ku bilind dibe, weke ku pêwîstiyeke sazûmana ezmanî be û weke ku temsîla wê ya liser rû- ye erdê be, ravekirineke bi kemna mîtolojîk bingeh digire. Hemû kitekitên din, perstgeh û perestîş, erka ku sazûmanê li bîran serdest- bikin û di giyanan de bilind bikin, digire ser xwe. Navendên perest- gehên weke mizgeft, dêr, kenîşte (havra) û yên din, perestgehên Su- mer in. Perestîşên pêşî jî, li van deran hatine pêkanîn.

Duyemîn veguherîna vê bîrdoziyê ya girîng, bi şêweya olên yek xweda û nûnerê wan pêxemberan , kevneşopiya Brahîm pêkaniye. Lêbelê çiqa diçe tê çespandin ku, ji mîtolojiya Sumer û Misir bi awayek sift bandor girtiye. Bi xiristiyantiya ku ji sincparêziya Zer- deşt û felsefeya Grek bandor wergirtiye, versiyoneke sêyemîn, ve- guherînek tê jiyandin.Buyina îslamtiyê ya olê dawî û bûyina Hz Mihemedê pêxemberê dawî, dîtina Hz Mihemed a vê rastiyê û ji ber nirxandina wî ye. Berevajî ku tê bawerkirin, serdema mîtolojîk û ramana olî ku bi Mihemed re, dikeve pêvajoya qedandinê, bi vê peyvê hê bêhtir watedar

dibe. Pêxembertiya dawî, tîne zimên ku êdî ji îro û pêde bi ol û mîtolojî, rêvebirin û têrkirina mirov û civakan hêsan nabe. Ev nirxandineke rasteqîn e. Lêbelê îslamtiya ku piştî Hz Mihemed, veguheriye bawerhişkiyeke bi rêzikên hişk, ji ber berjewendiyên feodalên xwediyên axê yên nû û çîna bazirganan e.

Bi vî aliyê xwe îslamtî, dibe bîrdoziyeke herî kevneperest. Bi taybetî mirina Hz Mihemed, jiholêrakirina ehlîbeyt, di pey re bi xa- nedaniyên Emewî û Abbasî re, hatiye merhaleyeke paşverû ya hişk. Bi perçiqandina gelek terîqetên batinî yên ku gel temsîl dikirin, ta- rîtiyekê xwe berdaye ser şaristaniya Rojhilata Navîn. Dema di nav- bera sedsalên 10 û 12an de, demeke bîrdoziyî û polîtîk a mezin e ku dê teveya dîrokê bêxe bin bandora xwe. Weke tevgerên beşên xizan û bindestan, ***xaricî, hurremî, babekî, karmatî, haşîşînî*** û ***smayîliyan*** ên batinî ku derketin holê, him pratîk û him bîrdoziyî têkoşîneke mezin dane. Şêweyek sosyalîzma hoveber temsîl kirine û jiyane. Lêbelê şêweya feodal a ku pêwîst bû hêzên hilberîn û tê- kiliyên wê werin jiyandin, jiberku rola xwe bitemamî nalîze, serfi- raziya van tevgeran gengaz nebûye. Lêbelê dîsa jî di dîroka têkoşî- na wekhevî û azadî de, cîhekî wan ê mezin heye.

Navendeke sereke ya van têkoşînan jî, qadên ku Kurd bisiftî lê dijîn e. Serdestên Kurd tevlî îslama Sunnî ya fennî dibin, girseya gel a sereke di van tevgerên Batinî de, rola mezin lîstine. elewîtî û zerdeştî, ji van têkoşînan ên ku liser lingan mayine ne. Ji PZ sedsa- la 12an heta weke îro, bi girtina deriyê îçtîhadê (nîqaş, gengeşî), di dîroka Rojhilata Navîn de, demeke herî tarî vebû ye. Liser bîrûba- werî û cîhana giyanî ya mirov û gelên Rojhilata Navîn, di bin navê rêzikên olî de, dogmaparêziyeke kor a herî paşverû ku di ti demên dîrokê de nehatiye dîtin, demeke çewsandinê rastîtî bidestxistiye. Şaristaniya Rojhilata Navîn ku dikeve pêvajoya paşdeçûyin û hil- weşanê, bi vê girtina bîrdoziyî û pêvajoya tarî ve, ji nêzîk ve girê- dayî ye. Heta weke roja me jî, vê serdestiya xwe berdewam dike.

Ev yek diyar e ku şîroveya sunnî ya bîrdoziya îslamtiya serdema navîn, liser cîhana menewî ya Kurd, roleke neyînî lîstiye. Ev rola ku bi destê axayên axê û serokatiyên eşîran ên tebeqeya ser ku bi- rêxistin bûne tê meşandin, ev neyînî gihandiye pêkutiyeke perçiqî- ner û

cîhaneke tarî. Kevneşopiya zanyariya gel û bandora tesewûfê jî çiqas çûye kêm û bê esil bûye. Rêxistinbûna bawerî û ramana zer- deştî û elewîtiyê ya bi heman şêweyê û malbatên hevkar ku têne serî, rêya ronakbûna ku ji van coyan xweyî dibû û ya azadiyê jî tê xitimandin. Bîrûbaweriya wekhevîxwaz û azadîxwaz a ku gel ji ci- vaka neolîtîk ve qezenc kirî û binyata wî ya giyanî, çiqas ku çûye di tarîtiyê de xerq bûye, ji aliyê viyanê ve jî, di bin navê teslhnbû- na qederê de, ji sazûmanê re serê xwe daniye. Rûxandina serdema navîn a liser gelê Kurd ev e ku, qederperestî kiriye felsefeyeke bin- gehîn. Propagandaya mezin a olî, bi esasî ev rol lîstiye. Dahûrandi- na vê rola bîrdoziya fennî ya bikûrayî û nîşandana encam û alter- natîfên wê yên jibo gel, peywireke ronakbûnê ya ku bingeha rone- sansa Rojhilata Navîn digire ye.

Rêxistinbûna polîtîk a serdema navîn, liser kurdan rê li ber pêş- veçûnên girîng vekiriye, dema begîtiyan vekiriye. Tebeqeya Kurd a raser, ji dema Sumer ve, hînî begîtiya cîgeyî bûye. Bi vê rêbazê, ji aliyekî ve xwe weke çîna serdest, bi komên eşîr ên binî dide peji- randin, li derve jî bi efendiyên xwe re di nava têkiliyên siyasî û aborî de, cîh ji xwe re çêdike û berjewendiyên xwe timî pêşvedibe. Bi vî aliyê xwe roleke resene û sereke qezenc dike. Ji dêvla çîneke serdest a serbixwe ve, bindestiyeke ku di nava xwe de xwedî oto- nomî be, bi hişmendî çêtir digire. Serdestiya bi serê xwe, him li der û him li hundir gelek belayan tîne serê wî, rê li ber talankirina wî vedike. Him serhildana gel û him jî dagikerên biyanî, rihetiya jiya- nê ji wan re nahêlin. Bersiva ku dibînin, nimûnaya hevkarî ya ku di hundir de xwedî otonomî ye. Esasê wê, fersendê nade rêxistinbûne- ke ku li der xwedî derûneke pêşverû jî. Mînak, sazûmana Sumer heger ku wan an jî Sumer birêxistin bikirana, ev ê bûbana pêngave- ke ber bi pêş ve. Mînakeke din a dawî, Komara Tirkiyê ye. Koma- rê yan ew yan jî rasterast rêveberiya Tirk birêxistin bike, yê roleke erênîtir bilîze. Lêbelê bi astengkirina herdû rêyan û pêşîlêgirtina pêşveçûnan çêtir li gor berjewendiyên wan e. Tevizandina gel a li

hundir, li gor berjewendiyên çîna wan e, Li derve jî ji berdêla vê ve, vê vediguherîne berjewendiyên polîtîk û aborî û herwiha avantaje- ke dubareyî bidest dixe. Di roja me de, ji demeke dirêj ve, digel ku ji aliyê kurdên Iraqê ve, deriyekî çareseriya demokratîk heta bi dawî vekiriye jî, beza li dûv otonomiya xanedanan a bi israr, ji ber vê kevneşopiya dîrokî ya ji aliyê berjewendiyên wan ve ku rejîme- ke herî bikêrhatî ye.

Di serdema navînde, civakên eşîran ku biberfirehî bûne serf, di sazûmana begîtiyê de rê li ber pêşveçûneke mezin vekiriye. Gelek hikûmatên Kurd ên cîgeyî ku bi otonomiyên berfireh hatine damezrandin. Girêdana wan a bi xelîfe û siltanan re, jibo van hikûmatan demeke zêrîn afirandiye. PZ di navbera sedsalên 9 û 13an de, di de- ma siltanên abbasî û selçûkiyan de, ji dewleta Kurd a feodal Mer- wanî heta bi xanedaniyên Kurd Eyyûbiyan, rê li ber çêbûnên siyasî yên hêzdar vebûye. Gelek begîtiyên kurdan ên bi vî rengî, xwe we- ke hikûmatan danezanî siltanan kirine, bi erêkirineke fennî ya şê- weya rêveberiya wan, derbasdariya wan hatiye naskirin.

Şêweyên vê rêveberiyê di dema osmaniyan de jî, hê bêhtir te fermîkirin û qederê 300 salan tê meşandin. Ev dem ji sedsala 16an he- ta bi sedsala 19an, bi awayek resene jibo begîtî û serokeşîrên Kurd, pêşve hatiye birin û erêkirin. Herwiha ji dema Sumer ve girêdayî giyana sazûmanê dimînin û ev weke rêyeke bikêrhatî tê girtin ku, her dem reseniyên xwe tevlî vê dike û didin meşandin.

Dahûrandina feodalîteya Kurd a ku ji serdema navîn heta bi ro- ja me hatiye çêkirin û timî hîkarîker bûye, ji aliyê qewimîn û bûye- ran ve, girîngiyeke mezin bi xwe re tîne. Li qasî rewişta wî a ge- lemper aliyên wî yên resene, rêbazên çêbûn û meşandina wî, ji kê re û çawa berjewendiyan pêktîne, ji gel çi dibe, çawa bandorê li bî- rûbawerî û jiyana giyanî dike, viyan û sinc çawa rajêr dike, di nas- nameya gel a dîrokî û çanda wî de rê li ber kîjan rûxandin û nûhan- dinan vekiriye, biyanîbûn çiqasî kûr kiriye, ji aliyê siyasî û civakî ve derfetên dewlemend û pêşketî çawa asteng kirine, heger bi he- mû aliyan ve werin dahûrandin, yê ronakbûneke mezin were pêka- nîn. Herwiha yê rê li ber polîtîkbûneke rast û ber bi pêş ve û şêwe- girtineke demokratîk vebe. Divê were nîşandan ku ev peywir qet nehatiye cîh. Tebeqeya Kurd a

raser, zemîna xwe ya polîtîk qet nî- qaş nekiriye û ji rexneyan re venekiriye. Di bin vê de, cîhaneke ber- jewendiyên binalet ku hezar salan domandî veşartiye. Jiberku diza- ne, dema ev yek derkeve holê yê bibe mijara xiyanet û tawanbari- yeke mezin, kî ji berjewendiyên wan re bikêrhatîbe, bêyî ku hêma- nên mirovatî bîne ber çavan, pêdivî be bi yên herî faşîst bi yên herî tarî û hêzên tineker re hevgirtinan pêktîne, gel di tarîtiyê de dihêle û heyînên pêşverû tinedike, çavneşkandî bicîhanîna van yekan po- lîtîkayeke herî bikêrhatî dibîne, ji berdewamkirina vê dîroka bina- let qet naqere.

Têgînkirina Kurd û Kurdistan, dibine para serdema navîn. Di de- ma serdestiya ereban de, têgînkirina kurdan a ji aliyê polîtîk ve, di bin şêweyeke nû de pêşveçûn pêkaniye. Kurdên ku bi rêxistinên dewletê re, bi aweyek sift ketine nava hevnasiyê, tûrikê (hebank) peyvan ê bi navlêkirinên rêxistinan, dewlemend dikin. Lêbelê ev dem bi biyanîbûn û bişaftineke sift re meşiya ye. Eslê wê erebên ku nimûnakên dewlet û rêveberiyê, ji fars û bîzansiyan wergirtine, ev bilezgînî xûnifandine û ji xwe re kirine mal. Di pey re, li derên ku gihîştinê erebkirin û xûnifandina erebî, weke îmtiyazekê nîşan da- ne. Ziman û çanda erebî, ketiye dewsa pîrozweriya Sumer a kevin. Zanîn û jiyandina vî ziman û vê çandê, jibo serdestî û bilindbûnê, mijara perwerdeya bingehîn e.

Serdema serdestiya Ereb, di heman demê de, serdema serdes- tiya ziman û çanda Ereb e. Eslê wê ev çand û ziman bijarteker e (eklektîk), ji der hatiye standin. Lêbelê jiberku lêguncandina wan biserfirazî ye, serdest bûne. Binyata wan a ji çolê, derfetê nade qezenca derûnê. Digel vê yekê çand û zimanê Kurd dewlementir e. Danehevên şaristaniya hezar salan xûnifandine. Hemû taybeti- yên neolîtîk û serdema pêşî nasdike û dijî. Zanyariyeke xwezayî encama vê çandê ye. Dîsa kevneşopiyên Brahhn û Zerdeşt, pê- wîst e weke berhemên vê çandê werin dîtin. Tişta ku ereban kiri- ye û aliyê wan ê serdest ev e ku, ev çanda dewlemend kirine na- va qalibên xwe yên çolê, bi bîrûbawerî û giyana bazirganiya ku anîne rewşa kevneşopiyeke hêzdar û ji her kesan re bazarkerî ki- rine. Hêza bazirganiya binyata Semîtîk, ev di asteke gelekî pêş de aniye rewşa danehevekê. Serdestiya cihûyan a darayî û bazir- ganî ya li tevaya cîhanê, ji vê kevneşopiyê tê. Ereban weke qebî- leyên dawî yên vê

kevneşopiyê, hostayiyeke ku bi îslamtiyê re pêngaveke mezin pêkanîne, nîşandane.

Weke ku tê zanîn, çanda bazirganiyê bidestxistina erzan û firoti- na biha, kiriye bingeha mijara hostayiyê. Ola îslamtiyê bi xwe, bî- rûbawerî û olekî bazirganiyê ye, ango wijdanê wê ye. Bazarkeriya wî ya di serdema navîn de, serfiraziyeke bazirganî ya bişeml e. Îslamtî û şaristaniya ku rê li ber vekirî, serfiraziyeke çîna bazirgan e. Hz Mihemed ê ku bi hostayiyeke mezin, hemû qezencên serde- mên borî di boteya bîrûbawerî û sincê xwe de dihelîne û di bin na- vê îslamtiyê de pêşkêşî mirovatiyê dike, şêweyeke vê nasnameya bazirganî a ku gihaye asta dahîtiyê ye. Pêwîst e neyê jibîrkirin ku, Hz Mihemed di dorhêla têkiliyên bi ***Xetîce*** ya bazirgan re, xwe dî- tiye û yekem car bi Xetîce re, bawerî bi îslamtiyê aniye. Li Rojhi- lata Navîn, bûyera bazirganiyê çiqas ku bi awayek rast were dahû- randin û pêşveçûna wê ya di nava dîrokê de li holê bête danîn, ras- tiya olên yek xweda di vê navê de ya îslamtiyê jî yê ewqasî bigihî- je raveyeke rast. Ax, bazirganî û pîşekarî, sê peyvên bi sêhr in ku di bingeha hemû şaristaniyên bilin de ne. Dema ku wateya van her sê peyvan bi tekûzî werin dahûrandin, dîroka mirovatiyê yê ronak- bûna herî mezin pêkbîne. Dema ku em polîtîkaya îslamtiyê bibêjin, vekirina vê eniya pişt a dîrokî, di bin ronahiya vê de nirxandina ser- dema navîn a îslamtiyê, girîngiyeke mezin bi xwe re tîne. Serdesti- ya ereban a liser Kurdistanê, di şêweya otonomiyên hêzdar yên bi hevkariya kurdan ve girêdayî, heta bi sedsala 12an derbasdar dibe. Ji sedsala llan û pêde, eşîrên tirkan ku pêşî di qada leşkerî û dûv re di qada siyasî de hêzdar dibin û xelîfeyên abbasiyan bi xwe ve girêdidin, demeke nû dide destpêkirin. Li şûna desthilatdarên Ereb ên ku bê esl dibin, begên tirkan jibo sazûmanê, weke xwîneke teze dikevine dewrê. Ji sedsala llan û pêde, desthilatî êdî di rêveberiya begên tirk ên Selçûkî de ye. Hebûna xelîfe êdî bi awayek teşeyî ye.

Polîtîkaya begîtî û siltantiyên Tirk ên di derbarê Kurd û Kurdistan de, mijareke nirxandinê ya hêja ye. ***Siltan Sancar*** bi xwe, di dîro- kê de yekem car, herêmên ku Kurd bisiftî lê dijîn, bi ***Kurdistan*** bi- navkiriye û ev gihandiye nasnameyeke fennî. Polîtîkayên eşîrên tirk ên di van sedsalan de, demekirina kurdan a ji cîhên wan û niş- tecîhbûna li şûna

wan e (Jixwe nikarin vê yekê bikin û ev ne li gor berjewendiyên wan e jî.) Annanca wan ku bi kurdan re lihev bikin û axa rûman berdest bikin û wira ji xwe re bikin welat. Ev nêzîk- bûna ku dexmeya xwe heta sedsala 20an li polîtîkayên begîtî û sil- tantiyên tirkan xistiye, car caran ku diket zorê jî, lêbelê bi esasî der- basdariya xwe domandiye. Tirk di vê hişmendiyê de ne ku bi neyar- tiya kurdan, di Rojhilata Navîn de nabine xwedî hebûneke hêzdar. Neyartiya bi kurdan re, tê wateya windakirin û careke din vegera derênku jê hatin e. Herwiha li derî nakokiyên berjewendiyên asayî, ji sedsala llan ve serdestiya aliyê têkiliyên kurd û tirkan, lihevkir- in e. Di van lihevkirinan de, îslamtiyê herî bêhtir jibo sunniyan avantaj pêkanîne. Beşên elewî yên şîiyan, ji sûd bêhtir zirar dîtine. Lihevkirina di navbera tebeqeyên raser de, bi şîrovaya sunnîtiya fennî ya ku berjewendiyên wan teraz dike, pêkhatiye. Lihevkirina di dema Yavuz Siltan Selîm de, ev rastî hê bêhtir diyar kiriye.

Ji sedsala llan heta bi sedsala 19an, ji serdestiyeke tirkan a li- ser kurdan zêdetir, behskirina ji lihevkirin û rêveberiyeke hevpar, yê rasteqîntir be. Tebeqeyên raser ên herdu aliyan, jiberku ketine nava hev, hemû heyînên wan ên qewmî, çûyina li pey çêbûnên si- yasî yên cuda ku nakokî hev, weke pêşveçûneke li dij xwe nirxan- dine. Herwiha mayina wan a di nava çêbûna siyasî ya hevpar de, him jibo berjewendiyên tebeqeya raser û him jî jibo aliyê hebûna wan a qewmî ve, bêhtir jiyanî hatiye dîtin. Herwiha jibo sepîneke bi vî rengî, bêhtir suxre hatiye kirin. Ev rasteqînî ji dema hîtîtiyan ve, xwedî wateyeke bi vî rengî ye. Di derûna xwe de hîtîtî û hûr- riyan, yekîtiya berjewendiyên xwe yên Anatolya û Mezopotamya bingeh girtine, Ev yek çêtir girtine ku timî, bi hev re di nava têki- liyên hevgirtî de bin, yekîtiyeke wan a sift çêbûye. Bi hev re, BZ di sala 1595an de Babîl berdest kirine. Di sala 1071an de, bi ***Şe- rê Milazgirê,*** Kurd û Tirkan pêvajoya têkçûna bîzansên Anatolya, dane destpêkirin. Di dema Siltanê Osmanî Yavûz Selîm de, bi ***Şe- rê Çildêran*** (Çaldiran) û ***Mercîdabik*** ku ji Kafkasya heta bi teva- ya Erebîstan û rêya Bakûrê Afrîka vekirî, ji aliyê din ve rê li ber Imperetoriya Rojhilata Navîn a herî hêzdar vekiriye. Di salên I920an de, careke din li hember Rojava, weke hêza berxwedana Rojhilat,

pêvajoyên rizgariya neteweyî ya Anatolya û Mezopo- tamya dane destpêkirin.

Çiqas ku hevgirtina van herdu qad û herdu gelan, ku di dîrokê de rê li ber serkeftin û pêşveçûnên girîng vekirî, rastiyeke hatî çavdê- rîkirin be, di rewşeke berevajî de windakirina wan a bi hev re jî, ewqasî rast e. Dîrok, di herdû rewşan de jî, gelek berjengan pêşkêş dike. Qezenckirin û pêşveçûn, li qasî ku bi yekîtiyê ve girêdayî ye, tê dîtin ku, windakirin û paşve mayin jî, dûrbûna ji giyana hevgir- tinê û bi encama devjêberdana hiqûqê biratiyê pêktê.

Çanda herdu herêman ku dişibe hev û di nava hev de, ji dema ne- olîtîkê ve rê li ber damezrandina girêdaneke diyalektîk a di navbe- ra wan de vekiriye. Dema ku tebeqeyên desthilatdar li gor giyana vê rastiyê hereket dikin, pêşveçûnên şaristanî yên girîng, bi hev re dijîn. Dema ku bi awayek mandeleker û tineker nêzîk dibin jî, wi- dakirina bi hev re dibe encameke jênerev.

Tê çavdêrîkirin ku, di demên serdestiya selçûkî û osmaniyan de jî, têkiliyên Kurd û Kurdistan di çarçova vê teraza dîrokî de peşve- çûn nîşan daye. Her ciqas ku car caran, nêzîkbûnên yekalî yên ku terazê xirabikin, rê li ber lihevxistinan vekiribin jî, bi damezrandi- na terazê re, ev rewş ji holê radibin. Ev rastiyeke din a girîng e ku, di pêvajoya dîrokê de polîtîkayên herdu herêman ên domdirêj ku hebûna hev mandele dikin, ne xwedî şensekî serfiraziyê ne. Danûs- tandineke çandî ya dewlemend, xwedî dîrokeke 15 000 salan in. Pêşveçûnên şaristanî yên serdemên pêşî û navîn jî, liser vê zemîna çanda hevpar bilind bûne. Helwestên hinek ji tebeqeyên raser ên mandeleker û hevkar, her çiqas ku pêşveçûnên dîrokê bişewşînin jî, zemîna çandî ya ku gel pêve girêdayî, timî biratî û piştgirî bingeh girtiye. Dibe ku ev rewş weke nakokiyekê were dîtin. Eslê wê ne nakokî ye. Dirûvtî û hevpariya çanda Rojhilata Navîn, berhema ke- dê, gelan, zanyaran û ya pêxemberan e. Çîna serdest mêtinker po- lîtîk a rêvebir, hewldide ku van cihêrengiyan jibo berjewendiyên xwe bikarbîne û wan ji hev re bike neyar. Komek raserên polîtîk, dixwazin ku serdestî û hêza xwe bi şoventî û bi serdestiyeke xwe- dayî bidin kinnişandin, komên din ên têkçûyî û lawaz jî, xulamtî û serîdanînê bingeh digirin.

Têkiliyên ên rêveber û yên tên rêvebirin, tenê ne di navbera ser- dest û bindest, yên mijok û yên tê mêtin de, derbasdar e. Di navbe- ra serdestan de jî hîyerarşiyeke hişk tê damezrandin. Ev hîyerarşî di dîroka hemû civakên biçîn de, derbasdar dibe. Serdest çandeke li gor xwe çêdikin û bi heyîna çanda gelan re, ti têkiliyê wan namî- nin. Ziman û heyînên çandî, di zemîna gel de pêşveçûnên xwe di- domînin. Ji aliyê din ve, ziman û çandeke serdestan a li gor wan ku ji gel veqetiyayî derdikeve holê. Mînak Akadî demekê, zimanê dîp- lomasiyê yê serdestên Rojhilata Navîn e. Li ku derê dewletokek bi- hatana damezrandin, wê derê dibistaneke Akadî jî dihate vekirin. Di serdema navîn de, erebî ev rol girtiye ser milê xwe. Roleke din a bi vê şêweyê, latînî wergirtiye. Di roja me de vê rolê herî bêhtir îngilîzî û çanda Amerîka dileyîze.

Lêbelê di nava gelan de, ziman û çanda neteweyî hebûna xwe berdewam dike. Li Rojhilata Navîn heyînên çandên ku dişibin hev, di navbera gelan de dilîniyên biratî û piştgiriyê pêşdixe, beşên ser- dest bi annanca ku bihêsanî rêvebibin, bi taktîkên dabeşbike û rê- vebibe, di navbera gelan de neyartiyên bîrdoziyî û polîtîk dafirînin, di vî babetî de sîqilandina şerên ol û mezheban weke polîtîkayeke bingehîn dîtine. Dema ku berjewendiyên wan pêwîst bike, di roje- kê de dawî li dijminatiya di navbera xwe de tînin, lêbelê lihevda- nên di nava eşîran û şerên di navbera mezheban de, bi sedsalan zindî girtine. Di encamê de ya diyarker, pêwîst e ku di rojên dijwar de, dostîtî û biratiya gelan be. Ya ku şaristaniyan ji binî xweyî dike jî, ev çavkaniya sereke ye. Dema ku ji vî alî ve lê bête nêrîn, çanda Rojhilata Navîn, jibo gelan weke federasyoneke xwezayî ye. Ya rastir, zemîna federasyoneke demokratîk gelekî hêzdar e. Li Ame- rîka, Afrîka, Rojhilata Dûr û Ewropa, heta van demên dawî jî, ze- mîneke bi vî rengî ya çandeke hevpar, pêknehatiye. Berevajî vê, cu- daxwazî û dijminatî serdest bûne. Eslê wê, çanda polîtîk a Rojhila- ta Navîn jî, xwedî taybetiyên şêweya federasyonê ye. Ji sumeriyan heta bigihe osmaniyan, xweseriya (otonomî) eyaletan a berfireh, timî pekliatiye. Azadiya heyînên çandî û etnîk, bingeh e. Ji bilî asû- riyan, di binyata hemû împeretoriyan de, polîtîkayên jiholêrakirina çand û komên etnîk tine ne. Kartêkerên yekbûnê, bêhtir diyarker in.

Lêbelê berjewendiyên çînî û xanedanî, dabeşbûn û dorhêleke lihevxistinê ya ku zîndî were girtin, jibo şerên desthilatiya xwe, şert dîtine. Bingeha daringî ya van lihevxistinan, bi berjewendi- yên malbatî, bisînor in. Pêşveçûnên aborî, civakî û siyasî yên domdirêj, encex di nava aramiyekê de û bi piştgirî û biratiya ku ji zemîna çanda gelan xweyî dibe, gengaz dibe. Çanda Rojhilata Navîn, ji hemû herêmên cîhanê yên din zêdetir, xwedî dilînên bi- ratî û piştgiriyê ye. Ji aliyê din ve, dinavheviya erdnîgarî, demok- ratîk, aborî, civakî û çandî, siyaseteke hevpar ferz dike. Yekîtiyên bi neteweperestî, bawerhişkiya eşîrtî û lihevxistinên mezheban ve girêdayî û di nava xwe de girtî, ne xwedî şensê pêşveçûneke dom- dirêj û xweparastinê ne. Ev yek ne rast e ku em bibêjin, ev berbi- çaviyên rasteqînî ji aliyê tebeqeyên raser ve bi erênî tên nirxan- din. Berevajî vê, di serdemên pêşî de, bi şerên etnîk û yên di nav- bera bajaran de, di serdema navîn de, bi şerên ol û mezheban, di serdemên nêzîk de jî, bi lihevdanên neteweperestî, parçe parçe ki- rin û rêvebirin, ji xwe re kirine hunera polîtîk.

Ev taybetiyên tîpîk ên çina serdest û mêtinker, di tebeqeyên Kurd ên raser de, bi şêweya herî neyînî îfadeya xwe dîtiye, bi zê- dekarî heyîna xwe ya çandî mandele kiriye, di têkiliyên xwe yên bi hêzên derveyî re, bi giyaneke teslhniyet û xulamtiyê hereket kiriye. Cudahî û reseniya wî ya ji beşên mîna wî, di vê rastiya wî de ve- şartî ne. Di pêşveçûnên dîroka Kurd ên ku aliyê wan ên neyînî bi- giranî de, esasê wê ev taybetiyên serdest ên çînî berpirsiyar in. Ji dêvla ku van taybetiyan bingeh bigirin, lihevkirineke biteraz bihiş- mendî û bibiryar bidin domandin, yê pêşveçûnên pir alî ku aliyê

wan ên erênî bigiranî bin, derkevine holê. Jiberku di nîvê komên çandê û di nîvê navendên erdnîgarî yên girîng de cîh digire, polîtîkayeke yekîtiya siyasî û aborî ya ku wekheviya maf û azadiya kur- dan bingeh bigire, yê pêşveçûna Rojhilata Navîn gelekî bi erênî û ber bi pêş ve bibe.

Mijareke din a ku di bûyera civaka Kurd de tê çavdêrîkirin, di- gel ku ji aliyê siyasî ve, di nava rêxistinên serdest de tê helandin, ji aliyê civakî ve, komên ku dikevin nava wê jî, ew dihelîne. Ev yek bi taybetî ji hêza binyata wan a civakî tê. Lawazbûna ku di warê si- yasî de dijîn, bi zexmbûna di warê civakî de biteraz dikin. Di pêva- joya dîrokê de, ji çar aliyan ve kom herikîne nava kurdan. Di enca- mê de hemû jî ji helandin û bişavtina xwezayî rizgar nebûne. Ji îs- kîtiyan heta bi helenan, ji yen ji binyata semîtîk heta bi yên ji bin- yata turkî, komên dîrokê yên herî girîng, di dorhêla Kurd a civakî û çandî de, bûne Kurd. Ev meyldarî heta bi nîvê sedsala 20an ku kapîtalîzm serdest dibe, berdewam dike. Bi pêwana kapîtalîzma dewletên civakên cîran ên ku serdestiya neteweyî, civakî û aborî qezenc kirin, pêvajo berevajî werdigere, Kurd bi helandineke sift re, rûbirû dimînin.

Di serdema neolîtîkê de, çanda çandinî û ajalvaniyê ya ku cîha- nê diguherîne, digel ku di serdemên pêşî û navîn de vê serdestiya xwe berdewam dike jî, li hember şoreşa pîşesaziya serdema kapîta- lîst, liberxwe nedaye û berserjêr bûye, Kurd ji çar aliyan ve hatiya helandin. Ev pêvajo, encex bi destlêwerdaneke (destekariyeke) hiş- mendî û tevgereke siyasî hatiye rawestandin. Herçiqas ku tevgera neteweyî ya Kurd, negihîştibe serfiraziyeke siyasî ya cidî jî, helan- dina neteweyî û çandî rawestand û di zindîgirtina pirsgirêka Kurd de serfiraz bûye.

Kurd, di rêxistinbûna aborî û civakî ya serdema navîn de, ji ge- lek aliyan ve ji cîranên xwe pêşketîtir bûn. Daneheva dîrokî û mer- cên erdnîgariya bikêrhatî, derfet daye kurdan ku di warê binyata aborî û civakî ya feodal de pêşvebiçin. Niştecîhbûna eşîrên koçber a liser axê, di vê demê de gelekî pêşketiye. Nifûsa cîwarbûyî, li hember ya koçber serdestî qezenc kiriye. Girêdana bi axê ve û serf- bûn, bûye taybetmendiyeke tîpîk. Lêbelê dîsa jî, eşîrên kevneşopi- ya koçber, hebûna xwe parastine. Digel rewişta eşîrên koçber ê wekhevîparêz û

azadker, bi serfên axê re giyana koletiyê kûr bûye. Digel vê yekê, di nava eşîran de jî bîrûbawerî û giyana feodalî ça- lak dibe. Serokatiya eşîran û axatiya axê jî digihîjine teybetiyen bi vî rengî. Raman û helwesta bi şêweya feodal, him di nava rêxistina axatiya cîwarbûyî de û him jî di nava rêveberiya eşîrtiyê de, çiqas ku diçe bandorker dibe. Serokatiya eşîrê û axatiya gund, nêzîkî re- wişteke hevpar bûne.

Li Kurdistanê bazirganî, di venêrana bazirganên Ereb de pêşve- çûye. Aboriya bi dirav pêşketin pêkaniye. Vê rewşê lezgîniya bazir- ganiyê û giraniya wê bi xwe re aniye. Di warê kankerî û pîşekarî de, serdestî dîsa di destê hostayên Ennen û Asûr de ye. Vê rewşê, rê li ber ennen û asûriyan vekiriye ku li nava bajaran sift bibin. Pî- şekarî û bazirganî, lebka bingehîn ya nifûsa bajarî ye. Li hember vê ax û zozan ango qada gundewarî, bigiranî di destê nifûsa Kurd de ye. Di şaristaniya bajêr de, erebê bazirgan, suryan û ennenê pîşe- kar, nifûsa bingehîn derdixin holê.Kurd û beşên din ên xizan, rola karkerên sûtal dilîzin. Ji xwe ev rewşa berbiçav, ji têkela tevgerên batinî yên serhildêr jî, diyar dibin. Yên ku girseya tevgerê pêktînin, ji gundiyên kû aboriya gundewarî ew ji cîhê wan kirine û ji binya- ta eşîrên ku belav dibin tê.

Serdestiya dewleta navendî ku zêde dibe û xwedaniya axê ku di destên hindik de digihe hev, cudahiya di navbera çînan de mezin di- ke û rê li ber teqîna tevgerên batinî vedike. Di mercên civaka Feo- dal de, di pêvajoya serdema navîn de, ev tevger mecbûr bûn ku di bin kemna olî de, weke mezheb û terîqetên cuda derkevin holê. Bîr- doziyeke modem û zanistî, li ti deran pêşveneçûye. Çînên ku îfade- ya zanistî bi nav û berjewendiyên xwe didin qezenckirin, encex di serdema kapîtalîst de, gengaz dibe.

Me da nîşandan ku, di serdema navîn de di bereka qewmbûna ci- vakên etnîk de, guherîna fonnekî gelemper jiya ye. Li nav kurdan jî ev meyldarî lezgîn dibe. Bûyera qewm, piştî bûyera etnîk tê. Gi- rêdana bi kûrayî û domdirêj ya aborî û civakî bi axê re, bingeha da- ringî pêktîne. Fonnên eşîrtî, herî bêhtir di mercên ku di nava xwe de girtî û nîv koçberiyê de, girîngiyê qezenc dikin. Cîwarbîna dom- dirêj rê li ber gundîtiyê û ew jî rê li ber cudahiya civakî vedike. Cu- dahiya civakî ya ku di yekeyên eşîran de gelekî bisînor, bi cîwarbû- na liser axê û bi

gundîbûnê re, zêde dibe. Qadên firehtir û nifûs, di- kevin bin venêrana begîtiyên feodal. Ev bûyerên ku ji hemtaya eşî- rê zêdetir, weke girêdanên nijad û qewm wate qezenc dikin. Digel ku li bajaran çînçînîbûn pêşvediçe jî, malbata ku piçûk dibe, eşîrti- yê lawaz dike. Bajar xwedî nifûseke tevlîhev in. Li qada gunde- warî, yekîtiya eşîrên ku bi ziman û çanda hevpar, çiqas ku diçe hiş- mendiya qewmîtiyê pêşvedibin.

Ji xwe di derûna bîrdoziya îslamtiyê de ev rastî heye. Hz Mihe- med bixwe, jibo ku qebîleyên çolê yên di nava xwe de girtî bike yek, hewldanên mezin kirine. Quran, esasê wê manîfestoyeke civa- kê ya nû ye ku, qebîleyên çolê yên ku şareza nabin bike yek, teng- nêrîna eşîran bişkîne û hewl dide ku şaristaniya bajarê pêşketî, di bin bandora dewlemendkeriya bazirganiyê de pêkbîne. Lêkolîna Quranê ya bi kûrayî û bi awayek civaknasî, di serî de ji rawestîna wê ya liser hebûn û yekbûna xwedê, heta bi hikmên wê yê daraz- ker û polîtîker, yê nîşan bide ku, qevdek bangewaziya di derbarê zelalkirina rewişta civaka nû de ye. Jixwe beşa bi navê ***“Peymana Medîne”,*** ji peymaneke civaka nû pêde ne tiştekî din e. Di vê çar- çova bîrdoziyî de, yekîtiyên eşîran ku yên pêşbikevin, bi pêvajoya polîtîkbûneke sift re, yê weke qewmekî ereban ê herî bihêz, forrn bide qezenckirin. Weke ku bîrdoziya kapîtalîzmê, neteweperestî û fonna netew derxiste holê, îslamtiya ku îfadeya herî bihêz a bîrdo- ziya feodalîzmê jî, yê nijad û hişmandiya wê derxe holê. Ev ne rast- hatinî ye ku di dema xanedaniya emewî û abbasiyan de, erebtî tê bi- lindkirin. Bi xwezaya kar û bîrdoziya îslamtiyê ya ku rê li ber ser- destiyê vekirî ve girêdayî ye. Herçiqas ku Hz Mihamed li hember girankirina vê, helwesta xwe nîşan dabe jî, di hişmendiya ku serde- ma bilindkirina ereb vekiriye de ye. Ev rewş, ji aliyê îslamtiyê ve restiyeke berbiçav qezenc dike.

Fonna esas a civaka îslamtiyê ku hatî afirandin, ne eşîre nijad e.
Di kapîtalîzmê de, merhaleya vê ya hişk girêdayîtir û hişmend, ne- tew e. Di serî de bi fars û tirkan re, nijadbûn bi îslamtiyê re lezgîn bûye. Bi taybetî girêdana nijada beşên ku desthilatdar, di vê pêva- joyê de çêbûna nijada serdest jî bi xwe re tîne. Demên serdestiya ereb, fars û tirkan, di pêkanîna serdestiya qewmî de jî tevkarî kiri- ne. Xanedaniyên kurdan

gelekî bisînor in, ên ku hene jî, jiberku zi- man û çanda ereban çêtir girtine, di pêşveçûna nijada Kurd de role- ke neyînî lîstine. Jixwe ji xanedanên Kurd ên ku di kevin nava rê- veberiyê, tişta herî pêşî ku dikin, an nonnên çand û zimanê xwe ve- dişêrin an jî terk dikin û nonnên çand û zimanê serdest ji xwe re esas digirin. Bi taybetî di serdema navîn de, tevgerên bi vî rengî ki- rine rêzika bingehîn. Digel ku xanedaniya Eyyûbî Kurd e jî, hemû tiştê xwe di suxreya serdestiya sunnîtiya Ereb de, bikaraniye.

Li nav Fars û Tirkan jî, ev rastî hatiye jiyandin. Lêbelê dîsa jî li serayên fars û osmaniyan, di bandora erebiyeke sift de be jî, zara- vayekî farisî û tirkî hatiye pêşxistin. Di nav kurdan de, yên ku bû- ne dewlet û begîtî damezrandine jî, di vî babetî de gelekî bisînor mane. Encex em dikarin ji suxreya ***Emîrê Bedlîsê Şerefxan*** a bisî- nor xeber bidin. Beşên kurdan ên ku ketine suxreya dewletê, di ser- demên pêşî de zaravayên farisî yên kevin û asûrî, di serdema navîn de jî erebî, bûne ziman û amûrên çandê yên bingehîn. Ziman û çan- da xwe, encex dema ku pêdivî bibînin û di têkiliyên eşîrtî de, ne bi awayek fennî bikartînin. Di vî babetî de, rola dîrokî ya serdestên Kurd ên hevkar, bi neyînî ye. Heçku ji aliyê çand û zimanê etnîkî ve, Kurd ji hemû komên etnîk ên Rojhilata Navîn pêşdetir bûn. Kê- masiya wan tenê, sûd negirtina ji çêbûnên siyasî û hêza rêxistnbû- nê ye. Digel ku timî ber bi derveyî rêxistinên siyasî hatine dehefan- din jî, parastina hebûna xwe ya heta weke dema îro, hêza çand û be- şa zimanê Kurd nîşan dide. Weke ku di beşên borî de jî me anîbû zimên, çavkaniya bingehîn a ku ziman çand derdixe holê û pêşve- dibe, jiyana gelan bi xwe ye. Ev rasteqînî bitaybetî, di pêşveçûna çand û zimanê neteweyî de, diyarker dibe. Li hember vê yekê, çî- nên serdest ên mêtinker ku bi sedsalan, zimanên akadî, aramî, la- tînî, helenî, osmanî û erebî, weke zimanê fennî û perwerdeyî bika- ranîn, dîsa ji jibîrbûnê rizgamebûne. Çîn û tebeqeyên ku ji wan re suxreyê dikin, dema ku ji holê radibin, fonnên çand û zimanê ku bi- kartînin û dijîn jî, jevdikevin û dihelin diçin.

Di pêvajoya serdema navîn de, Kurdan rêveberiya sê xanedani- yên serdest ên nijadên mezin naskirine. Piştî hilweşîna xanedaniya Med, di rêvebiriya xanedaniyên persên ku çand û zimanê wan nê- zîkî yê wan

de, giraniya xwe damezrandine. Bi dorê ***Akhamenîdên Pers, Arsakiyên Part*** û yê herî dawî di dema xanedaniyên ***Sasani- yên Persan*** de, ji serdema koledar derbasbûyina serdema feodal da- başa xeberdanê ye. Taybetiyeke din girîng a dema vê rêveberiyê, weke qewmê herî nêzîkî farisan, Kurd di rêveberiyê de, di rêza du- yemîn de bandorker bûne. Dîrok, ziman û çanda hevpar, vê rewşê hêsan dike. Di serdema navîn de, kurdên li qada îranê, gelek begîtî û hikûmet damezrandine. Di berxwedanên ***Mazdakî, Hnrremî*** û ***Babekiyan*** de, roleke çalak lîstine. Di dema xanedaniya safawiyan de, ji ber nakokiyên di navbera wan û Osmaniyan de, Kurdên ku xwestine herdû aliyan bikarbînin, herî bêhtir hatine bikaranîn. Ji vê rewşa ku heta bi nîvê sedsala 20an domandî, mîr, serokeşîr û şêxên kurdan berpirsiyar in.

Kurdan weke gel, vê demê rûxîn û hilweşanên mezin jiyane. Ji ber rewişta xwe, rêxistinên serokeşîrtî, mîrîtî û şêxîtî, xwedî asoye- ke teng a li gor berjewendiyên malbatî ne. Dema ku liser malabata wan bête leyîzandin, ji her havildarbûnê (îstîsmar) re vekirîne, ji serhildan û teslhnîyeta di nava hev de narevin an jî ji wan rizgar na- bin. Têkiliyên ku bi destê van serokatiyan hatine çêkirin, encamên bi vî rengî li gel ferzkirine, herwiha rajêrkirina gel kirine rewşa rê- zikekê. Rizgarî, bi gelên din re jiyaneke biratî û birûmet, di rastiya rêxistiniyên van serokatiyan de tine. Di wira de, jibo berjewendiyên kes û malbatan ên teng serhildan, teslhnîyet û suxreya bi xulamtî heye. Ev bûye weke taybetiyeke genetîk.

Dîroka têkiliya komên ji binyata Semîtîk a bi eşîrên ji binyata Kurd re, gelekî kevn e. Tê çespandin ku ev têkilî, diçe heta BZ 3000an, dema destpêka dîroka nivîskî. Komên semîtîk timî xwesti- ne biherikîne vê erdnîgariya ku çiya, deşt, av û şînayî bi hev re ku

weke bihişta çolê dinirxînin. Ev rastî, bingeha daringî ya lihevda- nên di navbera komên semîtîk ên çolê û eşîrên aryen ên çiyê ku bi hezar salan domandiye, datîne holê. Di lihevdanên bajêr ê Sumer de jî, ev her du binyat, bi hevgirtina xwe re, timî di dewrê de ne. BZ di salên 3000an de, qebîleyên Horrît û Amorit ên ku bi nivîsê hatine peytandin, weke berdewama vê kevneşopiyê, heman rol do- mandine. Kevneşopiya Brahhn, bi şêweyeke guherî weke hevgirti- na du binyat, du çandan, li hember tebeqeya raser, dewleta koledar, derdikeve pêşberî me. Weke ezmûneke pêşî ya hevpar a nava çan- dan, ji aliyê herdu çandan ve tê pejirandin. Lêkolînên zanistî yên dawî, vê yekê rast derdixin. Saziya pêxemberiyê ku di ser qebîleyê re tê dîtin, ji hemû komên etnîk alîgiran dibîne û tê pejirandin, bi vê taybetiya sereke ve girêdayî ye. Jiberku li hember têgihîna xwe- dê ya qebîleyan derdikeve holê, dîsa li hember têgihîna xweda-qe- ran derdikeve û tovê bawerî û ramaneke gerdûnî davêje, rê li ber watedarî û pêkanîna pêşveçûna wî vekiriye.

Hêrîşên Babîl û Asûr ên vê dawiyê, bi sazûmana dewleta kole- dar a serdema pêşî ve girêdayî ne û gelekî stemkar in. Di vê demê de, berxwedanên eşîrên kurdan, gihane asta gelek federasyon, kon- federasyon û dewletên navendî. Hûrrîyan, mîtanniyan, naîrîyan, ûrartûyan û herî dawî medan, ev rastî di rewşa deman de li pey hev temsîl kirine. Di dema persan de jî, em Medya weke rêveberiya eyaletê (satraptî) ya herî hêzdar dibînin. Herêm xwedî girîngiyeke di pîleya duyemîn de ye. Qerantiya Komagene, ya piştî Skender ku weke sentezeke çanda Helen û Med-Pers derkete holê, Ji BZ 250an heta PZ 250an, pêvajoyeke 500 salan a girîng digire. Vê demê, di- gel ku bandora waliyên Roma diyarker e jî, desthilatiyên cîgeyî jî heyîna xwe ya siyasî diparêzin. Yek ji van di heman demê de, ***Qe- rantiya Abgar*** a ku navenda wê Riha ye û komên Kurd û Asûr ban- dorker in. Di vê demê de, Ziman û çanda aramî ku mîrateya Asûr, di Rojhilata Navîn de xwedî bandor e. Di nasnameya ziman û çan- da navneteweyî de ye.

Piştî îsa, baskê xiristiyantiyê yê Rojhilat, pêşveçûneke lezgîn nî- şan dide. Zimanê aramî, weke zimanê zayîna xiristiyantiyê ye. Xi- ristiyantî di nava kurd û asûran de belav dibe. Li hember Zerdeşti- ya Sasanî ya fennî, serdestiyê qezenc dike. Kûrd û Asûr bêhtir nê- zîkî hev dibin.

Xiristiyantî di vê yekê de roleke girîng dilîze. Li ba- kur, nêzîkbûneke bi vî rengî di navbera kurd û ennenan de tê da- mezrandin. Mezopotamya jorîn, dibe navendeke vê baweriya nû ya hêzdar. Bi taybetî petrikên Nastûr, ji felsefeya Grek jî sûd werdigi- rin û di jiyana ramanê de roleke pêşketî dilîzin. Manîtî di vê dorhê- lê de dihile. Belavbûneke bi heman şêweyê, Bûdîzma ku bi naven- da Hindê pêktînê. Bandora Bûdîzmê heta bi Mezopotamya belav dibe. Manî di serî de mirateya kevneşopiya Zerdeşt a bi erênî, ji he- mû şêweyên bawerî û raman sentezekê pêktîne, aştiyê bingeh digi- re û hewl dide ku bawerî û sincekî biratiya cîhanê serdest bike. Ma- nîtî, derketineke herî hêzdar a berî îslamtiyê ye.

Dema ku serdestiya Ereb, liser vê mîrateya dewlemend tê da- mezrandin, Roleke weke ya barbarên ku li hember şaristaniya Ro- ma lîstine, dilîze. Digel ku Ereb ji aliyê leşkerî ve bihêz in, ji aliyê çandê ve lawaz in. Vê kêmasiya xwe bi bişavtineke çandî ya sift, ti- ne dikin. Serdestiya wan a di warê rêveberî û bazirganî de, rê li ber dewlemendbûneke lezgîn û damezrandina gelek bajarên nû vedike. Erebî ya ku pêşdikeve, cîhê akadî û aramî ya kevin digire. Erebî zi- manê dîplomasî û siyasetê ye, Jiberku Quran bi wî hatiye ‘xwarê’, pîrozweriyê qezenc dike. Li hember ziman û çandên cîgeyî serdes- tiyê bidest dixe. Bandora erebî tevlî hemû ziman û çandan dibe. Weke zimanê zanist, çand, perwerde û axaftina hevpar a tebeqeyên serdest, bi hêdî be jî, heta weke roja me bandora xwe didomîne. Serdestiya polîtîk a çînên desthilatdar ên Ereb, heta ku venêran di- keve destê beg û siltanên tirkan, PZ sedsala 12an berdewam dike. Bandora ereban a polîtîk û çandî liser kurdan, digihe asteke pêşketî. Bi taybetî tebeqeyên raser nîvî nîvî dibine Ereb. Girîngiyeke taybet didin ku xwe ji koka Ereb û pêxember nîşan bidin. Veqetîna ji gel û mandeleya neteweyî, di vê demêde jî bi awayek kevneşopî, pêş- vediçe. Ev dem dema siftiya biyanîbûna derûna xwe ye. Çînçînîbû- na bi binyata biyanî û biyanîbûn bi hev re pêşvediçin. Digel vê ye- kê, di ziman û çanda gel de di bereka neteweyîbûnê de, pêşveçûn çêdibin. Pêşveçûnên olî yên cuda, di nava gelan de, weke ku li Ew- ropa heyî, rê li ber dijminatiyan venake. Di vê yekê de nêzîkayiyên kevneşopiya çandî hîkarîker dibe. Dijminatiya di navbera baweri- yan de, ji aliyê mîr, serokeşîr û giregirên mezheban ên ku dixwazin bibin

tebeqeyên raser ve, tê pêşkarîkirin.

Di serdema navîn ku di bin serdestiya ereban de, digel ku di qa- da siyasî, bazirganî û zanistî de, hinek pêşveçûn çêbûbin jî, bi ge- lemperî jiberku dema dogmatîzmê ya herî hêzdar damezrandiye, yê bibe sedema paşveçûna dîrokî ya di sedsalên vê dawiyê de. Pêva- joya paşveçûyinê esasê wê, di dema siltanên Tirk de tê jiyandin. Tirk, PZ di sedsalên 9 û lOan de, bi xulamtî û bi leşkeriya diravdar, li serayên abbasiyan têne bicîhkirin. Nûhîn û bêeslbûna di rêvebe- riya Ereb de, bandora fennandarên ji binyata Tirk zêde dike. Di sedsala llan de, koçberiya eşîrên oxuzan a bi girseyî û damezran- dina xanedaniya selçûkiyan, dîsa jiberku dikevine çavê xelîfe, Tirk bi awayek girseyî, li herêmê niştecîh dibin. Di sala 1055an de, sil- tantî dikeve destê Tuxrul ê Siltanê Selçûkî. Herwiha li Rojhilata Navîn demeke nû, dema serdestiya fennî ya qewmên tirkan destpê- dike. Di nava demê de ev pêvajo pêşvediçe. Di bin navê selçûkiyên Anatolya, Sûriye, Iraq û îranê de, dabeşbûneke kevneşopî tê jiyan- din. Selçûkiyên Anatolya, jiberku li hember rûman xwedî şensekî belavbûnê bûn, bêhtir bihêz û temen dirêj in. Edî xwîna îslamtiyê ya teze û hêza belavbûnê, tebeqeya Tirk a raser e.

Dabeşbûna ku di nava qewman de tê dîtin, di nava tirkan de jî pêşdikeve. Beşên eşîran ên raser, di rewşa siltantî û begîtiyan de, dikevine rewşa çînên serdest ên sûnnî û feodal. Beşên xizan ên eşî- ran jî, bi şîroveyên elewî-bektaşî û weke tirkmenên, weke jiyana xwe ya kevin, bi awayek koçberî li berî û çiyan dijîn. Di ziman û çandê de jî, dabeşiyeke bi vî rengî derdikeve holê. Di jiyana beg û siltanan a serayan de, erebî û farisî serdest dibe, lêbelê Tirkmen di- bine barkêşê ziman û çanda tirkî. Feodalbûna navendî ya li dor sil- tanên Tirk, eslê wê di dema osmaniyan de pêşvediçe. Jiberku ev dem di heman dema hilatina serdema kapîtalîst a Ewropa de ye, nû- neriya osmaniyan a Rojhilata Navîn, weke demeke paşveçûyî ya mezin watedar dibe. Şerên ku li hember Ewropa têne meşandin, ji- berku bi şaristaniya Rojava ya ku bilind dibe û şaristaniya Rojhilat a ku paşvediçe ve girêdayî ne, di encamê de ji têkçûnê rizgar nabin. Dema Osmaniyan, yekem care ku Rojava li hember Rojhilat ser- destiyê qezenc dike ye. Êdî rêya herî rast, ne jiholêrakirina Rojava, ji her alî ve xûnifandina wê ye. Dema ku

împeretoriya Osmanî tê- digihîje, dereng dimîne. Encex bi serokatiya Mistefa Kemal, bi Ko- mara Tirkiye ku hatî îlankirin, meşa ber bi vê rêyê mîsoger dibe.

împeretoriya Osmanî ya feodal, di derawaye kevneperestiya dî- rokî û paşveçûyinê de ye. Şaristaniya kapîtalîst a Rojava ku li derî viyana wê pêkhatî, ev yek aniye rewşeke rasteqîniya berbiçav. Lê- belê pêşî li hatina zû ya mêtingehkariya kapîtalîst a Rojhilata Na- vîn, girtiye. Herwiha pêşveçûna mêtingehkariya klasîk a ku li çar aliyên cîhanê pêkhatî, asteng kiriye. Bandora vê ji du aliyan ve bû- ye: Bi dirêjkirina temenê feodalîzmê roleke neyînî lîstiye, Jiberku li pêşya dagirkirineke fîzîkî ya herêmê bûye asteng û pêşî li neyîni- yan girtiye jî, roleke erênî lîstiye. Bi gelemperi ji aliyê gel û çanda Rojhilata Navîn ve, ev pêvajo weke sedsalên windakirî bête nirxan- din di çîhê xwe de ye.

Têkiliyên Kurdan ên bi begîtî û siltantiyên Tirk re, ji dema ere- ban ne cuda ye. Di warê çand û ziman de di nava tebeqeyên Kurd ên raser de, digel ku bandora Erebî berdewam dike jî, serdestiya si- yasî hin bi hin, derbasî xanedanên serdest ên Tirk dibe. Di dema Selçûkî û begîtiyên Anatolya de, liser civaka Kurd serdestiyeke di- yar tine. Di vê demê de, gelek xanedanên weke merwaniyan, eyyû- biyan şerefxaniyan ûwd. Ji binyata Kurd in û pêvajoyeke pêşveçû- na feodalîteya Kurd, temsîl dikin. Feodalîteya Kurd di derûna xwe de, ji sedsala 8an û heta bi sedsala 19an, xwedî pêşveçûneke xwe- ser a li gor xwe ye. Herçiqas ku ne hatibin rewşa dewleteke navendî ya feodal jî, di asta hikûmet û nîvdewlatan de, gelek çêbûnên siyasî pêkanîne. Ji serîdanîna bi zorê zêdetir, di bingeha berjewendiyên hevpar ên feodal de, bi begîtî û siltantiyên Tirk re, ketina nava tê- kiliyan. Hêzeke herî nêzîkî têgihîna dewleta hevpar in. Bi vî aliyê xwe, rewşa kurdan dişibe ya li îranê ku bi persan re dihate dîtin. Di

begîtî û siltantiyên tirkan de, piştî qewmên Tirk, li gor girîngiya ristê, Kurd di rista duyemîn de rolekê dilîzin. Di dîroka kurdan de, ev roleke tîpîk e. Ango cîgirbûna wan a jibo hêza siyasî ya liser serê wan, jibo wan weke qederekê ye. Ev yek di derûna xwe de, pêdivi- ya giyana sazûmana serftî û benîtiyê ye û bingeheke wê ya çînî he- ye. Ev rewş ji biratî û piştgiriya rast a di nava gelan de, cuda ye. Ev rastiyeke ku dibe sedema, gelek bêterazî, biyanîbûn û lihevdanên li gor polîtîkaya dabeş bike birêvebibe. Encama wê ya erênî bi tenê, di rewşa berxwedanên bêteraz û serhildanan de, fersendê nade komkujî û koçberkirinan.

Ev meyldarî, di dema împeretoriya Osmanî de, bi awayek vekirî hatiye meşandin. Yavûz Siltan Selîm, dizane ku serdestiya li Rojhi- lata Navîn di hevgirtineke bi feodalîteya Kurdan re derbasdibe, her- wiha lihevkirineke gelekî nêzîkî asta wekhevî bingeh digire, vê ye- kê rê li ber sepandineke polîtîk a serkeftî vekiriye ku heta sedsala 19an domandiye. Di vê demê de feodalîteya Kurd, bi şêweya hikû- mat û malîkxaneyan, bi awayek fennî bûye xwedî desthilatiya cî- geyî ku ji bav derbasî law dibe. Desthilatiya siltan a navendî û dest- hilatiya feodalê cîgeyî, bi hev re hatiye meşandin. Digel vê yekê heyîna eşîrên koçber berdewam kiriye, elewîtî û êzîdîtiyê rewşa xwe ya berxwedanvan domandiye, heyînên ziman û çandî pêşveçû- na xwe berdewam kirine. Qedexeya hinek tiştan ne dabaşa xeber- danê ye. Ya herî girîngtir, ji ber binyata wan a aborî û civakî ya bi- hêz, gelek qebîleyên tirk û ereb, di nava wan de helandineke xwe- zayî jiyane. Digel serdestiya siyasî ya ereb û tirkan û derawaya kur- dên hevkar a neyînî jî, ev hêza ziman û çanda Kurd a bişavker, ji taybetiyên bihêz ên ku ji serdema neolîtîkê ve qezenc kirine tên.

### d- Di Serdema Kapîtalîzmê de Kurd

Digel ku gelek ji yê dîrokê herî afirîner û kevnare ye, bi rewşe- ke weke ku di dîrokê de nejiyabe re rûbirû bimîne, di serdema me de weke îroniyeke Kurd derdikeve pêşberî me. Tê ji dîrokê re der- gûştî û dayîktiyê bikî, lêbelê di derbarê te de rêzik û sinc nayê xe- bitandin, tê weke gelekî serdemê ku bêdilî nêzîkî bibin were nir- xandin û tê bibî qurbanê xiyaneteke herî nebaş. Tê ji mafê mirovan ê herî bingehîn ku

pêdiviye yê te be, bêpar werî hiştin, lêbelê tê we- ke civakeke mirovan a herî tawanbar werî îlankirin. Tê jibo suxreya herkesî amade bî, lêbelê tê ji naletbûnê rizgar nebî. Tê bişibî miro- vên hemdem, tê mîna wan bî, lêbelê di derûna xwe de, tê ji ti nir- xên serdemê nesîb negirî. Weke gelên reş, zer û çennsor ên serde- ma modem, tê layîqî koletiyê jî neyê dîtin. Tu bi statuyeke wisa, bi Kurdîtiyeke ku kirine xefikê re rûbirûyî ku, qet ne gengaz e ku mî- nakên din wiha hebin. Kurd tê mandelekirin, dibêjin ***'hebûneke wi- ha tine',*** dîsa jî tirsa herî mezin, ji vanê ku tên mandelekirin dibe. Ji tiştekî ku nebe çawa ditirsin? Tê bibêjî heye, tê bibêjî weke he- mû hemwelatiyan xwedî her mafî yî, lêbelê tê jibo zimanê wî ku li- ser lingan nîvco mayî, mafê îfadekirineke azad nedî. Pirsgirêka ser- dema me ku herî zor çareser bibe yê ev be.

Serdema kapîtalîzmê ya ku qewm û komên etnîk, bi hişmendi- yeke neteweyî û bicoş rabûne ji pêyan, Hewayeke wisa dide kur- dan, weke dema nexweşiyeke ku jê ranebin. Hêviyên jiyanê wesfê neteweyî û civakî winda dikin, dixindirin nava nezaniyeke tarî, kêmtaqete ku xwe terîf bike, Ser mîrîşkeke hevûdin dikûjin, lêbelê ji ber mafê xwe yê jêneger dikeve rewşeke ku xwe neqeliqîne. Bû- yer û pirsgireka Kurd, bi terîfkirinên ku bêtin vekirin, eslê wê rew- şeke ji pirsgirêkeke neteweyî wêdetir, dijî. Serdema kapîtalîst, him serdemeke ku hişyarbûna neteweyî destpêkiriye û dewletên netewî pêkhatine û him jî serdemeke ku bûye hêviya çareseriya gelek ko- mên netewî ku hê di asta pirsgirêkê da mane. Heger ku ji aliyê kur- dan ve, terîfkirineke serkeftî û rêya çareseriyê nehatibe pêkanîn, se- dema vê ya bingehîn ev e ku, bûyêr di xwe de rast nehatiye terîfki- rin. Naxwe, ravekirina bi sedemên weke perçebûna zêde, şêtbûna dijmin, mizawiriya stratejiyê û paşmayina civakî, ne rast û ne ba- werdêr nabin, heger bibin jî, nabine encameke serkeftî. Heger pirs- girêkeke ku dike carbar li holê hebe, tişta li wêderê tinebe çareserî ye. Ev mijareke bingehîn e ku, di bingeha her pirsgirêkekê de, êş- nasiya (teşhîs) çewt û ne bitêrayî heye.

Dema ku me PKKê weke rêxistineke hemdem a rizgarkeriya ne- teweyî terîfkir û em ketin rê, weke baweriya bi Quranê, me ewleyî bi rastiya xwe dianî û em êmîn bûn ku emê serfiraz bibin. Rastiya derketî holê, weke di mînaka sosyalîzma reel de hatî dîtin, heger hi- kim li ji

siseyen yeka cîhanê bike jî, sazûmaneke ku ji dogmatîzmê rizgar nebe, dewleteke ku 70 salan domandî û ewqas bihêz be jî, ji jevketinê rizgar nabe. Ev nêzîkbûn, mafdariyê bi kapîtalîzmê nade qezenckirin. Berevajî vê, nîşan dide ku, pirsgirêkên ku rê li ber wan vekirî, rast û bi têrayî terîfnekirine û çareseriyên wê jî ne ewlekar in. Dîsa ev nayê wateya ku dev ji hewldanên çareseriyê berdin. Be- revajî vê,pêwîst dike ku, çareseriya ku li gor derûna şoreşgerî ya zanistiyê, bi israr were lêgerîn û pêkanîn. Dema ku çewtiya nêzîk- bûnekê û pratîkê an jî nê têrayiya wê derkeve holê, bi israr nîşan di- de ku, ya rastir û tekûztir heye, pêwîst e lê were gerîn û bête sepan- din. Ev rastî, digel evqas êş û windabûnan, nayê wateya ku ji nû ve vegeriyane destpêkê. Pêvajoya ku em di nava wê de, pêwîst e ji serî heta bi binî bi kûrayî bête rexnekirin û rastkirin, rastiya ku tê bêrî- kirin û annanckirin, bi pîvanên baş û rind werin bijiyankirin.

Heger em ne baldar bin, dogmatîzma ku ji zanist tê, ji dogmatîz- ma ku ji mîtolojî û ol tê, ne hindiktir korker e, herwiha ji encamên xeter paşde namîne. Weke ku di rastiya sedsala 20an de jî tê çavdê- rîkirin, ê rê li ber pratîkeke herî bixwîn û êş a dîroka mirovatiyê ve- bike. Xeteriya nêzîkaya pozîtîvîst, li vir derdikeve hemberî me. An- gaşta vê nêzîkayiyê ev e: Serdema me serdema ku zanist serdest e, herwiha her tişta ku li gor zanistê tê kirin, rast û mafdar e. Di vî ba- betî de, Hîtler pozîtîvîstê herî mezin e. Lêbelê tişta ku kirî, ji çend fanatîkan pêde ti kes napejirîne. Bi rihetî em dikarin bibêjin ku, dogmatîzmên bi pozîtîvîzmê ve girêdayî, rê li ber sepînên herî xe- ter ên dîrokê vekirine. Di vir de nayê derpêşkirin ku ji zanistê gu- man bêtin kirin. Berevajî vê, zanistîtî rêveberiya nêzîkbûneke herî zor pêdivî dike, heger ku bextewariya mirov annanca bingehîn be, di vî derbarî de, berpirsiyariya neyîniyeke ketûber ku derkeve holê jî, heta bi dawî his bike, fennan dike ku, pêwîst e bi hemû encamên felsefeyî û sincî re, bi teqezî here guherîna rêbazê. Bi taybetî zanis- tîtiya di serdema sosyalîzma reel û kapîtalîzmê ya hoveber de, pir-

siyariyê pêwîst dike. Heger ev neyê kirin, ji çareseriya pirsgirêkên ku mîna dêwan, encex hêvî werin qutkirin. Heçku qedera zanistê ya jibo mirovatiyê, ne ev e. Dem dema çareseriyeke li pêşya hemû de- man e, bi wateyeke din, dem dema derîvekirina ji bêmirinî re ye. Bi van rexneyan re, baweriya ku li zanistê dibe, pêwîst dike were ba- werkirin ku, şensê çareseriya pirsgirêkên herî giran ên civaka mi- rov, bi teqezî heye.

Dema ku em bi vê perspektîfê, li bûyera Kurd û pirsgirêkên ku rê li ber wan vekirî binêrin, tê dîtin ku, nêzîkbûna zanistî liqasî ku çreseriya pratîk bigire, pêwîst e bigihîne rastiyeke resen û di asta afirîner de. Piştî navbera 30 salî, careke din bi çarçoveke dîrokê, destpêkirina dahûrandina kapîtalîzmê, di vê wateyê de ne vegera ji serî de ye, weke pêdiviya girêdana bi bîranînên êş û windabû- nan ve, jibo layîqî hemû mirovatiyê û gelê xwe bin, bi baweriya ku teqez yê serkeftî bibe, destekê bidine hewldanên azadî û wek- heviyê, di bin her mercî de xwedî derketina li peywira pîroz a te- kûz û bi sinc e.

Pêlên serdema kapîtalîzma ku bilind dibin, di destpêka sedsala 19an de, Rojhilata Navîn bêhtir dike bin bandora xwe. Li hember serdestiya aborî, siyasî û leşkerî, tişta ku Imperetoriya Osmanî yê bikaribe bike, gelekî bisînor in. An yê serdestiya sazûmanê bipeji- rîne û xwe di nûsaziyan re biborîne, an jî bi bêhêvîtî, bi berxweda- neke kevneperest û polîtîkaya terazê, yê roja xwe biqedîne. Di na- va van herdu meyldariyan de diçe û tê. Dused sal in ku herêmê xwe ji vê pêçokeyê rizgar nekiriye. Ne derketineke ku bibe altematîf, ne jî çêtirgirtina nûsaziyeke hişmendî û lihevkirî, bi biryardariyeke ku te xwestin nayê meşandin. Di vê de, binyata şaristaniya kevneşopî ya herêmê û hêzên teraza der û hundir ên ku lihevdixin, rolê dilî- zin. Hemû hostatiya siltanên osmanî ev e ku, di vê lîstika terazê de, hinekî din temenê xwe dirêj bikin e.

Li herêmê,hilweşîna împeretoriyê bi jevketêna teraza derve re, bûye yek. Li Ewropa, teraza ku di bin serokatiya Îngîltere de hatî damezrandin, bi destpêka şerê cîhanê yê yekemîn, bi têkçûna Al- manya, bi encam dibe. Herwiha împeretoriya Osmanî ku hevgirtiyê
Almanya jî, hildiweşe. Tevaya Rojhilata Navîn bi mêtingehbûnê re rûburû dimîne. Herêma ku di pêvajoya 15 000 salan de, timî Ewro- pa

him daringî û him jî menewî xweyîkirî, êdî bi têkçûnekê re rû- birû dimîne. Ji pêvajoya nû re, bêhtir ji têkçûnê, gotina serdestiya şaristaniya Ewropa, yê rastir be. Şaristaniyên tên hember hev, ji yê têkbirî û têkçûyî bêhtir, aliyê afirînerî û pêşveçûyî bêhtir rola diyar- ker dilîze. Ango aliyê dostîtî ku ji pêşveçûnê re suxre dike, li gor aliyê dijmintî ku ber bi paş ve dibe, girantir dikişîne. Saziyên ku şa- ristaniyan li hember hev weke dijminan nîşan didin, çewt in û ge- lekî mezin dikin. Bêguman lihevdanên cudahiyan û aliyên wan ên ku rê li ber şeran vekirin çêbûne. Di zagonên bingehîn ên pêşveçû- na diyalektîkê de, hebûn û yekbûna dijan di nava tevayiyekê de ye. Bandorkirina du serikan a li hember hev, bi temamî ne di şêweye- ke ku hevûdin tinebikin de ye, xwedî taybetiyeke wisa ne ku cîhê xwe bidine sêyemîn zayendekê, sentezeke din. Hemû bûyerên di gerdûnê de, li gor vê zagonê derdikevin holê. Di bûyerên veguhe- rîna civakî de jî, ev pêvajo derbasdar e. Lihevxistin û veguherîna şaristaniyên ku yekîtî û cudahiyên şêweyên civakan ên herî berfi- reh îfade dikin jî, di bereka vê zagona gerdûnî de ye. Bi temamî ne têkbirin û tinekirina hev e, derketina sentezeke rasertir esas e. Se- rekbûna aliyekî, vê rastiyê û zagonê ji holê ranake an jî naguherî- ne, mijara aliyên serdest derdixe pêş.

Dema ku di vê bingehê de bête nêrîn, serdestiya ku şaristaniya Ewropa li hember şaristaniya Rojhilata Navîn qezenc kirî, li qasî ku rastiyeke, ev bi temamî weke têkçûn û neyîniyekê nayê nirxan- din. Nirxandineke bi vî rengî, encex jibo hêmanên paşverû û kev- neperest ên ku, ji bingeha xwe ya şaristanî bêxeber, herwiha jiho- lêrakirina wan jênerev dibe û yên ku temenê xwe dagirtin re, der- basdar dibe. Heyînên şaristaniyan ên payîdar, bi xweyîkirina ji aliyê yên din ve, bi sentezeke rasertir, dikarin bikevine rêya pêş- veçûnê. Di mîrateya şaristaniya Rojhilata Navîn de, gelek hema- nên ku ji holê rabin hene. Ji xwe di nava demê de yên van bavê- jin zembîla (selik) sergo ya dîrokê. Lêbelê taybetiyên wê yên pa- yîdar ku berendamên sentezên raser jî hene. Berxwedana van na- şibe berxwedana kevneperstî û paşverûtiyê. Berevajî vê, berxwe- dana derûn a mafdar, jiyanî û xwedî behre qevastinê, weke ku bingeha pêşveçûnên bingeh e, heger bisînor be jî, li Rojhilata Na- vîn di vê bingehê de derawayeke antîtezê heye û bi israr

xwe di- de domandin.Li hember pêşveçûna şaristaniyeke raser re ku diqu- rifin û dikevin nava berxwedanên bêhêvî, di demeke kin de bi be- şên amadeyî teslhniyet û xulamtiyê re heman kategoriyê derdixin holê. Ev beşên ku rewşa wan serpeyî û serobero ye. Li hember vê yekê, yên ku bi nirxên pêşvebir ên şaristaniya raser re lihevbikin, wan bipejirînin, lêbele li hember aliyê raseriya di sînga xwe de ku bibin desthilatiyeke yek alî, serdestiyê, heta bibe ber bi tinekirinê, liberxwebidin, yên beşa payîdar û pêşverû temsîl bikin. Di vî ba- betî de, dîroka ku bi lihevdan, lihevkirin û bi sentezên nû yên pêş- veçûyinê, were terîfkirin, nezîkbûneke zanistir e. Li Ewropa û Rojhilata Navîn lihevdan û lihevkirina şaristaniyê û çuyina ber bi welidandina sentezekê mijareke rojanî ye, roj bi roj di rewşa bû- yer û qewimînan de, bi awayek peroşdar tê şopandin.

Di vê pêvajoyê de li Anatolya di bin serokatiya M. Kemal de, şerê rizgariya neteweyî ku pêşdikeve û esasê wê bi viyana gelê Tirk û gelê Kurd ve girêdayî, xwedî derûneke wisa ye ku, aliyê wê yê payîdar û pêşverû bi giranî ye, xwedî li taybetiyên şaristaniya Ewropa yên bi erênî derdikeve, lêbelê li hember aliyê wê yê Çew- sîner jî derdikeve.Hêz û serkeftina xwe ji vê derûna ku mafdarî û pêşverûtiyê nîşan dide, werdigire. Digel vê yekê, alîyekî wê yê na- kok heye ku, him dibe benpêk û him jî li hember taybetiyên ku ji- bo pêşveçûna zêde yê suxre bikin, derdikeve. Vî aliyê nakok, we- ke xwe li damezrandina Komarê jî vedaye. Her çiqas ku komar, bi dijderketina li hember hêmanên serpeyî yên paşverû û kevneperest mafdar û serkeftî bûbe jî, jiberku nebû bersiva xwestek û nirxên gel ên payîdar ku dixwestin pêşvetir herin û heta bi derketina li dij wan jî, bêmaf û ewqasî jî semekeftî ye. Digel ku di derbaskirina bennayînên feodal de roleke erênî dilîze, bersivdayina bi şovenîz- meke zêde ya li hember pêşveçûnên nirxên payîdar ên gelan û ji- berku demokratîkbûn bi temamî pêknaniye jî, roleke neyînî lîstiye.

Negihîştina pêşveçûneke lezgîn a bilind, ji ber vê şêweya nakoki- ya di sînga wê de ye. Heta ku ber bi demokratîkbûnê ve û bi awa- yek erênî neyê dahûrandin, ev nakokiya ku sedema vê qeyrana îro bi kûrayî berdewam dike ye, yê jênerev be ku, roj bi roj bi bando- ra xwe ya rizîner berdewam bike. Ev nakokiya di destpêka koma- rê de, hemû aliyên xwe yên neyînî,bi qeyranên di roja îroyîn de, derdixe holê û pêşkêş dike, Her roj îlan dike ku, pêwîst e çareserî di bingeheke erênî de be. Heta ku ev nakokî neyê dahûrandin çi- qas ku bi rêbazên hostatî bête nixûmandin û tepisandin jî, di wê behreyê de ye ku di neyîniyeke pir piçûk de jî, mîna erdhêjekê yê serê xwe ji bin erdê derîne û heyîna xwe nîşan bide, diyar e ku ti mînak weke qeyranên di sala 2000an ên li Tirkiyê de, nikarin vê yekê evqasî rast derbixin û biçespînin.

Welatên Rojhilata Navîn ên din, bi derengî be jî ketine rewşeke ku modemîteyeke bi şêweya Tirkiye, bi wergiriyeke teng bidin me- şandin, lêbelê ev jî derawaya nakok a bi vî rengî, hê kûrtir dijîn. Welatên ereban ku bennayiyên feodal bi zexmtir, ji aliyê şaristani- ya Rojava ve hatine hînkirin û jiyana xwe di rewşeke teslîmiyetê de, didomînin. Li nav qerantî û mîrîtiyan, ev rewş derbasdar e. Der- ketinên di bingeha burjûva piçûk de û modemîstên ku bi angaşta veguherînên tundraw derketine holê, digel ku feodalîzm derbasne- kirine, ber bi demokratîzmeke lihevkirî jî neçûne, ji rola qerantiye- ke hemdem ku lîstine wêdetir,tiştekî din nekirine. Evan ne bi bin- gehên dîrokî yên Rojhilata Navîn re û ne jî bi krîterên demokratîk ên ku şaristaniya hemdem berê xwe daye wan re, girêdaneke biwa- te pêkneanîne. Li hember neteweperestiya Îsraîl a ku bi terazên navneteweyî ve girêdayî, bi neteweperestiyeke Ereb ku rojê biqedî- ne, bûye polîtîkaya bingehîn. Bi vê yekê re, civakan li hember pirs- girêkên aborî, civakî, demokratîk, çandî û siyasî ku her roj zêdetir dibin re, dide gewixandin. Ew behre nîşan nedane ku, taybetiyên şaristaniya Rojava yê erênî bixûnifînin û reseniyên xwe derînin ho- lê. Rewşa nakok a bi şêweya Tirkiyê ku li van welatan tê jiyandin, her çiqas ku ji ber hatiniyên petrolê demakevin holê jî, bi hatiniyên ku kêm bibin re, yê xwe bi teqînên civakî yên mezin nîşan bidin.

An demokratîkbûneke bi temamî, an jî rizîn û qeyrana timî, heta ku di rewşeke rojanî de, di bingeheke erênî de neyê çareserkirin, yê heyîna

xwe berdewam bike.

Welatên mîna îran, Pakîstan û Afganistan, bi nakokiyan tijebe jî, bi rewşên heman şêweyî ve rûbirû ne. Ji destpêkê heta bi çaryeka dawî ya sedsala 20an, dema rêbazên kemalîst ku ceribandin negirt, pedivî dîtin ku xwe bi îslamtiyê ve girêbidin. Ev rewş li hember şa- ristaniya Rojava têkçûn û semekeftinê îfade dike. Derbaskirina rewşa teslhniyeta ku derketiye holê ya bi bizava îslamtiyê jî, weke ku di mînaka Afganîstan de tê xuyakirin, ji dehefandina derê serde- mê û ji ketina derawayeke herî paşverû pêde encameke din nade. Li Pakistan qayîşkêşiya benda rêveber a leşker û şarwer ku di bin kemna îslamtiyê de, ti rêyên derketinê yên serkeftî nîşan nedane. Derawaya van a heyî, ji rêxistinbûneke olîgarşiyê û wêdetir ne xwedî wateyekê ye. Digel ku şoreşa îslamiya îranê, weke bizaveke gel a li hember sazûmana şah pêşveçûbe û serkeftî bûbe jî, ziq ra- westîna wê ya di demokratîkbûnê de, di rewşa pirsgirêka bingehîn de ye. Hisdike bila neteweperest, hisdike sosyalîstê reel û hisdike bila bi şêweya kemna îslamtiyê be, hemû nêzîkbûnên bîrdoziyî û polîtîk ên ku hatine ceribandin, jiber ku gihîştina krîterên şaristani- ya demokratîk bingeh nagirin, rizgarbûna wan a ji nakokiyên kûr ku dijîn, gengaz nabe. Hemû welatên rojhilata navîn, an ê bi te- mamî bi pîvanên demokratîkbûnê re bibine yek, bi aliyên şaristani- ya hemdem ên bi erênî re lihevbikin, nakokiyên xwe çareser bikin û bikevine rêya pêşveçûnê, an jî yê di rêbazên ku heta niha ceriban- din de israr bikin, yê birizin û qeyrana xwe kûrtir bikin û di sînorê teslhniyetê de dombikin.

Aliyê giran ê destekarîtiya Ewropa ku di serê sedsala 19an de lezgîn bûyî, mêtingehkarî ye. Serdestî û azweriya karê bêsînor, pêkera (faktor) zextker a bingehîn e. Annanca bingehîn, têkbirina Rojhilata Navîn û teslhngirtina wê ye. Kurdan, mêtingehkariya ku ji serdemên pêşî û navîn ve nasdikirin, bi vê şêweya nû di xe- fika ku xistibûnê de, pêşwazî kirin. ***"Xefka Kurd"*** têgîneke polî- tîk e ku pêwîst e gelekî baş bête dahûrandin. Bingeha wê digihe heta bi mêtingehkariya Sumer. Ev xefk bi pûtepêdayin û timî bi zexmkirin hatiye amadekirin. Çarçova ku em ji dîrokê re xêzik di- kin, di derbarê vê xefikê de ye û hewl dide ku pêkerên wê yên se- reke diyarker bike. Em van dubare nakin. Encex ên ku bi destê ka- pîtalîzma Rojava hatine zexmkirin, ên herî xeter in. Herwiha

nas- kirin û dahûrandina “Xefka Kurd” a bi bingeha wê ya dîrokî re, bi ya ku bi kapîtalîzmê ve girêdayî hatiye damezrandin, girîngiyeke mezin digire ser xwe. Ev xefka ku dused sal in ji nû ve hatiye hû- nandin û zexmkirin, tê çi wateyê?

Mijara yekem, kapîtalîzma Rojva ji dêvla ku Imperetoriya Os- manî hilweşîne, bixe rewşeke ku nikaribe ji nav derkeve û pêre nebe serî, girêdana siltan û çend burokratên girîng a bi xwe ve, ji- bo berjewendiyên xwe çêtir dîtin. Bi pêwana van ê bikaribe li he- rêmê kontroleke li gor xwesteka xwe pêkbîne û him jî, hînkirina gelên serhildêr ê hêsantir be. Ev rêbaz bi taybetî ji aliyê Impere- toriya Brîtanya ve hate ceribandin û vê yekê temenê Imperetoriya Osmanî sed salan dirêjkir. Nêzîkbûnên Abnanya û Fransa jî bi vî rengî ne. Lihevnekirinên di navbera wan de, liser teraza Rojhila- ta Navîn nayê nîşandan. Siltanekî ku baş bi wan ve hatî girêdan û burokrasiyeke ku hatî lihevparkirin, jibo annancên sedsala 19an, derawayên herî bikêrhatî pêkanîbûn. Bi vî rengî, li qasî ku gav bi gav belav bibin, yên ku li hember vê yekê derbikevin, bi darê os- maniyan li wan bixin, dibe rê û rêbaza herî baqil. Baskek ji yê xefkê, bi vî rengî tê zexmkirin.

Mijara duyem an jî baskê xefkê, bi gelên ji binyata xiristiyan girêdayî ve, tê pêşvebirin. Mêtingehkariya Rojava ku bi vê rêba- zê qaşo dixwest gelên Rûm, Ennen û Asûr rizgar bike, rêya jiho- lêrakirina wan a herî xeter vedikir. Hemû gelên Rojhilata Navîn, bi van lîstikên di nava lîstikan de, dibûn qurban. Kevneşopiya qurbankirina zarokan a li hember karesatan, vê carê ne ji aliyê xwedayan, bi destê hemzayendên ku xwe dost nîşan didan, diha- te meşandin. Mêtingehkariyeke nazik, bi destê çendeke hevkar, yê tevaya gelan ji welatên wan ên hezar salan bike der, ji çanda wan qut bike û li hevûdin bike neyar.

Di nava vê tabloyê de, rewşa kurdan bi temamî kobaytî ye. Di rewşa alavekî ku ji aliyê her cureyê mêtingehkariyê ve bête bikara- nîn de ye. Ji destpêka sedsala 19an û pêde, kurdên ku yê mîna ma- şikekê werin bikaranîn, bi taybetî ji aliyê îngilîzan ve, jibo ku rêve- berên tirk, ecem û ereban bi xwe ve girêbidin, yê di rola qirasekî de werin bikaranîn. Polîtîkayke “se bi se dayin qirkirinê” dixin dewrê an jî, polîtîkayeke ku bi kevirekî çen çivîkan bikûjin, mînak digir- in. Bi destavêtina carekê re,

hevkarên Kurd hatine qezenckirin. Rê- veberên Tirk, Ereb û Ecem ên ku ji vê rewşê ditirsin, bêhtir bi wan ve ten girêdan. Gelên Ennen û Asûr ku ji aliyê kurdên feodal ên havkar ve tên çewsandin, bêhtir mecbûr dimînin ku xwe li wan di- girin. Siltan, şah û melîkên ku vê lîstikê ji destê duyemîn didin me- şandin, vê yekê weke merîfetekê dibînin. Ango polîtîkaya qirkirina se bi sê ku liser wan tê leyîzandin, ew jî liser dijên xwe bikartînin. Gelên ku dikevine rewşa qurbaniyê, li gor lîstikê çi fennanî wan bi- kin, ji bicîhanîna wê pêde ti rolên wan ên din namînin.

Herçiqas ku qurbanên sereke yên xefkê Kurd bin jî, mîna gotina *“bi cîranê xwe neke ê were serê te* ”, ev xefk ê hemû gelên herêmê têxe nava xwe. Kurd, ji tineyiya derfetên stratejîk, perçebûna zêde û jiberku hêza xwe nakin yek, alavên vê lîstikê yên herî erzan in. Digel ku di vê yekê de, azweriya karê kapîtalîst a ku ti rêzikan nas- nake, lîstika felsefeyê ya di derûnê de be jî, rewşa ku di dîrokê de jî bi vî rengî hatine bikaranîn, rê li ber derawayeke wan a herî bi ne- yînî vekiriye. Gengaz e ku em bibêjine vê yekê, polîtîkaya ***“Kivroş- kê bazbide, tajiyê bigire”*** Herwiha, aliyên ku ji xwe re weke pirs- girêkê dibîne heta bi dawî bikartîne, diwestîne û di dawî de jibo de- ma ku jê re pêdivî be carake din bikarbîne, lê xwedî jî derdikeve. Dema ku em dibêjin kobaytî, em vê rastiyê tînin zimên.

Bêguman, rewişta Kurdên hevkar ên tebeqeya raser ku ji he- zar salan ve hînbûyî kartêkereke girîng e. Rewşa gel a di nava nezanînê de, perçebûna wî û rewşa wî ku li hember hev hatine sî- qilandin jî, timî zemîneke bikêrhatî pêşkêş dike. Liser hemû ser- hildanên kurdan ku di sedsalên 19 û 20an de, di bin sîya mêtin- gehkariya kapîtalîst de hatine pêşxistin, ev lîstik hatine lîstandin

û serkeftî jî bû ne. Sedemên serhildanê yên mafdar jî, ti wateyê îfade nakin. Mijara herî girîng ev e ku di encamê de, kê winda ki- riye û kê jê sûd wergirtiye.

Heger ku Kurd serî hildin û li mafên xwe bigerin, dibe encame- ke biêş, Heger ku negere û li cîhê xwe raweste, tişta hê bêhtir ne baş tê serê wî. Dema em dibêjin ketina davik an jî xefkê, em vê rastiyê dibêjin. Karesatên bi vî rengî, hatine serê hindik gelan. Heger ku dîrokzaniya Kurd bikêrî tiştekî were, pêwîst e herî bêh- tir vê rastiyê dahûrîne. Heger em çend mînakên tîpîk vekin, rewş yê bêhtir were fêmkirin.

Dema ku îngilîzan di pêncîh salên pêşî yên sedsala 19an de, ji bo rêya Hindistan û ji ber dewlemendiya kan û petrolê dest avêt Iraqê, ev yek ji xwe re kire polîtîkayeke bingehîn ku, kurd, ereb û asûri- yan li hember rêveberiya Tirk, ya herî ne baş jî li hember hev bikar- bîne. Pêşî Kurd sîqilandin û got “ez li pişta we me”. Tirkiye ku ke- te astengiyê, bêhtir nêzîkî wan bû. Asûriyan ji ber xiristiyantiyê, ji wan webû ku hevgirtiyekî xwezayî dîtine. Ereb di rewşa hevkarên ku herî bêhtir xwe li wan girtibûn de bûn. Dema ku em hatin sala I850an, dawî bi serhildana di bin serokatiya ***Bedirxan Beg*** de, per- deya yekem a lîstikê bi serfirazî hatibû lîstin. Mêtingehkariya Ingi- lîz pêşveçûneke mezin pêkaniye û rêveberiya Tirk gelekî ji hêza xwe winda kiriye. Ereban efendiyê xwe yên nû dîtibûn. Bi asûriyan re hêviyeke sexte dabûn hişyarkirin. Kurd weke qurbanên lîstikê yên ku herî êşê dikişînin, bi perçiqandinê re rûburû hatibûn hiştin.

Di pêncîh salên dawî yên sedsala 19an de, vê carê di bin sero- katiyê ***Seyîd Taha*** de, bi serîhildana ***Nehrî,*** lîstik liser îranê tê lîs- tin. Encam dîsa bi heman rengî ye. Şahîtiya îranê nêzîkî revebe- riya Ingilîz a mêtingelikar dibe. Asûriyan qenc û qenc xwe sparti- ye wan. Kurd dîsa bi encameke biêş re rûburû dimînin, him tên perçiqandin û him jî, bi hoveberiyê tên dexmekirin û di derawa- yeke tawanbar de tên hiştin.

Ya herî biêş jî, serhildana ***Şêx Seîd*** a di sala 1925an de ye. Ingîl- tere dixwaze jibo petrolê, Kerkûk û Mûsilê li derî *“Peymana Nete- weyî”* bihêle. Komara Tirk ya di bin serokatiya M. Kemal de, ji daxwaza mafê liser herêmê naqere. Kurd û Tirk dixwazin pêwîsti- yên Peymana Neteweyî bi cîh bînin. Di van mercan de, dîsa pêlîs- kên mêtingehkariya

Ingilîz dikevin dewrê. Jibo ku bi kevirekî çend çivîkan bikûjin, lîstik amade ne. Baweriyê dide kurdên nêzîkî xwe ku yê alîkariyê bi wan re bike. Di dibêtiya serhildanekê de ku yê baweriya wan lê were, hêviyan sexte bi wan re çêdike. Dema ku serhildan destpêdike, bi hikûmata kemalîst re re lihev tê. Dabeşki- rina herî kûr a di qedera Kurd û Kurdistanê de, pêktîne. Iraq li piş- ka (par) wê ketî ye. Tirkiyeya kemalîst di dema wê ya herî zor de, nêzîkî xwe kiriye. Komarê dişîne ser kurdan û wan dixe nava as- tengiyeke kûr. Careke din, polîtîkaya ***"dabeş bike û rêvebibe"*** an jî, se bi sê bide qirkirin û lîstika ***"kîvroşkê bazbide, tajiyê bigire "*** bi awayek serkeftî tê lîstin, bi kevirekî çend çivîk hatine kuştin. Ko- mar kurdên ku heta doh hevgirtiyên wan ên stratejîk bûn, jibîr di- ke, giregirên wan darde dike, herwiha jê wê ye ku pirsgirêkeke dî- rokî çareser kiriye. Serî li rêbazên mandeleker û tepisandinê dixe. Bi vê lîstikê, ji polîtîkaya osmaniyan paşdetir dikeve û yê têkeve nava pirsgirêkeke ku wê herî bêhtir bide lebikandin. Li vir ne tenê Kurd, Komar û Tirk jî têne lîstikê. Emperyalîzm û mêtingehkarî, te- nê bi aliyekî re nalîze. Rêzika wê ev e ku, bi herdu aliyan re bilîze û biryara xwe bi aliyê ku herî jê re baştir re bide.

Di van deman de, di salên 1920-25an de, heman lîstikên polî- tîk liser îran û Iraqê tên lîstin. ***Smayîi Simko,*** digel piyonekî ku ji aliyê hemû hêzan ve dihat bikaranîn bû, jê wê ye ku ew wan bi- kartîne. Di encamê de bîrûbaweriya wî, digel derfetên mezin jî, dibe sedema windakirineke herî ne baş. Dema ku bikaranînên bi armanca taktîkê, di dema xwe de, bitêrayî û bi awayek rast neyên nirxandin, kesên ku tên bikaranîn, karesatên herî mezin tînin se- rê tevger û gelan.

Li Kurdistana Iraqê, tevgera di bin serokatiya ***Mahmûd Ber- zencî*** de jî, encam bi vî rengî ye. Bikaranînên li hember hev ên di qadên taktîkên teng de, heger ku ber bi encameke bihêz a derûn ve neyê birin, ji aqûbeteke neyînî nayê rizgarkirin. Di vir de em sûc te- nê naxin aliyê serokatiya serhildanê û yên lîstikvanên bingeh ku dijminê gel, ji ber çavan dûr nakin. Berevajî vê, em dixwazin bînin ziman ku em dizanin xefka Kurd, xwedî damezrandina mantiqekî bi çi rengî ye û pêwîst e gav bên avêtin.

Nîşandana van senaryoyên dawî, yên ku ji şerê cîhanê yê duyem heta

roja me hatine lîstin in. Di dorhêla ku şerê cîhanê yê duyem rê li ber vekirî de, partiyên di bin navê ***PDK*** de ku xwestine pêşbixin, xulamtiya kevneşopî, hevkarîtiya hemdem bi hev re meşandine û bi pratîka xwe, ne ji endamên xwe bi tenê re, ji hemû gelê Kurd re jî bûne mînakeke ne baş. Di tevaya cîhanê de, digel ku serkeftina te- koşînên azadî bûne rêzik û digel ku gelê Kurd bi destê PDKê win- dakirinên herî mezin dane jî, van rêxistinan xwe ji lîstokên di des- tê lîstikvanên taktîk de rizgar nekirine. Bûyera Kurd ku li hember mêtingehkariya Rojava, di asta têgihînê de jî pêşveçûnek nekirî, jê- nerev bû ku bikeve pêvajoyeke tarîtir.

Tirk, ereb û ecemên ku li hawîrdor cîranên wê, digel ku bi destê dewletê jî be, bi ketina rêya kapîtalîstbûnê, navber hê bêhtir veki- rin. Lê vê, serdestbûna çînî û serdestiya neteweyî ya dema feoda- lîzmê, avantajên çîna burjûva û neteweya serdest a serdema kapîta- lîzmê jî zêde kirin. Digel di mercên bindestiya emperyalîzmê de be jî, di warê aboriya neteweyî û çand û dewletê de, pêşveçûn doman- din. Di warê zanist û teknîkê de, tebeqeyeke bijarte ya netewî pe- kanîn. Çapemenî û weşanên bi zimanê neteweyî, bûne hêzeke bi se- rê xwe. Bi polîtîkayên der û hûndir ên ku bi neteweperestiyê ve gi- rêdayî, hntiyazên neteweyî di keseyatiya çînên xwe de, bi berje- wendiyên berbiçav zexmtir kirin. Pergalên leşkerî û polîstiyê yên ku berxwedana gel bişkînin, damezrandin. Ev rastiyek e ku, tirk ereb û farisên ku weke neteweyên serdema navîn ên bihêz, di pêva- joya sedsala 20an de, ev bûyêr jiyane, bi çînên burjûva û dewletên neteweyî, navbera xwe ya bi kurdan re gelekî vekirine. Hê serê xwe ji lîstikên empryalîstên mêtingelikar rizgar nekirin, vê carê jî xwe bi şovenîzma neteweyî ya cîranên xwe ku mandeleker û çewsîner re, rûburû dît. Dorhêleke wisa hate pêkanîn ku, dema bibêje ez Kurd im, bi tenê bimîne, bibîne ku hemû rê li ber tên girtin û yê we- re wateya ku xwe bi hemû xeteriyan re, rûbirû bibîne. Kurdîtî bi te- mamî li serî bû bela. Ji mêtingelikirinê gelekî wêdetir, mehkûmî statuyeke wisa kirin ku bi tinekirina hemû nirxên wî yên mirovati- yê re, weke hev bin.

Bûyera Kurd, di cîhanê de anîne rewşeke wisa ku, qisûra wê ya polîtîk, têgîneke ku reda wê herî bihêz be. Tişta hatî afirandin, ne

teroreke polîtîk e. taybetiyeke ji dayîkbûnê ve bi xwe re anî ku jê neyê berpirsiyarkirin, dikare karesata herî mezin bîne serê wî. Ni- jadperestî, faşîstî, neteweperestî û komunîstî, têgînên ku dikarin bê- tin terîfkirinê ne. Ev di hiqûqê navnetewî de, hatine nirxandin. Lê- belê bûyera Kurd bi ti têgînan nayê ravekirin. Digel ku ji mafê mi- rovan ê herî ketûber, mînak ji derfetên perwerdeya bi zimanê zik- makî jî hatiye bêparkirin, Kurd ji aliyê ewropayiyên ku xwe herî şa- reza dibînin ve jî, nayên naskirin û bi layîqî nayên nirxandin. Digel ku bi sedsalan suxre ji wan re kirine jî, gotina "birayên me Kurd" deynin dera han, ji aliyê cîranên xwe ve weke çavkaniyeke xeteri- yê tên dîtin.

Li hember vê rastiya mirovatiyê, gelo çawa emê bikaribin ji ke- sayetiyek û psîkolojiyeke Kurd xeber bidin? Emê vê statuya stem- kar a ku li gelekî kedkar ê herî dîrokî tê ferzkirin ku di ti pirtûkên mirovatiyê de derbasnabe, çawa rave bikin? Ti pirtûkên xwedayî, sincî, felsefî û zanistî, evqasî mandeleker û li dijî mirovatiyê, hel- westa xwe nîşan nadin. Lêbelê ev jî rastiyek e ku, li dora bûyera Kurd, weke ku kuneke reş be, dilwasî û têgînên li derî rastiyê tên damezrandin. Herwiha, em vê gelemeperiyê dikin ku, nirxandina bûyera Kurd a weke neteweyek, mêtingehek an jî nîvmêtingehekê, yê sivik bimîne, qurbanên statuyeke ji vê statuyê û wêdetir in. He- ger ku qurbanên nijadkûjî an jî komkûjiyeke vekirî bûna, terîf ê hê- santir bûna.Rewş bi têgînên bi vî rengî jî terîf nabin. Ev terîfên bi mij ên li dora bûyerê jî, rastiya wê ji holê ranake.

Ji bo em bûyera Kurd terîf bikin, ev çarçova dîrokî ku em hewl didin xêzk bikin, gelekî bi kûrayî dikare bête xebitandin. Bi belge- yên şûnwamasî û nivîskî dikare bi têrayî were çespandin. Niqaşa demekê ya ***"Kurd hene an tine ne?",*** ji zanistî zêdetir, ji ber dorhê- la teroreke giran rojeveyî bû ye. Heger ku ji heman neteweyê, çînê û eşîrê be jî, timî herêm û beşên ku derawa û mercên wan cuda bin, hene. Cihêrengî, taybetiyeke xwezayî ye. Em ji ne yek rengiya ro- nahiyê bigirin, heta bi ne yek cureyiya çîçekan, xweza bi xwe jî xwedî zagoneke pêşveçûnê ku ber bi aliyê cudayetiyê û piraniyê de ye. Veqetîna rêngên reş û sipî jî, rastiyeke zanistiye ku, bi rastî jî xalên serik ên ku reng diqedin e. Heger hûn dixwazin biqedin, da- beşbûna we ya bi şêweya reş û sipî bes e. Reşbûna

faşîzmê ya bi navê kapîtalîzmê û sipîbûna sosyalîzma reel a bi navê sosyalîzmê, her yekî ji zorlêkirinê pêkhatiye. Di rewşa berevajî xwezayiyê de, çênebûna temenê dirêj, em ji van mînakên serik ku xwe herî hêzdar berdidin fêmdikin. Ev mînakên sazûmana herî ne baş in ku bûyerên civakî, di bin hêza fizîkî de, wergerîne rengê ku dixwaze, di bere- ka yek ziman, yek çand û yek siyaset ûwd. de, zorê li veguherîna wan bike. Hatiye çespandin ku, di dîrokê de ev encex bi terorê û bi awayek demî yê hebin.

Em çawa terîf bikin bila em terîf bikin, bûyera Kurd, êdî ne rastiyeke ku bi bîrdozî û polîtîkayên zorlêkirinê û pêşdaraziyên me yên neberbiçav, em bikaribin veguherînin, pêwîst e bi hemû diyar- bûna xwe û bi berpirsiyariya sincî û siyasî, were dîtin û nirxandin. Hisdike bila em bi kêmneteweyî û etnîk, hisdike bila em weke bû- yereke neteweyî û civakî bipejirînin, ya girîng wesfên bûyerê yên sereke ne, bûyer bi xwe ye. Ti carî mafê me tine ku em bibêjine yekî ***"ez dixwazim te wiha bibînim*** Ev encex em xwedî fikrên sa- bît yê mîtolojîk ê dema xwedaqeranan bin, heta ku wateyekê îfade bike. Em dev ji nêzîkbûneke di nava sînorên demokrasiya piranîpa- rêz de berdin, di rawêjên herî dogmatîk bîrdoziyî de jî, angaşteke bi vî rengî kor nehatiye kirin. Veguherîna di bûyeran de, nayê mande- lekirin. Lêbelê rêzikên vê, bi girêdana bi zagonên diyalektîkê ve, watedar dibin. Veguherînên ku merc di dema xwe û cîhê xwe de pê- divî dikin, têne wateya dewlemendî û pêşveçûna jiyanê. Çalakiyên ku neyên pejirandin, yên bi şêweya destekariya zarokeke di zikê dayika xwe de ku were veguherandin an jî, zûka were welidandin e. Ti kesên baqil û bijîjkên xwedî sonda xwe, ne xwedî maf û raye- darê emeliyateke bi vî rengî ye.

Em va rastiyên biêş, jibo ferzkirina sepandinên bi şêweya kobay- tiyê ya li bûyera Kurd, rave bikin bê tên çi wateyê, tînin zimên. Em dixwazin bidin diyarkirin ku, zoriyên bûyera kurd ku di hundir de dijî û tênegihîştîbûyên derve, maf nade ti xwedî hêzan ku bibêje ***"di destê min de hêz heye ",*** weke dilê wî bixwaze bisepîne û timî we- ke alavên kobay bide sekinandin. Ji aliyê polîtîkvanên di têgihîna xweda-qeraniyê de, belkî jiber welatparêziyeke bêsînor û liser na- vê mezinatiya neteweyîtiyê, jibo bigihine annancên xwe, hemû tişt mûbah be. Herwiha nêzîkbûnên faşîst û reel sosyalîst, ev yek ceri- bandin. Encamên vê jî li holê ne. Terora li bûyera Kurd tê ferzkirin, ji ber bêxwedîtiyê ku bi nêzîkbûnên xayîntî û xasûkî, heta weke îro tên meşandin, pêwîst e ti xwedî hêzan nexapîne. Dema ku Hz. îsa jî li çarsingê xistin, li hember Roma û pêşgoyên şahidên derewîn bi tenê bû. Tê gotin ku giliyê xwe li cem xwedayê xwe jî kiriye û gotiye, ***"Çima te ez bi tenê hiştim? "*** Lêbelê dema ku em li dîrokê û roja me dinêrin, digel ku îsewîtî rastiyeke gerdûniye û wijdanê mi- rovatiyê yê herî mezin teşkîl dike, yên ku îsa li çarsingê xistine, ji bîranînên bi nalet rizgar nebûne. Bi vî aliyê xwe bûyera Kurd, ji si- yasîbûnê wêdetir, bi temamî ketiye rewşa pirsgirêkeke sincî. Kur- dên ku weke xiristiyanên serdema pêşî, keştiyan dadigirin û xwe davêjin peravên Grekîstan û îtalya û bi rêyên bejî bazdidin Ewro- pa, dişibe dubarebûna dîrokê.

Kurd ne mensûbên olekî nû û ne jî hêzeke ku di ax û milkê hi- neke din de çavê wan hebe ne. Daxwazên kurdan ku em nikarin bi- bêjin daxwazên polîtîk ên pêşketî ne, tenê weke ku di serdema pêşî de di çarçova hebûna çandî de, xwe îfade bikin û wêdetir ti daxwa- zên wan tine ne. Heger ku hebin jî, ev ne di mezinayiya ku jê we- rin tirsandin de ne. Nayê hizirandin ku gelekî bi vî rengî û bitenê, li hember çend hêzên ku ser û binê wan di nava çekan de, xeter be.

Xeteriyea rasteqînî ev e ku, dema pirsgirêkeke bisînor, bigihînin asta bûyereke dîrokî,. Heger em nexwazin encamên wê, hê jî bi êşên mezin bijîn, ev pirsgirêk pêwîst e jibo çareseriyê, herî pêşî we- re nirxandin. Dîroka Rojhilata Navîn, bi bûyerên bi vî rengî tijeye. Dîrokzan jî hemramanin ku, heger îsa li çarsingê nehatiba xistin, xiristiyantî ewqasî pêşve nediçû. Wekî din, heger zilma Neinrûd ne- bûna, pêxember jî

çênedibûn. Ya ku zora derketinê li Mûsa kirî, zil- ma Firewnan bû. Li hember Hz Mihemed çewsandinên Mekeyê ne- bûna, koçberî (hicret) çênedibû. Heger ne bi hişkebawerî bi xweş- bînî nêzîkî wî bûbûna, îslamtî jî yê ne bi vê şêweyê pêkhatibana. Di dîrokê de, sedema trajedî, êş û windayiyên mezin, timî nezanî û az- weriya berjewendiyên ku xwe bi vê nezaniyê ve girêdane û çew- sandin û çalakiya zilina nûnerên wan ên ku bawerhişkiyê çavên wan girtine.

Dramatîzekirina bûyera Kurd û pirsgirêkên ku rê li ber wan ve- kirî, peywira derdorên têkildar e û heta bi ya mirovatiyê tevî ye. Ji xwe li dora vê bûyerê êş û trajediyên mezin hatine jiyandin. Ji ber vê yekê, ti wateya sepandineke ku yê hesabên dîrokî bike û herêmê bîne rewşeke ku ji nav neyê derketin, nemaye. Ev derketiye holê ku polîtîkayên bi vî rengî ti berjewendiyan nadine xwediyên xwe. Em di serdemeke wisa de ne ku mebestên faşîst ên bi korayî û dizoker, li hember wijdanê mirovatiyê yê heyî, ti caran serfiraz nabe.

Piştî pratîkeke domdirêj, dema ku em li xwe dizivirin û li dûv xwe dinêrin, xweştir em dibînin ku, di salên 1970an de, me di der- barê bûyera Kurd de, bi hestyarî, bi nêzîkayiyên bîrdoziyî yên di asta dogmatîk de, peytandin kirine.Ti caran ji azadîkirina bûyerê guman nehatine kirin. Dema zarokekî heft salî be jî, dirûşmeya ***“Heger jiyan hebe yê bi azadî be, an jî qet nabe”*** ku xwediyê wê ye, wateyeke pîroz îfade dike û qet dev jê nayê berdan. Lêbelê dev ji pêdiviya bingehgirtina îfadeya vê ya zanistî jî, nayê berdan. Dog- matîzm belkî jî li qasî ku di ti pirsgirêkan de nebe, di pirsgirêka Kurd de derî ji xeteriyan re vekirî dihêle. Ev peywireke pêşdatir e ku, Zanist ji çil derê xwe ve bête qelaştin, pirsgirêk li gor berje- wendî û rûmeta hemû aliyan were îfadekirin û di vî derbarî de bi- gihine çareseriyên pêdivî. Jiberku di salên 1970an de, ev peywir bi- sînor hatiye cîh, şewşînerên hişmend û ne hişmend, ji xwe re gelek derbasî dîtine û derfet dîtine ku berjewendiyên xwe yên rezîl bido- mînin. Di vê xalê de xwerexnekirin, tiştekî jiyanî ye. Ev mercekî mirovatiye ku pêdiviyên vê yên pratîk pêşdatir werin cîh e.

Ez di vê baweriyê de me ku, çarçova dîrokî ku em dixwazin pêş- bêxin, di bin ronahiya zanînên heyîn de, terîfkirina herî nezîkî ras- tiyê ye. Di derbarê vê bûyer û pirsgirêka ku em temenekî bi bêhne- fişk liser

sift bûn de, Xala ravekirinê ya ku em gihanê, pêwîst e ji hemberên (hevrik) vê bûyerê re jî, weke rêyeke derketinê were dî- tin û mîna qezencekê were berdan. Beşên ji neteweyên serdest ên ku xwe bi awayek vekirî Tirk, Fars û Ereb dibînin, spartekên wan ên der û hûndir, pêwîst e ji çarçova CENTO ya demekê û NATO ya niha derbas bibin û nêzîkî bûyera Kurd bibin. Krîterên serdemê yên demokratîk û çarçova mafê mirovan ên ku timî pêşvediçin, di de- meke ku ne dirêj de be, yê zorê li hemû aliyan bike ku di xaleke hevpar de çareseriyekê bikin.

Rêya ku vê pêvajoyê bi êşû windayiyên herî hindik bike, hestya- riyeke zanistî û ifadeya wê ya di zimanê siyasetê de, baldayina pî- vanên şaristaniya demokratîk ên herî zêde ne. Xeteriya dogmatîk a siya îdealîzm û materyalîzma mekanîk a sedsala 20an ku liser za- nistê, piçûk nayê girtin. Rêya ku ji neteweperstiya kapîtalîst ber bi nijadperestiya faşîst û ji sosyalîzma zanist ber bi serdestiya sosya- lîstiya reeel û têgihînên civakê yên totalîter ve vebûyî, ji nêzîk ve bi dogmatîzma sedsala 20an ve girêdayî ye. Ev jî tê fêmkirin ku di bin vê de têgihîna pozîtîvîst heye. Kûrbûna şoreşa zanistî, daring- perestiya diyalektîk derandiye holê. Raveya felsefî ya curbicûriya xwezayê, di vê çarçovê de bi awayek serkeftî tê kirin. Curbicuriya bûyerên civakî û mantiqê veguherînê ku di vê de rolê dilîze jî, ha- tiye dahûrandin. Eslê wê, bingeha zanistî ya şaristaniya demokratîk jî di vê xalê de derdikeve hemberî me. Di serdemên ramana dog- matîk de, an jî di hemû mijarên ku dogmatîzma serdest derbasdar de, veguherîn bi xiyanetê re yek dihat girtin û dibû mijara cizakiri- nên herî giran. Girêdana van demên ewqasî bixwîn a bi dogmatîz- mê ve, nayê mandelekirin. Heger di dawiya sedsala 20an de, gelek pirsgirêkên ku dema kevin bixwînê dihatin çareserkirin, bi amûrên polîtîk û demokratîk ber bi merhaleya çareseriyê ve hatibin kişan- din, bêguman a ku di bingeha vê yekê de felesefeya veguherîner e. Vedana daringperestiya diyalektîk a li qada polîtîk, gihandina pirs-

girêkên demokrasiya piranîparêz û ên civakî ya derfetên çareseriya dewlemend û aştiyane ne. Pêşveçûnên bi vî rengî, êdî ji nîşandanên nêzîkayiyên felsefî û bemameyên polîtîk wêdetir, weke hewldanên pratîk-polîtîk derdikevin hemberî me.

Ne gengaz e ku bûyer û pirsgirêka Kurd, ji van pêşveçûnan cu- da bête hizirandin. Di pratîkê de hatiye fêmkirin ku, bi netewepe- restiya sedsala 19an, bi neteweparêziya sedsala 20an û heta bi dog- mayên olî yên ku ji serdema navîn mane, ravekirin û rêyên çarese- riya bûyera Kurd, ne gengaz û saxlem e. Di giranbûna pirsgirêka Kurd a di vê astê de, para nêzîkayiyên bîrdoziyî ya alîgiran ên bi vê şêweyê, diyarker bûye. Ya bête kirin ev e ku, ev rastî ji aliyê hemû- yan ve bête dîtin û pêşvebirina hestên bexşîner ên beremberî hev û xwerexnekirinê ne. Divê bête dîtin ku, mehkûmkirin û lêferzkirinên yek alî ji girtina bersivên tund wêdetir, bikêrî tiştekî din nayên.

Bi vê hewldana ku em dixwazin ji nû ve, nirxandinên Kurd û Kurdistanê bikin, sedema pêşvebirina vê çarçoveya dîrokî ku tev- kariyekê bike jî, ji ber pêdiviya nêzîkayiyên rast ên li pêvajoyên ça- reseriya nû ne. Ev derketiye rastê ku, teorî, bemame û pratîka 1970an, yê bikaribe cudaxwazî û şideta bêwate derêxe holê, yê ne- yînîtir jî neteweperestiya ku pêwîst e li dij bin, yê bikaribe hemû aliyan dîl bigire. Digel ku di bingeha wê de li dij tê rawestîn jî, pe- jirandina vê ya mîna qederekê, hişyarbûneke mezin û vegerîna hiş- mendiya pêngava azadiyê ya ji nû ve, pêwîst kiriye. Weke îfadeya paşverûtî, faşîzm û hemûyan, rantperestiya siyasî û aborî û bûyera Kurd ku anîne rewşeke ku emperyalîzm ê bikarbîne, bi taybetî ji aliyê tevgera azadî ve, nayê pejirandin.

Ev nêzîkayiyên me, heger ku bi derengî be jî, annanc dike ku ber- pirsiyariyên me yên li hember van xeteriyan bicîh bîne. Hêvî dike ku, rojekê yê fêmbar bike bê kî li hember welatê azad û komara demok- ratîk di nava xiyanetan de ye. Ev yek, girêdana bi bîranîn û keda yên ku hemû tiştên xwe jibo yekîtiya azadiya mirovatî û gelan, jibo rû- met û pêşveçûna wan danî holê, pêdivî ye bê çawa be îfade dike.

Weke ku berê hate kirin, ez bi wate nabînim ku careke din ez nir- xandinên siyasî û sosyo- ekonomîk ên roja me bi berfirehî bikim.

Hemwelatiyên li kolanan jî, êdî van heta bi mêjiyê xwe his dikin. Dîsa ez biwate nabînim ku peytandinên Kurd û Kurdistanê bi nêzî- kayiyên neteweperestiyeke hoveber û bi çepgiriyeke dogmatîk bi- kim. Di vî derbarî de, yên ku rastiyê heta bi mêjiyê xwe dijîn û yên ku heta bi mêjiyê xwe di xiyanetê de xerq bûne hatine ravekirin û di rewşa lîstika temaşeyê de ne. Êdî welat, civak, rêxistinên civakî yên ser û bin, şêweyên bîrdoziyî û ev hemû têgînên li qasî ku me têkildar dikin, ji aliyê dîrokî ve bê çawa şêwegirtine û hatine heta dema me jî, yekem car bi rasteqînî û bi şêweyeke ku ramanê bi afi- rîne, li holê hatiye danîn.

Bêşên nirxandinên me yên ji niha û pêde, yê di vê bingehê de bin ku em, hinekî din biwergirî nêzîkî tevgera Kurd a siyasî û neteweyî bibin û parametreyên sereke yên rêyeke çareseriya hemdem deynin holê. Heger ku bal bê dayin, nêzîkayiyên bi vî rengî annanc dikin ku, tevgera Kurd a dema nû, di ronahiya ezmûnên ku hatin jiyand- in de, bemameya nû, rêxistinbûn û xeta çalakiyê ya ber bi çareseri- yê, çawa yê bên plankirin û mijar ên werin sepandin ronahî bike.

## D- Tevgera Kurdan a Etnîk, Neteweyî û Demoratîk

Jiberxweveyîbûn û pêkera hişmendîtiya di bûyerên civakî de, li qasî ku ji hev neyên qutkirin, di nava hev de ne. Bersiva pirsa bê yek ji wan ê li kûderê biqede û ya din li kû yê dest pê bike, bi diyarkeriyên mîsoger nayê dayin. Buyer hişmendiyê, hişmendî jî bûyerê pêşvedibe. Ev ne diyarkerên hev ên neguherî, weke vegu- herînerên hev rolê dilîzin. Bûyera civakî, îfadeya rêxistinbûna hemû danehevên dema kevin e, tevgera civakî jî, çalakbûna bû- yerê û potansiyela veguherina wê ya di pêşerojê de îfade dike. Bûyera civakî bi tevayî, daneheva hişmendî û viyanê ye. Tevger jî, bi vê danehevê ve girêdayî hêmana çalak a ku hê netefiya ye û ne veguheriye danehevê ye. Di serê hêmanên çalak de jî, miro- vên ku wê demê dijîn tên. Jibo tevgera civakî, du amûrên bîrdo- ziyî rola bingehîn dilîzin. Bîrdoziya ku em dikarin bibêjin dog- ma, rêzik, zagon, ku diyar dike bê hebûna civakî ya heyî yê di kî- jan çarçovê de bilive, ya ku ji rêzikên dema borî û xeyalên pêşe- rojê yên rakêşer tê holê, enerjiya tevgerbûnê ye. Mercên hilberî- nê, têkiliyên wê, rêxistinên

siyasî, civakî û leşkerî jî, dorhilê da- ringî ya ku bête bikaranîn diderînin holê.

Ji bo civakan, tevgerên hemû dem û serdeman ên li gora xwe he- ne. Tevgera bingehîn a dema neolîtîkê, weke demsalî jibo berdewa- ma jiyana bi xwezayê ve girêdayî, weke olê xwezayê û parçekî ji yê wê, li dora dayîka xwedawend şêwe digire. Çêkirina xwedayên dost ên bi mirovan re, tevgerên herî bingehîn in. Pekanîna dia, qur- ban, ziyafet û cejnan a jibo van, şêweyên tevgerên civakî yên herî gûzîde ne. Pîrozweriya dayîka xwedawend, girêdana bi wê ve, tev- gera herî mezin e. hemî suxreyên jibo xwedayên dost re, yên ku ka- rê mirovan hêsan dikin, parçeyên vê tevgera mezin in. Tevgera bin- gehîn a siyasî ya demê, xwedî vê derûnê ye.

Tevgerên hişmendiya civakî yên serdema pêşî, perestina li dora xweda-qeranên ku rastiya civaka biçîn a ku hatî îdealîzekirin û bi vegotina mîtolojîk hatiye kinnişandin, bingeh digire. Di navenda raman û livdariyê de, rêxistina qerantiyê û hewldanên berdewam- kirina wê hene. Hebûna civakê bi qeranên ku kirine xweda gengaz e. Cejnên û perestinên birêkûpêk, jibo berdewamkirin û parastina qerantiyê ne. Jibo serokê civakên eşîr û qebîleyan ên ku nebûne qe- rantî jî, sazûmaneke bi vî rengî tê kevneşopkirin. Çavkaniya îlhama hemû tevgerên civakî, bi vî rengî hatine demîngirtin. Jibo civakê, tevgereke siyasî ya cuda û etnîk ku bi serê xwe, nayê hizirandin. Ji- bo hişmendî û livdariyê, navenda ku hatiye dawerkirin, bingeh e. Jibo wê şer tê kirin, tê mirin û xebat tê kirin.

Di serdemên feodaliyê de, ev rewş gaveke din pêşvediçe. Ne ji bo xwedê (ji bo qeran) bi xwe, jibo gotinên wan (rêzikên civaka nû) tevger bingeh têne girtin. Dema ku dibêjin ***“Xwedê wiha got, wisa ferman kir”,*** eslê wê yan civaka kevin tê restorekirin an jî, civake- ke nû tê damezrandin. Livdariya civakî, di bingeha rêxistinî de û di çarçova rêzikan de, tên birêkûpêkirin. Livdariya siyasî û leşkerî, êdî ji kesan rizgar bûye, jibo hemanên payîdar tên seferberkirin. Bi vî rengî, dikare ji ketina dema tevgerên siyasî ya serdema navîn, were xeberdan. Her çiqas ku di bin kemna olî û şêweya mezheb û terîqetan de were meşandin jî, di tevgerên siyasî ku bihişmendî û birêxistinî yên vê demê de, zêdebûnek heye. Zêdebûna nakokiyên civakî, di vê de rola bingeh dilîze.

Êdî di nava eşîran de jî, tevgerên ku serok derbasdikin û girêdayî nirxên eşîrê yên bingehîn hene. Ke- tiye demeke ku em dikarin bibêjin dema tevgerên etnîkî. Digel ku tevgerên mezheban ji nakokiyên çînan dihatin, tevgerên etnîk pa- rastina eşîrê ya li hember xeteriyên derve, bingeh digire. Hê jibo qewm û netewe, neketiye dema tevgeran.

Tevgera bingehîn a civakî ya serdema kapîtalîzmê, bi şêweya ne- teweyî ye. Rêveberiya feodalîteyê ya welat bi çîtan dabeşkirî ku tengbûna cîgeyî bingeh digire, weke astenga sereke tê dîtin. Berje- wendiyên kapîtalîzmê annanc dike ku, bi hindikayî civakên xwedî çand û zimanê hevpar, di bin bazareke pêşveçûyî, ziman, çand û hiş- mendiyeke siyasî de bide hev, van çîtan bişkîne, netew û dewleta ne- tewî pêkbîne. Êdî, bazara neteweyî, ziman, çand, dîrok û dewlet, weke annancên pîrozwer yê timî werin bilindkirin. Destên ku dirêjî van bibin ên werin şikenandin, yên ku suxreyê ji wan re bikin jî, we- ke qehremanên herî mezin, yê li şûna xweda-qeranên kevin werin rûniştandin. Sazûmana nû ya xwedayî û livdariya civakî ya ji ber wê, di bin vê fonnê de yê bi nîşana neteweyî, bête meşandin. Berje- wendiyên serdest ên li tevaya cîhanê, yê hemû tevgeran bi van tev- gerên sereke ve girêbidin. Nirxê li qasî serê derziyê jî namîne ku bi bazara neteweyî û dewletê ve neyê girêdan. Bê serê derziyê çiqasî neteweyî ye, pirsgirêka bingehîn a olê nû an jî tevgerê ye. Heger ku neteweyî be, binirx û pîroz e, ne neteweyî be xayîn û rezîl e. Merha- leya herî dawî ku bîrdoziyên dogmatîk, jibo civakan bigihinê, ev e.

Encama xwezayî ya vê têgihînê, şerên bîrdoziyî yên ku berde- wam dikin e. Ya rastir, dema hoveber bixwîn a berjewendiya çînan ku dogmatîzm pêşkarî dike ye. Tevger û şerên wê ne. Bêguman car- na jî, li hember van tevgerên ku digihan asta yawetiyê, gelek nêzî- kayiyên olan, mezheban û felsefeyan ên bi ramana aştiyane, ba- werî, sincî û bi navendên mirovatî jî çêbûne.Dîrok ti caran weke berhemeke viyana yek alî, pêşnakeve. Timî weke girêdana diyalek- tîk a du serikên dij, bi nakokî pêşvediçe. Bi taybetiyên ku nûjeniyê temsîl dikin û serekeyî qezenc kirin, demeke nû tê destpêkirin. Bû- yer û livdariya civakî, di vê çarçova sereke de, jibo hemû civakan derbasdar in. Ji bûyera civakî ya herî ketûber heta bi civaka netew a herî raser ku pêşveçûyî, pêvajoya

diyalektîkê ku jibo tevan dixe- bite, di vê derûnê de dixebite.

Tevgera civakên etnîk û çînên ku tên perçiqandin û tên mêtin jî, parçeyek ji yê vê çarçova sereke ne. Ramana ku di bin guhê tevge- rên qeranên xwedayî de derketî holê, ya bi şêweya *"Çavkaniya vê karesata hatî serê min ji kû ye, evqas pêkutî lî mêtin liser navê kî- jan xwedayan tê kirin? "*, eslê wê tovê tevgera pêşî ya etnîk û bin- destan davêje. Dema ku mirovatî dibêje *"Xwedêyo, ev êşa ku ez di- kişînim jibo çiye?"*, xwetêdana serhildanê destpêkiriye. Eşîrênku, li hember mirovên bizirh û biçekan şidandî ku tên wan dîl digirin û talan dikin, dest bi parastina xwe dikin, tê wateya ketina dema tev- gerên azadiyê. Pêxembertî, dibistanên felsefeyê, terîqetên mîstîk, di vê berekê de weke rêxistinên raman û baweriyê, di dîroka tevge- rên civakî de, cîhekî girîng digirin. Tevgerên mezheban ku serdema navîn seranser girtibûn, di derûna xwe de, tevgerên çînî û civakî yên beşên xizan ku tên perçiqandin û mêtin in.

Di serdema kapîtalîzmê de, yekem car hewldana terîfkirina civa- kê ya bi zanistî, rê li ber derbaskirina dogmatîzmê û pêşveçûna sos- yalîzma zanistî vekiriye. Sosyalîzma ku rastî û berjewendiyên ked- kar û bindestan, bi awayek zanistî îfade dike, weke rêbereke livba- ziyê, di dîrokê de rê li ber tevgerên civakî û neteweyî yê bi rengê nû vekiriye. Tevgera kedkar û bindestan, di derûna xwe de îfade di- ke ku demokrasî, hatiye rewşeke wergirîtir. Demokrasî ji wergiriya çîn a teng derdikeve, dikeve rewşa ku hemû tebeqe û çînên civakî, hemû nasnameyên etnîk û neteweyî bigire nava xwe û weke şêwe- ya rêveberiyeke siyasî, di tevaya cîhanê de hêz û wateyê werdigire. Ji demokrasiya civaka neolîtîk a xwezayî, bi derfetên ku jibo vegu- herîna hemû çîn û civakan ên di nava aştiyê de dide, bi ramana za- nistî ve girêdayî, derbasî dema şaristaniya demokratîk a bi hiş- mendî û rêxistinî dibe.

Kurdan di hemû serdemên civakî yên girîng de, weke gelekî liv- dar, hilberîner û afirîner, hebûna xwe dane hiskirin. Gelê serdema neolîtîk ê herî livdar Kurd in. Bi çandinî û ajaldarî ve girêdayî, ge- lê afrîneriya şoreşa civakî ya herî mezin e. Di serê civakên ku ser- dema pêşî deranîne holê, yên ku bingeha baweriya xwedayî ya ez- manî avêtin, yên ku şêweya ramana mîtolojîk bi rêkûpêk kirin de, dîsa Kurd tên. Kurd xwedî rûmeteke wisa ye ku, bi hişmendiya eşîrî, li hember koledarî û

mêtingehkariya Sumer, bi sexbêriyên ku ji azadiya xwe neqere, koma etnîk a herî pêşî serhildaye. Zexmbû- na eşîrtiya kurdan a îro jî, bi vê rastiya ku ji kûraya dîrokê tê ve gi- rêdayî ye. Li hember benîkirinê, gelê ku herî pêşî ala azadiya miro- vatiyê hildaye dîsa ew in. Di hemû serdemên pêşî de, berxwedana azadiya kurdan a di bingeha etnîk de, jibo gelan bûye çavkaniya îl- hamê. Di dîroka Rojhilata Navîn de, li hemer dewletên koledar, yên herî li ber xwe dan û teslhn nebûn, ên ku li bandevên çiyan jiyana azad ji şaristaniya koledar çêtir girtin, dîsa gelê Kurd bû. Di dîrokê de di bingeha etnîk de, di tevgerên berxwedanên herî domdirêj û herî wergirî de, cîhekî kurdan resene û sereke heye. Vê berxwedana azadî, li Mezopotamya jorîn, li zozanên Medya, sincê azadiya me- zin welidandiye. Sinc û viyana azad a Zerdeşt ku di dîroka azadiyê de cîhekî mezin digire, siftbûn û sentezeke van berxwedanên biesl e. Vê ji aliyekî ve rê li ber hilatina olên brahhnî vekir, ji aliyê din ve rêya ku diçe felsefeya Grek, heta bi dawî vekir. Ji çavkaniyên Ferad û Dîcle ne tenê şaristaniya koledar a Sumer û hemû şaristanî xweyîbûne, di heman demê de, hemû tevgerên azadiyê jî ji vê çav- kaniyê xweyîbûne.

Di serdema navîn de, li hember mutlakiyetperestên îslamtiyê, hewldanên azadiyê dîsa herî bêhtir di nava gelê Kurd de tên dîtin. zerdeştîtî. elewîtî, manîtî û terîqetên mîstîk, li hember koletiya fe- odal, meyldariya gel a jiyana azad temsîl dikin. Berxwedanvani- ya eşîrtî ya kevneşopî, berdewam dike. Di vê serdemê de pêşve- çûna herî neyînî ku, hevkariya suniyên feodal çiqas diçe biyaniyî gel dibe û ji sazûmana benîtiyê re suxreyê dike. Gel di hewldanên nasname û jiyana azad de, bi tenê maye. Bi xiyaneta serdestên

xwe re rûbirû ye. Begîtiyên feodal, serokên eşîran û şêx, jibo berjewendêyên takekesî û malbatî, gel xistine rewşeke wisa ku tenê dema bikêrî wan were, mîna amûreke bê kesayetî bikarbînin. Ser- dema kevneşopî ya qehremantiya berxwedana etnîk, bi dawî dibe. Dîsa li şûna terîqetên baweriyê yên biesl, dema terîqetên bêesl ên ku di bereka berjewendiyên malbat, xanedan û dewletan de, dili- vin, destpêdike. Di tevgerên civakî de bêeslbûneke gelemper li her qadê serdest dibe.

Di serdema kapîtalîzmê ya hişyarbûna neteweyî û dewleta nete- we de, weke hemû gelan, jibo kurdan jî pêvajoyeke nû destpêdike. Tevgerên gel ên kurdan, di vê demê de şêweyên nû qezenc dike. Bi bingehgirtina pêkhatinên çînî, nirxandina van deman a ji nêzîk ve û kitekitî, ji aliyê ronahîkirina dema pêşya me ve û helwesta rastir ve, girîng e.

### 1- Dema Neteweperestiya Feodal a Hoveber

Bandorên mêtingehkar ên kapîtalîst, livdariya ku li Kurdistanê hişyar kirî, rê li ber lêgerînên nû vedike. Digel ku burjûvaziyeke Kurd çênabe jî, bi burjûvabûna beşên Ennen û Suryan re, li hem- ber neteweperestiya burjûva bizavek pêktê. Lawazbûna bingeha çîna burjûva, jiberku binyata begîtiyên feodal û eşîran zexme, em dikarin van bizavan bigelemperî, bixin nava kategoriya netewepe- restiya hoveber. Taybetiyên wan ên berbiçav, di wateya burjûva de jî tinebûna bingeheke wan a bîrdoziyî, dikare weke Kurdîtiyeke dilînî û bi binyata civakê ya kevneşopî ve girêdayî were nîşandan. Ev taybetî, fersendê nadine bemame û rêxistinbûneke hemdem. Dema ku liser navê Kurd bête hereket kirin, girêdanên kevneşopi- ya eşîrtî û olî bingeh tên girtin. Digel ku rêxistinbûneke hemdem tineye, annancên siyasî yên ku bi baweriyên xwe pê ve girêdayî jî, bi rasteqînî xêzik nakin. Herwiha binyateke wisa derdikeve holê ku her kêlî bikaribe were bikaranîn û xiyanetê bike. Di pêvajoya sedsalên 19 û 20an de, rewişta gelek tevgerên serhildanan, di vê bingehê de çêbûye. Di dîroka gelê Kurd de derbeya herî mezin, van tevgeran lêxistiye. Ev serokatiyên feodal û neteweperestên ho-
veber, ku ji nirxandina rewşa berbiçav bêpar, ku nikarin annancên rasteqînî xêzik bikin, nikarin veqetîna dost û dijminan bikin, dema tevgeran û şewegirtina wan li gor mercên berbiçav nikarin biguhe- rînin

û pêşvebibin, digel ku rê li ber gelek windabûnan vekirine, nebûne xwediyê ti qezencan.Ya herî ne baş jî ev e ku, malbatên hê- zên serdest jî anîne cem xwe û jibo ku gel kontrol bikin, wan mî- na amûrekê bikartînin. Di wateya hemdem de, li dora Silêmaniyê di salên 1806an de, endamên eşîra ***Babanzade*** ku serhildana pêşî dane destpêkirin, di dîroka xwe ya vê dawiyê de, ketine derawaya malbateke ku herî bêhtir hevkar ji wan derketine. Di warê suxreya ji serdestên neteweyên cîran re, sînor nasnekirine. Heman rewşê em di serhildana Begê Botan ***Bedirxan Beg*** de, di sedsala 19an de dibînin. Di vê serhildana ku girêdanên feodal û neteweperestiya hoveber, bisiftî hatine xebitandin de, bi heman sedeman dema ku semekeftin jênerev dibe, bi malbatî heta weke roja me, xwe ji bi- karanînê rizgar nekirine. Bedirxanî, malbateke ku herî bêhtir em- peryalîzm û hevkarên cîgeyî xwe spartinê, jibo kontrolkirina kur- dan malbata ku herî bêhtir hatiye bikaranîn e. Kurdîtiya ku kirine, sînorên neteweperestiya hoveber derbasnekiriye û bizaveke nete- weyî û siyasî ya sêxberî neafirindine.

Di dema şerê cîhanê yê yekemîn de, digel mercên bikêrhatî jî, li îranê Smayîl Simko, li Iraqê Malnnûd Berzencî û li Tirkiyê Şêx Se- îd, jiberku bemameyeke wan a emperyalîst û demokratîk tinebû û ji damezrandina rêxistineke wiha dûr bûn, di tevgerên kurdan de, ji xwedîbûna roleke herî ne serkeftî, rizgar nebûne. Bi zêdeyî, lîstikên ajanên emperyalîst, weke têkiliyan fêmkirine û hatine lîstikên wan. Ewqas hewldanên bi wî rengî, ne jibo xwe û ne jî jibo gel, nevegu- herandine qezencekê. Weke mîrate tenê malbatên xwe hiştine. Kontrola liser van malbatan jî, bûye venêraneke liser gel. Nêzîka- yiyên di navbera serdestan de, yê bi vî rengî di pêvajoya dîrokê de gelekî hatine sepandin. Bikaranîna kesên lawaz û têkçûyî ya weke amûreke venêranê, polîtîkayeke berfireh e. Ev polîtîka li nav kur- dan, ji hişmendîtiyê wêdetir, bi awayek tekûz hatiye navxweyîkirin û hînkirin, bi dilê xwe ji aliyê wan ve li hember wan tê sepandin.

Demên PDK ya ku neteweperestiya hoveber xwe kiriye partî, mînaka van nêzîkayan a dawî û herî rûxîner e. Çêbûnên mîna PDK jibo polîtîkayên hêzên derveyî yên li herêmê, amûrên bika- ranînê yên herî bikêrhatîne. Ji ber bingeha burjûva ku pêşneketî û binyatên eşîrtî ku teng

bûne, li hember hêzên derûna gel, ji lîsti- na rolên herî xeter bi paş de nemane. Jibo jiyan û dewlemendiya wan, keysa wan tenê ev e ku li hember tevgera Kurd a hemdem, bibine piyonekî herî baş. Jibo berjewendiyên xwe yên li herêmê û jibo berjewendiyên malbatî yên ketûber, kîjan dewlet bixwaze, ji ketina têkiliya bi wan re dûr namîne. Di vî derbarî de, ti nirxên wan ên etîk an jî hêmaneke siyasî û bîrdoziyî tine. Heger hebe jî ji bazara van paş de namînin.

Li hemû welatên ku Kurd lê, zirarên ku ji partiyên bi navê PDK dîtine, bi ti demên dîrokê re nayê hevberkirin. Ya ku xeterî û neyî- niyan mezin dike, rêxistinbûna wan û xwegirtina wan a li efendiyên hêzdar e. Li herêmê jiberku lîstika liser tevgera Kurd a hemdem, gelek dirav û prestîjê tîne, lîstina vê rolê ya li hember hev, gelekî berhemdar e. Lêbelê jiberku çiqas diçe, dikevine rewşa leşkerên di- ravdar û gelê ku bi rêbazên kevneşopî bi xwe ve girêdane winda di- kin, ji pêşan (teşhîr ) û cihêgirtinê (tecrît) rizgar nabin. Dema ku çavkaniyên dirav û hêza ku destê wan digire winda bikin, bi hêza derûnî nikarin rojekê jî liser lingan bimînin. Weke ku gelek caran hatiye dîtin, dema ku desteka efendiyên xwe winda dikin, hêzên xwe yên çekdar ku ji sed hezaran zêdetir, di nava rojekê de belav dikin û direvin. Di roja me de baskê xefka Kurd ên herî xeter in. Li çaryana ku gihanê, an ê weke hêzeke neteweyî ya demokratîk xwe veguherînin an jî, yê bikevine rewşa malbatên koçber mîna yên ku di dema borî de hatine dîtin. Derawaya berbiçav a heyî ne gengaz e ku bi rêzikên demokratîk ên hemdem re, lihev bête anîn.

Digel semekeftina bi vî rengî, sedema ku neteweperestiya ho- veber berdewam dike, ji demeke dirêj ve, pêşveneçûna tevgereke Kurd a neteweyî û demokratîk e. Dema pêşvediçe jî, bi hêsanî ji aliyê hêzên neteweperestiya hoveber ve, tên jiholêrakirin. Cara yekem ku li hember PKK dikevin astengiyê, ji ber xerakirina vê

lîstikê ye. Dema ku tevgera PKK, polîtîkaya wan a li dijî gel ku dema kevin bi dizî didane meşandin, li ber çavan rahêxist û liser- nekeftinê rast kirin, ew ketin nava sexbêriyeke hevkariya xayîntî. Dema ku lihevdanên domdirêj ti encamên li gor daxwaza wan ne- dan, xweş dîtin ku bi polîtîkayên kevneşopî zêde nameşin. Dîme- nên cihêreng ên neteweperestiya hoveber ku li her qadê, demeke dirêj mane li benda têkçûna PKK. Dema ku ev pêknehat, beşek ji wan hê bêhtir hêrîşker bûn. Beşa din dûnnayîne ji tevgera polîtîk, çêtir li gor berjewendiyên xwe dît. Di dema ku astar ji rû bihatir de, ne hêz û ne jî baweriya van heye ku polîtîkayeke neteweyî bi- dine meşandin. Tevgerên ku liser berjewendiyên ketûber û mal- batî hatine damezrandin, bi encama berevajî ku derkeve holê re, ji belavbûnê rizgar nabin.

Di roja me de, pêvajoya ku neteweperestiya hoveber dijî, rewşa liser devê van rêyên çaryanê ye. Jibo ku pêşî li rûxîneriya wan a zê- de bête girtin, lêferzkirina bereka çareseriya demokratîk, kişandina wan a nava lihevkirinan ku bi xwe ewle bin, pêşandan û cihêgirti- na yên herî ne ediliyên wan, weke rêya rast tên xuyakirin. Rastiya ku, bingeha wan a çînî çiqas diçe teng û belavdibe û van bizav û tevgeran ji zemîna daringî bêpar dihêle jî, li ber çavan were girtin, heger ku bivin bijîn, mecbûr in ku pêwîstiya veguherîna demokra- tîk, weke vebijarkê deynin ber xwe. Herçiqas berjewendiyên hêz- dar ên takekesî û malbetî ku hînî wan bûne, nîşan dide ku bi hêsanî nayêne krîterên demokratîk jî, ji dêvla ku jiyana xwe bi temamî winda bikin, parastina xwe ya bi vê şêweyê, rêyeke herî derbasdar a li ber wan e. Herwiha di nava lihevkirinên demokratîk ên berfireh de, li hember aliyên wê yen xeter, bi amadekariya timî, dahûrandi- na vê belaya dîrokî û derxistina wê ya ji astengbûnê, girîngiyeke mezin pêşkêş dike.

### 2- Dema Neteweperestiya Burjûva

Neteweperestiya burjûva, bizavek e ku di sînga neteweperestiya hoveber de pêşveçûyî ye. Derdorên feodalên Kurd ên tebeqeya ra- ser ku ketine hûnaka têkiliyên kapîtalîst, di pêvajoyê de rê li ber çê- bûnên çînî yên nîv-burjûva vekiriye. Bi burjûvabûna neteweya ser- dest re, ev beşa ku di bindestiyeke hişk de pêşveçûyî, taybetiyên şo- reşgerî û

nûsazîparêzî yên ku di gelek tevgerên netewîbûnê de tên dîtin, bi van re pêşneketine, li qasî ku tinebin hindikin. Bûyereke ku pêşveçûnên berbiçav lêferzdikin e. Têkoşîneke bazarê ya li gor ber- jewendiyên xwe jî nade meşandin. Dikeve kategoriyeke li rasta te- rîfa çîna ajan. Bi taybetî bi pêşveçûna têkiliyên hilberîna kapîtalîst re, bajarên ku mezin dibin, derawaya vê çînçînîbûna di nava gel de, hêzdar dike. Di pêncîh salên dawiya sedsala 20an de, li tevaya Kur- distanê pêşveçûnên berbiçav ên bi vî rengî xwe nîşan didin.

Lingekî din ê vê pergala çînî yê girîng, pêşveçûna bilezgînî ya burjûvabûna piçûk a li bajêr û qada gundewarî ye. Digel pêşveçû- na kompredorên burjûvayên mezin a bisînor, tebeqeyên burjûvayên piçûk ên pirtir û berfirehtir çêdibin. Li qada gundewarî, burjûvabû- na piçûk a gund, bizaveke girîng e. Li bajaran jî, di bingeha suxreya jibo burokrasiya dewletê de beşên burjûva piçûk, cîhekî girîng di- girin. Jiberku herduk jî, li dora bazara neteweyî ji têkoşîna ziman û çanda neteweyî bêparin û herî bêhtir bi hêzên feodal ên hevkarên kevneşopî re, di bingeha bindestiya burokrasiya dewletê de jiyana xwe dibînin, di ber netew û neteweperestiya burjûva serdest re û bandora rewişteke hêzdar ku di nava wan de dihele dijîn. Nikarin di wesfê neteweyî û welatparêzî de nêzîkî nirxên ziman û çanda gel bibin. Li qasî ku binyat û berjewendiyên wan dest nadin meyldari- ya bi vî rengî, ji asta bîrdoziyî û mirûz ên pêwîst jî bêpar e.

Serokatiyên çînî yên vê çêbûnê ku, tirsonek, bintûte û bi taybe- tiyên xwesipêr, keysê bibînin yê rê li ber meyldariyeke netewepe- restiyeke nûsazîparêz vekin. Yê pêşveçûna neteweperestiyeke bi vî rengî bibe dabaşa xeberdanê. Rasteqîniya berbiçav li vê ferzdike. Ev bizava ku feodalîzm li pişt, li çar aliyên wê hêzên dewletên ne- teweyên serdest, li pêşya wê hebûna gel, bûne sedema ku li cîhanê taybetiyên bêhempa qezenc bike. Xasûkî, keysperestî, komplokerî, durûtî, xiyaneta ji nişkêve, her cureyê şûtîtiyê, pêşekî dayîna berje- wendiyên takekesî, bêrêzikî, pêveberdana (tawîz) zêdekar, reng gu- herîna weke bûqelemûnê, li qasî şoreşgerbûna ji nişkêve şoreşgeri- ya hember a ji nişkêve, pêneewliya ji gel, lêgerîna efendiyên ku timî pişta xwe bide wan, dilînîtiya zêde an jî ne hestyarî, li qasî bê- pariya ji bîrdoziyê

demagogiya zêde, bêpariya ji nirxên mirûz, li qasî serhildêriya bilezgînî xwesipêriya bilezgînî, li qasî çêkirina xê- zikê ya ji nişkêve û hebandina bîrdoziyekê bi heman lezgîniyê dev- jêberdan û bêxêzikî, di xuyakirinê de livdarî û di bin de aramî û ti- ralî, di derbarê dema borî de zanîna sexbêrî û korîtiya li qasî dog- mayan, li qasî behêviya pêşerojê xeyalên vala, weke taybetiyên pratîk, çandî, siyasî û bîrdoziya gelemper ên van meyldariyên çîn, derdikevine pêşberî me.

Rizgarîxwaziya neteweyî ya antî- emperyalîst û sosyalîzma reel ku di pêncîh salên dawiya sedsala 20an de, girîngî qezenc kirin, Li hemû beşên Kurdistanê bandor li vê bizavê jî kiriye, rê li ber wan vekiriye ku di bin kemna çepgiriya burjûvayê piçûk ê nûsazîparêz de, xwe binixûmîne. Vê bizavê, xwe bi pêşkêşkirina bi çepîtiyeke ku xwedî taybetiyên burjûvayên neteweperst ên bintûte û heta bi zi- manbaziya marksîst-lenînîst, jibo berjewendiyên xwe çetir dîtiye. Ji aliyê din ve, bi hêzên metingehkar û emperyalîst re, ji têkildanî- nên bêrêzik ku ji her cureyê xwesipêriyê re vekirî, paşde nemaye. Pêşlêgirtina sosyalîzm û neteweparêziyeke şoreşger a rast, bi van nêzîkbûnên wan ve girêdayî ye. Xuyakirina ji aliyê bizava şoreş- gerî ve û xencerkirina ji pişt ve, helwesta van bizavan û komên ji van bizavan a bingeh e.

Partiyên bi navê PDK û niçiken partiyên komunîst ku xwedî tay- betiyên reel sosyalîst ên neteweya serdest û gelek partî û komên bi vî wesfî yên di bin hevgirtina wan de ku derketine holê, li her par- çeyî, bi şûn neteweperstiya feodal a hoveber ve jî mane û rê li ber gelek neyîniyan vekirine, meyldariya azadiya gel timî sabote kiri- ne. Nehatina wan a ber bi yekîtiyên enîtî ya sexbêrî û berhevdanî, helwestên wan ên din girîng in ku nîşan didin. Di vê de, wergirtina desteka daringî ya ku ji derdorên bi wan ve girêdayîne, bandorake rasterast liser berjewendiyên takekesî û malbatî dike. Ji kuştina ge- lek welatparêz û kadroyên dirist heta bi bêesilkirinê, bêbandorkiri- na bi her şêweyê, bûye erkeke wan a din. Ne ji aliyê rêxistinî, ne si- yasî, ne çandî ve û ne jî hewldaneke çalakî û tevgereke wan ku cidî bête girtin, tine ye. Bidestêxistina tiştên heyîn, berevajîkirin û di encamê de valaderxistin, pêşveçûnên ji nêzîk ve bi vê bizavê ve gi- rêdayî ne. Di roja me de ne çareseriyeke kûr û rewşeke di derawa- ya herî lawaz de dijî.

Bendewariya wan ev bû ku, weke serokatiya gel PKK tine bibe û jevbikeve. Digel ku di ***komploya 15ê sibatê*** de pareke wan a gi- rîng hebû jî, pêknehatina vê bendewariya wan, mirada wan di ber wan de hişt. Têkiliyên piralî ên ku bi derdorên emperyalîst û mêt- gelikar re pêşvebirine, hê bêhtir rê li ber cihêgirtina wan vekiriye. Digel ku weke çîn, zemîna wan a daringî ji têkiliyê re vekiriye, se- demên taybetiyên çêbûnê yên ku tên pêşandan, pêwîst dike ku timî bal bi vê bizavê bête dan. Hewldana serokatiya gel ku pêşvedibe, di serî de gelên neteweyên cîran, biratiya hemû gel û çandan, yekîti- yeke azad û bi gelemperî li hember stratejiyên çareseriya di krîterên demokratîk de, dijminatiyeke bi zexelî pêşvedibin. Hewl didin ku weke xwesipartinê û bazara firotina ***“doza Kurd ”*** bikin. Ev yek ge- lekî girîng e ku, li hember nûnerên vê bizava ku nirxên gelê Kurd ên herî pîroz difiroşin û bi komployên herî rezîl, di jiholêrakirinê de rol dilîzin, hestyar û bi tedbîr bin. Pêwîst e mirov bi xuyabûna wan a bêhêz û sivik neyê xapandin. Yên ku xwedî bennayiyên feodal neteweperestê hoveber û yên ku xwedî xuyabûneke neteweperestê burjûva ku dikeve her rengî, bi taybetî yên ku bi çalakî di nava hel- westa kirîn û firotinê de ne, yên ji van ku dirist û bixwazin biedilin, di nava sexbêriyeke xwerexnekirinê de binirxînin, qezenc bikin û li qasî ku di nava bihevretiyên bikêrhatî de bigirin, di qadên bîrdozî, siyasî, çandî û pratîk de, hemû tedbîran bigirin û bêbandorbikin, herwiha di rêya çareseriya demokratîk de, derxistina wan a ji as- tengbûne girîngiyeke mezin digire.

### 3- Meyla Gel a Azadiyê

Ev yek yê rasteqîntir û hînker be ku em, meyla azadiya gelê Kurdistanê bi nasnameya wekhevî û azadî ya serdema neolîtîkê ve girêbidin. Têgihînên wekhevî û azadî yên xwezayî ku taybetmen-

diya komên etnîk ên vê demê, ango dayîk û kalikên kurdan bûn, bi taybetî di jiyan û hisreta eşîrên qada gundewarî û malbatên gundî de, cîhekî girîng digire. Di herêmên çiyayî de, ev taybetmendî hê bêhtir zexm in. Di serdemên pêşî û navîn de, li derî beşa hevkar a ku di tebeqeyên raser ên sazûmana benîtiyê de cîh digirtin, meyla gel a azadiya xwezayî hê jî cîhekî girîng digire. Têgihînên xulamtî û koletiyê, herî bêhtir di nava têkilî û şêweyên jiyanê ku bi tebe- qeyên raser ên hevkar ve girêdayî, derfetên sepînê dibîne. Digel hûnaka têkiliyên kapîtalîzmê û çalakiya hemû pîvanên jiyanê, lê- gerîn û têgihînên biratî, azadî û wekheviya xwezayî ya bi gel re, zindîtiya xwe diparêze. Ji vî alî ve, ev ne resthatiniyeke ku di na- va gelên Rojhilata Navîn de, gelê ku aliyê azadiyê herî pêşketî Kurd in. Ev bi pêşveçûna wan a dîrokî ve girêdayî ye. Biyanîbûna çînên serdest û mêtinker û tinebûna nirxên erênî ku bidin, li hem- ber xwezayê û dagirkerên biyanî, jiyana wan a berxwedanvan, di qezenckirina taybetiyeke bi vî rengî de, roleke girîng dilîze. Di vî alî de pêşdetiriya jinê jî, bi vê rasteqîniya dîrokî ve girêdayî ye. Çanda dayika xwedawend a dema neolîtîkê ku hêzdar, Bi dayîkên Kurd re hê jî bi awayek zexm dijî. Jinên Kurd li qasî ku angaşta xwe diparêzin, girêdan û rêzgirtina wê ya zêde bi şêweya jiyan, çand û olê ku bi serdestiya mêr vê tine. Yên ku heye jî, ji ber pê- kutiyên daringî û menewî û kevneşopiyan, vê rewşê dipejirînin, dema keysê dibînin serîhildidin.

Xizanbûna Kurd jî, weke meyleke dîrokî derdikeve pêşberî me.Ev pêvajoya ku li taxên bajarên Sumer, Babîl û Asûr destpêki- riye, di tevaya serdema navîn de berdewam kiriye, di roja me de li metropolên netewa serdest û metropolên emperyalîst, li qiraxên bajarên Kurdistanê domandiye, bi şêweya koçberiya xizan û re- benî pêşveçûye. Ji dêvla ku biçînên serdest ên xwe re di nava hev de be, hê bêhtir ji hêzên biyanî yên serdest û çînan re suxreyê di- ke. Nîv karkerî, jiyana beradayî, tenduristî û ji perwerdeyî û mer- cên çandê bêparî, jiyan jibo wan gelekî zor kiriye. Çewsandina ku him ji serdestên cîgeyî û him jî ji yên biyanî û keda wan ku herî bi erzanî tê nirxandin, jiyaneke biêş weke qederê bi stûyê wan ve ki- riye. Li hember jiyana bi vî rengî, di nava hêrseke xwezayî de ne. Piçûkdîtinê bi awayek kûr his dikin. Haydar in ku li xiyanetê rast hatine.

Lêbelê li hember pêkutiya mezin a liser xwe jî, xwe bêça- re his dikin. Ev rewş, rê li ber rewşa giyeneke bêteraz, hêrsbûna ji nişkêve û levdanên piçûk-mezin ên takekesîtî û malbatî, vedike. Bêpariya wan a ji merc û derfetên têkoşîna çîn a hemdem, levda- nên tekekesî, malbatî û heta yên eşîrtî li wan ferz dike. Provakas- yonên serdestên ên hişmendî, rê li ber rastiyeke gel vekiriye ku timî bi xwe re bi levdanin. Ji ber vê yekê, pêdiviya wan bi çande- ke aştiyê ya kûr a navxweyî heye.

Siftbûna têkiliyên hilberîna kapîtalîst, weke xizanên girseyî rê li ber bêkaran vedike ku bibin karkerên nîv demsalî û hijmareke hin- dik karkerên pîşesaziyê. Bêkarî bêhtir meyleke di nava xortan de ye û ber bi metropol û Ewropa, ketiye rewşeke koçberiya girseyî. Her- wiha ev mirov, dikevine rewşa ku bi hezar salan dagirkeran xwes- tibûn lê serfiraz nebûbûn. Liser xeyalen vala û jiberku hewceyî pênc qurûşên jiyanê hatine kirin, welatê xweda û xwedawendan ji ber xwe vala dikin. Karesateke ji vê mezintir nayê serê gelan û rew- şeke ji vê naletir nayê jiyandin.

Ev livdarî û guherîna civakî ya ku di pêncîh salên dawiya sedsa- la 20an de sift bûyî, bingeha daringî ya meyla azadiya gel a hem- dem pêktîne. Hişmendiya rizgariya çînî û neteweyî ku vê demê bi- lind dibe, bandoreke der a hêzdar afirandiye, bandorgirtina ji bîrdo- ziyên modem û ji zanist, gengaz bûye. Pêşveçûna di teknolojiya ra- gihandinê de, dema bîrewerbûnê bilezgîn kiriye. Bandorgirtin her- çiqas ku ji neteweperestiya burjûva û çepgiriya sosyalîzma reel ha- tibe jî, têgihîneke serbixwe, azad û wekhevîxwaz, siftbûneke bîrdo- ziyî hatiye rewşeke gengaz. Her çiqas ku di bin bandora dogmatîzm û utopîzmê de hatibe mayin jî, liser navê Kurdistanê dîrokeke rast û nirxandina civakê hatiye pêkanîn, nirxandina mercên berbiçav û ne berbiçav ên rojane hatiye kirin. Di sala 1970an de, livdariya sift ku li tevaya cîhanê hatî jiyandin, weke li hemû welatên Rojhilata Navîn, liser ciwanên Kurd ên ku di nava ciwan û rewşenbîrên tir- kan de cîh girtibûn bandor kiriye, rê li ber nirxandinên di derbarê welat, dîrok û civaka wî, tevger û rexistinbûnên neteweyî û civakî vekiriye. Gengez e ku ji livdariyên bi vî rengî re, meyla gel a aza- diyê, were gotin. Hêza ku di nava gelek koman de girîngî qezenc kirî û dexma xwe li demê dayî, PKK ye. Ev rastî pêdivî

dike ku bi kûrayî liser bête rawestandin.

### 4- PKK: Bûyin, Pêşveçûn û Pêşeroja wê

**a-** PKK, bi taybetiyên bingeh ên serdemê ku dexma xwe li sed- sala 20an daye, dikare weke bizava polîtîk û pratîk a dahûrandina rewşa berbiçav a li Kurdistanê ku bi sosyalîzma zanist ve girêdayî, bête nirxandin. Bêguman şîroveya saxlem a pêşveçûnên ku PKK rê li ber vekirî, bi nirxandina rastiya sedsala 20an ve, ji nêzîk ve girê- dayî ye. Dîsa bi wesfê kuna reş a li dora bûyer û pirsgirêka Kurd ve, girêdayî ye. Nirxandina bi serê xwe, bi awayek ne berbiçav ku şemayên cudaxwaz û şidetê bingeh bigire, yê mijara yekalî û şîro- veyên ne berbiçav derêxe holê. Di vê nirxandinê de ku me cîhekî berfireh ji PKK re veqetandî, jiberku mijara bingeh a parêznameyê ye. Ji wê jî girîngtir, ne tenê dema borî ya nezîk, potansiyel e ku yê bandorê li roja me û pêşeroja nêzîk jî bike û jiberku pêşveçûn di ali- yê erênî de bin, ji ber rola hildigire ye. Terîfkirina PKK a ji aliyê bîrdoziyî, polîtîk, leşkerî û demokratîk ve, li holê danîna bê bi xê- zika pratîk a destpêkê re çiqasî bi aheng pêşveçûye û çiqasî ji rê derketiye, nirxandina rastî ya behreya wê ya rexne û guherînê, mi- jarên herî pêwîst in ku bên ronahîkirin.

Tê dîtin ku, di doznameyên dozgerên KT (Komara Tirkiye) û di hinek biryarên ku DMME standin de, ji rastiyên berbiçav gelekî dûr in. Şîroveya hiqûqî ya teng û ne berbiçav, giraniyê digire. Him di dennafê min de nirxandinên herî mezinkirî dikin û him jî bi pirs- girêkê ve girêdayî, li bi hezaran dozan dinêrin, him jî weke ku tê- kiliya mijarê bi pirsgirêka Kurd re nebe, serî li rêbazekê dixin, ev hemû liser navê hiqûq jirêketineke gelekî xeter e. Nirxandina me, hiqûqê ku pêwîst e weke amûra herî dadmend ê çareseriya pirsgi- rêkên civakî bête şîrovekirin, di angaştê de ye ku, ji vê nêzîkbûna neyînî re nebe amûr, yê rola bikeve ser milê wê bilîze. Hêza bingeh a parêznameyeke rast jî, di derbarê pirsgirêka ku pêve girêdayî de, bi çareseriyên pêşvebirin ku bi pêşveçûnên di pratîkê de rê li ber wan vekirî têne pîvan. Biryarên dadgehan jî, di vê wateyê de, an di aliyê erênî an jî neyînî de rola mezin dilîze.

Ji aliyê ku em di parêznameyê de bigihin encamê, ji ber vê yekê di

pirtûka yekemîn de min bi berfirehî behsa şaristaniyan û Rojhi- lata Navîn kiribû. Ev pirtûka duyemîn herî bêhtir rewşa berbiçav a bûyer û pirsgirêka Kurd, di çareseriyên dibêtî de, wateya wê ya bi gelemperî ji aliyê hiqûqê gerdûnî ve û bi taybetî ji aliyê nirxên hi- qûqê demokratîk ê Ewropa ve, ji aliyê min ve jî dahûrana hiqûqî û zanistî ya bûyeran werdigire nava xwe.

Di bin van qeydkirinan de yê were dîtin ku, dema em terîfkirina PKK vebikin, rastî bi hemû aliyên xwe yê derkevin ronahiyê.

Jibo ku PKK rast were dahûrandin, pêwist e bê sosyalîzma za- nistî ji aliyê bîrdoziyî ve çi îfade dike û di pratîkê de rê li ber enca- mên bi çi rengî vekiriye, li holê bête danîn. Heger weke bîrdoziya afirandina dewleteke lê bête nêrîn û di vî babetî de weke rêbera liv- baziyê bête dîtin û rolekê bidinê, di encamê de yê were dîtin ku sos- yalîzma dewletê, wateya şêweyeke hemdem a bîrdoziya rahîbên Sumer qezenc kiriye. Dema ku em dewleta rahîb a Sumer ji nêzîk ve vebikolînin, yê were dîtin ku ji tişta sosyalîzma reel kirî gelekî bêhtir, sosyalîzma dewletê heta komunîzm, bi serfiraziyeke mezin afirandiye. Dema ku annanc damezrandina dewletê be, cudahî bêh- tir pêşveçûyina bingeha zanistî ya yekê ji wan e. Derûn heman de- rûn e. Dema dewlet were damezrandin, rêveberên raser bi awayek jênerev, an weke mînaka Sumer ên koma rahîban bin an jî, weke ku di têgihîna Eflatûn a dewletê de tê dîtin, ên rêveberiya feylesofan be. Di felsefeyên dewletên ku di serdema me de jî hatine damezran- din de, ev meyldarî timî bûne aliyê serdest. Monarşî, zadeganî û olîgarşî, di nava vê wateya gelemper de cîh ji xwe re dibînin. Pê- wîst e neyê jibîrkirinku, Dewleta rahîb a Sumer, ango dewleta pêşî, di bingeha mandelekirina civaka neolîtîk a ku dema herî dirêj wek- hevîxwaz û azad de, hatiye afirandin. Ev bûyer ji aliyê damezran- dina hemû dewletan ve diyarker e û rewşeke gelemper e. Dema dewlet were damezrandin, ji dêvla meyla civakê ya wekhevî û aza- diyê, newekhevî û serdestî yê giraniyê qezenc bike. Dewleta ku xwe dispêre civaka koledar, feodal û kapîtalîst, di derûna xwe de ti cudahiyan nayîne, di şêweyê de hinek cudahî pêktên. Spartina wê ya hiqûq an jî keyfîtî, rê li ber cudahiyên bingehîn venake. Hiqûq dewleta bi rêzik pêktîne, lê dewleta keyfî, yê bi şîroveya rêveber a rojane ve girêdayî be.

Li gor rêveber li qasî ku roleke nebaş bilîze, dema rêveber bi erênî be dikare roleke mezintir jî bilîze.

Bêguman xeteriyeke vê nirxandinê ya ku weke şîroveyeke anar- şît bête nirxandin jî heye. Lêbelê ev di xuyakirinê de wiha ye. ***Anarşîzm*** meyleke kapîtalîst e. Şêweya takekesparêziyê ya digihe asteke ku dewletê nasnake ye. Têkiliya vê takakesparêziyê bi aza- diya komunal û wekheviyê re, qet tine.

Pirsgirêka din a girîng, di pêvajoya dîrokê de rola pêşverû ya ku dewlet û herwiha civaka ku pê ve girêdayî dilîze ye. Di asteke bi- sînor a zanist û teknîkê de, çînçînîbûn û amûra dewletê, di bin pî- vanên diyar de jênerev bûne û roleke pêşverû lîstine. Lêbelê ev jî mijareke di dîrokê de pir hatiye dîtin û bi awayek zanistî hatiye çes- pandin ku, di pişta civakê de bûye girêbayeke kansêrî û giyandarî tine kiriye. Pêwîst e were dîtin ku, di dewletbûn û çînçînîbûnê de, ji sedî pênc bi wate be, ji sedî nod û pênc bê wate û di wesfê girê- baya kanserê de ye.

Hemû şêweyên mîtolojîk, olî, felsefî û ramana zanistî yên sipartî çînçînîbûn û dewltbûnê, di navbera wan de çiqas cudahî hebe bila hebe, ji vana ji sedî nod û pênc, heta ku bi gelemperî li dij erka dewletê ku nepêdivî û bêwate demekevin, heger ku bihiştê jî bafi- rînin, ji amûrbûna newekhevî û zordestiyê rizgar nabin. Beşek hin- dikayiya pir piçûk, yê beşa herî baqil û bi derfet pêkbîne, beşa din a gel ku herî zêde, yê beşa herî debeng (bûdela) û mehkûm derîni- ne holê. Ev cudahî, di derûna her cure çînçînîbûn û dewletê de he- ye. Rewayiya dewlet û çînçînîbûnê, para ji sedî pênc ku pêdiviya wê ferz dike, bi asta zanist û teknîkê tên watedarkirin. Di asta şore- şa zanist û teknîkê ku di dawiya sedsala 20an de gihîştiyê de, tê ba- werkirin ku ev ji sedî pênc bûyina dewletê û jiyana bi şêweya çî-

nan, ji holê rabûye. Bi hindikayî rawêja bingeh a kesên ku hewceyî bi têgihîna sozyalîzineke nû hene, êdî piştî serdema şoreşa teknîk û zanistê ku pêwîstî bi binyata dewleta kevin û civaka biçîn tine ye.

Ev têgihîn ji marksîzmê ne dûr e. Lêbelê dema nimûneya dewlete- ke weke dîktatoriya proleterya ya ne berbiçav, ku mirov dikare biki- şîne hemû wateyan tê pejirandin, marksîzmê xwe ji lîtava civak û dewleta kevin û xeniqandinê rizgar nckir. Heta weke ku di ezmûnên sosyalîzma reel de pir tê dîtin, çînçînîbûna herî zêde û dewletbûnê, di bin vê nimûnekê de şêwe girt. Di dîroka dewletan de, şêweyên herî otorîter û totalîter li welatên ku ev nimûnak sepandine hatine dîtin. Hatine rewşeke wisa ku cinawirê hatibû afirandin, dest bi xwarina xwediyê xwe kir. Çi bi êş e ku, bi telaşa wî cinawirî xwe avêtina da- wa civak û dewleta kevin. Li qasî ku weke rizgariyê, xwe bavêjin pî- şeyê civaka kevin ê qûnekî û orispîtiyê, pir rajêr ketin. Dersa bingehîn a ku sosyalîzma reel hînkirî, kîjan şîroveya dîktatoriya proleterya be bila be, heta ku dawî li amûra dewletê ya ferz neyê anîn, civaka sos- yalîst ku yê bête afirandin, ji jirêketinê wêdetir, ti rol û wateyê îfade nake, an jî ji şêweya gelek dewletên kapîtalîst ku sîqala sosyalîzmê li wan hatibe xistin, wêdctir naçe. Ev mînak di heman demê de, nirxan- dinên me yên di derbarê dewletê de ku me danîne holê, mafdar derdi- xe.

Bi rastî heger ku sosyalîzma zanist, bixwaze weke sazûmaneke wekhevîxwaz û azadîxwaz, ji hawîrdor re dost û ahengdar were te- rifkirin, şêweyên dîktatoriya proleterya jî di nav de, pêwîst e hemû şêweyên dewletan ji tûrikê xwe derîne. Bêguman civak bê rêveberî û bêkoordîne, najîn. Lêbelê em dibêjin ku, pêwîstiya vê ya bi terîf- kirina amûra dewletê, di serdema zanist û teknîkê de, wateya xwe winda kiriye. Pîvanên krîterên demokratîk ku zelal û dikarin bêtin sepandin, heta ku ya baştir derkeve holê, weke nimûnakeke ku em nebêjin dewlet, heger ne ya herî baştir be jî, dikare weke nimûnaka herî bikêrhatî rolê bilîze. Di bingeha derfetên ku zanist û teknîkê afirandin de, heta demên ku civaka demokratîk bigihe şêweyên rê- veberiya wekhevtir, azad û bi hawîrdor re ahengdar, rêveberiya de- mokratîk (weke îfadeya civakan, şaristaniya demokratîk) weke de- ma pêşverû ya serdema me, têgmkirinê heq dike.

Di derbarê binyata bîrdoziya sosyalîst a zanistî de, rexne berfi- rehtir dikarin werin kirin. Di derbarê rêxistin, livbazî, netewe, ol, huner, jin, felsefe, pirsgirêka neteweyî, têkiliyên seresazî û binesa- ziyan, têgihîna dîrokê, sosyalîzm û entemasyonalîzma li welatekî tenê de, gengaz e ku gelekî bi berfirehî werine rexnekirin. Lêbelê em di wergiriya nirxandina xwe de, ew jî di asta terîfkirinê de, rex- neya di derbarê dewletê de bi têrayî dibînin.

Di hilatina PKKê de, ev rastiyeke ku sosyalîzma bi vê têgihîna dewletê ve girêdayî, bingeh hatiye girtin. Digel ku bandorên burjû- va yên neteweperest û bermayiyên jiyana feodal jî, jiyana xwe di- domînin, têgihîna sosyalîzmeke wisaye ku, dexma xwe li hilatina wê daye, ku di demên tirkiyê yên salên f970an de bi temamî derû- na wê nehatiye danîn, di pirtûkên klasîk ên bisînor de dihate vego- tin û di asta sempatîzaniya koma pêşî ya damezrîner de hatiye têgi- hîştin. Ev diyar e ku xemleke bîrdoziyî ya hevqasî serkî, di pêşede- mê de yê pirsgirêkên girîng derêxe holê. Pirsgirêkeke din a bi vê ve girêdayî, nirxandinên dîrok û rewşa berbiçav yên di bin ronahiya sosyalîzmê de ne. Weke tevayikê rexnegiriyeke kapîtalîzmê ya bi- sînor, ew jî yên ku hemû di derbarê aliyê wê yên aborî de, jibo bîr- doziyeke totalîter ne têrayiyeke cidî ye. Pirsgirêkên wergêrê, lawa- ziyên çandî û ji ber binyata bîrûbaweriya dogmatîk û utopîst, di bingeha vê daneheva sosyalîzmê ya teng de, belgeyên di derbarê şaristaniyên Rojhilata Navîn de, yên tevlîhev ku encex di roja me de derketine holê, bi taybetî yên civaka Sumer, ne gengaz bû ku werin lêkolîn. Herwiha ev yek jênerevbû ku, dahûrandineke Rojhi- lata Navîn û bi vê ve girêdayî dahîrandina dîroka Kurd û Kurdista- nê, yê sereke be û bi çewtiyan tije be. Bi tezên neteweperest û reel sosyalîst, vebûna rê ya li ber têgihîna dîrokeke bijarteker, civak û netew, ji ber vê yekê xwezayî ye.

Têgihîna dîrok, civak û netew a ku ne berbiçav û di asta şematîk de li berçav bête girtin, di wê rewşê de bû ku weke xwe, li binyata bemame û rêxistinê vede. Tevlîbûna di destpêkê de ku ji kesayeti- ya netewe û çîneke pêşveçûyî bêpar, eslê gundiyên xizan, nederbas- bûyina di ezmûnên pratîk û polîtîk re, weke kadro têkeliyeke lawaz jênerev dikir. Sosyal şovenîzma serdestî çepê tirkiyê ku di pirsgirê- ka Kurd de serdest,

serkê li dijî vê, neteweperestiya Kurd a hove- ber û burjûva ku xwedî bandoreke hêzdar, mercên derketinê hê bêhtir zor dikirin. Di gel ne bitêrayî û çewtîtiya van mercên bîrdo- ziyî û pratîk jî, valahiya mezin ku bûyer û pirsgirêka Kurd dijî, bi hinek hewldanên bisînor, rê li ber jiyandina hilatin û pêşveçûneke hêzdar vekir. Hêza hilatin û pêşveçûna wê, ji hostatî û ji binyateke rêxistinî ya pêşketî nedihat. Xwedyê pirsgirêkê nebû. Lê xwedîder- ketin, hewldana bisînor û sade, teqîna pêdivî kiriye. Ji vî alî ve, ge- lekî dişibe tevgerên pêxemberan. Tê zanîn ku duwazdeh hewariyên îsa bizorê hatine cem hev. Li hawîrdor xizanên ku li benda mûcîze- kê hene. Digel vê yekê jî, tevgera bawerî û viyanê ya di dîrokê de herî mezin, pêkhatiye. PKK ya ku dişibe tevgera duwazdeh hewa- riyan, hinekî ji ber binyata mîstîkiya Rojhilata Navîn e. Binyatên rêxistinên Rojava yên hemdem, jibo Rojhilata Navîn nabin nimû- nak. Nasnameyên dîrok û çandi yên gelekî cihêreng, yê li binyata rêxistin û livbaziyê jî vede. Pêşveçûna terîqetan a li tirkiyê jî, di van taybetiyan de veşartiye.

Dikare were gotin ku, di vê wateyê de PKK bi veavabûna sosya- lîstiyeke nîv modem û bi sentezeke nîv klasîk a nasnameya Rojhila- ta Navîn, derdikeve holê. Weke îfadeyeke dawerî ya senteza Rojhi- lat û Rojava ye. Hêza xwe û bêhêziya xwe jî, ji vê sentezê distîne.

Aliyê PKKê yê herî cidî yê di senteza Rojhilat û Rojava de, re- seniya wê û nêzîkbûna bawennendî ye. Girêdana wê bi ti navêndên dogmatîk re tine ne. Xeyalên erzan xweyî nake. Miroven wêrek (di- lêr) û dirist bingeh digire. Jibo ti endamên xwe, berjewendiyên ta- kekesî û prestîjê belên nake. Deryê wê ji rastiyê dadmendiyê û rin- diyê re vekiriye û di nava sexbêriyeke ku azad berde de ye. Di ji- yanê de, wekhevî û rêzgirtina ji kedê re, bingeh digire. Bi pêşveçû- nê re, dema ku civak van taybetiyan bi çavan bibîne, yê li rêxistini- yê xwedî derkeve. Ji vegotinên wan zêdetir, şêweyê jiyana wan yê kişîner be. Ya ku lezgîniya pêşveçûna pêşî û rewişta wê dayî, ev taybetiyên wê ne. Lêbelê aliyê wê yên lawaz jî, dema were fêmki-

rin ku ev taybetî bi serê xwe têrê nakin ê xwe nîşan bidin.

Dema ku tevger mezin bû û ji tevgera komeke teng derket, pirsgirêkên cidî yên rêveberiyê û pirsgirêkên pratîk ku xwe nîşan dan, ne têrayî bilezgînî derandin holê. Di vê demê de hêzên sazûmanê ku hatin ser, rola avê bidine pola lîstin. Derketina derve ku tê zanîn, Di dîroka Tirkiye-Anatolya û ya Kurdistan û Rojhilata Navîn de, merhaleyeke girîng bi xwe re anî. Di demeke ku terazên cîhanê di nava levdaneke mezin de, mercên Suriye, Filistîn, îsrael û Lubnan, jibo pêşveçûnê fersend pêşkêş dikirin. Di pey re, şoreşa îranê û şe- rê Iraq û Iranê, dorhêl hê bêhtir bikêrhatî kir. Li tirkiyê mercên gi- hîştina derbeya 12ê îlonê û pêşwazîkirine derbeyê li derve, avanta- jek çêdikir. Dema ku li benda welidandineke bi mirina zû an jî li benda rêxistineke ku bisînor bimîne bûn, pêvajoya ***15ê Tebaxê*** destpêkir. Ev jî pêngaveke ne bi planên mezin bû, pêvajoyeke ku aliyê wê yên ji ber xwe ve giran bû. Digel vê yekê encamên wê me- zin bûn. Pêvajoyeke pêşveçûyî wisa derkete holê ku di serî de se- rokatiya PKK û endamên wê, ti kesî ev yek texmîn nedikir.

**b-** Li nav kurdan û tevaya Kurdistan, nirxandina PKK ya van sa- lên ku têne wateya demeke dîrokî ya nû, heta terîfkirina wê, jiber- ku em rastiyê bibînin, girîngiyeke mezin digire. Di serî de, di hila- tina bîrdoziyî de, sosyalîzma reel ku hatî hilgirtin û hînbûyinê sa- zûmanê, di vê dema pêşveçûnê de, maskeya xwe avêt û bi rûyê xwe yê rasteqînî xwe nîşan da. Bîrdoziya ku bisînor hatibû xûnifandin, li aliyekî hat danîn. Nasnameya kevneşopî, bi çeka ku bidestxistî û keysperestiya karbidestiyê, bû kesayetiyeke mîna Nemrûd. Kesa- yetiyên ku aliyê feodaliya wan a di kemînê de giran kişand, ji meyl- dariya neteweperestiya hoveber a ku di qada tevgerê de hîkarîker, hêz standin û dil berdane serdestiya xwe ya bêsînor. Kadroyên xi- zan ên gundî ku di destpêkê de dirist, jiberku pêngavên pêwîst na- vêtin, neteweperestiya hoveber dane pişt xwe û kesayetiya feodal a ku bilind bûyî, hê betir wêrekî qezenc dikir. Liser xebatên seroka- tiya tevgerê û qezencên ku berhema kedeke bêhempa, weke feoda- lekî xespker (rapêçker) dane ser. Bi sedsalan di derbarê karbidesti- yê de, mehçêtiya ku kişandin û fennandariya sexte, hinek asta aqil
ku bi wan re hebû jî, ji wan standibû.

Gelekî dereng derkete holê ku, evan ji holêrakirina kadroyên di- rist ên bisînor ku bi tevgerê ve girêdayî, bi komplokeriyên feodal, kirine livbaziyên bipilan. Dihate fêmkirin ku, bizava bi navê ***çete- ya çarmend*** ji şehîdbûna ***Egîd (Mahsûm Korkmaz)*** ê ku dawera kadroyên dirist ê tevgerê ve, di nava hewldanên tarî de bûn. Salên 1987-88an, demeke ku vê çeteyê dexma xwe li pratîkê xistiye. Di serî de bi gotina ‘encex çete vêna bikin’ têgihîna livbaz ku qet ne- dihat bawerkirin, hatibû rewşa xêzikekê. Pîvanên tevgerê yên we- ke bîrdoziyî, mirûz, rêzik, berpirsiyarî û diristî, bi temamî li aliyekî hate danîn. Sexbêriyeke ku di rêzikên ti şerî de nebûn û kesek ni- zane bê ji aliyê kê ve hatiye kirin, weke nexweşiyekê di hêzên ge- rîla gerandin. Jiberku karê wan demekeve holê, weke qewama şer nîşan didan û heta bi kuştina kadroyên dirist dibirin.

Di serê sala 1990an de pêkhatina bûyera Şehîd Hasan Bindal ku aliyê wê yê komplo, diyar kir ku aqlê xwe bînin serê xwe. Ev tenê işaretek bû. Ev têgihîna komploker, digel ku ne pêwîst bû jî, berpir- siyarê kuştina gelek jin û zarokên hê berî bûn. Kadroyeke ku heva- lên xwe yên herî hêja li pêşya xwe asteng bibîne, çavê xwe neşkî- ne û bikûje, pêşveçûneke şêt bû lê rastiyek bû. Van gelek rê girti- bûn. Rêxistin bi awayek mezin kiribûn hevparê sûcê xwe. Kadro- yên navendî yên kevin ku pêdivîbû berpirsiyariyê bikin, wek sê meymûnan diliviyan û digotin ***“Min ne bihîst, Min ne dît, Niza- nim*** Weke serokatiyê, çiqas ku pêngavên dîrokî dihatin avêtin û destek dihat pêşkêşkirin jî, xwediyên vê têgihînê bi awayek rezîla- ne û jibo sexbêriyên xwe yên keyfî ku bênirx, vala derxistina wan ji xwe re kiribûn zewq. Berxikên dayikan, ciwanên berhema kedên giran kom bi kom, jibo livbaziyên ne pêdivî û bêpilan, belkî jî jibo pakêtek cixare an jî jibo gezek nanê zêde, dişiyandine mirinê, Ke- tibûne rewşa mekîneya ku mêran dixwe. Keçên ciwan ku pêwîst bû mîna çîçekekê werin pêşwazîkirin, weke barekî piçûk dihatin gir- tin. Di kesayetiya van de, dildariyên azadiyê dihatin perîşankirin. Dema ku fersend didîtîn, ji lêferzkirina hoveberiyê venedikişiyan. Dima ku li wan teng dihat, an xwe davêtin dewletê an jî xwe li bir- yargeha neteweperestiya hoveber digirtin. Bi bazdana xwe, Ewro- pa jî kiribûne cîhê pîkolê. Xweperwerdekirin li dera han, bin kevi-

ran ji melzemeyên perwerdeyê yên ku bi kedeke giran dihatin peydakirin, tije kiribûn. Disiplîna rêxistinê, karê herî pêşî ku hilweşan- dana. Fennanên keyfî, suxredarkirina jibo xwe, ew ajoyên çîna ser- dest ên hezar salan ku binalet, bi rewşên xwe yên herî hoveber, di nava sefan de serdest dibûn. Digel hemû peşgirî û tedbîran jî, PKK di dema 1987-1997an de, eslê wê gelek ji derûna xwe û ji şêweya xwe jî winda kir.

Rast e, bingeheke PKKê ya girseyî heye. Lehengiyên wê yên mezin çêbûne. Şehîdên rojya mirinê yeêşî dane. Di mercên herî zor de rûmeta xwe stirandine. Lêbelê him li girtîgehê, him li çiyê û him jî li Ewropa hinekan, jibo têrkirina wan ajoyên xwe yên çîna ser- dest ku rezîl, rabûne nijdevaniyê. Her lîstik û mêrkûjî, ji wan weye ku hostatiyeke.

Digel ku bi temamî nehatine nivîsandin jî, bi lêferzkirina çewtî- tiya hişmendî, ji sedî nod hêza ku kadroyên rast ên partiyê û yên ku yê bûbana endamê rêxistinê, bûne qurbanên vê têgihînê. Lêgerînên kitekit, yê hê bêhtir rastiyê derînin holê. PKK ya ku di her astê de pêbaweriya xwe windakirî, bûyera kompolya li serokatiyê û liqasî windabûnên kadro, şervan û sempatîzanan, windabûna amûr û ha- cetên bêsînor, lojîstîk û girseyê jî, bi vê têgihînê ve girêdayî ye. De- ma hate 1998an, revandina Şemdîn û dûv re girtina wî jî, şanîdere- ke girîng e bê navenda PKKê ya ku di peyvê de mayî, di çi rewşê de ye. Heger ku bi hêdiya be jî, rêveberiyeke ku hê jî dorhêl û mer- can ji van xiyanetan re pêşkêşdike, dikare çiqasî angaşt bike ku aq- lê xwe li serê xwe daye hev û rêzgirtina kesayetiya xwe di wijdanê xwe de bi cîh kiriye?

Rexneyeke bi wergirî, dikare ji xêzika leşkerî ya di peyvê de we- re kirin. Digel derfetên leşkerî ku qet ne hindik, dorhêla ku gelekî bikêrhatî û desteka lojîstîk û girseyê, rastiyek e gerîla ku nikare xe- teke parastina rewa ya hêsan bigire, bi taybetî jibo serokatî û fer- mandariya wan çi yê were gotin? Xêzikeke bi aso û perwerdeyeke xwedî wateya leşkerî û reva ji rêxistinbûnê, di dorhêla derfetên ber- fireh de tiraliyeke ku jiyana turîstan ji paşve dişopîne, fennandari- ya ku ya amade jî ne di ber ti tiştî de dide windakirin, dikare çiqasî kesayetiya leşkerî li xwe bîne? Di gel ku jibo şerekî parastina rewa, hemû taybetî û mercên bikêrhatî gihane hev, fenneandariyeke li çi- yakî herî bikêrhatî ku nexwaze bizanibe parastina xwe bike û ji ser serê xwe bavêje, yê çiqasî cidî were girtin?

Fennandariyek û na- vendeke pratîk ku mirovên herî wêrek weke barekî binirxîne, yê çi- qasî bi angaşt be? Ev vekiriye ku, hisdike serek bila bigihe dewle- tan, hisdike bila bigihe Ewropa û hisdike bila bigihe neteweperes- tiya hoveber a burjûva, meyldariya çeteger, dexma xwe li rêxistin, fennandarî, xêzika livbaziyê û şêweya jiyanê xistiye.Ya ku serokatî ber bi xenqandinê biriye, ev rewşa ku rêxistin êxistinê bû.

Dema ku ez li derve bûm, di dawiya sala 1988an de, nêzîkî pê- vajoya kongreya öemîn, xweş tê bîra min ku min ev axaftin kiribû: "Ez li hember bîrûbaweriya mişkên kêzînan û şevşevokan (baçer- mok) çi bikim ku şerekî parastina rewa, ku deh caran dikare bête qezenckirin, bê xistine çi rewşê?" Ez li hember rêxistinê têkçûbûm. Meyldariya çeteyê, di rêxistinê de bê hestyarî û rewşeke ji encam- girtinê dûr afirandibû ku, têkçûnê nava min weke asîdê diheland. Ez hatibûme xaleke wisa ku, ez bêhemdî xwe bibêjime rojnameye- ke îtalya "ez ji rêxistinê îstîfa dikim". Şemdîn, vê dawiyê di mukir- hatinê xwe de, bi angaşt û belge dibêje ***"min ev pêh'cijo afirand",*** heta ji dadgehê rûniştineke (celse) veşartî dixwaze. Esehiya pêva- joyê nayê zanîn. Ji karesatên ku di dîrokê de hatine serê Kurd, ye- ke din xwe nîşan dida. Paşverûtiya Kurd tola xwe digirt. Bi salan, tişta ku bi lihevhatinên bi dewletan re, nikarîbû bike, di hundir de, him jî derfetên PKKê yên di nirxên zêr de tine kirin, Bi lêxistina PKKê ya li kevirê kor, xwe têr dikir.

Vê dawiyê dewlet, şerekî ku PKK yê bi rihetî qezenc bikira, bê çima windakir, qet tênegihîşt. Yê bibîne ku ev yek ne bi pêşgirî û tedbîrê wê pêkhatiye, herwiha yê tevkariya hêza paşverûtiya Kurd a der û hundir teqdîr bike. Lêbelê dewleta ku bûyî çete jî, yê ji nir- xên xwe gelekî winda bike. Dersên ku me ji hişyarkirinên 28ê siba- tê derandin, bi erênî bûn. Dema ku hate 1998an, derbaskirina xiti- mandina ku heyî, bi aştiyeke birûmet û bi rêya çareseriyeke demok- ratîk, jibo hemû aliyan weke rêya herî bikêrhatî xuya bû. Hê dema li Rojhilata Navîn, ev bibiryarbûn pêkdihat. Rêya mesajên ne ras- terast vebûbû. Lêbelê berjewendperestiya polîtîk û rojane û besît ên Rojhilata Navîn, emperyalîzma ku derfetê nade çareseriyeke birû- met, jibo bike xulam û berjewendiyên xwe bîne rewşeke bikêrhatî, rêbazan dike dewrê, dema bizav hat dan, bêyî ku ji kevneşopiyên hiqûqê demokratîk re rêzê bigire,

bi Rojava û Rojhilat re komplo- yeke li derî mirovatiyê biryar didin, li hember sepîna wê tişta were kirin pir bisînor û ewqas jî zor bû. Ya herî hêsan razana jibo mirinê bû. Pilana komplokeran bendewariyeke bi vî rengî bû. Rêya ku fer- send neda vê yekê, ceribandina jiyaneke di cîhekî mîna tabûtê de, dayina li çarsingê bû. Hemû tiştî dawiya demekê û destpêka deme- ke nû, ferz dikir û nîşan dida,

Di demên hilatina PKKê û pêşveçûna wê de, di binyata bîrdo- ziyî û livbaziyê de, bingeha çavkaniya netêrayî û jirêderketinên ku derketin holê, bi têgihîna dewletê û şêweya şidetê ve girêdayî ye. Têkiliya di navbera dîktatoriya proleterya ya sosyalîzmê û tê- gihîna şoreşê ya sipartî zorê, diyar e. Di rewşa zora şoreşger û ser- keftina wê de, weke îfadeya vê ya teorîk dîktatoriya proleterya, di sosyalîzma reel de rewişta xwe ya nakok datîne holê û xwe ji ve- guherîna amûra zorê ya kapîtalîzmê venekişandiye.Ev pêvajoya ku li nav Sovyetan bi êş derbasbûyî, di nava wê de bi berjewen- diyên kapîtalîzma neteweyî re ahengdar, di rewşa şêweyeke çan- da kevneşopiya împeretoriyê de heman rolê, ango ne piranîparêz û weke dewleteke kapîtalîst ku aliyê wê yê dîktatortiyê serdest, hebûna xwe berdewam dike. Li dijî gelê kedkar, veguherînê gav bi gav pêktîne. Weke encamê, hatiye çespandin ku dîktatoriya proleterya, weke amûreke civaka sosyalîst, bi serfirazî nayê bika- ranîn. Eslê wê, di wateya bîrdoziyî û polîtîk de, encama sedsala 20an a herî girîng, ev rasteqînî ye.

Herwiha nûjenkirina şoreş û têgihîna dewletê ya bîrdoziya sos- yalîst, di bingeha hemû pirsgirêkan de dimîne. Hinek dewlet û par- tiyên sosyalîst, di nimûneyên sosyal-demokrat ên kevin de ku kapî- talîzmê bingeh digirin, hewl didin ku nûjenbûna xwe pêkbînin. Ew- ropa Rojhilat û Rûsya vê pêvajoyê bisiftî dijîn. Hinek ji wan dix- wazin ku di bingeha tevgerên hawîrdor û kesk de, şêwe bigirin. Be- şek ji wan divê ku di nava rêxistinên civaka şarwer de, xwe bidin domandin, beşên bisînor ên ku di kevnîtiyê de bi israr jî, hewl di- din ku weke terîqetekê liser lingan bimînin. Diyar e ku pêvajoyeke derbasbûnê tê jiyandin. Tişta pêdivî ev e ku liser navê gelan, şêwe- girtineke bîrdoziyî ya tekûz û pratîkbûna vê ya bi sexbêrî ye. Heta ku encamên serkeftî bi pratîkê bide çespandin, nîqaşên bi vî rengî yê berdewam bikin.

Tişta bi lezgînî jibo PKKê pêdivî, di pêvajoya veguherînê de li tevaya cîhanê, ji nû ve rêya xwe ya bîrdoziyî û pratîk diyar bike ye. Jibo vê yekê jî, pêvajoya rexne û xwerexne ya ku dijî, heta bi veavabûneke nû ya sexlem û kûr, bi serfirazî bidomîne. Girêdana vê pêvajoyê ya bi têkçûn an jî serkeftinên bilind, ne rast e. Nêzîk- bûnên bi vî rengî serveyî ne. Heger ku serkeftineke tevayî jî pêk- were, ev pêvajoyeke pêdiviye. Heger bête rewşa saziyeke dewletê ya hêzdar, weke nimûnaka Sovyetê, belkî rewş hê jî zortir bibe. Li aliyê din bi temamî tekçûn heye. Herwiha gotina em her tiştî bi- guherînin jî, bi hindikayî li qasî nêzîkayiya yekem çewt e. Heta ku sedemên têkçûn û serkeftinê yekbin, û dest li van sedeman ne- yê dayin, veguherînên ku çêbibin ne nûjenî, encex revîzyon an jî restorasyon be. Di vê wateyê de, veavabûna ji nû ve jî, nûjeniye- ke nû îfade nake. Tişta hewce tê dîtin, şêwegirtineke bîrdoziyî û asta pratîk a lihevkirî ye.

Ez fikaran dikim ku, têgihîna sosyalîzmê bi dewleta rahîb a Su- mer an jî şêweya wê berbiçav a di roja me de bi rexneya dewleta kapîtalîst ve were girêdan û pêşvebirin, yê çewtîtî û kêmasiyên cidî bigire nava xwe. Ez bawer dikim ku, şaşî û kêmasiyên bigeh ên marksîzmê, ji nimûneyeke sosyalîzmê ya bi vê şêweyê dertê. Divê bête şîrovekirin ku, rawestina Engels van demên dawî ya liser pir- tûka Morgan a bi navê Civaka Kevin, girîngîpêdana Marks a vê ye- kê, kemasî dîtina xwe ye. Demeketina wan a ji qada kapîtalîzmê, digel ku qet ne xwestine jî, ew kirine rewşa serikê çep ê sazûmanê.
Ev yek şêweyeke pêşketîtir a veqetîna çep-rast ên di şoreşa Franse de ye. Kêmasiya herî bingehîn û xalên şaşîtiyê ev e ku, sazûmane- ke altematîfa kapîtalîzmê yan jî yeke ku wê derbas bike, bi vê rex- neyê bi tekûzî nayê damezrandin. Kêmasiyên din ên bingehîn, nê- zîkayiyên aborî yên bi vê ve girêdayî, ne nirxandina rola bîrdoziyê ya bi temamî, di dahûrandina dewletê de dubarekirina nêrîna çîna serdest a liser navê proleterya, nêzîkayiyên gelekî paş ên li ol, di- yamekirina rola seresaziyan a weke di rastiya wan de û di ser re bo- rîna kartêkera mirûz in.

Weke encamê, pêwîst bû bi têgihîneke teorîk a kûr û zelal bi- bînin ku, bi asta mirûz û baweriyeke gelekî li paş rahîbên Sumer ên ku dewlet afirandine, cîhana kedkaran nayê damezrandin, pê- wîst bû bi awayek

hêzdar balê bikişînin ku, bi şêweya jiyana pra- tîkeke resene û xebatê encex şêweyên civakê yên dîrokî werin rastkirin. Ji aliyê din ve ne dahûrandina wan a demokrasiyê jî, kemasiyeke mezin e.

Weke takekes nêrîna min ku ez dixwazim diyar bikim, çi navî lê bikin bila bikin, tenê ne li hember kapîtalîzmê, li hember hemû der- dorên civakê yên dewletperestên klasîk û biçîn, ku dahûrandina ci- vaka neolîtîk bingeh bigirin ê rastir be û yê bikaribe sazûmaneke bîrdoziyî ku bibe cîhana kedkaran derîne holê. Li hember sazûma- na şaristanî ya ku bi civaka Sumer a biçîn û bi hemû civakên biçîn ên ku di pey re hatin ve girêdayî, binyata civaka wekhevîxwaz û azadîxwaz a ku di civaka neolîtîk de ji hemû serdeman kûrtir tê ji- yandin, di bingeha zanist û teknîka ku pêşvediçe de weke aborî, ci- vakî, demokratîk û bîrdoziyî, ji nû ve were şêwandin.

Di çarçova vê terîfkirina sereke de, dema em taybetiyên civaka sosyalîst birêzînin, rêzeke wiha yê pêwîst be:

Civaka sosyalîst, weke bîrdoziyî pêşveçûna zanistî bingeh digi- re. Bikaranîna teknîkê ya bi wekhevîxwaz û azadîxwaziya civakê û bi xwezayê re ahengdar, him hêmana mirûz e û him jî şert dike ku bi rêzikên hiqûqê bi temamî têkeve bin kontrolê. Li hember teknî- kê ne hêmana aborî, hemana mirûz û birêkûpêkirina hiqûq pêşdatir e. Ti berjewendiyên aborî, ji hêmana xirabnekirina bizorê ya teraza

civakê ku bi wekhevî, azadî û bi xwezayê re ahengdar, ne pêşdatir û ne binirxtir in. Ya girîng, rêberiya şêweya ku zanist û teknîkê, di bin berjewendiyên jiyanî yên civakê de bigire ye. Şêweya bîrdoziyî ku bersivê dide vê annancê, weke organa herî mezin, Pêwîst e bi pîrozwerî û jidil rê nîşanî cîhana giyan û bîrûbaweriyê bide. Rola ol û ya sincê nû, yê di vê çarçovê de bête lîstin. Li qasî ku bi vê ar- mancê ve were girêdan, yê ji nirxê hemû raman û baweriyan re rêz bête girtin. Ev şêweya bîrdoziyî, xwedî nirx û pêşdatiriyekê ye ku ramana zanistî û sincê azad bi hev re temsîl dike. Azadiya takekesî û xweşiya civakê, teraza xwe ya herî baştirîn û bi têrayî, di vê çar- çova bîrdoziyî de dibîne. Bi gotineke din, asta azadiya civakê û azadbûna takekes, senteza xwe ya herî serkeftî dikare di bin vê şê- weya bîrdoziyî de pêkbîne.

Sosyalîzma reel û komen komunal ên piçûk jî di nav de, di bin- geha rexneya sazûmanên civakê ku jibo yekê ya din feda dikin, pê- wîst e yekîtiya bi têrayî an jî senteza ya rast, were girtin.

Civaka sosyalîst, pirsgirêka derbaskirina civaka kevin û dewletê, pêwîst e ne bi şêweya dîktatoriya kedkaran a sipartî zorê, deyne ho- lê. Her cureyê zorê yê hêrîşker ku mijokatî û qezenckirina hêzê bin- geh digire, di nêrînên bîrdoziyî yên kedkaran de cîh nagire. Heger ya li hember dewleteke bi zora bêteşe be jî, bingehgirtina hilweşa- na wê ya bizorê, yê bi vê sazûmana bîrdoziyî re nakok be. Ev hê- mana bingehîn nayê wateya ‘em dewleta heyî bingeh bigirin, em teslhnî wê bibin’. Berevajî vê, derbaskirina wê weke hêmana bin- geh dipejirîne. Ev yek hêmana têkoşîna li hember hemû têgihîn û sepînên dewletê jî, bingeh digire. Lêbelê rêbaza wê, hilwaşana ne bi zorê, ne bi rêxistina zorê ye, vala derxistina bi parastina rewa û livdariyê, weke stratejiya bingehîn dipejirîne. Parastina rewa, pêdi- viyeke hiqûqê gerdûnî û hêmana bingehîn berdide.

Heger pêkutiya wê gihabe asta kûştinê, mafên mirovan ên herî xwezayî nasneke, mafê gel ên çandî bizorê bi tepisîne û mandele bike, hêzên civakî yên ku bi biryarî bixwazin van bikarbînin bi bi- nisîne û mehkûm bike, li hember dewleta li derî hiqûq û sepînên wê ên bi zorê ku pêdiviyên hiqûqê gerdûnî bi cîh nayîne, şêweya bi çekdarî jî di nav de, bi yekîneyên parastina gel û li gor hemû ki- tekitên hunera şer, him

li der û him li hundir sîstemeke parastina rewa ya berfireh, yê were sepandin. Ev weke mafekî destûra bin- gehîn were dîtin, heger di zagona bingehîn de ev maf nebe, heta ku ev kêmasî di destûra bingehîn de were nivîsandin, berdawama şer, pêdiviyeke têgihîna parastina rewa ya ferz e. Heger dewleta heyî, dewleta hiqûq, mafên mirovan ên bingehîn û pîvanên siyaseta de- mokratîk bingeh bigire, helbet parastina rewa şêweya şideta çek- darî pêknayîne, heger pêkbîne yê ne rewa be û yê nirxê xwe yê bîr- doziyî winda bike. Gelek rêxistinên şoreşê û dewletên reel sosya- lîst, herçiqas ku di bin navê parastina dayîknîştiman (welat) û strandina şoreşê de, têgihîna parastina rewa tînine holê jî, hatiye çespandin ku têkiliya sîstema zorê ya dide xebitandin bi vê têgihî- nê re tine, heta sîstemeke ku hatiye terorîzekirin e. Hêmaneke pa- rastina rewa ya jêneger jî, nelihevkirina bi dewleta terorîst re ye. Bi dewleta terorîst re, dibe ku ji ber taktîkan di her mercî de, şer neyê kirin, lêbelê ev yek şert e ku ji aliyê hêmanî ve lihevkirin an jî teslhniyet were redkirin.

Herwiha hêmana di derbarê qada siyasî de, civaka demokratîk, siyaset û dewlet e. Cudahiya vê dewletê ji ya dewleta klasîk diyar e. Dewleta demokratîk, girêdayî çarçova hiqûqê gerdûnî ye, timî cokên wê yên siyaseta demokratîk vekirîne, derfetê dide saziyên ci- vaka demokratîk û her cure rêxistinên civaka şarwer. Dema ku ne li gor van pîvanan bilive an jî zorê li wan bike, heta ku van pîvanan bigire, yekîneyên parastina gel ên ku bi bi stratejiya parastina rewa ve girêdayî, pêwîst e rola xwe bilîzin, ev rol di nirxên hêmanî yên jêneger bin de ne. Heger baş bête nêrîn, di nava vê têgihîna siyasî de, hilweşandina dewletê an jî damezrandina dewleteke din, bingeh nayê girtin. Armanc tê girtin ku dewleta heyî, di derûn û şêweya xwe de bigiha dewleta demokratîk a hiqûq e. Ne sînoran, veguhe- randina nava wê annanc dike. Heger rewşa parastina rewa nebe, si- yaset ê di nava rêzikên demokratîk de were diyarkirin. Mafên bi tê- koşîna demokratîk werin bidestxistin. Mandelekirina maf û asteng- kirina rêzikên demokratîk, şêweya çekdariya parastina rewa jî di

nav de, yê bête hewldan ku bi her şêweyê encam were girtin.

Li vir a girîng, her mijara ku hewceyî pê heye û di her qadê de, jibo bicîhanîna van hewceyiyan, pêwîst e yekeyên civakê yên bi hişmendî û bi rêxistinî derînin holê û jibo derbaskirina civaka kla- sîk û dewletê, qada sêyemîn were afirandin. Bi qada sêyemîn, yên ku ne li hember civaka kevin û dewletê û ne jî yên ku li cem cîh di- girin, an jî yên fersendekê nadin ku bi lihevdaneke timî bikevine derawayeke asteng, ji ber ne têrayiyên xwe veguherînan nikarin çê- bikin asta hişmendî û rêxistiniya ku di sînga herduyan de pêktîne û têgihîna bingehîn û pratîka ku nakokiyê çareser dike, tê fêmkirin. Dema kevin, an bi nêrînên fennî û sepînên dewleta ku civaka kevin hildiweşa veguherîn çêdibû, an jî bi teorî û pratîkên ku dewlet hil- diweşandin hewl dihat dayîn ku civaka nû were pêkanîn. Lê di te- orî û pratîka qada sêyemîn de, di bin teraza cîhanê ya heyî û mer- cên demokratîk ên herî hindik de, bingeh tê girtin ku civaka nû bi afirînêriyekê xwe, xwe bigihîne hişmendî û rêxistinan û xwe pêk- bîne. Ne bi lihevdan û hilweşandin, tê hewldan ku di sînga ya ke- vin de altematîfan bafirînin û veguherînê di nava peresîn û aştiyê de pêkbînin. Dema ku rêya vê yekê were girtin, yê bikin ku heman encamê bi rêbaza parastina rewa bigirin û vî mafê xwe bikarbînin.

Di bemamesazkirina sazûmana aborî û civakî de, teraza dibetî (opthnal) ya di navbera takekesî û civakî de bingeh tê girtin. Ne ji- bo takekes dev ji civakê tê berdan û ne jî jibo civakê dev ji takeke- sê azad tê berdan. Ya ku di rewşa civak û takekesî de hilberînê di- yarker dike, ev pîvana sereke ye. Di bin her mercî de ahengdariya bi hawîrdor re, pêşdatirî werdigire. Xwedaniya (milkiyet) takekes û civakê jî di nava vê çarçova sereke de gengaz e. Keda afirîner ku ji wanê din bêhtir, li qasî ku dafirîne para xwe bigire, tiştekî dad- mendî ye. Ev peywireke giştî ye ku kesekî bêkar nemîne. Jibo ten- duristî, perwerde, spor û huner jî, bi polîtîkayên derbasdar, tevlîbû- na herkesî ya li gor ked û pêdiviya xwe bingeh e.

Civakek nû ku bi vê awayê şêwe bigire, dikare bête behskirin ku di wateya klasîk de, rêveberiya dewletekê derbas kiriye. Divê bête zanîn ku, zanist û teknîka heyî derfetê dide civakeke bi vî rengî, ya pêdivî organîzasyona vê derfetê û rêveberiya wê ye. Em bibêjine rêveberiya ku

derkeve holê, koordînasyona kar û rol, yê baştir be. Ev yek erkeke weke komîsyona kontrolê ya xebitandina civakê ye. Sepandina zorê, belavkirin, destekarî, belavkirina rantê, hêz bidestxistin û afirandina komên hntiyazdar, nabine erka vê rê- veberiyê. Em dikarin vê weke birêkûpêkirineke teknîk jî terîf bi- kin. Ev gotineke bi kitekite ku bibêjine vê şêweya civakê, sosya- lîst û demokratîk. Ya girîng ew e ku derûn serdest be. Ev yek di- yar e ku ev karê pêvajoyekê ye. Derbaskirina ne wekhevî û pêku- tiyên civakî yên bi têkoşîna demokrasiyê jî, tiştekî xwezayî ye. Pêşveçûna civakên Rojava yên di vî derbarî de, sedema rastî ya ra- serbûna wan e. Şaristaniya Rojava, ji levdanên di sedsalên 19 û 20an de ders derandine, civaka demokratîk di asteke pêş de afiran- diye û raserbûna xwe bi tevaya cîhanê daye pejirandin. Kêmasiyên wê hene. Bi derbaskirina NATO û damezrandina artêşa parastina YE yê, ‘amûra parastina rewa’ yê tekûztiriya xwe pêkbîne. Tê ar- manckirin ku mijarên netew, welatparêzî, hemwelatî û entemasyo- nalîzmê yên ku pêwîst e şêwegirtina bîrdoziyî li bemameyê vede, bi vê çarçova sereke re di nava ahengdariyekê de, were dahûran- din. Di bin rêveberiya hevpar a dewleta teknîk de bi pimeteweyî, pirçandî û bûyina bi pimasnameyî, pirsgirêkê demaxe holê. Dema ku rêzikên dewleta demokratîk werin sepandin, mijarên ku di nav- bera wan de pirsgirêkan çêbikin ê di nava aştiyê de werin çareser- kirin. Piştî ku mandelekirin û pêkutî bingeh neyê girtin, ya ku mayî yê têkoşîna demokrasiyê diyar bike. Wekhevî û azadî encex bi vê têkoşînê bête qezenckirin, yê di navbera gelan û nasnameyan de biratiya bi rastî û dostîtiyê damezrîne.

Çi qada ku gel û çand lê dijîn, weke îfadeyeke danehevê, bi na- vê wî gelî yan jî wê çandê bête binavkirin, ev nabe cudaxwazî. Ev rasteqîniyeke hemdem e ku heman netewe li gelek qadên cuda bi welat bûne û di bin heman rêveberiyê de jî, ev rewş di nava sîno- rên her welat û her neteweyê de tên jiyandin. Yekerbûna welatan encex bi jiyana gelan a azad bigihîje ewlekariyeke hêzdar. Weke nasnameyeke raser a hemû koman, têgîna welat û welatparêzî en- cex bi têgihîna jiyana komên piçûk a çandan û gelan, li qadên da- yîknîştiman û danehevên menewî, dewlemendiyê qezenc bike. Hemwelatî, girêdana bi dewleta teknîk ve îfade dike. Guherandina nasnameya bizorê nagire nava xwe. Mirovên ji

her baweriyê, ji her nijadê, her cureyî û her neteweyî, weke endamên heman dewleta teknîk, dikarin bibine hemwelatî, lêbelê nikarin bi zorê bikin em- damê neteweyekê. Entemasyonalîzmê, weke dabeşkirina hevpar a nasnameyên neteweyî û çandî, di her serdemê de pêşveçûn pêka- niye. Di serdema me de, weke aliyekî erênî ya kadîbûnê, jênerev e ku demeke herî sift û berfirehbûyî bijî. Di gundê cîhanê de, hemû pirsgirêk û bûyer hevpar in. Herwiha çareseriya wan jî hewldana hevpar pêwîst dike û hemû pêşveçûnen erênî jî ye tevaya mirova- tiyê li hev par bikin.

**c-** Şêwegirtina bîrdoziyî ya dema nû ku em hewl didin bi xalên sereke vebikin û vedana vê ya li dor van hêmanên bemameya vê û rêxistin û hhnên xebata wê, ji aliyê PKK ya dema nû ve jî derbas- dare û wateyeke mezin îfade dike. PKK ya ku hewldanên rexne- rexnegirî û nûbûnê dijî, yê bi van hêmanan çêbibe. Mandelekirina kevin a bi tevayî ne dabaşa xeberdanê ye. Lêbelê ev vekiriye ku pê- wîst e veguherînên herî bingehîn jî pêkbîne. Pêwîst dike ku derbas- kirina di ber çavan re berfireh be û nûbûn bi kûrayî û bi pratîkê re, di nava hev de wateyê qezenc bike. Şêwegirtina bîrdoziyî û çarese- riya pirsgirêkên bemameya PKK ya di dema pêşya me de, pêşdeti- riya yekemîn pêk tîne. Şêwegirtina bîrdoziyî, bergeha cîhana ku pê- ve girêdayîne û rawêjên teorîk ên bingehîn digire nava xwe.

Me hewl dabû ku em di pirtûka yekemîn de, zayîna bîrûbawe- riya zanistî, mîtolojîk, olî, felsefî û wateya wan dahûrînin. Ji dêv- la ku em dubare bikin, emê bi girêdana wan re têkildar bibin. Ya pêşî ku were fêmkirin û bingeh bête girtin, pêşveçûna diyalektîka çar şêweyên ramana kategorîk e. Gihîştina bîrûbaweriya zanistî, ji veguherîna enerjî û daring heta bi tekiliya parçeyê herî piçûk û gerdûnê, ji xwezayî heta bi giyandariyê, ji cureyê rîwek, ajal û mirov heta bi çêbûna civakî, bi xûnifandina zagonên ku dexma xwe li veguherînê dane bergehê qezenc bikin, tê wateya ku ji vî alî ve li hemû tiştên diqewime binêrin û şîrove bikin. Daringparê- ziya diyalektîk û dîrokî, dibe fonnulasyona vê bergehê. Xûnifan- dina vê ya rast, ji aliyê şêwegirtina bîrdoziyî ya sexlem ve jêne- rev e. Kesên ku ne xwedî vê bergehê û serokatiyê li veguherînên civakî bikin, yê fikareyên mezin bi xwe re bînin. Herwiha

partî û rêxistinên ku zanistê bingeh digirin û xwedî angaşt in ku civakê veguherînin, pêwîst e ku ev şêwegirtina bîrdoziyî, çarçoveya wan a teorîk teşkîl bike. PKK ya ku veguherînê dijî, pêdivî û mercekî pêşdatire ku şêwegirtina xwe ya bîrdoziyî di vê astê de qezenc bi- ke. Di vê çarçovê de, hemû rewşên bîrûbaweriya ku serdestî bin- yata kadro û şêweya jiyanê, rexne û xwerexnekirinê kirin şêweya girtina bîrdoziyî ya tekûz û bergeha teorîk a zelal ku bi xûnifînin, divê weke peywira vê nêzîkayiya pêşdetir a bingehîn, were dîtin. Çiqas ku şêwegirtina bîrdoziyî tekûz be, diyar e ku bemame û pratîk jî yê ewqasî rast û serkeftî pêşveçûnê pêkbîne.

Nûhîna ku bîrûbaweriya gundiyê feodal û burjûva piçûk rê li ber vedike, piçûk nayê dîtin. Di çetebûn, bêesilbûn û di bingeha her rev û xiyanetê de, ev bîrûbawerî û binyata rewişt heye. Partiyeke bi sexbêrî, dema ku xûnifandina şêwegirtineke bîrdoziyî ya tekûz bi kadro û endamên xwe bingeh bigire û vê bi serkeftî bîne cîh, yê me- şandina bemame û pratîka xwe bi awayek rast garantî bike. Heger ku vê pêkneyîne, pêşgiriyên (tedbîr) di asta duyemîn de, encamên payîdar nadin. Herwiha jibo annancê perwerdeya bîrdoziyî, weke ku mehteçiyeke (bêavî) mezin ji navê rake, heta ku bivê were xû- nifandin, bi taybetî pêwîst e bikin ku kadroya navendî bi kûrayî bi- xûnifîne. Mebesta baş, diristî, wêrekî û fedekarî, bi serê xwe ne bes in û bîrûbaweriyeke mezin weke veguherîna civakê, di mîsyonên ku rewişt û kesayetiyê dixwazin de, serkeftinê pêknayîne. Ev me- ziyetên hêja, encex bi şêweyên bîrdoziyî yên hêzdar û tekûz, yên bikaribin bigihin encamên serkeftî ku maf dikin.

Bemame û pratîk, pirsgirêkên bêhtir bi şewat pêşkêş dikin. Bernameya PKK ya dema damezrandinê, weke kopîkirineke cîhanê ya nîvekî hate çêkirin. Em nikarin bibêjin ku, vê bemameyê bi polîtîkayeke ku bête sepandin, bi dîrokeke berbiçav û taybetiyên serde-

mê, bi rojaneyî re, girêdaneke afirîner û nêzîkî rastiyê bi mafdarî aniye cîh. Diyar e ku maye di asta gelemperîkirin û ne berbiçaviyê de. Êdî cîhana 1970an bi awayek zêde hatiye guhertin. Sosyalîzma reel jevketiye. Têgihîna şaristaniya demokratîk serdestî qezenc ki- riye. Ku ev guherînên dîrokî li ber çavan neyên girtin, gengaz nabe ku bemameyeke siyasî were xêzkirin. Heger bibe jî, ji xeyalên ku nava wan vala û wêdetir naçe. Bemameya dema nû, li qasî xwerex- nekirinên a kevin, pêwîst e şêwegirtina bîrdoziyî bingeh bigire.

Hê girîngtir, pêwîst e giraniyê bide diyarkirina annancên berbi- çav ku werin sepandin û pêkanîn. Ji ber vê yekê heger ku Kurdistan weke welatekî diyar dike jî, sînorên wê yên siyasî di pêşiya yekîti- yê de ne weke astengiyê, weke pireke derbasbûyinê binirxîne û her perçe bi welatê ku lê re, di bingeha yekîtiya demokratîk de, pêwîst e gera li tevayiyê weke çetirgirtineke stratejîk were daxuyandin. Ye- kîtiya demokratîk a bi her welatî re, pêwîst e weke rêya yekîtiya di navbera welatan a herî sexlem, bi dostîtî û bi biratî were dîtin. Kur- distaneke cuda ku di nava xwe de hatibe îzolekirîn, li qasî ku ji ali- yê bîrdoziyî ve ne raste, ji aliyê pratîk ve jî ne rastîbîn (realîst) e.

Pêşveçûn û rewşa heyî dide nîşandan ku, him ji aliyê bîrdoziyî û him jî ji aliyê pratîk ve, Kurdistan bi rêya yekîtiyên demokratîk ê tevkariyên mezin li demokratîkbûna Rojhilata Navîn bike. Herwi- ha dirûşmeya bingehîn, dikare bi vî rengî were fonnulekirin: *“Ye- kîtiya demokratîk a bi welatên cîran re, Rojhilata Navîn a demok- ratîk e. Rojhilata Navîn a demokratîk, yekîtiya Kurdistan a demok- ratîk e. ”* Divê ku bi her welatî re, jibo pêşvebirina yekîtiya demok- ratîk, giranî were dayîn. Bi sedsalane cudaxwaziya ku xwîn liser tê rijandin, weke ku di mînaka Ewropa de jî tê dîtin, di dawî de tîne yekîtiyeke federal a bi dilê xwe. Heger ku veqetînên nû pêkwerin jî, di pey re dîsa têgihînên cur bi cur ên yekîtiyê têne rojevê. Êdî ji ber gelek sedeman, rastbîniya Kurdistan di wê rewşê de ye ku hel- wista yekîtiya demokratîk çêtir bigire. Sûd û erêniya ku yekîtiyeke demokratîk a bisînor ê bîne, yê ji Kurdistaneke îzolekirî gelekî bêh- tir nirxekî raser bigire. Yê li herêmê û ojhilata Navîn di qadên si- yasî, stratejîk aborî, dîplomatîk û çandî de rola katalîzora demokra- tîkbûn û dostîtiyê bilîze.

Mijareke din a girîng ev e ku, bemame civaka demokratîk bin- geh digire. Di nêzîkbûna li dewlet û civaka kevin de, ji dêvla ku bi levdan be û bi çareseriya bi zorê be, pêdivî ye ku altematîfan çêbi- ke, teorî û pratîka qada sêyemîn bingeh bigire û çareseriyê bîne.

Di qada aborî û civakê de, pêwîst e diyarkeriyên ku di beşên têkildar de hatine nîşandan, li ber çavan werin girtin. Azadiya îfadeya çandî û perwerdeya Kurdî, pêwîst e weke mijareke bin- geh cîh bibîne. Çapemenî-weşan-huner ên bi zimanê zikmakî, daxwazên jêneger in.

Pêwîst e ku bingeha piştgiriya demokratîk a di navbera perçeyan de, bête danîn û bi hemû welatên cîran re, di nava giyanekî demok- ratîk de, nêzîkayiyên dostane bingeh bên girtin.

Pêwîst e bi awayek şematîk û burokratîk nêzîkî li mijara rêxis- tinbûnê neyê kirin. Pêwîst e li gor hewceyî û erkê polîtîkaya rê- xistinbûnê bingeh were girtin. Têgihîna rêxistinbûna mastereyî, bingeha burokrasiyê ye. Ev bi mîsogerî bennayiyeke civaka çina klasîk û dewletê ye. Pêwîst e ji sepandin û têgihîna rêxistinbûnên gelemper ên ku ne fonksiyonî û rol, dem û wergiriya wan ne di- yar dûr bimînin. Têgihîna ‘çiqas rol û erk, ewqasî rêxistin’, yê bêhtir pêşve bibe. Têgihîna rêxistina burokratîk a gelemper, têgi- hîna piranîparêziya rexistinê û berhemdariya wê radiwestîne. Pê- wîst e têgihîneke demokratîk a piranîparêziyê, derbasdar bête gir- tin. Di vî derbarî de mijareke din a girîng, peywira ku jibo van rê- xistinan, kadro û rêveberên tekûz bigihîne ye. Polîtîkaya kadro- yên ku bi hîmê rêveberiya hemdem ve girêdayî, ferz e. Berevajî vê, ev yê rê li ber nexweşiya karbidestî vekin û yê nexweşiya bu- rokratîk bêhtir berfireh bikin. Nexweşiya desthilatparêzî, nexwe- şiyeke civaka biçîne û pêwîst e were derbaskirin. Rêveberiyên rê- xistinê ne li gor desthilatiyê, li gor behre û serkeftinê tê diyarki- rin. Li qasî hewceyiyan kadro pê têne dayin.

Di vê qadê de nexweşiya herî girîng, tegihîna çepgir a klasîk e ku, rêxistinbûnên civaka şarwer weke karê împeryalîzmê dibîne, xwe sosyalîstê pîroz û kadroya şoreşger dibîne, ji vê pêde ti xebatên din na ecibîne. Pêwîst e ji vê bîrûbaweriya ku îflas kirî û dema dora wî tê xwe difiroşe kapîtalîzmê, bête rizgarkirin. Divê dorhêl pêşkêşî van tîpan neyê kirin. Pîvana keda sosyalîst a herî hêja, xebata wê ya civaka demokratîk

a pêşvebirî ye, birêxistinkirin û pratîka wê ye. Xebitandina di nava rêxistinbûneke ku herkesî xwe, derdorên xwe pêşve bibe û berhemdar bike, pêwîst e weke peywera derûnî ya rê- veberiya rêxistinê were fêmkirin. Ji rêxistinbûneke aborî ya hêsan heta bi rêxistinbûneke bîrdoziyî ya herî raser, pêwîst e weke rewiş- teke rêxistinê ku wateyeke mezin îfade dike, were pejirandin.

Divê were zanîn ku, dema xêzika livbaziyê ji nû ve were diyar- kirin, heta ku xwerexnekirina di derbarê dema borî de bi sexlemî neyê kirin û dersên pêdivî jê neyên deranîn, pêsveçûn çênabin.

Têgihîna şerê rizgariya neteweyî yê salên 1970an, dikarîbû jibo wê demê wateyekê îfade bike. Dema ku sosyalîzma reel û netewe- perestî serdestbûn, heger ev rêbaz ne hatibûna parastin, ev yek bi xiyanetê re di heman wateyê de bû. Ev rêbaza ku PKKê serî lêda, digel ku ji nava xwe çetebûnî derand û vala derxist jî, roleke bi erênî leyîstiye. Heger ku meyldariya çete serdest nebûbana, derfe- tên serkeftinê yê hê bêhtir zêde bûbana. Lêbelê ji mînakên wê yê serkeftî jî diyar e ku, bi temamî ne dibire civakeke demokratîk an jî sosyalîst. Eslê wê têgihîna şideta ku pêwîst bû PKK ji serî de bi- pejirîne, divabû derbasî derî têgihîna parastina rewa nebûbana. Di- vê em weke xwerexnekirineke jidil bibînin ku, digel di derûna wê de ev hebû jî, me ev bi rastî fonnule nekir. Heger bibal lê bête nê- rîn, derketina çiyê, destavêtina çekê, li hember axa û faşîstan xwe- parastin, tev dikevine nava parastina derûn an jî têgihîna parastina rewa. Jiberku ev mafên xwe wergerandina şêweyeke serhildan û hêrîşê, di dawî de rola çeka ku xwe pê bikûje lîst. Di dawî de jî wi- sa bû. Nirxandinên bi xwerexnekirineke berfireh yê vê yekê nîşan bide: Heger ku PKKê hemû hêzên xwe yên livbaziyê, li gor erdnî- gariya bikêrhatî, lojîstîk û mercên girseyê nirxandibana, Bi taybetî di serê sala 1990an de, dewletê jî rastiya gelê Kurd pejirandibana û digel ku ne bi ewleyî jî didît, heger ku jibo şensekî bide, xwe xisti- bana derawayeke agirbestê, ev rastiyeke ku yê derfetên çareseriyê

herî bêhtir çêbûbana. Di dema xwe de, ne dîditina pêdiviya lihevkirinê, belkî jibo şoreşgeriyeke dijwar rûmet be, lêbelê dema ku bi rastiyan re bête hevberkirin, diyar dibe ku sexbêriyeke vala û ber xwe jî nabîne ye. Divê em bibînin ku ev çewtîtî timî têne kirin. Tê dîtin ku di têkiliyên bi neteweperestên hoveber û neteweperestên burjûva, bi karbidestên dewletê yên Ewropa û Rojhilata Navîn re, heman çewtîtî hatine kirin. Pêwîst bû ku bi helwesta nefspiçûktî rastî hatiba dîtin û hunera lihevhatinê hatiba sepandin. Divê xweş bête zanîn ku pêwîst e ev bi teslîmtiyê re neyê tevlîhevkirin.Tîpên Kurd yan jî tîpên ku bi gelemperî xwe şoreşger dibînin, xwe ji he- rênaya an heta bi dawiyê berxwedan an jî ji teslîmtiyê rizgar nakin. Heçku pêwîst bû bibînin ku jiyan ne tenê ji reş û sipî hatiye holê û rengê ku bivin bi dilê xwe hilbijêrin. Ev behre nehat nîşandan. Ke- sayetiya bi sedsalên dogmatîk, fersend neda dîtina pirengiya jiya- nê. Merhaleya fîlmê reş û spî derbasnekir.

Lêbelê çewtiya bingeh a pratîka PKKê ya di xêzika livbazî û şer de, liqasî ku xêzika parastina rewa bi kûrayî teorîk nekiriye, sepan- dinên vê yên pratîk jî bi bêberpirsiyariyeke mezin, bi dest têgihîna çetebûn û bêwijdaniya wê ve berdaye. Heger mijarên ku Şehîd Egîd anîbûn zimên û bal kişandibû ser wan cidî bihatana girtin, di- karîbûn fersendê nedin têgihîna çetebûnê û yên bikarîbana pêşî li bêesilbûna şerê ku ne dişiba ti têgihînan, bigirin. Lêbelê dema ku berpirsiyarî nedanîn ser milên xwe, pêvajoya bigabûs ku tê zanîn û qet nehatibû maf kirin, çiqas ku xwe ferz dike encamê digire û çiqas ku encam digirt jî, hê bêhtir xwe ferz dikir. Ev lêferzkirin anîn xaleke wisa ku, kûştina rêhevalên gelek hêja jî, anîne rewşa têgihîna serokatiyê. Eslê wê lîstika xiyaneta tebeqeya raser a hezar salan dihat sepandin. Êdî rêyeke din ku xwe bi xwe bikûje, ji vê rêyê xetertir tinebû. Ev têgihîna ku ajoyên xwe yên hoveber bi xwekûştin û kûştinê çareser dikir, dera ku lê be, azadî û bendewa- riya serfkeftinê li dera han, diyar e ku mirovatî bi xwe jî rêyeke derbasdar nabîne. Dibe ku di nava wan de provekator hebûn. Lê- belê diyar e ku ev yek ji kesayetiya nîv feodaliya burjûvayên pi- çûk, ji debengiya gundîtiyê û ji ne berpirsiyariya rêveberiya fer- mandarî ku ev kontrol nedikirin, dihat.

Vê rewşê, derfetên serkeftina ku dewletê û hemû têkildarên cî- hanê

dipejirandin, bi carekê ruxandin. Di asta navan de, mijara bê kî yê were berpirsiyarkirin, wateya xwe ya pratîk winda kiriye. Lê- belê dersên ku pêwîst e jê werin girtin, qet jibîmabin û di wesfê ku dilan bi şewitînin de ne. Ev ders di asta trajediyeke wisa de ye ku deqîqeyekê jî neyên jibîrkirin. Heger pêşî li vê belayê bihata girtin û agirbesta ku serok komar Ozal rê jê re vekirî, bi serkeftin bihata- na sepandin, diba ku neketiba vê pêvajoya bêş û belkî jî pêvajoya lihevkirinê destpê bikira. Lêbelê azweriya takekesî û berjewendi- yên ku aboriya rant geşkir, serdest hatin. Fersenda parastina rewa, di vê rewşê de dîsa ne hate nirxandin. Şideta heta bi dawî, di herdu aliyan de jî giha asta herî biêş. Nonnên şer jî wateya xwe winda ki- ribûn. Fersendeke herî hêsan jî, bi mirinê bi encam dikirin.

Min weke serokatiyê, bi vê pêvajoyê re, jiberku liser lingan bi- mînim ji xebateke bi şêtî pêde, tê rêyên din ne didîtin. Digel ku hewldanên nonnalkirina pêvajoya 28ê Sibatê deng dabû jî, dereng mabû. Gelek hêzên der û hundir, berjewendiyên xwe bi dorhêla şi- deta kor ve girêdabûn. Digel ku jê hêvî dihatin kirin jî, di nava PKKê de behreyeke ku di pratîkê de vê pêvajoyê derbasbike, der- nediket holê. Bi taybetî, kom bi kom qîz û lawên ciwan ku dişand- in tinekirinê û terkî mirinê dikirin, weke sexbêriyeke herî neyê bex- şandin xwe ferz dikir. Digel vê yekê hesab ji wan nedihat xwestin û pêşî lê nedihat girtin. Di wateya parastina rewa de, lihevhatineke ku yê bi windakirinên gelekî hindik biketana nav, hê di serî de ha- tibû sabotekirin. Sedema bingeh a di hundir de ku dawiya serokati- yê anîbû, ev bû. Derketina çiyê, jibo min xewnekî çil salan bû. Lê- belê ev jî mirina bi hezaran ciwanan ku qet ne mafê me bû. Ev maf min ji aliyê sincî ve bi xwe re nedidît û xewna xwe ya dîrokî pêk- nedianî. Çetetiyê, hê ji mêj ve di vê rêyê de, pêşya min qut kiribû. Bi durûtî bi min dikeniyan. Bi min didan hiskirin ku tolê hildidin. Şemdîn ev yek li dadgehê vekirî û veşartî ravekir. Yekî din hevalê min ê zarokatî dikûşt, yê din digo ***"Em serokatiyê bi nazikî dikûjin",*** yê din jî xortên mîna çiya didan ber guleyan.

Çiqas ku kitekitiya vê pratîkê ji aliyê herkesî ve were çêkirin, yê ewqasî rastî werin dîtin. Jiberku hemû binyata rêxistinê tevlî vî sûcî bûye, ji berpirsiyariyê rizgar nabe û ya herî hêsan xwerexnekirine- ke

jidil pêwîst dike.

Bêguman di van jirêderketinên di vî alî de, para bîrûbaweriya rêveberên dewletê yên dema 1993-1996an, diyarker e. Mirina Fennandarê giştî Eşref Bedlîs û Ozal a ku hê jî biguman û Hîzbû- laha ku xistin dewrê, bi kûrayî bihatana dahûrandin, dikarîbûn pêşgiriyan pêkbînin. Serokwezîra demê ku gotibû “Lîste di berî- ka min de ye, ya pêdivî yê were kirin”, girtina parlamenterên DE- Pê, valakirina çar hezar gundan, kuştina bi hezaran demokratên li mala xwe ku haya wan ji rêxistinê nebû, ambargoyên aborî û ope- rasyonên li çannedor nîşan didan ku di asta dewletê de jî, her tişt ji rê derketiye. Demeke dîrokê ya herî stemkar û tarî, bi vê şêwe- yê dihat meşandin. Operasyonên Susurluk û Hizbûlahê yên piştî sala 1996an, gelekî serveyî mane. Beşên ku sûcên hiqûqî yên gi- ran kirine, heta ku demexin holê û nedarizînin, ne gengaz e ku dewlet xwe paqij bike. Pêwîst e ku ev dem, bi berfirehî di dari- zandinê re were derbaskirin. Rojava ya ku jibo Miloseviç hestyarî nîşan da, heta ku jibo karbidestên Tirkiyê jî vê yekê nîşan nede, ji helwesta durûtî û hevpariya sûc rizgar nabe.

Di qada dewletê de, pêvajoya 28ê Sibatê, ji aliyê rawestandina vê şêtîtiyê ve heger bisînor be jî, erêniyek pêşkêş dikir. Agahdari- yên ku ne rasterast dihatin, rasteqîn û di asta berpirsiyariyê de bûn. Digel ku ewlekariyeke wê ya zêde nebû jî, ji aliyê ku dawiyê li vê şêtîtiyê bîne, ezmûna agirbesta yekalî, pêşgiriyeke rast bû. Lêbelê pêwîst bû ku ev bi pêngavên berember ên afirîner werin destekirin. Di vê de jî serkeftin ne bi têrayî bû. Komploya 15ê Sibatê ku kirin dewrê, rewş bi tevayî guherand. Êdî jênerev bû ku, sedemên komp- loyê ên der û hundir ku rasterast an ji ne rasterast, ji kûderê û çawa pêşveçûbûn û annanc û encamên wê deynin holê û li gor vê yekê ji nû ve herin birêkûpekirinekê. Pêvajoya Îmralî di vê rewşê de bû ku, van rastiyan ango komployê ji hemû aliyan ve derîne holê û bêban- dorkirina wan annanc bigire. Tolgiriyeke bêber û livbaziyeke xwe- kujî, helwesteke ku hêviya komplovanan bû û ev yek yê ne rast ba- na. Lêbelê jibo vê yekê helwesta dewletê yê diyarker bûbana. Pê- vajoya ku tê zanîn her çiqas bi ne diyarî jî derbasdibe û her çiqas nizanin bê encam yê çawa bibe jî, ez di wê baweriyê de me ku xa- la em gihîştinê rast e. Beşek ji ya PKKê û gel a

herî serdest, hel- westa ku serokatî ketî nav destek kirine. Vê helwestê kûştin rawes- tandin, rê li ber bidawîkirina têgihîna livbaziyên kuştinên li çiyê vekir, jibo gavavêtina dewleteke hiqûq fersend afirand, heger ku bi- sînor be jî jibo çalakiyên demokratîk dorhêl pêkanî. Herwiha pê- wîst e ku piçûk neyê dîtin.

Heger bi hindikayî be jî, yên ku liser pişta gel û PKKê xwe xweyî kirin, yên ku pişta xwe dane Ewropa û neteweperestiya burjûva hoveber, yên ku annanca wan tenê ji ajoyên xwe yên ta- kekesî re dorhêleke şêt vekin, li hember vê helwestê helwest nî- şan dane û hinek rev bipilan kirine û meşandine, bi taybetî di bin parastina Abnanya de û jibo annancên wê yên dîrokî, li Tirkiyê jî di nava Kurdan de weke baskekî siyasetê kirine ku birêxistin bi- kin. Hewl didin ku gelek kesayetî û komên bi vî rengî, weke ko- mên provakasyonê û partî birêxistin bikin. Têkiliyên jiyana rihet û gelek dirav, ji ber desteka medya û saloxgeriyê (îstîxbarat), pê- wîst e ev xeterî piçûk neyê dîtin. Parçeyek ji yê komployê girîng jî ev e ku, gelek dewlet hewl didin ku PKKyên xwe yên sexte û bi vî rengî bafirînin û têxin dewrê.

Heger ji mijarê derketibe jî, ev rewşên ku di pêş de hê bêhtir yê werin ravekirin, ferz dikirin ku di xêzika PKKê ya bîrdoziyî, ber- name, rêxistin û livbaziyê de, veguherînên binyatî werin çêkirin û bi lezgînkirin. Di nava hewldanên veguherînên piralî de, bêguman ya herî girîng, vekişandina PKKê ya xêzika parastina rewa ku bi kûrayî pêkbîne, sazûmana xwe ya parastina derûn bide rûniştandin û veguherînên din jî bi kurayî pêkbîne.

Liser banga serokatiyê PKKê, paşvekişîn û ketina sexbêriya pa- rastina rewa ya 2 Rêzber 1999an, pêwîst e ne weke guherîneke tak- tîk a ketûber were dîtin. Vateya wê ya stratejîk heye û pêwîstiyeke veguherîna bîrdoziyî, bemameyî û taktîk e. Weke çepên tirk, beşên

xayîn ên revok û komên Kurd ên neteweperestên hoveber ku angaşt dikin, ev ne teslîmbûneke û ne jî helwesta lihevkirineke bi Serpe- riştiya Giştî ya Leşkerî re ye. Weke gelek caran min bi lêv kiriye heger ku peymanek çêbûbana, min ê îlankirina vê weke berpirsiya- riyeke dîrokî bidîta û bi serbilindayî bikira. Divê ku ti kes, hêviyên xwe bi van angaştên erênî an jî neyînî ve girênede. Nêzîkbûneke bi vî rengî yê bibe encamên xeter. Lêbelê ji sala 1998an ve hê dema ku ez li Rojhilata Navîn, rewşa agirbesta ku me dixwest hêjî pêşve biçe û pêwîst e ku artêşa tirk jî bi têgihînî nêzîk bibe, ji devê me ne- ket û em gelekî liser rawestiyan. Êdî ew dizanin bê yê ciqasî pêdi- viyê vê yekê bicîh bînin. Jiberku bûye mijara spekulasyonên sift, min pêdivî dît ku raveyeke bi vî rengî bikim.

Sazûmana parastina rewa ya nû, yê herêma Botan, Behdînan û herdu aliyê Zaxrosan wergire û ku ne ji mecbûrî be ber bi aliyên din ve berfireh nabe, li vê qadê hemû cureyên parastina derûnî yê we- rin birêkûpêkirin û yê têgihîna yekîtî û livbaziya xwe bi pilankirin û xebateke kûr di vê çarçovê de rûnîne. Ev birêkûpêkirin, girêdana bi annanca ***“aştî û çareseriya demokratîk*** ” vc, bingeh digire. Ji çar dewletên ku li herêmê serdest, ango ji Tirkiyê.Iran. îraq û Suriyeyê jî, liser navê çareseriya demokratîk, bingehgirtina guftûgo û pêşve- birina wan, hevdîtinên heyî di asteke bihêman de ku çareseriyê ar- manc bigirin û berfireh bikin, daxwaz dike. Emê vekirina berfireh a vê helwesta stratejîk bihêlin pişt re û evqasî terîf bikin, ev yek ji- bo xêzika bîrdoziyî, ji aliyê bemameya nû û ji aliyê xebatên rêxis- tinê ve girîng in. Ji aliyê din ve jibo ku xebatbariyeke pratîk bi pê- vajoya xwerexnekirinê were dayin, ev birekûpêkirina stratejîk xwedî wateyeke dîrokî ye. Jiberku ev birêkûpêkirin di warê vegu- herînê de, pêwîst dike ku PKK çiqasî bi sexbêrî, rast û serkeftî be datîne holê, girîngiyeke jiyanî digire.

Dîsa ev birêkûpêkirina nû, jibo hemû dewletên cîran, di warê ça- reseriya pirsgirêka Kurd de, bêyî ku dest bavêjin sînoran, dorhêla herî bikêrhatî pêşkêşî wan dike bê di pîvan û giyanê yekîtiya de- mokratîk de, çiqasî bi mebesta baş in û herwiha vê biçespînin. Fer- senda pêdivî dide ku, ne tirkiye bi tenê, her çar dewlet jî dest nedin sînorên xwe, yekîtî û tevayiya dewletên xwe xera nekin, di binge- ha yekîtiyeke bi dilê xwe

de, vê hê bihêztir bikin, xwestek û mebes- ta wan ya ku ka çiqasî dixwazin pirsgirêka Kurd çareser bikin. Her- wiha sazûmana parastina nû, hemû xeleqên xeniqandinê ku dihatin sepandin şikandin, ji dêvla ku kurdan tine bikin, pirên biratî û dos- tîtiyê damezrandin û şensê pêkanîna aştiyeke herî birûmet dan ku hemû alî bi vê yekê qezenc bikin. Weke sexbêriyeke herî berpirsi- yar ku ji bo çareseriyeke biratî, bang dike hemû kurd, ereb, ecem û tirkan, li benda nirxandinekê ye. Ewlekariyê dide ku bi aliyên nê- zîkî çareseriyê bibin re peymana çekberdanê çêbike û biyekalî çe- kan bikameyîne. Herwiha, hewl dide ku li Rojhilata Navîn, fersen- dê nede pêvajoyên din biêş û bêwate yên bi şêweya şerê Ereb û îsrael, di vî warî de berpirsiyariya xwe ya raser nîşan dide.

Ji ber van hemû sedeman, ji dilê safî bendewar e ku, dewletên cî- ran vê sazûmana parastina rewa weke gefekê nebînin, vê sazûmanê jibo çareseriya vê pirsgirêka biêş û dîrokî, weke birêkûpêkirineke herî çê binirxînin.

Heta ku aştî û çareseriya demokratîk ji aliyê dewletên têkildar ve were pejirandin, bi berpirsiyariyeke gelek mezin û ji bo bigihine hêzeke ku cidî were girtin, pêwîst e tevkariya bi hemû rengî, per- werdeyî, xwerexnekirin, lojîstîk, sengergirtinên sererd û binerd û jibo yekîneyên herî çê û livbaziyên parastina derûn, plankirin û se- pandin bi fedekariyeke mezin werin meşandin.

Sazûmana parastina rewa, li qasî ku aştî û çareseriya demokratîk derîne holê, hêzeke wesifdar pêwîst dike. Ti aştî û çareseriya de- mokratîk, heta ku hêz û gelên mezin li pey nebin, nagihe serkeftinê, cidî jî nayê girtin. Aştiyeke rastî û çareserî, encex bi hêzeke ku vê pêkbîne, bi disiplîn û xwedî rêveberî be yê gengaz bibe. Jibo bigi- hin vê rewşê, xebatên qadê, birêkûpêkirina yekîneyan, sengergirtin, li hember dibêtiya hêrîşan planên livbazî yên herî çalak û encam- gir, lojîstîk û her cureyê xebatên veşartî, birêkûpêkirina fennanda- riyeke rast û biterayî, jibo pêkanîna van xebatan perwerdeyiyeke hêzdar, dorhêla jiyaneke ku di navbera rêhevalan de hezkirin û rêz- girtin hebe, jibo afirandina jiyana azad û pêkanîna aştiyê seferberi- yeke ku afirîneriyê di kesayetiyan de çêbike, ev peywirên herî gi- rîng in ku jibo xwerexnekirineke jidil bi serkeftin werine cîh. En- cex serkeftina van peywiran, takekes li hember

neyîniyên ku dijî, sûc û xeteyên wî bigihîne asteke bexşandinê. Li derî vê yekê, divê bête zanîn ku, ji ti kesî re rewşa bexşandinê çênabe, ji dewletê he- ta bi wijdanê mirovan yê hisab were xwestin, bi girêdana bi nirxên mezin û liser bîranîna wan, bicîhanîna pêdiviyan şensê herî dawî ye û pêwîst e maf pê were dayîn.

Ez vê mijara ku pêdivî bû bêhtir were vekirin, bi vî rengî bi tê- rayî dibînim. Weke rawestîna PKKê ya çalakiya bingehîn, li derî parastina rewa, mijareke din a nûjenî û veguherînê, şêwegirtina bîr- doziyî û ji aliyê serkeftina bemameya wê ve, mijara ku di dorhêla zagoniya her welatê têkildar de, xebateke bi çi rengî yê were me- şandin e. Pêwîst e ev mijar ne bi şêweyeke nêzîkbûna taktîkî ya teng, bi veguherîneke bingehîn û weke mijareke diyarkirina xêzika stratejîk li ber çavan were girtin û jibo ku jiyanê bibîne, pêwîst e çi hewldanên ji destê mirov werin bi hostayî û bi şêweyeke afirîner bête nîşandan.

Di dema nû de, li çar welatên ku PKK xwedî bandoreke berfireh e, li gor bemameya xebata xwe ya nû, di çarçova zagonî û demok- ratîk de hereket bike, ya rastir çalakiyên xwe di bin şêweyên zagonî û demokratîk de çêbike û bide meşandin, bi hindikayî li qasî mijara parastina rewa girîng e. Ji aliyê serkeftina derawaya parastina rewa ve, jibo veguherîna van welatan ku bibin dewletên hiqûq ên demok- ratîk, pêwîst e ku hewldanên pêdivî bi awayek serkeftî bînin cîh. Pê- wîst e ku li gor diroka berbiçav a van welatan û derawaya wan a ci- vakî, çandî, siyasî û zagonî, tevkariyê li rêxistinbûn û çalakiyan bi- kin, destek bikin û van mijaran weke xebateke bingehîn binirxînin. Di beşa piştî vê de ezê liser her welatekî rawestim, bi xêzikên sere- ke em vê mijarê biqedînin. Ev dibêtiyeke lawaz e ku PKK bi navê xwe û bemameya xwe ya resene, li van welatan xebatên xwe yên za- gonî bide meşandin. Dibe ku jibo Iraqê ev gengaz be. PKK bi navê xwe, li derve encex weke navendeke teng hebûna xwe bidomîne. Jixwe bi navê PKK ya başûr xebatek hebû. Jibo vir jî merc diyarker in. Lêbelê li hemû welatên din û li Ewropa, merc ferz dikin ku li şû- na PKKê an rêxistinên nû werin damezrandin, an jî yên ku li gor xwe bibînin destek bikin. Pêwîst e ev rêxistinbûn ne weke PKK ya ku qalik guhertî an jî weke saziyên dora wê werin dîtin. Pêwîst e ev weke partiyên ku serbixwe, zagonî, xwedî bemame, xwedî rêxistin

û xwedî sîstemên xebatê û weke saziyên civaka şarwer werin dîtin. PKK divê ku girseya xwe û sempatîzanên xwe jî, jibo xebatên di na- va van rêxistinan de, teşvîk bike. Bikaranîna weke şêweya ku qalik guhertî an jî weke saziya dora wê, yê dorhêleke ji provakasyonan re vekirî bihêle û li şûne feydê yê zirarê bide çareseriyên demokratîk. Bi vê sexbêriya sereke ve girêdayî, pêwîst e ku hemû partî û saziyên civaka şarwer ên ku xwedî annancên demokratîk, werin destek ki- rin. Jibo ku angaştên weke "ji PKKê fennan digirin", neyên çespan- din, pêwîst e nekevin nava sexbêriyên çewt û yên ku vê helwestê nî- şan bidin jî, hişyar bikin. Di vî babetî de bi nîqaşên berfireh, girêda- na van a bi planeke xebatê ya kitekit ve û meşandina wê, him jibo xwerexnekirinê û him jî jibo ku veguherîn di pratîkê de wateyekê îfade bike, pêwîst e weke rê û rêbazeke herî rast were dîtin. Jibo Ew- ropa xebateke bi vî rengî ya herî bikêrhatî, rêxistinbûn û şêweya liv- baziyê jî, girîngiyeke mezin digire.

Dema ku giyana rêhevaltiya dema nû, veguherîna kesayetî û sin- cê jiyanê şêwe bigire û cudahiya xwe deyne holê, yê biryar were dayin ku xwerexnekirin jidil tê kirin û pêdiviyên wê di pratîkê de têne bikaranîn. Herwiha xêzka bîrdoziyî û pratîk a ku heta niha me hewl dida ku em çarçova wê diyar bikin, encex di kesayetiya rêhe- valan de, di cîhana giyan û bîrûbaweriya wan de, di nîşandana wan a bi jiyana hevpar û sincê viyana azad de, bi girêdana wan a bi nir- xên bilind re, di sexbêriya wan a hezkirin û rêzgirtinê de, wateyê bibîne yê ji serkeftina wê were behskirin.

Weke perçeyên dawî yên mijarên veguherîna bingehîn, pêwîst e huner, spor, teknîk û tenduristî jî, neyên xemsarkirin. Dema ku per- werdeyên laş, hiş û giyan bi hev re werin meşandin, yê ya îdeal we- re girtin.

Di xebatên perwerdeyê de, pêwîst e sazûmana akademî were

pêşvebirin. Mijarên di serî de huner, ziman, dîrok, felsefe, xwedanasî, azadiya jinê û çapamenî-weşan, pêwîst e ku akademî, bi şêwe- ya ku hêzê bidine bingeha bemameyê û bîrdoziya dema nû, ji nû ve were birêkûpêkirin. Dîsa pêwîst e ku perspektîfa veguherîna akade- mîk nêzîkayî li perwerdeya leşkerî û polîtîka bingeh were kirin.

Di warê dîplomasî û entemasyonalîzmê de, bi rastiyên cîhanê ku li ber çavan werin girtin, afirandina kadro û girtina şêwaz, girîngi- ya xwe diparêze.

Weke mijareke bingeh, jibo perwerdeya gel a di qada demokra- tîk û çandî de, ev mijareke girîng e ku, saziyên çapemenî û weşanê yên henin, li gor xêzikê ji nû ve werin birêkûpêkirin û bînin asta ku bersiva hewceyiyan bidin. Esasê wê gel, siyaseta demokratîk ji van saziyan hîn dibe. Dîsa jibo hewceyiya wan a huner, nûçe û şîrova- yan ku kêm, ev sazî alîkarin. Herwiha divê ku kadroyên bi têrayî û kontrola wan a di asta bilind de, werin pêkanîn.

Mijareke dawî ku ez dixwazim bînim zimên jî ev e ku, pêdiviye çi li derî me û çi di nav me de, heta ku jiyana me nekin xeteriyê, em bi hezkirin û xweşbînî nêzîkî xwediyê her nêrîn û sexbêriyê bibin, cudahiyan weke çavkaniya dewlemendî û veguherînê bibînin, em ne bi nêzîkayiyên tepisandin û bi tevgerên karbidestî, têgihîneke jiyan û rêveberiya ku dorhêleke derketina azad belên bike, nîşan bidin. Pêwîst e ku rawestîna bi neyartî jî ne bi tinekirinê, li derî parastina rewa û mecbûrî, bi veguherînin dostîtiyê ji holê rakin, pêwîst e hûn vê hêz û behreyê nîşan bidin. Lêbelê divê hûn fersendê nedine yên ku bi xayîntî, bêmafî hewl dide ji pişt ve li we bixe. Çiqas ku israr bikin,. bersiva ku maf dikin bi teqezî divê were dan. Ji sexbêrî, ta- kekes, helwest û çavkaniyên ku ne edilin, timî nebaşî, berhevdanî, zordestiyê bikin û dijminatiyê hilberînin re, azadî nabe. Heger ku bi- be, yê xayîntî li azadiyê were kirin. Divê em ji bîr nekin ku neyarti- yên herî har jî, çiqas ku wate dibînin ji navê tên rakirin. Lêbelê der- baskirina kesên ku karê wan timî hilweşane, kûştinên daringî û me- newî ne û yên ku vî karî dikine zewq, weke peywireke mirovatiyê bibînin, pêdiviyeke jênerev a mafê jiyana azad a civak û mirov e.

Dema ku ber bi 8. kongreya PKKê ya asayî ve diçe, di nava çar-

çoveke parêznameyê de be jî, min hewl da ku ji ber girîngiya dî- rokî, di derbarê van mijarên sereke de tevkariyên xwe bikim. Hûn dikarin nêrîn û pêşniyarên min, heta bi dawî nîqaş û rexne bikin. Heta bi rexneyên ku altematîfên wan ên serkeftî hebin, yên di cîh de û encamgir, min xemgîn nakin yê bêhtir min xweşhal bikin. Min timî pêşdatirî da her helwest û pêyvên ku perwerdekar bin. Heger ku ez bibêjim min xwe ferz kir û xwest ku xwe bidim jiyandin, ezê neweyiyên herî mezin li xwe bikim. Pêwîst bû jibo ciwan, zarok, jin û ixtiyaran, demên dirêjtir veqetînim û li gor resenîtiya wan nê- zîkî wan bûbama. Di vî babetî de ez xwe deyndar û şikestî dibînim.

Di nêzîkbûna jinê de min xwest hinekî pêşve herim. Min hewl da du tiştên ku di pêvajoya dîrokê de bûbûn mîna hestî, hilweşînim û taybetmendiyekê derînime holê. Min xwest ez weke sincekî azad derînime holê ku, weke cinsa perçiqandî ya çînçînîbûna herî kevin û bi kûrayî, rastiyên cins û zayenda wan ku hay jê tinene ya ku mî- na qederê dibînin bêyî ku rêzê ji kemna olî û sincan re bigirim li ber çavan raxim, jibo cinsê wan resenîtî û azadiyê qezenc bike xwe paş- ve negirin, berevajî vê zayenda xwe weke senniyan bikameyînin. Lêbelê ev fedekariya me ya mezin, ji aliyê gelek jin û mêran ve, çi li derî me û çi li hundir, xwestin ku li dij me bikarbînin. Ez ji vê na- tirsim. Min tim kêmasiyeke mezin dît ku jina azad û jiyana azad qe- zenc neke û li hember vê min vebizav nîşan da. Lêbelê heta vî teme- nê xwe di vî babetî de têkneçûna min, bi jinên ku angaşta azadiyê ji- dil û hêzdar û nirxandina wan a weke mîrate û daneheveké, jibo min bûne derfeteke mezin. Pêşniyareke belavkerê xiristiyantiyê ***Ez.îz Pa- ûl*** ku dibêje (ez ne weke çêtirgirtina xwe diyar dikim) ***“Weke min cuda, jiyana we ya bê jin zor e, weke hevalên ku ji xebatan re ne zi- rarfeydê bînin, mayina weya li cem hev dikare çêtir be. ”*** ez bawer dikim di vî babetî de ye. Ev tenê bibîrxistinek e. Lêbelê di vê peyva wî re jî xuya dike ku kesekî esîl e. Lêbelê di têkiliyan de, lêferzkiri- nên bi destekarî, hêz û derfetên xwe, bi sincê koletiyê ve yê girêdayî be. Biwêjeke roja me ya moda ku dibêjin ***“çêtirgirtinên zayendî na- yên nîqaşkirin ”,*** her çiqas ku helwesteke nêzîkî azadiyê îfade dike jî, lê aliyê mijarê yên dîrokî, civakî, siyasî, çandî, olî û sincî berfi- reh in û çareseriyeke binyatî pêwîst dike.

Min damezrandina PJAyê bi rêzgirtin pêşwazî kir. Ev dikarin ji- bo tayînkirina qedera xwe pêngaveke dîrokî, jibo nakokiyan derî- nin holê û çareser bikin jî rola amûreke bingeh bilîzin. Lêbelê mi- jarê bi bergeha zanistî, felsefî, olî û mîtolojîk a berfireh, di nava he- mû aliyên dîrokî û rojane de çareser bikin, di vê bingehê de xeteke şêweya bîrdoziyî, bemameyî, rêxistinî û livbazî, xêzik bikin û bip- ratîk bibin, girîngiyeke mezin bi xwe re tîne. Damezrandina akade- miyeke azadî pêdivî ye û di cîh de ye. Xebatên weqfên azad û pra- tîkbûna di her cure rêxistinên civakên şarwer de, yê di pêkanîna nasname û jiyana azad de roleke mezin bilîze. Bi gelemperî di pêk- hatina civaka demokratîk de, rola pêşengî ku dilîzin pêdiviyeke berbiçaviya wan û çespîna veguherîna wan e. Di pêş de ezê bi nê- zîkbûnên di warê felsefeyê û wêjeyê de, tevkariyên xwe bikim. Lê- belê derûn hatiye pêşkêşkirin. Divê ku ez hêvî û daxwazên xwe nî- şan bidim ku, di rêhevaltiyê de, di jiyana azad de, di olê xwedawen- dê û di yên ku rêzgirtina wan ji evînê re heyin de, weke ku di şehî- dên wan ên hêja de jî hatiye çespandin, vê derûnê nemirîtî qezenc kiriye, ji koletiyê ji jina rezîl, ji mêrê serdest tola xwe digire û he- ta serfiraz bibe jî yê bistîne û yê serkeftî bibin.

Ez bawer dikim ku nîqaşên kongreyê û heger ku berî wê bigihî- je we, xebatên konferansê, yê bi van nirxandinan hêzê qezenc bi- kin. Ez dixwazim hêvî û baweriya xwe diyarbikim ku, ji navê we heta bi derûna we, li gor ahengdariya rengên xwezayê, hûnê her mi- jarê bi şêweya herî afirîner nîqaş bikin, hûnê rê li ber biryar û çê- bûnên bi hêjayiyên payîdar vekin.

Weke gotineke dawî, ez di xwazim diyarbikim ku, rûmeta we çi pêdivî bibîne, hûn di wê biryardayinê de azad in. Ev liqasî ku biryara şerekî bêeman be jî, dikare biryara aştiyê be jî. Lêbelê ez bawer dikim ku, hûnê ya herî rast bikin, ya ji mirovatî û gelê me re herî baş pêkbînin, digel bi biryardariya aştiya azad û birûmet, ji kûderê were û bila bi çi hêzê bin, li hember hêzên tinekirinê hû- nê amadekar bin û hûnê xwedî hêzeke wisa bin ku yên hatin şerê we poşman bibin. Ji vir û pêde her tiştî ev gotina we ya “soza me

yê bibe pratîka me” yê diyarker bike. Pêwîst e ez diyar bikim ku, her tişt zorê li we dike ku ev soz bi wate bibe û bikeve pratîkê, weke pêdiviya bibiryarbûna we şert e ku hûn hemû amadekariyên xwe bikin, qet xafil nebin û pêwîst e mirinên ne di cîh de hûn ji qederbûnê derînin.

Ez dixwazim tîkake xwe ji we bikim û vê mijarê bigirim. Hemû hewldanên xwe yên rêxistinî û livbazî, ne li gor mercên dîlîtiya min birêkûpek bikin. Ya derbasdar ew e ku hûn li gor rewşa tenduristî, rûmet û serkeftina xwe bilivin. Ez hêvî dikim ku hûn vê yekê bin- geh bigirin. Komplovanan xwestin ku jiyana min li dij we bikarbî- nin. Derfetên mirineke lehengî ji destê min girtibûn. Ez êxistibûm nava jiyaneke qehrker. Hemû binaletên dîrokê ez li çarsingê da- bûm. Jibo xweşiya we, çiqas herî zor be jî, jiyîna min ya heta îro girîng bû. Li qasî ku gelek rastî derketine holê, ez bawer dikim ku em hatine pozisyona biryara rast û livbaziyê. Hûn ne zarok in, hê- za xwe ya ku yê rastiyê û serkeftinê pêkbîne, tenê jibo xwe û gel bikarbînin. Jibo mirovatiyê jî tiştan bikin. Lêbelê berî her tiştî, ten- duristî, rûmet û serfiraziya we ji we re pêdivî ye. We û gel jibo min gelek fedekarî kirin. Ez bawer dikim ev bi têrayî ye. Ez jî dixwa- zim hinekî ji fikarên xwe dûr kevim û xwe bi xwe bihisînim.

Lêbelê min hay ji vê mijarê jî heye û pêwîst e ez balê bidim: Mantiqê komplo ev bû ku, min nedin jiyandin, heger bidin jiyandin jî, hemû gelê me yê dirist, dostên wan û di serî de we yên heta bi dawî girêdayî tine bikin, yên man jî dabaş bikin û berdin hev, her- wiha bişêweya tinekirina fizîkî û menewî rêxistinê bi dawî bikin. Eslê wê weke ji vê sazûmana rantperest a rûreş ku kete nava qey- ranê jî tê fêmkirin, liser gelê Tirk jî, bêoxireyeke bi vî rengî dihat annanckirin. Hemû hesabên wan, bi şêweya berxwedaneke vala, li- ser bihev şikandina ciwan û gelan bû. Ji binaletên yewnaniyên ku li pey tolhildana dîrokî bigirin, heta bi “em dardckirv’vanên tirk, he- mû hêzên ku dixwestin Tirkiyê bi xwe ve girêbidin, ji vê tevlîhevi- ya ku bi min ve girêdayî, berjewendî hêvî dikirin. Heger min heta bimirinê berxwedan bikirana, lîstika wan yê bi cîh bihata, min bix- westa bijîm, yê bi gotana “teslhn bû”. Herênaya qehrker ev bû. Az- weriya min ku ne bêteşe û aqlê selîm, hê ez di balefirê de parêzna- meya biratiyê derande holê. Ev helwest bêhtir ji min, jibo

we şen- sekî mezin e. Lê belê ez nizanim bê yê çawa bi dawî bibe.

Min gelekî hewl da ku mirina min tenê jibo min bisînor be. Lê- belê mirina min a ji nişkê ve an jî encameke ku li gor wan hatibe eyarkirin, hê jî bi gel re tinekirina we di rojevê de digire. Jibo ku ev wiha nebe, hê jî ezê hewl bidim. Lêbelê dîsa jî weke ku mirineke min a bi vî rengî yê sibe pêkwere, divê hûn amade bin, ev ne jibo we tenê, jibo hemû gelê me yê welatparêz û dostên me jî pêdivî ye. Ji ber vê yekê min di derbarê pakêtkirina xwe de, gotibû ji bombe- kirina Hîroşhna xetertir e. Weke ku sibe roja herî bikaresat be, pê- wîst e hûn hemû û herkes di nava amadekariyan de bin, ev jibo ten- duristî, rûmet û serkeftina we şert e. Dîsa jî ez hêviyên xwe yên aştî, biratî û çareseriya demokratîk ku yê serkeftî bibe diyar dikim, bi baweriya min a ku hûnê vê bi pratîka xwe biçespînin re, ez bi hezkirin û rêzgirtinên rêhevaltiyê we tevan silav dikim û serkefti- nên domdar dixwazim.

## E- Di Pirsgirêka Kurd de Ber bi Çareseriyê

Heger di bûyereke civakî de, pirsgirêkeke ku kokên wê diçin heta beriya sedsalan dijî û di serdema xwe de nagihe çareseriyeke nonnal, di vê de kêmasiya ku di mercên berbiçav ên der û hundir de bibînin, ev yê ne rast be. Mercên berbicav ên her pirsgirêkê hene. Lêbelê ev kartêker di pêşya çareseriyê de, weke astengên bêdawî rol nelîstine. Herçiqas ku mercên berbiçav gihîştî û bikêrhatîbin jî, bi serê xwe ça- reseriyê nayînin. Di mercên herî neyînî de jî, her dem gengaze ku ji anîşkekê ve derfetên çareseriyê bigirin. Neçareseriya ku bi netêrayi- ya mercên ne berbiçav ve bêtin girêdan jî, ne awayek rasteqîn e. Go- tinên di oxira wê de hindik xwîn hat rijandin, an jî asta hişmendiya rêxistinî lawaz e, nabin sedemeke ravekeriyê. Dîsa ku ez her tiştî li çewtîtî û xeteyên taktîk û stratejiyên leşkerî û siyasî bikim bar, dibe ku xapînok be. Ev yê nirxandineke rastir be ku, li sedema neçarese- riyê ya bingehîn, di şêweya nêzîkbûna çareseriyê de, di şêweya ku bê
yê çiqasî sepîner be û rasteqîn be de, bigerin.

Yekîtiya Sovyetan hêzeke weke dêwekî bû. Ji aliyê leşkerî û siyasî ve qet têkneçû. Hêrîşên hêzeke derve, an jî serhildanên hundirîn jî ne-

bûn. Lêbelê jihevket, bi girêdana bi annanca xwe ve têkçû. Sedema wê hêsan e: Asta azadiya takekesê sosyalîst û asta domokratîk a civa- kê, li derî rastîbîniya sosyalîst bûn. Bersivnedayina rastiya mirovê azad, ber bi neçareseriyê biribû. Jibo hilweşanên faşîzmê ya li hem- ber pirsgirêkan jî, dikarin sedemên bi vî rengî bidine pêş. Çareseriya pirsgirêkan hunerek e. Jibo vê yekê nêzîkbûnên bi zanistî şert in, lê- belê ne bi têrayî ne. Pêwîst e mirov pêre bi hunera wê jî bizanibe. Ki- lîlek hemû deriyan venake. Lêbelê hemû kilîl dişibine hev. Şibîn, bi serê xwe jibo vekirinê ne bes e. Encex hûn kuna herî bikêrhatî bibînin û wê kilîlê lê bînin, hûnê bikaribin derî vekin, naxwe hûn bibêjin derî bi ti kilîlan venabe, yê ne nêzîkbûneke rastbînî be.

Di pirsgirêka Kurd de, jibo çareseriyê ne hindik xwîn hate rijan- din û ne jî hindik rêxistin hatin damezrandin. Nayê gotin ku ‘şerê û dîplomasiya hindik hatiye kirin’. Hênceta ku pirsgirêk ji aliyê ber- biçavî ve ne gihîştî ye jî, nayê berpêşîkirin. Perçebûn ne dezavan- taj e, dikare avantajê jî çêbike. Lêbelê dema ku em li asta çareseri- yê dinêrin, ye bête dîtin ku li qasî serê derziyê neçûne. Mînak, li ba- şûrê Kurdistan, di van deh salên dawî de, tiştên ku di qewimin ne bi netêrayiyên mercên berbiçav, ne bi hindikayiya desteka derve û ne jî bi asta lawaziya hişmendî û rêxistinê, dikare were ravekirin. Berevajî vê, hemû merc gihîştî û bikêrhatî ne. Lêbelê ber bi çarese- riyê ve naçin. Sedema vê ya bingeh, bêrêziya ji rastiyê re û digel ku rêyên çareseriyê dizanin jî, sexbêriya astengkirinê ye û hêzên ku pêwîste bibin çaraser, li pêşya rastiyên çareseriyê ku bi israr dibin asteng e. Çareseriyeke hişwer (rnaqûl) a her pirsgirêka ku digihîje heye. Lêbelê ji ber vê yekê ya herî pêdivî eve ku, wateyeke kûr bi- din rastiyan, derfetên çareseriyê yên herî bi sînor jî cidî bigirin û sebr û viyana nêzîkbûnê nîşan bidin. Tenê kartêkera ku di çareseri- ya pirsgirêka Kurd de tine, ev e.

Helbet di bin van sexbêriyan de, sedemên dîrokî, civakî û siyasî hene. Ev sedemên ku di bin her sexbêriyê de cîh digirin, dikarin bi berfirehî werin vegotin. Encam tê bi cidiyet û israra ku di derbarê çareseriya hişwer a mercên rast derfetê didinê ve, te girêdan. Dibe ku ev herdu mîna du peyvên hêsan werin dîtin. Lêbelê heger ku ev nebin, çareserî di sêniya zêr de were pêşkêşkirin jî, jibo kesên ku cidiyet û israra wan nebe, ti

wateyê îfade nake.

Rastbîniya çareseriyê, cidîbûn û israr, rola kilîla ku bi vekirina ki- lîtê re encamê diyarbike dileyîze. Heger ku hûn bibêjin otonomiyeke di dilê min de, an jî li gor mafê neteweyan ê tayînkirina qedera xwe, ez dewleteke wiha tekûz dixwezim, hûn hişwera li ber xwe nabînin, herwiha hûnê fersendên çareseriyê yên bêhijmar ji dest xwe berdin. Tişta di pirsgirêka Kurd de dijî, hinekî jî ev mantiq û hewlîtî ye

Hêman û polîtîkaya reel tên tevlîhevkirin. Weke jibo ku bi hê- man bimînin polîtîkaya reel nayê kirin, berevajî vê liser navê polî- tîkaya reel yê dev ji hêmanê were berdan! Meyldariyên ku bi hew- lîtî û nexweşiya mantiq tên binavkirin, yên ku vê herênayê derbas- nakin e. Di pirsgirêka Kurd ku vê neçareseriyê dijî de, para vê he- rênayê mezin e. Nêzîkayiyên ku liser navê hêman dogmatîzm, liser navê polîtîkaya reel teslhnbûna heta bi qirikê, berpirsiyariya ku pirsgirêk êxistine rewşa herî nexweş jî hildigirin. Heçkû pir rengî serdestî jiyanê ye. Yê bixwaze dikare rêngê xwe bafirîne. Di pirs- girêka civakî de jî, jibo dîtina rengê çareseriyê, berî her tiştî divê ji rengkoriya kesên ku ji reş û spî pêde nabînin, bête rizgarbûn. Em xwe ji vê rastiyê cihê nakin. Em jî ketin heman xeteyan. Ya giring, xwerizgarkirina ji xeteyan e.

Di pirsgirêka Kurd de, di dema pêşya me de pêvajoya çareseri- ya ku bi siftî yên têkevin nav, bi hewldanên têgihanê, pêwîst e ev mijarên di derbarê rêbazê de, li ber çavan werin girtin. Çareserî we- ke ku tê gumankirin, bi çêkirina peymanan an jî bi saya nêzîkbûnên ku dewletê bexşandin, çênabe. Rastiya Kurd, derfetê nade van şê- weyan. Lêbelê ji ber ku wiha çênabe, neçareserî weke qederê nayê dîtin. Berevajî, ev rewş datîne holê ku pêwîst e çareserî di hinek şê- weyên din de, were lêgerîn.

Ezmûnên 200 salên dawî, danîne holê ku pirsgirêka Kurd bi nêzîkayiyên burjûva neteweperest û bi feodal otonomîtî, nayê ça-

reserkirin. Rastiya dewleta netew a cîran, şens dide vê nimûne- kê, rê li ber xeteriya xeniqandineke dîwarê cihêgirtina di bin çemberê de vedike. Neçareseriya ku nezîkayiya Îsraîl-Filistîn a neteweperest rê li ber vekirî û encamên ku têkiliya wê bi mirova- tiyê re tinene, li holê ne.

Ev nimûneka neteweperest a ji sedsala 19an mayî ku sosyalîzma reel hê bêhtir tenik kirî, ji pêşvebirina mantiqê reş-spî berpirsiyar e. Sazûmana demokratîk ku şaristaniya Rojava bi berdêlên mezin gihîş- tiyê, kilîlen çareseriya hemû pirsgirêkên civakî pêşkêş dike. Rojava, berî her tiştî hemû nelihevkirinên xwe yên dîrokî çareser kirin. Niha jî hînî cîhanê dike. Em dikarin bibêjin ku sazûmana demokratîk, Roj- hilata Navîn girtiye nava xwe. Ev jî rastiyeke ku deriyê wê, êdî ji ali- yê vê sazûmanê vê tê lêdan. Li derî sazûmana demokratîk, rêya çare- seriya pirsgirêkên neteweyî û civakî, nayê dîtin. Sazûmana demokra- tîk ku bi encancamên xwe serdestiya xwe çespandî, jibo hemû aliyan bi windakirinên herî hindik, weke rêya herî bikêrhatî ya ku feydeyên hevpar pêkbîne, çiqa diçe hê bêhtir qedrê wê tê çespandin. Digel ku sînorên siyasî yên heyî weke dane dipejirîne, mafên hemû derdor, kom û çandên ku pirsgirêkên wan heyîn, pektîne. Di nava pêvajoyê de, bi peresîna di aliyê wekhevîparêz û azadîxwaz de, şens dide her çêbûnê ku xwe pêşvebibe û pêşveçûnên ku layiq be, bi viyana xwe pêkbîne. Timî zorê dike ku xwe perwerde bike, birêxistin bike, hilbi- jêre û bide hilbijartin û dikare bi siyaseta demokratîk xwe bigihîne dewlet û zagonan. Civakên Rojava, tenê ne bi pêşveçûnên teknîk û zanistê serdest in. Ji van bêhtir, sazûmana demokratîk ev serdestî de- randiye holê. Yên ku hê jî ji demokrasiyê ditirsin, yên ku dibêjin ‘pêşî aborî dûv re demokrasî’, eslê wê erebê datînine pêşya hesp. Pêwîst e demokrasî, jibo aboriya li paş pêşvebiçe, pêşikiyê wergire. Di bin ro- nahiya vê rastiya ku ji aliyê zanistî ve jî hatiye çespandin û Xelata Nobelê ji xwediyê xwe re anî de, li tevaya Rojhilata Navîn û bi lez- gînî, lêgerîna çareseriya pirsgirêka Kurd a di bin sazûmana demokra- tîk de, tenê ne rêyek ji yên gengaz e, di heman demê de di bin mer- cên heyî de, rêya çareseriyê ya herî bikêrhatî ye. Dûrbûna dewlet-ne- teweyên serwer a ji demokrasiyê, pêwîste weke astengiyekê an jî we- ke sedemeke ku bikevin hinek rêyên din, neyê dîtin.

Weke ku di beşên berî de hatî vekirin, Pirsgirêka Kurd bixwe yê di rêya demokratîkbûnê de, zorê li van dewletan bike. Lewra qey- ran û neçareseriyên ku dijîn, sazûmana demokratîk jibo wan jî dike vebijarka bi tenê. Herwiha rastîhevhatina şaristaniya demokratîka hemdem û hebûnên Rojhilata Navîn ên bi pirsgirêk, bi taybetî di pirsgirêka Kurd de, derbasbûyina sazûmana demokratîk, aniye merhaleya ku çênebe çênabe. (ji ber ku ev beş di beşa têkildar de bi berfirehî hatiye ravekirin, ez li vir dubare nakim) Weke ku di dîro- kê de, şaristanî di mînaka Sumer de hilatiye, li Rojhilata Navîn jî, hilatina şaristaniya demokratîk a hemdem bi naverokeke nû tê ferz- kirin. Qeder careke din, rola bûyina kilîla şaristaniya demokratîk, dide Kurdan. Kurd ne tenê yê pirsgirêkên xwe yên giran çareser bi- kin, yê şensê biratiya di nava sazûmana demokratîk de û parvekiri- na yekîtiya azad û bi rûmet, bidine gelên cîranên xwe jî. Yê kilîla zêr a rizgarbûna rast, aşitî û jiyana geşdar ku gelê herêmê, di pêva- joya dîrokê de hêvî dikir, pêşkêş bikin. Pêwîst e weke xwedîlêder- ketina peywirên dîrokî were fêmkirin ku, ev nêzîkayî ne xeyal in, pêdiviyeke rastbînî ye, ferzbûna ku bigihîjin serdemê û rêya ewleyî ya ku hemû paşvemayinan derbasbikin, herwiha tişta bikevin ser milên wan, bi berpirsiyarî, cidîbûn û rikdarî bicîhbînin,

Di bin ronahiya vê çarçova çareseriya pirsgirêka Kurd de, jibo hemû dewletên ku di nava wan de tê jiyandin jî, di derbarê şêweyin çareseriyê de, di asta tezan de emê hewl bidin da mijarên sereke nî- şan bidin.

### 1- Pirsgirêka Kurd a Tirkiyê û Çareseriya Demokratîk

Ev rêbaza herî rast e ku, li sedemên giranbûna pirsgirêkên Kurd û rêya çareseriyên wê, di nava mantiqê çêbûn û pêşveçûna têkili- yên Tirk û Kurd de, bigerin. Çareserî bi xwe encamek e. Jibo ser- keftî bibe dema ku çavkaniyên dîrokî yên bûyerên ku pêve girêdayî û bê çawa peresîn nîşandanê, bi xalên sereke li holê were danîn, em dikarin ji sepîna rêbaza zanistî xeber bidin. Di beşên têkildar de, ji- berku em liser rawestiyane, tenê bi kurtayî emê bi bîra we bînin.

#### a- Dema Begîtiya Feodal û Siltantiyê

Ev pêvajoya ku di sedsala 11an de, bi hêrîşên siltanên selçûki- yên mezin û eşîrên oxûzan destpêkirî, ji levdanan bêhtir bi lihev- kirinan

hatiye birêvebirin. Li hember împeretoriya Bîzans, hev- girtina îslamtiyê ya kevneşopî bingeh hatiye girtin. Ji hiqûqê hev re rêz girtine, begîtiyên tirk û kurdan hebûna hevûdin naskirine. Di serî de Şerê Milazgirê, hevgirtinên di gelek şeran de, di en- camgirtinê de diyarker bûne. Begîtiyên tirkan û siltantî, di warê leşkerî û siyasî de pêşve diçin, lêbelê Kurd di warê aborî, çandî û civakî de, serdestir in. Çanda Kurd hê bêhtir bişav dike. Pirsgirê- kên heyîn, ji ber levdanên di serdema navîn de, yên di navbera sil- tantî û begîtiyên li her deveran ku liser damezrandina serdestiyê bûn. Aliyê levdanan ê etnîkî û qewmî zêde tine ye. Ji ber qayîşkê- şiya çînên serdest ên xwedanî, siyasî û leşkerî, di navbera wan de derbasdibe. Herwiha vê demê, di navbera tirk û kurdan de, pirsgi- rêkên etnîk û qewmî zêde tine ne.

Di rejima siltantiya osmanî de, têkilî bêhtir birêkûpêk dibin û statuyê qezenc dike. Ev statuya ku begîtiyên kurdan di nava xwe de serbest û rêveberî ji bav derbasî kur dibû, heta bi sedsala 19an ber- dewam dike. Ev di binyata hnperetoriyê de, di nava çînên serdest de, statuya herî pêşketî ye. Di gelek fennanên siltanan de tê dîtin ku, siltan vê têkiliyê di asta stratejîk de dinirxînin. Ev statuya ku wan damezrandî û bi têgînên hikumet, begîtî û herêma Kurdistan, ku fennîtî dane qezenckirin, hntiyazekê werdigire. Di vê yekê de, erdnîgariya kurdan ku bi eşîr û qewmên bihêz lê cîh girtin û li Roj- hilata Navîn girîngiya wan a stratejîk a jibo serweriyê, rola mezin dilîzin. Heta ku bi begîtiyên kurdan re lihevnekin, ne gengaz e ku li hember feodalên îran û Erebistanê serdestiyê bidestbêixin. Silta- nên Tirk, di hişmendiya kûr a vê rastiyê de ne. Begîtiyên Kurdan jî, ev hewceyiya stratejîk baş nirxandine û otonomiyên hnperetoriyê yên herî hêzdar damezrandine. Otonomîtiya Kurd statuya tîpîk a dema feodaliyê, weke rêya çareseriyê ye.

Ji destpêka sedsala 19an û pêde, bi mêtingehkariya Ewropa ku li

Rojhilata Navîn hîkarîker dibe re, Ev statuya di têkiliyên tirk û kur- dan de, tê hejandin. Di serî de Ingîliztan, dewletên kapîtalîst û mê- tingeliker, li Rojhilata Navîn li hindikayiyên xiristiyan xwedî der- dikevin û siltantiyê li hember belavbûna Hirûs diparêz in. Kurdan cihêdigrin û jibo keysa xwe bikartînin. Bi vê polîtîkayê, meyldari- yeke xeter tê pêşvebirin. Weke sepîneke polîtîkaya Ingîliztan ya da- beş bike û birêve bibe ku ti bingehên wê yên sincî tine ne, roleke xeter dilîze. Lîstika bi hemû hêzan a jibo ku bandorker bibe, sede- ma herî rast a qirkirinan e. Aştiya osmaniyan ku hindik gelek bi sedsalan domandî, xerabû. Dema ku qewm hevûdin dixwin destpê- dike. Neteweperestiya ku bi mêtingelikariya kapîtalîst ve girêdayî, weke dema bihevketin û pêrçebûnê, di dîrokê de cîhê xwe digire. Di têkiliyên tirk û kurdan de, weke dema ku pirsgirêk derketine, pê- wîst e ev pêvajo bingeh were girtin.

**b- Neteweperestî, Serhildan û Dema Dûrkirinê (tenkîl)**

Ev dema ku ji aliyê mêtingehkariya kapîtalîst ve hatibû pêşdan, dema ku pirsgireka Kurd di wateya hemdem de hilatiye û pêşve- çûyî ye. Mantiqê di bin vê de ev e: Jibo ku hindikayiyên xiristiyan bi xwe ve girêbide, wan bi kurdan ditirsînin. Di heman demê de, ji- bo ku tirk, ereb û eceman bi ba xwe de bikişînin, bi şêweya tetîki- rinê ku rolê dilîzin, serhildanên kurdan bikartînin. Kurdan weke ko- bayan û weke amûrên navtêdanê bikartînin. Mebesta wan tine ku bi mîsyonên şaristanî nêzîk bibin. Ingîliztan di vê polîtîkayê de serkê- şiyê dike. Dewletên din ên mêtingehkar û kapîtalîst jî, ji vê polîtî- kayê dûr namînin. Polîtîkaya Kurd a kapîtalîzma emperyalîst ku heta roja îroyîn jî tê, bi gelemperî liser hemû gelên Rojhilata Na- vîn, bi taybetî liser kurdan, di dîroka wan de pêvajoya herî bi şewat daye jiyandin. Taybetiya vê polîtîkayê neteweperestiya burjûva, ji- berku bi annanca dabeşbike-birêvebibe ve girêdayî ye, roleke ne- yînî lîstiye, li Ewropa di çêbûna bazara neteweyî, ziman, çand û dewletê de, rola bingeh a bîrdoziyî dilîze, lêbelê li Rojhilata Navîn, veguheriye amûreke ku gel hevûdin bixwin. Di jevketina Impereto- riya Osmanî de, rola bingeh lîstiye. Rê vekir ku, mozaîka Rojhila- ya Navîn parçe bibe, gel yek yek bimînin, weke di ereb

û kurdan de tê dîtin, parçe parçe bibin û bi hêsanî bibin xwarin. Vê dawîyê hêz- darbûna neteweperestiya cîgeyî û neteweperestiyên mîkro etnîk, vê perçebûnê kûrtir dikin, herwiha vê yekê weke niçika dabeşbike-bi- rêvebibe, lîstina ve rolê domandiye.

Neteweperestiya Tirk, weke vebizaveke li hember jihevketina împeretoriya Osmanî, neteweperestiyeke ku herî zû li herêmê şêwe girtiye. Di destpêkê de, ev neteweperestiya ku bi annanca meşrûti- yetê bi ***Namik Kemalan*** re, bisînor be jî di derûneke pêşverû de pêşvediçe, bi ***Osmanîtiya Nû*** bitegîn dibe. Di dawiya sedsala 19an de, bi ***Pantirkîzm*** û ji aliyê Evdilhemîd ve, bi ***Panîslamîzm*** bitêgîn dibe, Rejhna meşrûtiyetê weke qezenca vê neteweperestiyê derdi- keve holê. Ji derûna demokratîk bêpar e. Vegotinên azadî û biratî yên di destpêkê de, vê dawiyê cîhê xwe dane dîktatortî û nijadpe- restiyê. Şerê cîhanê yê yekemîn ku bi vê polîtîkayê ketinê, bi per- çebûna împeretoriya Osmanî biencam dibe.

Neteweperestiya Mistefa Kemal a deme komarê cudatir e. Ne ni-jadperest e, hemû şaristaniyên Anatolya ji xwe re çavkanî dibîne û ji wan re bi rêzgirtin e. Jibo ku mirûz û hişmendiya neteweyî ya ge- lê Tirk ku ji aliyê Osmanî ve piçûk dihat girtin bilind bike, dirûş- meya *“Xwezi bi wî \ wê ku bibêje ez Tirk im* ***”,*** bikaraniye, li vira jî ne aliyekî nijadperestiyê, neteweyîbûna gelê Tirk ku di serdema na- vîn de, ji aliyê Osmanî ve hatî piçûkgrtin, tê annanckirin. Cudahi- ya di navbera neteweperestiya Tirk a nijadperest ku vê dawiyê hatî pêşêxistin û neteweperestiya Mistefa Kemal de, girîng e.

Neteweperestiya Tirk a nijadperest ku dema komarê, digel îti-hadperestiyê bingeh digire jî, ji wê hê paşdetir e. Qeyranên aborî ku zêde dibin, hêrîşa ji gundan ber bi bajaran û li hember bilindbûna çepgiriyê, neteweperestiya ku piştî salên 1960an polîtîk bûyî, îfa- deya xwe di Ocaxên îdeal û MHP (Partiya Hereketa Neteweperest) de dibîne. Ev neteweperestiya ku dabeşî baskên din jî bûye, di roja me de bûye baskek ji yê desthilatiyê, di jiholêrakirina çepgiriyê de rola mezin lîstiye. Nakokiya wê ya bi hemdemîbûna Mistefa Kemal re, nedemokratîkbûna wan û desthilatiya faşîst ku dide meşandin, bi bingeha nijadperestiyê re, di rola asêyî (handîkap) de ye. Di serî de CHP (Partiya Komara Gel),

digel ku di neteweperestiya M. Ke- mal de hewldanên nûjeniyê têne dîtin jî, hê qevastina ku jê tê hêvî- kirin pêkneanîne. Qedera neteweperestiya M. Kemal, bi vê qevas- tina ku di bereka demokratîkbûnê de were pêkanîn ve girêdayî ye.

Hatiya xwestin ku osmanîtiya kevneşopî, bi bizaveke bi şêweya senteza Tirk-îslam were nûjenkirin. Ev bizava ku bi bilindbûna si- yasî ya îslamê ve girêdayî, herî bêhtir weke meyldariyeke lîberal a burjûvaziya Anatolya ku pêşdikeve şêwe digire. Ev meyldariya ku bêhtir ji Tirktiyê liser îslamtiyê radiweste û ji meyldariyên îslamti- yê yên li îran û nav Ereban dixwaze hezê bigire, di van demên dawî de, hewl dide ku di bereka Partiyên Demokrat ên Xiristiyan li Ew- ropa de, pêşve biçe.

Bloka desthilatiya kevneşopî ya burjûva Tirkiyê ku ji CHP ve- qetiyane û di angaşta lîberalbûnê de, DP (Partiya Demokrat), AP (Partiya Dadmendî) û ANAP (Partiya Dayik Niştiman), piştî ez- mûnan, ketine pêvajoya jihevbelavbûnê. Vê blokê mînakeke de- mokratîzmê ya lihevkirî pêşkêş nekiriye. Di roja me de ya ku herî liser tê rawestandin, hewldanên burjûvazî ne ku bloka parti- ya demokrat a navendî bafirîne. Him navenda rast û him jî na- venda çep, liser demokrasî û mafê mirovan radiwestin û hewldi- din ku vê valahiyê dagirin.

Qeyrana piralî ku Tirkiye di tevaya cîhanê de ketiyê, demeketin û neçareseriya neteweperstiya ku dexma xwe li sedsala dawî xistî, li ber çavan radixe. Di damezrandina komarê de, digel ku rola ne- teweperestiya M. Kemal mîsogere jî, jiberku peresîna demokratîk nîşan nedaye, dibe bingeha vê neçareseriyê. Heman nexweşî û ne- çareserî li tevaya Rojhilata Navîn tên jiyandin. Ewropa ku serdema neteweperstî ya herî pêşketî vekirî, neteweperestiya nijadperest a ku bi faşîzma Hîtler re gihaye bandevê, binerd dike û ala demokra- siyê bilind dike. Ev yek bû meyldariya sereke ku dexma xwe li pên- cîh salên dawiya sedsala 20an daye. M. Kemal heger ku bisînor be jî, ji neteweperestiya Rojava, di serdema pêşverû de sûd wergirtiye. Di vê wateyê de jî hemdem bû. Lêbelê piştî şerê cîhanê yê duyemîn ku hemdemî bi şaristaniya demokratîk hate terîfkirin, rêveberiyên Tirk pêşveçûna şaristanî a bi vî rengî, di derûna wê de tênegihîştin. Heger têgihîştibin jî, ne li gor karê xwe dîtin û jê bawer nekirin. Herî bêhtir reveberiya komarê ya di bin

desthilatiyeke olîgarşîk de, çêtir li gor berjewendiyên xwe dîtin. Demokrasiya hemdem jibo berjewendiyên xwe xeter dîtin. Ev jî tê wateya qutbûna komarê ya ji şaristaniya hemdem.

Di bingeha qeyrana aborî de, ev rastî veşartî ye. Hemû welatên Ewropa ku hatibûn rûxandin, bi rejîma demokratîk digihin asta îro, lê Tirkiye timî ji demokratîkbûnê dûr ma. Heta bi demagojiyeke demokrasiyê ya bêhempa xwe veşart û guman kir ku ew yê bi vêna derketinekê pêkbîne. Guman dikir ku bi vê lîstika demokrasiyê, herkes bi xew ve biriye, lêbelê hê nûka dibîne ku kiriye ku Tirkiye poşê li latê bixe. Ev vekirî ye ku di pêncîh salên dawiya sedsala 20an de, giregirên (bijarte) siyaseta Tirkî, angaşta komarê ya di der- barê hemdembûnê de fêmnekirine û mîrateya wê ya bisînor jî, ne baş bikaranîne. Vebizava arêtşê ya li hember vê yekê, benda siyasî timî di bin kontrolê de hiştiye û bi çar derbeyên girîng, nehiştiye ku komar ji rê derkeve. Lêbelê jiberku ev derbe ne xwedî bemameyên cidîbûn û herî bêhtir jibo di pîvanên klasîk de komarê biparêzin, bandora wan çênebûye, kirine ku hê bêhtir komar ber bi nava xwe ve kinnişiye û rê li ber vekiriye ku bikeve rewşa kevneperest. Di dawiya sedsala 20an de, ya tê jiyandin ne tenê qeyraneke aborî ye, qeyraneke aborî, çandî, civakî û siyasî ye. Pêngavekê ji vê û wêde- tir, hîperenflasyon û alozî ye. Heger ku di dema borî de bête israrkirin, ev jî yê jenerev be.

Yên ku rê li ber navberiya Tirkiyê û şaristaniya demokratîk a hemdem vekirine, tevgerên antîdomokratîk ên reveberiyên olîgar- şîk û neteweperestiya paşverû ne. Tirkiye di roja îroyîn de, enca- mên van nakokiyan weke qeyrana herî giran a di dîroka xwe de, bi awayek domdarî dijî. Taybetiya rejîmê ya otorîter û di nava xwe de girtî, destekariya ji mercên hundirîn asteng dike, herwiha weke ku di dîrokê de tê dîtin, çareserî û destekariya ji derve tê hêvîkirin. IMF (Fona Diravan a Navneteweyî) û YE, ji du aliyan ve hewl di- din ku vê destekariyê bikin. Lêbelê tirsên dewletê yên kevneşopî û binyata wê ya ji vebûnên demokratîk re girtî, serkeftina destekari- ya derveyî jî asteng dike. Herwiha jiberku derfetên çareseriyê yên der û hundir tên astengkirin, xeteriya teqîneke civakî ya her kêlî di rojevê de ye. Bi taybetî neteweperestiya Tirkiyê ku tengayiya xwe ya herî kûr dijî,

neteweperestiya Tirk a nijadperst ku divê bi faşîz- mê ji vê yekê derkeve, li dîwarê qewîn ê mercên der û hundir diqe- libe. Faşîzma ku jibo bilindbûn û desthilatiyê destekê nabîne, no- jekî dibe û bi xeteriya windakirina hêzê hatiye dorpêçkirin. Hemû mercên der û hundir, li herdû şêweyên neteweperestiyê vê herêna- yê ferzdikin ku, an xwe veguherînin an jî xwe ji navê bikişînin. Ar- têş dizane ku bi derbeyên kevneşopî tiştek nayê çareserkirin. Jibo bemameyeke nûsaziyê ya berfireh, girtina wê ya tevaya desthilati- yê jî, ji ber sedemên hevgirtinên derveyî û mercên hundirîn, weke dibêtiyekê nayê dîtin. Encex komer xeteriyeke jihevbelavbûnê der- basbike, yê destekariyeke vekirî were kirin. Jixwe, artêş venêran û çavdêriya xwe ya sift, bi rola MGK (Lijneya Ewlekariya Neteweyî) ya ku zêde dibe tîne cîh.

Di bin van mercan de, Tirkiye prsgirêkên guherîn û veguherînê yên dîroka xwe ku herî berfireh, nîqaş dike. Bi navbeynkariya med- yayê, roj bi roj ev nîqaş heta bi deverên nependî tên belavkirin. Ev nîqaş ne dişibe nîqaşên rewşenbîr û burokratên dema berî meşrûti- yetê yên serveyî û ne jî dişibe nîqaşên demokratên ku piştî şerê cî- hanê yê duyemîn di nava CHP de derketinek pêkanîbûn. Vê nîqa- şê, nîqaşên çep û rastên Tirkiyê yên salên 1970an, derbaskirine. Di vê de, merhaleya ku sazûmana sosyoekonomîk gihayê, xitimandi- na sîstema siyasî, şêweya ku pirsgirêka Kurd gihayê û bêahengiyên ku bi cîhana derveyî re tên jiyandin, rola bingehîn dilîzin. Weke di dema borî de, kesek bawer nake ku bi pêşgiriyên ketûber, yê ji he- qê qeyranê werin der. Her pêşgiriya çareserî ku yekalî tê girtin, ji girankirina qeyran û pirsgirêkan wêdetir, ti wateyên din îfade nake. Ev rewş nîşan dide ku êşnasî bi awayek rast nehatiye çêkirin.

Bîrdoziya neteweperest, gihaye merhaleya herî bilind. Edî bi vê bîrdoziyê pirsgirêk nayên çareserkirin, ten girankirin. Rastbîniya ku li tevaya Rojhilata Navîn tê jiyandin, vê yekê rast derdixe. Qey- rana Tirkiyê, di mercên emperyalîzmê de rewşeke gelemperî jî nî- şan dide. Şibîna wê ya Arjantîn, Brezîlya û Endonezyayê, ji vê rew- şa gelemperî tê.

Dema ku li mînaka Tirkiyê ji nêzîkve were nêrîn, ev dikare bête gotin: Aboriya kapîtalîst, bi sazûmana heyî zêde pêşve naçe, bere- vajî

vê yê paşve biçe. Dema damezrandina komarê, dema ku dane- heva kapîtalîzmê bi destê dewletê pêkaniye û burjûvaziya ciwan di nava burokrasiyê de hemandiye û afirandiye. Bingeha kapîtalîzmê bi vî rengî hat avêtin. Salên 1950an, dema pêşvebirin û berfirehki- rina kapîtalîzmê bû. Kapîtalîzma çandinî ya li qada gundewarî û kapîtalîzma pîşesaziyê ya li bajarên, vê demê pêngavên mezin avê- tin. Digel kapîtalîzma burokrat, dema daneheva taybet jî vebû. Ka- pîtalîzma bazirganî-pîşesazî pêşveçû. Piştî salên 1980an, pêngava senniyanê darayî destpêkir. Bi îkameya hundirîn û di pîşesaziyê de vebûna derveyî, pêngaveke din hate avêtin. Kapîtalîzma Tirkiyê, bi van pêngavan hate merhaleyeke diyar. Ji mercên aboriyên pêşve- çûyî yên cîhana sêyemîn, hate derawayeke ku bikaribe bi Ewropa re berberiyê bike. Kemasiya wê, damezrandina sazûmana siyasî ya vê aboriyê bû. Di vê de, bi helwesteke dudilî hereket kir. Di vî ba- betî de astenga bingehîn pirsgirêka Kurd bû.

Em bi girêdana dîroka nêzîk ve li ber çavan bigrin, em ê di da- mezrandina komarê de jî li rewşeke wiha rast werin. Dema komar bisazî bûye, Kurd jibîrkirine. Lêbelê timî tirsa wan hiskiriye, bi sa- zûmanê re lihevanîne û ji çareseriyê dûr maye.

Serhildanên Kurd weke ku datînin holê, ne serhildanên ku cuda- yetî bingeh digirtin. Di pêvajoya sedsala 19an de, serhildanên kur- dan ku berdewam kirine, ne jibo ku ji sazûmanê veqetin, jiberku hatibûn vederkirin hatibûn pêşêxistin. Navendparêziya ku zêde bû- bû, cîh ne dida kurdan. Digel ku kurdan otonomiya xwe ya kevin a berfireh winda kiribûn jî, didîtin ku di sazûmana nû ya navendî de jî cîhê wan tine. Dewletên mezin, jibo ku Tirkiyê hê bêhtir bindest bikin, Her çiqas ku car caran nav di bûyeran didan jî, ti caran jibo veqetînê destek nekirine. Di damezrandina komarê de, ev yek bêh- tir derketiye holê. Kurdan ne tenê otonomiya xwe winda kirin, xwe bi mandelekirina kesayetiya xwe re jî rûbirû dîtin. Dewletên ku berjewendiyên wan hebûn, di serî de Ingilîz, bi vê mebestê ji ser- hildanên ku pêkhatin sûd wergirtin û bi kemalîstan re lihevkirin. Pêvajoya di pey vê re, êdî bi temamî dema qedexekirina kurdan, ri- zandin û danjibîrkirina wan e. Bersiva berbiçav a ku PKKê dayî vê yekê, di çaryeka dawî ya sedsala 20an de, şerê bi siftî yê daketî bû.

Komara ku dema hetî damezrandin, bi hênceta serhildana Kurd demokratîk nebûyî, di merhaleya herî girîng a pêvajoya hemdembû- nê de, ji dêvla ku bi demokratîkbûnê sazûmana xwe biqedîne, dîsa ji ber tirsa xwe û bi telaşa dabeşbûnê, gumankir ku yê bi perçiqan- dina kurdan pirsgirêkê çareser bike. Bi şêtî û bi seferberlika gelem- perî, bi hemû rêbazên şerê taybetî, jiholêrakirina pirsgirêkê xiste ro- jeva xwe. Ligor hinek çavkaniyan 100, ligor hinekan jî 400 milyar dolar, ji vî karî re veqetandin. Encam, ketina aborî ya qeyranê, xwe- windakirina qada civakî û bitemamî îflaskirina binyatên siyasî. Des- teka desthilatiyê ketiye bin ji sedî dehan. Aboriyeke ku ji aliyê cîha- nê ve tê çavdêrîkirin, bêyê kengî hilweşe, heger ku IMF nebe roje- kê jî xwe berdewam nake. Pozberîtiya li cîhanê li dera han, heger ku DYA, YE û saziyên li dor wan nebin, ketiye rewşa komareke ku xwe nedomîne. Derawaye ku neteweperstiya Tirk ku Tirkiye aniye û lê bi cîh kiriye ev e. Kurdên xwe ne bi temamî tinekirine û ne jî bişav- tine. Berevajî vê, di bin pêşengiya PKKê de, rastiyeke Kurd a ku ve- guherîneke demokratîk a mezin dijî, dabaşa xeberdanê ye.

Li hember vê rewşa berbiçav, jibo dema pêşya me, tê hewldan ku gav werin avêtin. Him navenda çep û him jî navenda rast, hewl didin ku ji nû ve xwe bidin hev û xwe bi partî bikin. Yên heyin, yên ku ji niha de dibêjin kevin bûne, angaşta xwe berdewam dikin. Hi- kûmat deqîqeyên lîstikê yên dirêjkirî dilîze. Gel bi hêzeke mezin veguherînên bingehîn dixwaze. Çêtirgirtina gel a di aliyê şaristani- ya demokratîk de, mîsoger e. Artêş dûrî derbeyê, zora zêde ku li ta- razan neyê kirin, ne li hember veguherînên nû yên di rewişta de- mokratîk û laîk ên komarê de ne. PKK di derawaye parastina rewa de, di çêtirgirtina çareseriya demokratîk de, helwesta xwe ya mîso-

ger nîşan daye.

Li hember vê tabloyê, diyar e ku pirsgirêk bi pêşgiriyên yekalî çareser nabin. Ev pêdiviya mantiqe ku çareserî bi gelemperî û di nava hev de be. Dema ku xaniyek were avakirin, enîşkek ji ya wê bi mîne vala, yê xanî bi tevayî bêwate bike. Di destûra bingehîn de dema guherînan pêktînin, dîsa Kurd bi vederkirinê re rûbirû di- mînin. Hê ji niha ve zemîneke levdanê vekirî tê hiştin. Netewepe- restiya nijadperest hê jî bi qedera Tirkiyê dilîze. Bi tirsandinan, dîsa dixwaze pêşeroja Tirkiyê girê bide. Herwiha qeyran hê bêh- tir kûr dibe. Cihêbûna ji cîhanê û tengbûna hundirîn, girseyan tî- ne xala teqînê.

Eslê wê komar, guherîneke mezin derbas dike. Bingehên wê yên kevin bilezgînî tên derbaskirin. Nûjenî bûye azweriya herî bi- hêz. Li hember ên li dij veguherînê, vebizavên mezin tên nîşandan. Kesên ku ne ji aliyê levhatin, guherîn û veguherînan bin, di pêyvê de nemane. Lêbelê Tirkiye ditirse. Tirkiye ji dîroka xwe ya nêzîk ditirse. Jiber sûcên ku li hember kurdan hatine kirin ditirse. Di dî- roka nêzîk de, jiber sûcen ku li hember hêzên demokrasiyê kirine ditirse. Ji krîterên demokrasiyê û ji durûtiya xwe ya li hember wan ditirse. Ev hemû tirs, qeyranê hê bêhtir kûr dikin. Qeyran weke ku tê gotin, ne yek alî ye. Berî her tiştî siyasî ye. Aliyên wê yên siy- asî, psîkolojîk, civakî, mirûz û aborî di nava hev de ne. Hatiye xa- leke wisa, an çareseriyeke gelemperî an jî bi tevayî neçareserî. Li gor ku ti pirsgirêk bi derbe û tepisandinan çareser nabin û rewşe- ke wiha jî ne li holê ye, êdî dema ku em dikevinê, pêwîst e ku cu- da be. Rewşeke ku bi neteweperestiyê jî çareser bibe tine. Ne çep- giriyeke ku bête tepisandin û ne jî tevgereke Kurd a di rewşa şer de heye. Neteweperestî yê li hember kê şer bike? Hemû cîran dos- tîtiye dixwazin. Gel qet ne alîgirê şidetê ye. Berevajî vê ji şidetê bêzar bûne, nefret dikin. Heger ku hê jî bi ser de herin, bi teqîna civakî ya mezin gefan dide.

Edî pêvajoyek li Tirkiyê tê jiyandin ku, di dîroka Tirkiyê de ze- mîna neteweperestî, serhildan, dûrkirin û tepisandinê nemaye û er- ka xwe qedandiye. Edî dikevine demeke wisa ku, heger hinek nex- wazin jî, neteweperestiya neteweya serdest a nijadperest û netewe- perestiya burjûva ya bindest, çepparêziya kevin û xwediyên îslama siyasî jî bin, rola wan nemaye. Digel ku Tirkiye di vî babetî de, ji aliyê bîrdoziyî û

siyasî ve bi kêmasiyên girîng be jî, bi rastî jî dike- ve nava demeke nû. Girseyên gel di nava bendewariyeke dema nû de ne. Heger ku dewlet veguherînan derbas neke, yê çipî tazî li ho- lê bimîne. Heger ku siyaset ji aliyê bîrdoziyî, siyasî û mirûz ve de- ma nû ne hilberîne, mîsoger ê di sinif de bimîne. Heger bixwazin teqîna civakî, weke xeteriyeke ku mezin dibe neyê teqandin, der- basbûna dema nû pêwîst e. Li hember aliyen vê qeyrana siyasî, psî- kolojîk û civakî, çiqas ku dolaran şirinqe bikin bila bikin, heta ku mercên dema nû çenebin û ji nû ve veavabûn pekneyê, aborî ji qey- rana ku hê behtir kûr dibe rizgar nabe. Dema nû dibe dema ku he- mû kilîtbûn tên derbaskirin, weke bîrûbawerî û ji nû ve veavabûn guherîn û veguherîn tên pêkanîn. Dibe demeke ku komar ji nû ve, weke dewleteke hiqûq û laîk veava dibe. Dibe demeke ku pirsgire- ka Kurd nayê vederkirin û di bingeha yekîtiya demokratîk de, ber bi çareseriyê ve diçe.

### c- Dema Avabûna Komarê ya ji nû ve û Çareseriya Demokratîk

Konsensuseke gelemperî çebûye ku, qeyrana salên 2000an a Tirki- ye tê de dijî, bi demokratîkbûna dewlet, civak û binyatên siyasî, yê were derbaskirin. Ne rageşiyeke ji nû ve, ne jî yekîtî û pevrayiyeke bi gotinên neteweperestî, bendewariya demê nîşan nadin. Gel li qasî di- rûşmeyên neteweperestî, nêzîkayiyên demagojîk ên şerûd jî, napejirî- ne. Di bin sazûmana demokratîk de, bi dewleta hiqûq re, sazûmaneke aborî tê xwestin ku, ji nelirêtiyan paqij bûbe, ji enflasyonê rizgar bû- be, bêkarî çareser kiri be û bidadmendî hevbeş bike. Bêrîkirina dîrokî, aştî, azadî û dadmendî tê xwestin. Rewişta dema nû, yê bi van nirxan şêwe bigre. Jibo vê yeke destûreke bingehîn a nû pêwîst e. Ji aliyê de- mokratîkbûna vê destûra bingehîn ve şert e ku, viyana gel a ku derke- tiye rastê, ji xwe re bingeh bigire. Zagoneke demokratîk a partiyên si- yasî û hilbijartinê, jibo ku siyaset binyateke demokratîk qezenc bike,

pêwîst e. Destûra bingehîn yê dewletê demokratîk bike, zagonên partiyên siyasî û hilbijartinê jî, yê siyasetê demokratîk bikin. Saziyên civaka şarwer ku bi zagonan ewlekarî bidesxistin, yê bibine amûrên bingehîn ên demokratîkirina civakê. Dema ku azadiya îfadeyê ya ramanî û çandî bigihîje ewlekariyê, mafên mirovan ên bingehîn jî yê xebatbariyê qezenc bikin. Her tevgera siyasî ku bixwaze bigihe desthilatiyê, encex bi vê pêşnûmaya demokratîkbûnê ve girêdayî be, heta ku bibe xwedî şensê qezenckirinê. Çiqas ku diçe, meyldariya gelemper xwe di vî warî de nîşan dide. Pêkhatina van pêşveçûnên binyatî, şore- şa bîrûbaweriyê pêwîst dike. Gotinên herkesî ku dibêjin “ez ***jî guhe- rîm*** ”, dide nîşandan ku şoreşa bîrûbawerî pêşve diçe.

Ev rastbîniye ku, pêvajoya li pêşya dewlet û civaka Tirkiyê, we- ke Tirkiya Demokratîk were têgînkirin. Dema komarê ya yekemîn, damezrandin, nûsazî û ji ber sedemên parastinê, dema komara oto- rîter (1920-1950), dema duyemîn, rêveberiya beşeke piçûk ji yên tebeqeya raser a hevpar û keyfî, dema komara olîgarşîk (1950- 2000), weke dema nû, di wateya ku viyana gel, di xebatbariya bin- geha demokratîk de were nîşandan, dema komara demokratîk, ev pêvajoya ku em ketinê ye. Weke bîrûbawerî û sazîbûn, di bingeha bi tevgerbûneke civakî ya sift depêktê.

Çareseriya pirsgirêka Kurd a demokratîk, him sedema vê pêva- joyê ya bingehîn e û him jî ya ku temam dike ye. Herdu demên ko- marê yên pêşî, di damezrandinê de digel ku hevgirtiyek stratejîke jî, ji ber neteweperestî û serhildanan, bi vederkirina kurdan û man- delekirina wan derbasbûne. Heçku serokê rizgariya neteweyî Mis- tefa Kemal, dema ku hereketê organîze dike, Tirk û Kurd weke du hevparên stratejîk ku mîna goşt û neynûkê bi hev hewce, îlan kiri- bûn. Serhildanin bi serokatiyên feodal ku jibo mandelekirina Kurd hatin bikaranîn, bûyera komarê ya herî bêşens e. Rê li ber seqetma- yîna wê vekiriye û berevajî mantiqê damezrandina xwe bûye. Man- delekirina bûyer û pirsgirêkê, digel ku hebûna wan ji holê ranekiri- ye, pêşî li ketina wan a rojevê jî negirtiye. Timî tirs hilberandiye, vê yekê jî komar ber bi hişkbûnê ve biriye û pêşî li demokratîkbûna wê girtiye. Ji ber ku neteweperestî gihaye şoventiyê, dîtina rastiyên
dîrokê asteng kiriye.

Weke ku di beşên têkildar de jî me anî zimên, di bilindbûna hê- za Tirkan a li Anatolya de, desteka li Rojhilat a herî mezin Kurd in. Dema ku ev destek were kişandin, tirkîtî yê li Anatolya bi zorê xwe liser lingan bigre. Di hemû demên dîrokê yên krîtîk de, ev yek ha- tiye dîtin. Dîrok di ketina Anatolya de, diçespîn e ku di serfiraziya Milazgirê ya 107lê de, ku ne ji kurdan bûna ne gengaz bû. împere- toriya Osmanî ku di Rojhilata Navîn de bûye xwedî hêzekê jî, bi begîtiyên kurdan ku di sala 1514an de tevlî şerê Çildêran (Çaldiran) bûn, pêkhat. Gelek daxuyanî û fennanên Mistefa Kemal nîşan di- din ku, heger ne ji kurdan bûna şerê rizgariya neteweyî nedihat qe- zenckirin. Gelek bûyer û pêşveûn bi hebûna kurdan, jibo tirkan bi- encam bûne. Digel van rastiyên li holê, mandelekirina kurdan, tê wateya ku tevir li lingê xwe dixin. Bandora korkirina şovenîzmê di vir de ye. Hevgirtineke mîna goşt û neynûkê, dema hewceyî hebe pêdivî bibîne, dema ku hewceyî nebe jî tine bihesibîne, bûye polî- tîkaya komarê ya herî bi neyînî. Vê nêzîkayiyê ji derbeyên ku li xwe bi xwe xistî wêdetir, ti encamên din nedane. Digel ku bişavbû- na li bendê bûn pêknehat, teknolojiya roja me û ragihandin, bi mî- sogerî daniye holê ku êdî rêbazên bi vî rengî ne derbasdar in.

Bi vê mebestê, di derbarê bûyera Kurd ku jê ditirsin de, vekirina hinek têgînan girîngiyê bi xwe re tînin,

Yekemîn, di derbarê yekerbûna welat û yekîtiya dewletê de, hestyariya ku tê hiskirin e. Ev hestyarî, herî bêhtir ji tirsa pirsgirê- ka Kurd derdikeve holê. Tirsê mandeleyî, Mandeleyê jî serhildanên bêteraz û qeyranên domdar anîne. Encam jî, xwe xapandin û win- dayiyên daringî û menewî yên bêhempa ne. Heçku, yekîtiya welêt, dema ku Kurd liser axa xwe xwedî ziman û çanda xwe bin, yê he bêhtir sexlem bibe. Tê tirsandin ku, dema azadiyan bidin kurdan, ev yê bi cudabûn û bi netewebûneke din bi encam bibe. Bêsûdbûn û bêwateyiya cudabûnê, di nîqaşên azad de bi hêsanî dikare were çes- pandin. Bi jiyaneke bi hev re di nava azadiyê de û ji her alî ve ban- dora vê ya dewlemendker, dikare were nîşandan. Eslê wê cudabûn, bizavek e ku neteweperestî li hember hev pêşkarî dike ye. Di vê de ne aliyek bi tenê, herdu alî jî berpirsiyar in. Jelrrkuja cudaxwaziyê, vebijarka azadî û yekîtiya demokratîk e. Bûyin û nebûyina netewe- yeke cuda û pirsgirêka yek neteweyê jî, bi

awayek zanistî pirsgirê- kek e ku bi nîqaşê were derbaskirin e. Hatin an jî nehatina kurdan a merhaleya netewebûnê, heger ku were jî xeteriya vê ya jibo tir- kan, angaşta fanatîzma neteweperestiyê ye. Ev diyar e ku, kurdan bi zorê Tirk bihesibînin, tirkan bihêz nake. Tirk yê ne bi hijmara xwe, bi aborî û demokrasiyeke pêşveçûyî bihêz bibin. Nirxandina kurdan a weke çêbûneke civakî, bêhtir ji sûdmendiya tirkan re ye. Neteweyeke Tirk ku hebûna wan pejirandî, yê bêhtir di kurdan de rêzgirtin û daxwaza yekîtiyê çêbike, lêbelê mandelekirin, qedexeya zimên û mafê perwerdeyê yê ku ji ber wan bigre, yê timî rê li ber bindestî û piçûkdîtinê veke. Jibo herdu aliyan jî, sexbêriyeke ji vê bizerartir tine.

Di vî derbarî de, weke konsensuseke hevpar, mijareke ku ez di xwazim nîşan û pêşniyar bikim, weke ku li gelek welatan tê dîtin, şêweya ku yek neteweyê bi navê welat bînin zimên e. Mînak, Swîs- ra, Belçîka, Spanya, Rûsya DYA û weke ku hê li gelek welatên din heyî, çiqas ku ziman û çand hebin bila hebin, çawa yek neteweya Swîsra, Belçîka, Spanya û DYA gengaz be, weke neteweya Tirkiye yek netewe gengaz e. Ji dêvla Tirk, neteweya Tirkiyê rastbîntir e, çêtir ahengdarî rastiya dîrokî û civakê ye. Weke çiqlên yek darê, her ziman û çandek weke çiqilekî ji yê vê darê dikarin di vê darê de cîh bigrin. Tinê hiştina heyînên çandî û çêbûnên civakî ku cîhan wan weke çavkaniya dewlemendiyekê dibîne, ne gengaz e û ti sûdmen- diyê jî nayîne. Girtina kurdan a di nav heman welatî de weke dew- lemendiyekê, yê tevkariyeke bi rastî li tirkan jî bike. Berevajî vê yê timî biguman, levdan û seferên leşkeran çavkaniya zerarên herî me- zin be. Berdana çêbûnên civakî ya bi dev bişava xwezayê ve, digel vê yekê derfet dayina nirxên çandî yên ku dixwazin pêşve biçin, di pêvajoya dîrokê de bûye trenda mirovatiyê ya bingehîn. Encex ba- werhişkên herî hişk berê xwe dane hebûnên çandî ku ji holê rakin. Di dîrokê de cîhê van jî diyar e.

Heger ku ev alozî û tevlîheviyên têgîn û nezîkayiyên şoven we-

rin terk kirin, jibo ku Kurd bibin hemwelatiyên komarê yên bi hişmend û sexlem, ti asteng namînin, çareseriya pirsgirêka Kurd jî di vê xalê de, bi nasnameya xwe ya azad û çandî bi ku tevlî hemwe- latîbûna komarê bibe re, yê destpêbike. Çareserî ne dewleta cuda, ne mandele, ne jî seferên leşkerî ne. Komara Demokratîk di her ba- betî de çêtirgirtina bi hişmendî û bi rêxistinî ya hemwelatiyên xwedî mafên wekhev û azad e. Ev jî ne cudahî ye, bi rastî jî yekîti- yeke bi biratî û jibo vê yekê sûdwergirtina wekhev a ji hemû mafan e. Di vê nêzîkayiyê de, xeteriya bila kurdî bibe zimanê fennî û di pey re federasyon wer jî tine. Hinek nêzîkayiyên şoven û netewe- perest, vê demagojiye tînin zimên. Jiber nizanin ku demokrasiyeke rast ji dewleteke cuda û ji federasyonekê çêtir e û rejhneke ku ma- fên hêjatir tîne ye, van pûçiyan didine pêş. Hêza demokrasiyan, ji behreya çareseriyên wan ên bêhempa û ji taybetiyên wan ên pêka- nîna lihevhatina koalîsyonên mezin tê. Heger demokrasî ne rejhne- ke raser be, dibe ku ji xeteriya cudabûn û federasyonê were xeber- dan. Hindikayiyek dikare vê angaşt bike. Lêbelê hatiye çespandin ku, demokrasiyeke bêkêmasî rejhneke wisa bilinde, timî hemû gel, kom û heta bi çînan jî, di asta sûdmendiya herî zêde de digire.

Êdî pêşîlêgirtina kurdên rastiya dîrokê ku bi nasnameyên xwe yên çandî, tevlî komara demokratîk bibin, ji her alî ve zor e. Di serî de ji aliyê demokratîkbûnê ve ev nayê astengkirin. Astengkirina bi demagojiya ***'An tê ji demokrasiyê biqerî, an jî tê tevlîbuna azad bi- pejirînî'*** û bi tepisandinê, paşverûtiyeke ku serdema me qet na pe- jirîne ye. Ev yek ne bi pêwîstiya hemdemiyê û ne jî bi Kemalîzmê dikare were ravekirin. Vegotineke faşîzmê ye û pêwîst e bête terk kirin. Tişta li paş bimîne, pêkanîna yekeriya welat û yekîtiya dew- letê ya bi viyana azad a gelan ku bi awayek hêzdar diyar bikin.

Di gel ku ev nêzîkayî di pêvajoya dîrokê de, li gor giyana têkili- yên tirk û kurdan e, bi taybetiyên demokratîk û mafên mirovan ên serdema me re jî di nava ahengdariyekê de ye. Heger ku bal lê we- re dayin, di vê çareseriyê de, ne ji guhertina sînoran, ne ji otonomi- yê, ne ji lîsteyeke cuda ya mafên aborî, civakî, çandî û siyasî, nayê behskirin. Yên herî pêwîst tên dîtin, girêdana rast a bi sazûmana de- mokratîk ve û devjêberdana angaştên şoven û faşîst in. Pêwîst e her kom, bêyî ku

sazûmana fennî mandele bike, nasnameya xwe ya çandî û perwerdeya xwe bijî. Derûna çareseriya demokratîk a pirs- girêka Kurd ev e. Dibe ku hinek neteweperestên Kurd, ji vê yekê ne rihet bin, bibêjin ***'ev xiyaneta li doza Kurd a sedsala ye*** ", lêbe- le eynî weke neteweperestiya şoven a neteweya serdest, vê netewe- perestiyê jî, ji dêvla çareseriyê, timî dijminatî, cudaxwazî, êş û xwî- nê û ji windayiyên daringî û menewî pê de, tiştek ne hilberandiye. Jiberku di nava gel de ti destekên wan tine ne, ber bi çareseriya de- mokratîk nayên. Jiberku otonomîtî li gor berjewendiyên wan e, ji demokrasiyê dûr dimînin.

Di van mercên herî hindik de, dema ku pêşya çareseriya demok- ratîk vebe, bi koalîsyonên guhertî, aliyên pirsgirêkê yên destûra bingehîn û zagonî jî, di nava pêvajoyê de yê bikevine rêya carese- riyê. Cîhgirtina di destûra bingehîn û zagonan de, pirsgirêka dem û têkoşîneke demokratîk e. Zû an demg yê berhemên vê werine stan- din. Planên sosyo-ekonomîk ên li gora herêmê û sazî dikarin werin damezrandin. Çalakiyên çandî û hunerî, çapemenî û weşanên bi zi- manê xwe û perwerdeyî ya bi zimanê zikmakî, mijarên ku di pey amadekariyên domdirêj re werin çareserkirin in. Ciqas ku demok- rasî bikeve rewşa çandeke jiyanê, nayê hizirîn ku ev hemû pirsgirêk neyên çareserkirin.

Ev yek diyar e ku, ev çareseriya nefspiçûk a pirsgirêka Kurd, li qasî yekerbûna Tirkiyê, yê hêzekê bide yekîtiya dewletê jî. Ji en- damdtiya YE yê heta bi têkiliyên bi Rojhilata Navîn, Kafkasan, As- ya Navîn, Balkanan û gelek dewletan re, yê di her qadê de tevkari- yeke erênî bike û girambariyekê bide qezenckirin. Tirkiye ya ku di hundir de hemû hêza xwe dabe pêşveçûna aboriyê, pirsgirêkên asa- yîşê anîbin cîh û bi hemû hemwelatiyên xwe re levhatî, nayê hizi- randin ku pêşve neçe. Dema ku Kurd bikevine rewşa hemwelatiyên birûmet, li gund û bajarên xwe bijîn, yê tevkariya çareseriyekê li pirsgirêkên bêteraziya nifûsa metropolan, tenduristî, mazinbûna zê- de û perwerdeyiyê bike. Nifûsa Kurd ku li hilberîn û bazarê vebe, bi serê xwe çavkaniyeke dewlemendiyê ye. Dive neyê jibîrkirin ku mirovê azad bêhtir hildiberîne û bêhtir berxwarinê dike. Ev jî rêya herî rast a pêşveçûnê ye. Qeyran û alozî li dera han, dabaşa xeber- danê ye ku gelek dewletên pêşketî bi şûn xwe ve bihêle û bibe hê- za pêşeng a herêmê. Di asoya vê çareseriyê de, ev rastî xuya

dikin. Mîrateya neçareserkirinê li holê xuya dike, xwîn, êş, ji her alî ve windakirin û dîsa careke din hatina xala destpêkê. Heger komara Tirkiye guman dike ku bi mandelekirina kurdan ê di dema pêşero- jê de demokratîk bibe û ji qeyranê derkeve, yê li hundir yekîtî û li derve bi hevgirtinên hêzdar bi rêya xwe de bimeşe, ji van bûyerên ku îro tê de dijî jî diyar e ku xwe dixapîne. Pêngaveke PKKê ya ku di rewşa agirbestê de ye, besî windakirina çaryeka pêşî ya sedsala 21an e. Di vê de jî kesek qezenc nake. Dibe ku Kurd hê jî bi kûrayî kesayetiya xwe têbigihîjin û pirsgirêkê hê bêhtir giran bikin. Roj yê were dîsa heman rêya çareseriyê yê xwe ferz bike.

Çiqas bêşe, ev çareseriya ku pêwîst bû di serê damezrandina komarê de pêkwere, evqasî dirêj û bi qolinc bû. Jibo welatekî û gelekî çiqas bi windakirinan barkiriye! Heçkû li qasî ku çareserî ne li derî derfetê ye, bi her alî û bi her kesî dide qezenckirin. Çima ji çarese- riyê birevin? Heger birevin, weke ku di beşên rantperest de jî tê dî- tin, evan jiyana xwe bi qeyran û şeran ve girêdane, ji kedê qutbû- ne, beşên stemkarin ku çavên wan ji qezenckirina bêxebat pêve tiş- tekî din nabîne. Lêbelê rastî nîşan didin ku êdî dawiya van jî hati- ye. Gel hişyar bûne. Dawiya lîstikê jî hatiye. Ji ber vê yekê em di- bêjin, pêvajoya pêşya me, dema ji nû ve veavabûn komara demok- ratîk û bi vê re jî çareseriya pirsgirêka Kurd a bi yekîtiya zadî ye. Bereka ku dîrok ketiyê ev e. Heger ku hinek qezayên rê yên demî çêbibin jî, mîsoger e ku yê bigihe annancê.

Dibe ku rewşa PKKê ya parastina rewa ya bi çekdarî bibe pirs- girêk. Derbaskirina vê ji ber xwestekên ku nayên cîh, nayê asteng- kirin. Bexşîneke (efû) gelemperî û nêzîkayiya xweşbînî, yê bi hê- sanî rê li ber derbaskirina vê pirsgirêkê jî vebike. Lêbelê divê ev xweş bête zanîn: Heta ku ewlekariya demokrasiyeke bi temamî ne- yê pêkanîn û fersend neyê dayîn ku gelê Kurd xwe û hebûna xwe bi azadî îfade bike, nasnameya xwe ya çandî û zimanê zikmakî pêş- ve bibe, divê neyê hizirandin ku PKK û yên mîna wê yên biqedin û belav bibin. Heta ku ev pirsgirêkên mîna çiyan hebin, timî yê rê li ber rêxistinên ku ji her rêbazê re vekirî, vebe.

Li gor espriya xweşnêrînê, pêdiviya berpirsiyariya dewletêye ku, êdî bibîne ku derbaskirina pirsgirêkê bi helwesta wê ve girê- dayî ye,

herwiha bi gihaştinî nêzîk bibe û gavan bavêje dema pozberîtiya neteweperestî, serhildan û tepisandinê bidawî bîne, bizanibe ku bi lihevhatineke demokratîk hemû pirsgirêk ên bike- vine pêvajoya çareseriyê û ya pêwîst bi cîh bîne. Dîrok, bi mîna- kên wan tije ye ku, kes, partî û dewletên ku di dema xwe de gav navêtine û pirsgirêkên xwe çareser nekirine, êş û windakirinên mezin kişandine. Tirkiye dewleta ku di dîroka xwe de, herî bêh- tir mînakên bi êş kişandî ye. Di dema osmaniyan de, heger bisî- nor be jî, gihîştibana helwesta lîberal a Ingîliztan, dibe ku pêşde- çûna dîrokê cudatirbana. Di damezrandina komarê de, weke ku M. Kemal jî liser rawestiya ye, heger ku di bereka demokrasiyê de, behreya pêşveçûnê nîşan bidana, heçku yê li qasî Japonya bi- hatana. Helwesta Tirkiye ya kevneperst a li hember pirsgirêkan, di xeteriyeke wisa de ye ku, bi şûn welatên bloka sosyalîst ên ku doh hilweşiyan ve bimîne. Jiberku li hember pirsgirêkan nêzîka- yiyên erênî pêşnexe, bi êş û windakirinên mezin dibe navê win- dakirinê. Tirkiye di gîta (gêdûk, derbend) dîrokê ya 2000an de, di ezmûna merhaleyekê de ye ku, windakirina bi evîndarbûna xe- teyan û xweberdana li ber bayê tirsê, bi ti sedeman, jibo ti kesan nikare bête ravekirin. Pêwîst e were dîtin ku li pêşya serkeftine, astengeke cidî tine, pêdivî ye li gor giyana demê û bi prensîbê wê yên bingehîn ve girêdayî were meşandin. Pêwîst e hêrsa ku ji windakirin û êşa dema borî were kirin veguherîne hêzê û qezenc- kirina pêşerojê, yê bibe dîroka ku were nivîsandin. Ev mijareke di dîrokê de gelek caran hatiye dîtin ku, welatparêzî û biratiya rastî di demên wiha de, bi kes û gelan destan dane nivîsandin. Ez dixwazim bawerî û biryariya xwe nîşan bidim ku, hêzên Tirkiyê yên berpirsiyar û azadîxwazên Kurd ên rast, bi van giyan û hê- manan ê serkeftina komara demokratîk bi hev re pêkbînin û ser-

wertiya (hikm) dîrokê yê bi vî alî de be.

**2- Li îranê Pirsgirêka Neteweyî û Çareseriya îslamtiyê ya Demokratîk**

Damezreka îranê ya pirgelî, ji destpêka dîrokê ve giranî daye rêveberiyeke bi şêweya eyaletan. Welat dabeşî çar herêmên ku xwedî bingeha etnîk û qewmî bûye. Eyaleta Farsan ji qewmê herî mezin Farsan tê holê û li Başûr û Başûrêrojhilata îranê sift bûne, naven- dên şaristaniyê pêkanîne. Li Bakurêrojhilat dera ku di dîrokê de jê re Partya tê gotin, lê îro bi gelek nasnameyên çandî, eyaleta Xora- san cîh digire. Li Başûrêrojhilat Belûcîstana ku Belûciyên ji binya- ta Aryen lê dijîn, cîh digire. Li beşekê ji ya Bakurêrojava Azerbay- cana ku gelê wê, devokeke nêzîkî Tirkî dipeyivin cîh digire. Li Ba- kurêrojava yê herî girîng, herêma kurdên ku konfederasyona Med pêkanîbûn ên xwedî baweriya Zerdeşt û Mazda ku qewmê herî nê- zîkî farsan, cîh digirin. Dema kevin bi navê Medya, îro jî bi away- ek fennî bi Kurdistan tê bi navkirin. Ev herêm ji dema selçûkiyên mezin ve, bi navê Kurdistan weke yekeyeke siyasî û rêveberî tê nir- xandin. Digel van tevan weke Xûzistana ku hindikayiya Ereb jî lê cîh digire û gelek herêmên ku ji aliyê olî û çandî ve resene mane, hene. Di dîroka îranê ya kevneşopî de, rêz ji çand û herêmên ku lê cîh digirin re, tê girtin. Mandelekirin, nîşandana bi awayekî din, an jî sexbêriyên bi şêweya bişavkirinê nayên bikaranîn.

Vê rêzdarî û nêzîkayiya rasteqînî ya li komên etnîk û qewman, li îranê di nava dîrokê de rê li ber kevneşopiya dewlemend a rê- veberiyê vekiriye. Ji her qewm û çandê, rêveber û xanedanên rê- veberiyê derketine holê. Nirx bi neteweperestî û qewmperestiye- ke zêde nayê dayîn. Rola li gor behre û dewlemendiya çandê bêh- tir xwedî derfet e. Ji împeretoriya Pers û heta bi komara îslamê ya roja me, hindik-gelek, ev resenî hatine parastin. Cama weke hatî çespandin ku şahîtiyên bêesilbûn hatine daxistin, dema ku bikevi- ne derawayeke ne xwedî behre, ji kîjan xanedaniyê an jî malbat û çandê be bila be, heger ku ev şahên herî bihêz bin jî, ji daxistina bi serhildanên gel rizgamabin.

îrana ku baweriya Mazda û kevneşopiya Zerdeşt lê bihez in, li qasî ku di dîrokê de jî zayîna herênaya Rojhilat û Rojava re navendî kiriye, hisdike bila ji binyata Rojhilat be û hisdike bila ji ya Roja- va be, di

xûnifandin û veguherandina çandên bingehîn, bawerî û nirxên etîk de, rolên dîrokî lîstiye. Kevneşopiya Mazda û ya Zer- deşt ku ji mîtolojiya Sumer a koledar bêhtir derfetê didine viyana mirov û sincê azad, mînakeke hîkarîker ji ya vê veguherînê ye. Ge- lek bawerî û felsefeyên ku navenda wan Hindistan e, bi heman şê- weyê veguherandine. Dîsa kevneşopiya şîa ku di dîroka îslamê de rola mezin lîstiye, bi çanda îranê ve girêdayî veguherîna herî mezin e ku di îslamê de hatiye pêkanîn.

Dîsa ev yek serdestî û taybetiyek e ku, bi vê şêweyê gelek kev- neşopiyên olî, felsefî û qewmî, di nava mercên xwe de, dixweze ku di vî derbarî depêngaca herî mezin bi pêkanîna îslama demokratîk bidomîne.

Ezmûna îslama demokratîk a damezraka civak û dewleta îranê, di wê rewşê de ye ku ji aliyê hemû Rojhilata Navîn û welatên îsla- mê ve bête nirxandin. Di civaka Iranê de, bi awayek sift li derketi- nên demokratîk ên kevneşopî tê rasthatin. Serdema nevîn seranser bi van derketinan derbasbûye. Eslê wê ji dema koledariya Sumer ve, li hember sazûmanên pêkutî, timî bersiva gel çêbûye. Zerdeşt, Manî, Mazdek, Huremî û Babekî, Ebû Muslimê Xorasanî, kevne- şopiya 12 îmaman û pêngava dawî ya şoreşa îslamî, xelekên sere- ke yên vê zincîra derketinên dîrokî ne. Herwiha pêngava îslamtiya demokratîk, dikare wateyê hilgire.

îslamê bi gelemperî û bi mirina Hz Mihemed re, di pêvajoya mutleqiyetê de pêşveçûye. Hestyariya demokratîk a bisînor di de- ma çar xelîfeyan de, bi serdestiya xanedaniya Emewî cîhê xwe da- ye seltenata teqez. Siltan ketiye rewşeke wisa ku ji xwedê pêde he- sêb nedin ti kesan. Berpirsiyariya li hember xwedê, şêweya nenn- kirî ya têgihîna xweda-qeranên Sumer e. Hêza xwe ji kevneşopiyê distîne. Ji ber têgihîna xwedê ku gelekî hatiye bihêzkirin, sîstemên serdema navîn, ji qeranên serdema pêşî gelekî bihêztir û serdestir in.Têgihîna xwedê ya serdema pêşî lawaz e û ji mirovan ewqasî ne dûr e. Xwedayên dema neolîtîkê jî, bi mirovan re dost û di nava hev de ne. Di serdema navîn de xweda, bi nod û neh navên erjeng û te- nê bi rewişta fennankirinê, çîn û civaka feodal a ku pêdiviya wê bi serdestî û rêzikan heyîe temsîl dike. Serdestiya siltantiyê jî, weke siya xwedê ya liser rûyê erdê -zil-ul-Allah- tê nirxandin. Mutleqi- yet bi derûna têgihîna xwedê ve girêdayî ye. Jibo dahûrandina mut- leqiyetê, dahûrandina têgihîna xwedê pêwîst e. Herwiha jibo de-

mokratîkbûna îslamê, pêwîst e ola îslamê ne ji çîna feodal a serdest re, jibo gel bibe ol. Ev yek jî pêwîst dike ku dahûrandina têgihîna xwedê ya zanistî û civakî were kirin û ji dawerbûna menewî ya ku serdestiya siltantya feodal xwe lê girtî, were derxistin.

Ravekirina ol û hebûna xwedê ya civakî, felsefî û siyasî bê tê çi wateyê, şoreşeke bîrûbaweriyê pêwîst dike. Heger em ol û xwedê bi awayek felsefî û zanistî ravenekin, demokratîkbûna îslamê ji dirûş- meyeke xapînok wêdetir naçe. Di nava rewşenbîrên Iranê û îslampe- restên demokrat de, heger bisînor be jî nîqaşeke bi vî rengî heye. Lê- belê bîrûbaweriyeke xwedî şîroveya dogmatîk a olekî bi şêweya sa- zûmana xwedê ya ji dema sumeran ve û xwedî desthilatî, weke li te- vaya cîhanê, li Iranê jî gelekî bi bandor e. Cudahiya têgihîna laîktiya pozîtîvîst a ji xwedanasiya Iranê, xweda nenasiye. Ev jî tê wateya olê pozîtîvîst. Herwiha têkoşîna bi ol re, ya di bingeha laîktiya pozîtîvîst de, di derûna xwe de çewt e û jibo demokratîkbûna civakê zêde sux- reyê nake. Serdestiya dewletê ya ji çavkaniya xwedayî, encex em bi- karibin bi dahûrandina rast a xwedanasiyê û bi danîna holê ya rewiş- ta vê desthilatiya serdest û mêtinker, ji aliyê din ve, bi sazîkirina şê- weyên serdestiyên menewî û sincî yên ku jibo gel pêdivî, bikaribin derbasbikin û demokratîk bikin. Herwiha pirsgirêka demokratîkirina îslamê ya ku li Tirkiyê rojane bûye, nîqaşeke xwedanasî û felsefeyê ya berfireh, şêweya bîrûbaweriya nû ya ku jibo gel xwedî bingeheke zanistî be û sazûmaneke sincî pêwîst dike ye. Ev mijareke kûr e û ve- guherîna bîrdoziyî, siyasî û sincî pêwîst dike. Heger ku ev neyê ki- rin, ji demagojiyeke ol û wêdetir ti wateyê îfade nake.

Heger îran nîqaşa ku di vî babetî de heyî pêşbixe, tevkariyê bi- ke ku gel li hember ol çêtirgirtina xwe ya azad, bîrûbawerî û kev- neşopiya xwe ya sincî pêkbîne, pêngava ku liser navê îslama de- mokratîk tê meşandin, dikare nirxekî mezin hilgire û yê bikaribe di Ronesansa Rojhilata Navîn de, roleke girîng bilîze. Lêbelê gelekî zor xuya dike ku, îslama feodal a kevneşopî rê bide vê yekê. Lê dî- sa nirxandina vê ezmûnê ya bi awayek baldar, liberçavgirtina weke nimûneyeke di çareseriya demokratîk de, sexbêriyeke ku cidî bête girtin e. Mîsoger e ku şîroveya îran a îslamê, ji şîroveya Ereb pêş- vetir û gelparêztir e. Lêbelê

ev bi nîqaşe ku yê çiqasî bersivê û tev- kariyê bide demokrasiya hemdem. Bi mîsogerî pêwîst e ku were ceribandin û liser navê gel qezenc werin bidestxistin. Di vê çarço- vê de, dibe ku çareseriya pirsgirêkên qewmî û neteweyî yên ku bin- geha wan a dîrokî jî heye, yê rêyeke nenntir û hêsantir bibîne. Di vî babetî de îran, ne bi dogmatîkên hişk û mandeleker e. Rewşa wê ya heyî jî, di rêya çareseriya demokratîk de, merhaleyeke girîng di- gire. Ya pêdivî, şîroveya demokrasiyê ya hemdemtir û çêkirina sen- teza mercên îranê ye. Ji vî alî ve pirsgirêka Kurd, di gihîştina şîro- veya hemdem a li Iranê û senteza îranê de, dikare rola kilît bilîze.

Tevgera Kurd a li îranê heta bi ezmûna PDKê, rewişteke feodal a eşîrperest hildigire. Ji dema Med ve, vê taybehnendiya xwe dide meşandin. Niştecîhbûna kurdan a li pesarên zaxrosan, ji aliyê me- raqdariya azadiya xwe ve, wan bi şens dike. Weke ku li parçeyên din jî tê dîtin, nêzîkayiyên emperyalîzmê yên îstismarker ên liser kurdên îranê, encamên neyînî derandine holê. Tevgerên Şêx Ubey- dulah a di dawiya sedsala 19an de û ya Smayîl Simko di çaryeka pêşî ya sedsala 20an de, ji vî alî ve hînker in. Ezmûna komara Me- habad a di bin serokatiya Qadî Muhemed de, bûye qurbanê van lîs- tikan. Rêxistina PDKê ya îranê ku rewişteke neteweperestiya hove- ber derbasnekirî, jiberku kevneşopiya îranê ne xûnifandiye û wate nedaye lîstikên herî dawî yên Rojava, ji serokê wxe yên dawî Qa- simlo jî şehîd daye. Hinek komên neteweperest û hoveber û yên çepgir, di dema şoreşa îslam a Iranê de jî nîşan dane ku, ne di wê behreyê de ne ku pirsgirêka Kurd çareser bikin. Eslê wê merc jibo pêkanîna qezenckirinên bi pêşve bikêrhatî bûn. Şensê serkeftineke çareseriya li gor berbiçaviyên îranê ku rastiyên demokratîk ên hem- dem bingeh bigire hebû. Heger ku bi derengî be jî, pirsgirêka Kurd

bi van aliyên xwe, dikare di pêngava îslama demokratîk de, çareseriyê pêkbîne. Ya rastir, di vê bingehê de xwe nû bike, yê bi çarese- riya demokratîkhim di pirsgirêka Kurd û him jî di pirsgirêkên nete- weyî yên li îranê de, roleke kilît bilîze. Irana feodal a demokratîka îslamî, dikare weke perspektîfekê û dirûşmeyekê wate qezenc bike. Bi baldaneke li rastiyên çand, siyasî û rêveberiya Iranê, bi şîrove- kirina ku çawa nonnên demokrasiya hemdem, yên bi van rastiyan ve werin temizandin bigihin sentezekê, dikare di rêya çareseriyê de, bibe gaveke girîng. Jixwe azadiya îfadeya çandî, perwerdeya bi zi- manê zikmakî û azadiya çapemenî û weşanê, bisînor be jî heye. Dî- sa rêveberiya eyaleta Kurdistan, restiyek e. Ji gel re malkirina na- veroka van têgîn û teoriyan û gihandina wan a derûneke pêşverû, ji ber vê yekê jî pêkanîna saziyên derbasdar, yê hê bêhtir rê li ber pêş- veçûnê veke. Di destûra bingehîn û zagonan de, birêkûpêkirina nî- şandana vê pêvajoyê, dikarin bînin rojevê.

Pirsgirêk hemû, bi vê ve girêdayî ye ku tevgera azadiya Kurd a li îranê, reseniya Iranê rast bixwîne, krîterên demokratîk ên hem- dem bi awayek sexlem bixûnifîne, aliyên erênî yên ku heyîn, bin- geh bigire û bi gavên nefspiçûk pêşvebibe. Bi zanîna rawestîna li hember nêzîkayiyên neteweperestiya hoveber a otonomîperestiya teng û lîstikên derve, diyar e ku yê ji aliyê rêveberiya îranê ve bêh- tir têgihaniyê (fêmdariyê) qezenc bike. Pêşxistina guftûgoya ku heyî, pêhisandina girêdana çanda Kurd a nêzîkî wan, rastdayina wateya rojane ya biratiya kevneşopî, yê bêhtir tevkariyê li çareseri- yê bike. Li şûna dema kevneperestiya hoveber a otonomîperest, de- mokratîkbûna îslamê û dema nû ya bi senteza demokrasiya hem- dem ve girêdayî, di çareseriyê de xwedî şensekî serkeftinê ye. Tev- gera azadiya Kurd a Kurdistana îranê, bikaribe di vê çarçovê de xwe nû bike, weke hêzeke bikêrhatî û bandorker bi rêxistin û bi senger bibe, yê bikaribe bibe destpêkerê demeke nû. Heger ku ji ez- mûnên tevgerên Kurd ên li perçeyên din dersan derbixe, bitaybetî ji ezmûna PKK û ji sazûmana parastina rewa ya heyî sûd werbigi- re, yê bikaribe bibe nûnerekî dema nû yê bi angaşt. Di tevaya Ira- nê de bi bersiv û tevkariya ku yê di berbiçaviya xwe de bide pên- gava demokratîka îslamî, yê hê bêhtir rê li ber pêşveçûnê

vebike.

Jiber ku zemîna heyî bi astengî û xefikan tije ye, pêwîst e ku di têgihîna xebatê, di xêzika livbaziyê û rêxistinî de, bi hestyarî û ras- teqînî were hereketkirin. Berevajî vê, bi komployên ku di dîrokê de hatine dîtin, gengaz e ku her gav derbe werin xwarin. Bi taybetî tev- gerên ciwan û jinan, di vê çarçovê de rast were nirxandin û şêwan- din, yê jibo serkeftinê derfetên girîng pêşkêş bikin. Şêwegirtina pra- tîk û bîrdoziyî ya rast a tevgera jin û ciwanan, xwedî rastiyeke me- zin e. Bi terazbûyina bi tevgerên parçeyên din re, ya ku fersendê di- de pêşveçûnên berember, ya ku di nava xwe de naxeniqe, lêbelê pê- wîstiya ku di derawayeke penaber nebe de bimîne jî girîng e.

Eslê wê li vira yê çareseriya îslamî, ya bi şêweya çareseriya de- mokratîk a Tirkiyê were jiyandin. Herwiha heger ku hevberkirina di nava herdu çareseriyan de xweş bête kirin, di çareseriya pirsgi- rêka neteweyî ya Kurd de, dikare sentezeke bilind a îslamî û şîro- veya rojava ya hemdem, were afirandin. Bi hêviya hêzdar a bi vî alî de û bi pêngavên pratîk ên zexm ku werin avêtin, bi bawerî û mi- rûzê Zerdeştî yê hemdem û Brahîmî, tevgera Med a azadî ya Kawa- yên hemdem, dikare derûna ku pêdiviya şaristaniya demokratîk pê- hewce, bide qezenckirin. Dikare tevkariyeke hêzdar li senteza dad- mend, sinc û azadiya mirovatiyê bike.

### 3- Pirsgirêka Kurd a Ereban û Çareseriya Iraqê

Cîranekî din ê girîng ku bi Kurdan re di nava hev de dijîn, Ereb in. Ereb qebîleyên Semîtîk ên ku ji çola Erebîstan derketina dawî pêkanîn e. Pêla pêşî BZ di salên 6000an de, ber bi Misir û Mezo- potamya jêrîn pêktê. Tevlî çanda vir a nû bûne û di derketina holê ya şaristaniya Misir û Sumer de, rol lîstine. Pêla semîtîk a duyemîn, BZ di salên 3000an de pêşketiye, ber bi şaristaniyên Misir û Sumer ve, weke hêza karê erzan timî herikiye. Pêla semîtîk a duyemîn BZ di salên 2000an de, di bin serokatiya serkarên bihêz ên qebîleyan de, di şaristaniya Sumer de di guherînên xanedanan de, bandorker bûye, ji vê dîrokê û pêde derbasî rêveberiya bajêr bûne.Van qebîle- yên bi navê Amorît, piştî van dîrokan pêşî Babîl û pişt re Impereto- riya Asûr pêkanîne. Ji ber pêdiviya kan û daristanan, van qebîleyên semîtîk û xanedanên ku ber bi bakur hereket

kirin, pêrgî binyata Kurd Hûrîtan tên. Li gor ku di dîrokê de hatî peytandin, ji BZ salên 2000an ve bennayiyên van herdu binyatên qebîleyan ku têkilî û na- kokiyên wan berdewam dikin, di serî de Haran û li nava Mezopo- tamya, hê jî di nava hev û din de dijîn. Têkeliyeke van qebîleyan jî, qebîleyên Îbranî yên ku Hz Brahhn pêşevaniya wan dikir e. Tê fêmkirin ku ji binyata Semîtîk û Aryen xwedî têkiliyên hevpar in. Senteza çandî ya pêşî temsîl dikin. Kevneşopiya Brahhnî vê sente- zê pêşve dibe û derketina olên mezin ên yek xweda temsîl dike.

Şaristaniya Sumer, bi giranî bi qebîleyên ji aliyê van herdu çan- dan ve, hatiye dorpêçkirin. sumeriyan, bi hevgirtinên ku bi herdu aliyan re çêkirine, ji du hezr salan bêhtir serdestiya xwe didin me- şandin. Piştî BZ salên 2000an, di bin pêkutiyên van herdu qebîle û xanedanan de, bi jevketina sumeriyan re, hê bêhtir tên hemberî hev. Di dema babîl û asûriyan de, levdana wan hê bêhtir zêde dibe. Na- vên Hûrî, Gûtî û Kasît heman binyatên çandî îfade dikin. Di derba- rê têkilî û levdanên wan de, di kevalên (tablet) babîl û asûriyan de, gelek zanîn hene. Levdanên wan ên bi Mîtanî, Ûrartû û Medan re, digihe xala bandevê. Di sala BZ 612an de, bi hilweşandina paytex- ta asûriyan a ji aliyê medan ve, demek bi dawî dibe. Dema serdes- tiya Med-Pers destpêdike.

Hz Mihemedê ku bi bîrdoziya îslamtiyê qebîleyên çolê yên dawî dike yek, pêla sêyemîn a belavbûnê dide destpêkirin. Bi şaristaniya îslamê ya mezin, Ereb dikevin derawayeke serdest. Heçku berî îs- lamtiyê Ereb, qebîleyên Rojhilata Navîn ên herî lipaş bûn. Vê de- mê Kurd û Ereb careke din dikevin nava hev. Lêbelê Asûrî û Kurd herî bêhtir di nava hev de ne û belkî jî du cîranên ku di dîrokê de yên herî domdirêj in. Asûrî ji qebîleyên Amorît ên berî derketina ereban tên. Zaravayê wan ji yê ereban cuda ye. Çanda wan ji ya ere- ben pêşdetir e. Têkiliyên ereb û kurdan, di dema emewî û ebasiyan de, gelekî pêşvediçe. Piştî hilweşîna împeretoriya Sasanî ya PZ di sala 640an de, dikevine bin bandora şaristaniya îslam a ereban. Te- beqeya Kurd a raser, di bin bandora ziman û çanda Ereb de dimîne.

Jiberku avantajan bidestbixin, xwe ji binyata Ereb û pêxember di- hesibînin. Tebeqeya binî Kurd û ya jor Ereb dimînin. Digel ku ji he- man binyatê hatine, ev cudahî berfireh dibe. Tevgerên şêx, seyîd û mele yên

Kurd, belavkirin û propagandaya ziman û çanda ereban dikin. Ziman û çanda Kurd piçûk dibînin.

Di dema serdestiya osmaniyan de, bandora Ereb lezgîniya xwe winda dike. Têkiliyên bi tirkan re, ji têkiliyên bi ereban re bêhtir suxreyê ji pêşveçûna ziman û çanda Kurd re dike. Li qasî lawaziya tirkî, teraza di têkiliyan de jî di vê de rolê dilîze.

Di sedsala 19an de Îngilîz, jibo ku rêya bazirganî ya Hindistan û çavkaniyên petrolê bixin bin kontrola xwe, li Iraqê niştecîh di- bin. Di têkiliyên kurd û ereban de, demeke nû didin destpêkirin. Ingilîz herdu aliyan li hember hev bikartîne û bi taktîka dabeş bi- ke-rêvebibe, wan bi xwe ve girê dide. Cama wî û cama yê din destek dike û rêveberiya xwe berdewam dike. Li Iraqê serdestiya ereban a li kurdan, bi saya rêveberiya îngilîzên ku piştî şerê cîha- nê yê yekem, li Iraqê hatî damezrandin e. Eynî weke li Filistînê C-ihû serdest kirine, li Iraqê jî şêx û serokên Ereb ên feodal, anîn derawayeke bihêz. Vê demê rejîmeke monarşîk damezrandiye. Ji nû ve demeke siltantiya îslamî vekiriye. Kurdên ku ev rewş ne pe- jirandine, ji destpêka sedsala 19an, dest bi serhildanan dikin. In- gilîz cama osmaniyan û cama jî şahên îranê destek dikin û van serhildanan vala derdixin. Bi taybetî serhildana Melnnûd Ber- zencî ya di sala 1920an de ku pêşveçûneke mezin kirî, di encama vê destrêjka sêbareyî de, semekeftî dibe.

Piştî şerê cîhanê yê duyemîn, weke rêxistinbûneke neteweperest a hoveber, dema PDK destpêdike. Vê rêxistina ku dixwest seroke- şîrên feodal û rewşenbîrên bajêr ên burjûvayên piçûk bikin yek, ro- leke ji pêleyîskiya emperyalîstan û hêzên herêmê wêdetir nelîstiye. Bi destekirina Sovyetan a tundrawiya burjûvayên piçûk, li Iraqê monarşî hildiweşe. Dema nû, dema bilindbûna neteweperestiya Ereb e. Dema ku çêtirgirtina sovyetan jibo neteweperestên Ereb pêkhat, PDK ya di bin serokatiya Barzanî de, ji têkçûnê rizgar na- be. Neteweperestiya burjûva ji hev tê dêran. Di sala 1975an de, di

bin serokatiya Celal Talabanî de, YNK tê damezrandin. Dema ku tevgera Kurd a Iraqê yekîtiya xwe winda kir, hê bêhtir dibe amûre- ke bikaranînê. Bandora îsrael û ya Ereb hê bêhtir pêşdikeve. Berje- wendiya teng, dibe nexweşiyeke ku tevgera Kurd bikoje. Dikevine pêvajoyeke ji qayîşkêşiya eşîrên kevin bêesiltir û hevkariyê. Di şe- rê Iraq-Iran û kendavê de, di sala 1980an de, pêvajoya bikêrhatî ku derketibû holê ne nirxandin.

Piştî sala 1990an di bin parastina DYA de û bi desteka Tirkiyê, di- kevin dema hikûmeta federal. Kevneşopiya Behdînan-Soran a cuda- hiyê, rê li ber du rêveberiyên cihêreng vedike. Vê demê bi esasî li- ser PKKê dilîzin û di qezenckirina berjewendiyên polîtîk, leşkerî, dîplomatîk û daringî de, navbereke mezin derbasdikin. Ji berdêla van berjewendiyan, di nîşandan û dûrkirina serokatiya PKKê de, ro- la bingehîn dilîzin. Digel ku merc gelekî bikêrhatîbûn jî, pirsgirêka Kurd a li Iraqê, ji çareseriyê dûr e. Rêveberiyên Kurd, heta bi qirka xwe li pey berjewendiyên takekesî û çalakiya xanedaniyê ne. Ji xe- bateke demokratîk a di nava xwe de, bêpar in. Carekê hikûmeteke Kurd a federal, nayê pêkanîn. Di polîtîkayên DYE û Ingîltere yên li hember Sadam de, weke serê berên hatine rawestandin. Tirkiye jî ji- bo ku çalakiyên PKKê asteng bike, bi pêwana hêza çakûç, çavdêrî û venêrana xwe zêde dike. Li hember vê yekê, PKKê xwe li qada çi- yê girtiye û çalakiyên xwe didomîne. Ji sala 1990an heta ji sala 1986an ve, digel desteka PDK û YNKê jî, gengaz nebûye ku Tirki- ye berxwedana PKKê bişkîne. Iran jî bi guftûgoya ku bi hemû ali- yan re dimeşîne, nave ku dev ji vê mijarê berde.

Kurdistana Başûr, bi rewşa xwe ya niha, Libnan bûneke duyemîn, heta statuyeke weke levdana îsrael û Filistînê dijî. Rewşa kilîtbûna piralî ye. Hêzên cîhanê, herêmê û yên cîgeyî ketine nava hev. Rê li ber rewşeke ji levdana îsrael û Filistîn tevlîhevtir vekirine. Ne bi ge- lemperî liser Iraqê û ne jî liser çareseriyeke statuya kurdan, ti rewşên diyar derketine holê. DYE û Ingîltere hewl didin ku Sadam daxin, lê aliyê cîhanê yên din, nabine alîgirê vê yekê. Ambargoya YN erka xwe winda kiriye. Di vê bingehê de, tevlîheviyek berdewam dike.

Ev diyar e ku çareseriya pirsgirêkên li Iraqê, yê di du eniyan de

pêşvebiçin: Ya yekemîn, platfonna YN ye. DYA yê YN yan bikar- bîne û rejîmê bixe tengahiyê, di hundir de jî yê Kurdan û Kongreta Neteweyî ya Iraqê bikarbîne û bixwaze ku Yugoslawyake nû bafi- rîne. Rêveberiya Bush a nû di vê mijarê de bi israr e. Îsraîl jî ji dest- pêkê ve di vî karî de çalak e. Tirkiye hê bêhtir bi kûrayî, bi hemû aliyan re û liser her dibêtiyê hesabên xwe dike, tevgera tirkmenan weke amûreke destekariyê tekûz dike. Iran bi şîiyên nava Iraqê û hevkarên xwe yên nava kurdan re, di derawaya ku hêza xwe bide domandin de ye. Ewropa, Rûsya, Çîn û welatên Ereb ên din jî, di nava meseleyê de ne. Ev hemû hêz, liser çareseriyeke di nava Ira- qeke yekere de lihev dikin. Lêbelê jiberku DYA Sadam naxwaze, çareseriya bi vî rengî û nonnalbûyinê, asteng dike. Çareseriyeke bi vî rengî di asoyê re xuya nake.

Duyem, rejhna Iraqê jî di nav de, çareseriyeke demokratîk a hê- zên hundirîn ku di navbera xwe de pêkbînin e. Lêbelê di serî de re- jhn, damezraka hemû hêzan a ji demokrasiyê dûr, derfetê nadine çareseriyeke demokratîk. Heçku Iraqa demokratîkbûyî, veguherî- neke ku rola wê ya dîrokî û herêmî gelekî mezin e. Di demokratîk- bûna Rojhilata Navîn de, di çareserkirina hemû pirsgirêkên nete- weyî, etnîk, olî û çandî yên di nava aştiyê de, yê bûbana pêngave- ke mezin. Di çareseriyeke bi vî rengî de, pêwîst bû ku Kurd rola pê- şevaniyê bileyîzin. Dikarîbûn rêveberiyên federe ku piçûk neyên girtin bikin yek û Rêveberiya Federe a Kurdistana Demokratîk pêk- bînin. Dikarîbûn bi hêza xwe ya derûn ve girêdayî, bi rejhna Iraqê re di nava federasyoneke demokratîk de, heger ev zor be, bi destû- reke bingehîn a ewlekar ku jibo tevaya Iraqê derbasdar be, liser ko- mareke demokratîk lihev bikin. Careseriyeke ku hemû çand û zi- manan nas bike û vê di nava destûra bingehîn de garantî bike, der- feteke ku neyê piçukgirtin e. Di mercên Iraqê de, Iraqeke demokra- tîk ku bi ewlekarî, di çareseriya gurîfa pirsgirêkan de, pêngaveke mezin e. Di avêtina gaveke wiha de, rola kurdan a bêşikî ye. Sero- katiya feodal û burjûva, ligor berjewendiyên çînî, newêre gavên bi vî rengî bavêje. Helwesta wan ku pirsgirêkê li gor berjewendiyên çînî çareser bikin û berjewendiyên gel li ber çavan negirin. Ji giya- na lihevkirina demokratîk bêpar in. Bêyî ku dest bidin derûna rejî- mê, dîsa li Kurdistan bêyî ku pêvajoya demokratîk bidin xebitan- din, dixwazin ku

otonomîperestiya Kurd û komareke Iraqê ya ser- dest lihev bînin. Li dûv çareseriyeke ne demokratîk in. Lihevneki- rina wan a bi PKKê re, li tevaya Kurdistan, di vê bingehê de ye. Di- hizirin ku vekirineke demokratîk ê dawiya wan bîne. Jibo ku vê pê- vajoyê asteng bikin, li her qadê hewl didin ku eniyên li dij PKKê zindî bigirin. Ne ew hewl didin ku pirsgirêkê çareser bikin û ne jî dixwazin ku hêzên gel di warê çareseriyê de, însiyatîfekê bidest bê- xin. Pozisyona wê ew e ku bi berjewendiyên ku bi dest xistine, he- ta bi dera ku bikaribe biçe. Kudandina wan a li pey lêgerîn û pêva- joyên nû li dera han, astengkirina pêşveçûnên di vî derbarî de, ji xwe re dikin bingeh. Ji pêncîh salan zêdetir e ku pirsgirêka Kurd di xwe de kilît kiriye, jibo berjewendiyên xwe ku bidestxistine bipa- rêze, xiyanet jî di nav de, bi israr dikeve nava hemû sexbêriyan.

Lêbelê jiyan li hember van hewldanên kevneperest û paşverû ra- naweste. Qeyrana ku tê jiyandin, weke li tevaya Iraqê, li Kurdista- na Iraqê jî, yê rêyên nû yên çareseriyê di rojevê de bigire. Jixwe pirsgirêkeke ku timî rojeva cîhanê digire, bê hilberandina çareseri- yan wiha berdewam nake. Dibêtiya derfetên çareseriyê yê timî der- kevin holê. Herwiha ji ber hemû dibêtiyên pêşveçûnan, girînge ku di nava amadekariyên bi altematîf de bin.

Ji ber vê yekê derawaya PKKê, di hilberîna çareseriyan de, ji be- rê zêdetir rola katalîzorê didomîne. Ev mijareke domdirêj ê di roje- vê de ye ku, PKK weke partiyeke Kurdistana Başûr were berbiçav- kirin. PKK ji xwe bi tevlîbûna hezaran û şehîdên xwe, ketiye rew- şa partiya gelê Başûr. Nîşandana weke hêzeke ji derve, ji ber pro- pagandaya hêzên hevkar ên ku bi hemû awayî didin meşandin e. Pêwîst e ku PKK ji van hemûkan bêhtir xwe hêza qadê ya herî rast bide nîşandan, di warê siyasî, leşkerî, civakî û çandî de, senger bi- gire û pratîk bike. Pêwîst e di rêveberiya federe ya demokratîk a Kurd de, bi israr be. Heger ku PDK û YNK werin vê yekê bi wan re, yek neyê bi yê din re, ew jî ne gengaz be bi hewldanên xwe yên derûn, li qadên ku çalak çêbûna demokratîk lezgîn û tekûz bike.Di tevaya Iraqê de bi komên etnîk, olî û çandî re, di pêkhatina eniye- ke demokratîk de, rolê bilîze,di nava kurdan de jî, rêveberiya fede- re ya demokratîk bi israr bilind bike. Bi kûrayî û

berfirehî, bost bi bost bike ku mezin bibe. Pêwîst e ji nû ve veavabûna komara de- mokratîk a Iraqê û di vê de cîhgirtina derawaya federe ya Kurd a demokratîk, weke çareseriya herî rast, rejhn jî di nav de, bibin ji hemû kom, partî, eşîr û yekîtiyên eniyan û di çareseriya demokra- tîk de bi israr bin.

Hemû mercên der û hundir, veguherîna Iraqê ya demokratîk lê- ferz dikin. Dibêtiyeke pêşveçûna bi şêweya Yugoslawya heye. Lêbelê pêwîst e were dîtin ku rewşa heyî timî bi guherînan were derbaskirin, pêşgiriyên çareseriyê yên bi her awayî werin pêşve- birin. Pêngavên leşkerî û siyasî, bi çêkirina nirxandinên heroj, bi pêş ve, bi paşve an jî bi kûrayî û berfirehî werin avêtin. Amade- kariyên bi altematîf pêwîst in ku bi dibêtiyên herî neyînî, rewşa rejhnê ya heyî were guhertin, bi hevkarên Kurd re bibin yek û hê- rîş bikin. Digel vê yekê, şêweya dema nû ya xebat, jiyan û têko- şînê, bi awayek çalak di serî de perwerde, di her warî de bi disip- lîneke raser serdest were girtin. Pêwîst e mezinbûnên çendanî û çawanî, hemû hêrîşan pêşwazî bike û bikaribe bi hewldanên hem- ber bersivê bide. Pêwîst e weke pêdiviyeke berpirsiyariya jibo ge- lê di nava zoriyê de, jibo hevalên di girtîgehê de, dîsa jibo xazî û şehîdan, tişta ku were ser wan bi awayek serkeftî bînin cîh. Weke qadeke ku herî bêhtir êş û xwîn lê herikî, bêyî ku xwe bavêje pişt hinek sedeman, pêwîst e jibo hêviyên çareseriyê bersivan bafirî- nin. PKK jî di nav de, tevgera li Kurdistan rola xwe ya dîrokî li tevaya Kurdistan û Rojhilata Navîn bilîze, neteweperestiya hove- ber û neteweperestiya burjûva serdest derbas bike, ji heqê asten- giyên malbat û eşîrên paşverû derkeve, weke şaristaniya ku di de- ma elindê (berbang) de ye, rola hilatina şaristaniya demokratîk a li Rojhilata Navîn, bi serkeftin bîne cîh, herwiha bibe destpêkerê dema nû, serdemê û vê rûmetê hilgire, hêja ye her tiştî. Kesên ku bi van têgihîn û rûmeta dîrokî bijîn, ne gengaz e ku çi tişta dest bavêjinê çareser nekin. Sedema jiyana me, ecibandina pêşveçûna

dîrokê ya di vî alî de û bendewariya serfiraziyê ye.

**4- Bidestxistina Nasnameyan a Kurdên Sûrî û Çareseriya Tevkariya Demokratîk**

Herçiqas ku niçikên Ereban (Asûriyan) yên ku dirêjî nava Kurdan bûbin hene, perçeyên Kurdan jî yen ku dirêjî nava Ereban bûne he- ne. Di serê van de Kurdên Sûrî tên, weke erdnîgarî û çandî perçeyên wiha derdixine holê. Di pêvajoya dîrokê de, di nava hemû gelan de, dirêjbûna bi vî rengî û ketina nava hev tê jiyandin. Tevaya cîhanê, bi taybetî Asya û Ewropa, bi awayek sift pêrgî van pirsgirêkên wiha hatine. Nêzîkayiyên neteweperest, derawayên hindikayiyan ên bi vî rengî kirine sedema şidetê û rê li ber gelek şeran vekirine. Bi rûniş- tina sazûmana demokratîk re, pirsgirêkên bi vî rengî di nava heman dewlet û welatî de, çanda hindikayiyan hatiye nasîn, tevkariya wan a demokratîk, weke mafê mirovan ê bingehîn û mijara destûra bin- gehîn hatiye dîtin û bi serkeftin hatiye çareserkirin.

Beşeke girîng ji kurdên Sûriye, ji ber serhildan, levdanên eşîran û bêzagoniyên di pêvajoya dîrokê de, xwedî taybetiyeke ku ji qa- dên cuda hatine cem hev in. Dîrok nîşan dide ku, ji derketina Hz Brahîm a ji Rihayê heta bi derketina PKK ya dawî, belavbûneke bi vî rengî di serî de Sûrye heta bi Rojhalata Derya Spî, koçber û sift bûne. Ereb û Asûrî jî ji ber heman sedeman, ji ber zêdebûna ger- mayî û bazirganiyê, ber bi nava Kurdistan û Anatolyayê koçber bû- ne. Tê çavdêrîkirin ku di dîrokê de bi awayek sift koçberiyên bi vê şêweyê pêkhatine û danûstandinên çandî û bazirganî li hember hev hatine kirin. Erkeke van a girîng ku di navbera çandan de guherîn û veguherînan jî dike heye. Tê dîtin ku vê dawiyê Ennen û Tirkmen jî tevlî vê pêvajoyê dibin. Herwiha pirengiyeke dewlemend a zi- man, ol û çandan derdikeve holê. Esasê wê Sûriye, welatekî ku bi vê dewlemendiyê şêwe girtî ye. Ji ber vê çêbûna wê ya dîrokî ye ku dorhêleke bikêrhatî ya jibo lihevkirineke demokratîk û xweşnêrîn pêşkêş dike. Hemû komên li Sûriyê, herwiha Kurd jî, di çarçova van rastiyên dîrokî de, pirsgirêkên bingeh, nasnameya çandî bipa- rêzin û pêşvebibin, perwerdeya bi zimanê zikmakî, mafê çapamenî û weşanê, tevlîbûna jiyana siyasî a weke hemwelatiyên azad û wek- hev ku derbasî jiyanê bikin, yê çareseriyekê pekbînin.

Herçiqas ku hinek azadiyên bi vî rengî hatine naskirin jî, gelek pirsgirêkên wan hê li benda çareseriyê ne. Evan hemwelatî, perwer- deya bi zimanê zikmakî, mafên çapemenî-weşan û mijarên di der- barê mafên siyasî de ne. Digel ku astengiyeke tûnd tine jî, jibo bi- karanîna bi ewlekarî ya van mafan, statuyeke zagonî pêwîst e. Tê- koşîna zagonî ya bi serkeftin bi encam bibe, qezenceke demokratîk a girîng e, yê jibo demokratîkbûna Sûriye jî, tevkariyeke mezin bi- ke. Girseyeke sempatîzanên PKKê ya mezin li herêmê heye. Pey- wira vê girseyê ya bingeh ev e ku, di nava çarçova van mafên za- gonî de, bi bemameyeke demokratîk, bi rêxistiniya zagonî û têko- şîna xwe, bi hewldanên Sûriye yên welatparêzî û demokratîkbûnê re bike yek û bi têkoşîna azadiya dayîkniştimana xwe ku jê hatin re, di nava destek û alîkariyê de bin.

Hemû kurdên ku ji ber sedemên curbicur li tevaya cîhanê be- lavbûne, peywir û berpirsiyariya wan a di heman bingehê de he- ye. Di serî de kurdên ku koçberî metropolên welatên ku lê dijîn bûne, kurdên ku li her welatî dijîn, pêdiviye ku heyînên xwe yên çandî biparêzin, hemwelatbûnê qezenc bikin, perwerdeya bi zi- manê dayîkê, çapemenî û weşan, di bingeha pîvanên mafên miro- van û demokrasiyê de, bi awayekî çalak tevlî jiyana siyasî bibin û di vî babetî de, maf û peywirên xwe bi serkeftin pêkbînin. Ji ber vê yekê pêwîst e di serî de huner û di mijarên civakî, sportîf, per- werde û teknîkê de, xwe bigihînin û heyîna xwe ya çandî bi jiya- neke çalak biparêzin û pêşve bibin. Di vê bingehê de, divê ku bi gelên din re birûmet, di bingeheke azadî û wekhevî de, têbikoşin û jiyanê parve bikin. Li gor hêza xwe destek û piştgiriyê bidin tê- koşîna azadiya li welatê xwe.

Xala dawî, pirsgirêka yekîtiya hemû kurdan e. Dema kevin, bi awayek sift dirûşmeya Kurdistaneke serbixwe, yekgirtî û sosyalîst dihat gotin. Ev dirûşmeya ku ji neteweperestiyê dihat, him ji aliyê bîrdoziyî ve û him jî ji aliyê polîtîk û pratîk ve, ne rastbînî ye. Her- çiqas ku weke utopîk li guh xweş were jî, ya rastir dirûşmeya we- latparêzî û entemasyonalîzmê ye. Li gor her welat û dewleta ku li- ser axa wê, ev herdu dirûşme “Welatê Demokratîk, Dayiknîştima- na Azad”, ji aliyê tevaya Rojhilata Navîn ve “Rojhilata Navîn a De- mokratîk, Dayîknîştimana Hevgirtî” , jibo hemû gelên Rojhilata Navîn derbasdar

in. Ereb dabeşî zêdeyî bîst perçeyan bûne. Parçe- bûna tirkan jî berfireh e. îran jî xwe di nava perçebûneke bi vî rengî de dibîne. Pêrçebûna kurdan di berfirehiyeke cihereng de ye û re- seniyeke wê ya cihêreng heye. Her parçeyekî gel ku dabeş bûyî, bi serê xwe jibo netewe û welatekî şer bike, wê hinge Rojhilata Navîn ê seranser bibe qada şer. Bi cudahiya olî, erdnîgarî û civakî yê hê bêhtir dabeş bibe û bikeve rewşeke ku ji nav neyê derketin. Her ali- yê wê yê bibe mîna levdana îsrael û Filistîn. Jixwe têgihînên yeke- riya welat û neteweyan ji neteweperestiyê derketine û rê li ber du- sed salên herî bixwîn, şerên sedsalên 19 û 20an vekirine. Bi rêbaza neteweperestiyê, li Rojhilata Navîn navtêdanên levdanê, yê were wateya ku sedsala 21an seranser bi şer, qirkirin û nijadkûjiyan tije be. Herwiha ev yek ne li welatparêzî, ne li entemasyonalîzm û ne jî li humanîzmê tê.

Ya rast ev e ku sînorên siyasî ên Rojhilata Navîn weke dane bin- geh werin girtin û hemû welatan di nava yekeriya dewleta wan de, bi têkoşîneke demokrasî, wekheviya maf û yekîtiya azad pêkbînin. Her welatê ku demokratîk bibe, yê bibe gaveke din a demokratîk- bûna Rojhilata Navîn. Rojhilata Navîn a demokratîk jî, yê bi xwe re bi saziyeke weke YE yê bersivê bide yekîtiyeke azad a hemû ge- lan. Pêşveçûnên li nav dewletên Tirkiyê û ereban, vê meyldariya bi vî rengî rast derdixin.

Hatiye çespandin ku rêbazên Panturkîzma Enwer Paşa û Panara- bîzma Cemal Evdilnasir, serencperest û ji rastbîniyê bêpar in.

Rola bêhempa ya ku dîrokê jibo kurdan bi derfet kiriye, her par- çe bi rêya çareseriyeke demokratîk, dewleta ku di nav de bikşîne nava şaristaniya demokratîk. Ev rê, rêyeke herî bikêrhatî, rastbînî û bi wate ye ku, bigihîjin Rojhilata Navîn a demokratîk û şaristaniyê, kevneşopiya herêmê ya dîrokî û rastiyên erdnîgarî, aborî û civakî.

Di encamê de, pirsgirêka Kurd ji pirsgirêkeke ku bi nêzîkayî û rêbazên serdema neteweperest were çareserkirin, derketiye. Nete- weperestiya ku Şoraşa Fransiz bilind kirî, nezîkayiyeke bîrdoziyî ye ku çîna burjûva li hebûna netew û pirsgirêkên pê ve girêdayî di- sepand. Di derketina holê ya dewletên neteweyî de, di tepisandina demokrasî û têkoşîna çînan de, di gewixandina gelan de, di levda- nên etnîk de û

polîtîkayên metingehî de, rola bîrdoziyî ya bingeh lîstiye. Di derbasbûyina sedsalên 19 û 20an ên bixwîn de, para şo- ven a neteweperestên burjûva diyarker e. Ewropa ku çavkaniya vê hilatinê, bi dersên ku ji van şeran girtî, di pêncîh salên dawiya sed- sala 20an de, neteweperestiyê têxe pilana duyemîn û di sazûmana siyasî de, krîterên demokratîk bingeh girtine, Sazûmana demokra- tîk, sosyalîzma reel jî di nav de, li hember hemû sazûmanên siyasî serdestiya xwe çespandiye, di dawiya sedsala 20an de, bi jevketina sosyalîzma reel re, di cîhanê de bûye sazûmana sereke.

Di pirsgirêka Kurd de, hem neteweperestiya neteweya serdest û him jî neteweperestiya cîgeyî ya hoveber, ji kûrkirina neçareseriyê û ji êxistina dewletê ya nava astengiyan wêdetir nebûne xwedî ro- leke din. Israra di van nêzîkayî û rêbazan de, kûrbûna qeyranan, serhildan, tepisandin û komkûjî ne. Ev herdu cureyên neteweperes- tiyê, bi pêşveçûna şaristaniya demokratîk a hemdem re nakok dibin û dikevine derawayeke bîrdoziyên paşverû yen ji sedsala I9an ma- yin. Ev rastbînî, datînin holê ku, pêwîst e jibo pirsgirêka Kurd, krî- terên şaristaniya demokratîk a hemdem, bingeh werin girtin. Kurd di vê dema nû ya dîroka xwe de, di derawayeke xwedî têkoşîn de ne ku, bi rola pireke di navbera sê neteweyên Rojhilata Navîn de, bi mercên erdnîgarî, dîrokî û civakî, him rizgariya xwe pêkbîne û him jî gelên cîran têxe nava pêvajoya çareseriya demokratîk. Bêyî ku bikevin neva gewixandinên sînoran ên bixwîn, bi têkoşîna de- mokrasiyê ku li her perçeyî qezenc bike, bi pêkanîna yekîtiya rast a gelên Rojhilata Navîn, biratî û azadiya wan, di rewşa ewlekariya bingeh a serkeftinê de ne.

# BEŞA HEFTEM

# Bûyîna Şervanê Azadîyê ya Gelê di Dorpêça Komployê de

## Destpêk

Dahûrandina esehiya komploya Abdullah Ocalan, ji aliyê tegihîştina trajêdiya gelê ku ji çar aliyan ve hatî dorpêçkirin û di nav de xayînên wî pir ve, gelekî hînker e. Ev yek yê nêzîkayiyeke teng be ku berpirsiyarî tenê ji basîtbûna dostan û lawaziya rêheva- lan be. Ravekirina vê komployê ya weke destekariyeke hnperyalîz- mê, ya herî raser jî, yê nebe vegotineke bi têrayî ku mirov pê rihet bibe.

Li benda min bûn ku ez liser mijarê sift bibim. Min wisa kir. Ci- qas ku min wiha kir jî, min dît ku dîrok zindî dibe û pêl bi pêl bi ser min de tê. Sedemên bingehîn zindî dibûn. Heger ez li derve hezar salan bijiyama jî, hebûnên ku ez fêm nekim, yeko yeko wate qe- zenc dikirin. Tenê ne zimanê zikmakî û mantiqê civakê, min dika- rîbû ez zimanê tevaya xwezayê jî bi rihetî dahûrînim. Min fêm di- kir ku rastiya jê re efsane dihat gotin, korî ya ku jê re digotin ras- tiya rojane ye. Çiqas min fem dikir ku, mirovê pêşî çawa dest bi meşê kiriye, dilopa pêşî ya wateyê, çêbûna peyvekê ya mucîzeyî, coşbûna bi yekem çar çandina dexlê ku dihat wateya cejnê, dosta- niya ajalan ku ewlekarî dida, hêzên xwezayî ku dikirin xweda,

xweterîfkirina civakê ya pêşî ku çavkaniya her şêweya xwedayî,

dilpakiya dayîka xwedawend, li dora wê şoreşa jiyanê ya mezin a bi raçandin, bi xaniyên kerpîç û kevir, bi aşikên destan û bi tevrik, ez ji qehra komploya ku sala dawiya sedsala 20an ji min re amade kirî, rizgar dibûm. Ez karê têgihîştinê hê jî pêşvedibim. Min dest bi dahûrandina wateya gera xwe ya beradayî û mîna gêjan a liser xa- ka ku ez lê çêbûbûm jî, kiribû. Min sedema bazdana xwe ya çiyê, weke hespekî ku ji axûr bireve û nirxê dayika xwe ya ku sê caran ez nîv dardekirî dikirim jî, fem kiribûn. Dayika min a ku min ew nezan didît ya ku herî baş ez fêm kiribûm minê ji vê peyva wê: “77 *kes tevlî vê xebata te ya bi vî rengî nabe, herkes yê ji te sûd bigirin û tê bi tenê bimîne”* fem bikira. Hê temenê min deh sal bûn. Diha- te bîra min ku, bêyî li xwe bi zivirim min gotibû dayîka xwe: *“Bi- la be, ez bi biryarim ku bi tenê bimeşim.* **”** Dema min xwe wiha fêm dikir, min axa ku ez lê çêbûbûm dadihûrand. Dema ku sedsala 20an ji vî alî û alyê din ve, bi hemû giraniya xwe hate bi ser min de, mi- nê fem bikira bê çima tolê ji min digire. Ciqas min fêm dikir ku ez li hember herîşeke weke ya rahîbê Sumer ku hêrîşî dewleta afirandî û xaka dayîka xwedawend a berhemdar dikir bûm, min didît ku ez bixwe jî ji xwe direvim û bi şûn ve ji çend dilopên wateyê pêve tiş- tek nemaye. Minê fêm bikira ku, weke Gilgamêş ez li pey jiyana bêmirinê me, lêbele ji dema wî bi milyonan zêdetir bi hêzên miri- nê re rûbirû me, Ezê têbigihîştama ku ji çar aliyan ve mîna hêrîşî navendê bikin, ji mêjde xwe amade kirine û jiyana xwe bi vê yekê ve girêdane. Minê fêm bikira ku, cinawirê bi navê şaristaniyê çiqas mezin dibe, mirov jî dibe ajalê herî xetemak. Minê fêm bikira ku, xwedayen di mîtolojiyên rahîban de çawa xwediyên sazûmanê yên koledar û pelos (zişt) in. Ezê tebigihîştama ku, pêxemberên kalikê me Brahîmî bi avêtina van xwedayan a ji ezmanan û wir ve, ol-wij- dan afîrandine. Lêbelê minê bi şanazî baweriya xwe mîsoger biki- ra ku, tişta bi navê ***îlah, Ellah, Allah,*** eynî weke çêkirina Babîl-Su- mer, afirînerên sazûmana koledariyê ne. Çiqas min fêmkir ku, ev xwedayên tirsê yên hatine afirandin, hêzên hewl didan ku hê di deh saliya min de min dîl bigirin in, cara yekem min bi vê têgihînê rêz-

dariya xwe ji xwe re qezenc kir. Meraqa min a liser perestgehên rahîbên Sumer gelekî zêde dibû. Liser van perestgehan ez gihame vê daraza mîsoger: Xwediyên sazûmana koledar dikin xweda û dişînin ezmanan û wan bilind dikin, mirovên benî li bin erdan dişînine he- mû kar û suxreyên giran, dewleta ku dawera çînçînîbûna mirovan, tê afirandin û li holê tê çikandin û perestgeh jî malzaroka vî karî ne. Minê bidîta ku, karê kirine çi erjeng e, dahênana herî mezin afiran- dine, tevaya dîrokê, roja me û min bi xwe jî, pê kontrol dikin. Êdî ez gumanan nakim ku tişta dibêjin karê xwedê ye, ev yek e. Bi fêm- kirina ku min dizanîbû xwedayên min kî ne, ez rihet bûbûm. Jiber- ku min bi cidîtî bawer nekiribû û min ji wan re perstîş nekiribû, mi- nê maf bidana xwe û ji xwe re rêz bigirtana.

Navê min Abdullah, ango ‘beniyê xwedê’, lêbelê min wisa ba- werî dabû xwe ku, ez benîtiyê li dilê xwe rûnenînim û ji xwe re gi- ramgir bim, herwiha ew hêzên xwedayî çiqas werin bi ser min de bila werin, dilpakiya herî mezin yê parastina mirovê azad be. Ez ji nûve hê bihêztir ji dayik dibûm. Li hember welidandina dayika xwe ya ku min ne deciband û hewldanên welidandina modemîte ya ku baweriya min bi cidîtiya wê nayê, piştî hemû kûştinan, ez welidan- dina sêyem a xwe bi xwe cidî digirim û pê kêfxweş dibim. Min dî- sa pêdivî bi hevaltiya yên jiyiyane ne didît. Min hemû hevalên xwe di efsaneyan di didîtin. Dema ku min komploya Zeus a ku li Pro- mete û Hektor kirî û zarokên wî yên Atîna ku di roja me de kirin weke hev dîtin, min hevalên xwe çêtir nasdikirin. Hevaltiya bi Pro- mete û Hektor re gelekî bi rûmet bû. Vê yekê şanazî dida min.

Min rahîbên Sumer ku dayîka min a xwedawend û jina evînê îştar biribûn perestgehê û ji wir biribûn seraya qeran cem xweda- qeranan û bi wan re bi awayek giyandar kiribûn tirbê, xweş fêm ki- ribû. Heger ku xweda-qeran bin jî, min qet nepejirandiye ku jinê li- ser sifreya ziyafetê bikin parçeyek ji zewqa xwe. Lêbelê min fêm kiribû ku, dayika min a xwedawend û jina evînê heta weke roja îro- yîn dirhem bi dirhem mêtine û xwarine, kizmika (armûşk) wan jî weke zewaca du serî, jibo deng nekin avêtine ber mêrên kole. We- ke mêrekî ku min ev diyarî bi dilê xwe nedan pejirandin û çiqa min bawer kir ku ezê bibim lawekî dayîka xwedawend û jina evînê yê baş, hê bêhtir ez bi kêfxweşî û şanaziyê tije

dibûm. Min cara yekem axa dayîkê di kûraya dîrokê de fêm dikir, nakokiyên ku ji hezar sa- lan ve mîna girêkan hatibûn gelicandin vedikirin û min fêm dikir ku çêbûna min a vê carê bi wate ye. Ez dixwazim vê mesajê bidim dostan ku, li hember yên ku mirin li min ferzkirin, tevaya sedsala 20an, tevaya komplokeran û kî dibin bila bibin, tirûşdar qewîn) bim. Min hemû lîstikên wan fêm kiribûn ku, dixwazin min weke pakêtek bombeyên ji ya Hîroşhna xetemaktir bikin û bavêjin ser gelên me, min bi jêkirina kartikên (phn) wan bombeyan û bi avêtina kereseyên wan a ser rûyê bombevanan, xwe rihet kir. Ez alîgirê mirovan bûm, xwedayên zorker careke din têkçûbûn.

Diyalektîka gelê Kurd a dîrokî, bi rizgarbûna ji nava çembereke dorpêçkirî ve girêdayî ye. Ji şaristaniya Sumer heta bi sazûmana navnetewî ya roja me, xwestine ku hebûna Kurd di nava destrêjkê de dîl bigirin û bihelînin, hêzên serdest jibo ku li welatê wan sazû- mana ku bixwazin pêkbînin, wan weke kereseyekê bikartînin. De- ma ku gelê Kurd li hember vê statuyê derdikeve, xwediyên sazû- manê dezgeh dixebitînin, lêdixin, dikûjin, yên ku man jî digirin û hinekan jî bi bîrçîhiştinê hîn dikin, dîsa di statuya ku dixwazin de wan ditepisînin.

Me bigelemperî dîroka şaristaniyê û cîhê kurdan ê di nava vê dî- rokê de, jibo dîlgirtina di nava vê çemberê de rave bikin, li ber ça- van raxist, ez dubare nakim. Bi taybetî dîroka dused salên dawî, bi rastî jî dîroka komployên herî rezîl in. Komplokerî bûye navê siya- seta bi hostayî û dîplomasiyê. Birastî jî, weke gel yên ku bi dostîtî nêzîkî wan bibin, li qasî em bibêjin tinene, kêm in. Yên ku di wê angaştê de ne ku nûnertiya gel dikin, bi zirara ku didine xwe û gel, ji komplokerên hişmend ne paşdetir in. Sazûmanê bi spartekên xwe yên derû hundir, komlokerî kiriye mîna rêbazeke jiyanê. Ev weke nexweşiyeke vegirtinê di rewşeke belavbûnê de ye.

Hê dema ku ez li Enqerayê, tevgera çep ku pêwîst bû bibe nûnerê wekhevî, azadî û rûmeta mirovan, di kesayetiya me de xortên kurdan weke amûreke basît a taktîkê bikartanî. Ji niçika taktîkên çîna serdest ên ku hinekî hatibûn tenikirin wêdetir nediçûn. Dema ku vê rewşê rê li ber vebizavan vedikir, weke qedera hebûn û pirsgirêka Kurd bû ku têkevin nava komployên berfireh. Temenê şervanekî azadiyê yê di- rist, ne bi salan, ku kcvir bihelê, bi çend heyvan bi sînor bû. Hê ne ketî tora

dewletê, tora kevneşopiyê, ya niçikên rojane û çi bi hiş- mendî û çi xafil, tora qaşo dost û rêhevalan, ew tine dikirin.

Hinekî bi têgihînî û hinekî jî bi şensê xwe, dema ku bi angaşta şervanekî azadiyê me xwe avête Rojhilata Navîn, di dorhêla ku nû em ketibûnê de, em bi rastiyên hunera komplo ya di asta pispori- yê de, rûbirû hatin. Em hatibûne navbera Şam-Bêrûd û Heleba ku bazirganî weke giyan û organîzasyonekê lê çêbûyî. Siyaset şêwe- yeke bazirganiyê ya kubartir bû. Her tişt weke di bazirganiyê de, ji aliyê siyasî ve bê yê bi çend diravan werin, dihate pîvan. Di pê- vajoya dîrokê de, siyaset û olê ku şêweya wê ya serdemên pêşî û navîn, di derûna xwe de bîrdoziyeke bazirganan bû. Di îfadeya wê ya hatî siftkirin û bi pîrozwerî hatî kirmişandin de, li qasî nirxê we cîhê we heye. Heger ku hûn bi nirxê xwe bêhtir bizanibin, belkî hûn bi erzanî xwe nedin xerckirin. Nûnerên bîrûbaweriyeke serdest ku pîrozweriya ol jî evqasî bi şêwe dikin, heger ku bibin fîrîşte jî, nayê hêvîkirin ku bi biratî û dostîtî nêzîk bibin, hinek nê- zîkayiyên wan ên bi mirovatî jî, ji demî û rasthatinî wêdetir naçin. Bi berpêçûyina Rojhilata Navîn re, giyana min saniyekê bi tenê jî bê fîkar û diltirsî ne jiyaye. Eynî weke ku di qada tije mayîn re, bi zor û zehmetî tu bimeşe ye. Bi gelemperî mirovê Kurd, bi taybetî PKKyiyan ev dilînî (hestyarî) ne jiyane. Lewra tevgera liser şopa vekirî, timî ewlekariyê dide. Digel ku min bi carbar dikire qêrîn jî, yekî baqil, dem, derfet û aqilê ku jê re gelekî pêdivî, wemegirt û rola xwe nelîst. Li Rojhilata navîn jibo afîrandina derfetên ku komployê bişkîne, hewldanên mezin hatin kirin, derfetên girîng derketin holê. Lêbelê kesayetiyên bi nalet, fersend nedidan ku em van derfetan binirxînin, dubarekirinên min ên bêhempa encam ne- didan. Hemû pêngav weke ku li dîwêr bikevên, paş de vedigeri- yan. Jibo ku ev rastî bêhtir were fêmkirin, pêwîst e esehiya komp- lokeriyê ji nêzîk ve were terîfkirin.

Komplokerî, tevgera ku di bûyerên civakî de, li derî pêvajoyên asayî, tenê ne bi hêzên dijber, ji ber helwestên xizmên we yên çi hişmendî û çi xafil ku bi wan re dibe yek, daxistin an jî derîzagon- kirina kes, kom, partî an jî hêza gel ku annanc digirin e.

Dolabgerên bingeh digirin ku, liser kes, kom, partî an jî gelên ku dikevin pey wan, pilanan pekbînin, di hemû xalên krîtîk de hêzên xwe amade bikin û dema fersendê bibînin, nêçîra xwe ya ku annanc dikin

bigirin.

Dema ku tevgera azadî ya gelê Kurd, gaveke herî piçûk davêje, li her welatî ji zagonên, bingehên polîtîk û rêzikên şerê leşkerî zê- detir, bi planên ku di tarîtiyê de pêşvedibin, şopandinek dide dest- pêkirin. Rêbazên ku ne li gora ti rêzikan, tinekirin, perçiqandin, tir- sandin, navtêdan, danrevandin, dîlgirtin, êşkence, girtin, îflasa aborî, lîstina bi nirxên mirûz, lêferzkirina jiyana sexte, bikaranîna zebûniyê, dirav, îqbal (bext) ûwd. Diceribînin û tevgera azadî têk- dibin. Heger ku baldarî pê were dayin, mantiqekî şer ê nonnal jî ne derbasdar e. Komplokerî, sepîneke ji şerê qirêj û şerê teybetî jî gi- rantir e. Lewra di nav de yên ku xwe dost nîşan didin hene, rêheva- lên xafil hene. Di vî babetî de, heger em dîroka tevgera azadî ya ge- lê Kurd, di heman demê de weke dîroka komplokeran jî binirxînin, nabe mezinkirineke zêde. Berevajî vê, yê hê bêhtir bibe rastiyan. Lewra em dîrokeke ku dişibe ya gelên din najîn.

Aliyekî komplokeriyê yê xetertir ev e ku, yên xwe weke dost û rêheval nîşan didin, xafil dibin û di dema xwe de peywira xwe ne li gor soz û biryarên xwe tînine cîh e. Çiqas ku xwedî mebesteke baş û hewldanan bin jî, bi vê derawaya xwe zemîneke herî girîng pêktînin ku planên komplokeran serkeftî derêxin. Rola ku dilîzin, weke bûyerên ku bi ***Sezar*** *“Ma tu jî Brutus?* **”** daye gotin, bi xiya- neta ***Yehuda îskaryot*** îsa li çarsingê hatiye dayin û kûştina xelî- feyan ku bi neyînî rê li ber domkirina dîrokê vekirine. Ji aliyê ge- lê Kurd ve ya herî qehrker ev e ku, ne bûyerên yeko yeko, tevaya dîroka bi van bûyeran tije derbasbûye. Yê ku hûn weke dost li cem radiwestin, di kêliya ku tu jê hêvî nekî de weke mar bi te ve dide. Yê ku rêveberiyê ji we re dike, bi zanîn an jî ne bi zanîn we ber bi kendal ve dibe, hûn xwe di rêya rast de dibînin, lêbelê li de- reke ku hûn ne li bendê hûn di kendêl werdibin. Dorhêla we ya tevgerê, bi tevayî qadeke bi mayîn e. Rasthatina we ya li zoriyên ku hûn li xwe, li hevala xwe û li birayê xwe jî ewle nebin, weke qedera we ye. Hûn nikarin di hemûkan de li qestiyê bigerin. Ke- sayetiya ku tine, di mercên giran de hemû teraza xwe winda dike û bêoxiriya ku dibêjin qeder, dîroka binalet ku bi destê mirovan çêbûyî hikmê xwe berdewam dike. Tişta ku hatî serê yê bi navê serok, weke sehneya “qurbankirina qeran” a di mîtolojiyê de ye. Hemû nalet û bêoxiriya civakê, di dema ku

qeranên stemkar û mi- jok çênebûn de, bi qurbankirina kesê ku bi temamî pêşevan û se- rokê civakê, tê ji navê rakirin. Li nav kurdan, heger ku serok ne- hatibe kûştin, teslhn nebûbe, şêt nebûbe, hê aqlê wî liserê wî be û rûmeta wî di cîh de be, êdî tişta ku li benda wî an azadî an jî “me- rasima kûştina qeran e”. Aliyê sosret ê vî karî ev e ku, bûyerên mîtolojîk ên berî zayînê, di nav kurdan de hê jî rastiyên ku têne jiyandin e. Ji ber vê yekê di nav kurdan de, efsane û mîtolojî dibe rast û rastiya ku heyî, dibe kor, lal û ker.

Bûyîna ji gelekî wiha biêş e, reva jê nemerdî ye. Nereva jê jî, se- maxa li hember mantiqê stemkar ê komplpkeriyê û sepînên wê yên bêrezik e. Çiqasî hûn semaxê bikşînin û bibin qurban, hûnê naletî- tiya du stûyê xwe de ewqasî paqij bikin. Heta ku ev naletbûn hebe, hemû tişt heram e. Hiskirina dil ji ya lawirekî bê nirxtir e.Mantiqê wê bi temamî xiyaneta li rastiyê ye. Weke yekî kotî ji her deverên wî edab diherike. Herkes ji we direve. Rêya rizgarbûna ji vê yekê, yan azadî yan jî mirin e. Li derî vê, peyveke ku hûn bibêjine dayîk, kalik, dost û heskirya xwe û careke bi tenê dirêjkirina destê we yê bi helalî tine.

Min hê di piçûkaya xwe de ev kotîtiya civakî dîtibû. Dema ez za- rok bûm, dayîka min ku pêwîst bû ez xwe lê bigirim, min tawanbar kiribû û weke ku ez bibêjim: ***“Bi anîna min a cîhanê tû dizanê çi- qasî te rê li ber êşê vekir? ”*** Ez ji jiyana ku her gaveke wê qehr bû haydar bûbûm. Lêbelê minê xiyanet li jiyanê nekiriba. Cîhan hemû li aliyekî û ez li aliyekî, minê qedera ku li meşa mezin a bi tenê hatî

ferzkirin parçe parçe bikira, maskeyên xwedayan daxista, bêyî westandin û bêzarbûnê, minê bidomanda. Ez dizanim ku min rê li ber êşên mezin vekiriye. Li hember êş û wêrekiya wan qehremanên ku xwe jibo min dişewitandin, ezê ji heq jiyanê bihatame der. Dîroka komployê û jiyana binalet, di kesayetiya min de, êşên erjeng didan kişandin. Di efsaneyê de, carekê Hz Brahhn bi çirikê (mencenîq) davêjin nava êgir, ew agir jî dibe av. Lêbelê hemû sergerdeyên nav- netewî yên Nemrûdên hemdem, bi hemû naletiya sedsala 20an, êşên ku di kesayetiya min de, bi gelê me didan kişandin, yê tema- şekirina lîstikên xwe yên ku şanogerên herî hêl li paş dihêlin, weke pêdiviya desthilatiya xwe ya bêsînor bidîtana. Terîfkirina şerekî ku bi hev re didin meşandin jî bi rastî nakin, rêzikên xwe jî nedidan se- pandin. Lêbelê yê hemû sûc kiribana aliyê min, careke din weke ku bibêjine min "tu ne titiştî", yê gelê Kurd ên reben mandele bikira û bavêtana aliyekî. Li pêşberî wan terorîstekî ku gef li cîhana wan a mezin dikir hebû. Pêwîst e timî di sêdara idamê de were girtin, di- vê bêyî dardekirinê dilê wî bisekine, mêjîyê wî şêt bibe. Ev jî êş- kenceya postmodem bû ku nû dahênandibûn. Ez qurbanê dawî yê arênaya hemdem bûm ku Neron li gor wan titişt nekiribû.

Gelê Kurd ê qurbanê dîroka komplokeran, ku jibo azadî û rûme- ta xwe bidestbixe, me xwest gavekê bavêje, bi komploya sala da- wiya sedsala 20an a li hember ku em ketin sedsala 21an, hê jî mi- nê hewl bidana ku bijîrn. Bi dilê li qasî mistekê ku mîlyon lê bûne yek û bi çend dilop wate, jiyana ku min di tabûtgehê de pejirandî, jiberku ji efendiyên cîhanê min dûr digire, minê bi rûmet pêşwazî bikira.

## 1- Dîroka Komployan û Dersên ku Pêdîviye jê Bêtin Derxistin

### a- Komplokeriya Serdema Pêşî û Mîtolojiyên Xapînok

Esasê komplokeriyê, çêbûneke civak a biçîn e. Annanc digire ku, hêzên civakê yên li hember pêkutiya çîn a hişk û mijokatiyê li berxwedidin, bi rêbazên bêteşe bêbandor bike. Du rêbaz timî derbasdarin: Şelipandina (şaşwaz kirin) bîrdoziyî û sîstemên pêkutî yên bêteşe. Li gor cîh yek an jî ya din, herî bêhtir jî herdu rêbaz bi hev re tên

sepandin. Heger ku sîstema bîrdoziyî, bi têrayî rola xwe ya xapînok û bawerker bilîze û sazûmanê domdar bike, pêşdatir tê çêtirgirtin. Dema ku ev têrê neke, dijber derkeve û sîstema xwe ya baweriyê ferz bike, weke rêbaza dawî dema pêkûtiya hişk û bi he- mû amûrên ku têxin dewrê, hewl didin ku encamê bigirin.

Ya ku ev kar pêşî derande holê û diyarî dîrokê kirî, weke gelek seretayiyên din, dîsa şaristaniya Sumer e. Li perestgehê, karê herî girîng ku hewl didan serkeftî bikin, sazûmana mijokatiyê bê yê ça- wa bi mirovatiyê, weke sazûmana herî baş bidin pejirandin bû. Mî- tolojiya ku rahîbên Sumer afirandine, belkî jî di vî derbarî de, komploya herî mezin ku li mirovatiyê kirine. Şêweya ramaneke wi- sa tê afirandin ku, hemû mirovên ku dikevin bin bandora wê dibi- ne beniyê ji dayîk bûyî. Xwedayên ku her der dagirkirin serdestî hi- şê mirovan dikin, mirovan tînin rewşa suxrevanekî jidil ê xweda- yan, şewşandina civakî ya herî mezin ku di dîrokê de tê zanîn û çîn- çînîbûnê derbasdar dikin û didin pejirandin. Rahîbên Sumer, xwe- dayên sazûmana ezmên bi sîstem dikin û xwe dikin nûnerê wan yê liser rûyê erdê, vê dawiyê xwe weke xweda- qeran îlan dikin, efen- diyên xwe di nava destlênadayineke mezin de weke rastbîniyeke xwedayî nîşan didin û serdestî hişan dikin. Dîrok li gor mercên ber- biçaviya vê dabelandina mezin û komployê veguherînê derbas di- ke, bicîh dibe û bi şêweya çîrok û rîwayetên ku li nava gel belav bi- be şêwe digire. Jixwe weke dîroka serdest û mêtinkeran.

Di vî babetî de, ev rastbîniyeke ku perestgeha Sumer, weke bir- yargeha komployê ya herî pêşî were nirxandin. Di vî derbarî de, îfadeyên xweda û beniyên wan ên mîtolojîk, mijarên ku herî bêhtir werin lêkolînkirin û dahûrandin in. Bi taybetî vekirina Enkî yê ku kordînator û mamosteyê aqil ê xwedayan, gelekî hînker e. Enkî zanyarê şirîn ê komploya ye. Parçeyek ji yê komployên ku di pers- tgehan de tê bikaranîn, daxistina zayenda jinê ye. Vegotinên herî hî- karîker ên di derbarê çînîtî û veqetîna zayendî ku di nava hev de pêşvediçin, taybetiyeke girîng a mîtolojiya Sumer e. Ji aliyê ku ci- vaka biçîn a seretayî pêkanîn ve, ev taybetiya mîtolojîk, bi daxisti- na jinê ya weke zayendekê, nirxandina bi şêweya ku xistine nava çînçînîbûna herî kevin, rast derdikeve. Di dema du hezar salên ser- destiya wan de, çêbûna

koletiya zayend û çîn, di mîtolojiyê de mî- na neynikê tê vedan. Ji ber hewl didin ku jinê nûka daxin, hêza wê ya kevin bê çiqase bi awayek ne rasterast tê fêmkirin. Xapandinên aliyê jinê yên di mîtolojiyê de, herî behtir di levdan û levhatinên xweda Enkî û xwedayê çiyê Nînhûrsag ku piştî kedî dibe û vedigu- here şêweya înanna de, tê dîtin. Xwedawenda dema neolotîkê, gav bi gav ji aliyê civaka bi serdestiya mêr a ku di bin dawera Enkî ve te daqûrtandin. Lêbelê têkoşîna Inanna ya têr aqil ku bi hêsanî tes- lhn nabe jî, hejmetkar dike.

Di dawî de, destpêka koletiya mirov û koletiya zayenda jinê, di civaka Sumer, di perestgehên rahîban û serayên qeranan de pêktê, weke dahênana dîroka şaristaniyê ya bingehîn serfiraziyê qezenc dike. Weke ku daxistina zayenda jinê û dûv re daxistina wê bi xwe jî ne bes be, di berdewamkirina sazûmanê de, yê dor bigihe bikara- nîna wê ya weke amûreke daxistinê. Qîzên ku bi hilbijartin û per- werdekirin li perestgehan tên komkirin, yên di nêçîrkirina mêrên sazûmanê de, weke kereseyên herî hîkarîker rolê bilîzin. Herwiha him civak dikeve rêveberiya perestgehê û him jî ji aliyê ku hatî da- xistin ve te daxistin. Komploya herî rezîl yekem car bi vî rengî tê birêkûpêkirin. Yekem car li perestgehê kûçikatiya du zayendan, he- zeke bêhempa dide sazûmanê. Vê dawiyê vê sîstem ji perestgehê dikişînin kerxanê. Em dibînin ku di dîrokê de kerxaneya pêşî, we- ke navendeke çand û baweriyê li bajarê bi navûdeng Nîppûr hatiye damezrandin. Kerxaneya bi navê Mûsakkatîn, êdî dibe lîtavxaneye- ke ku civak hemû têde tê qirêjkirin. Civak bi çîna zayend û kole, yê di nava vê lîtavê de biperpite ku nikaribe êdî derkeve. Dafika ku helbestvan dibêje ***"serê min careke din ji belayê rizgar nebû",*** di derûna xwe de, di vê daxistinê de îfadeya xwe ya herî hîkarîker di- bîne. Him ji xwedawendê û him jî ji mirovê azad ê xwezayî, tol ha- tiye girtin. Efendiyên civaka bi serdestiya mêr dibin xweda, beni- yên wan jî pêşî li perestgehê û dûv re li kerxaneyê, li qasî ku serê xwe careke din ji belayê rizgar nekin, yê di lîtavê de werin xeniqan- din. Dîroka şaristaniyê yê bi pêşveçûna van herdu saziyan, berde- wam bike. Perstgeha rahîb, vediguhere kenîşte, dêr, mizgeft û hwd. Kerxane jî dibe xaniyê taybet, xaniyê xanedan, xaniyê gundî û xa- niyê bajarî.

Civaka feodal û kapîtalîst, zaroka civaka Sumer e, genên xwe yên binyatî ji vir girtine. Şêweyên komplokeriya perestgeh û se- rayê, yekem

car û bi awayek orîjînal, di civaka Sumer de hatine pêkanîn. Ne belaşe ku em dibêjina van dahênanêndîrokê yên herî girîng.

Çi bi êşe ku, sepînên komplokeriya Sumer a li derve, yekem car li hember koma etnîk a Kurd ku bi zimanê xwe dibêjin Kurtî, hatiye bikaranîn. Di destana mirovatiyê ye herî pêşî nivîskî, ***Des- tana Gilgamêş*** de, ev mijar gelekî balkêşe. Gilgamêş bi xwe, qe- ranê leheng ê dewlet-bajarê Ûrûk e. Pêdiviya bajêr a bi keresteyê daristanê, bi kevir û kanê, zorê li Gilgamêş û sefera daristanê di- ke. Ji ber vê yekê, hewceyiya wî bi arîkarekî ku daristanê baş nas- bike heye. Weke rêzan û hevkarê xwe, ***Enkîdû*** li daristanê dibîne û nêçîr dike digire. Him jî bi bikaranîna fahîşeyên perestgehê. Be- şek ji ya destanê di vî derbarî de ye: Daxistina hevkar a bi zayen- da jinê. Qîzên perestgehê ku baş hatine perwerdekirin, di vî karî de gelekî serwext in. Di demeke kin de, Enkîdû ji çiyê tînin xwar û hînî bajêr dikin. Êdî Enkîdû careke din serê xwe ji belayê rizgar nake. Êdî kilîla berdestkirina welatê daristanê hatiye bidestxistin. Kewê ku ji çiyê hatî nêçîrkirin, jibo nêçîrkirina kewên din, di re- kihê de hatiyê bi cîhkirin.

Gilgamêş di sefera çiyê ya bi navûdeng de, dema ku berê xwe di- de çiyayê Zaxros, Enkîdû yê ku ji wira girtibû jî bi xwe re dibe. Ji herka destanê tê fêmkirin ku Enkîdû, Kurdê hevkar ê yekemîn tem- sîl dike. Enkîdû, Gilgamêş dibe ser xwediyên welatê çiyê. Yê qew- mê xwe nêçîr bike. ***Hûvava*** yê ku pêşî li çiyê dibînin û dibêjin no- tirvanê daristanê ku wî mîna cinawir nîşan didin, eslê wê serokê eşîrê ye. Welatê xwe diparêze. Lêbelê li hember rêxistinî û çekên Gilgamêş ji têkçûnê rizgar nabe. Kurdê pêşî yê şervanê azadiyê ku

ketî dîrokê, herwiha yê êsîr were girtin. Gilgamêş dixwaze ku Hûvava jî weke hevkarekî bihêle. Lêbelê Enkîdû jibo ku serdestiya xwe winda neke, jibo ku ji windakirina derawaya xwe ditirsiya û ji ber ku altematîfekî wî çênebe, Gilgamiş qayîl dike ku Hûvava bi- kûje. Gilgamêş Hûvava dikuje û pêvajoya bi xwîn dide destpêkirin. Destan di vî derbarî de, têkilî û nakokiyên diyalektîk ên ku gelekî dirêj, tîne zimên. Neqşên çiya-deşt, eşîr-bajar, qeran-serhildêr, we- latparêz-hevkar û çîrokên bi vî rengî ku ji nifşan gihane nifşên din, dike destan. Ji aliyê mijara me ve ya girîng eve ku, di destana ni- vîskî ya pêşî de, çîroka Kurd a xemgîn bi şêweyeke sergirtî tîne zi- mên û destpêkirina dîroka Kurdan a bi komployê ye. Welatê wan ê ku bêyî hevkarekî daxistî kesek nikare bikeviyê, bi zêdeyî di civa- ka bajêr de, bi rênîşandana xayînên ku bi zayenda jinê tên daxistin, dikevinê. Ji wê rojê heta bi îro, ev dîrok bi siftî û berfirehî berde- wam dike. Yê ku darê dide erdê, kunnikên di nava wê de ne. Di xa- lên werçerxa dîrokê de, tim tîpên bi vî rengî yê derkevine hemberî me. Di hilweşandina dewleta *Hûrî-Mîtanî* de, yê ku rol leyîstiye *Şehzade* (mîrlaw) *Matîzawa* yê hevkar e. Di têkbirina xanedaniya *Med* de, Xwarzê yê Persî *Kîros* rola sereke dileyîze.

Di hemû bûyerên dîrokê yên ku dewsa xwe çêkirin de, komplo- yan rola xwe domandine. Daxistina *Troya* ku nirxên şaristaniyê di ser Anatolya re kişandine Ewropa jî, bi komployê ye. *Hektorê* le- heng, Troya diparêze. Bajar nakeve. *Homeros* vê hingê di destana *îlyada* de, di nava sehneyên xemgîn de vedibêje. Xwedayê çîna ser- dest a Helen *Zeûs* û *Athena* ku ji anya xwe afirandî, aqlê xwe bikar- tînin ku yê karibin vî karî bi komployê pêkbînin. *Athena* xwe xwe têxe şêweya birayê Hektor *Deîphobo* û wî qayîl dike ku yê li hem- ber *Akhîleos* şer qezenc bike. Di dem û cîhê çewt de, jibo şer nav di Hektor dide. Hektor tê kûştin, Troya dikeve. Deryê Anatolya he- ta bi dawî ji Helenan re vedibe. Dema serdedstî û çanda Helan a sê hezar salan destpêdike. Di serdestiya Rojava ya li Rojhilat de û ser- destiya Ewropa ya li Asya de, dîsa komployên bi zayenda jinê ve girêdayî rolê dilîzin. Zimanê mîtolojîk rastiyê venabêje. Lêbelê çavkaniyeke dîrokê girîng e ku hinek pêvajoyên bûne bûyerên gi- rûng jî tîne zimên. Gotina ku dibêjin di bin her efsaneyê de rastiyek heye, di vî babetî de gelekî rast e.

Komploya serdema klasîk a bi navûdeng ku gelekî tê zanîn, kûş- tina

***Julîus Sezar*** e. Beşek ji yên ku rolê dilîzin, derdora wî ya nê- zîk e. Qaşo yê Romayê ji dîktatoriya Sezar rizgar bikin. Di komp- loyê de biraziyê Brutus ê ku rola biêş dilîze, rêzika vî karî careke din derdixe pêşberî me. Heta ku hinek ji nêzîkên kesekî, partiyekê an jî gelekî neyên bidestxistin, komplo bi hêsanî bisemakevin. Komploya Sezar vê dawiyê, tê serê gelek hnperetor û qeranan. Desthilatî û komplo bi hev ve girêdayî ne. Bi hindikayî liqasî şerên diyar, di bûyerên desthilatiyê de rolê dilîze.

Mînakeke dawî, em di derbarê dîroka îbraniyan û îsrael de bidin, yê hînker be. Di Incîlê de derbasdibe: Qebîleyên Îbranî, piştî Mûsa dema hewl didin ku bajarên Filistîn û îsraela îro bidin erdê, di na- va bajêr de ***Rahabê*** fahîşe bikartînin. Ji aliyê din ve lawên îsrael, xwe tevan weke qewmê bijarte û sîxurê xwedayê xwe ***Yehova,*** di- nirxînin. Sîxurî li nav îsraeliyan weke pîşeyeke ku xwedê daye wan e. Herwiha di tevaya cîhanê de ji aliyê sîxurî ve, bi navûdeng in. Yê ku îsa dayî dest, ji duwazdeh Hewariyan Yehûda îskaryotê ku bi pêşgoyê serek ve girêdayî bû. Hemû dîrokzan destnîşan dikin ku, îsa li çarsingê nehatiba dayîn, olekî weke xiristiyantiyê demedike- te holê. Di tevkariya ku komployekê li vê pêşveçûna dîrokî kirî de, li qasî girtina îsa ku bandorker, ti mînakên din nayên nîşandan.

Pêwîst e girêdana civaka biçîn û vê çêbûna bi nalet a serdema pêşî, bi mêtinkerî û desthilatiyê re, bi berbiçavî were fêmkirin. Komplo ne ji mebesta ne baş û nehezkirina xwedê ya ji mirovan tê. Ne lîstika mirovên sincpîs e jî. Weke goşt û neynokê, mekanîzma- yeke desthilatiyê ya bi damezraka civaka mêtinker ve girêdayî ye. Ne rûyê desthilatiyê yê ku xuya dike, rûyê wê yê ku xuya nake gi- rîng e. Desthilatiya rast di rûyê ku ji gel, ji civakê tê veşartin de di- lîze. Navê vê lîstikê herî bêhtir, komplokerî ye.

Di çêbûna civaka Kurd de, hê di serdema pêşî de, weke taybeti- yeke ku rahên xwe berdane kûr, rola “kunnê darê” tê lîstin. Kunnik gelek in û jibo ku bijîn, pêwîst e dara ku heyîna civakî, ji hemû ali- yan ve bikojin. Trajediya Kurd û weke îfadeya wê ya folklorîk des- tanên xemgîn, ne belaş ev xiyanet û qelsî anîne zimên. Lewra kur- mê di sînga dara azadiyê de, civakê dikoje. Ev jî tê wateya ku jiyan hemû biêş derbasdibe. Destan û stran vê yekê diqîrin.

Komplokerî di serdema navîn de hê bêhtir har dibe. Derfetên mi-

jokatiyê ku zêde dibin û mîhraqên desthilatiyê ku berfireh dibin, yê hostatî û hunera komplokeriyê pêşve bibin.

**b- Serdema Navîn û Komplokeriya bi Maskeya Ol**

Weke şêweyeke raman nerexnekirina ol, jibo ola îslamê kêmasiyeke mezin e. Mandelekirina ol a bêteşe, çiqasî ku rastbîniyê veder dike, girêdana bawennendî jî ol ewqasî ji rastiyan qut dike. Di nav civakên Rojhilata Navîn, di pêşveneçûna ramana zanistî de, para nêzîkbûna bi ola îslamê pir mezin e. 01, derbaskirina mî- tolojiya serdema yekemîn a di veguherînê re û pêşkêşkirina bi şê- weya rêzikên baweriyên hişk e, Komînaka (têhev) gelemper a ra- manên ku civaka pêşdikeve di derbarê rastiya xwe û xwezayê de gihayê. Xeyal û baweriyên wan ên di derbarê dema borî, niha û pêşerojê de pêktîne. Bi civaka çîn ku derkete holê re, nîşandana çêbûnên desthilatî, dewlet û qerantiyê, îfadeya xwe herî bêhtir di ramana olê yek xweda de dîtî ye. Dema ku saziyan xwestine xwe li hişan serdest bikin, pêşî mîtolojî, dema ku ew hindik maye, bi olê yekxweda ev hewceyî ji holê rakirine. Di vê rewşê de xweda ji vedana hêzên xwezayî bêhtir, vedana hêzên civakî pêktînin. Hê- za menewî ya çîna rêveber û qeranên ku fennan dikin sembolîze dikin. Ji terîfkirina civakê ya gelemper, ber bi terîfkirina çîna rê- veber û qeran, rê li ber wateyeke guherî vedikin. Xweda bi xwe dibe bi şêweyeke perçiqîner, dibe alîkarê herî mezin ê siltanê ku bûye otorîteya tenê ya çîna rêveber. Taybetiyên xwe yên çînî, si- yasî û navên xwe zêde û tekûz dike. Xweda jî weke terîfkirina xweza, gerdûn û tevaya civakê, bi heyîna ramana felsefî û zanistî ve girêdayî, ber bi yekerbûna teorîk ve diçe.

Em vê ciyawaziyê (veqetînê) ji bo vê yekê dikin: Serdema navîn ku serdemeke komployan, angaşt dike ku, hemû mêrkûjiyên xwe, lîstikên desthilatiyê û heta bi mêtinkeriya xwe ya li ber çavan, liser navê xwedê dike. Kemna olî û xweda, dibe sedema mêtinkeriya ci- vakî û pêkutiyan. Hemû tişt jibo xweda û ol e. Heçkû dema ku ev herdu peyv werin vekirin, yê were dîtin ku di nava wan de, hemû şêweyên çewsandinê, desthilatî, mêtinkerî û xapandin veşartî ne. Weke şêweya nû a bîrdoziyî, olê ku hatî damezrandin, roleke ji mî- tolojiya serdema pêşî xetertir û dîlker dilîze. Nennîtiya ku di mîto- lojiyê de heyî, ji holê hatiye rakirin.

Baweriya teqez a bi rêzikên ol û qalibên baweriyê, şert in. Herwiha hinek bennayîyên azadiyê ku bi mirovan re mane jî, ji holê tên rakirin. Dikeve bin çewsandina ci- zayên hişk û sepanî. Ji holêrakirina mirovê azad, livbaziya dîrokî ya herî mezin e ku serdema navîn bi rêya ol pêkaniye. Di vê de, ro- la olê nû yê pêşveber û ronahîker ku şêweyên olên kevin ji holê ra- dike, nayê mandelekirin. Lêbelê nedîtina tarîtiya ku rê li ber vekirî jî, bêrêziya li mirovê azade û tê wateya mandelekirina wî.

Bi taybetî dogmayên olî di demên ku pêşverû dibin de, liser ci- vakê bitevayî sîstemeke komplo pêşvedibe. Di îslamtiyê de, vê de- ma ku bi emewî û ebasiyan destpêkirî, gelekî honawer e. Dema ku Mûawiye ber bi têkçûnê diçe, Quranê bi serê rima xwe ve dike û şer radiwestîne. Lêbelê dûv re dibe komkûjê har ê ehlîbeyt. Belkî jî di dîroka ti olan de, li qasî yê di îslamê de, komplo tine ne. Ji her çar xelîfeyan, sisê bi komployan hatine kûştin. Yên ku bi serê du- wazdah îmaman hatin, bi zêdeyî komplo ne. îslamê rêzikeke vê jî dîtiye. Takiyeperestî weke têgînekê komplokerî bi xwe ye. Bi sepî- na vê rêzikê, mêrkûjiyên bêhijmar hatine kirin.

Ev bûyereke di derbarê derûna bîrdoziya ol de ye. Piştî ku yên li derî xwe kafir îlan dike û mirovan bi awayek hişk vediqetîne, hemû rêyên ji holêrakirina wan, liser navê xwedê weke mezinayî û rûmetekê nîşan dide. Wê hingê serdema navîn seranser ji axa- yên şer tije dibe. Xwedayê serdema navîn weke heyîna tenê, qet hevpar û şirîkan napejirîne. Eslê wê çûyina ber bi siltantiya teqez heye. Yekîtî û heyîna xwedê ji dawerkirina viyana siltan a tenê û bihêz wêdtir, ne xwedî ti nirxê pratîk e. Tenêbûna viyana siltan, yekîtiya xwedê ya mîsoger pêwîst dike. Piştî ku siltantiyê ji aliyê

bîrdoziyî ve hêz qezenc kir, mirovekî nedaxistî nahêle. Encex mirovên li bandevên çiyan, li terîqetên mîstîk an jî di serhildanên li ber çavan de, hewl didin ku azadiya xwe biparêzin. Benîtiya jibo xwedê, êdî weke rûmetê tê dîtin. Nefesa dayika me ya xweda- wend hatiye qutkirin.

Di dîtina xwedayê serdema navîn de, jin aferîdeka kêm e. Daxis- tine vesereke mêr a herî nuhayî. Koletiya zayendê gihandine şêwe- yên herî bêwate. Jin bûye diyariyeke ku bi awayek bêsînor pêşkêşî mêr kirine. Ne weke mirov weke mêl ku bixwazin bikaribin bikirin û bikar bînin. Jibo ku vê komployê bi serê mirovatiyê bînin, hemû olên serdema navîn, bi hev re pêşbaziyê dikin. Hatiye rewşeke wi- sa ku relnne liser dema pêşî bête kirin. Di xiristiyantiyê de deryê engîzîsyonê û di îslamtiyê de yê îçtîhadê (têgihîştin) ku tê girtin, li- ser damezraka hişê mirovan, di rewşa terora herî wergirî de ye. Ji aliyê din ve komplokeriya serayê, serdema xwer ya herî pêşketî dijî. Baweriya li perstgehê, bi komploya li serayê bi encam dibe. Herduk jî hevûdin diwelidînin.

Di civaka serdema navîn de, çiqas ku serdestiya bi binyata ol ve girêdayî pêşve diçe, biyanîbûna gelan a bi nasnameya wan a azad re, zêde dibe. Pêşveçûna serdestan a çawanî (wesf) û çendanî, ye- keriya wan bi bîrdoziya olî re, yê gel bi serê xwe mecbûr bike ku heyîna xwe ya etnîk û çandî bijî. Serdestên wan, weke hilgirên nas- nameyên xwedayan ku gel wan fêm nake, rola xapînok dilîzin. Bi nasnameya bîrdoziyî ya nû, mêtinkerî û desthilatî di cîh de tê rûniş- tandin, bi kûrayî û firehî belav dibe. Vebizava gel, bi xirakirina olê fennî û bi şêweya mezhebên batinî yên zêde ne. Gel li hember komploya ku lêrasthatî, di bin navê terîqetan de, yê tim li rêyên nû bigere. Terîqet ji xwe di wateya rê de, dibe navê derketinên ku kêm nabin. Tişta ku li serê kurdan hûnandine, di şêweya kemna ol de ye. Hevkariya ku ji serdema pêşî maye, bi lezgînî bi olê nû re dibe yek û biyanîbûna xwe hê bêhtir kûr dike, rola beniyên siltanan ên herî baş dilîzin. Gel jî yê berxwedana xwe bi rêya gelek mezheb û terî- qetan pêşandan bike. Bi dîwarên ku li derdora şaristaniya serdema navîn hûnandî, yê bikeve jiyana girtîgeheke xwezayî.

Serdest hewl didin ku di navbera şah û siltanan de cîhekî bigirin, tişta ku dikin navxweyîkirina xiyanetê ye. Zemîn bi komplokeriyê didin qezenckirin. Serdestên ku ji mêj de yekîtî û xweşiya gel jibîr kirin, bi

levdanên etnîk û yên olî yên kêmber, jiyanê tînine rewşe- ke ku tenê li komployan rast were. Kolandina çalikên li pişt hev, ji herî jor ji malbata siltan, heta bi herî jêr xulam û gundiyan yê bi kar were. Encameke xwezayî ya sincê feodal, sazîbûna xiyanetê ye.

Biyanîbûna hemû gelên Rojhilata Navîn ku di serdema navîn de dijîn, bi veguherîna di amûrên bîrdoziyî yên çanda rahîbên Sumer ên dawî û paşverû de tekildar e. Şêweya sûnîtiya fennî ya olperesti- yê ku muştaqa sêyemîn a vê çandê, gelan di nava çerxeke bêsûd de, di nava rewşeke wisa de dihêle ku di her astê de, bi xwe re di dera- waya şer de bin. Yên ku ji vê yekê jî sûd werdigirin, çendek ji dora serayê, hevkarên wan û axayên şer ên ku ti rêzikên wan tine ne.

Gelê Kurd mehkûmî jiyandina vê bûyerê ya herî bi kûrayî û ji çar aliyan ve dorpêçbûyî kirine, anîne rewşa gelekî arenatiyê. Ça- wa ku xiristiyanên pêşî davêtin arenayê û bi şêran didan perçekirin, rastbîniya gelê Kurd a serdema navîn jî, ji serî heta bi dawî û bi te- mamî, di bin penceyên hevkarên serayê û axayên şer de, tê perçe- kirin. Mijara ***Dehak*** ê di ***Efsaneya Kawayê Hesinkar*** de, ku heroj serê du ciwanên Kurd parçe dikir û bi xwarina mêjiyê wan jiyana xwe bi tenduristî berdewam dikir jî, di derûna xwe de, vê rastiya gel tîne zimên. Bi rastî jî, Dehak û Nemrûdên ku nava wî tije kiri- ne, kannend û leşkerên wan ên bîrdoziyî û çalak, heroj mêjiyê gel, ango ramana wî ya azad û heyîna wî ya çandî, derfetên hilberîna wî ji dest digirin û bi xwarina wan, jiyana xwe berdewam dikin. De- hak ne yekî ku di dema kevin de çêbûye û tine bûye. Him hijmara wan û him jî hevkarên wan zêde bûne, Ew rojê ne du ciwanên me, mêjiyê hemû ciwan û gelê me, timî dixwin. Ber bi roja me ve bi awayek siftbûyî, û berfirehbûyî, li hemberî me weke qijikên ser ke- laşan û sîqalkan, radiwestin. Ev pêdiviyeke rêzgirtina me ya ji ras- tiyê re ye ku, em oldariya fennî ya serdema navîn, mîrateya îslam- tiya sunî ya bîrdoziyî, xapandina pratîk û komplokeriya ji kapîtalîst re hiştî, bi vê şêweyê terîf bikin û nîşan bidin.

**c- Neteweperestiya Kapîtalîst û Faşîzm Komplokeriya Herî Pêşveçûyî ye**

Ji bo fêm kirina reseniya bîrdoziya faşîzmê ya weke niçika nete- weperestî û neteweperestiya kapîtalîst a xwezayî, pêwîst e ji welat- parêzî û ji çandparêziyê were veqetandin. Weke komeke etnîk, nijad û

netewe, hezkirin û girêdana bi axa ku bi hezar salan vekirî û ha- tiye rewşa welat, nirxekî pîroz îfade dike. Mirovekî ku ji vî nirxî, an- go ji welatparêzî bêpar, mirovekî herî biyanîbûyî, ji pîrozweriya ji- yanê dûrketî û di pêvajoya naletbûnê de ye. Heger ku civakek keti- be vê rewşê, ew civak civakeke herî gunehbar, li naletê rasthatî û la- yîqî vê yekê ye. Bazdana ji dayîkniştiman, piçûkdîtin û terkirina axa çavên xwe lê vekirî, xiyaneta li dayîkê li çanda dayîka xwedawend e. Terkirina dayîkniştiman a bi koçberiya zorê û ji ber sedemên aborî, lêbelê hilanîna hezkirina dayîka axê ya di dil de, bingeha he- mû hestyarî û ramanên bilind e. Çi kesê ku ev hezkirina wan nebe, hemû hestyarî û ramanên wan biqirêj û xetemak in. Xwedî sincê xi- rab û hêrîşker in. Beşa ku mirovatiyê tine dike, hisdike bila netewe- perestiya şoven, hisdike bila bi şêweya kozmopolîtperestî şêwe gir- tibe, ji komên bi vî rengî tê holê. Di derûna van civakan de, axpa- rêzî, welatparêzî û çandparêzî tine. Neteweperestî û kozmopolîtiya wan, weke herdu rûyên madalyonekî ye û heman dravî îfade dike.

Neteweperestiya kapîtalîst, di rola olê nû yê ku cîhê bîrdoziya olê ku bi tevgera laîktiyê lawaz bûyî girtî de ye. Cudahiya di nav- bera wan de, neteweperestiya ku hinek têgînên zanistî yên nû bin- geh digre ye. Hewl dide ku ji daneyên zanistî yên netewe, dewlet, civak û têgihînên rêveberiyê ku derketine holê, sûd wergire. Cure- yek şovenîzma hemdeme ku ji şovenîzma eşîrê û ji ya ometê ango ji şovenîzma komên ji heman olî cuda ye, lêbelê di navbera wan de, girêdaneke zêde heye. Şovenîzm dikare weke komên ku ji roja bû- yîn ve, wateya didine rastiyên xwe û hestyariya perestinê were te- rîfkirin. Di dema komunala hoveber de, heşîrên ku xwe bi sembo- lên bi navê toteman terîf dikirin, dawî çiqas ku civak pêşveçû, timî guherînan derbas dikin û digihîjin terîfkirinên nû. Civaka neolîtîk, rê li ber civaka daykanî ya pêşveçûyîtir, li ber olê dayîka xweda- wend vedike. Perestineke ku navend jin û dayîk, pêşvediçe. Di ci- vakê de taybetiyên mê serdestiyê qezenc dikin. Xwedayên jin vê rastiyê sembolîze dikin.

Çêbûna serdest a civaka koledar, dewlet e. Dewlet, li dora pe- restgeha ku sembolên civakê, terîfkirinên wateyên wan pêşvedibe, pêktê. Ji ber girîngiya wê timî tê bilind kirin. Çîna serdest ku li do- ra wê pêşve diçe, bi destxistina îmtiyazên nû ku di xeyalên xwe de jî

nedidîtin, sembolîze dike û weke olekî nû ku serdestî civakê di- de xuyakirin. Mîtolojî weke îfadeya van hewldanan a herî pşveçûyî tê birêkûpekirin. Di derûna xwe de, hewl dide kû civaka biçîn ve- şêre, çîna serdest a nû û dewleta wê ku bi têgînên xwezayî û weke heyîneke pîroz sembolîze dike, serdest bike. Dîsa erkeke van mîto- lojiyan ev e ku, beşên civakê yên kedkar tenê jibo suxreyan hatine afirandin, musteheqî her cureyê cizayê ne û pêwîst e piçûk werin dîtin. Di encamê de bîrdoziya serdest, şovenîzma ku pêwîst e weke ol were fêmkirin, weke serdestiyeke li civakê dikeve rola herî me- zin a rastbîniyê. Hemû raman û hestyariyên civakê, ev şovenîzma mîtolojîk dagir dike. Ev rewş, hêzeke xurt a rêveberiyê dide çîna serdest. Herwiha girîngiya perestgehan zêde dibe. Karê pêşî yê her dewlet-bajarê ku tê damezrandin, avakirina perstgeheke bi şeml a weke cîhekî pîrozwer e. Ti saziyên din weke perestgehê tinene ku rêveberiyê rihet dikin. Girtîgeh, kerxane û hunerxane jî girîng in. Lêbelê rola wan ti carî nagîhe asta perestgehê.

Omet, civaka olî ya serdema navîn e. Weke têgihîna netewe a ro- ja me tê dîtin. Bîrdoziya ometê olî ye. Civaka îslamê, civaka xirist- yantiyê, civaka mûsewîtiyê, di heman demê de, neteweyên îslamê, xiristiyantiyê û mûsewîtiyê pêktînin. Omet, veavabûneke bîrdoziyî ye. Li derî cihûyan, yekîneyên etnîk ên mûsewî tine ne. Lêbelê ji- berku olê çîna raser e, di navbera wan de cudabûnên etnîkî jî pêş- vediçin. Bawerhişkiya olî, şovenîzma bi erebî ye. Ji ber derûna xwe, di hemû bîrdoziyên ku ji zanistê re bêrêz de, bi taybetî di yên ku bi rewişta olî de, bawerhişkî serdest e. Ji aliya binyatî ve, digi- hine jêderka (nijad) Sumer û Misir. Lêbelê çiqas ku cîh û civak tên guhertin, di encama veguherînên ku hatin derbaskirin de, rewşeke weke ku girêdana wan bi jêderka wan re nebe, derdikeve holê. He- ta jibo ku aliyên dişibine hev binixûmînin, mandelekirina orîjanalê bûye rêzik. Berevajî vê, nikarin xwe nû û bi awayek cuda bidine pejirandin.

Zemîna dîrokî ya ku neteweperestî pê ve girêdayî jî, wiha ye. Aliyê wê yê cuda, rastiya neteweyî ya ji ber bazara mercên ku hil- berîna kapîtalîst afirandî, derketiye pêş e. Li dewsa totemê eşîr û qebîleyê, totemê netewe, ango xwedayê neteweperestî an jî olê wî cîh digire. Ji ometa firehtir, derbasî olê neteweyî, ango netewepe- restiyê dibin. Bi

wateya klasîk neteweperestî ne ol e. Lêbelê têkili- yên di navbera wan de, zelal in. Di mercên hilberînê de û pêşveçû- nên di qada zanistî de, pêwîst dike ku derketina olî ya nû bi kinnişe rengê neteweperestî.

Weke di her derketina olî de, neteweperestî jî di derketinên xwe yên pêşî de, gengaz e ku roleke pêşverû bilîze. Gelên ku di pence- yên ometperestiya kevneşopî de nasnameyên xwe winda kirin, de- ma ku bi bandora neteweperestiyê zindîbûna çanda xwe dijîn, diyar e ku ev rol erênî ye. Jixwe, di bingeha pêşveçûna wê ya lezgînî de jî, ev rastî heye. Lêbelê kapîtalîzma ku paşverû dibe û ber bi mêtin- gehkariyê ve diçe, rê li ber neteweperstiyê vedike ku taybetiyên şo- ven qezenc bike û heyînên neteweyî yên din piçûk bibîne. Di vê rewşê de neteweperestî, ji bîrdoziya neteweyek an jî gelekî ku di- perçiqe derdikeve û dibe amûra serdestiya hêzên ku di pêvajoya be- lavbûnê de ne. Weke hêzeke demagojîk, dikine sedema hemû cure- yên komplo, levdan û şeran. Jiberku demagojiya wê bihêz e û bi hê- sanî bandorê li civakê dike, hîkariya wê ya komplokeriyê xurt di- ke. Mînak, bi Hîtler û Mussolînî re ev taybetî berbiçav in. Bi nete- weperestiya Alman, xwe di ber komploya di dîrokê de herî mezin re dikin. Aliyên neteweperestiya Cihûyan ên bi vî rengî jî zexm in. Cihû bawer dikin ku qewmekî bijarte yê ji aliyê xwedê ve hatin afi- randî ne. Ev bawerî rê li ber şovenîzmeke wisa vedike ku, hemû ne- teweyên din di bin xwe re dibînin. Di derûna van hemû şovenîzman de, têgihîna ***“totemê min jiyê te binirxtir e ”*** heye. Herwiha diyar e ku bi hoveberiyê ve girêdayî ne. Hemdemîbûna neteweperestiyê,

nayê wê wateyê ku ne hoveber e. Tenê nîşan dide ku hoveberî, şê- weya totemîzinê ya hemdem e, eynî weke lêgerîna olan a serdesti- yê. Dîsa weke ku di serdemên pêşî de berfirehbû, têgihîna ***"pûtê min ji yê te bilndtire"*** nîşan dide. Dema ku em ji rewişta olî ya ne- teweperestiyê xeber didin, em van mijarana nîşan didin û ev pey- tandinên rast in.

Divê xweş were têgihîştin ku, tegihîna netewe ya bi welatparêzî û heyîna çandî ve girêdayî, ji aliyê çawanî ve ji vê sexbêriyê cuda ye û berevajî vê ye. Bûyina welatparêzekî baş û ji heyîna çandan re rêzgirtî, bingeha têgihîneke rast a humanîzmê ye jî. Berevajî vê, mirovê ku hestên welatparêzî û rêzgirtina ji heyînên çandî re win- dakirî, ji dîrokê û herwiha ji rastbîniya civakê jî qut e. Ji mirov, rê- xistin û civaka ku ji rastbîniyê qut, her cureyê xeteriyê tê hêvîkirin. Hilberandin û îfadekirina van a nirxên bi wate, zor e.

Ne zor e ku girêdana neteweperestiyê ya bi komoloyê re were dî- tin. Dema ku Hîtler amadekariyên şerê cîhanê yê duyem dikir, bi te- mamî serî li rêbazên komployan dida. Dema desthilatdar dibe, de- ma şer dide destpêkirin, rêbaza bingeh komployan bikartîne. Hisdi- ke li nav xwe jibo gel bixapîne û hisdike li derve jibo belavbûna xwe binixûmîne, çeka komploya neteweperestî bikartîne. Komplo çeka herî xeter a rêveberiya erzan e. Karê rahîbên Sumer ê mîtolo- jiya bişeml, hê jî bi şêweya neteweperestî dayîna berhemên xwe berdewam dike. Berdewama dawîtir a van berheman, bîrdoziya sosyalîst a reel e. Heta sosyalîzma reel bêhtir dişibe bîrdoziya pe- restgeha Sumer. Weke bîrdoziyeke dewlet û civakê ya sift, herduk jî sosyalîzma dewletê bi gotineke din, koletiya wê derdixin holê. Heta ku dewlet hebe, her şêweya hilberînê ya dora wê, ji sumeriyan bigirin heta bi sovyetan, ji temsîlkirina heman derûnê rizgar nabin. Ji damezrandina bandora koletiyê ya liser civakê, paşde namîne. Dewlet û sosyalîzm, di wateya çînî de li cem hev ranawestin. Yek hebe ya din nabe, an jî pêwîst e veguherîneke binyatî derbas bike. Israra sosyalîzma reel a di sosyalîzma dewletê de, bê çawa rejîme- ke komplo û lîstikê ya liser gel e, di pêvajoya jevketinê de bi şêwe- yeke ku neyê bawerkirin derketiye holê.Di bingeha vê rastiyê de jî, dewleta bi şêweya rahîbên Sumer, heye. Ji aliyê bîrdoziyî ve jî, dî- sa di bingeha tevan de mîtolojiya rahîbên Sumer heye,

Cudahiyên di navbera mîtolojiya rahîbên Sumer û qalibên bîr-

doziyî yên sosyalîzma reel de, ne di derbarê derûn de, bi awayek şêweyî ne. Hemû bîrdoziyên ji vê binyatê, ji ber rêveberiya hêsanî ya liser civakê û takekes, li pey serdestiya hişî û hestyarî ya bi xa- pandinê ve girêdayî ne. Yek ji wan ku ji ya din bêhtir zanist û fel- sefeyê bikartîne, erka wan a bingehîn û bi heman rengî ji holê ra- nake. Heta bîrdoziya ku herî bêhtir zanistê bikartîne, ji tevavayan xetertir dibe. Mîtolojiya Sumer, ti caran ji faşîzma Hitler wêranker- tir nebûye. Bîrdoziya neteweperest Penceşêra (kanser) serdema me ye. Hisdike bila bi şêweya şovenîzm û hisdike bila bi şovenîzma ci- vakî be, çi civaka ku têxe bin bandora xwe, dike nava nexweşiye- ke xedar de. Çareseriya vê nexweşiyê, ne bikaranîna neteweperst- ya hindik an jî gelek e, devjêberdana ji binî ye. Tenê ne devjêber- dana van şêweyên raman û hestên bi vî rengî, têkoşîna li hember wan jî pêdivî ye. Cîhaneke raman û giyanê ku bi vê nexweşiyê ketî, encex bi têkoşîneke paqijkirinê ya sift, xwe û civakê yê bigihîne xweşiyê. Rêya vê yekê jî, welatparêziyeke bi sexbêrî, rêzgirtina ji heyînên çandî re û humanîzmeke ku bi mirovheziyeke kûr be ye.

Gelê Kurd, hê xwe ji xefikên olî û mîtolojîk ên serdemên pêşî û navîn rizgar nekirî, heta hê bi wan re di nava gewixandinan de, di van dused salên dawî de, xwe bi xefikên komployên neteweperesti- yan re, rûbirû dît. Heta ku ji ber baranê reviya ye, li şirik û xilîlokê qelibiye. Mîhraqên neteweperest ên ku di nav de û li derî wî derke- tine holê, di fennankirina kûştina wî de, bi hevûdin re pêşbaziyê di- kin. Li herî derve neteweperestiyên Ingilîz, Fransiz, Alman û hevka- rên wan neteweperestiyên Tirk, Fars û Ereb weke ku ne bes bûn, di nav xwe de jî, yê bi neteweperestiyên Asûr, Ennen û neteweperes- tên xwe yên hoveber re jî, rûbirû bimîne. Gelo yê bi kîjanê re bika- ribe bibe serî? Serdema karesatê bi çargavî liser dilîze. Netewepe- restiyên serdest dibêjin *“encex tu dikarî bibe Tirk, Fars û Ereb* **”,** ne- teweperestên hindikayî jî dibêjin *“xw’ediyê viryê esîl em in* Nete- weperestiyên neteweyên mezin, timî di hesabê *“gelo emê wan çawa û bi çi rengî bikarbmin?* **”** de ne. Neteweperestiya hoveber a cîgeyî jî, weke malê dawî ku di dest de mayî, di kula firotina gel a bi pênc qurûşan de ye. Ti gel li karesateke ji vê mestir rast nayên. Li nalet- bûneke ku di dîrokê de qet mînakên wê nebin, rast hatine.

Em dikarin komploya neteweperest, di çend merhaleyan de baş- tir bidin xuyakirin:

**I- Dema 1800-1940an:** Di vê dema ku ji aliyê begîtî, serokeşîr û şêxan ve te temsîlkirin û bandoreke neteweperestiya hoveber û cî- geyî ya lawaz ku tê dîtin de, leyîstik di nava leyîstikê de heye. Im- peryalîzma Ingilîz li herêmê, di pey afirandina rêveberên hevkar ên bi xwe ve girêdayî û alîgiran de ye. Jibo ku hindikayiyên xiristiyan, ereban û başûrê îranê bi xwe ve girêbide, polîtîkaya dabeşbike-rê- vebibe, êxistiye dewrê. Begîtî, eşîr û şêxên Kurd ku nav di wan tê dayîn, zorê him li rêveberiya osmanî û îranê û him jî li hindikayi- yên xiristiyan ên Ennen û Asûr dikin. Ingîliztana ku ji vê yekê sûd werdigire, rêveberiyên osmanî û îranê bêhtir bi xwe ve girêdide û dibe parêzkerê Ennen û Suryanan. Yê ku li rastê dimînin Kurd in. Çiqas serhildan çedibe, ewqasî bêhtir tê wateya dagirkerî, girtin û koçkirinê. Pêşevanên serhildêr an tên kûştin û an jî bi wan ve tên girêdan. Gel bi xwe nizane bê çi diqewime. Xwe di nava dagirke- riya ji çar aliyan ve û talankirinê de dibîne. Li başûr, ji ***Serhildana Babanzade Evdirehman Paşayê Silêmanî*** (1806), heta bi li Baku- rê Kurdistanê ***Serhildana Seyid Riza*** yê ji eşîra Ebasan a Dêrsimê (1938), serhildanên li pey hev ên bêplan û bêrêxistin, liser gelê Kurd gelekî biha tên. Bê çiqas windakirin çêbûne jî, nikare bête he- sabkirin. Serhildan biplan, stratejî û têgihîna ti rêxistinan ve ne gi- rêdayî ne.Li dora wan komployên sift tên lîstên. Her hêzeke têkil- dar li pey berjewendiyê xwe ye, lêbelê mêjiyê Kurd li holê tine ye. Begên wan pir in lê mêjiyê wan tine ye. Li hember vê rewşê, gel ji parastina canê xwe pê de nikare tiştekî bike. Ketiye rewşa civake- ke bêhtir perçebûyî, koçberiya bizorê û rencberiyê. Çîna wan a ser- dest, serê xwe ji ti pirsgirêkên wan naêşîne. Serdestên wan di pey berjewendiyên kesayetî û malbatî de ne.

Di Rojhilata Navîn de, neteweperestiya Tirk, Ereb û Iranê yên bindest ku bilind dibin, li gor neteweperestiya Kurd a hoveber, xwedî gelek awantaja ne. Heger ku bi hoveberî be jî, di destê wan de hêzên dewletê hene. Xwedî partiyên neteweperest ên bihêz in. Çîna wan a neteweperestên burjûvayên piçûk pêşve diçin. Mîhra- qên Kurd ên neteweperestên hoveber gelekî qels in. Hêzên eşîrtî yên kevneşopî, hêza

xwe winda kirine. Begîtiyên bihêz ên dema borî ji holê hatine rakirin. Dema ku em tên dawiya vê demê, qurba- nên komploya neteweperest bi pêvajoya jiholêrakirinê ya herî bi êş re rûbirû ne. Tevgera neteweperest a Ennen, piştî qirkirinên sift, axeke xwe ya berfireh terk dike û li dîasporayeke dîrokî rast tê. Dî- sa qedera asûriyên ku gelekî herî kevnare jî, bi vî rengî ye û bi qir- kirin û koçberiyan yê werine rewşa gelekî dîasporatiyê. Rûm jî yê welatê xwe yê 3000 salan Anatolya yê, bi heman şêweyê terk bikin. Kurd, digel ku gelek bicîhkirinên mecbûrî dijîn jî, weke gelekî jev- belavbûyî lêbelê bi awayek fizîkî yê li cîhê xwe bimînin. Belkî jî xêra îslamtiyê ya bi tenê, ev mayîna li cîhê xwe ye.

Eslê wê rewşa wan gelên din jî ewqasî ne rewnaq (geş) e. Tirk, Ereb, Fars û gelên din ên misibnan, bi qedandina xwe ya di şeran de, rewşa herî hejar dijîn. Bi taybetî neteweperestiya ***îtihad û Te- rakî,*** Bi mîlyonan zarokên Rojhilata Navîn di şeran de dan qirki- rin, bûye berpirsiyarê hilweşanên herêmê yên herî berfireh. Nete- weperestiya Ereb-îsrael, di rewşa haveynbûnê de ye. Netewepe- restî liser asoya herêmê, weke ewrekî tarî diçe û tê. Di vê demê de, çend gelên kevnare ji holê radibin û Kurd di rewşa gelê herî birîndar de ye. Gelên din ên Tirk, Ereb û îran jî, di nava rewşeke perîşan de ne. Mîrateya neteweperestî ya jibo gelan, ev rastiyên bi êş, bi xwîn û bi ji holêrakirin e.

**II- Dema 1940-1975 a PDKan:** Tebeqeya Kurd araserkujimer- cên şerê cîhanê yê duyem sûd girtî, di derdê qezenckirina hêzê û bi- destxistina berjewendiyan de ye, di bandora pêşveçûnên di tevaya cîhanê de dimîne, di dawiyê de hewl dide û xwe weke rêxistineke neteweperest a burjûva ku li pey otonomiyê îlan bike. Derdorên ku tevlî vê rêxistinê bûne, ji tevlîheviya feodal û burjûvayên piçûk tên holê. Giraniya hêzên feodal serdest e. Rêxistinbûneke modem a ne- teweperest bisemaxin. Demên pêşî xwe bi bloka Sovyetan ve ya ku prestîja wê bilid dibû ve girêdidin û dixwazin ku otonomiyê bidest- bixin. Lêbelê ji ber damezraka çîna wan, jênerev e ku bikevin bin bandora hêzên emperyalîzm ên herêmê, DYE û Îngîliztanê. Weke hêzeke teze, dikevine bin kontrola îsrael jî. Împeryalîzm, jiberku vê demê, ji partiyên hevkar ên sosyalîsta reel û bizavên tundraw ên çep û

neteweperest ditirsiya, jibo berjewendiyên xwe, baştir dibîne ku kontrola potansiyela gelê Kurd, bide van partiyên bi navê PDK. Partiyên PDK, jibo daqûrtandina enerjiya şoreşger, peywira paratonerê (birqgir) dibînin. Ev partî, tevgereke şoreşger a ku di sînga gelê Kurd de şîn were, qet jibo berjewendiyên xwe baş nabînin. PDKan weke amûreke kedîbûyî, him jibo ku kurdan hînbikin û di bin kon- trolê de bihêlin û him jî jibo ku welatên cîran di derbarê pirsgirêka Kurd de, bi xwe ve girê bidin û ji wan sûd bigirin, diparêzin. Di de- mên hişyarbûna gelê Kurd ên neteweyî de, dixwazin ku ji malbatên began, efendiyên burjûva liser serê wan amade bikin. Derûna komp- loya nû ev e ku, bi efendiyên burjûva ên çêkirî re gelê Kurd têxin bin kontrola xwe. Annanceke vê nêzîkayiya komplokerî ya din jî ev e ku, gelê Kurd ji serokatiya şoreşger a ku him ji wan û him ji hev- karên wan hesêb bixwaze, bêpar bihêlin.

Çawa ku serokê şoreşger ê kurdên îranê Silêman Mûînî, serokê kurdên Tirkiyê yê şoreşger Seîd Kinnizitoprak û gelek milîtanên şoreşger, bi komployên ku bi serokatiya Barzanî hatin kûştin. Jibo ku serokekî serbixwe şoreşger û rêxistinek demekeve holê, li hemû perçeyên Kurdistanê, bi çalakiyên sîxûrî nêçîra seriyan dikin. Digel ku di vê demê de, li tevaya cîhanê serokatiyên şoreşger, di têkoşî- na demokrasî û rizgariya neteweyan de mînakên serkeftî didin jî, Ji ber komployên ku PDKan dilîstin, serokatiyeke şoreşger a kurdan demakeve holê. Armanca lîstik û komployan ev bû ku, gelê Kurd di bin kontrola PDKên kurdperwer ên sexte de bihêlin, ji ber vê ye- kê jî ji serokatî û rêxistinên şoreşger û welatparêz bêpar bimînin, herwiha rêxistinbûna sosyalîzma reel jî bêbandor bihêlin.

Gengaz e ku were gotin “peywira demokratîk a welatparêz ne ez dikim û ne jî bi kesekî didime kirin”. Hinek taybetmendiyên hev- karên Kurd ên li gor xwe hene. Tenê bi pêkanîna fennana hêzekê ranawestin. Hêzên ku zanibin ên hesab ji wan bixwazin, bi komp- loyan berî dijmin ji holê radikin. Ji ber van taybetiyên damezraka wan e ku heyînên herî paşverû yên Rojhilata Navîn in. Şerê wan ê ku bi PKKê re kirin, ji ber van taybetiyên damezraka wan e. Sede- ma bingeh ku bi PKKê re ketin şer jî, tirsa wan a ku esehiya wan derkeve holê û pêwîst be hesab bidin gel bû. Rizgariya gelê Kurd a ji hêz û bîrûbaweriya komploker a hezar

salan, encex bi rast nirxan- dina encamên vî şerî û bi çêtirgirtinên rast ên azadiyê ye

**III- Dema 1975-2000an:** Ev dem, dema beyeniya PKKê û azadi- ya wê ye. Em dikarin bibêjin ku ti tevgerên civakî, mîna PKKê li rastî komployên der, ên hundir û xiyanetê nehatine. Şerê ku bi netewepe- rest û şovanên civakî re hatî meşandin, taybetiya bingehîn a vê demê ye. Annanca bingeh ev e ku, bersiva hewceyiya gel a serokatiyê we- re dayin. Gelek hêzan, di dîrokê de yekem car dîtin ku kontrola kur- dan ji destê wan derket, di tevaya cîhanê de dest bi lîstikên mezin ki- rin. Têkoşîna di eniya bîrdoziyî de te dayin, yê nasnameya hêza ku ji gel re serokatiyê bike û pêwîst çawabe, diyar bike.

Neteweperestiyên neteweya serdest a herêmî, yê vê demê kurdên hevkar ên kevneşopî weke hêzeke cîgir, li cem xwe xweyî bikin. Y ê hêzê bidin ku serdestiya bîrûbawerî ya bennayiyên serdema navîn, bi rêya terîqetan bidin berdewamkirin. Li qasî ku bandorker bibin, di serî de partiyên sazûmanê, yê hemû saziyên hemdem ên siyasî, civakî, aborî, sportîf û hunerî, jibo pêşgiriya gel ku bîrûbaweriyeke azad qezencnekin, yê bi awayek ji rêbibin û bêesil bikin, bikarbî- nin. Annanca wan a pêşdatir ev e ku, yekîtiya bîrûbaweriya gel a azad, bi komplokeriya neteweperestiya neteweya serdest û netewe- perestiya cîgeyî a hoveber, vala derêxin.

Hêzên global, yên mîna DYA û YE jî, hesab dikin bê di herêmê de, bi pêwana kurdan ê çiqasî hîkarîker bibin û li gor vê yekê polî- tîkaya xwe didin meşandin. Dema ku zincîra komplo ya cîhanê li dora PKKê timam bû, hêzên dîrokî û yên rojane li dora hebûna Kurd bûne ristik û weke qijikên ser kelaşan, bê ye nikilê xwe li kû- derê bixin re tekildar in.

## 2- Rastbîniya Komplo ya ku PKK Jiyaye

Rêxistinbûnên ku bingeha wan a civakî hebe, heger ku li binya- ta xwe bi bawerî û hişmendî dest bi rûniştinê bikin, dîroka wê civa- kê carake din giyandar dibe û bi têkilî û nakokiyên xwe yên heyîn di bin mercên nû de, hewl dide ku jiyanê bibîne. Di vî babetî de, her

rêxistinbûnek destekariyeke civakî ye. Di dema ku derkeve holê de, herî pêşî hemû fonnên jiyanê yên ku heyîn, pirsiyarî dike û dadiri- zîne. Bi fonnên derbasdar re, jibo ku fonnên nû bafirîne dibe yek û bi fonnên ku şensê jiyana wan tine re, dikeve neva têkoşîneke tund. Têkoşîn dikare ji warê bîrdoziyî derbasî şidetê bibe û gelek qadan wergire. Jiberku pêvajo pêvajoyeke mirin û mayinê ye, bi taybetî di mercên derketinê de, jênerev e ku bi xwîn û êş derbas bibe. Di da- wiya şerekî nûhîner de, bê çi di behreya jiyanê de ye û çi ne tê de ye, zelal dibe. Di van demên ku bi demên şoreşgeriyê tên binavki- rin de, heger ku têkoşîn bi kûrahîke terayî û bi şêweyeke rast hati- be dayin, bigelemperî yê aliyên ku werin hilweşandin hatibin der- baskirin. Êdî li paş dimîne pêvajoya nûkirina civakê. Ev dem kêli- ya herî xetemak e û pêwîst e baş were texmînkirin. Xeteyên trajîk ên dîrokî û herwiha têkçûnên wê jî, di kêliyên wiha de pêktên. Ber- dewamkirina rêzikên demekê yên bi heman rengî, bersivnedana mercên dema nû, yê xwe bi marjînalbûn û terîqetbûna paşverû nî- şan bide. Heger ku rêxistina şoreşger jî nebe bersiva vê yekê ya bi erênî, ji veguherîna heman marjînalbûn û terîqetbûnê rizgar nabe. Ev hemû pêvajo têne vê wateyê ku, Rastiyên civak di pêvajoya dî- rokê de jiyaye, ji nû ve bi şidet û di navbera demeke kin de, bi le- hengî û rezîliya xwe, bi rastî û şewşandinên komplokerî, bi xweşi- kayî û nerindiya xwe, careke din ji tirba xwe radibe û tê zimên.

Ev terîfkirina gelemper a di derbarê destekariyên civakî de, pê- divî ye di rastbîniya Rojhilata Navîn a civakî de, bi îfadeyên rese- ne yên wesfdar werin terîfkirin. Jibo vê civakê, kişandina şêweyên rêxistinî yên şaristaniya kapîtalîst a Ewropa, yê fikareyên ku bi bin- yata xwe re lihev rast neyê û vexwînî hev nebin, bi xwe re bîne. Weke ku her ax her berî hilnegire, dibe ku her çand jî, berhemên çandên qadê cuda hilnegire. Veguhastin, çandin û bidestxistina ber- hemdariyê, dema ku gelek resenî li ber çavan bêtin girtin û pêdivî werin bicîhanîn, yê gengaz be.

Weke ku ji wergiriya nirxandina me jî tê fêmkirin, Civaka Roj- hilata Navîn weke daringeke ku ji gelek pêkvedayiyên (amêjen) cu- da hatibe çêkirin e. Digel ku binyata çanda cîhanê ye, piştî hezar sa- lên dawî, çandeke ku afirîneriya wê qediya ye. Rola afirîneriyê, di bin diyarkeriya vê çandê de, dikişînine Ewropa. Ax û çandên wes- tiyayî, weke nîvmiriyekî ketina xeweke kûr. Ewropa, bi taybetî piştî salên 1500an,

weke ku cîhanê bi wê destpêkiribe xwe di eci- bîne, bi sexbêriyeke eznavendperest serê xwe hildaye û dimeşe. Li gor xwe bihişt û dojehên nû dafirîne. Weke xortê nezan ku bi qed- rê kalikê xwe nizanibe, li qasî ku binyata xwe ya Rojhilata Navîn nasnake, ji piçûkdîtin û kampanya zemkirinê paşde namîne.

Ewropa çiqas ku xwe welidand û bisazîbûn kir, li cîhanê belav bû û xwe serdest kir, hesab dikir ku hemû kes vê rastiyê binase. Di- be ku ji hemû aliyên cîhanê yên din re ev yek rast be. Lêbelê jibo civakên Rojhilata Navîn meşandina vê yekê zor bû. Heger ku qam- bost bûbin jî, afirînerên şaristaniyê hê li cîhê xwe bûn. Heger ku bi- temamî jî werin kûştin, çanda wan ku li her derî nifûzkirî, yê rese- niya xwe ferz bike. Ewropa ku pêl bi pêl bi ser herêmê de dihat, ser- destiya ku dixwest pêkneanî. Ji hesabkirina çewt a çanda qadê riz- gar nebû. Rojhilata Navîn, bi hêza leşkerî, aborî, siyasî, civakî ya civaka ku dijî li berxwenedida, li berxwebidana jî, şensê wê yê ser- keftinê tine bû. Yên li berxwedidan, hêmanên ku taybetiyên gene- tîk ên şaristanî û çanda kevin qezenc kirî bûn. Heman encam, jibo belavbûna sîstema sosyalîzm a reel jî, derbasdar bû. Ewropa ku bi çep û rastên xwe jî hate ser Rojhilata Navîn, dîsa ji semekeftinê riz- gar nebû. Li holê ti serfirazî û serkeftinên Rojhilata Navîn jî tine ne. Digel ku nebûye Japonya û Çîn, ti rewşa wê nîne ku bibe Afrîka,
Awustralya û Amerîka Başûr jî. Tenê tişta ku serkeftî bûyî, hebûna orîjînalîteya wê ye, mikurhatina wê ya ku bixwaze jî ji vê rizgar na- be ye. Şerên Ereb-îsrael, yê Iraq û îranê û têkoşîna kurdan a bi he- mû kesan re, rastbîniya vê mikurhatinê ye.Weke di hemû şewegir- tinên çanda Ewropî de, belavbûna çep û rast a siyasî û çanda wê ya bîrdoziyî li Rojhilata Navîn, gelekî qels û kêmber maye, li hember van mûştaqên îslamperest ên ku îslama feodal a Serdema Navîn bi têgînên kapîtalîzmê re tevlîhev kirin û xwest ku bibe bersiv jî, ji vê yekê gelekî dûr dimîne. Tişta ku diqewime, ji çerxa bêsûd a teqlî- dên hêsan wêdetir naçe. Resenbûyin, digel ku pêdiviye antîtezên te- zên şaristaniya Ewropa werin pêkanîn, afirînêriyeke nû pêwîst di- ke. Ev jênerev e ku, ev hemû pêvajo li axa ku cîhê komployan, bi hevkarên herî xeter ên kapîtalîzmê re hevgirtina tevlîhev, bi terîfa zor, gelo dost e dijmin e ku bi hêsanî nayê zanîn, heta weke margî- se (bûqelemûn) li gor cîh reng duguherîne,

ji derûn bêpar, derew û komplokeriya wan zêde, kesayetiya rastiya wî hindik, û di şeweya rastbîniya rêxistin û hereketê de were nîşandan.

Di van mercan de, ji serî de bi gotina "ez liser xeteke rast ber bi pêş ve diçim", encex bi xwe xapandin an jî weke gelek mînakên wê tên dîtin, bi endambûneke fanatîk a terîqetekê gengaz e. Mayina li- ser lingan û nexirakirina teraza xwe jî, hostatiyekê dixwaze. Nexa- sim bêyî ku dev ji taybetiyên mirov ên bingehîn berde, ji qirêjbûna şaristaniyê ya di warê çînî û zayend de qaqibo bike, bibêje "Ev ax dergûşa mirovatiyê ye" û angaşta " Bi rastî jî yê ku mirov be, ji law û qîzan bêpar nayê hiştin", li derî pîvanên serdemê, behre û hêza xwe ragirtinê pêdivî dike.

Di bûyera PKKê de, heger ku jê ne haydar bin jî, angaşteke mi- rovatiyê bi vî rengî ya ku dixwazin li hêleke wê veşartî û sexlem were girtin, heye. PKK ya ku bûyera Kurd ji vê angaşta xwe re ki- re bingeh, rastbînî û di cîh de ye. Heger ku rastiya Kurd were jiyan- din, ev yê weke mirovekî nû bi xwenûkirinê gengaz bûbana. Di he- bûna Kurd de mirov, di bingeha çina serdest û mêtinker de, di xala herî jêr a daxistinê de ye. Ev rawestineke ku xaleke hê binretir ne gengaz be ye. Tiştekî winda nekiribe nemaye. Zincîra koletiyê bi xwe jî -jiberku gelekî hîn bûye, bi mebesta ku zincîr nebin jî yê we- ke kerê koletiyê bijî- ji destê wî derandine. Heger ku bi vî mirovî re were lebikandin, tevlî qirêja çînî û zayend nebûbe, heger tevlî bûbe jî bêyî ku rik bike, dibêtiya ku bixwaze ji vê qirêjê paqij bibe heri bilind bû.

Dema ku PKK pêkhat di vê angaştê de bû ku, rastiyên serdest ên hemdem û rastiyeke gelê ku ji şaristaniyê re dergûştî kiriyê lêbelê ji binketinê rizgamebûye, di pêvajoya dîrokê de bûyerên ku jiyaye, têkilî û nakokiyên wî di kesayetiya xwe de berbiçav bike û çareser bike. Bê ev tê çi wateyê, me di nirxandinên xwe yên heta niha de danîn holê. Lêbelê ya bişewat, yê di pêvajoya jiyana PKKê de der- keta holê. Dîrok û serdemê, yê hemû taybetmendiyên di bûyera Kurd de, annanc û sepînên wê, mebestên baş û yên ne baş, rûyê xweşik û yê kereh, rastî û çewtiyên wê, diristî û komployên wê, di rastbîniya PKKê de carake din da jiyandin. Ya yê mîna mirovê azad û gel biketana rêya jiyanê an jî yê bimirana. Ti têgihîn û sexbêriyên din ev jiyana qirêjî û binalet ku ji kelaşê li holê xirabtir, paqij nedi- kir. Di vê çarçovê de, nirxandina dîroka PKKê yê gelekî hînker be.

**I- Ji zayinê heta bi îlankirina wê ya fermî:** Ev pêvajoya ku sa- lên 1970- 78an digire nava xwe, xwe dispêre bennayiyên mirova- tiyê yên dawî ku bi xwe re û bi angaşta ***"Ez jî heme ",*** mebesta ku hêmanên pêşverûtiya hemdem li heyîna civaka xwe bisepîne îfade dike. Di Tirkiya wê demê de, ji kesayetî û rêxistinên wêrek ên ku liser navê kedkaran hereket dikirin, bandor tê girtin. Di vê dorhêlê de, angaştên neteweperestên hoveber ên Kurd jî tên bihîstin. Evan salan, dema ku di cîhanê de têkoşînên rizgariya neteweyan gihîşti- ne bandevê ne. Yên tên perçiqandin ku şensê azadiyê ezmûn neki- ribin, bi xiyanetê li mirovatiyê re dikin yek. Lêbelê heger rastbîni- ya ku hatî perçiqandin û tepisandin çêbûna Kurd be, weke qada bi sêlax (xîz) mayina bêdestek jî, li gor xwezaya wê ye. Di pêvajoya dîrokê de, komployek, xiyanetek û hevkariyek e ku nehatibe ez- mûnkirin nemaye. Dirûşmaya azadiyê ya çend ciwanan, yê çiqasî rizgarker bûbana? Di derbarê azadiyê de, di cîhanê de daketiye rewşa civaka herî bêangaşt, ya xirabtir çineke komploker û hevkar a ku mînakên wê qet nebin, weke peywirdar li anîşkê hatiye rûniş- tandin. Di binê her kevirekî de, marek an jî dûpişkek heye. Digel vê yekê jî, ji ketina hereketeke Mesîh îsa ya hemdem nehat pelikan- din. Birastî jî şibandin gelekî hîkarîker e. Tevgera ***Esseniyên*** dema îsa û tevgera ***kedkaran*** taybetmendiyên nêzîkî hev hildigirin. ***Yali- yayê Mêrunker*** (tehfîlker) û propagandavanên sosyalîst jî pir dişi- bin hev. Aliyê herî balkêş jî, koma PKKê ya destpêkê jî qederê du- wazdeh kesan e. Bi dibêtî yek an jî du sîxur jî di nava ristê de ne.

Kom ne gelekî birêxistin û hişmend e. Ji binyata hejar û diristî aliyên wê yên diyar in. Civak nirx bi vî aliyê wan dide û jê re dibe binik. Aliyê rêbaza têkoşîna wan, bi giranî propagandaya peyvkî ye. Yê hewl bidin ku belavok û namilke (broşûr) yan bisînor biwe- şînin. Heger ku ji komê ***Hakî Karer*** ê herî dirist, fedekar û ji Der- ya Reş ku ji binyata Tirk, di sala 1977an de bi komployê nehatiba kûştin, dibe ku kom bi carekê derbasî tundrawiyê nebûbana. Li vir jî şibandin hîkarîker e. Çawa li çarsingdana îsa, hewarî bêhtir bi ba- weriyeke mezin li hawîr belavkirin û zor li zêdebûnê kir, kûştina Hakî Karer jî rê li ber encameke bi vî rengî vekir. Bêhtir bixîretbûn, belavbûna li her alî û zêdebûn, bu pîvana girêdana bi bîranîna şehî- dan. Digel ku taybetiyên komplo yên belavkirinê hene jî, bandora wê ya tundrawkirinê jî ne hindik e. Di

bûyera PKKê de komploya yekem, di derbarê angaşt, cidiyet û mezinbûnê de rola dîrokî lîsti- ye. Heger ku ev komplo pêknehatiba, bê kom yê çawa çêbûbana, mijara nîqaşê ye. Navê PKKê û bemameya wê, encama girêdana bi bîranîna Hakî Karer ve ye.

Dema ku Hakî Karer li jiyanê, bemame, îlankirina partiyê û pro- fesyonelbûna bitemamî ne di rojevê de bû. Jiberxwevebûnê giranî nîşan dida. Ji aliyê teşe ve, ji komên din ti cudahî tine bû. Heta bêh- tir serobero bû. Di derawayeke wisa de bû ku hêzên ewlekar jî di nav de, gelek komên çepgir henekê xwe pêdikirin. Pîlot Necatî Ka- ya yê ji Agirî ku weke yekem sîxurê cidî tê hizirandin bi xwe jî, he- nekê xwe pê dikir. Bûyera Hakî Karer, kartêkera herî bingeh e ku, dawî li dema komeke wiha sist anî û îlankirina partîbûnê lêferz kir.

Komployekê vê carê rê li ber tevgereke gel vekir ku êdî gavan ber bi paş ve navêje. Hz Muhemed jî heta dawî, heger ku xeteriya kûş- tina wî nebûna, ne di wê mebestê de bû ku ji Meke yê derkeve. De- ma ku plana kûştinê xwe lêferz kir, koçberî (hicret) jenerev dibe. Di dîroka îslamê de kêlika kîlometro ya herî bingehîn, ev koçberî ye. Heger ku ev koçberî pêknehatiba, mijara nîqaşê ye ku îslamtî yê ev- qasî pêşveçûba an na. Rastiya Hz îsa ya çarsingê jî, nîqaşên bi vî rengî bi xwe re tîne.

Di bûyera Kurd de, komplokerî bi awayek kevneşopî li cem yê ku dike kar dimîne. Herî bêhtir jî, rê li ber pêvajoyeke tolhildanê ya bixwîn vedike. Bandora komployê ya binisîner (tennisîner), di ci- vakê de weke rêyeke hîkarîkerbûnê tê hizirandin. Li Hîlwanê di sa- la 1978an de, komploya kûştina ***Xelîl Çavgun,*** dîsa di vî babetî de xistin dewrê. Di hate annanckirin ku koma Hilwanê ya gelekî pêş- ketî, bi vê komployê bi binisînin û jevbelav bikin. Em vê yekê nî- şan bidin ku, li pişt herdu komployan hebûn û nebûna dewletê, li- ser encamê ti bandora cuda nake. Lêbelê ev peytandineke rast e ku, helwesta dewletê ne di ser asta şopandinê re ye. Eynî weke ku ji mi- rina îsa cihûyên cîgeyî bêhtir tên berpirsiyarkirin, di van herdu komployan de jî, berpirsiyariya paşverûyên cîgeyî diyarkertir e. Di çêbûna PKKê de, helwestên çeteyî yên paşverûyên cîgeyî ku komploker rola sereke lîstine. Ev çeteyên cîgeyî ku hinek rast ên fa- şîst û hinek çep ên şovenên sosyal, demeke dirêj yê bi PKKê re qa- yîşkêşiyê bikin. Dewlet hê bi helwestên vekirî li holê xuyanake. Hevkariya cîgeyî jibo ku kontrolê jidest bemede, di wê

rewşê de ye ku mêrkûjî jî di nav de, serî li her rebazê bixe. Rêya ku gel ji kon- trola wan demekeve, di şerê ku bi xêzika PKKê re bikin re derbas dibe. PDK ya ku di vî babetî de biezmûn, di pêşêxistina pîyonên xwe de dereng namîne. Çawa ku ***Aladîn Kapan*** ê ***"pênc perçepa- rêz"*** ê Hakî Karer şehîd kirî, derdikeve ku milîtanekî komeke bi PDKê ve girêdayî. Dîsa li pişt rêxistina KUK (Rizgarîxwazên Ne- teweyî ya Kurdistan) ku dest bi mêrkûjiyên berfireh kirin û livba- ziyên pêşî li hember PKKê bikaranîn, PDK heye.

PDK vê demê yê ji xwe re peywir bibîne ku, çi liser navê hnper- yalîzmê û çi liser navê rêveberiyên neteweyên serdest ên cîgeyî, ji- bo herêmê di bin kontrola xwe de bihêle, di tevaya Kurdistanê de bi rêxistinên sîxur yen heman rengî, derketina komên şoreşger û welatparêz tepeser bike. Li hemû perçeyên Kurdistanê meferê nade derketinên şoreşger û demokrat. Rêbaza bingeh, li her derê bi şê- weya kompoyan ê bikeve rojevê. Bi vê rêyê, li hemû parçeyan der- ketinên demokrat û şoreşger ti carî bi xwe nehatine. An hatine bi- nisandin, an hevkarî li wan hatiye ferzkirin, an jî ji holê hatine ra- kirin. Li hember vêna, yekem car di kesayetiya PKKê de, li hember rawestîneke serbixwe û bi biryar hatiye meşandin. Venêrana ku îm- peryalîzm û neteweyên cîgeyî yên çewsîner dixwestin bi destê PDKê damezrînin, hatibû perçekirin, di bereka welatparêz, şoreş- ger û demokrat de, rêxistinbûnên bîrdoziyî, polîtîk û livbazî derke- tine holê. Ev di hate wateya hilatineke nû. Êdî dor dihate avêtina pêngava duyemîn.

II- **1978-1988 Komplo û jiholêrakirin:** Piştî ku dorpêça paşve- rû ya cîgeyî û pêngava pêşî ya komplokeriyê vala hat derxistin, PKK bi awayek fennî tê îlankirin û di dîrokê de yekem car liser na- vê gel, digihine bi biryarbûneke ku di xêzikeke şoreşger û welatpa- rêz re bimeşin. Tiştek xwezayî bû ku dewlet bi vê pêşveçûnê re tê- kildar bibe. Êdî hevkarên cîgeyî û rêxistinên serkar (taşeron) têra dewletê nedikirin. Cama astarê van rêxistinan ji rûyê wan bihatir bû. Herçiqas rêbazên ku komên çepgir di nava xwe de bidin levdan û dîsa çep û rastan bera hevûdin bidin, bi awayek sift sepandin jî, asta ku PKK gihayê êdî ji jiholêrakirineke bi rêxistinên serkar, ge- lekî dûr e. Bi dewletê parçekirina ji navxweyî ve û bi rêya hinek hevkarên wê, kontrolkirina

wê, bêhtir dikeve rojevê.

PKK ya vê demê, bi livbaziya ***Hîlwan-Swêregê*** serdestî mîhra- qên cîgeyî yên paşverû bûye, bigirse bûye û ber bi Rojhilata Navîn ve berfireh bûye. Kontrolkirina wê ya ji alyê dewletê ve jî zor bû- ye. Êdî çêwsandin û girtinên rasterast jênerev in. Çawa ku derbeya ***12ê îlonê*** û rejîma leşkerî bi vê annancê pêşdikeve, li tevaya Tirki- yê girtinên berfireh pêktîne, PKK jî ji vê yekê derbeyên mezin dix- we. Lêbelê vebûna rêya çiyê û hinek kanalên derve, derfet daye pa- rastina hinek hêzan. Lêbelê dewletê berê xwe daye girtiyan, zorê li mikurhatinê dike daku komên li derî welat bê erk bihêle.

Di vî derbarî de du navên kilît, ***Kesîre Yildirim*** û ***Şahîn Donmez*** in. Şahîn di nava girtiyan de û Kesîre li derveyî welat, ji xwe re ki- rine peywireke bingeh ku, liser hevalan bandora xwe bikin û parti- yê têxin bin kontrola xwe. Dahûrandina di derbarê van herdu kesan de, yê hê bêhtir hînker be. Abdullah Ocalanê ku serokê komê yê xwezayî, bi van herdu navan re ji nêzîk ve têkildar bûye. Herduk jî ji Dêrsimê ne. Şahîn ji malbateke daketî ya ji bennayiya serhildana Dersimê ye. Berevajî vê, Kesîre ji malbateke ku di pêvajoya serhil- danê de, alîkariyeke mezin daye dewletê û ji asta raser a komarê ji ***înonn*** teqdîmame standiye tê. Herduk jî li Enqere di derdorê zanîn- gehê de, weke çepgir tên xuyakirin. Di pêvajoya veqetîna ji çepgi- riya Tirk de, bi herdukan re jî hevdîtin hatine çekirin û herduk jî qa- yîl bûne ku di koma liser navê Kurdistanê de cîh bigirin.

Vê têkeliyê, endamên komê yên din diltepîn (diltirs) kiribûn. Şa- hînê bi rewişta sûtal û malbata Kesîre ya ku ji ber serhildanê pir di- hat naskirin, di vê de kartêkerên bingeh bûn. Lêbelê baweriya bi ta- kekesiyê û binyat negirtina malbatê, taybetmendiya bingehîn a ko- ma nû bû. Ji aliyê din ve, girtina endaman a ji her herêm û ji her be- şê, pêdiviya welatparêzî û yekîtiyê jî bû. Heta bi girtina ***Hakî û Ke- mal Pîr*** ên ku ji binyata Tirk, hatiye xwestin ku ji serî de biratiya di nava gelan de, têxin nava ewlekariyê. Rewşa Kesîre, bi gelem- perî jiberku vate bi wekhevî û azadiya zayenda jinê bête dayin û bi taybetî jibo ewleyî bi zarokên gelek malbatên bi vî rengî were da- yîn, weke gaveke di cîh de be dihat xuyakirin. Jibo destpêkê me- besta baş jênerev bû.

Van taybetiyan, ji aliyê Abdullah Ocalan ve nirxandineke nêzîkî

îdealê ji aliyê siyasî, bîrdoziyî û pevrayiya zayendan ve û bire heta bi ezmûna zewacake bi Kesîre re. Digel ku hestyarî û ramanên Oca- lan jidil bûn, jibo Kesîre, bê çi rast bû hê îro jî demeketiye holê. Vê têkiliyê, bi hindikayî li qasî kûştina Hakî Karer, bandor li PKKê ki- riye. Nirxandina têkiliya Kesîre ya weke sîxûriyeke hêsan, yê nêzî-

kayiyeke ne bitêrayî be. Tê zanîn ku ev kes ne di kula ku bibêje "îleh ezê têkevim komê" de bû. Hatiye çavdêrîkirin ku di zewacê de ne bi xwestek bû û xêzikeke mirî dişopand. Em dikarin bibêjin ku ne di rola sîxuriyeke ketûber de jî bû. Dema ev taybetiyên wê li ber çavan werin girtin ku, digel yeke gelekî baqil bû û xwedî çav- dêriyên zexm bû, jibo komê bi çalakî nedixebitî, di serî de Ocalan û li hember kesayetiyên girîng ên komê helwestên navtêdanê nîşan didan, bi gelemperî diket nava sexbêriyên weke sarbûna marekî, bi tegihîna têkiliyeke bêdilê xwe hereket dikir, helwesteke wisa nîşan dida ku mêrekî mêr, bîst û çar saetan nikaribe bihevaltî pê re bimî- ne, digel ku kapasîteya wê pir mezin bû jî, ev li coşbûna şoreşgeri- yê venedida, asta têkiliyên wê bigelemperî li gor wê xwedî taybe- tiyên navtêder bûn, pêwîst e di derbarê wê de hê bêhtir bi kûrayî nirxandin werin kirin. Ev jî mijarên girîng in ku, di nava rêxistinê de yekem car Şahîn, xortê ji Meletiyê bi navê Celal bi awayek ho- vane liser tirba wî dikûje. Kesîre jî keçika bi navê Eyşê ya ji Pazar- cixê ku keça muxtarekî bû, bi hênceta ku bi xortekî re ketiye nava têkiliyên nelirê, li Bekayê di şikeftekê de heta ku dimire dihêle. Edî piştre ev sexbêrî di nava PKKê de dibe xêzikek. Tê zanîn ku Şahîn, pêşevanê polîtîkaya êşkenceyên liser girtiyan dihat sepandin bû. Dîsa tê zanîn, ev sexbêrî bûye sedema ku kadroyên di asta seroka- tiyê de, yên mîna Mazlûm, Xeyrî, Kemal Pîr û Ferhat Kurtay, bi ro- jiya mirinê û şewitandinê, dawî li jiyana xwe anîne. Weke komplo- yeke navxweyî, para wî di sedan mikurhatinan de heye. Vê yekê gewixandina berember bi xwe re aniye û rê li ber Berxwedana Zîn- dana Amedê vekiriye. Ya dihat ferzkirin komployeke klasîk bû. Ar- manc girseya girtyan û vedanên wan yên derve bûn. Dewlet di ke- tina rêyeke stemkar de, rola sereke lîstiye. Lêbelê berxwedana zîn- dana Amedê, piştî 20 salan jî weke kevneşopiyeke zindî berdewam dike û di veguherîna polîtîkaya zîndanan de, rola xwe ya dîrokî lîs- tiye. Di xêzika PKKê ya azadiya gel de, weke îfadeya sembol a ra- westîna zexm, cîhekî dîrokî girtiye. Di

çûyina ber bi pêngava 15ê Tebaxê de, bandora rojiyên mirinê diyarker bûye. Heger ku ev ro- jiyên mirinê nebûna, pêngaveke bi vê şêweyê ne dihat rojevê. Ça-

wa ku girêdana bi bîranîna Hakî Karer ve , ber bi îlankirina PKKê ve biribû, girêdana bi bîranîna berxwedana zîndana Amedê ve, ber bi îlankirina 15ê Tebaxê ve biribû.

Ev mînakên ku di derbarê van herdu komployan de, bê çawa li- ser dîrokê hîkarî kirine, gelekî hînker in. Heger ku ji aliyê dewletê ve, ev kar heta bi rojiyê mirinê nehatiba birin û hinek mukirker (îti- rafker) weke nevtêder nehatiba bikaranîn, li welat dorhêla demok- ratîk û aştî ewqasî xira nedibû. Heger ku jibo qezenckirinê nêzîkayî hatiba kirin, dewlet û demokrasî yê hê zûtir bi qezenceke mezin ji nav derketa. Evqas êş û windakirin li hember hev çênedibûn. Li Rojhilata Navîn polîtîkayên kevneşopî yên bi dawîkirinê, bêparbû- na ji lihevkirina demokratîk, liser dewletê, liser gel û di serî de PKK, liser rêxistinan jî gelekî biha hatiye.

Di vê demê de, hîkariyên Kesîre hê bêhtir hewceyî nirxandinê ne. Dibe ku bi encama damezraka me ya li derveyî welat, di nava xwe de bênefes bihêle û hîkariya serokatiya xwe zexm bike. Bi he- man rewşa ku li Ewropa dayî domandin, vê dawiyê tê xwestin ku veguhere perçebûnekê. Têkiliya ku bi Parêzer *Hiseyn Yildirim* re ketî nav, helwesta Yildirim a di girtîgehê de, nezîkayêyên wan li se- rokatiyê, hê jî bi mijarên ku werin ronahîkirin tije ne. Diyar e ku di jiholêrakirina PKKê de, hewl didin rola sereke bilîzin. Lêbelê vê yekê gelo jibo kariyarîzm û PKKeke din, an jî weke sîxurekî diki- rin, digel gelek şanan jî, mijarên ku liser wan pir were nîqaşkirin in.

Heman mijar dikarin jibo *Ali Çetinei; Mehmet Şener li Selim Çurukkaya* jî, werin gotin. Çetîner, eynî şêweya Kesîre yê mêr e. Digel ku xwedî kapasîte ye jî, helwestên wî yên gumanbar û kev- neperest, di kûştina Palme de rewşa wî ya ku bi Yildirim re rêve- beriya Ewropa dikir, digel ku di vê bûyerê de roleke PKKê ya fennî nebû jî, hiştina wan a di nava gumanan de, di derbarê teza *“dewsa Kurd”* de pêşkêşkirina wan a kereseyan, aliyen wan ên tarî derdixe holê. *Selim Çurukkaya* û *Mehmet Şenei;* eynî helwes- tên *Şahin Donmez* û *Yildirim Merkit* nîşandane, bêyî ku rasterast li ber rêxistinê rabin, jibo ku ji nav ve bidest bêxin, xwestine bi helwesteke bi hêrs bidin meşandin. Di bin navê PKKke cuda de, çûna wan a ber bi jiholêrakirinê, bi awayek berbiçav diyar e. Tiş- ta were zanîn ev e ku, digel mikurhatina Şahîn a eşkere, xweste- ke van herdukan bê yê çiqasî û çawa rola mikurhatineke veşartî

bidin meşandin e. Têkiliyên ku di ser dewletên Ewropara didin meşandin, pirsgirêka ku bi kê ve girêdayîne jî, bi xwe re tîne. Ev vekirî ye ku aliyên wan yê dişibin xêzika ku Çetîn Gungor dime- şîne, hene. Tê dîtin ku Ahnanya, jibo ji aliyê dîrokî ve liser kur- dan, ji aliyê hîkarîkeriyê bi gelemperî liser Rojhilata Navîn û Tir- kiyê damezrîne, li kesên bi vî rengî xwedî derdikve. Ev rewş bi mafên mirovan û sexbêriya demokratîk nayê ravekirin, ev yek di- yar e ku ev parçeyek ji xebatên baskê ku bi xwe ve girêde ye.

Bi rihetî tê fêmkirin ku Ahnanya dixwaze, ji PDK, PSK û ber- mayiyên PKKê blokeke Kurd pêkbîne û vê di zemîneke legal de rûnîne. Ev tiştekî xwezayî ye ku, bi dewletên herêmê û Tirkiyê re jibo lihevkirinê hewl bide. Dema fêmkir ku PKKê weke dixwaze nikare kontrol bike, bi hewldanên mezin qedexe kir, xwest ku bi- kire û marjînal bike. Ji vê demê û pêde, dibe dewleta herî sereke ku liser PKKê herî bêhtir disekine, bi pêkutiyan dixwaze ku enca- mekê bigire. Destekên herî mezin dide dijberên PKK û dijberiya wê. Derfetên mezin dide komên Kurd ên nêzîkî xwe. Bi gelem- perî, di bingeha xêzka serdestî ya liser Rojhilata Navîn, Mezopo- tamya û Tirkiye, hereket dike. Tê dîtin ku di warê mafê mirovan û demokratîkbûnê de, helwesten sexbêrî nîşan nade, herî bêhtir weke amûran bikartîne.

DYA û Ingîlistan jî, dixwazin ku blok û xêzikeke Kurd a bi xwe ve girêdayî pêkbînin. YNKê weke hêzeke sepandinê xweyî dikin. Jiberku pêşveçûna PKKê ne li gor berjewendiyên vê baskê bû, bi taybetî ji sala I990an pêde, teqîbeke hişk dane meşandin, hîkariya xwe ya li tevaya cîhanê jî bikaranîn û serokatiya PKK teslhn kirin. Jiberku dewletên herêmê PKK kontrol nakin, vê yekê zor li DYA û dewletên Ewropa kiriye ku rasterast helwestên xwe nîşan bidin. Ji ber vê yekê gelek destekên darigî û dîplomatîk dane dijberên PKKê. Ji hewldanên xwe yên ku kuklayên xwe li şûna PKK bi cîh bikin, paşde nemane. Weke encamê, netepisandina PKK û pêngava 15ê Tebaxê, rewşên ku Tirkiye derbas bikin derandine holê. Gelek dewletên ku hesabê wan liser kurdan heyîn, ber bi helwestên li dij PKKê ve birin. Hêzên cur bi cur, pûte pê dane ku viyaneke kurdan a azad demekeve holê.

Dewletên herêmê jî, ji dêvla ku viyana Kurd a azad nasbikin, hewldanên mezin nîşan dane ku têxin bin kontrolê. Ji têkiliyên tak- tîk

û wêdetir, ti fersend nedane PKKê. Ji ber berjewendiyên xwe, neketine nava helwestên perçiqîner. Naxwe neteweperestiyeke ku bi mandelekirinê ve girêdayî, ji aliyê hemûkan ve bingeh tê girtin. Her dewleta ku cîranê kurdan, bêyî ku azadiyê bide, girêdana “kur- dên xwe” ya bi xwe ve, weke polîtîkayeke bingeh berdewam dike. Ev polîtîka herî bêhtir di nêzîkbûna li PKKê de xwe nîşan dide.

Digel evqas komplo û jiholêrakirinên ji hundir ve, polîtîkayên çewsandin û perçiqandin ên bi desteka derve jî, viyana PKKê ya azad nehatiye tepisandin. Digel ku gelekî hejiyaye, bi teraza wê ha- tiye lîstin û ji hêza xwe jî windakiriye, dîsa PKK şensê bûyina vi- yana azad a gelê Kurd, zindî girtiye. Berxwedana zîndanê ya bile- hengî, parastina rûmeta mirov annanc girtiye. 15ê Tebaxê, wateya israra di viyana azad de hilgirtiye. Lêferzkirinên rêxistin û kesaye- tiyan yên der û hundir, cara yekem hatiye semekftîkirin, hewldanên dewletên hûr û gir ên çewsandin, perçiqandin û venêranê, vala ha- tine derxistin, weke viyana gel a azad biserketin mane ser lingan.

Ev viyana azad ku berdêla wê bûye êşên mezin û gelek winda- kirin, weke qezencekî herî mezin, di vê demê de di dîrokê de cîhê xwe dîtiye.

**III- 1988-1998 çetegerî û destekariya emperyalîst a di tevaya cîhanê de:** Digel hemû ferzkirinên der û hundir, di pêşevaniya PKKê de berdewamkirina viyana gel a azad, têkoşîn hê bêhtir bişi- det kiriye. Hinek meyldariyên ku di hundir de pêşketin, xwestin ku têkoşîna çekdarî li gor sexbêriyên xwe yên li derî sinc û hêrsa xwe ya siyasî bikarbînin, derketin holê. Kadroya ku xwe li gor hewceyi- yên têkoşîna pêşvediçe xwe nedigihand, kesayetiyên ku bi taybeti- yên civaka paşverû û bi hêrsa çîna serdest a nû hişyarbûyî diperçi-

qînin, nêzîkbûnên xwe yên komploker, di tinekirina asta bîrdoziyî û siyasî ya rêxistinê de, kirin rêbaza herî bingehîn. Jibo sexbêriyên xwe yên kêfî zexm bikin, di bikaranîna hîkariyê çiyê ya ajalker, zor- bûna venêranê û hêza çekê de, sînor nasnekirin. Ji dêvla artêşbûnê, çetegerî kirin mijara pêşbaziyê. Bêyî veqetana sûcdar û bêsûc, hê neketin tertîba şer, şêweyeke livbaziya ku di veqetanê de zorî were kişandin, kirin teşeya bingehîn. Rewşeke bêesil ku neşibe teşeyê ti şeran derkete holê. Eslê wê li hember gerîla ev rewşa ku bi kontrge- rîla tê navkirin, dîsa ji aliyê heman hêzê ve dihat kirin.

Girêdana vê yekê ya bi hevkarîtiya kevneşopî û bi nûnerê wê PDKê ve, yê raveyeke ne bi têrayî be. Du kartêker di vê yekê de ro- la girîng dilîzin: Ya yekem, kadroyên dirist û damezraka şervan ku li hember peywirên giranbûyî, xwe bi têrayî perwerde nakin. Ya du- yem, xasûktiya burjûvayên piçûk ku vê yekê fersend dibînin û hewl didin PKKê têxine rewşa rêxistineke cuda, bi gotina wan fersenda çîna gundî ku desthilatiyê ji destê rewşenbîran bidest bixe.

Jiber ku ji dennafê peywirên demên zor ên qatbiqat giranbûyî nayên der, di her saziyê de rewşên wiha dikarin derkevin holê. Ne- xasim di dorhêlên ku komployên provekekirî timî hebûna xwe di- domînin de, derketina holê ya çeteyên serhildêr û nijdevanan, jêne- rev e. Encex perwerdeyeke mezin a leşkerî û bîrdoziyî, dikare vê pêvajoyê biserkeftin derbasbike. Lêbelê dîsa jî, rola hewldana kom- ployên hişmend, ya hêzên hevkar ku timî destekê didinê û ya PDKan a di vê de, piçûk nayê girtin. Ev di drûna xwe de, dikare weke tekoşîneke çînî jî were dîtin. Çetegerî û PDK, di astengkirina ku gerîla bi artêş bibe de, ji hemû hezan bêhtir rol lîstine. Di dor- hêla levdanê de, ji sedî nod para windabûnên bêwate, berhemên vê bêesilbûnê ne. Têkoşîneke azadî ya 1993an ku yê bi hata qezencki- rin, an jî bi hindikayî yê rê li ber pêngavên demokratîk vebikira, bi qurbanî çetegeriya ku ji herdu aliyan jî rê li ber windabûnên mezin û êşan vekirî, kirin. Di neyîniya van salên ku dewlet jî û PKK jî ji xêzka xwe derketin û serûbinî bûbûn de, tegihîna çetegerî û pratîka wê, diyarker bûye. Dewletê jî ji vê yekê wêrekî dît, bawerî bi ser- keftina xwe anî, kete rêyên li derî zagonan û di dema hikûmeta Çîl- ler de, bi bîrûbaweriyeke ku di ti demên dîrokê de nehatiye dîtin, ber bi derî hiqûqê ve çûye.

Dema ku ev komplo û bêesilbûn di nava damezraka PKKê ya çekdar de tên jiyandin, liser serê gel jî, çeteyên mêrkûj ên bi mas- keya Hîzbûlah kirine bela. Bi hezaran kûştinên hovane, bi van çe- teyan hatine rêvebirin. Nêzîkî çar hezar gund û mezrik hatine vala- kirin, bi mêrkûjî û birçîbûnê gefan li gel dikin û hewl didin ku Kur- dîstanê vala bikin. Ev mêrkûjiyên ku ji aliyê peywirdarên taybetî ve tên meşandin û ji beşeke dewletê jî tên veşartin, aliyê komployê yê herî hovane nîşan dide. Jiber ku di vê de şopa hesp û se tevlîhev bû- ye, zor e ku para dewletê, hêzên derve û ya mîhraqên paşverû yên cîgeyî were hesêbkirin. Lêbelê ev mîsoger e ku ev dem, dema kom- ployên herî rezîl e ku li hember gelê Kurd ên dirist û welatparêz, hatiye meşandin. Bingeha vê qeyrana ku li Tirkiyê bi kûrayî berde- wam dike, berhema vê demê ye. Pêvajoyeke dîrokê ku yê bûbana dema biratiya gelan a bi rastî û azadiyê, bi aboriya şerê taybetî, bi bîrûbaweriya rantperest, bi raya giştî ku bê berpirsiyariya civakî, hate pûçkirin. Weke vebizaveke li dij vê pêvajoyê, **pêvajoya 28ê Sibatê** ku pêşketî, pêngaveke restorasyonê ya ku nehatiye temam- kirin e. Tevgera ku dewleta jirêderketî, careke din bîne ser xêzika rewa ye. Di vê demê de dewlet, ji aliyê bîrdoziyî ve vediguherî ko- mara terîqetan. Dewlet dihate rewşa ku laîktiya bi kêmayî, bite- mamî winda bike. Ji hêmanên laîktî û hiqûqê, bitemamî hatibû dûr- ketin. Aborî jixwe ketibû demeke qeyranê ku kûr û domdar bûbû. Liser navê PKKê bersiveke erênî ya li pêngavên 28ê Sibatê yên bi erênî, helwesteke di cîh de bû. Heger ku guftûgo pêşbiketa, nonnal- bûneke bilezgîntir gengaz bû. Vê carê jî, operasyonên di tevaya cî- hanê de ku jibo xeniqandina PKKê û serokatiya wê hatin lidarxis- tin, fersend nedane vê yekê. Eslê wê careke din Tirkiye dikişandin xêzka sala 1925an. Jibo ku Iraq para DYE û Ingîliztan bikeve, eynî weke ku sala 1925an hatî kirin, pêşî tevgera Kurd tê mezinkirin û weke xeteriyekê tê nîşandan, piştî ku gelek tewîz ji Tirkiyê tên wer- girtin, tinekirina tevgera azadiya Kurd PKK, serokatî û girseya wê ku ne li gor berjewendiyên wan, kirin annanc. Mîhraqên Kurd ên hevkar ku yê li şûna wê deynin, PDK û YNK di xeta Enqera, Was- hîngton û Londra de, dihatin hînkirin û amadekirin.

Birastî jî komplo wergirî bû û gumanbar bû ku jibo berjewendi- yên Tirkiyê be jî. PKKê jî bi agirbesta yekalî, pêkhatîbûna xwe ya jibo

levhatinê danîbû holê. Bi demokratîkbûnê û bêyî ku di ser Ira- qê re Tirkiyê têxin zoriyê, dikarîbû ber bi çareseriyeke biratiyê gav bête avêtin. Di derûna xwe de ev sexbêrî, ne li gor berjewendiyên yên hundir ku ji ranta şer xwe xweyî dikirin bû. îsrael, jibo Tirkiya ku ketî tengasiyê behtir bi xwe ve girêbide,heta bi dawî dihat bi ser PKKê de. Tirkiyê gelekî bi hestyarî li PKKê dinêrî. Weke xeteriya herî mezin diyar dikir û xwe anîbû xala ku hemû tewîzan bide. Li der û li hundir derdorên ku bi rantê ve girêdayî, ewqasî ketibûn na- va vê polîtîkayê ku di şevekê de banka li hewa direvandin û diha- tin valakirin. Berê xwe dabûn aboriya talanê. Ti hikûmetan heta ku ji vê belaşiyê nexwin, nevêbûn ku dev ji vî şerî berdin. Jibo dewle- tên Rojava yên mezin û aboriyên bihêz ên ku dixwestin Tirkiyê bi xwe ve girêdin jî, dorhêl îdeal bû. Nirxê PKKê û yê gelê Kurd ê we- latparêz ku yê were qurbankirin, li ba karê wan ê şîrîn ne titişt bû. Kurd ji mirovan ne dihatin hesêbê ku mafê wan hebe. Jixwe tero- rîst hatibûn îlankirin. Rojava ev destek kiribû.

Hevkarên kevneşopî û neteweperestiya hoveber a burjûva ku li hember PKK paşveçûn dijiyan, li bendê bûn ku kêlîkê berî kêlîkê PKK tine bibe. DYA û îsrael bi plankirina li Londra di tevaya cîha- nê de ketibûn alannê. Ber bi salên 2000an ve, di komploya dawî ya A. Ocalan de, hêzên xwe bi aliyê aborî, îstîxbarat, weke dîploma- tîk û leşkerî xistibûn dewrê. Vê carê bi mîsogerî kiribûn serê xwe ku di kesayetiya PKK û Ocalan de, viyana Kurd a azad biqedînin.

Ev plan hê jî bi kûrayî dikare were vekirin. Di van demê dawî de derketiye rastê ku serikek ji yê vê, yê ku Tirkiye xistiye nava qey- raneke kûr e. Ji ber helwesta serhildana kor ku li bendê bûn nehat nîşandan û em ketin nava helwesteke nenn, aştî, biratî û demokra- tîk a levhatinê, me pêşî li serkeftina vê komploya împeryalîst girt.

Komploya tevayî ya li hember PKK, gelê Kurd ê welatparêz û A.Ocalan, komploya sedsala 20an a dawî û ya herî mezin e. Di te- vaya cîhanê de hatiye bikeyskirin. Hatiye fêinkirin ku annanceke wê ya mezin jî stabîlîzekirina Tirkiyê bû. Tevgereke welatparêz ku biratiya gelan ji xwe re sexbêrî nîşan dayî, xwe zêde jibo van lîsti- kan nake kerese. Berevajî vê, biratiya gelan û azadiya wan çi pêdivî bike ku wê pêkbîne, pêwîstiya rêzgirtina wê ya ji derûna xwe û gi- rêdana bi gel re ye. Heta ku PKK ji êşkence û mikurhatinên zîndanê û ji komplo û çetegeriya di

nava hêzên xwe de rizgar nebe, rêzgir- tina jibo xwe bidest naxe.

PKK, jibo ji xêzika ku yê ji cudaxwaziyê re suxre bike dûr bike- ve, bi nêzîkayiyeke stratejîk a bi yekerbûna welat û yekîtiya dew- letê ve girêdayî, di nava têgihîneke parastina taktîk a spartî xêzka parastina rewa de, jibo aştî û levkirineke demokratîk, pêdiviyên berpirsiyariyên xwe bi cidîbûneke mezin bicîh tîne. Ev pêvajoya ku ji salên 2000an destpêkirî, bi kûrbûnekê berdewam dike. Dewlet jî jibo ku weke Rûsya-Çecenîstan û îsrael û Filistîn nekeve nava ba- werhişkiyeke neteweperest, pêdivî ye ku ve dema bêdengiyê baş binirxîne, tişta bikeve ser milên wê bicîh bîne û tevkariyekê bike. Pêwîst e PKKê û viyana gelê Kurd ku azad bûyî, li Tirkiyê veguhe- rîne hêza demokrasî, laîktî û dewleta hiqûqê. Ev rewşa ku hêsan xuya dike, eslê wê çareseriya aştî û biratiya gelan a herî bi vate di- gire nava xwe.

Tê hêvîkirin PKK, di kongreya xwe ya 8an de ku amadekariyên wê dike, di vî derbarî de yê pêngavên gihîştîtir û rastbînîtir bavêje. Herwiha, PKK ya ku bêhtir bi rastbînî dilive, rastbîniya xwe bi ber- siva ku dide mercan û bi veguherîna xwe çespandî, di heman demê de yê were pêkanîn ku bi şêweyeke zexm bikeve dema xwe ya nû- jenkirî. Piştî sala 2000an, Kurd û PKK ya weke îfadeya viyana wan a azad ku hişmend û birêxistinî, ketiye demeke wisa ku pêdivî ye ji her alî ve were nûkirin. Pêkanîna vê demê yê ne ji berxwe ve be. Ji serî heta bi binî, bi veguherîneke hişmend û birêxistinî yê pêkwere. Jibo vê yekê, pêwîst e ku bi xêzikeke çalakî û rêxistinî ya spartî nir- xandineke rexneyiya berfireh a dema borî ku di pratîkê de îfadeya xwe ya bi têrayî û bi bîrdoziyî, teorîk, bemameyî, stratejîk û taktîk were berbiçavkirin.

Heta ku pêwîst be dersên ji dema borî werin derxistin neyên de- ranîn û peywirên dema nû bi awayek zelal û tekûz neyên bicîhanîn, dema nû ji têgîneke bêvate wêdetir naçe. Jibo ji dîroka PKKê ya ku biêş, windakirinên bêvate, fersendên azadiyê ku hatin berdan, le- hengî, trajedî, daketin, jiholêrakirin û komplokeriyan tije derbas- bûyî hinek dersan derînin û peywirên pêdiviye biçihbînin, em dika- rin gelekî kurt wiha birêzînin:

**1-** Li hember peywirên li pêşya xwe, heta ku arastineke bîrdoziyî ya bi terayî neyê pêkanîn, di peywirdarkirina ku têkeve nav û raye- darkirina di rêveberiyê de, yê jênerev be ku di pratîkê de bêesilbû- nên

mezin derkevin holê. Kes û yekeyên ku tekûziya bîrdoziyî, ze- lalbûna xêzkê, rewşa mirûz û wijdan, behreya plansaziyê, hêza bi- rêvebirin û venêranê bi wan re nebe, nayên peywirdarkirin. Dema ku peywir were dayin jî, yê jênerev be ku rewşên ji xiyanetê xirab- tir û neyîniyen neyên hêvîkirin, derkevin holê. Herwiha peywira bingeh ku ev ders dike bar, her rayedarî û peywirdarkirin, yê karê li pêşya xwe çawa û di çiqas demê de bîne cîh, kîjan derfetan pê- wîst dike, pêdiviye bi çend kesan, li hember kê yê berpirsiyar be û fennandariya kê bike, divê ev mijar bizelalî werin plansazkirin, pratîkirin û venêrankirin.

**2-** Li hember livbaziyên ku rê li ber serhildanan û têkoşînên çekdarî yên mezin vedike, pêwîst e hezar caran bihizirin û carekê bikin. Heta ku neyê zelalkirin bê çima, bi çi annancê, li hember kê, di çi- qas dem û wergiriyê de, bi kê re û çawa yê were meşandin, destpê- kirina serhildan û têkoşîna çekdarî, yê rê li ber mêrkûjiyên mezin, bêesilbûn û herwiha semekeftinan veke. Encex dema ku hemû rêyên jiyana rewa û azadîbûnê bizorê werin xitimandin, hiqûq were binpê- kirin, di plana takekesî û çandî de û bi bê mafdarî mirin li gel were ferzkirin, ne tenê weke pêdiviyekê weke mafekî rewa ku di destûrên bingehîn û zagonên gerdûnî de jî heye, serî li serhildan û têkoşîna çekdarî tê dayin. Annanca serhildana çekdarî ya bi şêweya gerîlatî ev e ku, heta pêdiviyên hiqûqê gerdûnî û îfadeya vê ya destûra bin- gehîn ango ya di zagonên YN de jî tên îfadekirin ku Tirkiye jî di nav de ji aliyê gelek dewletan ve hatiye pejirandin, mafê takekes û ge-

lan ên sê nifşan were bicîhanîn, weke şêweyeke têkoşîna rewa, bikaranîna mafê berxwedana pîroz a gelê xwediyê mafên demokratîk û hemwelatiyên azad e. Ne serlêdana vê tekoşînê, semelêdana wê yê bibe nepêbaweriya demokrasiyê, ango yê were wateya ku li hember dewleta demokratîk a hiqûq, bicîhneanîna peywirên xwe. Pêdivî ye xwerexnekirin di vê çarçovê de were bicîhanîn.

**3-** Xêzka serhildan û gerîla a ku PKKê di rabirdûyê de sepandî, mafê parastina rewa him ji aliyê xêzka siyasî û him jî ji aliyê leş- kerî, stratejî û taktîkan ve derbaskiriye. Vateya wê tê vê yekê ku, di derûn de nebe jî, di teşe de bemameyeke ji cudaxwaziyê re vekirî, weke leşkerî stratejî jî bi hêrîşkerî, ketiye rewşeke serî li gelek ar- mancên taktîk bixe ku pêdivî ye jê ne berpirsiyar be.

Li hember vê yekê, ji aliyê sexbêriya bi bîrdoziya xwe re, rewşa xwerexnekirinê ku pêwîst e bikeve nav, vesazkirina bemameya ji nûve ku li gor yekeriya welat e. îfadeya vê ya gelemperî û dirûşme ya wê ev e : Bemameyeke ku sînorên her welatkî perçeyên Kurd li nav bingeh werin girtin, di nava van sînoran de pevrayiyeke azad annanc were girtin. **“Welatê demokratîk, perçeyê azad”,** îfadeya bemameyî û sedema siyasî ya mafê parastina rewa ye.

Gihîştina têgihîna bemameyeke bi vî rengî, li qasî ku pêdiviye- ke xwerexnekirinê ye, ji aliyê leşkerî ve jî, pêwîst dike ku derbasî rewşa parastina rewa ya stratejîk bibe. Rewşa parastina rewa ku hatî pêkanîn, pêwîst e behtir bi hêman, bi arastin be, di hêz û rekû- pêkiyekê de be ku aşitî û demokrasiyê û dewleta hiqûq tekûz bike. Rewşa wê ya çawanî û çendanî, binke (baregeh) girtina wê, lojîstî- ka wê, perwerdeyî û rêxistinbûn were hesêbkirin, şêweya fennan- dariyê di wê hêzê de be ku bersivê bide hemû hêrîşan, ev maf pê- wîst e were bikaranîn.

Hêzeke ku li qirkirinê rast were, ne hêza parastina rewa ye. En- cex ev hêza ku xwe tine bike be. Di rabirdûyê de, rewşên wiha ge- lekî hatiye jiyandin. Heger rewşa yekîneyan a çawanî û çendanî ne li gor binke girtin û fennandariyê be, ne xwedî lojîstîk be û rê li ber gelek tinekirinan veke, an pêdiviye dev ji vê rewşê berde û şarwer bibe, an jî derbasî pişt sînoran bibe.

Di dema borî de li qasî ku ev yek bi berfirehî hate kirin, bêyî ku pêdiviyeke wê bicîh bînin, ger û tevgera “gund bi gund”, li vî çi- yayî û

çiyayê din a mîna beradayiyên serhildêr, bi mîsogerî nabe şêweya parastina rewa. Ji sedî nod sedema windabûn û neyîniyan ev sexbêrî ne. Di bingeha parastina rewa de yekeyên ku dixwestin li nava welat binke bigirin, pêwîst e hemû mercên vê bicîh bînin. Berevajî vê li navê PKK nayê xwedî derketin û nayê destekkirin. Ev yê jênerev be, yekîne û xebatên bi vî rengî ku yên tinekirinê bin, fersendê bide derdorên ku di demokrasî û aştiyê de berjewendiyan nabînin û têkoşîna gel a aştî û demokrasiyê têxe astengiyê.

Lêbelê sazûmana parastina rewa heta hetayê li pişt sînoran namî- ne. Mercên roja me ku bi lezgînî ten guhertin, destûrê nadine vê ye- kê. Heger ku bide jî yê gelek neyîniyan bi xwe re bîne. Herwiha li pişt sînoran, ji aliyê her perçeyî ve encex karibin demeke maqûl bi- mînin. Bi dewleta têkildar re, di bingeha xêzka parastina rewa de, levkirina aştî û demokratîk tê lêgerîn. Heger ku bersiv neyê dayîn an jî bi şêweya hêrîşê be, jibo aştiya birûmet û levhatineke demok- ratîk were pêkanîn, di bingeha ku çarçova wê hatî xêzkkirin de, pê- wîst e tevkariya bi aştiyê re, bi rêya şerê çekdarî, bibinke girtineke şêweya rast û bi parastina gel bide domandin. Ev pozîsyon li hem- ber hemû dewlet û hêzên têkildar, dabaşa xeberdanê ne. Ev yek pê- diviya xwerexnekirina bingehîn a dema nû ye ku, pûte pê dayina di- lopek xwîn belaş neherike, lebelê jibo mafê berxwedana pîroz, an- go heta ku “mafê sê nifşên bingeh” ên ku hatina rewşa asa (norm) yên hiqûqê gerdûnî werine cîh, jibo serkeftina şerê parastinê her tişt were bicîhanîn. Xwerexnekirin gihîştina vê rewşê ya biserkeftin e. Berevajî vê di dema borî de israr heye. Encamên wê ji her komplo- yê re vekirîne û ketina ji rewşeke xiyanetê xirabtir e.

**4-** Ev peywireke bingehîn e ku, di dema borî de çi li ser navê PKKê, çi li ser navê dewletan û hêzên din, di encamên çalakiyên veşartî an jî eşkere, zagonî an jî komplo û bi şêweya çetetî de, hij- mareke wergirî ya hemû mirovên ku ji gel hatine kûştin, gundên ha- tine valakirin, gerîla û leşker, jin, zarok û mêrên ku mirin de were kirin, bê berpirsiyar kî ne, ji alyê hiqûqê neteweyî, navneteweyî û
hiqûqê rêxistinî ve, di derbarê çawa bêhtin darizandin û cizakirin de xwerexnekirin were pêkanîn û dersên pêdivî jê werin deranîn.

Berpirsiyarî û cidiyeta li hember van peywiran, encex bi bicîha- nîna pêdiviyên wan re yên gengaz bibin. Heta ku hijmartineke wer- girî ya di

derbarê sexbêrî, helwest û çalakiyên sûc ên ji aliyê hemû alîgirên têkildar ve ku têgihînên siyasî, leşkerî, sincî û olî derbaski- rin de, yên bê wate ku tenê zirar didan xwe neyê kirin, heta em he- sabê ya ku ketî aliyê me nedin û em hesab ji meqam, kes û hêzên bi pratîkê re têkildar nexwezin, em nikarin behs bikin ku em li hem- ber dîrokê, gel, mirovatiyê, hiqûq û demokrasiyê, li peywirên xwe xwedî derdikevin. Ev jî pêdiviya xêzka parastina rewa ye, peywir- darên ku dewleta xwe jî xapandine, kirine çete, ji xêzka hiqûqê de- randine û heta li gor hiqûqê neteweyî heger ku bisînor be jî hatine darizandin, ji herî jor heta bi jêr werin hijmartin û hesab ji wan we- re xwestin. Çawa ku li ser navê PKKê weke tawanbarî neyê here- ketkirin, li ser navê dewletê jî yen ku sûc kirin, rihet nakin.

Heger hiqûqê neteweyî ne di hêza pirskirina hesabekî fennî de be jî, li ser navê hiqûqê gerdûnî û berxwedana gel a pîroz, pêwîsti- ya pirsiyariya hesab a ji mêrkûjan, pêdiviya berpirsiyariyê ye. Tê- kiliya ne pirsiyariya hesêb, bi demokrasî û aştiyê re tine. Li hember kes, meqam û hêzên ku hê jî dibêjin “em dardebikin, bigurînin, ti- ne bikin”, parastina çekdarî jî di nav de, bicîhanîna pêdiviyên pa- rastina rewa, li her cîhî, di her dem û her mercî de, lêbelê jibo ser- keftina wê, hemû tiştî bi şêweyeke kitekit hesab bikin û bicîh bînin, pêdiviya xêzika parastina rewa ya dema nû ye. Encex bi vî rengî yê li dewleta demokratîk a hiqûq û komarê were xwedî derketin. He- ger ne di vê rewşê de be, jibo pêkanîna wê, dikare pêdiviyên wê he- ta bi dawî were bicîhanîn. Bi kurtayî, bi xwerexnekirinbûna li hem- ber rewşên sûc û hemû neyîniyan yên ku di dema borî de ji aliyê hemû aliyan ve hatine kirin, bi bicîhanaîna pêdiviyên vê yekê yên di pratîkê de, gengaz e.

**5-** Xêzka parastina rewa, di nava gel de xebateke li gor pêdiviyên siyaseta demokratîk pêwîst dike. Li derî binke girtinên zexm ku pa- rastina wan gengaz, di dema nû de weke dema kevin tevgera bi na-

vê PKKê, meşandina çalakiyên siyasî, li derî qadên ku mercên antî-demokratîk lê derbasdar, nabe helwesteke rast. Rêxistina civaka şar- wer û çalakiyên wergirî ku li gor pêdiviyên hiqûq û demokrasiyê, pêwîst e ku weke xebatên herî bikêrhatî werin birêxistinkirin û me- şandin. Berevajî vê, jênerev e ku bikeve rewşên provekatîf. Veguhe- rîna PKKê ya di derbarê vê qadê de pêwîst dike ku, her welat li gor mercên siyasî, çandî û hiqûq, ji navê xwe heta bi bemame û pratî- kên xwe, zagonî, çandî, wêjeyî, her şêweyê hunerî, derdorî, aborî, civakî, hiqûqî, siyasî û zayendî werin damezrandin. Veguherîn bi pê- kanîna van damezrandinan, bi erk kirin, bi serkeftiniya dewleta de- mokratîk a hiqûq û bi dema ku pêwîst be jibo ji nû ve were damez- randin, bi anîna rewşa ewlekariya bingehîn gengaz e. Jibo vê, for- masyonên behreyên bîrdoziyî, polîtîk û pratîk ên ku pêwîst, pêdivi- ye bidin qezenckirin, pêdivî dike ku kapasîteyên raman, bawerî û moral bersivê bidine vê. Di vî babetî de, li qasî ku fersendê nedine demagojiyên çareseriya mezhebperest ên têgihînên çepgirên klasîk ên Tirk, ev peywireke demokratîk a girîng e ku, dorhêlê nadine de- magojiyên navtêdanî û şewşandinên têgihînên neteweperestên Kurd jî. Xwedîlêderketina peywirên demokratîk, yekîtiya gelan a aştîx- waz û azad, di vî babetî de kirina tiştên ku dikve ser milên wan jî, pêdiviya şoreşgeriya berpirsiyar e. Naxwe, hisdike bila terîqetperes- tiya çep, hisdike bila ya rastgir be, yê ne rola şoreşgerî encex rola şoreşgeriya hember bilîze. Di van mijaran de jî xwerexnekirin encex bi xwedîlêderketina rast a van peywiran û bi arastineke têrayî ya ku pêdivî bi girtina xêzka serkeftinê gengaz e.

**6-** Di van bingehan de veguherîn, xebateke rast a di qada navne- teweyî de jî, ji nû ve tîne rojevê, birexistinkirina li gor xêzkê û tem- sîlên wan jî, pêwîst dike. Li hember hevkarên neteweperest, lêgerî- na çareserî ya bi pîvanên demokratîk, yê bêhtir bike ku ji destek û piştgiriyê re suxreyê bike. DYA jî di nav de li tevaya Ewropa, heta bi hemû qad û welatên ku bigihinê, ne gengaz e ku ji vê xêzkê re destek neyê dîtin. Heger ku destek neyê dîtin, ev yek ji ber xebata ne bi têrayî û temsîlê ye. Li DYA û Ewropa, derdorên komploker bisînor in, di warê serkeftinên xwe de, deyndarê sexbêriyên li derî zagon û çalakiyên veşartî ne. Divê ev rastî li ber çavan bête girtin ku, bi taybetî berpirsiyarên komployan derînin holê, jibo bêmafî ji holê werin rakirin

li derdorên mafê mirovan, meclisa demokratîk û hikûmetê, heta de serî de NY û YE di hemû saziyên navneteweyî de, ravekirina hemû tiştên ku diqewimin, xwestina destek û pioşt- giriyê ji ya di çareseriya hiqûq de, ji aliyê derbaskirina ya kevin û amadekariya serkeftina dema nû girîngiyeke mezin hildigire. Li ho- lêdanîna ku terorîzm ji aliyê kê ve bi israr tê berdewamkirin, kîjan dewlet û hêz nayêne lihevkirina demokratîk, derxistina holê û bi erk kirina serkeftî ya îradeya gelê Kurd a azad û rewa û saziyên wê ku heta bi dawî yê bêhtin destek kirin, Peywirên bingeh ên ku pê- divî ye werine cîh in. Di vî derbarî de jî derbaskirina dema borî û xwerexnekirin, bi bersivdayina van peywirên rast, tekûz û bi şêwe- ya pratîk a serkeftî gengaz e. Li hember eniya mijokatî ya global- bûnê, hûnandin û pêşvebirina eniyên ked û gelan ên azadî û piştgi- riyê, bi bersiva dengê hêzdar ê dadmend, azadî, wekhevî û esîl ê ji dergûşa mirovatiyê ku bide humanîzm û entemasyonalîzma dema 2000an, yê gengaz be.

**7-** Di derbarê van hemû mijaran de, rexne û xwerexnekirin en- cex bi perwerdeyeke zexm wateyê qezenc bikin. Qedera gel û rê- xistinê teslhnî van kesan nabe, yen ku mêjiyê wan bi diyalektîk û felsefeya dîrokî naxebite, yên ku hemû nirxên rindî, başî û hezkiri- nê di wijdanê xwe de bicîh nekirin û yên ku damezrandinên nû bi- cîh nanîbin .

Di bingeha minêkarî de, heger ku rê li ber zoriyên mezin jî ve- ke, bicîhanîna pêdiviyên wê annanca xebatên perwerdeyê ya jêne- ger e. Pêwîst e em li qasî rahîbên Sumer ku heta roja îro şêwe da- ne şaristaniyê, bi hewldaneke mezin û hostatiyekê, hêza ku tezên Rojhilata Navîn jî nîşan bide û tevkariyê li pêşveçûna şaristaniya demokratîk bike, li cîhên me yên pîroz em bi perwerdeyê bi teqezî deynin holê. Pêwîst e tiştên ku rahîbên Sumer jibo dewlet û şaris- taniyê pêkanîn, em jibo serkeftina şaristaniya demokratîk û di rêya dirêj a bê dewletbûnê deji xwe re weke rêzan bibînin. Di dergûşa şaristaniyê ya pîroz de, şêweya şaristaniya me ya nû ku, dîsa xwe- dawendên bihêz û rind digihîjin, Civaka bi serdestiya mêrê bi mi- jokatiya har û çewsîner ku gav bi gav tê derbaskirin, mirovatiya rast ku hevûdin himbêz dike, bi gotina niha jibo şaristaniya demokratîk weke dergûşa zayok a ji pêşve re vekirî, pêwîst e em li rola xwe ya dîrokî bi tîbûneke mezin, bi coş û hezkirin, bi bawerî û xîretî, bi ra- man û viyaneke ku di çi tişta dest bavêjyê de

serkeftî bibe, xwedî derkevin. Tenê ni jibo gel û rêxistina me, jibo êşa gelan û mirova- tiyê ku li qasî dilopek hêvî be jî bersive bidinê, jibo serkeftina wê em her tiştê xwe deynin holê, xwedîlêderketina têgihîna peywira me ya pîroz û bîranîna nirxên me yên mezin, pêwîstiya layiqbûna me ya ked û heviyên me yên pêşerojê ne.

PKK ya weke nunereke viyana gel, ku hemû çewsandinên împeryalîst û tineker qelaştine û azad bûye, bi van rastbîniyên dîrokî ku dikeve pêvajoya veguherîneke berfireh, li hember hemû komp- loyên der û hundir û jiholêrakirinan, têgihîn û sepîna çetegerî ku , di kesayetiya wê de li gelê wê û mirovatiyê ferz dikin, bi şêwegir- tina xwe ya nû, di wê hêzê de ye ku bersivê bide û ber bi şaristani- ya demokratîk a hemdem ve bimeşe.

## 3- Komployên ku li Serokatiya PKK Tên Ferzkirin Mikurhatina Tirsa ji Nasnameya Gel a Azad e

Peyanên (teşebus) komplo û jiholêrakirinê ku weke takekesî û rêxistinî, li serokatiya PKK tê ferzkirin, ne bi dahûrandineke siyasî û ewlekari, encex bi şêweya romanekê bi rihetî were vegotin. Bê- guman, aliyên bîrdoziyî, siyasî û îstixbarî yên teqîb û jiholêrakiri- nê gelekî girîng in. Lêbelê encex bikaribe kakûtê (qerqûde, îskelet) rastiyê rave bike. Vegotina wê ya berbiçav û zindî, bi bikaranîna nêzîkayiyên mîtolojîk, olî, felsefî û zanistî yên di nava hev de, bi tevlîkirina utopya û hevberkirinên dîrokî, bi dahûrandina romanên di tonên cihêreng de, yê hê rastir û hînker be.

Ev rastbînî weke takekes ji A. Ocalan û weke saziyê ji PKK wê- detir, vateyên ku ji wan derbasdike digire nava xwe. Dahûrandina rewşa gelê Kurd, ne bi têgîn û teoriyên civaknasiya hemdem û ne jî bi pîvana zanista siyaseta hemdem gengaz e. Bûyer bi xwe bi tay- betiyên dama mîtolojîk û olî hatiye hûnandin an jî xeniqandin. Belkî bi awayek fîzîkî gelek li hemberî me be. Xwe ji cureyê miro- van dihesîbîne. Lêbelê dema ku em bi pîvanên hemdemî binêrin, yê were dîtin ku ji qebîleya Zûlû yen Afrîka Başûr nenastir, bênasna- me, ji hemû mafên xwezayî bêpar, heta ji bikaranîna zimanê xwe ya bi azadî dûr. Ev rewşeke wisa toqîndare ku li ti pîvanên mirova- tiyê nayê. Him heye û him tine ye,

him mirov e û him ne mirov e, him gel e û him ne gel e. Ev 'him' hê jî dikarin zêde bibin. Jixwe polîtîkayên fennî vê şêweyê bi awayek vekirî bilêv dikin û disepî- nin. Berpirsiyargirtina hikûmet û siyasetên rojane yên ji vê yekê jî, yê vegotineke kem be. Ravekirina vê ya weke encameke berjewen- diyên navneteweyî û herêmî, encex yê bibe balkişandina ser aliyê rastiyê yê sînorkirî.

Di hemû serdemên dîrokê yên girîng de, bandora derbeyên gelek hêzan li ser bûyerê çêbûye. Li gelek herêmên cîhanê jî, rewşên bi hemanrengî hatine jiyandin. Lêbelê reseniya bûyera Kurd, bi şêwe- ya ku ne weke xwe be û ne jî weke yên ku xweferz dikin be, pêk- hatiye. Ji rewşa di nav de mayinê qet rizgar nebûye. Qet nehatiye fêmkirin ku gelo bakîre ye an jî fahîşe ye. Heçî ku hatiye xirabiya xwe têgerandiye, lê ne fetihandiye. Aliyê vê yê sosret ev e ku, yên bi angaşta "Gelekî bi vî rengî tine an jî ji kevya paşya min çêbûne", li hember pirsa " Heger ku parçek ji yê te be, laş yekbûnî ye çima tu wî mîna organekî penceşêr (kanser) dihêlî?", bi temamî bêbersiv dimînin. Li vê cîhanê bi navê NY rêxistinek heye. Li ser navê ne- tewe û gelên cîhanê xwedî rayeyeke mezin e. Jibo qebîleyên Afrî- ka yên herî paşdemayî biryaran distîne, qaşo gelek dewletên ku hij- mara wan nagihe milyonê weke endam dipejirîne. Lêbelê dema ku hebûna Kurd dibe dabaşa xeberdanê, dîsa hebûna vî gelî dikeve rewşa nîqaşê. Ji aliyê mafê wî ve tine tê hesibandin. Binyata van hemû rastbîniyan di dîrokê de veşartiye. Encex ku em zimanê mî- tolojî û olan bi temamî dahûrînin hinek zanyarên binamûs û bisinc seferber bikin, belkî em perçe perçe fêm bikin.

Ez xwejbêjiyeke(retorîk) bi vî rengî zêde dirêj nakim. Tenê min xwest ez balê bikşînim bê jibo dahûrandina serokatiyê, em di zemî- neke çawa de ne. Ez bi salan bi xwe re lebikhn. Weke yekî ku tera- za giyan û tûre (rik, hêrs) yê wî di mercên pir zor de çêbûne, ez di damezrakek wisa de bûm ku gumana min ji piçek toz jî çêdibû. Da- hûrandin û çareserkirina mijareke hevqasî tevlîhev, ango guheran- dina rastbîniya vî gelî, gelekî serdestî taqeta min bû. Heger ez ne pêxember bim jî, ji bangewaziyekê wêdetir min nikarîbû ti bando- rê bikim. Lêbelê vê pirsgirêkê, weke kunên reş ên di gerdûnê de ku beşenan (cîsm) dikişînin, ez dikişandim tarîtiya xwe. Ya bi şûn de mayî ev bû, ezê ji rewşên ku di ti pirtûkan de neyên ravekirin, riz- gar nebûbama.

Gelemşe (gelş) ne hêza aqil û feraseta (pêhesî) min bû. Hê ez deh salî bi gotina ku mi gote dayika xwe "Çima te ez anhne cîha- neke ku hêwiya min lê neyê?", min qedera xwe dîtibû. Bi merîfeta qaşo serokê DYA yê ku li cîhanê teşeyên mijokatî û çewsandinê yên super pêşvebirin, komkûjiya ku mêrê spî li çennsoran kirî, we- ke şaristaniya cîhanê ya herî pêşketî bi mirovan daye dabelandin, yê çanda kovboyê şêt herî bêteraz ku nizane çawa tê jiyandin, bi şê- weyeke ji ya çil rêbiran (heramî) bêdadtir, weke ku çennsorê dawî nêçîr bikin, him jî bi lîstikên rezîl ên hevkarên ku ji min weye dost in, girtina min û teslhnkirina min a bi vî rengî, karekî ku ti wêjevan nikaribin mantiq û wijdanê wê vekin e. Dîsa pêdivî ye ku ez hinekî vê ronahî bikim.

Tirkan bi kêyfeke mezin, hewl dan ku girtina min weke bûyere- ke di dîroka xwe de herî girîng binirxînin. Lêbelê serkeftina wan, bi bîrûbaweriyeke qet ne dostê wan, bi wijdanê xwe yên reş ku we- ke min li çarsingê bixin û bizmar bikin, heyîna min a fîzîkî bikin pakêt û têxin tabûtgehê wêdetir, ti wateya din nade. Dema ku îsa li çarsingê dixin, li gor ku di Incîlê de derbasdibe, dibêje " Xwe- dayê min çima te ez bi tenê hiştim?" Ez ne di ve rewşê de me ku bi helwesta bîrûbawerî û giyanî, ez loma ji ti kes an jî saziyan bi- kim. Lêbelê pêdivî bû ku bi bîranîna bi sedan ên ku xwe şewitan- din û xwe kûştin û yen dijîn ve, bi awayek mezin girêdayî bim. Ya herî girîngtir, li ser navê mirovatiyê bûyer û têkiliyên bêhijmar ku

pêwîst e li wan were xwedîderketin hebûn. Tevger û kesayetiyeke ku îfadeyên xwe berevajî hemû tawanbariyan didan, dibirine xeni- qandinê. Tevgerên esîl ku li ser navê biratiya gelan dihatin meşan- din, bi mandelekirinê bîrûbawerî û bêwijdaniya rantparêz a herî rezîl, dixwest ku encamê bigire. Êşa ku van afirandî, li ser navê ge- lan jiyandin pêwîst dikir. Jibo ku komplo zirarê nede gelên me û derûna nasnameya Rojhilata Navîn, pêwîst bû ez hêza xwe ya pê- divî nîşan bidim. Ewrûpa û zaroka wê ya neqeriyayî DYA, bi hê- za xwe ya şaristanî ez gelekî daxistibûm. Ez di nava mabnayinê de bûm, bê çima evqasî li derba min bêrêzî kirin. Lêbelê di şer de tak- tîkeke nazik sepandibûn. Digel ku gelê me û PKK jî bi şêweyeke herî bê însaf û bêrêzî û ez jî weke çend sedsalên dawî ku dikirin, wan li çarsingê dabûm, ev yek ji tirkan re dikirin mal. Bûyera min vekirî bû. Hemû tişt digel ku Ewropa DYA û xulamên wan ên re- zîl nasnameya serdestên Grek amade kiribûn, rola celadiyê didan tirkan. Ev yek şêweya ‘dabeş bike-rêvebibe’ û ‘se bi sê dan qirki- rin’ a herî hovane bû. Benda serdestên Tirk, ne baş bikartanîn. Çi- qas ku zor be jî, xirakirina vê lîstikê yê bûbana helwesta herî esîl ya van sedsalên dawî.

Bila ti kes min, bi bîrûbaweriya şoven a Tirk a gel nenas û biratî nezan re ku hindikî şer kiriye, tawanbar neke, an jî jiberku min hel- westa levhatina aştî û demokratîk daye pêş, xwespêr û sertewên ne hesibînin. Berxwedana herî mezin di vê helwesta dawî de veşarti- ye. Tevkariya li aşîtiya bi rûmet û bi lihevkirineke demokratîk a ye- kîtiya gelên me, bersiva herî bi bandor a li kompleyê bû. Jibo min hemû helwestên li derî vê yekê, di nava bêteraziya hêzê ya mezin de, yê bûbana suxreya ji xwesteka wan kesên bêfedî ku li benda şer bûn. Xala ku herî ez xemgîn dikirim, di kesayetiya min de heqare- tên ku li gelê Kurd dikirin bûn. Lêbelê hema ku ev gelê bi hezaran zarokên xwe qurban dabûn fêm bikirana! Jibo gelê ku kesekî wî ti- ne û ne xwedî lawekî ku bizanibe serkeftî bibe, ez çavkaniya hêvi- yê bûm. Hêviyên gel ên ji vî zilamê ku him li çarsingê dayî û him jî di tabûtgehê de, berdewam dikirin. Ji zilamê ku zayîna xwe sede- ma herî mezin a tawanbariyê didît, pîriktiya zayîna xwe ya azadiyê hêvî dikirin. Min ne fennan da PKK û ne jî da gel, ku min teqîb bi- kin. Jiberku kesekî wan ê din tine, piştî 2000 salan ez mecbûr mam ku helwesta ji ya îsa zortir,

deynim ser milên xwe. Min rola Kawa- yê Hêsinkar jî anî ser xwe. Min pîroziya Hz Brahîm jî hemdemî kir.

Ez bûme ***Mem*** û ***Derwêşê Evdî*** yên ***Zîn*** û ***Edûlêyan.*** Em ji axî- na ***Maniyan, Mazdekan û Babekan*** bigirin, heta bi tenêtiya ***Hiseyn*** a li Kerbela, evîna rastiya ***Helac Mansûr,*** û payeya dostîtiya ***Pîr Siltan Abdaljî,*** min hilgirt. Ez hevalê ***Denizan, Mahîran û Brahî- man*** bûm. Ez şervanê tolhildana ***Mazlûm, Xeyrî, Kemal û Ferha- dan*** bûm. Ez mînakeke dawî ji ya serdemeke bi vî rengî, bi heza- ran ji her gelî yên yekbûyî ku gihîştine hişmendiyê. Ne tenê berx- wedan û şerê van bîrdarên mirovatiyê, dozeke wan aşîtiyê ya ku fersend nedîtibûn hebû. Ev parêzname ne ya min, parêznameya wan a aşîtiyê ya dawî ku kêm mayî ye. Min xwest ez vê kêmayiyê temam bikim. Ez bawer dikim ku, terîfa mirovatî, dîrok, serdem, mijokatî, zilm, berxwedan, azadî û aşîtiyê, rast hatiye kirin. Rêyek ji dîroka gelan re hatiye vekirin. Dîsa ez zanim ku tişta ez dikim ne serokatiye, ez gemara yên ku hezar sal in derketine holê û dibêjin em serok in, paqij dikim. Ez destavgeha (daşir)dîrokê paqij dikim. Bê kê li ser navê çi û bi çi vateyê kiriye gemar jî rave dikim. Ti ca- ra çavê min di dewletê, di payeyê de û heta di serokatiya jineke ku raziyî her tiştî de nemaye. Bêyî ku ez veqetîna jin, mêr û netewe bi- kim, min ji her tiştî bilindtir dît ku bi yên têkldar re, bibim heval. Belkî hevalên min, ez di rewşeke wiha de xeyal jî nekirime. Min careke din rastî ji wan re rave kirin. Heger bi ecibînin û rast bibî- nin, trajêdiya min jibo wan çavkaniya herî mezin a hêzê ye. Hê jî heger ku mezin dixebitin û serkeftî nabin, di derawaya xwe xapan- dinê de ne. Bila jêbigerin.

Di beşa dawî ya parêznameya xwe de, ezê nasnameya xwe hê jî vekim. Ezê di vê beşê de, rawestina xwe ya li hember komplo û xa- pandinên bi heman rengî, rave bikim. Gelemşe ne mirina min a bi lehengî ye. Gelek qehremanên bê hijmar ew rol, bi hêzeke ji min bê sînortir bi serkeftin bicîh anîn. Ya kêm ev e ku, terîfkirina jiyana la- yîq a zexm jibo wan qehremanan bikin û jibo ku zalim û sextekar mîrateya wan neşixulînin, hemû rêyên ku yê bikarbînin bêhtin gir- tin û derbasgehan (gêdûk) asê bikin. Ji ber girêdana xwe ya bi bî- ranînên pêşewayan re, hê jî ez vê peywirê didim meşandin.

Rast e ku pêşewatî hunerek e, nayê gotin ku min ev huner baş temsîl

kiriye. Lêbelê ez di vê baweriyê de me ku min, taybetiyên wê yên takekesî û rêxistinî him jibo kurdan û him jî bi gelemperî, bi zêdekarî dahûrandine. Belkî min zalim û sextekarên wî nedan er- dê. Lêbelê di daxistina maskeyên wan de, min tevkariyên girîng ki- rin. Dema ku min got min gemar paqij kirin, min dixwest ez vê ye- kê bibêjim. Ji yên ku maskeyên xwedê danîn heta bi demagogên za- nistî bê çi mal in, jibo yên fêm bikin min gelekî vekirin. Bitaybetî mêraniya ku li ser pişta jinê û yên bindest dihat meşandin, bi sero- katiyê pêpelûk kirina vê yekê bê tê çi wateyê, min di kesayetiya xwe de bi perçiqandin û bi li xwe mikurhatina wan, derêxiste mey- danê. Min hewl da ez nîşan bidim ku, ev saziya ku pêşî bi xwedayî û dû re bi nîv xwedayî leyîstî, pêşnimûneyeke (prototîp) dewletê ye, heger jibo pêşewatiya gel têkevin rê pêwîste pêşî ev nasnameya zorbaşî (ceberût) were vekirin û hilweşandin, encex bi vî rengî şê- weya pêşewatiya nû weke kordînasyona karê gel yê vateyekê îfade bike. Min xwest ku ez pêşveçûna xwe teorîk a di vî aliyî de, li ras- tiya gelê Kurd bisepînim.

Di gel hemû destekên min, dema ku min dît di nava rêxistin û derî rêxistinê de, ji nîv-axatiyekê wêdetir ti şêweyên din nîşan na- din, ji mecbûrî ji daxwazên weke “Pêşewa”, weke “Serok” re, gi- ramgir (rêzgirtin) bûm. Gel û yên ku xwe jibo wî feda kirin, ev dix- westin. Min nikarîbû ez bêgiramiyê bikim. Di asta ku min pêkanî de, di her mijarê û her qadê de heta yên behredar derketin holê, ez ji rola “Serokatiya Giştî” nereviyam. Esehiya wê ev barekî ku zor pêbawerî were bû. Valahiyeke mezin a dîrokî, siyasî, civakî û leş- kerî hebû. Tevan, hemû qadan dixwestin ku ez mafê wê bidimê. Ev peywira ku jibo hêviya rojekê jî behreyeke berfireh dixwest, bêyî ku ez xemsariya dahûrandina teorîk bikim, di pratîkê de jî bi nîşan- dana tempo û şêweya herî hindik min xwest ku bersiv bidim. Rêzik û şêweya sepandinê minê hilbijarta. Lewra di vî derbarî de, ti tiştî

mînak ku rêzikê ferz bike tinebû. Dişibiya meşa di nava daristaneke hovane de. Cinawirên daristanê yên bêhijmar hebûn. Digel ku ev xweş dihate zanîn jî, ji ber pêdiviya rêzgirtina ji gel û bawennen- dan re, ez ji meşeke mîna Gilgamêş paşde nemam. Gilgamêş li da- ristanê serokên gel têkdibirin û rê li ber serok-qeranan vedikir. Lê min dixwest ku ez qeranên li daristanê têkbibim û bi hîle, xap û fen- dan rêveberiya gel ku ji destê wî hatî derêxistin, careke din lê ve- gerînim. Ez di wê kulê de bûm ku rê li ber serokên gel vekim. Di vî karî de Gilgamêş, hevkarê xwe ji daristanê bi pêwana jina ku ji xwedawendî daxistî fahîşetiyê, nêçîr dike û kedî dike, min dîsa be- revajîtiya vê yekê dikir. Min jina ku ji fahîşetiyê xirabtir lê hatî ki- rin, careke din kire xwedawend û min hewl dida mêr ango Enkîdu careke din bikim pêşewayê gelê wî yê hişmend. Xwedawendiyê, weke saziya serokatiya gel, bi derûna xwe ya wekhevîparêz û aza- dîxwaz, dikarîbû mêr bihewisîne. Lêbelê Enkîdûyên ku herî jidil jî, bi bêmirûziyeke mezin bi serhildana berbiçav bersiv dabûn. Digel hemû qêrînên min, mîna sê meymûnan “Min hisnekir, min nedît, nizanim” dilîstin. Jibo wan ne xwedawend, orispiyeke taybetî an jî gelemper pêdivî bû. Li vira jî min li hember rastiya pêşewatiya mê- rê serdest a ku nirxekî wî yê rêxistinî hebû û di pratîkê de jî xwedî nirxekî ne hindik, şerek dabû destpêkirin.

Pênc hezar sal bûn yên ku daristana cîhanê ji her alî ve girtin, bi- taybetî Ewropayiyên hişmend, ez nêzîkî xwe nedîtim û jibo girtina min, yê tola xwe vegirtana. Tiştekî zêde bihata kirin nebû. Rev an jî xwekûştin yê li gor berjewendiyên wan bûna. Tişta ku minê karî- ba bikira ev bû ku, heta bi nefesa xwe ya dawî ez azadiya dilê xwe biparêzim, bi dilopên wateyan ku ez pêşve bibim, bi rêzgirtina me- zin jiyanê berdewam bikim. Ewan ji Neronan xirabtir qurbanekî xwe avêtin arenayê, bi serperoşiya ku bi şêrên wan xweyî kirin bi- din xwarin, di nava qêrînên tirsê yên bi kêyfê hûnandî de, dixwe- stin ku jibo çend temaşeyên xwe aqûbeta wî bibînin. Qaşo xiristi- yan bûn, him jî Ortodoks! Lêbelê weke ku wa jî hê berê gelek ca- ran nivîsîne, nûnerên Roma yên ku bi hezaran caran îsa li çarsingê dane. Di genên wan de ev çanda çarsingê hebû. Têgihîştina min a vê yekê ne zor bû. îsa ji me bû, cîranê dev deryê me bû. Xwedîlê- derketina lê ya bişanazî, pêdiviya cîrantiyê bû. Bi hezaran operas- yonên çarsing û danexwarina bi şêran,

li wî û şopînerên wî hatin se- pandin. Qurbanê dawî ez bûm. Him kevneşopiya berxwedana bi- şeml a kalikên me ya eşîrtî ku bi derûna mirovatiyê ve girêdayî, him jî kevneşopiya aştiyê ya kalikê me pêxember Brahîm û îsayan, bi awayek sosret bi min re diciviyan. Bilindbûneke xwedayî jêne- rev bû. Min xweda dahûrand, min ravekir bê kî ye. Lêbelê ez ji xwedayiya gelan, jinan, zarok û ixtiyarên di zorê de re giramgir bûm. Ez di nava bilindaya xwedê ya taybetiyên wan ên xwedayî de bûm. Bilindaya di nava vê xwedayiya gel a rastî de bes bû. Mirina di bin merc û şêweya ku ez tê de, dibû navê bilindayiyeke hê me- zintir. Vê rastiyê êdî ne tirs, çiqas roja ku diçû vebijarka aştiya esîl a gel di derande holê. Heger ku şer û tinekirinê ferz bikin, ez di wê hêzê de bûm ku, heta bi dawî lêbelê bi berxwedaneke serkeftî û bi şerê parastina rewa , heger bixwazin jî bi aştiyeke herî birûmet mi- nê bersiv bidana. Ez di rêya lehengên berxwedan û aştiyê de bûm, li gor qewêtî û hosiyên(wesiyet) wan bi parêznameyê hatibûn rave- kirin û li çar aliyê cîhanê hatibûn belavkirin. Dawiya wê mirina wê çawa tê bila be, ev rastiyek bû ku mirovatî û gelên me yê qezenc bikin.

**a- Dema Bûyîna Serokatiya ji bo Gel (1970- 80)**

Meşa di nav zeviya gelê Kurd re, ku ji sed salan ve zemîna pê- şewatiyê bi komplo û xiyanetan hatî mayînkirî, ji serî de pêwîst di- ke ku her kêlî tu hesabê perçe bûnê bikî. Ne tenê mayînên fizîkî ku ji zora dewletên derdikevin, ji wan hezar qatî zêde û bandorkertir, mayînên ku li cîhana giyanî û bîrûbawerî hatine bicîhkirin xetertir bûn. Bi wê şêweyê ne ku her kêlî bikaribin mêjî û dil parçe parçe bikin. Ji ber vê yekê ev zevî, ango rastiya gelê Kurd bêweç (bejî) hiştibûn. Weke erdên sînoran ên mayînkirî, herçiqas ku axa ber- hemdar be jî, bi sedsalan ku nehatiye ajotin û çandin veguheriye ço- lekê an jî çiyayekî. Heger hûn bêyî amûrên ku mayînan paqij dikin û bêyî hostayan dest pê bikin, ev kar yê bimîne derhozeyan.finûcî- ze)

Hinek behreyên min hebûn. Ez hêvî dikim ku di beşa nasnameyê de li ser rawestim. Mêjîyekî pir gumanbar û dilekî ku tim jibo aza- diyê lêdida rola yezdanan dilîstin. Hêza van yezdanan hebû ku, timî rastiyê û azadiya ku zaroka wê bidin teqîbkirin. Ewqas birik bûn ku, heger ne amade bin ye lêbikole, nezabe yê bide zayîn.

Li Enqere ya di salên 1970an de, dengê ciwanên şoreşger berze û bêhtirs bû. Dihat hiskirin ku di qadeke bixefik de, bêhtirsî bû. Lê- belê heger ku ewan, li qasî li hebûna nijada min xwedî derkevin wêrek û fedekar bûn, heger bi min re jî hestên rûmetê yên bisînor hebin, ezê ji şopandina van ciwanan paşde nemabama. Şehadeta Mahîr Çayanan a li Kizildere û dardekirina Denîz Gezmîşan, pey- wira şopandina bîranîna wan, dabû me sempatîzanên wan ên bina- mûs. Edî xwendina dibistanê hêncetek bû. Mîsoger bû ku ezê li ser navê gel bimeşim. Lêbelê gelê min ku li ser sêpayê dardekirinê na- vê wî hatî qîrandin, gelê Kurd gelekî çawa bû? Divabû ev were za- nîn. Min wiha dest bi pirsgirêka neteweyî kir.

Hê beriya wê jî hebû. Kurdîtî, hê ez li dibistana seretayî weke dûvekî li pey min dihejiya. Neteweperestiya Kurd a hoveber, weke masiyê di nava çiravê de, dixwest ku me jî nêçîr bike. Van tiştên mîna kunên reş, ez ber bi hevnasîna pirsgirêka Kurd ve dibirim. Ji- bo ciwanekî di vê serdemê de ku bi çanda Rojhilata Navîn, derbas- kirina bîrûbaweriya dogmatîk, nezîkî tiştekî bêderfet bû. Çêtirgirti- neke weke îslamtî nebe bila sosyalîzm be, jibo rizgarbûna ji dog- matîzmê ku yê ne bitêrayî bûna, piştî ezmûnên mezin minê bitîta- na. Di vê pêvajoyê de yê bihata fêmkirin ku heta bîrûbaweriya dog- matîk neyê derbaskirin, yê cudahî di navbera dubarekirinên tamî- mên sosyalîzmê û ramana bi ayetên Quranê de nebe. Di bingeha ewlekariya sosyalîzma reel de, sosyalîzmeke ku bîrûbaweriya dog- matîk derbasnekirî, li xwendekarekî wê yê ku bi bîrûbaweriyeke dogmatîk a negihiştî, sepandina li pirsgirêkeke herî zor li pirsgirê- ka Kurd, hatibû barkirin. Pirsgirêkê bi xwe û muxatabê wê hevûdin dîtibûn. Tiştina dikarîbûn derkevin holê. Ev Apoparêzîtî bû.

Di sala 1975an de, di nava aloziya çep û rast de, serokatiya ADYÖD (Komela Xwendekarên Bilind ên Şoreşger a Enqere) ku min kirî, jibo kama me zemîna pêdivî pêşkêş kiribû. Jiholêrabûna Dev-Genç (Federasyona Ciwanên Şoreşger) û neteweperestiya Kurd a hoveber bi navê DDKO (Ocaxa Çandê ya Şoreşger a Rojhilat) ku li şûna DDKD (Komeleya Demokratik û Çandê a Şoreşger) dixwest cîh bigire, di mercên ku zêde bandorker nabe de, ji bo ez derketinekê bikim dorhêl ji min re vebûbû. Me di van mer- can de hilatineke nû, Apoparêzî pêkanî

û pêşve bir. Di van mercan de ciwantî, ji dogmatîzmê wêdetir hestyar bû. Koma me ji heman binyata hejarî, ji nêzîkî duwazdeh kesan hatibû holê. Beşek ji wan jî ji binyata Tirk bûn. Weke Kemal Pîr digot: “Li Tirkiyê rêya riz- gariyê di azadiyê gelê Kurd re dibûre”, bi têgihîneke entemasyona- lîst tevlî bûbûn. Ya cihêreng Kesîre Yildirim bû. Ji malbateke hev- kar a binav û deng dihat. Ev ji hevkariyê wêdetir, malbateke CHP (Partiya Komara Gel) a ku mîlîtantiya Tirkiyê kiriye. Meyldariya çepgiriyeke xwezayî, taybetiya demê ya CHP bû.

Vekirina min a vê mijarê, herçiqas ku weke kesanî xuya bike jî, ji ber teşeyeke ku encamên wê yên dîrokî, civakî, siyasî û çandî he- ne standiye, rewişteke wê ya ku bûye girêk heye. Di derbarê kesa- yetiya Kesîre de, gelek tişt hatin gotin. Hate nîqaşkirin ku gelo pey- wirdareke dewletê ya hişmend bû an na. Ez ewqasî nakevim vî aliyî. Herî bêhtir ezê tekiliyên wê yen bi komê re dahûrînim.

Gihîştina Kesîre ya komê, dihate wateya ‘raweste!’. Di nava helwesteke wisa de bû ku dihat wateya “ Pirsgirêka Kurd, pirsgireka çep ji me tê pirskirin, xwediyê wê em in”. Heta tu bêjî bes baqil û xwedî kişîneriyeke jinê ya parzinandî bû. Ji aliyê fizîkî ve taybetiyên Kurd hildigirt. Yê çiqasî rasthatinî be ez nizanim, lê- belê minê her roj fêmbikira ku bendaveke jiyana min serobinî bike, li pêşiya min hatiye çikandin û Kesîre di kesayetiya xwe de vê tem- sîl dike. Nêzîkayiyê min her çiqas ku ne bi hişmendî bin jî, hinek mijarên girîng digirtin nava xwe. Di mercên nû de, me dikarîbû rewşa malbatê veguherînin avantajekê. Ciwan bû, dikarîbû bibe sosyalîsteke baş. Pirsgirêka Kurd êdî ne ya feodalan, pirsgirêkeke kedkaran bû. Weke sosyalîstan dikarîbûn lê xwedî derkevin. Ji ali-

yê din ve ji Dêrsimê bû. Bi nêzîkbûna wê ya li pirsgirêkê, him jibo yekîtiya gel û him jî jibo veguherîna gelek kesayetiyên bi heman rengî, yê bûbane mînak. Azadiya jinê jî di rojevê de bû. Jibo vê ye- kê jî dikarîbû bibe nimûnek. Ev mijar bi aliyên siyasî û bîrdoziyî yên kar ve girêdayî ne. Ji aliyê din ve bi awayek dilînî nêzakayî çê- dibû. Dema ku ev hemû annanc bûne yek, ji aliyê din ve bi bando- ra kevneşopiya çanda malbatê, min raman û pêşniyareke "zewaca" zû pêşêxist. Mijar nazik bû. Kêliyên ku zembereka dîrokê bi êş lê dida bû. Ev meyldarî veguherî qayîşkêşiyeke mezin. Dibe ku pêş- niyara min, weke ku ez wê kontrol bikim an jî bê bandor bikim şî- rove kiribe, an jî jibo ku ew min bipîve xwestibe ezmûn bike. Di ve hingê de, bi ketina pêvajoya "an bi min re bi dergistî bibe an jî bi hêmaneke komê a din re.", kom bi belavbûnê re rûbirû kiribû. Tê bîra min, ez ketibûm nava dilîniyeke ku dev ji komê berdim. Jinê hêza xwe nîşan dida. Vekirina min a bi şûn de zor bû.

Dergistîbûneke çêkirî ku hemanek ji ya me winda kir, jibo pêva- joyê provakasyonek bû. Taybetiyên telp ku em dikarin bibêjin rik an jî namûsa Kurd, zor li min kir ku ez jênegerim. Me dergistîtiya çekirî xirakir û veguherand zewaca fennî. Sal 1978 bû. Di pey re bi firîna cara pêşî û danîna li Amedê û jibo îlankirina PKK, Civîna Gundê Fîsê hate pêkanîn. Min dogmatîzm û dilînîtî, ji pirsgirêkê re dikire qurban.Tişta dihat hêvîkirin ne serfirazî, merasimên ku pirs- girek xwe bi mezinbûnê re bide nasîn bûn. Lêbelê dîsa jî pir girîng bû. Gelo dewlet radiket? Ev mijar gelekî hat nîqaşkirin. Dema ku Ugur Mumcu bi angaşta ku vê mijarê ronahî bike, dest bi nivîsan- dina pirtûkê kir, bû qurbanê komployekê. Têkiliya di navbera pir- tûk û bûyerê de qet nehat fêmkirin. Bavê Kesîre Alî Yildirim, sux- revanekî dewletê yê bi ezmûn bû. Li qasî ku tê bîra min, di rojna- meyekê de sala 1985an wiha digot: "Jibo ku em nêzîkî dewletê bi- kin me keç dabûyê." Lêbelê ev bi serê xwe ne bes e ku nêzîkaya dewletê rave bike.

Girîngiya bûyerê ya dîrokî ev e: Serokatî, malbatperestî û komp- lo, di demeke krîtîk a dîrokê de dikete rojevê. Bi awayek nonnal ku pêwîst e weke têkiliyeke malbata taybetî lê bête nêrîn, çiqas ku di- çû vediguherî qeyraneke siyasî, civakî û rêxistinî. Pêvajoya li Ame- dê ya nêzîkî salekê berdewam kirî, veguherîbû dojehekê. Têkiliya di navbera jin û mer de li dera han, li holê jineke ku qet neyê fêmkirin, encex nav

di yên ku karibin di rûyê mirovan derbixin bide û pêşani- yeke wê ya neyê kişandin hebû. Şehîdê mezin M. Xeyrî Dunnuş, vê demê rojekê bûbû şahidê vê têkiliya me. Cemîl Bayik jî pêre bû. En- cama ku derêxistibûn, “Mafê wê tine ku wiha bike”, bû. Vê dawiyê min bihîst ku gotibûn “em wê ji holê rakin”. Kemal Pîr li Bêrûdê di- be şahidê heman rewşê û dema diçe şehadetê, qewêtiyên xwe dike û dibêje “Tişta ku ev jin dike bila jê re nemînin”. Têkiliyeke ku mê- rekî nonnal nikaribe 24 saetan berdewam bike, digel ku gelek heva- lên bûne şahid qeherandin jî, min heta bi 1987an kişand.

Kesîre çiqasî dewleteke hişmende an jî ne rasterast e, em bi hê- sanî fêr nabin. Lêbelê ya girîng ne evder e. Dikarîbû li ser navê dewletê jinîtiya xwe bi erênî jî bikarbîne. Bi gelemperî rêbaza ku tê sepandin jî ev e. Lêbelê bi awayek berbiçavî ya ku li min dihat ferz- kirin, rewşa “An teslîm bibe an jî tiştekî mezin ê were serê te”, herî bêhtir jibo şêtkirinekê dihate gotin. Naxwe ve dawiyê, nêzîkê ku emê jihev qut bibin, bi şêweya weke ku gotî “ne tirse te jehr nadim” nanirxînim. Belkî bi we sosret were, lêbelê jibo yên bixwazin ku di- yalektîka Kurd bi kûrayî fêm bikin, rizgarbûna ji vê xefikê ewqasî ne hêsan e. Kûştina wê pir hêsan bû, lêbelê ev yê ne çareserî bûna. Hisdike bila bi wateya berbiçavî bûna û hisdike bila ne berbiçavî, heger lêferzkirina dewletê hebe jî, çareserkirina pirsgirêkê ya bi şî- detê, yê bûbana hatina lîstikê. Digel hemû navtêdanên wê jî, çiqas ku min kişandibana min bawer dikir ku jibo PKK û komê pêdivî bû.

Dema li dîrokê bête nêrîn, yê were dîtin ku hemû ezmûnên sero- katiyan bi awayek tûnd ji malbatperestiyê bandor girtine. Di serde- mên pêşî û yên navîn de, ev mijareke gelekî berfireh e. Di nav kur- dan de hê bêhtir roleke kûjende lîstiye. Malbat mîna saziyeke ci- vakî, weke cinawirekê ye ku mêrê kurd di temenekî piçûk, di 15-20 saliya wî de digire û bêbandor dike. Tê zanîn ku, hisdike bile di as- ta dê û bav de û hisdike bila di asta jin û mêr de be, xêr di yên ku dikevine vê têkiliyê de namîne. Hem û dem û enerjiya xwe dide vê rewşê. Encam dibe nîv şêtî, dînîtî û ji aliyê siyasî û civakî ve der- ketina ji kesayetiyeke bivate. Ev aliyê kar ê gelemper e. Gerîneka derya çand û civaka Kurd e ku takekes dadiqûrtîne. Dema ku tu ga- van li qada asta bilind ku dewletê têkildar dike de bavêjî, tê weke Enkîdû têkevî kemendê. Rola jinê, beyî ku

neberbiçav bibe jî amû- reke wisaye ku, ji ajanekî herî hişmendtir dadixe. Hê ji dema Su- mer ve, di sazûmana dewleta rahîban de, jin heyîna herî kediye ku mêr bi sazûman, siyaset û dewletê ve girêdide. Heger em jibîrane- kin ku Enkîdû çawa hate hînkirin, emê derûna sazûmanê fêm bikin.

Di bûyera min de, Kesîre bi serê xwe dewletê dileyîst. Dema ku em bi awayek berbiçav binirxînin, axa-jineke ku ji dewlet û têkili- ya malbateke nîv-feodal a burjûva hêz wergirtibû. Ne yeke wisa ke- tûber bû, xwedî taybetiyen wisa bû ku bikaribe mêr di asta herî bi- lin de bileyîzîne. Dibe ku qet ji dewletê re ne pêdivî be. Weke axa- jinekê diyar bû ku ne jineke wisa ye ku gundiyê weke me dabelîne. Ev tiştekî xwezayî ye ku, ji xwe girankirinê zêdetir, dev ji sexbêri- ya serdestî û zewqa wê bemedida. Jixwe ji ber rewişta wê ya çînî, jibo ku ji saziyeke ku di navbera Kurd û dewletê di dilîst hatibû, ji- bikaranîna herdu aliyan re bi şêweya berbiçav vekirîbû. Dikarîbû were hêvîkirin ku ji rewşa serokatiyê bihêsanî naqere. Ev nêzîkayî hinekî din bêhtir rastbînî ye. Weke milîtaneke ku baş bixebite ez di destê xwe de hiştibama, yê bikariba jibo xwe rê li ber derfetên me- zin vekira. Bi dibêtiyeke mezin, etîketa zewacê, ji ber vê yekê ha- tiye hesabkirin. Yê di xêzka xwe re bi mirina xwe bimeşiya. Bi nav- têdanên mezin ên komê, hilatina PKK veguherande gabûsekê, ez poşmanî ji dayîk bûna min kirim û heta bi dawî rola xwe lîst. Hel- westa çîna hevkar a neteweyî, di nava sarîtiya marekî de, heta bi dawî birik berdewam kir.

Baş e min çi hesab dikir? Berî her tiştî pirsgirêk ne pirsgirekeke malbatî ya hêsan bû. Min rewişta kevneperest a rastbîniya malbatê ya gewre dîtibû. Min bi êşeke giran fêm kiribû ku dema hestên bi- lind ên di rastbîniya Kurd de, nehatibû. Xeyala min a meşa li wela- tê azad bi jina azad re, di gava min a pêşî de, weke belayeke mezin di ser û dilê min de teqiyabû. Muxetaba min ji jineke ketûber ge- lekî wêdetir bû. Axa-jina ji tîpa malbata Kurd a hevkar ku bi hezar salan hatibû parzinandin bû. Ku çi biqewimiya, yên mîna min li mala xwe ji xulamtiyê wêdetir nedikirin tiştekî din. Lêbelê min jî, Kurdê nû çêbûyî yê cuda temsîl dikir û wî dilîstim. Muxataba min ev zûka fêm kiribû. Di demekê de ev gotina ku li derdora wê zêde dibû “Ev naşibe kesekî ji we” pêşxist. Yên dişibiyan di destê wê de weke nêçîrên hêsan bûn.

Çiqas ku diçû derdiket rastê ku, nîşanê mêrekî klasîk bi min re ti- ne ne. Vê yekê jî jinik har kiribû. Vê taybetiya min dibêtiye ku hemû planên wê xirakiribûn. Diya min ez li zincîrê nexistibûm. Ew li dûv vê yekê bû. Şerê min yê jinê ji mêj de destpêkiribû. Niha ez di mer- haleya herî krîtîk re derbas dibûm. Ezê bûbama Enkîdû? An jî minê xwedawend dîsa li ser textê wê rûniştandibana, minê bikariya Enkî- dûyan ji destê fahîşeyên taybet û gelemper derînim? Bi rastî jî pirsgi- rêk dîrokî bû û çareseriya wê pir zor bû. Kûrbûn û berdewamkirina gewixandinê, bi rewşa hêzan a berember ve girêdayî bû. Di rewşên wiha de ti nirxên kûştineke fizîkî tine ne. Çareserkirina têkiliyê xwedî nirxekî dîrokî ye. Min qet ji rastiya rêbaza xwe guman nekir. Gelem- şe ev bû ku ezê çiqasî dahûrînim û bikaribim ragirim. Minê çiqasî bi- kariba komê û PKK ya ku bizor gavan tavêje, ji vê belayê biparêzim? Kêliyên komploya berbiçav û ku hebe yên neberbiçav ên mirin û ma- yinê, dihatin jiyandin. Ez ne behsa mirina fizîkî û daringî dikim. Ez behsa mirina bi şêweya Enkîdû dikim. Di derbenda jin û malabatê de, karîbûm werim daqûrtandin. Qeder û planê jî wiha pêdivî dikir.

Pêwîst e ez vê yekê li hember dîrokê bînim zimên ku, bi derke- tina min a derî welat re, di gava yekemîn de, ez serkeftî bûbûm. Rizgarbûna ji vê têkiliyê ya bêyî ketina daringî û menewî, mijare- ke ku nirxê wê nehatiye dahûrandin e. Lêbelê di diyalektîka Kurd a dîrokî de, di wateya girtina demekê û gavavêtina demeke nû de, girîngiyeke mîsoger a diyarker hebû. Dema ku di vî babetî de nêzî- kayî û hêviyên dewletê jî zelal bibin, di derbarê demê de nirxandi- nên rastbînîtir ê werin kirin.

Aliyekî mijarê yê raser, yê xebatên Rojhilata Navîn û Ewropa yên piştî sala 1980an nîşan bide. Ez hwel bidim ku di beşa dudoy-

an de binirxînim.

Di dema hilatina komê û PKKê de, di hinek têkiliyên ku bi pêş- veçûna serokatiyê ve girêdayî de, nirxandineke rastî girîng e.

Evan meyldariya Şahîn Donmez ku xwe davêje pêş, kûştina Hakî Karer û têkiliya Pîlot Necatî Kaya yê tê bawerkirin ku peywir- dar bû. Hakî Karer nimûneya wêrekî û fedekariyê ya komê bû. We- ke giyana min a veşartî bû. Fêmkirina jiyana wî ya kin lê biderûn, jibo biratî û yekîtya gelên me ya berfireh û kişandina azadiyan, di- vê weke çavkaniya îlhama me û peywirame were têgihîştin. Ji mal- bata wî bi taybetî Bakî Karer û hineke ku rola provekasyonan lîs- tin, digel ku gelek zirarên mezin dan jî, nirxê bîranîna wê yê tim bi- lind bimîne. Lêbelê mêrkûjiya Aladîn Kapan a li ser navê PDK-5 perçeperest, dibe ku bi plan be. Ev dişibe mêrkûjiya mikurker û provekatoran. Di vê rewşê de tinekirina çengê min ê rastê, şîrove- yeke rast e. Heger ku kûştin bi plan be, ev yek hatiye annanckirin. Hakî, ji nêzîk ve di şopandina Pîlot Necatî jî de bû. Lêbelê xwedî- lêderketina komê ya bihêz a li bîranîna şehîd, veguheriye bihêzbû- na komê. Bûyerê, berevajî hêviyan encam derandine holê.

Pîlot Necati Kaya, dibe mînaka pêşî ya ku artêş ketiye dewrê. Pêşniyariyên çalakiyan yên provakatîf ku rasterast ji min re kirin û têkiliyên wî yên din, rê li ber xuyakirina binê wî vekir. Kurdekî ji Agirîiyê bû. Min cîhana wî ya rast qet fêm nekir. Min annanca wî ya di derbarê xwe de jî fêm nekir. Carekê di xaniyê ku ez lê de, tê bîra min ki wiha gotibû: “Kekê min, tu fennan bike ez dikarim xwe ji qata çaran a vî xaniyî bavêjim, ez dikarim her pêbawerî (rnûte- med) bişêlînim, dikarim her faşîstî bikûjim”. Lêbelê min fennan nekir. Dema ez derketim derî welat, gotin ku har û şêt bû. Vê dawi- yê min bihîst ku di firokeke dennankirina çandiniyê de, bi qezayê mir. Weke zilamê peywirê timî di bîra min de ma. Serpelê duyemîn ku bi Mahîr Çayan û wan re livbazî kirî, îlyas Aydin bû. Lêbelê we- ke dibêtiyeke lawaz min ji xwe pirskir ku gelo çênabe sempatîzan be. Bi awayek berbiçav tevkariya wî li Enqere li bihêzbûna komê gelekî çêbûye. Endamê komê nemaye ku xweyî nekiriye.

Di vê demê de, milîtanê bijare Şahîn Donmez e. Hewl dida ku bibe alîkarê min. Lêbelê di hundir de li hember rêhevalê xwe, mêr- kûjiya

herî hovane wî pêkanîbû. Bi vê yekê dixwest ku xwe bihêz nîşan bide. Bi kompleksbûna wî, ji damezraka malbatê dihat. Ali- yekî qels ê hilatina serokatiyê bû. Verşîna wî zûka ya li pirsiyariya polês, rê zûka li bir sefera min ya Rojhilata Navîn vekir. Heger ku ne verşiya bana, domandina dîrokê yê bi şêweyeke din bûna. Ji ali- yê din ve, neçûbana ser rehevalên xwe yên ku şerê rûmetê dikirin û rojiya mirinê li wan ferz nekiriba, pêvajoya 15ê Tebaxê bi wê şê- weyê pêşnediket. Di kurdan de tîpê ku di mercên zor de, bihêsanî refê xwe diguhere temsîl dike. Di rojên rihetiyê de, ev dixwazên herî li pêş xuya bikin.

Bi dibêtiyeke mezin, dewletê xwestiye ku bi Kesîre û Necatî ko- mê û herî bêhtir min têxe bin venêranê, dikare were diyarkirin ku kirine vê jî bi rêbazên kevneşopî, bi jin û diravan pêkbînin. Heger ku min çewtiyên mezin kiribana, PKK hê nehilatî, di merhaleya ko- mê de yê ji holê rabûbana. Jin û diravê ku kesayetiya Kurd timî li hember wan têkçûyî, weke du çekên hîkarîker hatine bikaranîn. Mêrkûjiyekê û verşîneke nêzîk, gavavêtina min a ku dîrok guhertî bi xwe re anî. Di dema komarê de, azadiya viyana gel, cara yeke- mîn li hember sazîbûneke dîrokî hatiye. Kesayetiya min pêvajoye- ke zor derbas kiribû. Welatparêzî, rizgarbûna ji dorpêça malbatê, bêyî ketinekê derketina ji dilîniya nexweşiya ciwantiyê, bi PKKê re bidestxistina nasnameyeke nû, di vê demê de yekem car di dika dî- rokê de xuya dikin. Altematîfa gel derdiket holê. Kompleyên kev- neşopî, encamên berevajkî dabûn. Koçberiya min a Rojhilata Na- vîn, ji mînakên xwe yen dîrokî ne hindiktir girîng e. Di serokatiyê de rawestgeheke nû temsîl dike.

**b- Parçebûna Civakî ya di Kesayetiyê de û ji nû ve Veavabûn**

Pêvajoya 1980-90Î, ji aliyê pêşveçûna serokatiyê ve, çirandina kesayetiya cîgeyî û ji nû ve damezrandina wê ye. Koçberiyê digel hinek windabûnan jî, qunnê kome yê sereke rizgar kiriye. Li sêgo- şeya herî sincirî (sorbûyî) ya cîhanê, biryargeh hatiye damezrandin.

Sêgoşeya Îsrael-Libnan-Sûriye, di serê qada koçberiya kevneşopî ya Mezopotamyayiyan de tê. Teraz û levdana Rojhilat û Rojava, ro- jên xwe yên herî genn li vê qadê dijî. Merhaleyek ji ya şerê di na- va îslamê

de, şerê îran û Iraqê (1980-88), destpêkiriye. Lihevdana Ereb û îsrael demeke herî genn dijî. Neteweperestiya Kurd di nava lêgerînên nû de ye. Neteweperestiya hoveber, hewl dide ku ji mer- cên nû sûd bigire. Di van mercan de, viyana gelê Kurd a azadiyê xwedî şensekî bisazîbûn û berfirehbûnê bû. Beşeke girîng ji koçbe- ran gihabûn hev. Civakeke ji 300 kesan a bi biryar kom bûbû. Kur- dên Sûriye û yên Libnan refên xwe vekiribûn. Şoreşa îranê derfe- tên mezin afirandibûn. Li welat gennahiya têkoşînê berdewam di- kir. Xeteriya ku Tirkiye ji venêranê derkeve, pesenda (tesdîq) Ro- java jibo rejîma 12ê îlonê derand. Nêzîkayiyên filistîniyan li gor mantiqê bazirganî bû. Bi saya hebûna me, dema ku ji Enqere tewîz standin, dostaniyeke wan a jidil bi me re nemabû. Sûriye weke cî- girên dema dirêj nêzîkî me dibûn. Serokê YNKê yê neteweperestê Kurd ku bûye mîna gur, weke ku gelek kesên nezan bikaranîbûn, bi heman rengî nêzîkî PKKê jî bû. Ji her alî ve rewş hatibû guhertin. Jibo rola dîrokî were lîstin, pêwîst e şaşbûnên mezin neyên kirin. Ji aliyê din ve pêwîst bû ku koçberî veneguhere penaberiyeke genî. Pêdivîbû li hember bandora Ewropa ya bêesilker, baldar bûna. Pê- wîst bû ku amadekariyên jibo di dema bikêrhatî de vegera welat, xebata bingehîn bûna.

Ez di vê rewşê de me ku van mijaran bi vî rengî binirxînim. Di bingeha zehmetiyên min de, provekasyonên Kesîre û bê angaştiya hevalên ku yên bikarîbûna aliyê min bikira bûn. Bandora yekîtiya herdukan heza min dikoşt û ez bê bandor dikirim. Di bihara 1983an de, Mehmet Karasungur di ser Iranê re, bûbû qurbanê levdana PDK û YNK. Komên çepên Tirk û komên Kurd ên bi bîrûbaweriya bur- jûvayê piçûk û feodal ku hatibûn qada Rojhilata Navîn, ji binpêbû- nê wêdetir ti wateyên din nedidan. Hê di bihara 1980an de, koman berê xwe dabûne hûndirê welêt. Girtina Kemal Pîr a bi bêşensî, en- cama vê çûyinê bû. Bi rastî jî yekî ku yê bûbana çengê rastê bû. Timî min heyfa xwe wiha tanî: Xwezîka mabana û me hemû karên pratîk ên milîtanî ji wî re bihiştana! Rêhevalekî ku windabûna wî herî bêhtir xwe dabû hiskirin bû. Rêhevalekî wisa rind û baqil bû ku, dema nefesa xwe ya dawî da, serokatî di derbarê Kesîre û M. Can Yuce de hişyar kiribû. Herçiqas ku li hundir gelek girtin hati- bin kirin jî, li qasî ku PKK bi awayek serkeftî derketina derveyî we- lêt pêkanîbû, vegerên xwe yên pêşî jî çêdikirin.

Di dem û cîhê ku hatî girtin de, serxwebûn, resenîtî û paqijiya serokatiya gelê Kurd, berî her tiştî dihat. Ev dikarîbû ji hemû gelên Rojhilata Navîn re jî bibe hêviyek. Yên ku baweriya xwe bi vê yekê danîn, bi tempoyeke bilind mezin dibûn. Mercên zîndana Amedê û rojiyên mirinê, zor dikir ku em zûtir hereket bikin. 12ê îlonê ketibû pêvajoyeke nû. Jibo were nîşandan ku şoreşgerî ne qediyaye û li hember êşkencê em bêdeng namînin, ji aliyê din ve ji ber pêdiviya girêdana bi xêz- kê ve, Pêngava 15ê Tebaxê munasib hatibû dîtin. Dema nû ji aliye çalakî ve jî hatibû destpêkirin. Heger ku şehîdên rojiya mirinê ne- bûna, belkî rewşeke cuda çêbûbana. Şidetê bangî şidetê dikir. Êdî dîrokê yê di dorpêça şidetê de meşa xwe bidomanda. Di heman de- mê de 15ê Tebaxê, bersiva hosiyên Mazlûm Dogan a ku gotibû “Pêwîst e qêrînên me bi cîhanê bidine bihîstin” bû.

Li ser navê serokatiyê, Di konferansa yekemîn de (1981) pirtû- kên bi navê Rapora Polîtîk, Li Kurdistan Pirsgirêka Kesayetiyê, Ji- yana Partiyê û Taybetiyên Mîlîtanê Şoreşger, Li Kurdistanê Rola Zorê û Li Ser Rêxistinbûnê ku hatin pêşkêşkirin û nivîsên ku di ro- ja me de nirxekî klasîkî qezenc kirin, di vê demê de hatibûn weşan- din. Hemû di navbera salên 1980-1985an de hatibûn nivîsandin. Gelek axaftinên dirêj ku jibo navendê jî hatin kirin, di nirxê pirtû- kan de bûn. Rojname û kovar bi çend zimanan dihatin weşandin. Arastina daringî û teknîkî bihêsanî dihat bidestxistin. Vekirinên te- orîk û pratîk, di dewlemendiyeke ku rê li ber her serkeftine vekin de bûn. Ketibûne xêzkeke çalakiya dîrokî. Li hember rûyê rejîma 12ê îlonê (Rezber) yê ku ji aştî û levkirineke demokratîk re girtî, di vê demê de heta bi kûderê, çawa û kengî yê bi encam bibe ku ne- dihat zanîn, bi biryarbûn, şêwe û tempo di asta ku babetî (layîqî) se- rokatiya gel de bûn. Bêpariya ji alîkarên bihêz, ne di wê giraniyê de

bû ku pêvajoyê rawestîne.

Lêbelê qelsîtiyên ku dema pêşî xuya nedikirin, derdiketin holê. Qadên cur bi cur di veneguherînê de bi israr bûn.

Berî her tiştî xweferzkirina Kesîre li derî sînorên debarkirinê bû. Provekasyonên xwe bihewa dixistin. Derbe li aliyê herî nazik ê hi- nek dost û rêhevalan dida. Kesekî weke wê nizanîbû ku dawiya çanda xanedanên hevkar hatibû. Cîhaneke wan hebû, ev cîhan jev- diket. Cîhaneke nû ya gel vedibû. Qet navîbû ku bi giyan û mebe- sta xwe, amadeyî vê yekê bibe. Tişta divabû ku biçespîne, cîhane- ke gel ya azad û xweşik a ku ji ya wan bibore yê nebûna. Çiqas ku di kesayetiya min de cîhana gel vedibû, rengê wê diçilmisî. Ev ra- westina wê her çiqas weke karîkaturekî wê yê basît be jî, timî Kle- opetra ya ku min di fîlmekî de dîtibû bi bîra min danî. Jibo wê ne Imperetoriya Roma ya Sezar, serayên Misra kevnare bingeh bûn. Serayeke Firewn bi tenê bi cîhanê nedihat guhertin. Kesîre jî xwedî serayek û xanedaniyeke malbatî bû. Cîhana gel heger ku bihiştiba- na jî, diltengî di da wê.

Dixwest ku provekasyona xwe ya dawî, sala I986an dema em ber bi kongreya sêyemîn diçûn biteqîne. Jiberku ez ji şerê wê bitirs bûm, min baştir dîtibû ku ez kongreyê li paş bişopînim. Weke ku hezar salbûn em pevdiçûn, di nava hêrsekê de bû. Hê jî windakirin nedipejirand. Tebeqeya Kurd a raser ku heliyayî, di wê de nefesa xwe ya dawî dida. Heçku heta dawî min pêdiviyên hevaltî, dost û rêhevaltiyê pêşkêş kiribûn. Lêbelê min timî diyarkir ku, li hember serokatiya gel, heger ez jî bim, fersend nayê dayin, ya rast cîhana gel ya azad e, yekîtiya di vê de yê nirxekî mezin be. Lêbelê ew ji ya xwe ne hate xwar. Rêxistin alîgirê cizakirina wê ya bi kûştinê bû. Wê jî mirin dixwest. Vê yekê ez timî hizirandim. Min gotibû ci- zayê herî mezin jiyandina wê ye. Ji aliyê din ve, dawiya dawî za- yendeke dihat perçiqandin û Kurd bû. Di encama dîrokeke hezar salan a bilanet de hatibû vê xalê. Di wê rewşa wê de, tolgirtineke bêteşe li me nedihat. Ya girîngtir, têkiliya min hê ji serî de di nava hewldaneke levkirinê de bû. Bi vê annancê bi malbatê û bi wê re ketibûm nava têkiliyan. Ev mebesta levkirineke siyasî û demokra- tîk bû. Xiyanetkirina min, bi rastiya serokatiya min re pevnedikir. Ev têkiliya ku encex di risteyên romanan de bi kûrayî bête raveki- rin, piştî deh salên pêtî, di havîna 1987an de bêxatir, bêdil û

bêxa- tirxwestin, çawa ji reşahiyê hatibû wisa kete nava tarîtiyê.

Ezmûneke evînê, jibo min û gel pir biha hatibû. Sedema ku ge- lek rêheval ber bi xwekûjiyê birin, ev ji min re bûbû êşeke timî. Lê- belê heta ku tekiliyên diyalektîka serdest neyê jiyandin veguherîn çênebin, tekoşînên civakî û neteweyî nedihatin meşandin. Hilweşî- na trajîk a hinek têkiliyan, jibo damezrandina hineke nû pêwîst di- bûn. Heger ev girêka kor nehatiba perçekirin, xwedawenda evînê nedihat fêmkirin û min jin nasnedikir. Di têkiliyekê de tişta hatî da- hûrandin, dîrokeke bêhempa û çîn bû. Tişta dabaşa xeberdanê, tê- kiliya koletiyê ya herî kevin bû. Ji dîrok û rastbîniya civakî ya gel wêdetir bû. Her çiqas ku êş û zirara wê mezin bû jî, ev têkiliya ku bi vî rengî bi encam bû, ez ji jinê dûr nekirim û hêletê min jê nebir. Rê li ber min vekir ku bi kûrayîke nebe nesîbê ti rewşenbîran, des- tê xwe bavêjime rastiya jinê. Min tola lîska wê ya bi şanaziya (dif- re) min a bi awayek erjeng, bi vî rengî digirt. Ez bi biryarbûm ku, jinîtiya bi wê re û mêraniya bi xwe re ya ku rê li ber vê têkiliyê ve- kirî bikûjim. Li ser navê mirovatî, welatparêzî, wekhevî û azadiyê, encex ez bi vî rengî bersiva ve yekê bidim. Ji wê salê û heta weke îro, min li ser jinê gelekî nivîsî û ez gelekî ji wan re vebûm. Min mezinatiya wan dît û piçûkbûna xwe jî. Min mêrê ku ew ji mafê wî nayên der û tekiliyên jinê yên dilxelên (zişt, pelos) dahûrandin. Min esehiya jiyana mala gelemper (kerxane) û mala taybet, nîşan da. Bi- la çewt neyê fêmkirin, ez tekiliyên malbatî yên damezrandî twan- bar nakim. Lêbelê ji ber giramgiriya min a ji evînê re, li hember wanê ku hêviyên mezin girêdane û bi sedan ên bi şewata canê xwe ev çespandine, vê weke peywirekê dibînim. Pêwîst bû evîn li vê xa- kê bijî. Jibo vê yekê jî pewîst bû şerên wê bêtine kirin.

Ev şerê ku ez nirxê mezin pêdidim hate dayin û evînê qezenc ki- ribû. Ya şûnde mabû ji rûmeta mêr û jinên esîl re. Em bûbûn lawên layîqî vê xaka ku di serî de bi evîna xwedawendê û nirxên şarista- niyê bilind bûyî. Teorî û pratîka evînê rast hatibû kirin. Encex ên ku

argûra (pêtal) serfiraziya azadiyê di destê wan de, nêzîkî xwedawenda evînê bûbana. Ev xaka ku bi keda dayîka xwedawend ji çan- dinî û kedîbûnê re hatî vekirin, tenê evîna yê ku layîqî wê, yê xwedî maf bana ku li ser bijî. Zagoneke evînê hebû, yê lêguncîn bûna. Li qada gelan, hemû cureyên şer zor in. Çiqas zor û di zorê de be jî, heger li hember serokê wê tu wiha jinê bide pêş, tu hewl bide ku bi leyîstikên zayendî yên ji hezar salan ve tên leyîzandin bide erdê, di- vê tu bipejirînî ku bersiva vê yekê yê bi rengekî wiha be. Li ser na- vê mirov, li ser bilindayî û evîna wî, li amûr û rêbazên komployên dîrokî yên herî bi bandor, wiha bersiv hatibû dayin. Ya bi şûn de, maye ji hewldanên esîl û serkefta ên ku di vê mijarê de soz û bir- yarên wan heyin re. Bê alîkarî jî zor bû. Di bilindbûna serokatiyê de, bêhêzbûna alîkaran, nexasim hineke ku xayin derdiketin, rê li ber trajêdiyen mezin vekiriye. Ez timî dibêjim: Heger çar-pênc ke- sên ku xwe li şêweya serokatiyê rûniştandî hebûna, ne êşên bi vî rengî çêdibûn û ne jî şer evqasî dikete astengiyê. Tenêtiyê belkî ez mezin kirim. Lêbelê êş û windakirinên mezin ku maf nekirin bi rê- hevalan û bi gel da jiyandin. Di vî derbarî de ez tim Hz Mûsa bi bîr- tînim. Mûsa jibo ku qewmê bi nalet bike yek, çil salî li çol û çiyan diqîre. Deh Fennanê derdixe holê. Lê qewmê wî dîsa weke xwe di- ke. Dîrok dinivîse ku fennandarekî bi navê Yeşû tenê li pey xwe hişt. Hinek gotegot (rîwayet) dibêjin ku qewmê wî ew kûştiye. Te- nêtiya Mûsa gelekî xemgîn e. Dîrok hinekî wiha pêwîst dike. Ez di- zanim ku ji min hezar caran zêdetir xwedî wêrekî û fedekariyan he- ne, hijmara van digihe hazaran. Lêbelê dema dîrokê derdixin holê, bûyina xelîfetî û alîkariyê taybetmendiyên cuda pêdivî dike.

Bûyereke din a ku bisazîbûna serokatiyê şewşandî, qaşo di bin navê serokatiya gundîtiyê de, hewldanên derketina holê ya komeke ku ji bîrdozî û disiplînê reviyayî ye. Mercên çiyê ku hoveber dike û lawaziya venêranê, rê li ber gelek tîpên dirû û ji hêvotina seroka- tiyê bêpar vekiriye ku pêşvebiçin. Jevbelaviya kongreya sêyemîn û xwedîlêdemeketina navendê ya li partiyê, dorhêl heta bi dawî ji van re vekiriye. Çêbûna bi navê Çeteyê Çannend, berhema van merca ye. Vê meyldariyê ji aliyekî ve damezraka bawennend û fedekar dişkand û ji aliyê din ve jî hewldanên serokatiyê davêtin binê bîre- ke bêbinî û vala derdixistin. Evan ji sinc û hêvotina ku derketina se- rokatiyê şîrove bikin

û bisepînin, bêpar bûn. Kûştinên li derî xêzkê yên jin û zarokan, ji vê çavkaniyê dihatin xweyîkirin. Evan binge- heke bêesilbûnê ya cidî davêtin. Van tîpên ku Şehîd Mahsûm Kork- maz bal kişandî ser wan, heta bi kûştina gelek partîzanên binirx ku ji xwe re asteng didîtin, karê xwe pêşxistin. Rola van a di şehadeta Mahsûm de jî, hewceyî lêkolînê ye. Piştî Şahînê di zîndanê de, di nava partiyê de Mehmed Şener û Selîrn Çurukkaya yên ku mîna mikurkerekî rol dilîstin, lêbelê ev yek bi demagojiyeke tûj dime- şandin, dijîtî ji xwe re kiribûn weke pênasekê. Li ser rojiyên miri- nê û xweşewitandinan, xwestin ku bi demagojiyan encamekê bigi- rin. Xwestin rizgariya xwe ya takekesî bi rêbaza demagojiya dijber bitemirînin. Xwe ji şixulandina derfetên ku zêde bûbûn, paşve ne- hiştin. Tîpekî cihêreng jî Dîlawer Yildirim e. Bi çend rexneyên lê hatin kirin ku qurifî û xwe kûşt, pêdivî dike ku ev pêvajo were da- hûrandin. Malbateke ku dişibe malbata Kesîre, berevajî ku jê dihat hêvîkirin, neketina wî ya nava hewldanên di pratîkê de, ji aliyê din ve ku profîleke serokatiyê xêzk dike, rewşa wî balkêş dike. Derke- tina wî ya derve û bi hevdîtina wî ya bi serokatiyê re, nedişibiya rê- hevalekî berpirsiyar. Yekî xwedî potansiyel bû. Em bi hêvî bûn. He- ger ku ji ber diristiya xwe çûbe mirinê, mixabin lê hatiye. Mijare- ke ku pêwîst e were lêkolîn e.

Vê demê hinek lêgerînên kûştinxwazî çêbûn. Gelek lêpirsîn ha- tin çêkirin. Lêbelê ji ber bîrûbaweriyên dogmatîk û ji ber tawanba- riyên çêkirî, dibêtiye ku hinek cizakirin pêkhatibin. Ji aliyê min ve kemasiya min ev e, jibo ku ewlekariya zêde bi rastiyên gelemper û bi kitekitên pratîk, ezmûnê qezenc bikin, min berpirsiyarî da kesên ketûber û ev yek bingeh girt, bawerdikim ev hemû ji vê yekê diha- tin. Divê ez bidim nîşandan ku min ji vê nexweşiya kûr a sosyalîz- ma reel, para xwe stand. Danîna rastiyên neberbiçav ên li şûna ras- tiya mirov a tevlîhev, dahênaneke şaristaniyê ya rahîbên Sumer e. Di bin navê rastiyên gerdûnî, rastiyên xwedayî, hêmanên felsefî û rastiyên zanistî de, rastiya berbiçav di plana duyemîn de ma. Ya ku dogmatîzm xweyî dikir ev hînbûniya raman bû. Piştî ku rastî tên gotin, weke ku suxreya xwedayî ya rahîbê pîroz hatibe bicîhanîn, dikevin nava hestekî. Şaşîtî li vir hate kirin.

Divê diyar bikim ku ez di vê mijarê de, xwerexnekirineke wêrek

jiyam. Heger ku bidemgî be jî, bi awayek zêde ev xwerexnegirî di vê parêznameyê de, hatiye nîşandan.Di wê baweriyê de me ku nir- xê wê yê mezin û pewîstiya wê heye.

Weke encamê, ev dem di pêşveçûna serokatiyê de, pêngaveke bi pêşve ye. Bendavkirina dewletan a rasterast û neyekser hatin der- baskirin. Rêbazên klasîk ên dewletê ku şoreşger û serhildêrên Kurd bêbandor dikirin, hatin bêhîkarîkirin. Hisdike bila bi qezenckirina dostanî û hisdike bila navtêdankirin be, em nehatin lîstikên ku xe- teyan bi me bidin kirin. Weke li hemberî PKKê, hewldanên ku li hember serokatiyê jî altematîfekê pêşbixin, vala hatiye derxistin. Paşverûtiya Kurd a navxweyî ya klasîk, kesayetiya ku îflas kirî, bi şêweya ji nişkêve û bi wêrekî, di warê vala derxistinê de herî bêh- tir rê li ber ziraran vekirine. Hinek peyanên kûştinxwazî vala hatin derxistin. Kişandina tevgerê ya Ewropa û kedîkirin, bi zanîna ku li pey vê yekê îstîxbaratên Ewropayî hebûn, vala hate derêxistin.

Taybetiya vê demê ya diyar ev bû ev yek bingeh dihat girtin ku, serokatiya PKK ji aliyê dewletên herêmê ve were kontrolkirin. Sa- zûmana hnperyalîst, ji dêvla ku rasterast têkildar bibe, serkaran bi- kartîne. Bi taybetî mebesta Ahnanya ya li ser Tirkiye û dewletên herêmê, ji destpêkê ve pêwîst kiriye ku serokatiya PKKê annanc bigire. Li ser rûyê PKK xebatên ku bi rêxistinên serkar dide meşan- din, li bêencamiyê rast tên. Ji vê yekê jî serokatiyê berpirsiyar digi- re. Dipelikîne ku hesabê li ser Kurdan dike, yê vala herin. Ji serî de yan PKKyeke li gor xwe yan jî parçekirina wê kiriye rojeva xwe. Girtinên 1987an, ezmûna damezrandina altematîfa serokatiyê ye. Li pişt hemû bemameyên şerê taybetî yên Tirkiyê rawestiya ye. Lê- belê nakokiyên wê di hinek xalan de û hêza ku zêde dibe, rê li ber nakokiyên di nava wan de vedike. Li Ewropa dûrxistina serokatiyê an jî serîlêtewandina wî, polîtîkaya wê ya kû ji serî de bibiryar da- ye meşandin e. DYA û Îngîlztan xwestine ku li ser YNK hîkarîker bibin. Iran û Erebîstana Siûdî komên îslamî ferzkirine. Weke li do- ra PKKê, li dora serokatiyê jî tengkirina qadê, gav bi gav hatiye pêşxistin. Lêbelê digel kontrola dewletên herêmê jî, navbera ku bi serokatiya gel hatî standin, pêşveçûneke dîrokî ye. Bitaybetî nirxên rastî yên xebatên Rojhilata Navîn ên vê demê, nehatiye fêmkirin. Ez bi awayek vekirî bibêjim ku,

vekirina vê mijarê ya bitemamî, bêwext dibînim. Lêbelê divê were zanîn ku, Xebatên serokatiyê yên li Rojhilata Navîn, di nava şerekî tûreyî yê erjeng de derbasbû- ye. Jibo ku giyana azadî neyê windakirin, berxwedana herî mezin hatiye nîşandan. Ev mijar encex bi romanên berfireh, wateya xwe ya rast bibînin. Heta ku xebata min a Rojhilata Navîn neyê fêmki- rin, pêvajoya ku diçe Komploya 15ê Sibatê nayê fêmkirin. PKK hê jî bitaybetî nezana aliyê wê yê şerê psîkolojîk e. Ders jêgirtina wê, jibo dabînkirina netêrayiyên demê, dikare rê li ber xwerexnegiriye- ke rast veke. Serokatiya vê demê biteqezî divê were fêmkirin.

## 4- Esehiya Komploya Sedsalê Çawa Were Fêmkirin

### a- Komployên Dîrokî Pêşveçûnan Ranawestînin, Lezgîn Dikin

Piştî 1990an, ji aliyê cîhanê, herêmê, welat, PKKê û min ve, pê- vajoyeke nû ye. Pêvajoya jevketina Sosyalîzma reel, bi awayek fennî jî tê pejirandin. Sazûmana Sovyetê, jiberku xitimandina nava xwe di dem û cîh de bi veguherînên pêdivî pêkneanîn, berdêlên wê bi jevketin û hilweşînê dide. Rêzika ku ji her bûyera civakî re der- basdar, careke din rast derdikeve. Nakokiya di navbera annanc û bû- yerbûnê de, demeke dirêj bi zorê nayê meşandin. An bi rêya nûsazî an jî ya şoreşê ber bi pêş, qevastina merhaleyeke rasertir jênerev di- be. Heger ku ev neyê pêkanîn, rizîna ji hundir û jevbelavbûn bi zo- ra paşverûtî, di serdema me de bi faşîzmê tê binavkirin û dixin nava restorasyonekê. Restorasyon, heman xaniyî bi kereseyên nû ji kevin bi hêztir nîşan dide û payîdar dike. Lêbelê jiberku dînamîkên civakî zorê li tevgerê dikin, ev xanî dikevin derewaya muzeyên ku di wan de nayê rûniştandin. Sazûmanên sosyalîzma reel û faşîst ên ku ber- hemên şoreş û şoreşa hember, dema ku nabine bersiva pêvajoya nor-

malbûnê û jibo veguherînên pêdivî nekin li berxwe dane, ji hilweşînê rizgar nebûne. Cîhan, di dawiya şerê mezin ê duyemîn de, dibe şahidê hilweşîna faşîzmê. Sosyalîzma reel a ku berhema vî şerî jî, di dawiya 1990an de di nava xwe de jevdikeve û jevbelav dibe. Pêva- joya em dikevinê, dema ku çep û rast peresin dibin, di veguherînan re dibûrin û di sazûmana şaristaniya demokratîk a serdestiyê qezenc dike de, digihin hev e. Rêya çareserkirina pirsgirêkan a bigiranî, yê bi krîterên serdest ên sazûmanê werin pêkanîn. Sazûmana navnete- weyî, di vê bingehê de hêman û saziyên xwe di ber çavan re derbas- dike, sererastkirinên ku bersivê bide mercên nû pêktîne. Veguherîna di tevaya cîhanê de, di vê bereka sereke de ye. Ketina ji sedsala 20an a sedsala 21an, herî bêhtir bi vê bûyera sereke ve girêdayî tê terîfki- rin. Sedsala 21an di vê angaştê de ye ku, weke şaristaniya demokra- tîk û serdema mafê mirovan were binavkirin.

Rewşa şer û aştiya di bingeha neteweperestiya paşverû de, ya li Rojhilata Navîn ku ji sedsalan ve tê, bi temamî di pêvajoyeke xi- timî de ye. Enerjiya gelan bi sepînên neteweperestiya paşverû, tê daqûrtandin. Pirsgirêk nayên çareserkirin, bi çend rantperestên qeyranê tînine rewşa şêweyeke jiyanê. Pêvajo di encama neçareser- kirina zêde de, rê li ber peydabûna bîrdoziyên paşverûtir û terîqet- bûnan vedike.

Tirkiye ku dewleteke sereke ji ya herêmê ye, bi qeyranên ku li ser hev diqewimin, xitimandin bi şêweyeke herî sift tê jiyandin. Ne ber bi guherîna bîrûbaweriyê û ne jî ber bi veguherîna damezrakî ve gavan davêje. Şerê taybetî ku aniye rewşa seferberiya gelemper, dewlet jî ji xêzka kevneşopî derdixe, dikişîne qadeke sepandinê ya derî hiqûq ku çete lê peyda dibin.

PKK jî heman rewşê dijî. Veguherîna ku li tevaya cîhanê tê ji- yandin û çêbûnên di nava wê de bi awayek berbiçav nayên nirxan- din. Têgihîn û sexbêriyên kevin, ji mêj de ji xêzka xwe ya bîrdo- ziyî, polîtîk û rêxistinî derketine, rexistinê vediguherînine komên çete. Damezrakên bi vî rengî, li gelek qadan û li herêma şerê çek- darî, bi şêweyên çalakî û jiyana derî rezikê, teşeyekî paşverû ye ge- lek cuda li PKKê ferz dikin. Navend û kadroyên ku pêdiviye ber- pirsiyar bin, dibine paleyê pûş.

Rewşa min a serokatiyê, li hember van rastiyan çiqas ku diçe di- keve qadeke teng. Bi hewldanên mezin bi taybetî di nava welat de, kişandina

ber bi xêzka ku em dixwazin pêkbînin û pêngavên vegu- herînê, ji aliyê têgihînen çetebûnê ve vala tên derxistin. Weke di dewletê de, di PKKê de jî dema komên li derî xêzkê tê jiyandin. Ev rewş rê li ber çalakiyên bê wate vedike windabûnên trajîk û êşan pir mezin dike. Jibo derbaskirina rewşê, dubarekirinên sift serokatiyê jî bê erk dihêle. Jibo komplo û jiholêrakirinan, dorhêla herî bikêr- hatî wiha pêşvediçe. Ji serê salên 1990an heta bi ber bi 2000an, komploya qeder ku dikim hilweşînim, çiqa ku diçe yê tora xwe li her derê min bipêçe.

Ji serê 1990an pêde, dengê lingên komployên der û hundir digo- tin: “va ez hatim”. Di mêjûya 25 Çile 1990Î de kûştina hevalê min ye zarokatî Hasan Bîndal a qaşo bi berekî qezayê, eslê wê bûyere- ke ku gelek siran di nava xwe de vedişêre ye. Ev dibêtiyeke mezin e ku komployeke ji aliyê rêveberên kampê Sari Baran, Mehmed Şe- ner û Şahîn Balîç ve hatibe plansazkirin. Heger min bûyer dabelan- dibana, di nava demeke kin de operasyon yê bi jiholêrakirina min biqediyabana. Du sîxurên fennî yen ku peywirdarên jiholêrakirina min, wan rojan di telewizyona Star de, li hember tawanbarkirina xwe -bi baweriya min jibo ku Cem Ersever biparêzin- wiha dibêjin: “Em ne semekeftî ne. Me xwestibana me yê bikûşta, lêbelê dixwes- tin em wî giyandar bigirin.” Mikurhatineke bi vî rengî bû. Rastî di nav de hebû. Bi rêya çeteyê ku di nava PKKê de pêşketibû, dikarî- bûn vê bi rihetî bikin. Lêbelê jibo ku kontrola rêxistinê jî di destê wan de bimîne, giyandar mayina min û piştî rêxistin tekeve destê çeteyê jiholêrakirina min, derûna stratejiya wan bû. Pêwîst bû rê- xistin bitemamî têkeve destê wan. Ji ber vê yekê jî, hemû kadroyên dirist û girêdayî yên ku xeter didîtin, pêdivî bû bi şêweya qezayê ji holê rakin. Şemdîn, Cemalê Kor, Hogir û Şahîn, ev pêvajo bi şehîd- kirina Mahsûm Korkmaz di sala 1986an de dabûn destpêkirin.

Niha tê fêmkirin ku, an bi hênceta qezayê an jî di bin navê “sî- xûrtiyê” de, bi sedan kadro û welatparêzên dirist kûştibûn. Jibo ku kadroya partiyê ya herî binirx û damezraka çalakîker ji holê rakin, bi zanîn di bin navê çalakiyan de, dişandin mirinê. Jibo vê yekê di derbarê inisiyatîfa fennandariyê de, bi awayek erjeng helwestên nazik nîşan didan. Lewra çiqas ku rayeya fennandariyê hebe, ev yê ewqasî komplo, mêrkûjî û qezenckirina hêzê be. Ez bi temamî na- bêjim dewlet, lêbelê di bûyera Cem Ersever de jî, weke ku hê ne hatiye ronahîkirin,

dibêtiyeke mezin e ku tekiliyên derdorekê bi vî çeteyê di nava PKKê re rasterast an jî neyekser hebû. Ji xwe di na- va dewletê de, te zanîn ku vê demê kontrolkirina çeteyan gelekî zor e, Dîsa di vê demê de, di serî de PDK, hinek ji beşên KUKê, gelek eşîr û peywirdarên taybet, bi awayek sift di nava vê pêvajoyê de, peywira xwe domandine.

Sedema ku çete semekeftîbûye, diyarbûna sergerdeyên wê ye. Cizakirina Şahîn Balîç a bi mirinê, Reva Sari Baran, Mehmed Şe- ner û Hogir, kûştina Cemalê Kor a berê û kişandina Şemdîn a bin kontrolê, bi awayek mezin çalakîtiya çete şikand. Girîngiya bûyera Hasan Bîndal a mezin, jiberku hemû mebest û girêdanên dibêtî yên çete dabûn dest bû. Heger ev bûyer nehatiba dahûrandin, serokatî ye di destê wan de mabana û yeeke xwesteka xwe bikar anîbana. Ev zor e ku em bibêjin tevan sîxûrtiya hişmend dikirin. Lêbelê tê- kiliyên beşekê bi çeteyên dewletê re mîsoger e. Ev rolên xwe ne weke sîxûrên sicîlkirî, di bingeha berjewendiyên kes û malbatê de ya ku li nav kurdan gelekî tê sepandin, bi levkirinên veşarî dane meşandin. Ev tîpên wisa bûn ku, jibo rêxistinê bixin destê xwe di- karîbûn her rêbazê ezmûn bikin. Ev dişibine şêweya ku serokê Hiz- bûlahê, li hember PKKê dewlet bikartanî. Hinek komên PDK û KUKê, gelek eşîr û rêxistinên di bin navê cihêreng de, lêxistine û mêrkûjî kirine. Çavkaniyeke girîng a rantperestiya ku digotin “Prî- mê Apo”, bi hişmendî an jî ji ber xwe ve heta bi nava PKKê berfi- reh bûbû û weke nexweşiyekê belav dibû.

Li gor baweriya min a takekesî, kûştinxwaziya li Ozal hatî kirin, mirina wî û di kûştina hinek fennandarên ku Fennandariya Giştî ya Cendenne kirin de, para van çeteyan û qaşo fennandarên ku Ozal semekeftî didîtin hebû an jî ev dibêtiyeke ku neyê piçûkgirtin e.

Sala 1993an, ev mêjûya ku di dîroka PKK û dewletê de şikes- tineke girîng çêbûye û ji xêzkê hatiye derketin e. Damezraka Turgut Ozal a ji guftûgoyê re vekirî, rê li ber qurban bûna wî ya ji aliyê hêzên ku nikarîbû wan kontrol bike vekir. Di van rojan de, Eşref Bedlîs ê ku di qezayeke firokê ya bi gengeşî de jiyana xwe ji dest da balkêş e. Di pey vê re mêrkûjiyên bêhijmar ên di bin maskeya Hizbûlah de, valakirina bi hezaran gund, operasyo- nên ku hatin siftkirin, weke sefera tinekirinê hat femkirin. Taktî- kên PKK ên ku ewqasî ne baqil, ji zêdebûna windakirinan û xiti- mandina pêvajoyê wêdetir nediçû, gerîla ber bi

têgihîn û sepîna parastineke rewa ve nedihat kişandin. Rêvebiriyên leşkerî û si- yasî yen demê, teror derandibûne derî xêzka hiqûqê. Derketina dewletê ya ji rêçikê lezgîn bûbû.

Vê demê kûştinxwaziya komplo ya herî girîng, di mêjûya 6 Gulan 1996an de nêzîkî xaniyê me yê Şamê ku gilûr (qerebalix) giran, teqandina tirembêleke ku nîv ton teqemenî tê de ye. Ji ber ku li têlefo- na min dihat guhdarîkirin, ji wan weye ku ez li wêderê me û tirem- bêl tê teqandin. Ev komploya ku seroka hikûmeta demê Tansu Çiller, bi 50 mîlyon dolarî ji diravdaniya sergirtî fînanse kirî, gelekî berfireh e. Di çapameniyê de hatibû nivîsandin ku, yên bi navê çeteyên Su- surlukê, Malnnûd Yildirim ê bi kod navê Yeşîl, hinek ji malbateke kurdên Sûriyê û serokê şaredariya Wêranşar ê demê di nava vê komployê de bûn. Di lêpirsîna min de, yên ku li ser navê leşkeriyê hereket dikirin, bi israr danîne ziman ku ev kes ne berpirsiyar bûn û ew û dewlet temsîl nedikirin. Digotin ku dema me bixwestibana, me dikarîbû em vî karî bi fuzeyan pêkbînin. Ji xwe dihat zanîn ku di na- va dewletê de du nêzîkayiyên cuda hene. Bi vê bûyerê re, di bingeha minêkariyê (bidilêxwetî) de çalakiyên bi bombeyan re xweteqandinê destpekirin. Dorpêça şidetê hê jî bi jor ve hilkişiya.

Derketina dewletê ya ji rêçikê, pêşveçûneke ku herkesî bi şayîş (endîşe) dişopand bû. Çalakiyên “Jibo ronahiyê deqîqeyek tarîtî”, bi vê pêvajoyê ve girêdayî bûn. Di rewişta laîktiya dewletê de jî nû- handinên lezgînî dihatin jiyandin. Pêvajoya ku di dîrokê de bi navê 28 Sibat tê binavkirin, herî bêhtir weke restorasyonekê hate rojevê.
Di rêyên neyekser re PKK jî vexwendî berpirsiyariyê dikirin. Digel her tiştî em bi erênî nêzîkbûn. Em bi têgihîna ku kûştina mirovên bêsûc û valakirina qadan ê raweste, ambargo yê bisînor bibe, şer dewam bike jî yê bi rêzikên xwe dewam bike, ketin vê sexbêriyê. Hevgirtina Tirkiyê bi îsrael re ku di sala 1996an de gihabû asteke stratejîk, fersendê mezin didan îstîxbaratê. Îstîxbarata îsrael a di te- vaya cîhanê de û kontrola wê, îlankirina PKKê ya weke “rêxistine- ke terorîst”, ji aliyê Tirkiyê ve teqîbkirina serokatiyê, hêsan kiribû. Di vê mêjûyê de, Shnîtîsê ku piştî Papandreu bûyî serokwezîrê Grek û serokê DYA Clinton, di sala 1996an de dikevin nava têgihî- neke ku zagonîtiyê nedin serokatiya PKK û fersend hebe wî teslhn bikin, ev agahiyeke ku vê dawiyê hatibû bihîstin

e. Qada hiqûqê ya ku li dora PKKê dihat tengkirin hê bêhtir zêde dibû. Di serî de Frensa, Ahnanya û Îngîliztan, li hember alîgirên PKKê kampanya- yeke girtina bi annanca siyasî, dabûn destpêkirin.

Serokatiyên YNK û PDK yên Kurdistana Başûr, weke spartekên bingeh ên kampanya li dijî PKKê, di sala 1996an de weke hevgir- tina îsrael bi navendên Enqere, Londra û Washîngton re, ketibûn nava têkiliyen sift. Di derbarê Dûrxistina PKKê û serokatiya wê ya ji Başûrê Kurdistan û destekkirina di operasyonan de, lihevkiribûn. Weke xeleka dawî ya plana jiholêrakirina PKK û serokatiya wê, mabû Sûriye. Misrê jî dikişînin cem xwe û şerê psîkolojîk ku li ser Sûriyeyê pêktînin, di demeke kin de berhem dide. Sûriye serîte- wandinê û di derbarê PKKê de lihevkirinê, çêtir li gor berjewendi- yên xwe dibîne.

Berî ku ji Sûriyeyê derkevim, havînê pêde li ser navê artêşê di rêya neyekser re, nêzîkayiyên kanaleke ku zanîn radigihandin, pir balkêş bû. Bi agirbesteke bi wate re, pêvajoyeke nû dihat daxwaz- kirin. Bi zanîna rêxistinê, agirbesta yekalî ya di dawiya Tebaxa 1998an de, bi van ragihandinan ve girêdayî bû. Lêbelê ti wate bi vê agirbesta ku di nîvî de hat qutkirin nehat dayin. Ev guftûgoya ne yekser a aliyên wê yên bi erênî girantir ku mafê me yê parastina re- wa jî nasdikir, heger bi awayek fennî hatiba destpêkirin, pêvajo yê hê bêhtir bi erênî pêşveçûbana. Ez bawer dikim ev yek, rewşeke bi

pêvajoya ku merhaleyên 28ê Sibatê derbasdike ve girêdayî ye.

Em hatibûn serê terka rê. Hatibû têgihîştin ku êdî em nikarin qada Rojhilata Navîn, mîna berê bikarbînin. Ya pêwîst ku bihata kirin, an weke serokatiyê min ê qada çiyê weke biryargehê hilbi- jartibana, şer bêhtir dijwar kiriba û çalakiyên li bajaran bilind bi- kiribana, an jî minê hewl dabana ku legerînên lihevkirinê di mer- cên Ewropa de pêşve biribana. Rewşa şer ku hatibû xitimandin û gihabû xaleke kor, dema ez li çiyê bama dibêtiya ku her cureyê çekan bihata bikaranîn, bi ramana ku rewşa min yê bar gelekî bêhtir giran bikira, ev yek nehatibû çêtirgirtin. Şerekî ku li derdo- ra min sift bûbana, ji her alî ve yê fikareyên mezin bi xwe re hil- girtana. Ji aliyê sincî ve ne rast bû ku ez xwe bikim bar. Ji aliyê din ve, serokatiyen Kurd ên hevkar ji her cureyê şixulandinê re vekirî bûn. Ev rastiyeke dihat zanîn bû ku yê heyîna min a li wi- ra, bi awayek ne baş bikaranîbana. Peymana Washîngton a 17 îlon 1998an, şanîdereke vê yekê bû. Digel ku mercên Ewropa jî xeter bûn, bi tegihîna siyasî, çandî û demokratîk neyekser be jî, hinekî ewlekarî bi hiqûq dihat. Lêbelê qet nehatibû ramandin û texmîn- kirin ku hikûmeta Grek, bi hatina me ya vî welatî di roja 9 Cot- meh 1998an de, yê evqasî rezîl bûbana.

Di dawiya sedsala 20an de, li hember viyana gelê Kurd a azad, di tevaya cîhanê de piştî amadekariyeke domdirêj, plana derbe û komployekê, gav bi gav dihat pratîkirin. Dema ku em fîlin careke din paşde tînin û lê dinêrin, tê fêmkirin ku ev plan hê di sala 1990an de, li London berbihev hatiye dîtin û xwestine ku di asta navnete- weyî de derbasî pratîkê bikin. Digel ku aliyê planê yên li Tirkiyê tên zanîn, aliyen DYA û Ewropa bi zelalî nayên zanîn. Heger em aliyê navneteweyî nebînin, nirxandinên me yê bi kêmayî bin. He- ger ku dubare be jî bi kinayî em careke din bilêvbikin:

1- Mêrkûjiya Palme, digel anancên din, jibo rejîma 12ê îlonê û pişt wê re Tirkiyê bi derve ve girêdayî bihêlin û ji şoreşa azadi- ya Kurd biparêzin, weke amûrekê hatiye bikaranîn. Bi destekkirin û nêzîkayiya xweşbînî yên Palme ya jibo tevgerên Viyetnam û Af- rîka Başûr, Swêd a ku serokwezîrê wê bû kiribû navendek. Swêd dikarîbû bibe navenda tevgera azadiya Kurd jî. Palrne li hember bû ku tevgera azadiya Kurd, bi terorîstiyê were dexmekirin. Di kûştina wî de teriya “dewsa Kurd” û

hewldanên ku PKK weke te- rorîst îlan û qedexe bikin, ev derawaya Swêd a erênî ji holê rakir. Giredana rêxistinbûna Gladio ya di nava NATO de ku li Ewropa gelekî bihêz û hê demeketî holê, bi ve komployê û yên mîna vê re yê rojekê were ronahîkirin. Di pey çalakiya 15 Tebax 1984an re, piştî ku Ahnanya jî giraniya xwe danî, bi hikûmeta Tirkiyê re li- hevkirin pêkhatibû. Bi pêşkêşkirina gelek berjewendiyên aborî, li tevaya Ewropa pêvajoyeke îzolasyonê ya li hember PKKê hat destpêkirin. Provekasyona Palme, xeleka herî girîng a vê pêvajo- yê bû. Dabeşkirina PKKê peşveçûneke din a ku ketibû rojevê ye. Komeke ku Çetîn Gungor di nav de, bi vê mebestê serokatî diha- te kirin. Navtêdanên Kesîre weke kû berhem bidin bûn. Gelek rewşenbîr weke Malnnûd Baksî û Şivan Perwer, hatibûn dûrkirin. Ev tenê bi hewldanên Tirkiyê nayên ravekirin. Eslê wê weke bir- yarake navenda Ewropa dihate sepandin. Çepê Tirkiyê bi vê rêyê ji mêj de hatibû xesandin. Heman plan li hemû tevgerên azadiyê yên cîhanê dihatin sepandin.

Girtina Ahnanya ya PKKyî yên di asta nevandî de jî, parçek ji vê plana bi hişmendî ye. Dihat annanckirin ku parçe bike û parçeyekî girîng têxe bin kontrola xwe. Di serê sala 1990an de Serfennandarê Giştî yê Tirkiyê Dogan Gurêş, di gera xwe ya ku li London kiribû de, gotineke “plana me hat pesendkirin”, di çapameniyê de cîh girtibû. Hatibû fêmkirin ku Îngilîztan jî yê di jiholêrakirinê de rolê bigire ser milen xwe. Dîsa di sala 1991ê de, serokê YNK Talabanî li paytexta Awûstûrya Viyana, bi Wezîrê Karê Derve yê Tirkiyê Hikmet Çetîn re, di derbarê Ilankirina PKKê ya bi terorîstî de, lihevkiribû. Vê nê- zîkaya Talabanî, bi helwestên Ahnanya, Frensa û Îngilîztan re di na- va hev de, di bûyera îlankirina terorîstiyê de rola bingeh lîstiye. Bi vê têgihîna yekîtî ku li tevaya Ewropa gihabûnê, tevgereke Kurd a bê PKK dihat annanckirin. Tevgereke Kurd a bê PKK, di destê wan de keyseke pêdivî bû ku li tevaya Rojhilata Navîn bikarbînin.

2- Piştî sala 1993an ku ezmûna agirbesta bi Ozal re semekeftî bû, vê carê jî taktîka ku li rojevê rûnişt, “ji PKKê re erê ji Apo re na” bû. Jiberku PKK ya bûye xwedî girseyeke bi mîlyonan nikarî- bûn hember bigirin û hewldanên perçekirinê jî encam nedan, taktî- keke bi vî rengî derandin holê. Her dewlet li gor xwe dest bi çêki- rina ,kadroyên PKKê kir. Ji Rojhilata Navîn heta bi Rûsya û Ewro- pa gavên bi vî rengî hatin

avêtin.

Ji bi Şemdîn Sakik pênasa “zilamê duyemîn” hat dahênandin. Jiholêrakirina Apo hatibû biryardan, hisabên piştî wî re dihatin kirin. Jibo bi Kanî Yilmaz roleke wiha bidin leyîzandin, êxistin pêvajoye- ke girtinê a bêvate. Piştî teslîm girtin û jiholerakirinan, dihat ar- manckirin ku weke serokê PKKê bikarbînin. Moskova li ser Nu- man Uçar dixebitî.

Ji helwesta gelek dewletên Rojhilata Navîn ev yek dihat têder- xistin. YNK û PDK lîstikên xwe yen li ser PKK sift kiribûn. Di ke- saniya HADEP (Partiya Demokrasiya Gel) de operasyoneke bi he- man rengî dihat meşandin. Xetîb Dîcle, Leyla Zana û parlamente- rên teslîm nebûn tên girtin û dawî li rexistina DEPê jî tê anîn. Li ser HADEP qayîşkêşiyek dihat jiyandin. Kurdîstan vala dibû, bi rêba- zên toqîn ên bi maskeya Hîzbûlah, bi hezaran welatparêzên ku sû- cê wan ê rêxistinî tinebû, dihatin kûştin. 6 Gulan 1996an de, hê nîv saet di ser bombekirina serokatiyê re derbasnebûyî, nûçeyeke ji çavkaniya London, radigihande cîhanê ku A. Ocalan hate kûştin an jî hat bombekirin. Ev kiryar berî dihatin zanîn.

3- Hevgirtina Tirkiye-îsrael a 1996an û li Bakurê Iraqê têkiliyên rêxistinên Kurd, tirkmen û Tirkiyê, di vergiriyê de ne. Di 17 îlon 1998an Peymana Otonomiya Kurd a Washîngton de, xala herî gi- rîng, helwesta li dij PKKê bû. Eynî weke sala 1925an, Bi tawîzên mezin ku Tirkiye dabûn, dema em ber bi 2000an ve dihatin, lihev- kirineke bi heman rengî pêkhatibû. Ev dihate wateya nûkirina Loza- nê. PKK û tevgera Kurd a azadiyê bi temamî tê îzolekirin, jibo dîl- girtina serokatiyê hemû tiştî digirine ser xwe, li ser gerîlayên Kurd jî bi pêwana hevkarên Kurd, teknîka îsrael û kesên pispor, jibo ope- rasyonan işaret dihat dayin. Ev planeke jiholêrakirina giştî bû.

Rêhevalên ku ji fennandarî û rêveberiyeke sexte ya hê gelemşe-

ya çeteyên nav xwe çareser nekirî, di warê bisengerkirina hêzên xwe de xemsar û hînî jiyana erzan a li ser pişta serokatiyê, rizgar nabin, esehiya qaşo dostên Sûriye û Grek hê nehatîye fêmkirin, li hember nêzîkbûnên wan ên berjewendperest û qurfkî, ya ji seroka- tiya PKKê re mabû meşeke biguman a ber bi nediyariyê ve bû. Bi dilxelînekek mezin serenca 9 Cotmeh 1998an destpêdikir.

Dema derketina 9 Cohneh 1998an tê nirxandin, bê zemîna Roj- hilata Navîn çi wateyê îfade dike, pêwîst e jidil û bi awayek zexm were dahûrandin. Min di vê zemînê de pratîkeke nêzîkî 20 salan derbaskiriye. Têkilî û xebatên min yên bêhijmar çêbûn. Pêşveçû- nên di girîngiya dîrokê de derketin holê. Pêwîst e ji hemû aliyan ve were fêmkirin ku min, bi çi tûreyî û giyanê pêkanîne û min ça- wa debar kiriye. Di serî de damezraka PKK û gelek derdor, li derî dhnenê fennî ku ti tiştî îfade nake, hêza tegihîştinê nîşan nadin ku derûna gelemşeyê fêm bikin. Weke ku di eniya pêşverûyên nor- mal de binavûdeng hatibe jiyandin, xebat hatibe kirin û serkeftinî hatibe bidestxistin. Tiştekî wiha nîne. Ravekirina bi şîroveyeke erzan, rihatiyekê dide wan. Siyaseta wan a dogmatîk û tegihîna wan a rêxistinî wan têr dike. Dema ev sexbêrî têra wan nake, vê carê jî xwe davêjin têgihînên pîroz ên kevneşopî, bi taybetiyên kesayetiya min ên “derasayî” rave dikin û dixwazin bi erzanî ji berpirsiyariyê rizgar bibin. Ji ber vê yekê, ti kes nezîk nebû ku pratîka ez jiyame bi wateya mîtolojîk, felsefî, olî û zanistî jevder- bixe. Gelek pirtûk hatine nivîsandin, min jî nivîsîn. Rastiyên ku ez jiyame, hê jî ez nikarim binivîsim. Ji ber vê yekê pêwîst e qa- dên azadîbûnê pêşkevin. Lêbelê rêheval, hinek kes û saziyên ku mercên wan pir bikêrhatî û karê tegihîştinê ku jibo pêşveçûna wan şert e pêknayînin, bi vê sexbêriyê xwe mehkûmî pêşveneçûn û semekeftinê dikin. Heger ku gengaz be, bila jevderxistina van salan bikin, jibo mirovatiyê, kurdan, dîrok û pêşeroja Rojhilata Navîn, bê pêwîst e were çi wateyê, ji xwe re weke peywireke bin- geh bibînin. Lewra li derî vê derfetê, di rêya ku diçe jiyana azad de, ne dîrok û serdemê, ne jî rastiyen berbiçav ên rojane jevderbi- xin ku pêşiya xwe ronahî bikin. Niha yek rê ev e û bi keda mezin fêmkirin û pratîkkirinê pêdivî dike.

Heger ez beşeke piçûk ji jiyana Rojhilata Navîn bi xêzikên stûr, ji aliye siyasî û dîplomasî ve binirxînim, terîfa wê yê wiha be:

Derketina ji nava labîrentên ku ji dema sumeran ve hatine raxis- tin a pişti evqas sal bi awayek sexlem û diyarîkirinên jibo azadiya gelan, bi wateyeke rast bi sexbêriyeke pêxemberî û kesayetiyê gen- gaz e. Vê pêvajoyê ne tenê saziya pêxemberiyê bi min da fêmkirin, bi derûna xwê ya rast nîşan da ku bi pratîkeke çawa yê li mirovati- ye jî bête xwedîderketin. Ev tê vê vateyê: Her pêxember di pêşve- çûna civakê de, bilindbûna vateyekê ye. Zimanê wî herçiqas ku xwedayî be jî, derûna wî di derbarê vate, hiş, tore, wijdan, azadî û wekhevî ya civaka pêşvediçe de, rê li ber gihîştina wî ya pêvajoye- ke çandî ya cuda vedike. Gel di vî babetî de di derawayeke gelek zana de ye. Dema ku gotibûne min "Tişta tu dikî, diyaneteke nû ye (behsa sê olen mezin dikin) tê wateya xebateke olê çaremîn", ez mabûm şaş. Vê dawiyê min fêmkir ku çi gotibûn. Herçiqas ku di- bêjin piştî îslamtiyê rêya pêxembertî û olekî nû hatiye girtin jî, ev weke parastineke ku her serdem xwe payîdar şîrove bike ye. Heta ku li Rojhilata Navîn, bandora ol û çandên kevin ên li ser qadên si- yasî, bîrdoziyî, li ser hemû qadên civakî û encamên wan ên ku ro- jên îro dîl girtine, neyê dahûrandin, ne şaristaniya Ewropa tê fêm- kirin, ne jî şerekî der û hundir ê bi wate û serkeftî te dayin. Dîrok daraza (hikim) xwe dide meşandin. Bi laîktiya serveyî ne ol tê da- hûrandin û ne jî civaka nûjen (modem) tê afirandin. Encamên ez- mûnên nûjenbûna neteweperestî ya dused salan, li holê ne. Çiqas ku di vê rêyê de were israrkirin, weke di demeketina Ereb-îsrael de, bê he çiqasî yê rê li ber êş û wêrankeriyan veke jî, tê texmînkirin. Çareserî, dahûrandina xwezaya dîrokê ye û bi derketineke ji wir, afirandina derfetên azadiyê ne.

Di serdema me de, jibo vê hereketê, gotina 'olê çaremîn' bi wa- te nabe. Encex em dikarin bibêjin ku, ev hereket dişibe Ronesansa Ewropa ya sala f500an, lêbelê di bingeha peşveçûneke diyalektîk de kokên şaristaniya xwe û asoya şaristaniya wêdetirî kapîtalîzmê sen- tez dike, herwiha weke ronesansa Rojhilata navîn were terîfkirin, yê watedartir û bersiva hewceyiyên dîrokî be. Heger em bibêjin me ev afirand, yê mezinkirin be. Ya em dixwazin pekbînin eve ku, li gor derûna vê axê ya çandî û bêyî ku bibin dîlê paşverûtiya serdemê, de- rûnên wê yên erênî bipejirînin, ev yê bibe tevkariyeke li hereketa azadiya roja me ya resen. Di vî babetî de bibawerim ku, ev ê di dî- roke de wate bigire, yê bibe bizaveke derketina bihêz û domdar ku ber bi annanca azadiyê, bi

argûreke venemire bimeşe. Hêvî û bawe- riyên min qet qutnebûne ku, çiqas kêmasî û gemara wê hebe jî, nû- nerên wê yên xurt ê vê bizavê paqijtir bikin, bigihînin hêzeke tevge- rê û yê gav bi gav bigihin annancên rastbînî û pêkhatî. Jiberku ev erdnîgarî gihaye hêza giyanî û bîrûbawerî ya ku jê re liqasî nan, av û hewayê pêdivî, yê ji nava astengî û tarîtiyên ku ji hezar salan ve ketiyê, derkeve û di rêya rastir a ronahî re, bi coşeke mezin bigihe annanca xwe. Afirandina jiyaneke bivate ya bi vî rengî, ji hemû tiştî bi nirxtir e û pêdiviye ev nirx bête zanîn. Rêzgirtin û girêdana bi xwediyên lehengî, êş û fedekariyên dîrokî re, li qasî ku em xwe ji rastbîniya bi nalet a hezar salan rizgar bikin û pîrozwer bibin, binirx e. Heger ku wateyeke olê nû bidine vê tevgerê, dive ku di vê xalê de were dîtin. Pîrozkirineke wê heye, ew jî ev derûna ku em dixwazin ronahî bikin e. Ev parêznama min, bê jiyana hemdem a ku ji naletê hatî rizgarkirin û pîrozkirin tê çi wateyê, rave dike.

Derketina min ya ji Şamê ber bi Ewropa ku ez bi hinek mînakên dîrokî re hevber dikim, çewt tê şîrovekirin. Lêbelê heger ku dîrok û rojaneyîtî di derûna pîroziyê de bimeşin, ev dirûvtî jênerev e û rast e. Encex dîrokên ku hatine şewşandin û mandelekirî, dikarin bendê bikişînin pêşya rastiya hevdirûviya (hevşibîn) nirxên pîroz. Heger ev rewş hebe jî, perdekirineke. Ya rast tevgera ristikî ya pî- rozweriya ye.

Ezê behsa Ezîz Paul ê ku baskê xiristiyantiyê ye Ewropa afirandî bikim. Pêşî dijminatiya hewariyan dikir. Di rêya Şamê de tevlîbû- na xwe ya nav hewariyan, weke bûyereke ku dîrok guhertî bilêv di- ke. Ji malbateke Cihû ye, li Tarsûsê ji dayik dibe. Ji Antakya dest pêdike, gelek caran li Anatolya, Grekîstan û îtalya digere. Propa- gandavanekî bawennendiya mezin e. Heger ew nebûna xiristiyantî
bi vî rengî li Ewropa belav nedibû. Li Romayê hate kûştin.

Li ser bîranîna wî, Katedralên Saînt Paul ku li her aliyên Ewro- pa hatine çikandin, ne belaş şemla xwe nîşan didin. Lewra di bin- yata sincê Ewropa û hatina wê ya vê merhaleyê de, xerca mirova- tiyê ya Ezîz Paul heye. Ewropa nîvî nîvî Saint Paul e. Rasthatiniya wî ya li xiyanetên piralî û daxwazên amûrkirina wî ya ji çavkaniyên neyîniyan re, vê rastiyê winda nake. Ya herî balkêş, li qada Grek, digel dostên jidil gelek dostên dirû û sexte jî hene. Ji gelek dostên bêgiram jî gilî dike.

Derketina min a ji Şamê ya di 9 Cotmeh 1998an de, vê bûyera dîrokî

bibîr tîne. Gelek dost hene. Ji partiya desthilatdar gelek vex- wendî hatine kirin. Parlamento bi piraniyeke ku bikaribe zagona bingehîn biguherîne, ez vexwendî kirime. Berî ku ez herim, dost Kostas Baduvas ê ku wezîrtî kirî û hê jî parlamenter, ji wergêrvana min Ayfer Kaya re ne carekê bi tenê gelek caran, bi telefonê ev yek erê kiribû. Dema ez giham wira, ‚dost Baduvas' tine bû. Yê ku ez pêşwazî kirim, serokê îstîxbaratê Stavrakîs û Kalenderîs ê ku navê xwe Egîd danî, ango yê kû rola Yehûda îskaryot (hewariyê îsa îx- bar kirî) ê hemdem dileyîst bûn. Helwesta wan ji ya helenên beriya 3000 salan ne cuda ye. Helwesteke helenan ku ji wan deman ve ne hatiye guhertin ev e ku, kesên li derî xwe û yên ne li gor berjewen- diyên xwe bi barbar binavdikin, yên li derî cîhana xwe ya hêsan bi- yanî dibînin û ev yek hesteke bi binyat e. Lêbelê ev nêzîkayî teva- ya rastiyê îfade nake. Aliyê wê yê dilînî û mirûzî rave dike. Rasti- yên siyasî û dîplomatîk cudatir in.

Dîtina vê rastiyê baş e: Tevgera azadiya Kurd, di serokatiya PKKê de weke Bolşevîzma hemdem tê dîtin. Jixwe nêrîn û dexme- kirina "Stalînperestê hişk", vê nêrînê nîşan dide. Her çiqas ku tay- betiyên wan ên cuda hebin jî, nêzîkayî dişibin hev. Siyaseta fennî û sazûmana dewletan, naxwazin ku PKK û bi tevayî tevgera azadi- ya Kurd, bikeve zagonîtiyê (legalîteyê)

Gelek dewletan jî kişandiye derzagonîtiyê (îllegalîte). Bi taybetî di vê de Ahnanya serkêşiyê dike. DYA hê hişktir e. Dewletên Roj- hilata Navîn jî di nava heman nêzîkayiyan de ne. Bi mîsogerî der-

zagonîtî hesêb dikin. Yên dost encex kesanî û derî fennî nêzîk dibin. Sûriye ya ku weke dost û piştgîr tê berdan, ti caran xêzka tun- draw a neteweperestiya Ereb derbasnekiriye. Weke kesekî jiberku helwesta serokdewlet Hafiz Esad girîng e, em dikarin bi du hevo- kan binirxînin. Hafiz Esad ji ber desthilatiya xwe ya mezin û mer- cên ku di nava wan re derbas dibe, li gor min di navbera dewleta klasîk a despotîk û dewleta şoreşger a demokratîk de, li ser xêzkekê bû. Lingekî dewleta bi wateya xwedayî kişandibû nava gel. Bere- vajî ku tê zanîn, bi awayek hêsan beşek ji dewleta pîroz û desthilat- dar kiribû suxreya gel. Lêbelê ev jî rastiyeke ku têgihîna dewleta rahîb a Sumer diparast. Nasnameyeke Rojhilata Navîn a ku nîvî tarî û nîvî ronahî bû. Ne dijminê tevgera azadiya Kurd bû. Lêbelê bîr- doziya kevneşopî, têgihîna dewletê, neteweperestî û hêzên dîplo- matîk ên hemdem, dostîtiya wî asteng dikirin. Egîdiya wî ya herî mezin ew bû ku, li ser daxwaza kesan dijminatî nedikir. Lêbelê di rojên dawî ku emê derketiba de, nîşan dabû ku nikare serokê Mis- rê Mubarek ê neviyê Firewn û burokrasiya dora xwe derbas bike. Ne di wê derawayê de bû ku zora zêde li neteweperestiyê bike.

Ji aliyê min ve ya were rexnekirin ne Sûriye ye, derawaya min e. Di sala 1990an heta 1980an de, ez ji qada ereban derketibama di- be ku pêşdeçûna dîrokê cuda bûna. Niştecîhbûna min li Zagrosan vebijarka herî cidî bû. Lêbelê nêzîkayiyên îran û kurdên hevkar yê çi deranda holê, nedihat zanîn. Ya duyemîn, hevalên ku ev rol bilîs- tana birihetî hebûn. Hêviyên ku ew vî mafî bikarbînin serdest bû. Lêbelê wisa hêsan derketin û wisa qambost bûn ku dikarîbûn xwe di çemê bostekê de bixeniqînin. Fersend û suxreya dîrokî ku min da wan qet fêm nekirin. Li ser derfetan weke destberdayiyan û mîratx- weran lîstin. Xwe jî û keda min a ku nirxekî mezin îfade dikir bi arama min re bêxem bikaranîn û pûç kirin. Mijara ku herî were rex- nekirin û bikişîne xwerexnekirinê ev e. Lêbelê bi neçûna wira ya di 9 Cotmeh 1998an de, hê jî ez di baweriya rastiya wê de me. Lewra wê hingê şer yê kesanî bûbana û yê veguherîbana tolgiriyê. Dibêti- ya fersenda aştî û biratiyekê yê bi temamî bihata windakirin. Di gel ku derketina çiyê xewneke min a çil salan bû jî, sedema ku ji ber xemgînbûna xwe nebehicîm, heger ku li qasî serê derziyê jî derfe- teke aştîxwaziya jibo jiyan û azadiya mirovan hebe, ji

ber sedema ku çetirgirtin û ezmûnkirina vê yekê yê bêhtir binirx bûna. Di ta- bûtgeha xwe ya heyî de jî sedema bi mirûzbûna min, jiyîna min a jibo aştiyeke bi rûmet ku ji şerekî esîlkirinê ne hindiktir binirx e.

Fêmkirina derûna vê helwesta hikûmeta Shnîtîs, bêhtir girîng e. Dibêtiye ku bi pesenda DYA, Îngilîztan û heta bi ya Ahnanya jî be. Dîsa xwedîlêdemeketina Beduvas a li vexwendina xwe gelekî sos- ret e. Dikarîbû mîsoger nehatina min bixwaze. Kesekî ku wezîr be û evqasî hêsan bimîne, ji têgihîştinê gelekî dûr e. Dibêtiyeke girîng ev e ku bi hişmendî qutkirina lingê min ji Rojhilata Navîn e. Di vê yekê de dibe ku îstîxbarata Îngilîztan rola bingehîn lîstibe. Ne derî dibêtiyê ye ku hêzên tevlîhev di dewrê de bin. Bûyerên vê dawiyê yê vê rastiyê nîşan bidin: Dibêtiya herî xurt ev bû ku, piştî ez kişan- dime Ewropa yê kesayetî û rûmeta min binpê bikirana, êdî di destê xwe de weke amûreke kedîbûyî, di serî de li hember Tirkiyeyê û di hevkêşeya Rojhilata Navîn de bikarbianiyana. Dema ku min pêqev- za xwe avêt Grekîstan, min wê hingê fêmkir ku rêzikên hiqûq, ma- fê mirovan û civaka demokratîk jibo min tine ne, berjewendiyên hişk ên siyasî û aborî bingeh tên girtin. Nîşandana min a helwesta li Grekîstan destpêkirî ku ji tirsa Tirkiyê be an jî bi lihevkirinekê pêkhatibe, yê ne rastbînî be. Berevajî vê, di asta herî bilind de we- ke sîstema Rojava, ez di vê baweriyê de me ku di serî de serok Clînton, helwesta Tirkiyê hê berî û deqîqe bi deqîqe vekolabûn. Pê- wîst e vê yekê nîşan bidim, gelekî hişmendbûn ku hebûna PKK û Ocalan, jibo berjewendiyên xwe, bi şêweyeke herî îdeal bi serê Tir- kiyeyê de biteqînin û bikarbînin. Stratejî û taktîka wan ev bû: Him PKKê û kurdan û him jî Tirkiyeyê û tirkan bikarbînin, ji ber di na- va şerekî kor ku pêncîh salî bidomîne de bigirin, ji min sûdmend bi- bin. Herin heta bi dankuştineke bi destê Tirkiyeyê, bi hindikayî bi destê beşên şoven, paşverû yên ku bi wan ve girêdayî vê yekê pêk- bînin. Herwiha Tirkiyeyê bêhtir bi xwe ve girêbidin, kurdan jî bê- rûmet û bi awayek penabertî hewceyî xwe bihêlin. Serenca çar hey- vên li Ewropa, vê meyldariyê rast derdixe.

Ez meyldariya xwe ya dostîtiyê nîşan didim. Heger ku zarokeke pênc salî be jî, ez weke dost guman bikim pêbaweriya min a heta bi dawiyê, taybetmendiyeke rewişta min e. Di jiyanê de belkî jî ali- yê min yê herî lawaz (ez ji vê bawer nakim, baweriyeke min a va- la heye ku pêwîst e

şertê ewlekariya rêhevaltî û dostaniyê qet neyê binpêkirin) dilîniya min a ewlekarî ya bi vî rengî ye. Li ser navê dostîtî û rêhevaltiyê, min ev aliyê xwe bi awayek erjeng bikarani- ye. Lêbelê jiberku nirxê mirovatiyê yê herî bingehîn e, ez bi bawe- rim ku pêwîst e ez dev jê bemedim. Li gor min lîstika bi dostanî û rehevaltiyê, weke ku diya xwe û jina xwe bifiroşin e. Herwiha ji- berku dostîtî û rêhevaltiyê di kesayetiya sedsal 20an de, derbeya herî mezin xwariye, qurbanê wê yê dawî û yê herî trajîk ez bûm. Di vî babetî de pêdiviye ez ji gewixandina bi sedsala 20an re behs bi- kim. Pêşî li Grekîstan û dû re li Rûsya, bê çi bi serê dostîtiyê hati- ye nîşan bidim yê herî hînker be.

Siftbûna min ya piştî du çûyinan, heger bisînor be jî derfet da min ku ez rewişta Grek jevderêxim. Ya ez behs dikim rewişta Grek ên serdest e. Biteqezî hinek taybetmendiyên tîpîk û resen ên gelê wê ku ji serdesten cudatir hene. Ev rastiyek e ku ji xweda Diony- sos ve reseniyeke gelê Grek heye. Bicoş û bidostanî ye. Lêbelê we- ke ku li hemû welatên cîhanê tê dîtin, ev rewişt têkçûye û encex girî ji destê wî were. Gelên cîhanê hemû nikarin li dostîtiyên xwe xwedî derkevin. Lêbelê di pey de têr digirîn. Dema ku xwe bi xwe re jî di- bin dost û rêheval, vê yekê dikin. Cudahiyên wan, windakirin û ye- kîtiyên wan, di nava girî û evîna erzan de xerq dibe. Rêzgirtinê bi- kin jî, ti nirxê vê yê zêde tine. Rêzgirtin û hezkirineke ku dostîtî û rêhevaltiyê neparêze, ku dayîka min be jî min timî bi çavekî piçûk lê nêriya ye. Min hezkirin û têgihîneke hember nîşan neda ye. We- ke ku qeder dibêje min “ne hêja ye tu li ser dost û rêhevalên ku tu nirx bi wan dide bigirî”. Tişta ez li dij derdikevim ne dostîtî û rêhe- valti ye. Berevajî vê, yên ku nirxê serfiraziyê nadinê û sexte û re- benên ku nizanin bibin dost û rêheval in.

Dema ku li dîroka çîna serdest a Grek tê nêrîn, ji sala BZ föOOan dema mîkenan ve, li gor şêweya ramana wan a ku teşeyeke mîtolo- jîk qezenc kiriye, xweda Zeus dikare her cure pûştîtî û bêbextiyê bi- ke. Her jina ku derkeve pêşberî wî, dikare ji rê derxe. Ji her aliyê xwe, ji eniya xwe û ji paşya xwe weke Athena, dikare gelek xwe- dayên piçûk biwelidîne. Derew û xapandin taybehnendiyên wî yên xwedayî ne. Bê çawa lehengê Troya Hektor xapandiye, ji aliyê Ho- merosê jê bawer dike ve, bi heyfpêanînê tê nivîsandin. Bes bila li gor berjewendiyên Helenîstan be. Weke xwedayê îsrael Yehova ye. Jiberku Helen û

Lawênîsrael qewmên bijarte ne, li dij miroven din ango barbaran çi bikin, mafê wan e û xwedayên wan wiha fennan dike. Ev rastbîniya mîtolojîk, vê dawîyê yê veguhere rastiya siyasî û olî. Pêdiviye nebêjin mîtolojî û lê biborin. Heta bi roja îro tişta di bingeha ol û siyasetê de, rastbîniyên mîtolojîk in.

Ev taybetiyên mîtolojîk, nîşan dide ku çawa çîna serdest a Grek derketiye holê. Çavkaniya wê ya sereke jî mîtolojiya Sumer e. Tê za- nîn ku di ser Anatolya, Fenîke û Misrê re him mîtolojîk û him jî we- ke civaka daringî, xweyî bûne. Ev rewişta çînî û neteweyî ku ji wê demê ve nehatiye guhertin, bi hemû aliyên xwe ve yê dergeta pêşberî min. Bîrûbawerî û rewişteke fêlbaz, xapînok, jibo berjewendiyên xwe ti nirxî bi mirov nade û yên li derî xwe barbar hesêb dike ye. Mi- rovatî, rastbîniya gel û dîroka ku min temsîl dikir, li rastbîniya dîrok, siyasî û çandî ya cuda ku di derûnê de qet pê re lihevneke, rast hati- bû. Ev bi wateyekê, hember hatineke Rojava û Rojhilat a piçûk ku ji dema Med û Persan ve berdewam dikir bû. Deriyê rojava, bi hêsanî rê nedida derketina Rojhilat a ku di kesayetiya min de dihat temsîl- kirin. Hisabên din ên Atîna hebûn. Nêzîkayiyên wê hemû, li hember xeteriya Tirkiyeyê ku ji her kesî û bi her şêweyî sûdmend bibe. Ça- vên wan ne dibirî ku di kesayetiya min de -jixwe bi şêweyek dostîtî- yê karibin sûdmend bibin. Weke polîtîkaya Ingilîz dixwestin ku bi şêweya “Şkandina se ya bi sê”pêkwere û jê sûd bigirin. Dihat fêmki- rin ku dostaniya wan xapandin bû.

Derketina min a ku ji pêşî de nehatibû plankirin, ji ber mecbûr- bûna ku derketî holê, di serê pêşdatiriyên ku werin ezmûnkirin de hate dîtin. Demeke bi qeyrana pêvajoya bêesilbûnê, ya piştî sosya- lîzma reel dihat jiyandin. Serokwezîr Prîmakov û Serok Jeltsîn, xa- yînên girîng ên sosyalîzma reel bûn. Ji ber girêdana berjewendiyên wan ên bi îstîxbarata qirêj û aborî re, rewşa min her çiqas ku stra- tejîk be jî, wê demê guncanî (rnusaîd) firotinê bû. Di nêrîna yên ku sîstema Sovyet a mezin firotin de, hêvîkirina giramgiriyeke ji nir- xên azadiyê re xwe xapandin bû. Têkiliyen ku bi FDN (Fona Dira- van a Navneteweyî), DYA, îsrael û Tirkiyeyê re hatin meşandin, mîsoger dikir ku yê li hember min, helwesteke li derî hiqûqê nîşan bidin. Heçku Duma jibo penaberiya min, digel yek denga bi neyînî bi 298 dengan erêniya xwe nîşan da. Lêbelê ji

aliyê dewleta despo- tîk ve, ti wateya vê tinebû. Dixwestin ku bizorê min di ser Tirkiye- yê re bişînin Qibrisê. Bi dibêtiyeke mezin, bi rewşeke hevkarî dix- westin ku hê wê hingê teslhnkirina min pêkbînin.

Ev ne çêtirgirtineke min e ku min bibawerî kiribe. Lêbelê rejî- meke wiha bêesil a di ser îdealên azadî û wekheviya ku di rêya wê de gelek xwîn hatiye rijandin û êş hatiye kişandin de rûniştî, Jirê- derketina kûr a sosyalîzma reel jî nîşan dida. Ev rewş dide çespan- din ku, ew hê jî ji kevneşopiya mêtinkerî û pêkutiyê ne qetiya ne. Vê bi bîra min dianî ku ji sosyalîzma perestgehên rahîbên Sumer jî paşvetirin. Şoreşgeriya Rûsya nîşan dida ku, asoya kapîtalîzm û fe- odalîzmê derbasnekiriye, kapîtalîzma dewletê sosyalîzmê demaxe holê û herwiha li hember kapîtalîzma lîberal a hemdem xwe nagi- re. Dîtina min a vê yekê, rê li ber min vekir ku ez rûyekî din ê sed- sala 20an nas bikim. Sedsala 20an gelekî dişibe sedsala xiyanetan. Sedsala şoreşan û ya azadiyan hê ne hatî dawî, weke sedsaleke ku ji binyata xwe bi ti nirxên mirovatiyê ve negirêdayî û berjewendpe- restiya daringî ya her hêman dîl girtî, hatibû û xwe spartibû 2000an. Ewqasî bixwîn derbasbûna wê, ne çespîna bilindaya wê ya barbari- ya wê bû. Ya ku li gelemper serdestî dikir, neteweperestiya hoveber û daringperestiya bêteşe bû. Li hember taybetiyên mirovatiyê yên di pêvajoya dîrokê de bilindker, bi naveroka mafê mirovan û de- mokratîk, şoreşeke hember dabaşa xeberdanê bû.

Em bi encameke ku terîfa şoreş û şoreşa hember ji nû ve bide ki- rin re rûbirû hatibûn. Dîmenê li hember min, ferz li min dikir ku ez hê rastir nêzîkî rastbîniya mirov bibim. Hevberkirina min a hêma- nan û şêweya jiyanê ku xerqî rojê bûyî, ronahî kir. Wêrekî û hişmen- diya min zêde dikir ku ez li hinek qalibên dawerî ne aliqim, êdî pê- wîst e ez maskeyên xweda û mirovan (heman rastiyê îfade dikin) parçe bikim. Pêwîst bû pûtên sedsala 20an werin şikandin. Pêwîst e heyîn û mafên takekes berî heyîn û mafên civakê werin, an jî bi hin- dikayî xala opthnal a di navbera wan de bingeh were girtin. Takeke- sîtî û mafên wê ku bi dest însafa kapîtalîzmê ve hatin berdan, şaşi- yeke xetemak bû. Her civakparêziya ku heyîna takekes û pêşveçû- na wî ya azad bingeh negire, şêweya rahîben Sumer e û mecbûr e ku çînên serdest ên mêtinker derêxe holê. Dirûşma “Her tişt jibo civa- kê”, dirûşmeke herî kevin a civaka biçîn e. “Her tişt jibo takekes” jî, heger weke nakok jî xuya be, dirûşma civaka

biçin a herî pêşketî ya kapîtelîzmê ye. Bêyî ku li hember dirûşmên herdû hêmanan têk bi- çin, rêya bingeh ev bû ku, xwe bispêrin îdeala mirovatî, azadî û wekheviyê. Heger ku sosyalîzma zanistî yê bibe çêbûnek, pêwîst bû ku xwe ji dogmatîzm û ji sosyalîzma perestgehê rizgar bike. Her têkoşîna di ber dewletê de, berevajî sosyalîzmê bû. Lêgerîneke ji dêv- la vê ve derûna sosyalîzmê bû. Ya hetî dîtin ku dîktatoriya prolete- rya be jî, ji amûreke koletiyê ya nû pêde ti encamên din nedidan. Te- orî û pratîkeke siyasî ku jibo derbaskirina sazûmana zorê be, yê bi derfetên ku teknîk û zanistiyê, bi azadiyeke ku ji serî de takekes bin- geh bigire, bi bîrdoziyeke wekhev ku civakê bi kedeke pevrayî bi- lind dike, bikaribe barbariya çîna serdest derbasbike û bigihîna îfa- deya rastbînî ya utopya civakî ku te bêrîkirin.

Çûyina Moskowa ku bi vî alî siftbûna min ya bîrdoziyî lezgîn kir, bersiva min a bingehe ku ezê bidim bîranîna wanên ku bawerî bi utopya sosyalîzmê anîbûn û di vî warî de keda mezin dabûn. Moskowa sedsala 20an wisa hêsan bûbû ku, ne di wê hêzê de bû heger bi neyînî be jî, xeyalekê zindî bike. Rawestîna li ser rastiya Rûs bi hindikayî li qasî ye Grek pêdiviyeke diyar bû. Vê yekê xwe datanî holê ku, jibo gihîştina hinek rastiyan, li vir jî hilweşandina pûtan, pêdivî bû.

Çûyina Roma ya 12 Mijdar 1998an, jiberku di nava Ewropa de paytexta bi tenê ya me karîbû em herin bû. Bi desteka Parlamenter Ramon Montavîanî yê partiya Komunîst ku di nava koma 'Ji nû ve veavabûn' de cîh digirt, em gihabûn wira. Li rastî çend heyv dema hikûmeta Masshno D'Alema hatibû. Nezîkayiyên wan bi xwarû- pêçkî bûn. Ne siyasî û ne jî hiqûqî nêzîkayiyeke zelal nîşan nedan. Navtêdanên derdorên senniyan ên îtalya yên mezin, desteknekirina welatên Ewropa, bitaybetî di bin helwesta xweferzkirina Ahnanya de, helwesteke bi inisiyatîf nîşan nedidan. Helwesteke ji ser serê xwe avêtin pêşdiket. Bi komên polêsên ku herî baş perwerdebûyin, pêkutiyeke hişk a psîkolojîk pekanîn. Qet fersend nedan ku ez ji odeya xwe derkevim. Heger di mayinê û revandinê de israr bihata kirin, razîbûna venêraneke gelekî tûnd ferzdikirin. Jibo yekî ku berpirsiyariyên wî yên giran hebûn, diyar bû ku di fersenda pêşî de derketin pêdivî bû. Tenê mabû ku bizorê bikine der. Jibo cîhekî ge- lek dewletên ku dirav didan wan, mebesta wan a rast diyar dikir. Helwesta Hiqûqê demokratîk nedihat pêşandan.

Mebesta min ew bû ku ez pirsgirêka Kurd, bikişînim platfonne- ke demokratîk. Heke ku bûbana destek, hatina Tirkiyeyê ya ber bi vê helwestê yê ne zor bûna. Hatibû fêmkirin ku Ewropa ne alîgirê çareseriyeke pirsgirêka Kurd a cidî bû. Lebikandina Tirkiyê ya bi pirsgirêkê ji wan re gelekî çêtir bû. Ji helwesta Grekîstan jî ev di- hat fêmkirin. Siyaseta li Ewropa dikarîbû dawiyê li şer bîne. Ev yek jî di serî de DYA, ne li gora stratêjiya Rojava bû. Helwesta Alman- ya rojekê berî rojekê vekirina rêya çiyê bû. Diyar bû ku li gor de- ma dirêj dihizirin. Aloziyeke li Rojhilata Navîn a bi kurdan ve gi- rêdayî, çêtir li gor karê wan bû. Herwiha derketina min a ji nişkê ve, rewşeke li derî taktîkên wan bû. Hemû amadekariyên wan li gor kesayetiên Kurd ên hevkar û kedîkirî bûn. Hebûna PKK û bitaybetî ya min, keysa Kurd a deh salan bû ku dimeşandin û gelek dirav li ser razandibûn, di destê wan de bêerk hiştibû. An yê şewşandibana û kiribana derawayeke bêkesayetî, an jî yê veder kiribana. Di vê de meyla DYA jî dihat hisabkirin. Min zor bikira dikarîbûm bisekinim. Zor bû min ji navenda ku hiqûqê Roma li derketî holê bavêjin. Lê- belê xeteriyen siyasî giran bûn. Dewleteke evqasî zorê dike, dika- rîbû tiştên bêhtir giran pêkbîne. Ez mecbûr mabûm ku di fersenda

pêşî de derkevim.

Çar heyvên ku min li sê paytextên Ewropa yên dîrokî derbaski- rin, hinek rastiyen girîng derandibûn holê. Hiqûq û demokrasî, ne di wê mebestê de bû ku mafê tevgera azadiya Kurd bide. Polîtîka- yeke Ewropa ya Kurd a mirovatî tinebû. Tenê di dema xwestekên xwe yên ji Tirkiyeyê de, weke amûrekê dihat bikaranîn. Eslê wê polîtîkayên dused salên dawî didan meşandin. Ew li Rojhilata Na- vîn, jibo li gor polîtîkayên xwe zorê li reveberên Tirkiyeyê, Iran, Iraq û Sûriyeyê bikin, kurdan weke amûrekê bikartînin. Di bin hel- westa wan ku jibo çareseriyekê nîşan nedin de, ev sedem hebûn. Ji- bo wan hebûneke Kurd ku demeke dirêj pirsgirêkan çêbike pêdivî bû. Lêbelê çareseriyê kereseya ku bikarbînin ji wan re nedihişt.

Ev sexbêrî jibo hevkarên Kurd ên li Bakurê Iraqê jî derbasdar bû. Tirkiyeyeke bi pirsgirêk ê hewceyî wan bûna. Herwiha mayîna PKK a weke pirsgirêkê, jibo berjewendiyên polîtîk ji hemûyan re pêdivî bû. Ne çareseriya bi min re, li hinekan dihizirin ku di dema dirêj de li gor xwesteka wan bilivin û ji polîtîkaya wan a domdirêj re, suxreyê bikin. Ez li dij perspektîfên wan polîtîk ên dused salan bûm. Înisiyatîfa rewişta azad û biryara serbixwe, ne rewşeke ku pe- jirandibana. Pejirandina vê yekê, yê bûbana windakirina gelek hev- karên Kurd ên ku bi deh salan bû xweyî dikirin. îtalya dixwest ku bêhtir derfetên bazirganî û veberhênaniyê ji Tirkiyeyê bistîne. Ji ber vê yekê helwesta herî tundraw nîşan dida. Lêbelê rewşa min, weke ku di pratîkê de tê dîtin, ev hesab jî xira dikir. Berjewendiyên wan ne li gor ku kesayetiya min ragirin bû. Yê tê femkirin, hiqûqê Ew- ropa û demokrasiya wê, li sînorê pirsgirêka Kurd radiwestiyê. En- cex ji hêza karê wan bi erzanî sûd bigirin û di polîtîkayên Rojhila- ta Navîn ên domdirêj de weke amûrekê bikarbînin, nêzîkayiyeke Kurd a bi vî rengî derbasdar bû. Heger bi vî alî be jî, polîtîka dîsa ji şêwegirtineke bitemamî dûr bû. Aliyê ku giranî nîşan dida, weke di gelek pirsgirêkên gelemper de -di serî de Balkanan- di pirsgirê- ka Kurd de jî, polîtîkayeke Ewropa ya ku şêwegirtî nebû. Her dew- let encex bi polês û îstîxbaratê nêzîk bibin û hewl bidin ku bi pê- wana saziyên civaka şarwer têkevin nav.

Dema ez li Roma û bigumana min li Moskovayê, hêzeke ku herî bi min dilebikî MOSSAD bû. Weke ku bibeje “xwediyê pirsgirêka Kurd ê

herî bingeh ez im”, derdikete holê ku hêza hemû tevna xwe ya îstîxbarat û venêranê pêşve dibir bû.

DYA, îsrael û Ingilîztan weke baskekî cuda radiwestiyan. Ew- ropa hê belawela bû. Jixwe di pirsgirêkên bi vî rengî yên girîng de, ji polîtîkayeke hevpar bêpar bû. Ingilîztan dused sal in ku pê- şewatiyê dike. Dibêtiya polîtîkaya Kurd, bê Inglîztan nayê hizi- randin. Bi çêbûna îsrael re, venêran bi destê MOSSAD dihat me- şandin. Bi Barzanî û Talabanî re, gelek Kurd bi sîstemê ve girê- dabûn. Tenê rewşa PKK sazûmana ku afirandibûn xira dikir û gef li teraza wan a afirandî dikir. Ji ber vê yekê ez berpirsiyar didîtim û xistibûm nava polîtîkayeke pêşan û cihêkirinê ya hişk. Peyma- nên wan bi Tirkiyeyê re yên sala 1996an, rê li ber rolên wan ên operasyonî vekiribû. Hesêbnekirina vê ya bi awayek ne baş, kê- masiyek bû. Dema ez li Roma ku me cidî nedigirt, ji ber hisabki- rina hêza îsrael a ne bi têrayî bû. Êdî yê vê dawiyê were fêmkirin ku, di derbarê min de ya ku Moskova jî kirî destê xwe, îsrael bû. Di teqîbkirin û hiştina min a bêxebat de, para îsrael diyarker bû. Ji xwe ev yek bi desteka Amerîka ya dîplomatîk û darayî didan meşandin. Jibo ku ez li Moskova nemînim, krêdiya IMF (FDN) a 8 mîlyar dolar hatibû bikaranîn. Dîsa bi vê annancê pêşnûmaya Herikîn a Şîn hatibû standin. Ya herî rezîl ev bû ku beyî tiştekî bi- din, rewşa min a asteng bikartanîn û ji hev gelek tawîz werdigir- tin. Sîstema rantperest a li Tirkiye ye bi navê “prîmên Apo”, di qada navneteweyî de jî, hê berfirehtir sepîn didît. Tevaya Ewropa, Rûsya, DYA û dawî jî burokratên Kenyayê yê riba (faîz) yên xwe bistanda. Di kesayetiya min de, bazarkirina daxwaza azadiya ge- lekî ya jibo berjewendiyên daringî, pir rezîlane bûn.

Li îtalya şerê psîkolojîk encam dida. Di fersendeke piçûk de, min amadekariya derketinê dikir. Hêsaniya nûnerê Moskova Nu- man Uçar a gundîtî, bû alîkarê kûrbûn û berdewamkirina komp- loyê. Rewşa nûnerê îtalya Ehmed a pasîf û bêberpirsiyar, ji têgi- hîştina bûyeran dûr bû. Hemû jî di cîhana xwe ya hêsan de qedi- yayî bû. Bi derketina ji îtalya him ez û him jî D’Alema rihet bû- bûn. D’Alema ezmûneke ne baş a mafê mirovan û demokrasiyê dabû. Li hember senniyana îtalya bizdok bû. Heger bûbana den- gê hiqûq û demokrasiyê yê berze, tevkariya wî ya li dîroka azadi- yê yê jibîr nebûbana.

Dema ez dîsa giham Moskovayê, bi dibêtiyeke mezin perdeya lîstikê ya dawî hatibû amadekirin û dihat leyîzandin. Derketina min a ji îtalya, bi hêzên tarî yên ji herdu aliyan û bi nûnerên PKK ên ne bi têrayî ku di nava nêzîkayiyên dilsafîtiyê (saxikî) de, pêkhatibû. Pêvajoya çarsingê yan jî ya amadekirina tabûtê bû. Yên Moskova- yê bizmarên pêşî, bi awayek hişk lêdidan. Cara yekem min di rû- yên wan re, dîmenên ku cîh nedidan dostaniyê didîtin. Diyar bû ku biryar ji jor bû û mîsoger bû. Di aqûbeta ku dizanîn de, tişta diket ser milên wan pêktanîn. Bi lîstik û zordarî, ez li firokeke bar (kar- go) siwar kirim, li xaniyekî mîna yê gundan ku min vê dawiyê bi- hîst li paytexta Tacikîstan Bîşkek bû, piştî girtina heftiyekê bi he- man statuyê, bi generalekî malnişîn (teqawîd) bûyî Nagzakîs û bi temsîlkera Atîna Ayfer re, di rêya Petrograd re bi firokeke taybet em ber bi Atîna bihewa ketin.Girêdana firokê ya bi dewletê re di- yar bû. Pêşî xwestin ku li Romanya daynin, Nagzakîs angaşt dikir ku, bi Shnîtîs re biryar jibo teslhnkirina li vir standine. Dibe ku rast be. Dema ku me nepejirand, ji mecbûrî em li Atîna daketin. Heman zebaniyên dojehê Stavrakîs û Kalenderîs bendewar bûn. Lêbelê ev yê roja didoyan be. Roja pêşî ku em hatin di dalana (salon) VlPê re em derbasbûbûn û rojekê li mala xesûya Nagzakîs a ji gel û dost man. Min wiha jê pirs kiribû, “Pangalos dikare xiyanetê bike?” Bi mîsogerî gotibû, “Na, jibo hilbijartinê fersendeke ji vê baştir tine”.

Wezîrê Karê Derve Pangalos, fêlbaziyeke vekirî kir. Tîmeke îs- tîxbaratê ya di asta bilind de, şiyandibû mala ku jibo hevdîtina fennî bangî min kiribû. Bi peyvên tije gef û ne bidostanî gotibûn, “Heta çarê sibehê ji te re mohlet. Berevajî vê, tişta em dizanin emê bizorê bikin.” Ev nêzîkayiyeke bi dijminatî bû. Rûçikê xwe yê eseh nîşan didan. Diyar bû ku ji berê de lihev kiribûn. Tişta mayî ev bû ku, ewlekariya min a dostîtî ya hê berdewam dikir bi- karbînin û bikişînine dera ku dixwazin. Kenya hê ji berê de bi CIA re amadekarî kiribû. Minê ev vê dawiyê fêm bikira. Kalen- derîsê ku ez pir pê ewle, li ser şerefa dewleta Grek sond xwar û got ku, li Kenya ya ku Grek lê bibandor di nava 15 rojan de, bi pasaporta Afrîka Başûr a ku Wezîrê Karê Derve amade kirî, her tişt çareser bûye. Jiberku ewlekariya bi dostan bingeh bû, nepeji- randin çênedibû. Li cem min hişyarkereke cidî tinebû. Wergêrvan Melsa ya ku min bi temamî ew fêm nedikir, gelekî tevizandî dili- viya. Dikarîbû ku

sextekariya wan jihev biderxistanda. Dest li ser Ayfer danîbûn. Eslê wê ez hatibûm cihêkirin.

Di vê pêvajoyê de ez bûme şahidê çend hereketan ku dixwestin xiyanetê bi rêyên neyekser vebêjin. Ajovan lêxistineke bi jideha li firoka ku ezê lê siwar bûbame kir. Ez di vê baweriyê deme ku ew hereketeke bi hişmendî bû. Firok ranebû. Lêbelê dû re li gor texmî- na min, di ser Swîsre re, firokeke taybet bi tîmeke ne Grekî re, li balefirgeheke veşartî li benda min bû. Dibêtiya firoka CIA an jî ya îstîxbarata Îngilîztan gelekî zêde bû. Berî ku em siwar bibin, ajova- nê texsiyê belkî deh caran çû û hat, navîbû ku bigihe cem firokeyê. Min ji ve helwestê jî encamek nederand. Min wisa bawerî anîbû ku di pirtûka dostaniyê de, cîhê xiyanetên wiha tine ne. Heger hinekan bigota “te direvînin”, minê erza wan bişkanda. Lewra di pirtûka mi- rovatiyê de, cîhê vê yekê tine bû.

Vê dawiyê hat têgihîştin ku hemû tişt bi plansazî bû. Balyozê Kenya birihetî ez ji balefirgehê girtim. Peyva wî ya pêşî bivate bû. Xwest bi min bide hiskirin ku şerefa alman û îngilîzan hinekî heye, lê şeref û rûmeta grekan tine ye. Derfet tinebû ku ji van peyvên wî wateyek bête deranîn. Mebesta wî hebî ku bi zorê bihêle civîna NY. Min ji vê jî tiştek fêm nekir. Vê dawiyê dev ji xwarina bi min re jî qeriya. Hewl dida ku qet rûnenê. Diyar bû ku rojên dawî derbas di- kirin. Bi şîretên ku ji Atîna dihatin, dihat xwestin ku min ji balyoz- xanê bavêjin. Çar gorîl hatibûn jiyandin. Dema me nîşan da ku emê li ber xwe bidin, dev ji me berdan. Wezareta Karê Derve, ya Giştî, ya Dadê û ya Îstîxbaratê, heta sibehî di asta wezîran de, bi telefo- nan dixwestin ku ez werim avêtin. Kostulas diçe civîna serokê îs- tîxbarata Kenya yê ku lawê Wezîrê Karê Derve ye. Êdî ji me re di- bêje ku, hemû tişt tê zanîn, heta bi wêneyên me jî hatine kişandin. Dema ku dane me heta 15ê Sibatê ye. Heger ku em demekevin ê bi zorê bi me re bikin. Heger em 15ê Sibatê demekevin, kûştin jî di nav de yê her tiştî bikin. Herwiha derketina wê rojê jênerev bûbû. Mayîna me cerd, berxwedan û kûştina bi nîşandayina şerekî çek- darî kûştin bû.

Xiyaneta mezin a Kalenderîs dawî ku kirî ev bû: “Ez bi Sîmîtîs re axivhn, ewlekarî da min ku di ser Misrê re emê bikaribin herin Holanda”. Ji pejirandina vê yekê pê de, ti vebijarkên din tine bûn. Hê berê jî di ser Mînskz paytexta Rûsya Spî re, çûyîna Holanda ha- tibû

ramandin. Eslê wê ew jî lîstik bû. Bi dibêtiyeke mezin bi der- ketina ji Şamê re, hemû tişt di bin kontrola CIA, Ingilîztan û îstîx- barata Grek de, di bin plansaziyeke ku hê jî esehiya wê nayê zanîn de, dihat rêvebirin. Ji vê yekê gumana min tine ku weke provekas- yoneke di dîrokê de herî mezin, hatiye amadekirin. Lêbelê ne gen- gaz e ku di derbarê esehiya rastî de, ez bibêjim her tiştî dizanim. Vê yekê encex ew bi xwe dizanin. Tişta em bikaribin bikin ev e ku, bû- yerên derkevin holê, em rast şîrove bikin. Polêsên Kenya anîbûn heta bi nava balyozxanê. Bi awayek diyar didan hiskirin ku em ne- çin, yê cerdê pêkbînin. Rayedar bi çend hevokan ev digot: “Em naxwazin li welatêxwe xwînê birjînin.” Di vê navê de, dibe ku der- manê tevizandinê û dennandanên din bikaranîbin. Xebatkarên aş- xanê bi teqezî bi balyozxanê ve girêdayî bûn. Rewşa min mîna ya şevekoran bû. Herwiha jibo ku ez bi sexlemî neramim û min ber- dest bikin, dibêtiyeke mezin e ku dennanekî bi dozaja bilind bika- ranîbin. Sedema ku min rewşên biguman ên diyar jî ji hev nedikir- in der, dibe ku bandora dennandana tevizadinê be.

Li dora firoka ku ez lê siwar bûm, zilamên bejin bilind, çavşîn, kerenzer û gewr bi çekên otomatîk tedbîr girtibûn. Dibêtiyeke mezin e ku ev elemanên CIA û MOSSAD bûn. Ya ku li balyozxa- nê wêne kişandî jî, bi dibetiyeke mezin MOSSAD bû. Di hundirê firokê de, tîmên taybetî yen Tirk xwe avêtin min û ez avêtim er- dê. Her tiştên li ser min birin û bi bandan ez hişk girêdam. Çavên min jî bi heman bandan girêdan û ez avêtim dawiya firokê. Firok a Cavît Çaglar bû. Bûyereke ku çawaniya hikûmeta Rêya Rast nî- şan dida. Firokê du caran danî. Yek Misir, ya din an îsrael an jî Qibris bû. Dema ku ez bi keştiyê anîm giravê, sibeha 16ê Sibatê bû. Di firokê de dema çavên min vekirin, mijara ku min dixwest ez bilêvbikim ev bû: “Ev serkeftin ne ya we ye. Yên ku dibêjin me dostîtî ji we re kiriye, helwesta dirist nîşan nadin. Dixwazin vê lîstikê bi herdu aliyan bilîzin. Min ti caran dijminatiya Tirkîtiyê nekir. Ji aliyê dayîka min ve jî girêdana xwînê heye. Ji niha û pê- de mîsoger ezê di vê bingehê de têkoşînê bikim.” Eslê wê helwes- ta min a pêşî, heta bi dawiyê ne axaftin bû. Lêbelê dihat fêmkirin ku, ev sexbêrî yê bike ku komplo weke xwe veşartî bimîne. Jibo ravekirina komployê, jiyandin rastir bû. Bi rê de dema ku ez ji fi- rokê peya kirim û kaş kirim,

çawa min pirsî û got: “Hûn min di- bin kiryara ne diyar?” Bersiva wan bû: “Em vî şensî nadine te. Devê xwe bigre naxwe emê bigrin.”

Yê ku pêşî li giravê ez pêşwazî kirim, serbazekî di payeya ser- heng de bû. Xwe da naskirin ku Serokfennandariya Artêşê temsîl dike. Gotinên wî bi kinayî wiha bûn: “Di vî karî de pir lîstik hene. Em dixwazin bi biratî çareser bikin. Em fersendê nadin van lîsti- kan.” Ev helwesteke ku ez ne li bendê bûm. Ez ne di wê rewşê de bûm ku ewlemendiya wî bipîvim. Dibe ku bi şaşkirineke taktîk re, pollîtîkayek anîbe zimên. Ji bendewannayînê û dîtinê pêde, ti vebi- jarkên din tine bûn. Deh rojan ez di hicreyeke ku mercên wê pir gi- ran de mam. Ewletî (emniyet), MIT, Cendinne û Îstîxbarata Serfer- mandariyê, bi çeprastiyeke çannend, pirsiyariyek dane meşandin. Pêkutiyeke bêteşe û sixêf (çêr) tinebûn. Lêbelê dorhêla psîkolojîk û menewî jibo min pir giran bû. Debarkirin û ragirtin behît (mûcîze) bû. Di pêvajoya deh rojan de, ez bi teşeyeke ku çawa min rast didît û rast dizanîbû axivhn. Min helwest danî. Beşek hat weşandin. Be- şek nehat weşandin. Mîsoger bû ez bi rûyekî dewletê ye cuda re rû- birû bûm. Bi awayek gihîştî nêzîk dibûn. Gelekî zor bû ez fêm bi- kim ku çiqasî di nava lîstikên tên kirin de an jî li dij wan e. Sexbê- riya ku min bingeh girtî ev bû ku, ji serî heya binî xêzikeke fersen-

dê bide pevrayiyeke gelan a aştiyeke birûmet û jiyaneke biratî û parastina vê ya bi bawerî, bi biryarî û hişmendî. Ev yek berevajî xêz- ka min a bîrdoziyî û polîtîk nedihat. Helwesta min a li hember cudaxwaziyê û şideta ku parastina rewa derbasdike, jiberku li gor xêzka min a bîrdoziyî bû, min birihetî helwesta xwe berdewam kir.

Bingeheke damezrandina Îmralî ya li gor Peymana Mafê Miro- van a Ewropa, gerdûnî û rewa tinebû. Di bingeha bûyerê de, komp- loyeke giran û revandin hebû. Pêdivîbû ku damezrandin ne di bin van şert û mercan de bûna. Ji aliyê din ve jî DMME re ne hatibû ra- gihandin ku gelek aliyen wê ne li gor PMME yê ne. Lîstika şano- yeke dawerî ya li derî rêveber û senarîstên hatin amadekirin jibo ra- ya giştî, dabaşa xeberdanê bû. Dayina parêznameya min a weke "li- hevkirineke demokratîk û mesaja aştiyê", li gor min sexbêriya herî rast bû. Jibo parastineke berfireh, ne dem, ne kerese (materyal), ne jî ji aliyê amadekariyê ve rewşeke psîkolojîk a bikêrhatî hebû.

Di derbarê pêvajoya Îmralî de, gelek raveyên min çêbûn. Ez hêvî dikim ku derûna wan ê bi şêweya pirtûkan were weşandin. Livirdubarekirina mijaran, ez bawer dikim ku zêde bivate nabe. Ev parêznameya min, bingeha bîrdoziyî û mirûzê guftûgoyên min ên bi parêzerên min re dide û di wesfê temamkirinê de ne. Hinek derdoran li der û hundir, xwestin ku helwesta min xira bikin. Rewşa herî fi- kare ev bû. Min xwest ku van mijarên ji tenduristî û mirina min jî girîngtir, ez rave bikim. Ji aliyê weşanê ve ya ku dihat kirin, propa- gandeyeke bi şêweya ku "min bi dewleta tarî û Serfennandariya Giştî a Artêşê re peyman kiriye, lihevkiriye û teslhn bûme." Ev pro- paganda bi annanc bû. Alîgirên vê him ên hundir û him jî yên der- ve, bi vêna dixwestin ku rûyên xwe yên esehî veşêrin. Lihevkirinek çêbûbana, minê îlankirina rewşê weke rûmetekê bidîta. Min tim anî zimên ku rewşeke wiha tine. Li ser mijara agirbestê ez ji sala f993an ve radiwestiyam. Dema dawî ku hê ez li Sûriyeyê, Bi agir- besta f îlon f998an ve girêdayî, f îlon f999an li gor derfetên ku merc bidin û demeke maqûl ku bimînin min xwest em vekişine derî sînor, di bingeha ku agirbestê bi biryar bikim de min weke gaveke duyem avêt. Rewşa heyî, ji ber mercên mecbûrî, hêzeke bisînor a li hundir û beşeke mezin li derve ku binke girtibin, bi şêweya rewşeke bi hêvî ya "lihevkirineke demokratîk û jibo aştiyê guftûgo" bû.

Ev mijareke dihat zanîn bû ku, siyaset, hikûmet û parlamento yên ku li çareseriyê nagerin, bixwe berpirsiyarin û rewşa heyî ji her alî ve xeteriyan hildigire. Heger ev rewş di bingeheke erênî de ne- yê derbaskirin, ji ber çavan neyê dûrkirin ku xeteriya dorpêçeke şi- detê yê hê mezintir û domdirêjtir yê dorhêlê bide ber xwe. Lihev- kirin di têgihîna “komara laik û demokratîk” a ku jiyanê bibîne de tê lêgerîn. Xweş tê zanîn ku di pêvajoya dîrokê de, di hemû çêbû- nên siyasî û dewletên ku tirkan li Anatolya damezrandin de, para kurdan heye, mînaka dawî ya vêna bi damezrandina Komara Tirki- yeyê û berî wê şerê rizgariya neteweyî ku hatibû dayîn, tê çespan- din. Heger dev ji mandelekirin û polîtîkayên ku heta roja îroyîn ber- dewam dikin were berdan, tê bawerkirin û hêvîkirin ku rêya çare- seriyê yê derkeve holê. Ev nezîkayiyeke stratejîk tê dîtin ku Kurd weke hemwelatî û gelê azad, bi liberçavgirtina pîvanên hiqûqê ger- dûnî, bi komarê re bibine yek.

Ev sexbêriya ku li bemame, stratejî û taktîkên PKKê yên nû ve- dayî, jiberku min di beşên pareznameya xwe de anîbûn zimên, ez dubare nakim. Yên ku pêwîst e polîtîka û helwestê diyar bikin, as- ta dewletê ya raser e. Ev rastbînî ne tenê ji kurdên Tirkiyeyê, jibo hemû parçeyan weke nezîkayiyeke stratejîk tê dîtin.

Digel ku rastî evqasî vekiriye, beşek ji helwestên li dij PKKê, ji ber derdorên ku rûyê wan ê xayîn derketî holê veşêrin, şiltaxiyên (neweyî) weke “Apo pirsgirêka Kurd li Îmralî binerd dike”, davê- jin holê. Teqîbkirin û lêpirsîna hesab a ji van kesan pir girîng e.

Bitaybetî van deh salên dawî, bi lêferzkirineke xayîntî ya bêe- man, him ji aliyê hevkarên Kurdistana Başûr ve û him jî ji aliyê yên ku xwe li Ewropa girtine, ji her alî ve bi Ewropa ve girêdayî û yê ku nirxên mirûz nasnakin, bi antî-Apoparêziya ku jiyana xwe pêve girêdane û bi van kampanyayên neweyiyan, xwe rizgar nakin. PKK bi sexbêriya xwe ya şer û aştîxwaz li holê ye. Hêza wê, şehîdên wê û gelê wê jî li holê ye. Ka ew li kû ne? Şer dixwazin. Kî destê wan digire? Bi sîqilandina PKK suxreyê ji kê re û ji kîjan hêzê re dikin?
Heger ku dirist bin, meydan vekiriye. Bila gelemşeya Kurd li çiyê, li deştê, li bajêr, li gund, li der û li derve temsîl bikin. Bila heta bi dawî li ber xwe bidin û mînakekê nîşan bidin, da biçespînin ku ne sextekar û şiltax in.

Hevkarên Başûrî, ev deh sal in ku li ser pişta PKKê bi xeyalên otonomiyê dijîn. Him YNK û him jî PDK, bi hêzên xwe yên girê- dayî û dûvelang, li hember PKK helwestên erjeng pêşêxistin. Jibo wan du rê hebûn: An bi xwerexnegiriyeke jidil ê werine lihevkiri- neke demokratîk û aşîtiyê, an jî dev ji otonomiyeke mafnekirin ku bêyî PKK pêkneyê berdin. Ev çil salin siyaset û dîplomasiya ku ev didin meşandin, ji serdestiya biyaniyan a çar hezar salan bêhtir zi- rar daye. Êdî ji niha û pêde bila dirist bibin û bila zanibin werine aştî û demokrasiyê. Berevajî vê ku cîhan jî rabe, yê bibînin ku ji rewşa tê de rizgar nabin. Bila ji bîr nekin ku bi biryarbûna min, ya hemû şehîdan, ya rêhevalan û ya gel ev e.

Pêvajoya min a Îmralî, yê li gor giyana vê parêznameyê berde- wam bike. Sexbêriya min ê ev be ku, li qasî amadebûna aştiyê û li- hevkirineke demokratîk a weke sibe pêkwere, li hember şerekî wê- ranker ku sibe dest pêbike jî, heta bi dawî rawestim û her dem bi bawerî û bi biryar bersivê bidime vê yekê. Li derî vê min ne jiyan naskir û ne jî fem dikim. Herçiqas ku netêrayiyên wê jî hene, yên ku hêvî û girêdana xwe pêşkêşî min kirin, pêwîst e fêm bikin bê ev rastî tê çi vateyê û li gor mercên ku tê de hereket bikin, ev jibo wan jî pirsgirêka jiyanê ye. Ev pir girîng e ku zanibin girêdayîbimînin û li gor pîvanên wê bilivin, pêwîst dike ku jiyana xwe li gor dibêtiya her cure pêşveçûnê bitemamî bi rêxistinî û bi amadekarî bigire.

Ez bawer dikim ku bi vê parêznameyê, ez bersiveke berfireh di- dime gelek kêmasî û pirsên ku di seriyan de gihane hev. Jibo gelê me û rêhevalan, di serî de jibo gelê Tirk, ji bi dostên gelên cîran û dostên ji cîhanê, min di derbarê hêviyên wan de, di derbarê tiştên dihatin meraqkirin de, di derbarê mercên min yên giran ku ez tê de û pêvajoya Îmralî de, bi dayina bersivên berfireh min peywira xwe bicîh anî. Pêşvebirina rexnegiriyên xwe û bicîhanîna pêdiviyen rex- negiriyên min, hêvî û mafê min in.

Komploya 9 Cotmeh-15 Sibat a ku bi kes û hevkarên bi dîmen-dariya dostanî ve girêdayî, weke komploya herî berfireh derketî ho- lê û weke parçeyek ji yê metingelikirina li ser gelê me ya ku ji de- ma sumeriyan ve tê, ji encama ku plan kirî û dixwaze gelekî dûr e. Veguherandina vê komploya kû hemû xayîn û hevkarên sedsala 20an di bin viyana hnperyalîst a herî bilind de kirine yek a aştiya dîrokî ya Anatolya û Mezopotamya, weke peywirekê li ber gelê me û hemû hêzên berpirsiyar e. Xwedîlêderketina vê peywirê, him ji- bo yekeriya bihêz a welat û him jî jibo yekîtiya biderûn a komara demokratîk û laîk, sexbêriya rast a bitenê ye. Ev di heman demê de rêya aştiya birûmet, biratî, azadî û wekheviya ku di pêvajoya dîro- kê de hatiye daxwezkirin e.

**b- Komploya 15ê Sibatê Dikarin ji bo Gelan Veguherînin Aştiya Payîdar (Mayînde) û Demokrasiyê**

Dema ku em komploya 15ê Sibatê ji aliyê dîrokî ve şîrove bikin, taybetiyên girîng derdikevin holê:

1- Tê dîtin ku komplo, bigelemperî li ser xêzka levdana Rojhilat û Rojava pêkhatiye. Min weke xala ku Anatolyayê ango Tirkiyeyê lawaz dike, şîrove dikin. Zaroka Rojava ya neqeriyayî û siyaseta Grek a ku xala serik e, xwestiye ku min tim bê hêman û di rewşe- ke ku tenê zirarê bidim de bibîne. Berevajî vê, dema ku dîtin têki- liya min yê zirarê bide wan, ji avêtina min a nav êgir paş de nema- ne. Lêbelê rola wan a di komploya dawî de, bi şêweya hevkarê xa- yîn ê ku dostîtî bikaraniye. Ne yê ku plansazî kiriye û sepandiye, herî bêhtir serkar e. Di berdêla vê serkariyê de, diyar e ku jibo Ege û Qibris ê li benda tawîzan be. Di bûyerên dawî de, ev yek bi awa- yek vekirî derket holê. Yê ku fennana teslîmkirinê dayî Clînton bixwe ye, ev yek ji aliyê nûnerê wî yê taybet Blînken ve, hate bi- lêvkirin. Ev yê nêzîkayiyeke teng be ku weke helwesta li hember terorîzmê were ravekirin. Mîsoger e ku li pişt vê îsrael jî heye. Gi- rêdana rastgiriya îsrael beşa serik ê zêdekar a alîgirê şer ku soz dayî Tirkiyeyê, xurt e. Serokwezîrê demê, Benyamîn Netenyahû yê se- rokê bloka rastê partiya Lîkûd e. Îsraîl di teraza stratejîk a Rojhila- ta Navîn de, jibo ku Tirkiyeyê li cem xwe bihêle, di pêkanîna komployê de rola serleyîstikvan dilîze. Lêbelê ne bi tenê ye.

Lêbe- lê ez texmîn nakim ku girêdana wê bi demokratên çepgir ên îsrael û bi xêzika Şîmon Perez re hebe. Divê neyê jibîrkirin ku kûştinx- waziya îzak Rabîn ji bi serikên rastgir ve girêdayî ye. Dema ku amadekariyên komployê hatin kirin, Clînton bi arîşeta (şantaj) Mo- nîka hatiye bêbandorkirin û di wê rewşê de ye ku yeka lobiya îsra- el neke dido. Him di destê jina xwe Hîlary de û him jî di destê Mo- nîka de, bi arîşetiyê derêxistina gelek biryarên serokatiyê gengaz bûne. Li vira di navbera stratejiyên Grekîstan û îsrael de, di derbarê Tirkiyeyê de rewşa tevkariyeke demî derdikeve holê. Clînton vê yeke kordîne dike. Bingeha vê koordînasyonê li London hatiye avêtin, Hesabê ku min îzole bikin û PKKê têxin bin venêrana xwe pir xurt e. Rewşa min a serokatiyê, polîtîkaya kevneşopî ya Rojava li ser kurdan dihejijîne. Derûna bûyerê jî bi vê rastbîniyê ve girê- dayî ye. Ji ber vê yekê Ewropa, jiholêrakirina min li gor berjewen- diyên xwe dîtiye. Lewra demeke dirêje polîtîkaya Kurd ku didan meşandin, dîsa li ser rûyê min vala derdiket. Taybetiyeke gelemper a ku li ser digihin hev jî, çanda Rojhilat ku di kesayetiya min de ji- hev venakin e.

2- Vê mijarê sedema psîkolojîk û çandî ya teslhnkirina min têş- kîl kiriye. Çanda Rojava ya ne di binyateke ku min bihelîne de bû, di dîtina min a weke kesayetiyeke ku pêwîst e were vederkirin de hîkarîker bûye. Digel ku berjewendiyên aborî û daringî diyarker in jî, bingeha çandî jî bi pişt guh ve nayê avêtin. Qaşo jiberku Lenîn an jî Hûmeyniyekî duyemîn demekeve ev yek hatiye kirin. Ev bi zelalî derketiye holê ku, yê ne hevkar û teqlîdkerê çanda wan be, kesekî ku xwe piçûk nebîne û wan raser negire, ji aliyê wan ve bi xweşbînî nayê dîtin. Xêzka şareza- barbar di vê bûyerê de parasti- ne. Diyarbû ku di derbarê kesayetiya min de, demeke dirêj çavdêrî kirine. Min xwe di atmosfereke wisa de dît, weke ji mêj ve biryar dabin ku ez ne li gor mentalîteya wan bûm. Ev atmosfereke ku bi hişmendî hatibû afirandin bû.

3- Di derûnê de bi polîtîkaya kapîtalîzma Ewropa ya dused salên dawî ve, girêdayî mane. Di bingeha vê polîtîkayê de, jibo ku di serî de Tirk dû re Ereb û Iranê bi xwe ve girêdayî bihêlin, bikaranîna kur- dan a weke amûreke gef û gurê heye. Di pirsgirêka Kurd de, an bi şer an jî bi aştiyê min jibo çareseriya dawî zor dikir. Lêbele wan ev yek bingeh digirt ku vê pirsgirêkê, di destê xwe de timî weke keyse- kê bigirin.

Girtina vê çekê ya ji destê wan, ne li gor karê wan bû. Ne dixwestin ku dev ji vê bennayiya gemarî ya polîtîkaya mêtinkeriya kevneşopî berdin. Pirsgirêka Kurd a ku ji aliyê stratejîk ve hatî çare- serkirin, jibo wan mijareke ku hê dema wê nehatibû bû. Di rewşa wan de xuya bû ku heta hesabê xwe bi Tirkiyeyê, Iran û Iraqê re ne- bînin, yê keysa Kurd di destê xwe de bihêlin. Ev helwesteke weke ya li Tirkiyeyê jî hinekên ku berjewendiyên xwe di domkirina vê pirsgirêkê de dibînin e. Ev polîtîkaya jibo Kurdan ‘ne bimre ne bi- mîne’ ye. Ev nêzîkayiyeke hovane ye ku liqasî nemire xwedî derdi- kevin û liqasî nejîn li kevya kendal digirin. Heger ku hinekî destek bidana, di bingeha rast de mercên bikêrhatî yê derketibana holê. Mî- nak ew nêzîkayiyên ku li Kosovo û Makedonya nîşan dan, jibo kur- dan jî bi israr pêkanîbana, pirsgirêk ji mêjve yê çareser bûbana. Rewşeke bi vî rengî jibo Ereb-îsrael û Rûs û çeçenan jî derbasdar e. Berjewendiyên wan di domkirina pirsgirêkan de hene. Lêbelê dema ku nava Ewropa an jî nêzîkî wê têkildar dike, bi lezgînî û bi awayek sift nêzîk dibin û çareseriyê dibînin. Rewşa min jiberku ne li gor ber- jewendiyên wan e, vederkirina wê tiştekî xwezayî tê dîtin.

4- Di teslhnkirina min de, jiholêrakirina tevgera azadiya Kurd û serokatiya wê annanceke diyar e. Têkiliyên ku bi salan bi hevkarên Kurd re hatine berdewamkirin, hatiye xwestin ku di vê jiholêrakiri- nê de dîsa were bi erk kirin. Qaşo yê serokatiyeke Kurd a lîberal û demokratîk bihata afirandin, hemanên Kurd ên li gora her dewletê yê derketibana holê, yê ji valayiyê rêxistinên curbicur bihatana afi- randin. Di vî babetî de Ahnanya serkêşiyê dike. Afirandina komên alîgirên Ahnanya yên Tirk, Ereb, Kurd û Iran, polîtîkayeke Rojhi- lata Navîn a kevn e û ev polîtîka ji dema Enwer Paşa ve bi erk bû- ye. Kurdên Iraqê bûne gurikê vê polîtîkayê, di demên dawî de li Tirkiyeyê jî xwestine gavên bi vî rengî werin avêtin. Givrikîbûna di

bin baskên hêzên derveyî de, bûye şêweyeke debarê.

Jiholênerakirina tevgera azadiya Kurd, yê careke din rê li ber hewldanên jiholêrakirin û perçekirinê veke, an jî yê jevbelavbibin û herin. Ji aliyê din ve, heger bisînor be jî, pêşketina mercên aştiyê, yên bixwazin ku bişixulînin. Tevgera azadiyê ku civakên şarwer ên azad nafirîne, yê hewldanên şixulandina wan zêde bike. Herwiha pêwîstê baldar bin ku, him rêxistinbûnên bi şêweya terîqetên kevin ên paşverû û him jî rêxistinên hevkar sexte yên civaka şarwer, gel ji rê nebin.

5- Dayina pêvajoya Îmralî ya vejîna aştiya çandên bira yên Anatolya û Mezopotamya, ji şer zortir e lê encamên wê bêhtir şoreşger û berhemdar in. Aştiyeke bi bikaranîna heyînên çandî yên azad, yê bibe bersiveke herî rast a Ronesansa Anatolya û Mezopotamya û derûna Komara Tirkiyeyê ya şoreşger. Bi hêmana ku her şerek aş- tiyeke, hewldanên aştiyê yen li gor berjewendiyên gelan, gelekî pê- wîst û girîng in. Yên ku aştiya şerê xwe neyînin, ji hêzên ku vê ye- kê li dij wan bikarbînin rizgar nabin.

Lêkolîna aştiyê û bisînor be jî pêşvebirina wê, ti carî nayê wate- ya windakirinan û lebikandina bi karê vala re. Yên ku rêyên raste- qîn ên aştiya şerên xwe pêşve nebin, heger ku ji aliyê leşkerî ve qe- zenc bikin jî, di dawî de ji vala derxistinê rizgar nabin. Di derbarê aştiyê de hisabekî çewt, qezencên leşkerî yên herî girîng jî bêvate dike. Serokê li hember gel û leşkerên xwe berpirsiyar, kesê ku pirs- girekên aştiyê bi hindikayî li qasî pirsgirêkên leşkerî lêdikole û hewl dide ku çareseriyên rastbînî pêkbînine ye. Serok û fennandarê ku ve yekê pêkneyîne ji windakirinê rizgar nabe.

Di pêvajoya Îmralî de, dema em li sexbêriyên li hember hewlda- nên aştiyê dinêrin, yê were dîtin ku rola yên ku bêesilbûn, marjî- naltî, hizbperestî û dijminatî ji xwe re kirina huner, tê de heye. Lewra aştiyeke cidî û bivate, yê aloziya sexte ya ku ji civakê re sux- reyê nake û takekes bilind nake, ji holê rake, yê pêşiyê li rewşên derî zagon bigire, yê debara rewa û şêweya jiyana sazûmanê ser- dest bike.Yên ku behre û şêweya jiyana wan ne li gor vê yekê û yen di dema xwe de veneguherin, aştiyê ne fêm dikin û ne jî dixwazin.

Ev êş û zoriyen şer jî nizanin. Digel vê yekê jî, pêwîst e cidiyeta pê- vajoyê were dîtin. Heger ku here serkeftinê û neçe jî ev pêvajo gi- rîng

e. Di pey vê re şerekî ku biqewime jî, yê ji şerê kevin cudatir be. Qeyrana ku Komara Tirkiyê di dîroka xwe de jiyaye, encama şerê borî ye. Heta ku ev neyê mikurhatin û veneguhere aştiyeke dadyane, ev qeyran ji holê ranabe. Lewra nabin ku êşnasiya sede- mê bibînin. Herwiha tedawî jî rast nayê kirin. Tirkiye di salên 2000an de, vê nakokiyê dijî. Qeyran an bi şerekî hê bixwîntir, an jî bi aştiyeke dadiyane û birûmet yê ji holê were rakirin. Berevajî vê, ji gabûsên civakî yên ku heroj tên dîtin rizgar nabe.

6- Pêvajoya Îmralî jibo gelê Kurd û ji aliyê min ve, dema zayî- na sêyemîn e. Deme yekem, dema ji jidayîkbûna di mercên civaka gundîtiya çandinî de ya bi sedsala 20an re nakok, heta bi nimûneka civaka fennî, digire nava xwe. Ev dem di nava netêrayiyên pêvajo- yeke veqetînê de ku di navberê de 15 hezar sal hebûn de derbas bû. Tora jiyanê ya 15 hezar salan berê û dû re nayê dahûrandin. Neça- reseriyê rê li ber şerê nava malbatê û civaka gundîtiyê vekir. Ez ser- hildêrekî gund bûm. Vê serhildanê heta bi derbasbûna civaka fennî berdewam kir. Vê dawiyê, pêvajoya duyem ya afirîner ku bi dibis- tana seretayî destpêkir û di derbasbûna di merhaleyên cirbicur re, heta bi serhildana li hember komara olîgarşîk berdewam dike. Ev dema ku dişibe êrîşa Don Kîşot a aşê bayî, rê li ber pirsgirêkan ve- kir ku derkevin holê û hê bêhtir giran bibin. Taybetiyên kapîtalîst jî tevlî nakokiyên civaka Neolîtîk û feodal bûn. Ji ber ku ne şêweya şoreşger bû, dorhêleke geremol (tevlîhev) serdest bû. Serhildana ku hatî kirin, paşverûtiya di nava xwe de jî çareser nekir. Ev merhaleya ku 20 salan berdewam kirî, piştî ku li herêmê û tevaya cîhanê ban- dora xwe kir, di encama astengiyên ku derketin pêşiyê de, veguherî pêvajoya îmraliyê.

Mercên Îmralî tenê ne weke kes, weke komar û gel jî tê wateya zayîna sêyemîn. Zayîna duyemîn, zayîna bi şer û şidetê û paqijbûn îfade dikir. Di xwezayê û civakê de li gor zagona heyîn û yekîtiya dijan a di hemû çêbûnan de, di bingeha şidetê de ku li hember ko- mara olîgarşîk berdewam kirî de, yê cîhê xwe bide komara laîk û demokratîk a ku bi demokratîkbûnê pêkwere. Liqasî ku pêşveçûn bê nakokî çênabe, gewixandina timî ya bi nakokiyên ku çareser na- bin re jî, pêkanîna pêşveçûnê li dera han encex wêrankerî, hilweşan û qeyran pêşbikevin. Jiberku Tirkiye di têgihîştin û çareserkirina nakokiyan de demg maye,

ketiye pêvajoya qeyranê û jê demakeve.

Pêvajo ji aliyê hemû hêzan ve, zayîneke ji nû ve û şêwegirtine- kê ferz dike. Ji dewletê heta bi aboriyê, ji siyasetê heta bi hiqûq, ji sinc heta bi huner, hemû qad dihejijin, ditengijin û bi qeyranê re li çareseriyê digere. Pêvajoya min a Îmralî tê wateya ku agir dide vê rastiyê. Çawa ku pêvajoya berî wateya 'ez û şer' dabe, ev pêvajo- ya nû jî tê vateya 'ez û aştî'. Ji aliyê saziyî ve parçeyek ji bingeha hebûna min, hişmendî û viyana azadiya Kurd e. Ev hişmendî û vi- yana ku bi şer di ezmûnê re borî, niha jî di pêvajoya aştiyê re der- bas dibe. Pêvajoya şer ku xwe weke antî-feodal û komara antî-olî- garşîk fonnule kirî, pêvajoya aştiyê weke 'komara demokratîk û la- îk' xwe di derûn de bi şêweya nûbûnê îfade dike. Heger veqetîn û şidet neyê xwestin û bitemamî ji sazûmanê vederkirin were xwes- tin, pêwîst e kurdên ku bi keda xwe di dîrokê de, ji pêvajoya ku bi tirkan re dewletbûn û neteweyîbûn jiyane, bi zorê û bi mandelekir- in neyên vederkirin. Aştî ferz dike ku, siyaset û hiqûq cîh bide kur- dan da ku heyînên xwe yên çandî weke dizanin bi azadî bijîn û bi komarê re bibin yek. Komara ku bi mandelekirina viyana Kurd a azd ve girêdayî be, olîgarşîk e û jenerev e ku ev rê li ber şidet û ve- qetînê vebike. Vebûna wê ya ji yekîtiya azad ango ji lihevkirina de- mokratîk re, yê were vateya jiyana di nava aştî û yekîtiyê de. Nese- pandina vê, jiberku hê têkoşîna di navbera komara olîgarşîk û ya demokratîk de bi encam nebûye. Ji vî alî ve pêvajoya Îmralî, bi awayek dawerî merhaleyeke dîrokê nîşan dide. Ev pêvajo yan ê aş- tiyê derîne holê, an jî heger di vê de bisemekevin û polîtîkayên mandelekirin û tinekirinên komara olîgarşîk berdewam bikin, wê hingê bi şideteke berfireh û siftir re, pêvajoyeke ku veqetîn kûrtur bibe yê destpêbike.

Di bin vê qeyrana ku Tirkiye di dîroka xwe de yekem car dibîne de, ev rastbîniya bingehîn heye. Ji ber siyaseta ku qada çareseriyê,

weke meclis û hikûmetê di dema xwe de mijarê bi awayek rastbînî li ber çavan nagire û ya dikeve ser milên wê bicîh nayîne, ser pirs- girêkan dinixûmîne û bi dev rizîbûn û neçareseriyê ve berdide, we- ke ku di çapemeniyê de jî tê nivîsandin, çavkaniya qeyranê siyaset e. Siyaset bi biryardayina dardekirinê ku mîna şûrê Demokles di ser serê min re dihejîne, guman dike ku yê encamê bigire û çewtîtiya herî mezin li vir dike. Ev nêzîkayî Tirkiyeyê mehkûmî lêverzkirina der û hundir a sazûmaneke ku di derûna xwe de bi çeteyên rantpe- rest û nelirêtiyê ve girêdayî, herwiha qeyranê dike. Her sal heta her heyv, dibe sedema windakirina mîlyar dolaran û ji aliyê menewî ve jî, dixe nava êş û astengiyen kûr. Madem ku şerê 15 salan bûye se- dema 40 hezar kûştin û bi sed mîlyaran windayiyên daringî, êdî ya bête kirin ev e ku, ev bûyer di nava hemû mercên dîrokî, civakî û navneteweyî de li ber çavan were girtin, ber bi terîfkirin û çreseri- yeke rast ve were birin. Heta ku ev yek neyê kirin, yê jênerev be ku qeyran hê bêhtir hilkişe Weke kes û saziya serokatiyê pêvajoya min a Îmralî, pêdivî dike ku pirsgirêk di bin vê çarçovê de were nirxan- din. Dema ku bi bîrûbaweriyên sûdeperest û bikarhêneriya erzan ev neyê pêkanîn, hisdike bila ji derdoren dewleta fennî û hisdike bila ji derdorên hevkarên Kurd ve were, nêzîkayiyên mandele, neweyî û tineker ku werin pêşxistin, dîsa yê dema şerekî ku bêxe astengi- yê ferz dikin. Merceke bingehîn a serkeftina vê pêvajoyê ev e ku, jibo nekevine vê lîstikê, digel nîşandana helwestên hestyarî, divê bête zanîn ku bûyereke li Îmralî ya bi tinekirina min a daringî an jî menewî, yê were vateya tinekirina hêzên viyana azad ên Tirk û Kurd, jiberku şerê azadiyê jibo gelên me bi encam bibe, pêwîst e amadekariyên stratejîk û taktîk ên şerê parastina rewa, weke şer si- be dest pêbike bi sexlemî were meşandin. Vateya dîrokî ya ji aliyê min, PKK, dewlet, civak û gelê me ve ev e.

7- Vateyeke komploya 15ê Sibatê ku ji aliyê Ewropa, DYA û PMME ve jî rast were terîfkirin heye. Binçavkirin û girtina min a ku li hember viyana gelê Kurd a azad hatî meşandin û mîsoger a li dij PMME û li derî hiqûq, Ji Komara Tirkiyeyê zêdetir saziyen DYA û YE yê, him ji aliyê hiqûqî û him jî ji aliyê siyasî ve berpir- siyar dike. Lewra weke ku min di parêznameya xwe de jî bi berfi- rehî rave kir, hêz û saziyên ku dabaşa xeberdanê bi têgihîneke si- yasî a mêtingehkar, bi sexbêriyeke

li derî hiqûq ku PMME binpê- kirin, ev rewş derandine holê. Herwiha bi çûna min a DMME, tenê ne rewşa Komara Tirkiyeyê ya li hember PMME, esasê wê YE û DYA ku di kesayetiya min de li hember viyana azadiya Kurd pêka- nîn, darizandina berpirsiyariya wan a bê hiqûqî û li derî sinc, pêşi- kiya yekem digire.

Li sê paytextên Ewropa yên girîng, çarsinga (çannix) ku ezê lê werim dayîn, an jî li tabûtgeha min bizmar hatine xistin. Dû re bi lîstikeke felbazî a kapîtalîzmê, ji nav destên yamyamên Afrîka ez avêtim firoka tirkan.

Yekem car li Atîna paytext ez li çarsingê xistim. Atîna hisdike bi- la ji şaşmayîna xwe û hisdike bila bi çandeke paşverû û giyaneke tirsonek ku ji tolgiriya wê ya kor dihat, bi xwestina ku êşa serdes- tiya xwe ya 3000 salan a li ser Anatolya winda kirî derbixe, li hem- ber tirkîtiya Anatolya serfiraziyeke erzan û bê hêman ji min hêvî ki- riye. Dema femkir ku ev yek ne gengaz e, weke ku xwediyê min ew bi xwe bin, li hember çend tawîzên Qibris û Ege weke paketeke di- yariyan, an jî weke mîheke dehiyê bi xiyaneteke ku di dîrokê de ne- hatibe dîtin, bi rezîlî û bêşerefiyeke ku di pirtûka dostaniyê de tine be ez pêşkêşkirim. Weke endameke YE, hiqûqê PMME binpê kiri- ye. Bêyî ku hinek hêncet werin pêşêxistin, bêsincî û sûcê wê li hember hiqûq zelal e. Heger pêdivî be ev bi gelek şahid û ravekiri- nan, dikare were çespandin. Nivîskarê Grek Kazancakîs, romana “Li Çarsigêxistina îsa ya ji Nûve”, ji mêjve nivîsiye. Lêbelê dera- waya min ne takekesî ye. Ev li çarsingê xistin, li ser bi mîlyonan kurdên bi viyana azad ku bi mirina xwe bi serokatiyê ve girêdayî, hatiye sepandin. Grekî dikarin xwe ji dema Xweda Zeus ve, gelekî xasûk bibînin. Xwedawenda Athena ya ku Zeus ji eniya xwe afirandî, dikare bi fêlbaziyan xwe têxe şêweya birayê Hektor Deîpho- bos û wî di nava agirê şer de, ji holê rake. Herwiha dikare deryê Anatolya veke. Ev rastbînî di mîtolojiyê de derbas dibe. Lêbelê ez dema ku ji 2000an re yek mabû, dema di sedsala 20an de dijiyam xistime vê xefkê. Heger wan ez bikûştama, bi komployekê rengê qezayê bidana û ev yek pêkanîbana jî min xem nedixwar. Li gor çanda wan ê çêbûbana û biqediyana. Lêbelê bi şêweyeke ku di ti pirtûkan de û di nav ti hêmanên sincî de cîhê wê tine be weke pa- keteke diyariyê, di nava 30 hezar şehîd û rondikên dayîkan de, di demeke krîtîk ku ez ne amade û hê gelek

hêviyên gel ji min hebûn de, çawa cesaret dikirin ku min teslhnî thnên taybetî yên tirkan bi- kin? Li pişta wan Clînton hebû, wî fennan dabû. (Şêwnnendê tay- bet Blînken, ev yek bi fennî dabû çapemeniyê). Hikûmeta Grek jî bi leyîstika dosanî ev anîbû cîh.

Clînton wê demê di bin darizandina Senato ya hetîketiya (skan- dal) Monîka de bû. Jina wî Hîllary û dildara wî Monîka jî, du sîxu- rên ji binyata cihû yên ku hê ji berê de hatine amadekirin û ketine nava Qesra Spî ne. Cihû dibêjin ku ev huner xwedê daye wan. We- ke ku di Incîlê de di behsa Îbranî de derbasdibe, weke sîxura pêşî ya jin, ji fahîşe Rahav bi pesindan tê behskirin. Clîntonê bi çanda kowboy ê hedê xwe nizane nûnerê dawî yê mêrê spî ku çennsor nê- çîr dikirin e. Tenê jibo ji hetîketiya Monîka xwe bi erzanî rizgar bi- ke, viyana ku MOSSAD bi şertê ku min teslhn bike pê dayî sepan- din, ne dibû peywira hikûmeta Grek. Jibo desteke serokê DYA me- zin, hemû tişt hate kirin. Naxwe bi ti awayî din barê vê bêsinci û bêhiqûqiya vê komployê nedihat hilanîn.

îsrael jibo ku di ser Tirkiyeyê re terazeke stratejîk damezrîne, ne xwedî maf bû ku min bike qurban. Kalikê me yê hevpar Brahhn bixwe jî, pêxemberê yekem e ku qurbankirina mirovan ji ol rakiri- ye. Li ser bîranîna wî û jibo rêzgirtina olê wî, pêwîst bû MOSSAD neketa nav çalakiya qurbankirina min. Jibo serdestiyê pêdivî ye sî- norekî sincî hebe. Hema bila hikûmeta Grek nebûbana amûra vê lîstika qirêjî. Bi lîstikên wiha nazik ên li ser Tirkiyeyê, bi peyma- neke di nava xwe de, Kurdekî weke min ku bawer nedikirin baqil be, ne pêwîst bû ku weke bombayeke atomê ya zindî bikarbînin. Pêwîst bû hesêb bikin ku rojekê aqlê Kurd ê were serê wî û yê tol- hildanê birêxistin bike. Ji hezarî yek be jî, pêwîst bû vê dibêtiyê li ber çavan bigrin. Li navenda Xiristiyaniya Ortodoks, ne pêwîst bû
sûcekî bi vî rengî ku careke din giyana îsa li çarsingê bixe were krin. Pêdivî ye nebûbana şêweya Yahûda îskaryotên hemdem. Ya ne baştir, pêdivî bû ku bi raveyên sextekarî ev bêsinciya toqîn û sûcdarî ne hatibana nixûmandin. Ez zêde dirêj nakim. Wateya çar- singa min a ku li Atîna hatî amadekirin an jî bizmarên pêşî ku li ta- bûta min hatin xistin a dîrokî û mirovatî, di vê çarçovê de ye. He- ger ku helwesta dirist bingeh were girtin, pêwîst e bi mîsogerî ali- yên vê yên siyasî û hiqûqî li ber çavan werin girtin.

Bizmarê duyemîn li Moskava lê hatiye xistin. Ez bi vê yekê qet şaş nebûm û min hêrs negirt. Gilîkirinê jî bivate nabînim. Jibo Rûs û hikûmeta wan a ku ji nirxên xwe yên herî esîl re bi awayek rezî- lane bêxîret mabûn, min ti dibêtî nedida ku xwedî fikareke mirovatî û sincî bin. rûsan vê demê xweş dane çespandin ku ti nirxên wan ti- ne ne ku bi diravan nedin. Rûsya weke endamê KE (Konseya Ew- ropa) girêdayî PMME ye. Herwiha di Duma ya ku di rewşa parla- mento de, bi dengdana li hember yekê ku bi 298 dengan penaberi- ya min hatibû pejirandîn û bizorê avêtina min a ji Rûsya, li derî hi- qûq e. Ev yek jî YE û DMME yê têkildar dike.

Li paytexta Ewropa ya pîroz li Roma, bizmarê sêyemîn li pêş ça- vên Papa hate bikaranîn. Herçiqas ku mirovê mezin Ezîz Paûl jî li Roma weke xiristiyanê yekem ku dihat kûştin bû, ne pêwîst bû ku pêvajoyeke weke mirinê li min were ferzkirin. Ewropa û Roma di wê angaştê de ne ku şaristaniya hemdem temsîl dikin. Pêdivîbû Ro- ma, di sala ji 2000an re yek mayî de, sepîneke ku li Saînt Paûl hatî kirin, cara duyem ezmûnneke. Eynî weke wî ez jî ji Şamê dihatim. Minê di derbarê şaristaniyê de hinek rastî bilêv bikirana. Çima ev- qasî ketin rewşeke nepejirandinê? 66 rojan weke ku di rekiheke he- sin de bigirin, hawîrê min bi polêsên mîna pola dorpêçkirin û hel- westa xwe nîşan dan. Minê heyîn û xwesteka azadiya gelekî kevna- re ku navê wî nayê pejirandin û ti mafên wî yê mirovatî nayê dayîn bianiyana zimên. Ev diyar e ku li gor nirxên Ewropa yên siyasî û hiqûqî maf û xwesteka demokratîk e. Qet giramgirî ji vî mafî re ne- hat dayin. Jibo revandina min hemû tişt hate kirin. Hemû erkên psî- kolojîk ên ku min li çarsingê bixin hate bicîhanîn û ez birêkirim.

DMME pêdiviye li ser vî aliyê rastbîniyê raweste, li paytext Roma ya ku şêwe û giyan daye YE, bê çima rewşeke wiha qewimî bipir- se û hesab bixwaze.

Revandina min a paytexta Kenya, bitemamî bi viyana hevpar a Ewropa û DYA pêkhatiye. Rola herî rezîl jî bi zaroka xwe ya herî neqeriyayî, bu hikûmeta Yewnan dane leyîzandin. Çîroka vê gelekî duvdirêj e. Min hinekî behs kir. Pêdivî be ez dikarim vê revandin û teslhnkirina xwe ya li balyozxana Kenya jî, bi awayek berfireh ji DMME re bînim zimên. Pêkanîna hilgirtina çarsingê, pakêtê, tabût- gehê an jî dardekirinê ku bi destê yamyamên Kenya yên kû xweşik hînkiribûn, karekî herî bi qirêj yê komployê bû. Qaşo Ewropa pak û paqij bû û Kenya ev sûc kir. Diyar e ku Ewropa di qirkirina ge- lan a bihev de, gelekî tecrûbe standiye. Li vira jî roleke hêsan a ce- ladê siyasî daye lîstandin. Jiberku fikaran ji raya giştî û zagonan di- kin, ev taktîk xistin dewrê. Ango li Ewropa qet tiştên qirêj çênabin, çêbibe çêbibe yê li nav yamyaman çêbibe!

Rola DYA ya li Kenya vekiriye. Jixwe serokê DYA li rola xwe ango li fennana teslhnkirinê xwedî derket. Ez di wê baweriyê de me ku CIA û îstîxbarata Grek, ev dek û dolab ne ji ber evîna Tirki- yeyê zivirandine. Ez ji vê yekê qet guman nakim ku mirina min a di destê tirkan de, annanceke wan stratejîk a li gor dilê wan bû. Ez bawer dikim ku nêzîkayiya Ingilîzan jî bi vî rengî bû. Ji ber hinekî min, dijminatiyeke bi şêweya berxwedanvanekî bêteşe li derba Tir- kiyeyê nekir û ji ber ku hinekî jî serfennandariya Giştî ya Tirkiye- yê bi tedbîr nezîkî min bû, pêşî li teqîna bombeya li bendê bûn a ku di kesayetiya min de yê bûbana sedema mirina deh hezaran girt. Pêşî lê hat girtin ku sedsala 21an bibe sedsala levdaneke Kurd û Tirkan. Lêbelê ev diyare ku di bin maskeya dostaniyê de, leyîstika ku bi herdu aliyan him bi Tirkan û him jî bi Kurdan hatiye leyîzan- din, di dîrokê de li Bîzans jî nehatiye dîtin û komployeke rezîl û be- şerefiyê ye. Pêdiviye ku him Tirk û him Kurd vî aliyê komployê bi- bînin.

îsrael di teslhnkirin û cihêgirtina min a ji cîhanê de, rola diyar- ker lîstiye. Derketina min a Rojhilata Navîn û pêşêxistina min a xêzkeke Kurd a nû, ji aliyê stratejîk ve ji xwe re xeter û weke dij- berekî dît. Dema ku bi awayek kevneşopî tevgera Kurd tê gotin, hevkarên Kurd ên

Iraqê bingeh digire û hewl dide ku bi têkiliyên bi wan re, hemû kurdan bixe nava toreke stratejîk. Parçekirina min a vê torê, tevgera min a serbixwe, ji aliyê din ve tengkirina min a qa- da hevkarên Kurd û mayina min zêde ya li qada ereban, rê li ber pêşxistina stratejiyeke li hember min a di tevaya cîhanê de vekir. Ji- bo îsrael, ez di rewşeke wisa de bûm ku ji Arafat bêhtir nedihatim xwestin. Di hevgirtina wan stratejîk a bi Tirkiyeyê re, ev kartêker rola bingehîn dilîzin. Digel ku ez zanim ev stratejî ji aliyê rastgirên îsrael ve hatiye meşandin, lê ez nizanim gelo rola xêzka Şhnon Pe- rez ê ku çepê temsîl dike tê de heye an jî tine.

îsrael berî 9 Cotmeh 1998an dest avêtibû min. Ji bombekirina 6 Gulan 1996an haydare û desteka wê heye. Bê Yewnan çiqasî ser- karî kiriye, mijara lêkolînê ye. Derêxistina min ji Moskova ya ji ali- yê serokwezîr Prhnakov ve, bi bandora lobiya cihû û îsraelê ye. Tê bîra min ku cara dawî Arîel Şaron hatibû Moskovayê. Ya ku di ser DYA re zor li îtalya dikir jî îsrael e. Dibêtiyeke mezin e ku li Lon- don û li Ewropa jî, helwesta weke zilamekî neyême xwestin, dîsa bi hêza MOSSAD e. Ya ku jibo teslhnkirina min bi DYA fennan derandî jî, rastiya cihû ye. Ez vê helwesta îsrael dişibînime helwes- ta li hember Mûsa bê çi anîne serê wî û belkî jî kûştibûn. Li Rojhi- lateke Navîn a demokratîk, ez dixwazim ku cîhê gelê C-ihû jî hebe. Dîsa ez heyranê zanist, huner û hêza felsefeya Cihû me. Yê bi van kiryarên ku anîne serê min, her roja ku derbas bibe fêm bikin bê çi zirar dane xwe. Kurdên ku rastiyên di vî alî de bibînin, yê hê bêh- tir hişyar bibin, bigihine hêza xwe û yê biçespînin ku yê bikaribin dadmendiyê pêkbînin.

# BEŞA HEŞTEM

# Di Pirsgirêka Kurd de Hiqûqê Ewropa yê Bikaribe Derfeteke Çareseriyê Derêxe Holê

Bûyerên ku li derdora min û pirsgirêka Kurd qewimîn û anîna wan a ser çarçova hiqûqê Ewropa, him mafek e û him jî di pirs- gireka roja me ya herî girîng de, di afirandina derfetên çareseriya si- yasî de, fersendek e. Liqasî ku Komara Tirkiyeyê weke parçekî ji vî hiqûqî şêwe girtiye, hê jî bi gelek peymanan ve bi awayek erênî gi- rêdayî ye. Rayeya (erk) PMME û DMME pejirandiye. Di vî derbarî de bi rakirina hinek dûreperêzên (îhtîraz) xwe yên bisînor re rûbirû ye. Herwiha weke pirsgirêka Tirkiyeyê ya herî bingehîn mijara Kurd, di nava qada rayeya hiqûqê Ewropa de ye. Bi hezaran dozên ku ji vê pirsgirêkê dertên hatine DMME û di derbarê wan de biryar hatine standin. Mafê min yê serlêdana takekesî jî, di vê çarçovê de hatiye nirxandin. Mijar di derbarê hinek aliyên ku li xalên PMME nayên de, hatiye lêkolîn û pejirandin e. Him jiberku ez di dozê de alîgirim û him jî jiberku di bûyeran de ez şahidê tenê me, parastina min a peyvkî û nivîskî pir girîng e. Bêşik derawaya min a serokatî ku ji ali- yê gel ve weke parçeyek ji yê kesayetiya min tê dîtin, pêwîst dike ku ji aliyê siyasî û civakî ve girîngiyeke mezin bi vê dozê bête dayîn. Li- qasî ku di kesayetiya min de viyana azad a gelê Kurd tê ziman, hewl dide ku di nava hiqûqê Ewropa de ji xwe re cîh bibîne û li ya ku ma- fê wî ye digere. Doz ji vî alî ve, yekemînekê temsîl dike.

Divê ez bidim nîşandan ku weke takekes, dema ez li mafê xwe digerim, vê yekê bingeh nagirim. Bi vê mebestê ya herî bingeh ev e ku, di derbarê bi mîlyonan Kurd ên ku rewşa wan girantir, stem- bar û mafê wan tên binpêkirin de, dawî li vê yekê bînin, pêdiviyên van mafên wan bi awayek rast terîf bikin û ji aliyê hiqûqê erênî ve hinekan ji wan

pêkbînin. Ji ber vê yekê min DMME weke saziye- ke bingehîn a hîqûqê gerdûnî dît û xwest ku doza xwe bikişînim vi- ra. Ez dixwazim baweriya xwe nîşan bidim ku dadgeh yê di vê çar- çove de mijarên neyekser an jî rasterast ku bi min ve girêdayî lêbi- kole û biryarên xwe bistîne. Gelek derdor hemraman in ku encama derkeve holê yê xwedî wateyeke dîrokî bin. Ev wate weke takekes ji derawaya min û gelekî wêdetir e. Gelo pirsgirêka Kurd yê bi aş- tîxwazî, bi rêya hiqûqê demokratîk û lihevkirinekê bi encam bibe, an jî yê bikeve dorhela şerekî girantir, ev bi biryarên ku DMME yê bistîne û ya girîngtir yê çiqasî hêzdar be ku bisepîne ve girêdayî ye.

Derfet heye ku biryarên DMME tevkariyê li lihevkirinake aştî û demokratîk bike. Ji ber vê yekê jî, liqasî ku biryar giyan û navero- ka erênî ya hiqûqê YE bingeh bigire, ewqasî jî pêwîst e ku hêza xwe ya sepandinê nîşan bide. Dema biryareke ku hiqûq bisînor û ne temam be û di rewşeke ku neyê sepandin de be, yê rê li ber pêva- joyên ku Ewropa weke Bosna, Kosovo û Makedonya bilebikîne ve- ke. Dema ku tevkariyeke bi erênî bike, Yê bike ku koçberiya Kurd a zêde raweste, Çalakiyên kurdan li Ewropa yên protestoyî yê ra- westin, yê pireke dostaniyê di navbera Ewropa û Rojhilata Navîn de were damezrandin. Li qasî tevkariyeke ku li têkiliya dostanî ya çanda di navbera Rojhilat û Rojava de bike, bi taybetî yê dewsên di van dused salên dawî de yên Ewropa ku bi polîtîkayên mêtingeh- karî pêkanîbûn tine bike, yê bibe xwedî erkek ku di navbera xiris- tiyantî û îslamtiyê de lihevkirinekê çêbike.

Ji ber van hemû sedeman di derbarê parêznameya xwe ku min pêşkêşî DMME kirî de, min ev yek bingeh girt ku ez, di çarçova şa- ristaniya dîrokî de herênaya Rojhilat û Rojava, têkiliyên bingeh ên di navbera Rojhilata Navîn û Ewropa de dahûrînim û pêşvebibim. Dîsa min xwest mijara têkiliya Tirk-Kurd ku bi Ewropa re tekiliye- ke pirsgirêkî ye, hinekî vekim. Min bawerkir ku hiqûq, encex di bin ronahiya van rastiyên siyasî, dîrokî û çandî de bêhtir were fêmkirin û rola xwe bilîze. Herwiha çiqas ku dirêj û bêtêkilî were dîtin jî, min hêvî kir ku DMME yê vê yekê bi têgihînî pêşwazî bike. Di vê beşê de jî, di derbarê hiqûqê demokratîk ê YE de, bê pêwîst e çawa li doza me û pirsgirêkên gelê me

were sepandin, ezê raman û nêrî- nên xwe bînim ziman.

**1- Çêbûna Hiqûq û Pêşveçûna Wî**

Bi ketina qada hiqûq re, ez pêwîst dibînim ku ez çi ji vê têgînê fêm dikim, terîf bikim. Hiqûq rêzikên nava civakê ku rîayetkirina wan bi hêzê tê pêkanîn e. Gengaz e ku ev rêzik peyvkî an jî nivîskî bin. Di demên ku civak ji eşîr û qewman pêkdihat de, ewqasî ji hi- qûq nayê behskirin. Li rêzikên em bi tore binavdikin ku zagonên xwezayî ne, jiber xwe ve tê rîayetkirin. Navê tore yê din sinc e. Cu- dahiya di navbera sinc û hiqûq de, yek jê bi hêzê tê meşandin û bi mueyîdeyên ku berî tên zanîn tê sepandin, sinc jî beyî ku hêzek we- re bikaranîn ji berxwe ve dimeşe.

Hiqûq herî bêhtir bi çînçînîbûna civakê re, bûye sîstema rêzikan a ku ji lihevnekirinên derdikevin holê re li çareseriyan bigere. Li kevalên kevir ên curbicur ten nivîsandin û hewl tê dayîn ku hem- welatiyên dewlet-bajar, ji berê de bi van rezikan bizanibin. Herwi- ha di berdewamiya sazûmanê de hêsanîbûn tê pêkanîn. Hê di zayî- na wê de tê dîtin ku hiqûq du qadan birêkûpêk dike. Hiqûqê ku sa- zûmana hundirîn diyar dike û têkiliyên bi hemwelatiyan re dadihû- rîne yê bi navê hiqûqê giştî, hiqûqê ku rêzikên bingeh ên tevgera di navbera hemwelatiyan de diyar dike jî, hiqûqê kesan e.

Çavkaniyên zayînê, bigiranî viyana ku dewletê dertîne holê û serdestiyê dike ye. Ev qeran be û meclisek be jî, derûna wê ya çînî naguherîne. Tê dîtin ku, toreyên kevin jî bi civaka biçîn re, weke çavkaniya rêzikên hiqûq tên nirxandin û çavkaniyeke gi- rîng derdixin holê. Derdorên zanyar ku bi hiqûq re têkildar jî, rê- zikan çêdikin. Cama viyaneke derveyî ya cuda jî ku rêzikan da- tîne, weke çavkaniya hiqûq rolê dilîze. Dema ku siyaset an jî temsîlkerê wê qeran xwe bikin xweda, fennanên wan weke hiqû- qê xwedayî te nirxandin. Di vê rewşê de fermanên xwedê, dibi- ne kalanê ku viyana siyasî ya teqezbûyî dikişîne xwe. Hiqûqê xwedayî di bingeha xwe de, hiqûqê ku herî ne wekhev e. her pey- va xweda-qeran ku nayê nîqaşkirin û lihevkirin û hemû hêz li xwe dayîn hev, di nirxê zagonan de kirarî (muamele) dibîne. Her- wiha weke çavkaniyeke hiqûq a bitenê tê pejirandin. Vê pêvajo- ya ku bi sumeriyan re destpêkirî, di demeke kin de dexma xwe li hemû

şaristaniyê xistiye, bi taybetî di bin navê hiqûqê xwedayî de, birêvebirina civakên Rojhilat ji aliyê serdestiya qeran a teqez ve, bi xwe re aniye. Ev gengaz e ku weke şêweya hiqûqê herî paşverû, hiqûqê xwedayî were nîşandan. Lewra taybetiyên vî hi- qûqî ne yê toreyî û nejî yê lihevhêner hene. Serdestiya qeran a ku di nava civakê de li qasî xwedê tê bilindkirin, weke çavkaniya bi- tenê dibîne. Di paşveçûna civakên Rojhilat, di şêweya rêveberi- ya despotîk û di pêşveneçûna hêsan a demokratîkbûnê de, bando- ra têgihîna vî hiqûqî roleke mezin dilîze.

Zayîna hiqûq ya bingeh, BZ di salên 750an de, bi civaka Ro- ma ku vediguhere dewlet-bajar, destpêdike. Hiqûq ji serî de ji vi- yana qeran zêdetir, ji aliyê konsulên ku weke temsîlkerên gel ha- tin hilbijartin ve, tê çêkirin. Viyana qeran jî hiqûq derdixe holê, lêbelê ji destpêkê ve weke pêdiviyekê, rêvebirina gelê Roma bi rêzikên ku ji aliyê nûnerên wan ve tên çekirin, bingeh e. Heta bi dema Imperetorê Roma Rojhilat Justinyen (PZ 565), yê dexma xwe li serdemê dayî, hiqûqê Roma ye. Di gelek pêvajoyan re der- basbûye û weke bingeha hiqûqê hemdem jî erk dîtiye. Aliyê wî yê girîng ev e ku, hiqûq bi çavkaniya xwedayî nabîne, ji aliyê hemwelatiyan ve weke hiqûqekî bi rewişta laîk tê pêşvebirin. Di bingeha serdestiya şaristaniya Rojava ya li hember şaristaniya Rojhilat de, cudabûna tegihîna di navbera van hiqûqan de rolê di- lîze. Hiqûqê laîk, hişmendiya hemwelatî û takekesîtiyê pêşve di- be, takekesê hemwelatî li hember civak û dewletê bêhtir diparê- ze û bihêz dike.

Hiqûqê serdema navîn, di civakên Rojhilat de derawaye xwe ya bi çavkaniya xwedayî dide berdewamkirin, di civakên Rojava de, çînên nû viyana xwe li serdestiya qeran ferzdikin û jibo bidin peji- randin, destpêkên nû didin destpêkirin. Ji sedsala 13an û pêde bi Magna Charta, ji viyana çîna burjûva ya civakê ku nû pêşvediçe re, pêşevaniyê dike. Hiqûq kevneşopiya Roma dida berdewamkirin. Di civakên Rojhilat de, nûbûneke hiqûqî ku derketineke viyanî ji- bo hêzeke civakî ya nû temsîl bike, pêknayê. Deriyê 'îçtîhad' ê şî- rovekirineke cuda ku hiqûqê heyî pêşvebibe jî, hatiye girtin. 'Şerî- at'ji daxuyana viyana yekalî ya monarşiya hiqûqî pêde, nayê ti va- teyên din.

Di hiqûq de mijara herî girîng ev e ku, hêzeke civakî an jî tevge- rek, zorê li statukoya heyî û li sazûmana zagonî bike û cîhekî ji xwe re

çêbike. Hêzên ku viyana xwe li zagonan venedin, heger ku kir- yarî hebin jî, yê bi awayek fennî ji xwedîbûna mafan bêpar bin. Bi-zagonkirina mafan, ango daxuyana viyana azad a takekes û civa- kan, di hemû sîstemên hiqûq de di serê hemû pirsgirêkan de tê. Rê- ya bingeh a çareserkirina nerihetiyên civakî û çalakiyan, gihandina van a îfadeyên zagonî ye. Ev rê, demokratîkkima hiqûq e.

Serdestbûna şêweya hilberîna kapîtalîst, damezrakeke civakê ya pir aloz derande holê. Pevhatina (lêhatin) çîna burjûva ya pêşeng bi hiqûqê kevin monarşîk û feodal re, ne gengaz bû. Burjûvazî jibo ku hiqûqê xwe bafirîne, hiqûqê Roma ji nû ve zindî kir. Bi taybetî hi- qûqê şannendî (medenî) nûjen kir. Weke bingeha hemû sîstema za- gonî, pêvajoya tevgera zagona bingehîn da destpêkirin. Jibo her dewleteke neteweyî, zagoneke bingehîn a cuda bû annanceke bin- gehîn. Zagonên bingehîn rola dawera veguherînên civakê yên nû, dilîstin.

Hemdemî, di heman demê de serdestiya hiqûq îfade dike. Di qa- da neteweyî û navneteweyî de, meyla bihiqûqîkirina berfireh û ne- hiştina têkiliyên bêrêzik, serdest dibe. Demokratîkkirina rejhnên si- yasî, bingeha hiqûq jî fireh dike. Demeke nû ya ku ewleyiyê dide hemû mafên hemwelatiyan, weke mafê mirovan derdikeve pêş. Te- rîfkirina şaristaniya Rojava ya nû, bi navê serdema hiqûqê demok- ratîk tê binavkirin.

**2- Di Çareserkirina Pirsgirêkên Civakî de Rola Hiqûq**

Di pêvajoya dîrokê de hemû pirsgirekên girîng, bi rêyên siyasî û leşkerî dihatin çareserkirin. Bihêzbûna çina leşkeran a zêde, bi vê rastiyê ve girêdayî ye. Yê maf diyar dike, hêza leşkerî ye. Ya ji si- yasetê re dimîne ev e ku, li gor hêza xwe ya leşkerî encamên herî baş bi destbixe ye. Di civakê de jibo dadê, derbasdariya hêmaneke gerdûnî ne dabaşa xeberdanê ye. Dad bi şûr tê diyarkirin. Hiqûqê hemdem, bi şerê li hember ve têgihînê pêşveçû. Girêdana leşkerî û siyasetê ya bi hinek rêzikan ve, serkeftina pêşveçûna hîqûqê hem- demî ye. Di serî de NY û YE saziyên girîng ên navneteweyî, mîna- kên geş in ku hiqûq ji sînorê neteweyî derbasdibe û bûutên gerdûnî qezenc dike. Evan bêhtir sazûmaneke cîhanê ya ewlekar û bihedarî (aramîdar) hêsan dikin.

Edî hiqûq him di sazûmana neteweyî û him jî ya navneteweyî de, di

çareserkirina pirsgirêkan de berî siyaset û leşkeriyê tê. Lêgerîna çareseriyê di nava hiqûq de ya heta bi dawiyê, tê rewşa rêbazeke rêveberiya hemdem. Serîlexistina rêyên siyasî û leşkerî û dûrgirtina derfetên hiqûq a ji ber çavan, weke şaşbûneke cidî ya rebazê tê nirxandin. Ya rast jî, di hemû rewş, bûyer û tekiliyên ku pirsgirêkan derdixin holê de, zorlêkirina hiqûq a heta bi dawî ye. Heger rêya vê neyê dîtin û rêya hiqûq bitemamî girtî be, wê hingê rêyên leşkerî û siyasî yê rewa bin.

Bi taybetî welatên Ewropa ku di serdema nêzîk de, şerên olî, ci- vakî û neteweyî yên mezin jiyane, piştî herdu şerên cîhanê, li ser sîstema hîqûqê demokratîk bi awayek sift rawestiyan. Jibo pêşîlê- girtina dijminatiyên siyasî û şerên ku rê li ber wêrankerî û êşên mezin vekirî, jibo pirsgirêkan veguhêzin deravên (rêav) çareseriyê yên bêxwîn, pêdivî bi hiqûqekî pêşketî heye. Taybetiya herî girîng a hiqûqê Ewropa yê hemdem ev e ku, tenê pêşxistina asa (norm) yên hiqûq bi têrayî nabîne, bi têgihîneke hiqûq a dînamîk çarese- riya her bûyera ku derdikeve holê, bi hîqûqê erênî ji berê de pêk- tîne. Digel vê yekê, rola hiqûq a bingeh ev e ku, ne dewletê li hem- ber hemwelatî biparêze û xurt bike, berevajî vê hemwelatî li hem- ber hêza dewletê bi mafên bigeh ên xurt bi arastin bike û biparêze.

Yê ku hewceyî paraztinê ne dewlet e, takekes e, hemwelatî ye. Sa- zûmana ku hê pêşvetir diçû, ji ber çavan dûr dixist û di tepisandi- na wî de ti pirsgirek nedidîtin, êdî di parastina çandan û hindika- yiyan a di wergiriya bingeha hiqûq de, hestyariyeke mezin nîşan dide. Pirsgirêka hindikayî û heyînên çandî, çiqas ku diçe bêhtir di zagonan de bi berfirehî cîh digire û pêdiviya çareserî bingeh tê gir- tin. Herwiha dema kevin, gelek bûyerên civakî yên ku dibûn bin- geha serhildan, şer, dijîtiyên civakî û dijminatiyan, di wergiriya hi- qûq de cîh digirin û digîhên amûrên çareseriyê yen pêdivî. Ev nê- zîkayî jiberku civakê bi tevayî digire nava xwe û bi hiqûq bi awa- yek berfireh hatiye arastin, bi sîstema hiqûqê demokratîk tê binav- kirin. Ev encama ku Ewropa bi ezmûnên dîrokî gihîştiyê, ji teva- ya cîhanê re dibe mînak. Li Ewropa îfadeya sîstema hiqûqê de- mokratîk ê berbiçav, PMME û saziya wê ya sepînê DMME ne. Çû- yina ber bi zagona bingehîn a Ewropa jî, di rojevê de

ye. Di nava vê nirxandina dîrokî ya kin û terîfkirina hiqûq a hemdem de, ne- zîkbûna li pirsgirêka Kurd û di rêya çareseriya hiqûq de, nirxandi- na weke derfetekê hêsantir dibe.

### 3- Hiqûqê Ewropa Komara Tirkiyeyê û Pirsgirêka Kurd

Komara Tirkiyeyê, bi nakokî û têkiliyên bi Ewropa re derketiye holê. Kemalîzm a weke hemana damezrîner, nimûnekek şaristani- ya Ewropa ye. Mistafa Kemal, heyranekî şaristaniya hemdem e. Peymana ku komar derandî holê, bi şanenavên dewletên Ewropa yên sereke ku hatiye pesendkirin, Peymana Lozanê ye. Komarê ji aliyê felsefe û damezrakî ve şaristaniya Rojava ji xwe re kiriye rê- ber, gelek deqên (nivîsar) hiqûq weke xwe veguhastine binyata xwe. Ji pêncîhsalên dawiya sedsala 20an û pêde bûye endamê rê- xistinen bingehîn. Endameke leşkerî ya NATO ye. Di sala f950an de ketiye Konseya Ewropa ya ku rêxistineke siyasî ya bingeh e. Ji aliyê aborî ve endameke OECD ye. Hê jî berendameke YE ye.

Tirkiye herçiqas ku xwedî gelek mercên teşeyî yê demokratîkbû- nê ye jî, di gavavêtinên pêdivî yen di warê derûna demokrasî û hi- qûqê wê de, helwestên kevneperest nîşan dide. Dixwaze bi komar- parêziya sedsala 19an berdewam bike. Ev rewş rê li ber lihevneki- rina wê ya bi Ewropa hemdem re, vedike. Kartêkera bingehîn a di bin vê yekê de jî, tirsa wê ya ji pisgirêka Kurd e. Vê tirsê heta we- ke îro, an bi mandelekirinê, an jî bi rêbazên tepisandinê pirsgirêkê xistiye nava neçareseriyê. Herwiha guman kirine ku bi vê tirsê yê pirsgirêk çareser bibe. Lêbelê bi teqîna çalakiyên di bin pêşevaniya PKKê de, pirsgirêk bûye mijara rojevê ya bingehîn. Ji ber neçare- serkirinê jî, hemû pirsgirêkên Tirkiyeyê jî bi xwe ve girêdane û rê li ber qeyranekê vekiriye ku nikaribin ji nav derkevin. Digel êşên mezin, koçberkirin û mirina zêdeyî 40 hezar mirov, hê jî pirsgirêkê bi israr weke ‘pirsgireka terorê’ dibîne û nakeve nava wê. Ev rewş veguheriye pêvajoya Komara Tirkiyeyê ya herî giran ku hemû qad girtine nava xwe û ketiye rewşa qeyranê. Pirsgirêka Kurd an ji ali- yê komarê ve yê were çareserkirin û bibe sedema pêşveçûnê, an jî yê bibe sedema di nava lîtavê de bigevize û birize.

Qeyrana Tirkiyeyê ya 2000an, ji tê zankirin bi gelekî bêhtir kûr û berfireh e. Aliyê wê yê darayî, jiberku çîna navîn jî girtiye nava xwe û dihejijîne, dibe mijara çapameniyê. Jiberku berdevkên vê pir in, dibe sedema ku weke pirsgirêka yekem were xebitandin. Aliyê qeyranê yê darayî, tenê parçeyek ji yê tengava gelemper û qeyranê ye. Ji aliyê din ve ne sedem e, qeyraneke encamê ye. Digel ku bi mehane desteka darayî ya ji tevaya cîhanê tê girtin jî, berdewamki- rina wê ya bi girantirîn, rastiyê derdixe ku qeyrana encamê ye.

Ev rewşa Komara Tirkiyeyê, gelekî dişibe qeyrana darayî ya os- manî ku di 70 salên dawiya hnperetoriyê de ketibûyê. Jiberku di de- ma xwe de û bi dînamîkên nava xwe nûsaziyên puxtedar ên pêdivî pekneanîn, Daxistina Selhnê sêyemîn a bi zorê û nûsaziyên Mah- mûdê duyemîn ku serveyî mabûn, ji aliyê din ve şerên ku bûne se- dema windakirina hêzê, rê li ber berdana fersendeke dîrokî vekiri- ye. Di van salan de li Ahnanya û Rûsya nûsaziyên ku di binyata hn- peretoriyan de hate jiyandin, encamên serkeftîtir dabûn. Rewişta Siltan Malnnûd a zorkerî (zorbaşî) û bandomegirtina wî ya ji çan- da Ewropa, bi hindikayî derfet nedaye veguherîneke bi şêweya Ja- ponya. Di dema Siltan Mecîdê ku di peywî re hatî de, bi awayek lezgînî îlankirina Fennana Tanzîmatê, jiberku ji jidilî bêpar bû û di- şibiya merîfeta çend burokratên roja me, encamên payîdar nedane û rê li ber veneguherîna împeretoriyê vekiriye. Yekem car bi şerê Kirimê ketiyê pêvajoya deyndarbûnê. Li hember Ewropa eynî we- ke îro, nûsazî ne jibo berjewendiyên gel û welat, jibo diravan bibî- nin weke keysê hatiye bikaranîn. Ev yek tiştekî xwezayî bû ku tê- gihîneke nûsazîparêziya bi dirûtî û jidilîtiyê dûr, jevketin û tenga- viyê kûrtir bike. Nûsazî ne jibo çareseriyê, jibo torpîlê tên çêkirin. Weke ku bibêjin ‘Çiqas dirav ewqas nûsazî’. Di vê rewşê de jêne- rev e ku encam ê îflas û jevketin be. Jibo pêşîlêgirtina jevbelavbû- nê, digel pêkutiyên Evdilhemîdê duyem, hinek veguherînên ji mec- bûrî jî, pêşî li jevketina hnperetoriyê negirtiye. Aqûbeta Yekîtîxwaz (îtîhadparêz) ên ku bi heman polîtîkayê hereket dikirin û netewepe- restên zêdekar jî, bû weke ya wan. Ji ber ve yekê jî ‘Duyunu Umu- miye’ ya ku weke saziya îflas û jiholêrakirinê ketî dewrê û IMF ya îro bi heman rengî ne.

Mercên damezrandina komarê û kesayetiya M. Kemal, herçiqas ku ji

jor ve û bi giraniya burokratîk be jî, di dwelet û civakê de rê li ber nûsazîparêziyeke tundraw vekiriye. Ev nûsazîparêzî, ji aliyê dîrokî ve, pêngava herî tundrawe ku di civakên Rojhilat de tê dîtin. Lêbelê piştî şerê cîhanê yê duyemîn, di pêvajoya ku ketinê de, ji dêvla kûrkirina nûsaziyên civakî û veguherîna ber bi demokrasiyê, çetirgirtina sazûmana olîgarşîk rê li ber şensê nûsaziyên payîdar ên komarê girt. Taybetiyên zagona bingehîn a 27ê Gulanê yên nûsazî- parêz, bi vebizavên çîna olîgarşîk ên tund û pêşkarîkirina levdana çep û rastan, vala hatiye derxistin. Eynî weke deyndarbûna Osmanî ya piştî sala I856an, piştî sed salan dîsa dibin venêrana IMF de, bi 18 peymanan polîtîkaya deyndarbûnê ku ketine nava wê, bûye po- lîtîkayeke mecbûrî. Piştî vê demê, bemameyên guherînê yên sosyo- ekonomîk ku ketine navê, ji ber bi demokrasiyê re lihev nayên û bi guman û weke lîstikeke siyasî tê nêrîn, pirsgirêk û levdan zêdebû- ne û şensê bûyina komareke demokratîk û laîk a Rojavayî hatiye windakirin. Di sala 2000an de, ketine qeyraneke berfireh ku li he- mû aliyan rizîbûn, îflas û xitimandin derketiye holê.

Tirkiye êdî li hember herênayekê ye ku nikaribe êdî xwe tevbi- de. An yê çêtirgirtina xwe ya şaristaniya demokratîk a hemdem di xêzika YE de pêkbîne, an jî yê vebijarka xwe ya şaristaniya demok- ratîk ji stratejîkbûnê derêxe, yê bîne rewşa amûreke taktîk ku cama li gor karê xwe bikarbîne. Eynî weke ji dema Tanzhnatê ve, yê li hember Rojava derawaya xwe ya stratejîk bazar bike, di bin sazû- maneke bêesil de lihevbikeve û here. Bi vê rewşê, êdî nikare weke kevin lîstikên demokrasiyê jî bilîze. Di dorhêla qeyranên hişktir de, pêvajoyeke bi levdan yê jênerev bibe, yê bikeve rewşa Yûgoslaw- ya kevin, Iraq, Kore, Pakistan ûwd. Lêbelê rastiyên jeo-stratejîk, pirsgirêkên siyasî û sosyo-ekonomîk ên giran ku dijî, vê rewşê de- meke dirêj hilnagirin. Herwiha veqetîn û biencambûna xêzka YE û ya dijî wê, gihaye merhaleyeke jiyanî. Her roja ku çareseriyê paş- ve davêje, windabûnek e. Tirkiye ji ber sedemên berfireh, di vê çar- çove de pêwîst e ku çêtirgirtina xwe bike.

Vateya çêtirgirtina YE ya rojane, sepandina krîterên Kopenhag in. Ev yek jî bi biryardayina di asta dewlet û civakê de, bi derbas- bûyina sazûmana demokratîk a bi temamî û lihevkirî yê gengaz be. Tirkiye ji ber tiralî û statukoya ku di pevajoya dîroke de hînbûye, vê biryarê nade. Herwiha danehevên heyîn beradayî diçin. Rewşe- ke ku xwe bi xwe hildiweşîne tê jiyandin an jî lê tê ferzkirin. Ev rastbînî ji aboriya rantê û pêve girêdayî ji şerê sift ê daketî tê. Agir- besta PKKê ya yekalî, nayê vateya ku şerê sift ê daketî qediya ye. Tê vateya cemidandinê. Sazûman weke xwe berdewam dike, heta ku sazûman jevnekeve jî, di nava pîvanên nonnal de dest navêjin ti pirsgirêkan. Çiqas ku dest nayê avêtin jî, bi bandorên zincîrkî li her qadê vedide û vediguhere qeyrana civak, aborî, siyaset, dewlet û bîrdoziyî. YE bi vê rewşê ne Tirkiyeyê dipejirîne û ne jî vederdike. Vederkirina Tirkiyeyê, ji aliyê stratejîk ve yê rê li ber gelek neyîni- yen ku neyên kontrolkirin veke. Li Balkanan, Kafkasan û Rojhila- ta Navîn, gelek pirsgirêkên din ê tevlî pirsgirêkên heyî bibin û dor- hêla aloz û levdanê yê lezgîn bibe. Herwiha YE bi tolerans nêzîk dibe, lêbelê jiberku Tirkiye gavên tevlîbûnê navêje, di çareserkiri- na pirsgirekan de rola bandorker nalîze. Hêzên Tirkiyeyê cîgeyî yên şoven û neteweperest, di vî derbarî de bi kevneperestiyeke ti- mam xitimandinê

bihez dikin. Di dibêtiya dorhlêke levdan û alozi- yê de li hêviya bihezbûneke siyasî ne, bi levdanê xwe xweyî dikin û hewl didin ku derawaya xwe ya di nava dewletê û civakê de bi- hêz bikin. Demokratîkbûna di xêzka YE de, weke bidawîbûna po- lîtîkaya xwe dinirxînin.

Di bişidetbûna vê qeyrana dawî de, para têgihîna nûnerên nete-weperestî ya hindikayiyên Tirk ên cîgeyî û ya veavabûnan diyarker e. Evan hê jî di pey Enverparêziyeke dereng de ne. Herçiqas ku navtêdanên siyasî yên olperest jî, di vê kevneperestiyê de bûbin xwedî par, bi veqetînên van demên dawî û guherînên bîrûbawerî û sexbêrî yên ber bi demokrasiyê, weke pêşveçûneke erênî tên dîtin. Helbet ev meyldarî jibo yên li derî bîrûbaweriya takiyeperestiyê derbasdar e. Bîrûbaweriya Kemalîst ku xwe di warê şaristaniya de- mokratîk de nûjen nake, weke kêmasiya herî girîng tê dîtin û jibo komarê weke asêyiya (handîkap) herî cidî rolê dilîze. Partiyen olî- garşîk ên rantê qedandineke bi timamî dijîn, civak bilezê ji van dûr- dikeve û ev di bin bandavê de li herî jêr dikevin.

Heta bi van demên nêzîk bi awayek kevneşopî, Tirkiyeyê di de- mên wiha de, bi ketina artêşê ya dewrê re hewl dida ku ji tengavê derkeve.

Lêbelê konjonktura der û hundir û hevkêşeyên piralî, gavavêtinên artêşê gelekî xeter dikin. Artêş niha qhna xwe bi venêraneke hişk û hişyarkirinan tîne. Ev nayê vateya ku artêş westar û nehestyar e. Be-revajî vê, artêş di her mijarê de xwedî lekolînên berfireh, plan û di-yarkirina polîtîkayê ye. Weke partiyeke postmodem stratejî û taktî- kên kûr ên li gora xwe disepîne. Li derî danezanan, lîstika bi awayek vekirî berbihev nabîne. Ev hemû rastbînî, cudahiya rewşa Tirkiyeyê ya ji Arjantîn, Brezîlya û Endonezya datîne holê. Venêrana navnete- weyî ya di ser DYA û YE re jî, ji vê rastbîniyê tê. DYA hewl dide ku pêşî li hilweşîna aborî bigire û wê bi xwe ve girêbide, YE jî dixwaze ku bi aboriyê re daneheva demokratîk a heyî ji belavbûnê rizgar bi- ke û di destê xwe de bigire. Ev nêzîkbûn heger ku bisînor be jî, li ser Tirkiyeyê rê li ber qayîşkêşiyeke DYA û YE vedike.

Li Tirkiyeyê heyîna hêzên alîgirê YE yê piçûk nayên girtin. Ev hêz di van demên dawî de hewl didin ku bibandor bibin. Yekem car derdorên senniyan di serî de KPKT (Komela Pîşesaz û Karsazên Tirk-TUSIAD),

mecbûr dimînin ku çêtirgirtinên xwe yen demokra- tîk diyar bikin, heta di vî warî de ji sendîqayên karkeran ên hevkar bêhtir xwedî gavên pêşve ne. Çepgiriya ku berpirsiyar e altematî- fên kedkaran pêşvebibe, hê ji bandora sosyalîzma reel û netewe- perstiya cîgeyî demeketiye. Demokrasiyeke civakî ya hemdem û navendeke rastê a lîberal hê bi awayek vatedar çênebûne û valahi- ya heyî danegirtine.

Li hember van rastbîniyan ketina Tirkiyeyê ya rêya demokrasiye ne bêderfet e. Berevajî vê cara yekem, mercên der û hundir zorê li vebijarka demokrasiyê dikin. Herwiha xwedî şensekî bilinde ku ji vê qeyranê bi pêngaveke demokratîk derkeve. Êdî dibe xwedî der- feteke ku li sîstema hiqûqê Ewropa yê demokratîk jî rûne. Di vî derbarî de Tirkiye ji aliye danehevê ve bihêz û dewlemend e. Pirs- girek ev e ku xalên krîtîk werin derbaskirin. Weke ku xweş tê za- nîn, pirsgirêka herî krîtîk di derbarê kurdan de ye. Pirsgirêka Kurd ne tenê di nava xwe de, li tevaya Tirkiyeyê û di nava damezraka pevrayiyê de, serî dêşîne û agir dide hemû pirsgirêkan. Kevneşopi- ya rastgir û neteweperestên Tirk pejirandina kurdan a bi têgînî jî, bi xiyaneta li welat re weke hev digirin. Heyîna kurdan a peyvê jî, we- ke cudaxwazî û gefa li ewlekariya neteweyî tê dîtin. Di van nîqa- şên dawî de, ev rastbînî bi awayek vekirî derketiye holê.

Helbet bi vê bîrûbaweryê, cîhgirtina di nava demokrasî û hiqûqê YE de, ne gengaz e. Mafê Kurdan ê herî hêsan, perwerdeya bi zi- manê zikmakî û derfetên çapemenî û weşanê jî nayên dayîn. Gelek derdor derdikevin holê ku van mafan di nava cudaxwaziyê de dinir- xînin. Heçku li Iraq û Iranê yên ku ji standardên demokrasiyê ge- lekî dûr, perwerdeyî û weşana Kurdî ji mêjde destpêkiriye. Di vî babetî de Tirkiye, dikeve derawaya welatê ku ji sazûmana Rojava re herî biyan. Dema hate fêmkirin ku taktîkên neteweperestên şo- ven ên ku kurdan daqûrtînin nagirin, êdî polîtîkaya ku xwe lê dipê- çin ‘gefa li ewlekariya neteweyî’ ye. Herwiha ev têgihîn bi xwe, pirsgirêkek e ku birihetî were çareserkirin, xwe bi xwe dike çavka- niya gef û gura yekemîn. Heger hûn gelekî di navenda Rojhilata Navîn de yê herî kevnar mandele bikin û bi hemû şêweyên rêbazî jiholêrakirina wî weke peywireke neteweyî bibînin, jênerev e ku Kurd werin rewşa çavkaniya gef û guran.

Sazûmaneke çewsandinê ya di cihanê de mînakên wê nebin ku heta bi qedexekirina ziman çûyî, diyar e ku timî yê dorhêla şidetê û cudaxwaziyê hilberîne. Tir- kiye weke ku ketiye xefka derdorên ku bi zorê bangî amûrên bîrû- baweriya cudaxwaz û şidetê dikin. Eslê wê ev derdor teng e. Lêbe- lê jiberku jiyana xwe ya kevneşopî û hêza xwe bi vê yekê ve girê- dane, di nava xwe de bi rêxistinbûneke asê û bawerhişk e. Di warê xitimandinê û astengkirina gavên bipêşve, hosta ye.

Di dîrokê de gelek mînakên vê sexbêriyê hene. Kûştinxwaziya Turgut Ozal, mirina wî ya bi şik û ezmûnên kûştinxwaziya Bulent Ecevit, kûştinên kiryarên wan nediyar û hewldanên ku dorhêlê timî nexweş bihêlin, bi van hêz û derdoran ve girêdayî ne. Wekehevki- rina van û artêşê û dewleta tarî (kûr), şelipîner e. Berevajî vê, dema ku ev di nava artêşê û dewletê de bihêz bin, ji pekanîna faşîzmeke bêhempa paşde namînin. Van hêzan siyaset û civak teslhn girtine. Kêmasiya wan tenê, lawaziya wan a li ser hinek xalên dewletê yên nazik û li ser artêşê ye. Ji ber vê yekê jî, nîşandana hinekan a van xalên dewletê yên nazik, artêşê û van çeteyan a di nava hev de, şe- lipîn û şewşandinên mezin in. Di vê xalê de herdu derdorên dijber, di dahûrandina dewlet û artêşê ya rast de, peywira perdeyeke mijê dibînin, dhnenekî rastiyê yê xumamî dide.

Jiberku Tevgera Azadiya Kurd, demeke dirêj stratejiya xwe ya aştî û lihevkirina demokratîk nexistiye dewrê, bi awayek berbiçav rê li ber bihêzbûna van derdorên antîdemokratîk, şerxwaz, olperes- tên cîgeyî û neteweperestên zêdekar, vekiriye. Ev yek ji kêmasiya hewldanên aştî û lihevkirina demokratîk a hêzên çepgirên demok- ratîk ên Tirk ku dihat hevîkirin, tê.

Sexbêriya PKK ya agirbesta yekalî ku bi pêvajoya Îmralî bêhtir hate pêşvebirin, derdoren ku bi aboriya rantê girêdayî xistine vala- hiyekê, derbeyek li rola wan a ku demeke dirêj welat cemidandin û

rehîn girtin da. Digel hemû navtêdanên wan jî, bi israrbûna di vê helwestê de, ev hêzên fennî û nefennî yên ku di nava dewlet û ci- vakê de bipiyaketin, bêerk hiştine. Ev derdor ji banga şer bi away- ek israr ne qeriya ne. Lêbelê dema borî esehiya wan derandiye ho- lê, bê çima dixwestin dorhêla levdanê zindî bigrin, dema ku rola wan a di nelirêtî û ya di ranta aborî de zelal bû, bilezgînî ketine de- rawayeke cihêgirtinê. Edî vê demê derfetên nîqaşkirina rastî û pirs- girêkên Tirkiyeyê derketine holê. Hatiye dîtin ku di pirsgirêka Kurd de lihevkirina demokratîk gengaz e, hatiye fêmkirin ku ewlekariya neteweyî ya rast di çareseriya demokratîk a pirsgirêka Kurd re der- bas dibe. Ev pêşveçûnên ku veguherîneke tundraw nîşan didin, he- ger ku bi hêdika be jî, daniye holê bê rêya çareseriya pirsgirêkan bi çi ve girêdayî ye, bi awayek rast jî nîşan daye bê ev qeyrana ku kûr- tir dibe, yê çawa ji holê rabe.

Ev bûyer nîşan didin ku, di pirsgirêka Kurd de du helwestên dij hev, wateyeke dîrokî hildigirin. Di ketina Tirkiyeyê ya rêya hiqûqê YE û demokrasiyê de, çareseriya demokratîk a pirsgirêka Kurd ha- tiye rewşeke diyarker. Herwiha gihaye merhaleyeke wisa ku hiqû- qê YE yê, hê berbiçavtir PMME ji nêzîk ve têkildar bike. Sepandi- na PMME, di çareseriya Tirkiyeyê ya pirsgirêka Kurd de û derbas- bûyina demokrasiyê de, girîngiyeke jiyanî pêşkêş dike. Bi vateye- ke din pirsgirêk dikeve rêya çareseriya hiqûqî. Herwiha mafên kur- dan ên zagonî ku bi wan werin dan, yê tevkariyekê li YE û Tirkiye- yê di ketina pêvajoyeke rihetkirinê de bike. Berevajî vê heger ku PMME neyê sepandin, welatên YE yê di serî de bi hêza Kurd û ge- lek pirsgirêkan re yê rûbirû bimînin, yê Tirkiyeyê jî bikişîne dorhê- leke levdanê û bi hemû aliyan ve ji hiqûq û demokrasiyê dûr bike. Encamên ku derkevin holê yê ji pirsgirêkên piştî jihevketina Yû- goslawya xirabtir bibin.

Çawa ku YE pirsgirêkên Bosna, Kosovo û Makedonya digire ro- jeva xwe, Di wê rewşê de ye ku pirsgirêkeke Tirkiye ya ku endama gelek rêxistinan, li gor PMME bi annanca çareseriyê rojane bike. YE heta niha du standardî sepandiye, ji ber sedemên siyasî hiqûqê xwe nesepandiye. Vê nêzîkayiyê, Tirkiye di derbarê hiqûq û de- mokrasiyê de nehestyar kiriye. Desteka herî sûdmend ku yê jibo Tirkiyeyê were kirin, gavavêtina di warê dewleta demokratîk a hi- qûq de ye. Rola ku di vî

babetî de PMME û DMME dilîzin bisînor e. Tirkiye ya ku di derbarê dozên kurdan de tenê tazmînatan dide û li gor pêdiviyên peyman û biryarên dadgehan, di zagonên xwe de ti guherînan çênake, herênayeke hiqûqî diderîne holê. Heçku pêwîst bû ku ji hezaran dozên Kurd, hinek encamên hiqûqî yên girîng bi- hatana dîtin. Pêdivî bû ku di jinavêrakirina kemasî û hinek xalên antîdemokratîk yên di nava hiqûqê Tirkiyeyê de, helwesta bi israr û encamgir hatiba nîşandan. Bi taybetî di vî warî de, Konseya Ew- ropa ku ji sepandin û lêmiqatebûna biryarên PMME û DMME ber- pirsiyar, di derbarê Tirkiyeyê de helwesteke pir bi tolerans nîşan di- de, pirsgirêkê nakişîne rêxistinên têkildar û bi giranî dest lênagerî- ne. Li Kurdistanê nêzîkî 4000 gund û mezrik hatine valakirin. Be- şeke mezin ji wan bi awayek bêzagonî hatine ruxandin. Ev bi te- mamî nelêyî PMME ne. Jixwe DMME di derbarê gelek ji van gun- dan de biryar dane. Ev yek jî nîşan dide ku, ev pirsgirêk ne takekesî ye, di wesfekî pevrayî de gel hemûyî têkildar dike.

Ev yek dide çespandin ku pirsgirek ji takekesî derketiye û giha- ye asta ku gel hemûyî tekildar bike. Di vî babetî de bikaranîna ‘te- rora PKK’ weke hêncetekê, ji aliyê hemanên hiqûqê demokratîk ve yê ne rast be. Ev yek mijareke di asta skandalekê de ye ku, bêma- fiyên li derba heyîna Kurdan tenê di wergiriya mafê mirovan de, bi awayek takekesî û bi çend hezar dolar tazmînatan di ser guhên xwe re diavêjin. Di PMME de, “Mafên sê nifşên bingeh” hatiye birêkû- pêkirin. Parçek ji yê van mafan jî, diyarkirina qedera xwe ya bi azadî û îfadekirina jiyana çanda xwe ya bi azadî ye. Ji aliyê kurdan ve di serî de ev maf û gelek mafên din ên bingehîn jî, nayên sepan- din. Rewşên ku bi awayek vekirî bi peymanê re nakok in bi berfi- rehî tên jiyandin. Kurd li derî hiqûqê tên hiştin. Ji aliyê takekesî ve hinekî digirine nava hiqûq, lêbelê ji aliyê gel û heyîna çandî ve ji hiqûq bêpar tê hiştin. Li ti welatên ku endamên Konseya Ewropa ev rewş nayê jiyandin. Hinek deman di Parlamentoya Ewropa de, bir- yarên ku di vê mijarê de hatine dan, ti caran cidî nehatine girtin.

Çawa ku li Tirkiyeyê Kurd tine tên hesibandin û encex weke tirkan dikevin wergiriya zagonan, ji aliyê hiqûqê Ewropa ve jî nêzîkayi- yeke bi vî rengî tê nîşandan. Ev nêzîkayiya ku em dikarin weke ‘bi takekesî

erê lê weke gel û çand na' fonnule bikin, diyar e ku nakokî hiqûq û krîterên demokratîk ê Ewropa ye.

Jiberku sicîla Tirkiye ya di vî warî de neyînî bi awayek cidî, di dema xwe de nayê nirxandin û biryarên pêdivî nayên dan, Him pirsgirêka Kurd û him jî qeyrana ku tê jiyandin bi kûrayîtir berde- wam dikin. Ev ji aliyekî ve polîtîkaya kevneşopî ya mêtingehkari- yê ku welatan bi taktîka pirsgirêkên di nava wan de bi xwe ve girê- didin, tîne bîra mirov.

Bi vê annancê, dema ku min parêznameya xwe pêşvebir, jibo ku ev nêzîkayiyên neyînî ji holê rabin, min pêşikî neda derawaya xwe ya takekesî. Li gor baweriya min, weke takekesekî vî gelê ku di rewşeke xetemak de ye, heyîna wî bitemamî tê mandelekirin, we- ke gelên hemdem nayê pejirandin û li derî hiqûqê hatiye hiştin, min tevlî wergiriya hiqûq bikin ev yê ne rewşeke lihevkirî be. Ez di vê baweriyê de me ku, heta mafên gelan ên bingehîn neyên nasîn, ma- fên takekesên wî gelî werin nasîn jî, ti wateya zêde îfade nake. He- ta pir xetemak e dema ku weke “ji aliyê hiqûq ve xwedîlêderketina endamekî rêxistina terorê ku li bêmafî rasthatiye'”nîşan bidin. Ev amûrbûna bêmafiyeke mezin a li ser navê hiqûq e. Di warê dozên bi kurdan re têkildar de, ev herênayên xetemak tên jiyandin.Li vir ev mijêr tên aqilan: Gelo hiqûqa Ewropa û demokrasiya wê naxwa- ze kurdan di wergiriya gel de bibîne? Heger dixwaze, helwesta ku di pirsgirêka gelek gelên bi vî rengî de nîşan dide, çima ji kurdan texsîr dike? Gelo kurdan weke aynaqagurî (sîsirkagurî) ku nijada wê diqele dinirxîne? Mafên ku hê ji mêj ve kirina nava hiqûq û di peymanên NY de jî zagonîbûne, yê kengî li kurdan werin sepandin? Pêwîst e ku bersiva gelek pirsên bi vî rengî were dayin. Dema ku li Strasbourgê dest bi lêkolîna doza min kirin, komek civaka gel ku di ser sed hezarî re, daxwazên xwe bi dirûşman gihande heta bi salo- nên dadgehê. Pêwîst e ku van dengan rastiyek anîbin ziman.

Ez di vê baweriyê de me ku, DMME dema dest davêje rewşa min, pêwîst e gelê Kurd û pirsgirêkên ku dijî li ber çavan bigre. Çavkaniyeke bingehîn a hiqûqê Roma ku bûye bingeha hiqûqê Ewropa jî, rêzgirtina ji toreya gelan ango ji heyîna wan a zagonî re ye. Hiqûqê Ewropa yê sedsala 20an, çênabe ku ji hiqûqê Ro- ma yê beriya 2500 salan paşdetir be. Heger bibe yê derûna xwe mandele bike.

Parêznameya xwe ku ez bi rastiya gelê Kurd a di pêvajoya dîro- kê de bê çawa pêşveçûyî ve girêdidim, ji ber girtina bersiva van pir- sên bingehîn, pêwîst dibe. Jibo ez bersiva van angaştên ku dibêjin cîhê kurdan di nava dîroka şaristaniyê de tine bidim, destavêtina min a dîroka şaristaniyê, gelekî girîg bû. Yên ku di pêvajoya dîro- kê de heyîna xwe terîf nekin, di roja me de jî xwe nasnakin û têko- şîna mafên xwe nadin.

Dahûrandina dîrokî bizanistî datîne holê ku, hemû şaristanî we- ke xelekên zincîrê bi hevûdin ve girêdayîne û xeleka dawî jî şaris- taniya Ewropa ye, ev yek yê suxreyê bike ku ne bi hestyarî birstbînî nêzîkî pirsgirêkan bibin. Gihîştina dozê heta bi DMME, girêdana wê ya bi vê rastiyê re datîne holê.

Jibo ku ez berpirsiyariya şaristaniya Ewropa ya rasterast, di der- barê kurdan de deynim holê, nîşandana min ku ji polîtîkayên mê- tingehkariya dused salên dawî, ya ku serkêşiya wê Ingilîztan dikir, bê çawa bandorker bûye, pêdivî dike ku berpirsiyariya sincî û polî- tîk were hiskirin.

Wateya pratîk a van poîtîkayên mêtingehkar ku YE derbasbike, bi sepandina wê ya PMME ve girêdayî ye.

Jiberku pirsgirêka Kurd êdî bûye pirsgirêka Ewropa, li holê da- nîna heyîna Kurd a berfirehî û bi vî rengî, bawer dikim ê DMME ronahî bike. Ji ber mercên ku ez tê de, ev nirxandinên ku min di parêznameyên Îmralî de pêkneanîn, bawer dikim digel kêmasî û çewtiyan jî, yê valahiyekê dagirin. Min hewl da ku di derbarê PKKê de bi berfirehî nirxandinan bikim. DMME di biryarên xwe yên curbicur de, heger ne di derbarê damezraka rêxistinê tevî de be jî, li ser tawanbariyên terorê hinek biryar standine. Min di pa- rêznameya xwe de girîngî da ronahîkirina vê mijarê. Bi giranî ji

bûyera şidetê bigirin heta bi têgihîna şideta PKKê, min cîhekî berfireh da mijarê. Min bi vê yekê xwest ku helwesta xwe û ya rêxis- tinê, li hember şer û şidetê zelal bikim. Ya rast ev e ku, heyîna ge- lê Kurd li qasî bi serê ti gelan nehatibe, di bin şideta desthilatda- rên biyanî de dijî, Ev li holê hatiye danîn ku ji ber vê yekê derfe- ta pêşveçûneke azad nedîtiye. Di hemû pêvajoya dîroka şaristani- yê de, kurdan encex bi derketina lûtkeya çiyan re, hebûna xwe pa- rastine. Ji ber vê yekê jî hêza ku şaristaniyên bajêr en nonnal da- mezrînin û bidomînin, nedîtine. Yên ku hatine damezrandin jî, di demeke kin de hatine dagirkirin. Ji ber van taybetiyên wan ên dî- rokî ye ku hê jî mîna eşîran dijîn.

PKK xwest ku vê dorpêça şidetê ya mezin bişkîne. Lêbelê ji ber bîrûbaweriya gundîtî û eşîrtiya bihêz a di damezraka xwe de, têko- şîneke çekdarî ya bi şêweya parastina rewa ku rast û bi têrayî be pêkneanî. Weke ku tê zanîn, gelekî ku hemû heyîna wî heta bi zi- manê wî hatî qedexekirin, xwedî mafê parastina rewa ye ku ev maf him di zagonên gerdûnî û him di zagonên bingehîn ên neteweyî de jî cîh digire. Ne bikaranîna vî mafî, bikameanîna vî mafî li derî hi- qûq e. Xêzka parastina rewa ya PKK, him mafekî zagona bingehî- ne him jî peywireke pîrozwer e ku jibo gelê xwe bicîh bîne. Ti sa- ziyên hiqûq jiberku gelê Kurd vî mafê xwe bikartîne, nikare tawan- bar bike. Yên ku pêwîst e werin tawanbarkirin, ew kesên ku pêdi- viyên hiqûqê hemdem ên jêneger, ji gelê me re nîşan nadin in. Di vê rewşê de, vebijarka parastina rewa tenê dimîne di dest de. Ev Mafê zagona bingehîn, hatiye bikaranîn. Ev yek pêdiviyeke hiqûqi- ye jî, heta mafên gelê me yên ku di PMME de jî bi awayek vekirî hatin nîşandan neyên dayin, heta ku hemû heyîna wî were mande- lekirin, perwerdeya bi zimanê dayîkê û bikaranîna zimanê wî ya bi azadî were qedexekirin, em heta bi dawiyê jî dev ji mafê xwe yên parastina rewa, bemadin. Di vî derbarî de, bi gelek biryarên DMME jî derketiye holê ku yê tawanbar polîtîkayên dewletê bi xwe ne. Bi hezaran kesên bêsûc ku ji aliyê çeteyên dewlet wan xweyî dike ve hatine kûştin, bi hezaran gundên ku hatine valakirin, çalakiyên terorê yên ku tawanbariya herî giran derdixin holê ne.
Gelê me teroreke ku di dîrokê û di roja me de bi serê ti gelan neha- tiye, dijî. Mînaka Halebçeyê hê nehatiye jibîrkirin. Herwiha paras- tina rewa

di bingeha çekdariyê de be jî, pêdiviyeke hiqûqê gerdûnî û zagona bingehîne ku were bikaranîn.

Tişta neyê pejirandin ku ez jî sal û demên dirêj li hember bûm, lê di pêşlêgirtinê de min zorî kişandin, şêweya şideta ku ji xêzka parastina rewa derbas bûbû ye. Di nava PKK de kes û komnan him li hember rêhevalên xwe, him li hember gelê şarwer (sivîl) û him jî li hember sazî û kesên dewletê yên ku li derî şidetê mabûn, şidet da- ne meşandin. Di vî babetî de tê zanîn ku min ev çewt didîtin û jibo neyê rewşa xêzkeke di asta Filistîn û îsrael de, min hewl didan. He- ger ku şidet negihabe vê astê, ji ber van hewldanên min e. Agirbes- ta yekalî ya ji sala 1993an ve ku bi daxwaza serokkomar Ozal me hewl dida em pêkbînin, piştî gelek pêvajoyan bi disiplîneke mezin tê sepandin. PKK beşeke mezin ji ya hêzên xwe yên çekdar, deran- dina derî sînor û êxistine rewşa parastina rewa. Ev rewş ji aliyê ra- yedarên Tirkiyeyê ve jî tê beliyandin (rastandin). Bi vê mijarê ve girêdayî, PKK di kongreya xwe 7. ya 2 OOOan de bi awayek vekirî nîşan daye û di bemame û stratejiyên xwe de rave kiriye ku ne li pey cudaxwaziyê ye. Gelek caran daxuyanî dane ku di nava Tirki- yeke unîter û yekere de, amadeyî çareserkirina pirsgirêka Kurd a di nava lihevkirineke aştî û demokrasiyê de ye. Bêyî daxwazeke zêde- kar, ev helwesta tê vateya ku alîgirê bikaranîna mafên di bingeha PMME de ye, hê jî ji aliyê dewletê ve bi awayek fennî ne hatiye bersivandin. Dewlet di warê naskirina pirsgirêka Kurd bi xwe de jî, zehmetiyan dikşîne. Ti caran nêzîkî naskirina hiqûqê Ewropa û krî- terên demokrasiya wê nabe. Digel ku Tirkiye berendama YE yê jî, welatê bi tenê ye ku krîterên Kopenhagê nayîne cîh.

Li hember vê rewşê pêwîst e DMME, rewşa PKK a ku ev du sa- lin bi disiplîneke mezin xwe kişandiye derî sînoran û bi berpirsiya- riyeke mezin rewşa xwe ya parastina rewa diparêze, li ber çavan bigre. Pêwîst e DMME nirx bi vê yekê bide ku, PKK ji vê mejûyê û pêde xwe ji bûyerên terorê yên derî hiqûq paqij kiriye û yê her tiştên xwe li gor parastina rewa ya pîroz bide mêşandin. Nirxandi- neke bi vî rengî, yê tevkariyê bike ku pirsgirêka Kurd di zemîneke rewa de were nîqaşkirin û bikeve pêvajoya çareserkirinê. Biryarên ku dadgeha bilind bistîne, di derbarê pirsgirêkê ku di wergirya hi- qûqê demokratîk de destekarî lê

bête kirin, yê bandoreke erênî him li saziyên YE û him jî li rayedarên Komara Tirkiyeyê bike, ji aliyê din ve di nava pîvanên hiqûqê demokratîk de yê PKKê jî teşvîkî ça- reseriyê bike. Herwiha dixwazim diyar bikim ku, di bingeha van rastiyan de dadgeha bilind, bi taybetî bi biryarên ku ji niha û pêde pêşbêxe, di çareserkirina vê pirsgirêka giran de yê wateyeke dîrokî hilgire. Digel ku rêzgirtina min ji hinek biryarên hatine dan re he- ne jî, ev yek diyare ku parêznameya min yê di warê netêrayiya wê de bibe bingeha rexneyên min. Di serî de mijara şideta cudaxwaz ku dadgeha bilind timî li ber çavan digire, Sedemên şidet û cudax- waziyê yên rast û berbirsiyarên wê li holê hatine danîn. Ev gelekî girînge ku yê xedir lê hatî kirin û yê xedrê dikin, neyên tevlîhevki- rin. Ji ber vê yekê dîtina PKK bi awayek giştî yê ji aliyê dadgehê ve, pir girîng e. Beşek mezin ji dozên ku tên DMME, yên bi PKK ve girêdayî ne. Di vî derbarî de, ez careke din pêdivî dibînim dax- waz û baweriyên xwe diyar bikim ku, beşên parêznameya min ên di derbarê PKKê de, weke beşên di derbarê gelê Kurd de bi girîngî werin nirxandin. Ev yek jî diyar e ku ev parêznameya min, jibo dadgeha bilind weke belgeyeke herî girîng e.

Rewşa min a takekesî, encex bi van herdu rastbîniyan ango bi derawaya gelê Kurd a zagonî û bi derawaya PKK ya leşkerî, siyasî û zagonî ku were nirxandin û ronahîkirin, yê bikaribin bi awayek rast û berbiçav dest bavêjinê.

### 4- Pêvajoya Darizandina Îmralî PMME û DMME

Rawêja (hîpotez) ku takekes ê bi serê xwe û bêberpirsiyarî bikari- bin bijîn, encex bi awayek zanistî beriya 7 mîlyon salan, dema mer- haleya ku derbasî cureyê mirov bûyî, dibe dabaşa xeberdanê. Weke nêrîneke zanist tê pejirandin ku hê wê hingê jî, di rewşa komên pi- çûk de bi şêweya sazûmana lîstikan dihat jiyandin. Ji wê mêjûyê ve ev mijareke hatiye çavdêrîkirine ku, çiqas asta civakî ya cureyê mi- rov pêşvediçe takekes jî pêşvediçe, mana li derî civakî tê wateya mi- rinê. Di parêznameya xwe de li ser vê mijarê jî rawestiyam. Sedema vê ev bû: Ez weke ‘cinawirekî terorîst’ ku ji ezmên ketibe, bi fenna- nên taybetî û veşarî kowboyê dawî serokê DYA yê mezin, bi desteka hêzên tevaya

cîhanê yên ‘qehreman’, ji aliyê yekeyên îstîxbarat û ewletiyê (emniyet) ve ez hatim girtin û li girava Îmralî, di bin pêşgi- riyên derasayî de ez avêtim tabûtgeheke asê. Ez di rewşa “terorîstekî herî mezin ku sîh hezar kes kûştî” de bûm. Di tevaya cîhanê de û li Tirkiyeyê, bi propagandeyeke behempa bi vî rengî dihatim nîşandan. Li ser min gelek tişt hatin gotin û nivîsandin ku, ji pêdiviya çawa we- rim dardekirin bigirin, heta bi werim parçekirin xavûxav werim xwa- rin jî yê ne bi têrayî be, ji dêvla ku bi carekê bikûjin rizandina hêdî hêdî saet bisaet yê çêtir be û di vê navê de min bikarbînin ku heta dostekî min jî nemîne polîtîkayan li ser min pêkbînin.

Jibo darizandina min a li Îmralî were nirxandin ku gelo, bi ge- lemper li gor hiqûq û bi taybetî li gor PMME ye an na, min parêz- nameya xwe berfireh girt. Di parêznameya xwe de hewldanên çes- pandina min, nirxandina ‘ez jî mirov im, gelekî min ku ez jê me he- ye’, ne ku fenteziyeke hatiye pêşêxistin. Em bi cîhaneke bi maske ku min ji mirovan û gelê me jî ji gelan nahesibîne re, rûbirû ne. Ev yek ne tenê di roja me de derbasdar e, rastbîniyeke ku heta bi kûra- hiya dîrokê diçe ye. Heger em ji mirov û gelan bihatana hesiband- in, herwiha wekheviya hiqûq a derbasdar li min û gelê min jî biha- tana sepandin, mîsoger şanoyeke hiqûq a trajî komîk weke ya Îmralî pêknedihat. Pirsgirêk ne ji ber mercên giran ku ez di wan de hatime darizandin û ne ji ber darizandina ku li dij gelek xalên PMME ye. Digel ku ev mijar jî gelekî girîng in, cudahiyên hêsan ên di derbarê şêweya pêdivî de ne. Hêmanek ji ya hiqûq a bingehîn, berbiçavî (tişteyî) ye. Hiqûq bi mebest û bi angaştên taybet ve na- yê girêdan. Ez bi vê gotinê ji hîqûqê hemdem xeber didim. Naxwe ev yek diyar e ku ji fennanên dewletê yên ji binyata hiqûqê xwe- dayî re, hiqûq nayê gotin. Di vî babetî de ne ji hiqûq, dikare ji xa- pandin, dagirkirin û tinekirina nêrîna zalim û derewan a ku xwe ji binyata xwedayî nîşan dide, were behskirin.

Darizandina min a Îmralî, tenê ne mandelekirin û mêrkûjiya hi- qûq e, di heman demê de û xetertir, hatiye xwestin ku jibo tinekiri- na rastiyên ku ez wek annanca veşarî dibînim, bikine navbeynkar. Tenê ne di rojên ku ez li Îmralî de, di hemû pêvajoya Ewropa û Kenya de jî, sepînên heroj yên velîsk (şok) li ser velîskê, annanc di- kir ku rastiyên

dîrokî û mirovî jibo min û gelê min nederbasdar bi- ke. Dixwestin li paş xwe kesayetî û gelekî di asta ajalan de ku ji paryayên hindiyan bênirxtir, bihêlin. Ya herî erjeng ev rewş bû. Ali- yê vê yê herî stemkar ev bû, dixwestin ku hişmendiya min tine bi- kin û bigihin vê encamê. Çiqas ku biçe heta dostekî min nemîne pê- vajoyeke tinekirin û rehabîlîtasyonê ya kûr û berfireh bisepînin. Ne gengez e ku ez bibêjim ev xeterî bitemamî ji holê rabûye. Rast e min li dadgehê got ku ti êşkenceya bêteşe li min nehatiye kirin, he- ta min ji pirsiyariyeke ku giramgiriya li hember hev werdigirt jî behs kir. Lêbelê ev rewş tenê kemneke pêvajoyê ye. Rastî li dereke din in. Dijîtiya li hiqûq û PMME ku bi hiqûqê Tirkiyeyê, rêveberi- ya wê û DED (Dadgeha Ewlekariya Dewletê) ve bête girêdan, yê nêzîkayiyeke gelekî teng be. Heta baweriya min ev e ku Tirk bi xwe jî, weke gel û dewletê bi awayek têrayî ji bûyerên ku diqewimin, ne agahdar in. Ji ber vê yekê min rast nedît ku ez dijîtiyeke Tirk a er- zan bikim. Min ev yek tim li ber çavan girt ku, li qasî mirov hay ji rastiyan hebe, bizanibe ku li derê cuda ne jî, herwiha bizanibe ku nêzîkayiyên zanistî û berpirsiyarî jiyanî ne. Parêznameya min a pir- reng jî hinekî bi van sedeman ve girêdayî ye.

Nebaşiya herî mezin ku emê li hiqûq û darizandinê bikin, win- dakirina behreya têgihîştina me ya rastiyê û sehekiya wê ye. Ji ber van hemû sedeman, heta weke dema ku ez hatim binçavkirin jî, min pûte pê da ku ez rstiyan rave bikim. Heger hêza cîhanê yê herî me- zin serokê DYA Clînton, bi awayek fennî bibêje ‘min fennana tes- lhnkirinê da’, hêza duyamîn a cîhanê serokwezîrê Rûsya Prhnakov roja ku ez ji Ewropa derketim, gotibe min hemû CDS (Civaka Dewletên Serbixwe) hişyarkirin ku ‘bila neyê welatê wê’, Li îtalya digel ku pêwîst bû bi awayek hiqûqî ez serbest bûma bi pêkutiyeke psîkolojîk dabim revandin û li Grekîstan rêvebiriyeke ku min digot dost e digel vexwendina fennî derbeya kûştinê li min dabe, Di bin van hemû helwestan de berjewendiyên bêmaf ên aborî û siyasî he- bin, Dîsa di dawî de di asta wezîr de bibêje ‘em te dibin Holanda’ û bi şêweyeke ku cîhê wê di ti hiqûqî de tine be min teslhnî yeke- yên Tirk ên ewlekariya taybet bike, li vir tenê ne ji binpêkieina hi- qûq yê were behskirin, ev diyar e ku em bi komployeke sedsalê ya bêhampa re rûbirû ne.

Pirsgirêk ne ev e ku ez tawanbar im an jî ne tawanbar im. Pirs- girêk ev e ku li tevaya Ewropa, bi kîjan bîrûbawerî û berjewendiy- an ketina nava van helwestên li dij PMME. Di kesayetiya min de xiyaneteke mezin a li pîvanên Ewropa ên demokratîk û hiqûq da- başa xeberdanê ne. Di nava sînorên ku PMME lê derbasdar de, xa- la hioqûqê ku yê li min were sepandin, di derbarê penaha siyasî de ye. Jixwe Dadgeha Roma ya Spartek (spartin) mafê min ê penahê pejirandibû. Di vê rewşê de hemû saziyên dewletê û temsîlkerên wê ku bi rêbazên bêhempa ez avêtime derî Ewropa, tawanbar in. Binçaviyeke bi destê wanên tawanbar ku pêkhatî, li dijî xala PMME ya 5an e. Herwiha ya berî her tiştî were biryardan, betalki- rina vê binçavkirin û girtina li derî hqûq e. Pêwîst e ez vê mijarê bêhtir bi awayek kitekitî bînim zimên. Lêbelê weke ku dadgeha bi- lind jî yê bi rihetî bibîne, pêdiviye baş were peytandin bê çima ez ji mirovan û gelê me jî, ji gelan nayê hesibandin. Ev mijar pêşiki- yê digire. Jiboku ji dadgehê re bibim alîkar, bê ez mirovekî çawa me û weke qurbanekî terora giran a bi salan bê ez çawa gihame vê demê, min belaş bi awayek zanistî rave nekiriye. Lewra ya ku li ser min sepandina li ti cinawiran nehatiye sepandin. Dîsa mandelekiri- nên ku li ser heyîna gelê me hatine kirin, li qebîleyen herî paş jî ne- hatine sepandin. Dema ku ez dibêjim hiqûq berbiçaviyê bingeh di- gire, ez dixwazim vê rastbîniyê nîşan bidim. Meşandina vê dozê li gor hêmanên hiqûqê gerdûnî ku bi mîlyonan kes rakirine ji piyan û dengê wan heta bi dadgehan jî tê, encex bi mafdayina van rastiyan yê gengaz be.

Pêdivî ye ez vê mijarê nîşan bidim ku, tenê mercên darizandina Îmralî weke li dij PMME were dîtin û biryar bête dayin, ezê vê ye- kê weke berdewama komplo binirxînim. Pejirandina min a vê yekê ne gengaz e. Dema ku ez biryareke bi vî rengî bipejirînim, di vê de- ma ku min ji gelê xwe rêzdariyeke mezin girtî de, di nava gelê Kurd de xayînekî hevkar jî yê bibime ez. Li hember van hevkarên ku teq- lîdkerên sereke yên bêhiqûqiya li ser gelê me, jiboku werin rêya hi- qûq a birûmet, min pir têkoşîn kir. Lêbelê di darizandina Îmralî de, her hewldana ku were wateya dabelana kompleyê yê were vateya ku lîstika hevkaran cîh bigire. Heger em vê bêmafiyê bixebitînin, dadgeh ji vê re bibe amûr û ez jî dabelînim, bê guman ev rewş he- ta ku takekesekî me yê dirist hebe,

yê rê li ber vê rewşa stemkar a heyî veke. Dîtina vê rastiyê belkî ji ber mercên Ewropa zor be. Lê- belê ya tê darizandin, hêvî û viyana azad a mirovên me ku xwe li ser navê gelê me dişewitînin û li hember hêzên hêrîşker heta bi ne- fesa xwe ya dawî li ber xwe dixin. Herçiqas ku min ev viyan bi awayek layîq temsîl nekiriye jî, ez qet fersendê nadim û nabim amûr ku ev nirx di kesayetiya min de, him jî li hemberî hiqûq der- beyê bixwin û lawaz bimînin. Ez vê yekê gelekî girîng û dîrokî di- bînim û dixwazim ku, Van hemû rastiyan, sazûman û hêzên ku hi- qûqê Ewropa gav bi gav binpêkirin, ez ne bi komployekê bi zincî- reke komployan revandim, rast terîf bikin, berî her tiştî dadgeha bi- lind vê mijarê ronahî bike û biryarê bide.

Revandin û binçavkirina min, pêwîst e ne weke bûyereke ketû- ber were nirxandin. Tenê jiboku vê bûyera bêqidoş (bêyom) pro- testo bikin, ji gelê me sedan kesan xwe şewitandin, xwe avêtin mi- rinê. Hat xwestin ku derbeyeke mezin li hêvî û baweriyên gelê me were xistin. Ya herî ne baştir ev bû ku, heger pêvajoya xwekûjiyê ku ez xistibûmê bihata xebitandin, yê pêvajoyek jênerev bûbana ku bi deh hezaran jiyana mirovan tefiyabana. Ji ber vê yekê pêş- kêşkirina min a Tirkiyê ya mîna pakêtekê, yê bandora bombeyeke atomê ya piştî Japonya û ji Halebçe gelekî wêrankertir nîşan bida- na. Lêbelê digel hemû zoriyan, valaderxistina min a pêvajoya xwekûjiyê ku dihat ferzkirin, yên ku bandora bombeyeke bi vê şê- weyê plan dikirin jî, vala derêxistin. Hesabê wan hemû ev bû ku ez li ber wan mercên giran nikaribim li ber xwe bidim, an xwe li rojiya mirinê bidim an jî bi demançeya ku balyozê Grekîstan dayî min, xwe bikûjim. Di vê rewşê de, yê encam bûbana bi hezaran ça- lakiyên xwekijî, pêvajoyeke şidetê ku levdana Filistîn û îsraelê ge- lekî li paş bihêle. Berpirsiyariya sincî ya ku min li hember gelên me, dost û rêhevalên me his dikir, helwesta min ya bi kesayetî û ber bi aliyê aştiyê ve, pêwîst dikir ku ez neyêm van lîstikan. Da- wiya wê çidibû bila bûbana, heta ji destê min bihata jiyîna min yê rastir bûna û herwiha min ev lîstik xera kir. Esasê wê komplo bi vê helwesta min li bisemeketiyê qelibî û kete rewşeke ku nexebite. Min pêşî li lîstikeke bixwîn ku Anatolya û Mezopotamyayê bi sa- lan bikişîne nava xwe, girt.

Eslê wê polîtîkaya ku tê sepandin, kurtayiya dused salên dawî ye.

Pêşî yê kurdan bikişînin nava serhildanê û dû re bêdestek bihê- lin, di pey re ber bi rewşeke ku bibêjin ‘li tirkan bixin’ bidehefînin, ev kurtayiya polîtîka wan e. Bi gotineke din lîstika “Kîvroşkê bire- ve, tajiyê bigire” dihate leyîzandin. Diyar e ku polîtîkayeke gelekî stemkar dihat meşandin.

Min di parêznameya xwe de, di pêvajoya revandinê de bê rola kîjan dewletê çawa çêbûye nîşan da. Heger were xwestin, bi awa- yek peyvkî, bi şahidan an jî nivîskî ez dikarim bi awayek berfireh, bersivan bidime hemû pirsan. Heger ku ez bi kurtayiyeke kin duba- re bikim:

**a- Pêvajoya Revandina Min û Sexbêriyên li Derî Hiqûq:** Vê pêvajoyê di 9 Cotmeh 1998an de, bi pêşwazîkirina min a li Balefir- geha Atîna destpêkir. Ji dêvla Baduvas ê dost, parlamenter û wezî- rê kevin ku ez vexwendî kiribûm, Stavrakîs ê serokê îstîxbaratê yê bi kod navê Baby û Kalanderîs ê ku xwe dost nîşan dida yê bi kod navê Egîd, ez pêşwazî kirim. Digel ku min nîşan da ez jibo penahi- yê serî li dewletê bidim û ev yek mafê min e jî, ewan nîşan da ku yê zorê bikarbînin, ez ber bi Moskovayê ketim re. Li Moskovayê ji aliyê parlamenter Jîrînovskî ve hatim pêşwazîkirin. Temsîlkerê par- tiya me Numan Ûçar bû. Piştre nîşan dan ku serokwezîr Prîmakov gotiye herî zêde dikare neh rojan li vir bimîne, heger meçe emê bi-

zorê bişînin. Di vê pêvajoyê de li mala parlamenter Mîtrofonow mam. Piştî 33 rojan, jiberku hikûmetê penahiya min a ji aliyê Du- ma ve ku li hember yekê bi 298 dengan pejirandî, bicîh neanî, ber bi îtalya ketim rê. Ez li benda dostaniyê bûm lê hatim girtin. Piştre dadgehê girtina min rakir. Lêbelê ez di bin dorpêçeke hişk de hiş- tim û jibo reva min, tişta hebû dikirin. Piştî 66 rojan, ji derketinê pêde ti rêyên din neman. Di vê pêvajoyê de parêzerên min ên îtal- yan û wergêrvanên min hene. Ew di wê rewşê de ne ku tiştên qewi- mîne bibêjin. Parêzerê min ê parlamenter Pîapîsa û wergêrvan Eh- med şahidê hemû bûyeran ne.

Dema ku careke din hatim Moskovayê, digel ku wan soz dabûn jî ez xistim nava sepîneke hişk. Li ser navê DYAû îsrael Madleîne Albright û Şaron hatibûn wira. Krêdiyên IMF dihatin nîqaşkirin. Pêşnûmaya Herikîn a Şîn jî di rojevê de bû. Bawer dikim li hember teslhnkirina min, di warê krêdiyên IMF û Pêşnûmaya Herikîn a Şîn de, lihevkirin. Weke rawestgeha dawî, bi firokeke taybet a ku gene- ralê malnîşîn Nagzakîs û wergêrvan Ayfer Kaya anîn, di ser Petrog- rad re me li Atîna danî. Di VÎPê re borîm û şevekê li mala xizimên Nagzakîs mam. Şeva din bi mebesta ku ez bi Wezîrê Karê Derve Pangalos re hevdîtinê çêbikim, li dera ku ez çûmê dîsa pêrgî sero- kê îstîxbaratê Stavrakîs hatim. Ez xistibûme xefkê. Bi zorê ez biri- me derekê. Piştî ku şevekê bi firokê ez li hewayê gerandim, ez da- nhne Girava Korfû. Çapameniya Ewropa digot, ‘Jibo vê şevê hemû balafirgehên Ewropa li Apo hatin girtin’. Serokwezîrê Rûsya jî li ser navê CDS qedexe kiribû. Diyar bû ku biryareke di asta herî bi- lind de hatibû dan. Vê dawiyê hate fêmkirin ku ev biryar bi awayek veşartî, li Swîsrayê hatibû standin. Hêza ku biryar dayî, di bin ve- nêrana DYA de yekeyeke NATO ya bi şêweya Gladîo ku li derî hi- qûq bû. Heman yekeyê revandina min a Kenya jî plan kiribû. Ev yek jî rastiyeke ku vê dawiyê derketibû holê ye. Di vê plankirinê de rola îstîxbarata Ingilîz jî, di çapameniyê de hate diyarkirin. Hikû- meta Grek jî bi dostaniya xwe ya sexte rola serkariyê lîst. Kalende- rîsê li ser navê hikûmetê got ku di pazdeh rojan de yê pasaporta Ko- mara Afrîka Başûr were amadekirin, heta wê hingê mana min a li balyozxaneya Grek a Kenyayê yê ewlekartir be. Di encama ku min bawerî pê anî de, revandina min a Kenya pêkhat. Digel ku hikûme- ta

Grek û sefîrê wê Kostulas revandina min dizanîbûn jî, ev yek ra- ve nekirin. Roja dawî jî bi polîsê Kenya re lihevkirin, bi ewlekari- ya Pangalos gotin ‘em diçin Holanda’, bawerdikim ku bi bandora dennanê tevizandinê jî em revandine balefirgeheke ku yekeyên Tir- kiyeyê yên taybet ji dudoyê Sibatê ve amadekariyên xwe dikirin û ez teslhnî wan kirim.

Vê dawiyê Blînkenê nûnerê Serokê DYA Clinton, di çapameni- yê de dide xuyakirin ku ev yek bi fennana Clînton a taybet pêkha- tiye. Ev kurtegotina min jî bi awayek vekirî nîşan dide ku, hikmên PMME bi awayek giran hatine binpêkirin, digel ku serlêdana min a penahiyê him li balyozxaneya Grekîstan û him jî li îtalya hatiye pe- jirandin, bi rewşeke li derî hiqûq ez hatime revandin. Li balyozxa- neya Grekîstan a ku ez bi zorê teslhn kirimê, serlêdana penahiyê ku min dabû, Kostulas bixwe anî zimên ku hatiye pejirandin û serlê- dan êxistiye kiryariyê. Bi pêwana parêzerekî ku ji Grekîstan hatibû, min hewl dida ku ez vê kirariyê li Grekîstan bidim meşandin. Li Kenya jî ez bi awayek fennî di wergiriya PMME de bûm. Ji ber vê yekê ez li dijî avêtina xwe bizorê ya derve derketim. Bi kurtayî ji 9ê Cotmehê heta bi 15ê Sibatê di dema ku borî de, pêwîst bû ku hikmên PMME li min werin sepandin. Rûsya jî di nav de, ti hikû- met ne xwedî raye ne ku mafên ev peyman dide binpêbikin. Li ser navê van dewletan, ez tevlî serlêdanên parêzerên xwe yen ku li PMME dane dibim. Ez dozdariya xwe nîşan didim û berî doza Îmralî, di derbarê van dewletan ango Grekîstan, Italya û Rûsya de, tevlî serlêdanên dozdariyê ku werin lêkolîn dibim. Encex di vê bin- gehê de dema ku esehiya revandina min were ronahîkirin, dijîbûna binçavkirina min a li PMME bi awayek vekirî yê derkeve holê.

Ev yek bi awayek vekirî li holê ye ku, dema ez teslhnî tîmên Tir- kiyeyê kirime bi ti rêzikan ve girêdayî nemane, di vî derbarî de ti belge tine ne, ji aliyê din ve bûyer di nava sînorên Ewropa de der- bas bûye, herwiha li dijî hikmên PMME ye. Bi vê ve girêdayî, da- rizandina Îmralî ku ji bingeha hiqûq bêpar e, bi nêrîneke ‘doz tine’ an jî ‘çênebûye’ bi encam bibe, yê bibe pêdiviyeke hiqûq. Berevajî vê, biryareke ku were dan yê li dijî PMME be. Heta yê hiqûq ji pê- vajoya komploya revandina min re bikine amûr, DMME jî ji vê zin- cîrê re bikin xelek û dadgeha

bilind bixine pozîsyoneke ku ez ba- wer dikim ew jî nexwaze. Divê ez bawerî û daxwaziya xwe careke din nîşan bidim ku, dadgeha bilind li hember vê lîstika revandinê ku wê jî têkildar dike, helwesteke bivate nîşan bide û biryareke la- yîqî dîroka xwe bistîne.

**b- Cizayê Mirinê û Weke Amûreke Gefê Bikaranîna li Hem- ber Gelê Kurd:** Digel di wê baweriyê de me ku doz ji aliyê hiqûq ve tine were hesibandin jî, dixwazim jibo zanînê di derbarê cizayê mirinê ku dane min de hinek nirxandinan bikim.

Biryara mirinê ya di derbarê min de anîne 28 Hezîran 1999an. Ev mêjû salvegera dardekirina Serokê Serhildana Kurd Şêx Seîd a 1925an e. Ya girîngtir, mêjûya teslhnkirina min 16 Reşemiyê jî, ro- ja destpêkirina serhildana di pêşevaniya Şêx Seîd de ye. Herdu mêjû jî bi awayek hişmendî hatine hilbijartin. Ango dixwestin vê yekê bibêjine gelê Kurd: Hûn çiqas serîhildin jî encam nayê guher- tin! Serokkomar Sileyman Demirel di axaftineke xwe de wiha di- got: “ 28 serhildan çebûn, hemû hatin perçiqandin. Ya dawî jî yê heman aqûbetê bibîne.” Diyar e ku plankirina senaryoyê diçe ge- lekî kevin. Ev senaryoya ku ezê vê dawiyê bibihîzim, îsrael, DYA û Grekîstan sala 1996an ketibûn navê. Dibe ku hêvî û annancên wan cuda bin, lêbelê di warê jiholêrakirina min de, berjewendiyên wan bûbûn yek. Min bandora van hêzan a li ser kurdan û tevgera azadiya Kurd gelekî bisînor kiribûn. Hemû veberhênanên ku jibo hevkarên xwe pêkanîbûn vala derketibûn. Ji ber vê yekê hemû jî hêrsgirtî bûn. Di serî de Barzanî û Talabanî, li her perçeyê Kurdis- tanê jibo bi sedan kes û komên piçûk veberhênana ku van 40-50 salên dawî kirin, li ser rûyê min ku nedihat xebitandin, sedema da- ringî ya bingehîn a komploya Apo ye. Keysa Kurd di destê wan de timî pêdiviyeke jiyanî ye. Li ser rûyê min bêpar mayina wan a ji vê keysê, qet nedihat pejirandin. Bi rêveberiya Tirk re, di vê bin-

gehê de lihevkirin. Jiholêrakirina Apo jibo tevan sûdmendî bû. Bi Sûriyeyê bi xwe jî gelekî giran dihat. Cîgirê serokê Sûriyeyê Evdilhelîm Haddam di hevpeyvîneke xwe ya bi rojnameyeke Tirk re, yê wiha bigota: "Abdullah Ocalan bandorê li kurdên Sûriye, Iraq û îranê jî dike. Ji ber vê yekê me kire der, me jî nedixwest. Di mi- jara PKKê de em di heman xêzkê de ne.

Hikûmeta Grek û Clînton di sala 1996an de, bi jiholêrakirina min ku tevgera Kurd ê bikeve bin venêrana wan yê pêkhatîtir be, li- hevkiribûn. Bi rastî jî hevkarên wan vala hatibûn derxistin. Nikarî- bûn sîxurekî Kurd jî bikarbînin. Abnanya ji ber sedemên kûr rike- ke mezin ji min girtibû. Kesayetiya min li quretiya Alman nedianîn. Ez berevajî daxwazên wan ên li ser Mezopotamya dihatim. Sede- mên Ingîltere, Fransa, Swêd, Rûsya û wan dewletên din jî, bi vî rengî bûn. Mentalîteya min bi yekî ji wan re lihevnedikir. Tenê îtal- ya jiberku nûka nêzîkî mijarê dibû, hinekî nezan bû. îtalya jî giha- bû encameke ku jibo ji min rizgar bibin, mana min a li wira ya de- meke kin, rêya herî pêkhatiye. Bi rastî jî yên herî mezinên ku di cî- hanê de ji bikaranîna berjewendiyên xwe berpirsiyar, di derbarê ku ez jibo wan gelekî biha dihatim de, him ji aliyê çînî, him neteweyî û heta navneteweyî ve, gihabûne baweriyeke hevpar. Yê Lenînekî duyemîn neafirandibana. Lêbelê jibo rêya îsabûneke duyemîn, derî heta bi dawî vedikirin. Baweriyek bi tirkan re pêşdiket ku ez neya- rê wan di dîrokê de yê herî mezin im. Eslê wê paşverûtiya kevne- şopî û şovenîzmê, di kesayetiya min de derfetên berjewendiyan bi- destxistibûn. Çepên Tirk nîşandabû ku ji vesazbûna demokrasî û wekheviye gelekî dûr in. Hevkarên Kurd jî li hemû parçeyên Kur- distan bawerdikirin ku di navbera me de, kendal hene.

Bi kinayî, hemû hêzên der û hûndir ên sazûmana damezrandî yên herî raser, di jiholêrakirina min de, bûbûne yek. Heger ku li derî hiqûq û bi rêbazên komployê be jî, hewldidan ku fennana mi- rina min bi hev re binivisînin. Di be ku hinek, dost û rêheval şaş bi- mînin, lêbelê pêdivî ye ez vê bersivê bidime wan: "Ti rewşa HZ îsa ku stratejî û taktîkan çêbike tine bû." Meşa wî ya Qudsê ya ser Ro- ma û hevkarên wê pêşgoyên Yahûda, rêya tenê ya çalakiya ku en- cam bide û layîqî dîrokê bû. Vê dawiyê min nêriya: Çiqas li ser vê axê qeder dişibin hev. Dema

kesayetiyek li cîhana desthilatiya de- mê serî hildide, çawa nêzîkî pêxemberan dibe! Naxwe giyaneke hevpar û kesayetiyeke heman pêvajoyan heye. Di mercên cuda de bi şêweyên cihêreng, di demên dîrokê yên weke hev de nûjen dibû. Mercan bi lezgînî ez ber bi wê encamê ve dibirim. Diyar bû ku bir- yar ê mirin bûna, lebelê sepandina wê yê serî bêşanda. Waliyê Ro- ma Pilatus bixwe jî, di derbarê îsa de ne alîgirê çarsingê bû. Pêşgo- yên Cihû yên hevkar ev yek lê ferz kiribûn. Gilgamêş jî ne alîgirê kûştina Huvava yê notirvanê daristanê bû, lêbelê Enkîdu yê hevkar zor lê kiribû ku wî bikûje.

Diyarbû ku yê biryara mirinê jibo annancên siyasî were bikara- nîn. Ez vê bi temamî ne weke parçeyek ji yê komployê jî dinirxî- nim. Bi mebesteke baş û bi annanca aştiyê, bi zêdebûna mirovên xwedî aqlêselhn, dikarîbûn weke kevirekî bingeha lihevkirina de- mokratîk bikarbînin. Nirxandina van nêzîkayiyan a weke lîstikê, karê wan derdorên ku ji vê komployê sûd bigirin e. Ev kes yên der- kevin holê.

Ez jî pêwîst e bidim diyarkirin ku min biryara rastiya mirin û ji- yanê nedabû. Ev mijar gelekî vekiriye ku, heger bi rastî jî ez hati- bim rewşa kesayetiyeke kolektîvîzmê, mêraniya takekesî û tirat xwestina (qaqibo xwendin) ji mirinê re, ne şêweya çalakiyê bû ku ez serî lê bixim. Dema ku dadgehê biryara mirinê da, dadger Tur- gut Okyay pênûsa xwe naşkîne û yê mecbûr mabana ku dijîtiya xwe ya li dardekirinê nîşan bidana. Mirina min bê yê çawa pêkwe- re bi rastî jî nepenî ye. Ev veguherîbû keyseke siyasî ya mezin. Xe- teriyan digotin va em hatin. PKK û kurdan mêjûyên serhildanên nû, li gor encamên biryara dardekirinê amade dikirin. Derdorên paşve- rû û şoven ên Tirk, sepandina biryarên dardekirinê jibo hilbijartinê dinirxandin. Hestên tolgiriyê li herdu aliyan jî rabûbûn ji piya. He- mû hêzên derve, dibêtiyên encama biryarê dinirxandin. Diyar e ku, pêwîst bû ji diltirsiyên (şayîş) takekesî wêdetir, bi berpirsiyarî hel- westên xwe nîşan bidim. Ya herî rast ev bû ku, her roja ez bijîm ji- bo aştiyeke bi rûmet û lihevkirineke demokratîk binirxînim. Gira- niya ku min bidana berjewendiyên takekesî, him ji aliyê siyasî û him jî sincî ve, ne rast bû. Bi ve armancê min mesajeke ku rê li ber encamên çewt veke, neda derdorên rne ku li benda işaretekê bûn. Min nikarîbû bi taktîkên he PKK jî bi rêvebibim.

Jibo hisabên wi- ha teng him derfet nebûn, him jî ev ê bûbana sexbêriyeke çewt. Min hewl da ku li hernber mirinê, helwesta Sokrates bingeh bigirim: Bi wate kirina mirinê, dîtina wateya felsefî ya çirna û çawa mirin! Di rewşa heyî de, li qasî ku texrnîn nekim ez dijîrn. Di bin biryara mi- rinê ku weke şûrê Demokles di ser serê min re dihejije de, bilind- bûna giyan a mezin, peşveçûna wateyê ya mezin di nava nefspiçû- kiyeke ku zêde dibe de, pêşwazî dikim. Şêweyeke jiyanê ku di na- va çend hefteyan de, kevir be jî yê biterikîne hatibû bivatekirin. Es- lê wê ne mirinê ez vekiribûm, min mirin jev vekiribû. Biryara mi- rinê ne ez, min biryara mirinê bi şêweya wê ya nerind û bêoxir bê- bandor kiribû. Ji kûderê were û bi çi rengî be bila bê, hisdike bila sibe û hisdike bila di salên werin de, êdî mirin jibo min ji mijareke cidî derketibû. Heta ez gihîştibûm hêzeke vateya wê ku min dikarî- bû bibêjim, mirin bixêr hat û ser seran hat. Pirsgirêk ev bû ku ez vê rastiyê ji gelên me re, ji dostan û ji PKK re rave bikim. Li gor hêz û derfetên xwe, min hewl da ku ez vê yekê bikim. Hinekî ji felse- feya “bimire-bikûje” derbasbûyina “bijî-bide jiyandin”, gelekî bi berfirehî hatibû meşandin. Heger ku alî bixebitin, yê serfiraziya wê jî di aştiya birûmet de, bi hev re parve bikin.

Ev pêşveçûnên erênî bûn. Valaderêxistina mebestên bêoxir ên di komployê de û gotina xweş a “Her tiştekî xêr tê de heye” rastbînî didît. Bêguman weke berhemeke ezmûnên mirovatiyê yên erênî, ji aliyê dijayetiya xala duyem a di derbarê mafê jiyanê de ya PMME ku belgeyeke hîqûqê hemdem e, biryara DMME ya li ser cizayê mi- rinê ku dayî rawestandin, tevkarî li vê pêvajoyê kiriye. Vê biryarê, jibo dewlet û siyaseta Tirkiyeyê ku di astengiyeke mezin de bû jî, deriyekî şens vekiriye.

DMME ketiye rewşa ferwerde. Bang li aliyan dike ku li gor pê- diviyên hiqûqê gerdûnî hereket bikin. Banga wê ji kurdan re ‘dev ji serhildanê berdin’ û ji tirkan re jî dibê je ‘deriyê xwe ji çarese- riya pirsgirêkan a hiqûqî û demokratîk re veke”. Ev hemû rastî bi awayek vekirî nîşan didin ku, di bin biryara vê dardekirinê de tay- betiyên dîrokî û siyasî hene, gelemşe ne li ser mijara terorîtekî ye. Doza min û biryara di derbarê cizayê mirinê de, bûye kartêkereke herî girîng a têkiliyên di navbera Tirkiyeyê û Ewropayê de. Ev mijar jî nîşan dide ku, rêya Tirkiyê

ya şaristaniya demokratîk a hemdem û tevlîbûna wê di kûderê re derbas dibe. Dardekirina Kurd, tinekirina wî, tine hesibandina wî, tê vateya girtina deriyên cîhanê yên herî girîng jî. Edî kurdan jî li gor pêdiviyên serdemê, bi biryara mirinekê ne melisin (qutifin), rastiya rabûna ser lingan bidestxistine. Belkî jî di dîrokê de di pirsgirêkeke cidî de, aqlêselîm û hişmendî serdestiya xwe nîşan dide, vê rewşê vediguherîne sedema aştî û azadiyê û biryara jiyanê. Heger ku hemû alî li ser mijarê bi kûrayî rawestin, yê li hemberî berhemên ku di her şerî de xêrek heye rast werin. Yê mebestên ne baş ên aliyê reş ê komp- loyeke bêoxir tenê vala demekevin, yê aliyê wê yên bixêr jî bibi- ne xwedî şens ku hêviyên wan serfiraz bibin. Biryareke mirinê ya li Îmralî, yekem car e ku bi biryara jiyana aştiya azad re biteraz bûye. Têkoşîna aştî, lihevkirina demokratîk û girêdana bi hiqûq ve, yê her tiştî diyar bike.

Dardekirina Şêx Seîd û hevalên wî, rê li ber otorîterîzma koma- rê, di têkiliya tirk û kurdan de mandelekeriyê û bişavtina bizorê, ve- kiriye. Têkiliyên herdû gelên ku rizgariya neteweyî bi hev re peka- nîn, bi awayek kûr zirar dîtin (hincirîn). Komarê şensê demokratîk- bûnê ji dest xwe berdaye. Bi şûn vê ve serhildanên Dêrsim û Agirî anîne. Di serî de M. Kemal û î. înonu, hinek rêvebiran fêm kiribûn ku ev pirsgirêk bi vî awayî çareser nabe. Di vê bûyerê de rola polî- tîkaya emperyalîstê sereke Ingilîztan ya bi şêweya 'kîvroşkê bire- ve, tajiyê bigire', mezin e. Ingilîztan bi herdu aliyan lîstiye û polî- tîkaya xwe ya di derbarê Mûsil û Kerkûkê de, daye meşandin.

Ingilîztan piştî 75 salan, bi heman polîtîkayê jibo hesabê xwe yê li ser Iraqê bide meşandin, xwestiye ku rêveberiya tirk û kurdan dî- sa bikarbîne. Min di dadgehê de gotibû "pêwîst e ez careke din 1925an bi bîrbînim" û min nîşan dabû ku dersgirtina ji dîrokê rêya

herî rast e. Min di derbarê serhildanê û biryara dardekirina xwe de bangewazî kiribû û gotibû, pêwîst e herdu alî jî vê biryarê veguhe- rînin aştiya komarê ya birûmet û biratiyeke bi wate. Danezana aştî û Lihevkirina Demokratîk a 16 Tebax 1999an, hê jî derbasdariya xwe didomîne. Dîrokê bi awayek sosret, bi min ve girêdayî ketiye herênaya ‘an şer, an aştî’. Hêza PKK ji her demê bêhtir e û di dera- wayeke wisa de ye ku, şerekî berfireh bide meşandin. Diyar e ku evana potansiyaleke pêşveçûna neyînî, ya ku sedsala 21an jî bide windakirin hildigire.

Zoriya jibo min ev e ku, ez ketime bin bandora herênaya kûr a şer û aştiyê. Di bin biryara mirinê de, biencamkirina herênayên bi vî rengî bi awayek erênî, arameke mezin û hêza têgihînê dixwaze. Lêbelê dîsa him PKK û him dewleta ku polîtîkayên xwe yên binge- hîn li gor biryara mirina min bi bingeh dikin, xeteriyekê bi xwe re tîne. Ev li qasî ku aştiyê li hêzên parastina rewa yên PKK ferzbikin, pêwîst dike ku dewlet jî di bingeha qanîkirina civaka Tirk de, bi ar- manca qezenckirinê bigihe hêza çawahînî û çendaniyî. Ti aştî bêhêz pêknayên. Aştiyên bivate, bi cidîbûna hêzan, bi sengergirtina wan û potansiyela wan ve girêdayî ye. Veguherîna aştiyê ya rêbaza şe- rekî ku têkbir û têkçûyê wî tinebe, yê bi herdu aliyan bide qezenc- kirin. Pêwîst e ji herkesî re bibe annanc ku têkiliyên Kurd û Tirk, bi aştiya di herênayê de, bi keve rêyeke biratiya dîrokî. Pêwîst e ye- kîtî di sepandina demokrasiyeke timam û aştiyeke birûmet de were lêgerîn. Ev sexbêrî pêdiviya giyana Kuvayî Mîlîye ya 1920an ku bingeha komarê danîbû ye. Kurd hêzeke stratejîk ên vê serfiraziyê bûn. Ev deynekî komarê û pêdiviya xwezaya damezrandina wê ye ku, cîhê mafê wan be bi wan bide.

Dema ku Ewropa li Lozanê komarê pesend dike, înonu jî pirsgi- rêka Kurd nîqaş dike, dema ku dibêje “Me tirkan û kurdan bi hev re...” û bi vê şêweyê dinirxîne, ya xwezayî ev e ku êdî bi hindikayî daxwazên kurdan ên çandî, navêjin pişt guhên xwe. Herwiha komar ê ji çewtiyeke dîrokê vegere. Pirsgirêkên PMME, demokratîkbûna Komara Tirkiyeyê û tevlîbûna YE yê, bi biryara mirina min ve ali- qîne. Şerekî Tirk û Kurd ê berfirehtir jî li vê biryarê aliqiye. Hemû pêşveçûnên herênî an jî neyînî bi aqûbeta vê biryarê ve girêdayîne. Di pêşveçûna erênî ya vê rewşê de ku ne li gor giyana damezrandi- na Lozanê jî, PMME ya ku çarçova

hiqûqê YE, dikare rola ferwer- deyekî dadmend bilîze. Jiholêrakirina xeteriya şer a ji binî, bi lîsti- na vê rolê ya serkeftî ve girêdayî ye. Pêwîst e Komara Tirkiyeyê jî, li gor hiqûqê xwe yê hemdem ji ber xwe ve bersivê bide çareseri- yeke dadmendî.

Di pêvajoya dîrokê de, kurdan ji tirkan re bêhtir suxre kiriye. Berdêla vê nabe ku mandelekirin û ji hemû mafên hemdem bêpar hiştin be. Wekî din biryara mirinê ya weke şûrê Demoklas di ser se- rê wan re, qet nabe. Bi biratî, çi pêdivî be pêwîst e li gor wê sexbê- riyeke çareserker were nîşandan. Pêwîst e PKK jî, hêza xwe ya si- yasî û leşkerî deyne holê ku bikaribe aştiyekê bîne. Di heman de- mê de, pêwîst e biçespîne ku yekerbûna welat û yekîtiya dewletê çawa ewlayiyeke (pêbawerî) xûrt e. Herçiqas ku ev nakok werin dî- tin jî, divê neyê jibîrkirin ku her yekîtî ji senteza nakokiyan dertê holê. Edî pêwîst e were pejirandin ku, veavakirina komarê ya di bingeha demokratîk de, encex bi aştiya Kurd û lihevkirineke de- mokratîk pêkwere. Pêwîst e were dîtin ku, sedsala 21an bi ti rêyên din nayê qezenckirin.

Çil sal in şerê mirin û jiyanê yê ku li ser kesayetiya min tê me- şandin, hatiye merhaleya xwe ya dawî. Ev pêvajoya ku bi senger- girtina hêzên neteweyî û navneteweyî tê jiyandin, birastî bi encam- bûna wê ya jibo bihêzbûna dewletê û yekerbûna demokratîk, bi bir- yara aştî û demokrasiya ku civaka tekildar, hêzan siyaset û leşkerî bidin ve girêdayî ye. Digel ku çêtirgirtina min aştî û demokrasî ye jî, heger hêzên şer bi israr werin ser min û rizandinê berdewam bi- kin, diyar e ku dawiya vî karî yê bibe şerekî azadiyê yê birûmet.

c- Di Pêvajoya Îmralî de Lînça Siyasî: Digel liberçavgirtina da- rizandina min a Îmralî ku li dij hiqûq pêkhatî, ez di wê baweriyê de me ku pêşkêşkirina zanîn û nirxandinên min ê sûdmend (kêrhatî) bin. Ez tevlî angaştên parêzerên xwe dibim ku dijayetiyên li xalên PMME yên 2, 3, 5, 6. 7, 8, 9, 10, 13, û 14an de, nîşan dane. Di vî derbarî de parastinên berfireh ên kirin ku li gor teknîkên hiqûqêne û him jî bi naverokeke mezin parastinê dikin, ji aliyê min ve jî der- basdarin. Ezê herî bêhtir rastiyên di derûna mijarên ku dijayetiyê nîşan didin de rave bikim.

Hê heke ez girtî bim jî, li Tirkiyeyê di giraveke tenê jibo min de ku

mercên wê di dîroka wê de diyar in, girtina min a bi serê xwe, rewşeke herî girantir e. Li Tirkiyeyê ji ber liberabûna mercên girtî- gehên tîpa F, ji 50 girtiyî bêhtir an bi sedema cerdan an jî bi rojiya mirinê şehîd ketin. Mercên ku ez tê de dijîm ji mercên tîpa F gelekî girantir in. Di rêznameyên ti girtîgehan de, di derbarê van sepînan de xal tine ne. Ez kirariya girtiyekî kêyfî û taybet dibînim. Kesek nabe şahidê min bê ez çawa dijîm. Ji aliyê hêzên ewlekariyê yên taybet ve ku hijmara wan di bin bîstan re nakeve, bîst û çar saetan him bi kamera û him jî bi çavên vekirî, tême çavdêrîkirin. Tenê gi- raniya vê sepînê ya psîkolojîk, encex bi raporeke Komîteya Şopan- dina Eşkenceyê ku rêxistineke xizima DMME ye, were nirxandin. Bi piçek xirabûna hewayê re, hevdîtinên min ê hefteyî ku bi pare- zerên xwe re saetekê dikim, cama diçe serê sê hefteyan saetekê. Bi birayekî xwe û du xwîşkên xwe re, encex bi mehan carekê hevdîti- nan dikim. Ji ber dûrbûn û hejariyê, hevdîtinên bi wan re wekî din zor e. Tewrîneka (alerjî) min a pir giran heye û mercên heyîn vê gi- rantir dikin. Jixwe avhewaya deryayê, bandoreke fetsînok li ser ten- duristiya min dike. Di van demên dawî de, serê deqîqeyê carekê avika tîr ku dikeve qirka min, ez mecbûr im bavêjim. Laşê min di merhaleya tirûşa xwe ya dawî de ye. Xwarina min bi şêweya kara- vana ye. Ji aliyê tenduristiya xwe ve, ne gengaz e ku ez bikaribim tiştekî bikirim. Digel vê yekê ez hewl didim ku bi fennandariya gi- ravê û bi rêveberiya girtîgehê re, têkiliyên xwe di nava pîvanên şar- mend (şareza) de bidim meşandin. Pirsgirêkên min ne ji wan tên. Statuya ku tê sepandin, di rewşa amûra çewsana psîkolojîk a herî mezin de ye. Digel ku ez girîngiyê bi van mijaran nadim, esasê wê pêwîst e sîstema lînça siyasî were vekirin. Di dema darizandinê de, cîhan tev bû şahid ku ji aliyê qismên bi timtêla şarweran û çapeme- niyê ve, hewayeke lînçê hate wezandin. Di salona dadgehê de, rex- neyeke piçûk jî bi peyana lînçê dihat pêrgandin. Heger ku pêşgiri- yên leşkerî yên taybet nebûna, diyarbû ku yê her şêweya şêtîtiyê pêkbihatana. Li derve terora ku çapemeniyê dida wezandin, bi ar- manca ku gelê Kurd bitirsînin û bikin ku dev ji doza xwe berde bû. Dixwestin ku em li bûyina xwe poşman bibin. Di vê pêvajoyê de, bi sedan dost û welatparêzan xwe şewitandin. Bi propagandeyeke pêşek ku teqez ezê bêm dardekirin, dixwestin hemû

hêviyên van mirovan tine bikin. Dixebitîn ku min weke mirovekî gelek basît nî- şan bidin û min ji çavê gel bixin. Bi karîkatur û şîroveyên sosret, dixwestin ku hemû xalên min ên tirûş jev vekin. Sempatiyên herî piçûk ên dostanî, bi şideta zêdekar dihat tepisandin. Armanca sîste- ma çewsana ku dihat sepandin, tinekirina hişmendiya siyasî û we- latparêz ya gel û da nîşan bidin ku dozeke wan tine ye. Dîlokeke ji- bo min were gotin, helbesteke jibo min were xwendin, jibo lînçki- rina di nava civakê de bes bû. Hunennend Ahmed Kaya ku jibo min bi awayek neyekser çend peyvên aştiyê anîn zimên, jibo lînçkirina siyasî têrê kir. Êdî nikarîbû li Tirkiyeyê bimîne.Xayîn hatibû îlan- kirin. Piştî demeke kin, nikarîbû vê êşê bikişîne û şehîd ket.

Di encama hewldanên bi israr ên lihevkirina aştî û demokrasi- yê de, ew dorhêla şoven hinekî hatiye derbaskirin. Civakê nakokî hê bêhtir bi rasteqînî dîtine. Bi aboriya rantê û şerê taybet, nelirê- tiyên ku ten jiyandin dîtine, têgihîştiye ku sedema vê qeyrana tê jiyandin damezraka siyaseta rantperest e. Ji aliyê din ve meqamên dewletê yen berpirsiyar, raporan pêktînin ku êdî, dewlet bi vesa- zîbûna mandeleker û tineker ên klasîk xwe ji pirsgirekan rizgar nake, vesazîbûneke demokratîk a ji nû ve jênerev e û pêdiviye nû- saziyên di vî derbarî de bi awayek lezgîn werin sepandin. PKK tê- gihîştiye ku xitimandinen bîrdoziyî û pratîk, bi nêzîkayiyên kevin nayên derbaskirin û çareserî nayên dîtin. Di nava xwe de veava- bûneke nû ya piralî dijî.

Hemû qismên civakê bi kûrayî dibînin ku, rewşeke nû derdike- ve holê û qolincên vê têne kişandin. Ji aliyê pirsgirêka Kurd ve rewşa ku tê jiyandin, ‘ne şer ne aştî’ ye. Demeke agirbestê ye ku li dora şer rawestanê şêwegirtiye. Hemû alî bi kûrayî li ser diramin, hewldidin fêmbikin bê pratîk û ramanên kêrhatî ye kîjan bin, polî-

tîkayen li gor vê pêkbînin û ji nû ve veavabikin. Hemû civaka Tirkiyeyê ketiye vê pêvajoyê. Her beş ji dîrokê heta bi rajaneyî û heta bi pêşerojê, xwe bi awayek piralî di ber çavan re derbasdike, cîha- nê û mercên welat ên der û hundir bi awayek rasteqîntir şîrove di- ke, dibe xwedî bemame û perspektîfen nû. Nûjenîbûna jiyana siyasî bi piraniyeke zêde pêşwazî dikin. Lêbelê ev hemû pêşveçûnên erênî jî ewletiyê nadin ku çareserî pêktên, tenê dide çespandin ku êdî mîna kevin nayê jiyandin. Pêwîstiya bê çawa ye bête jiyandin, bi pêşêxistina peymaneke civakî ku di serî de kurdan û hemû nas- name, bawerî, raman û cudahiyen zayendan bigire nava xwe ve gi- rêdayî ye. Ev yek jî zagona bingehîn û zagonên nû pewîst dike.

Pirsgirêka Tirkiyeyê ya şer û aştî, di kûrahiyeke ku pirsgireka Kurd derbasdike de ye. Him rabirduya wê ya dîrokî, him jî qayîş- kêşiyen civakî, olî û etnîk ên sîh salên dawî, ev rasteqînî derandiye rastê. Bîrdoziya fennî ya komarê û reveberiya wê ya olîgarşîk, her- çiqas ku xwestiye kemneke yekreng bikişîne ser civakê jî, di vê de serkeftî nebûye. Nakokî û levdanan ev kemn çirvirandine. Ya pê- divî, gihîştina zagoneke bingehîn a ku pirrengî û pirçandiyê bipeji- rîne ye. Xwesteke civakê ya di vî warî de xurt e û timî pêşve diçe. Li Tirkiye ya 2000an tê ferzkirin ku di derûn de ji nû ve şêwe bide komara laîk û demokratîk. Bi hindikayî li qasî ya sala 1920an, ve- guherîneke ji binî pêdivî ye.

Pêvajoya Îmralî ya mirin û jiyanê, him heyîna hewceyiyên vê veguherînê zelal kirine û him jî, rê û rebazên ku ev veguherîn yê çawa pêkwere berbiçav kirine. Bêguman di ve de rola PKK û ya ge- lê Kurd ku bi serokatiyê ve girêdayî, gelekî mezin e. Cara yekem e ku Kurd li hember komployeke mezin a der û hundir ji hev belav nebûne. Berevajî vê bi awayek derasayî hevûdin girtine û helwesta xwe ya aştî û lihevkirineke demokratîk danîne holê. Hêza vê hel- westê û diristiya wê, bandor li dewlet û hemû civekê kiriye, wêrekî daye wan ku ber bi aştiyê û peymana civakî gavan bavêjin. Peyma- neke civakî ku kurdan jî bigire nava xwe, di asta herî bilind de tê nîqaşkirin û ev yek jibo yekerbûna welat û yekîtiya dewletê şêwe- ya herî rast tê dîtin. Tişta tê jiyandin qolincên zayînê ne. Lêbelê ev nayê wê vateyê ku her tişt di rêyeke rast de pêşvediçe. Hêzên cî- geyî, paşverû û şoven, bennayiyên wan ên kevin

û statukoyên bu- rokratîk, xwedî potansiyeleke wisa ne ku her kêlî bikaribin astengi- yên nû û teqînan pêkbînin. Xeteriya teqînên civakî, bitemamî ji ro- jevê demeketine.

Bi vê rasteqîniyê ve girêdayî pêvajoya jiyana min a Îmralî, di derbarê parastina rewa de, bi destpêkirina ji min li her kesî û her derdoran, peywirên piralî bar dike. Ev peywir, jibo aştiyeke erênî û derbasbûna demokrasiyeke temamî, pêwîst dike ku hêzên PKK ên çekdar bibin xwedî xurtbûneke çendanî û çawanî. Ev ne tenê jibo hêzên li nava Tirkiyeyê ku aştiyê naxwazin, jibo hêrîşên paşverû- yên bihêz ên li Rojhilata Navîn û yên di nav kurdan de jî vala der- bixin, pêwîst dibe. Heta ku ev neyê pêkanîn, aştî û demokrasî yê bi- be nîgaşek (xeyal).

Mijara duyem a girîng, pêwîst e ku Kurd damezraka civaka klasîk derbas bikin û bi awayek wergirî, berfireh û tîkane, hebû- na civaka şarwer ku piraniya civakê di sînga xwe de bide hev pêk- bînin. Bersiva gel a ku bide jiyana min a Îmralî, damezrandina ci- vaka şarwer a bi vî rengî ye. Jibo birayên gelê Tirk û komên din ên çandî jî çareserî, damezrandina civakên şarwer e. Pêşnûmayek ji ya herî bingehîn a Tirkiyeyê, pêşvebirina civakên şarwer e. He- ta ku civaka şarwer neyê damezrandin, veavabûneke ji nû ve ya bi fennanên dewleta klasîk, yê nîgaş û xwexapandin be. Bi tay- betî çep û demokrasiya civakî (sosyal demokrasî) ku pêwîst e herî bêhtir li vê pêşnûmayê xwedî derkevin, divê ku damezraka xwe ya kevin a bawerhişk derbas bike û di baweşîneke fireh de, pêşe- vaniyê ji çareseriya hevgirtineke civakên şarwer re bike. Heke hi- nek rêzgirtina wan ji hevqas êşa ku hatiye kişandin û hevqas şe- hîdan re hebe, ev yek li wan ferzdike ku li vê peywira wan xwedî derkevin. Berevajî vê, yê pêşevaniya siyaset û desthilatiyê ji be- şên rastgir ên ku bêsexbêrî, ji demokrasî û aştiyê bêbawerî û be- hêman re, pêşkêş bikin. Di şerê mirin û jiyana xwe ya Îmralî de, bi vê hişmendiyê û weke hay ji berpirsiyariyên xwe hebim, pêdi- viyên vê yekê bi bawerî û wîre dikim. Ev vateyeke jiyanî hildigi- re ku, kes û saziyên têkildar xweş dahûrînin bê ev jiyana gelên me tê çi vateyê. Aştiyeke birûmet û çareseriyeke tevî ya demokratîk, çêtirgirtineke me teva ye û giraniya navenda xebatên me ye. Lê- belê bi zanîna hêzên şer û yên çetegerî, pêwîst e ev yek ji ber ça- van neyê dûrxistin ku, tinekirineke ji min

destpêbike, di serî de ji kurdan yê bibe kûştina deh hezaran. Divê neyê jibîrkirin ku, he- defa bingeh ya hêzên der û hundir ên ku komplo amadekirin jî ev e û di nava demê de yê karibin li tinekirineke wiha xwe biqewi- mînin. Weke ku sibe ev yek yê pêkwere amadekirina hemû cure- yên parastinê şert e. Aştiya birûmet a pêşerojê, heger nebe jî şerê azadiyê yê birûmet, encex di vî bingehî de serkeftî bibe.

Ez daxwaz û hêviyên xwe careke din diyar dikim, DYA û PMME û DMME ku hêza çareseriya demokratîk û hiqûqî ya wê di- yardikin, jibo tevkariyeke erênî li pêvajoya Tirkiyeyê bikin, yê po- lîtîka û bîrûbaweriya mêtingehkarî ya klasîk a dema borî derbasbi- kin, ber bi aştî û lihevkirineke demokratîk bi biryarên dadmendî, gavan bavêjin.

**d- Li DMME Çareseriya Dostanî, Lêgerînên Guftûgoyê û Peywira KE yê:** Rêyeke çareseriyê ku DMME dixwaze pêşbixe, çareseriya dostanî ya di navbera dozdar û dozlêkirî de ye. Tişta ji vê tê fêmkirin, hewldana ku pirsgirêka di navê de bi guftûgoyê ji navê rakin e, tawîzên pêdivî an jî xalên lihevkirinê bi hev re pêş- wazî bikin an jî biryar bidin.

Heger ku mercên Tirkiyeyê yên polîtîk û organên biryarê amede bûna, berî ku DMME bikeve pêvajoya biryara di derbarê min de, li ser pirsgirêkên bi Tirkiyeyê re û li ser mijarên dijî PMME, lêgerîna çareseriyê ya bi guftûgoyê yê çêtirgirtina min bûna. Ez bixwe xwe jibo çareseriyeke bi vî rengî bi angaşt û amade dibînim. Tê zanîn ku di sala 1993an de di pêvajoyeke wiha de, bi serokkomar birêz Ozal re min biryardariya xwe nîşan dabû. Vê dawiyê bi rêyên neyekser hinek nêzîkayiyên guftûgoyan pêşketin. Dewletê nîşan da ku ji vê rêbazê re bitemamî ne girtiye. Lêbelê hinek pêşveçûnên neyînî, hê- zên ku çareserî ne dixwestin û heta bi dawî di şidetê de bi israr, ga- vên bi vî rengî bê bandor kirin. Digel vê yekê jî, herî dawî di serê Rezbera 1998an de, bi destpêkirina agirbesteke yekalî, hewl hate dan ku zemînek ji gavên bi vî rengî re were amadekirin. Dîsa 9 Cot- meh 1998an piştî polîtîkaya çewsanê ya li pêvajoyê, çêtirgirtina min a ne çiyê ya Ewropa, ji ber sedema pêşvebirina guftûgoyan bû. Li Îmralî pêvajoya pirsiyariya min, di heman hewayê de derbas bû. Li vir ji lêpirsîneke klasîk zêdetir, bi

israr li ser hate rawestandin ku rêya rast a derketinê, lêgerîna bersiva çareseriyê ya bi guftûgoya ye. Vê dawiyê di vê bingehê de, him ji meqamên rayedarên dew- letê re û him jî ji rayedarên PKKê re, min nameyên di derbarê van nêzîkayiyan de şandin. Parêznameya min a di derbarê darizandina Îmralî de ku min amade kirî, herî bêhtir mesajeke aştî û lihevkiri- neke demokratîk bû. Vê parêznameya min, dikişandina dorhelê ya ber bi aştî û lêgerîna çareseriya lihevkirina demokratîk de, rê li ber bandorên girîng vekir. Ez daxwaz dikim ku ev belge jibo DMME jî, weke parêznameyeke veser were lêkolîn.

Ev parêznameya min ku min jibo DMME amade kirî, di wê ar- mancê de ye ku, rêya diçe guftûgoyeke ku pîvanên hiqûqê demok- ratîk bingeh digire, ronahî bike. Dema were lêkolîn, yê were dîtin ku ji hemû aliyan re, li gor giyana PMME di nava lêgerîna çarese- riyekê de ye. Herwiha bi pêşêxistina pêşniyara dadgehê ya çarese- riya dostanî, ez girîng dibînim û hêvîdarim ku lêkolîneke berfireh li ser parêznameya min were kirin.

Li Tirkiyeyê jî, TBMM (Meclisa Mezin a Neteweya Tirkiyeyê) amadekariyên xwe dike ku di demeke nêzîk de, di zagona bingehîn de hinek guherînên girîng çêbike. Ev amadekarî annanc dikin ku ji- bo endamtiya YE, bi Krîterên Kopenhagê re ahengdariyekê pêkbî- nin. Heger ev guherîn liqasî ku wergiriya PMME pêrgîn bike çêbi- be, derfetên çareseriya dostanî dikarin derkevin holê. Lêbelê israr- kirina hinek partiyen şoven û paşverû ya di warê cizayê mirinê de, sexbêriyên li hember perwerdeya bi zimanê Kurdî û azadiya îfade- yê ku alîgirên berdewamiya qedexeyan, dikarin gavên ber bi vî alî ve vala derêxin. Lêbelê dîsa derfeteke ku derkeve holê, nirxandina wê dikeve ser milê aliyên berpirsiyar.

Ji aliyê din ve, PKK ya ku bi giranî li derî sînoran di sazûmana parastina rewa de, bi biryar û amade, jibo guftûgoyê dorhêlê tîne rewşeke kêrhatî. Edî aliyê ku pêwîst e gavan bavêje, meqamên ra- yedar ên dewletê ne. Hêvî û pêşniyara me, di vê rêya ku jibo dew- letê jî birûmet û sûdmend de, teşwîqker be û gavan bavêje. Eslê wê mercên der û hundir ên ku hardu alî jî dorpêç kirine, gavavêtinên bi vî rengî him lezgîn dikinû him jî dîrokî digirin. DMME jî ji ber gi- rîngiya mijarê, ku bi hewldaneke taybet bi annanca çareseriya dos- tanî, hêzê bide lêgerînên guftûgoyê û bangê li aliyan bike, heger ku serkeftî bibe yê were vateyeke dîrokî. Di derbarê hemû mijarên ku dadgeha bilind peşniyar bike de, dixwazim nêzîkayiyên xwe yên bi mebesta baş û daxwazên xwe diyar bikim.

Ji bo KE ya weke hêza sepandina biryarên ku DMME yê bide jî, ez pêwîst dibînim hinek raman û pêşniyarên xwe bi kurtayî bilêv bikim: KE berpirsiyare ku PMME bisepîne û çavdêrî bike. Tirkiye nêzîkî 50 saline ku endamê damezrîner ê konseyê ye. Ennenîstan û Azerbaycana ku herî dawî tevlî bûne jî, di zagonên xwe de guherî- nên pêdivî pêkanîn. Tirkiya hê di gelek mijaran de, guherînên ku PMME pêdivî dibîne pêknayîne. Di vê mijarê de, di bereka birya- rên DMME de ku hiqûqê hundirîn jî girêdide, guherînên zagona bingehîn û yên zagonî jî paşve davêje. Bêguman konseyê Tirkiye gelek caran hişyar kiriye. Lêbelê êdî ji hişyariyan wêdetir, pêwîst e ku hinek pêşgiriyan pêkbîne. Pêşlênegirtina wê, hiqûqê wê jî dihin- cirîne. Weke ku helwestên tawîzkar nîşanî endamekî xwe dide. Ev rewş bi awayek neyînî, bandorê li pêşveçûna dewleta hiqûqê de- mokratîk a li Tirkiyeyê dike. Bitaybetî, bidawîbûna van paşveavê- tinên ku ji ber pirsgirêka Kurd û laîktiyê derdikevin holê, jibo ew- lekariya di derbarê hiqûq de neyê hincirandin, pir girîng e.

Tirkiye di serî de cizayê mirinê, hikmên zagonan ên ku jibo he- mû hindikayiyan û ramanan azadiya îfadeyê qedexe kirî, li gor PMME birêkûpêk nake. Doza min jî, di vî babetî de hatiye derawa- yeke ku rola kilîtê dilîze, heta weke amûreke îstîsmara siyasî tê bi- karanîn. Cizayê mirina min ne li hundir tenê, li platfonna YE jî ji- bo endamtiya YE weke keysekê tê bikaranîn. Ev rewş ne min bite- nê, daxwazên gelê Kurd ên

rewa jî dike mijara bazarê. Heçku sazi- yên YE xwedî nirxên nonnatîf e. Ev nirx neyekser be jî nayên nî- qaşkirin û nabin mijara tawîzan. Ez dixwazim nîşan bidim ku, ma- fê min û gelê Kurd ên rewa û zagonî ku timî bi Tirkiyeyê re tê nî- qaşkirin û dibin mijara bazarê, gelekî çewt û bêmafî ye. Ez peywir dibînim nîşan bidim ku, KE kêlî berî kêliyê bang li endamê xwe yê damezrîner Tirkiyeyê bike, ku ahengdarî nonnên wê bibe û pêdivi- yên wan bicîh bîne.

Ji aliyê din ve, KE têkiliyên xwe bihêz ên bi Tirkiyeyê re, di pirs- gireka Kurd de ji bo pêşvebirina guftûgoya siyasî bikarbîne, him yê di bicîhanîna biryarên DMME de û him jî yê di nîşandana Tirkiye- yê ya peresîna ber bi dewleta hiqûq a demokratîk û laîk ve, roleke girîng bilîze. Ev gelekî girîng e ku KE, agirbesta PKK a yekalî ku di bingeha parastina rewa de dide meşandin, weke fersendekê bibî- ne, di derbarê lêgerîna guftûgoyên me yên bi Tirkiyeyê re, bi hin- dikayî li qasî têkiliyên ku nîşanî Kosovo û Makedonya dan, hewl bide û destekê bide. Hewceyiya kurdan û ya Tirkiyeyê jî bi vê des- tekê heye. Ji ber encamên dibêtiya doza min, ez nîşandana daxwa- za xwe ya di vî derbarî de pêdivî dibînim, bi hewldanên hêja yên KE ku yê tevkariyê bike, hêvîyên xwe tînime zimên.

Weke encamê, Parêznameya xwe ya ku min jibo DMME amade- kirî, bi vê şêweyê diqedînim. Pêdivî dibînim ku bi parêznameya min a Îmralî re were nirxandin. Ez daxwaz dikim ku, zanînên di derbarê gelek bûyer û kesên ku pêdiviye werin lêkolîn de min da- ne, weke belge û şahidan werin nirxandin. Dixwazim dubare bikim ku pêdivî be, ji parastina veser a nivîskî û peyvkî re jî, amade me. Bi vê parêznameya xwe ez baweriya xwe nîşan didim ku DMME him ji bo gelê me, PKKû ji bo min, himjî ji bo mirovatiya pêşverû û Tirkiyeyê, yê biryareke dadmend, herî rast û layîqî dîrokê bide.

Bi vê mebestê rêzdariyên xwe pêşkêş dikim.

# BEŞA NEHEM

## Nasnameya Apo: Ji Bavik Ber bi Gelbûnê

Xêzkirina pêşnûmayeke nasnameya Abdullah Ocalan, weke kesê ku bûyêr herî sift jiyayî, jibo min dibe peywirek. Xêz- kirineke bi vî rengî, di heman demê de jibo kesên ku xebatên dîrok, civaknasî, jînenîgarî û huner dikin, yê valahiyeke belgeyan dagire. Ji aliyê din ve weke rêxistineke teorîk û pratîk, jiberku derdoreke fireh bi awayek berbiçav têkildar dike û bandorê li gelek bûyerên civakî dike, terîfkirina wê ya rast girîngtir dike. Ji aliyê ronahîkiri- na gelek nirxandinên ku di dennafê wê de hatine nivîsandin û yê werin nivîsandin, yên hetine gotin û yên werin gotin de, ye sûd- mend be. Bêgûman pêdivî ye ku mijar ji aliyê wêje û zanistî ve jî were xebitandin û çi roja ku diçe girîngiya wê zêdetir dibe. Li qasî ku siftbûna gelekî û dîrokê ya di takekesekî de pir hindik hatiye ji- yandin, takekesekî ku bi meşeke bi tenê ya bi vî rengî, dîrokeke û gelek pijandî û daye meşandin, hindikî hatiye dîtin. Çi roja derbas- dibe bêhtir tê fêmkirin ku gelek mijarên werin ronahîkirin hene. Ji- bo pirsên ku him di derdora dost û rêhevalan de, him jî di hest û ra- manên hemberan (hevrik) de, derketine holê û guherînên ku di ji- yana wan de çêbûne bi awayek rast werin şîrovekirin, terîfkirina nasnameyeke rast pêwîst e. Ya girîngtir ev e ku, heger nasname rast neyê terîfkirin, vê xeteriyê bi xwe re tîne ku ji trajediyen rê li ber wan vekirî bêhtir, yê trajêdiyen mezintir li wan zêde bike. Dîsa der- doreke mijarê ya îstîsmarker a pir fireh çêbûye. Terîfnekirina rast, yê bike ku ev derdor lîstik û berjewendiyên xwe bêhtir bi rihetî bi- din meşandin. Gelek

sedemên bi vî rengî yê bikêrî zindîgirtina pa- raztina DMME jî werin. Ev jî pêdivî dike ku nasname were nivî- sandin. Ji aliyê ku bennayiyeke Rojhilata Navîn nîşan bide bê li hember şaristaniya Ewropa tê çi vateyê, yê gelekî sosret be.

## 1- Çêbûna Xwezayî, Hilweşîna Çanda Bavik û Ketina Daristana Şaristaniyê

Ev peytandineke zanistî ye ku, derdora xwezayî û pêşveçûna dî- rokî, di çêbûna kesayetiya takekes de rola diyarker dilîze. Di asta terîfkirinê de di derbarê derdor û çarçoveya dîrokî de, dikarin hinek diyarkeriyên cewherî werin kirin. Derdora ku ez lê çêbûme, weke penaveke (plato) bi geliyan hatî parçekirin, xwedî hinek girikên ne bilinde û li dera ku deşta Mezopotamya bi Torosên navîn re li roja- va dibe yek de cîh girtiye. Gundê min Amara (Omerli) ku ez lê çê- bûme û mezin bûme, pênc km nêzîkî qewsa ku Ferad ji bakur tê û ber bi başûr bi awayek hişk lê di fitile de hatiye avakirin. Avhewa- ya wî, avhewayeke Derya Spî ya derengmayî ye. Li nîvê herêma ku di dîrokê de bi navê Heyva Berhemdar tê binavkirin de ye. Jibo he- mû çandên rîwek û ajalan bikêrhatiye. Ji jiyandina taybetiyên neo- lîtîka yên niha jî tê fêmkirin ku, herêmeke bingehîn a civaka neolî- tîk lê pêşveçûyî ye. Taybetiyên feodal û dû re yên kapîtalîst ku nê- zîkî derdorên me pêşveçûbûn, li herêma ku ez lê çêbûme hewqasî bibandor nebûne. Ev yek gelekî balkêş e ku heyîna civaka gund a neolîtîk bi awayek zexm dide meşandin.

Tê fêmkirin ku ev qad, bûye cîhê mêtingehkariya şaristaniya Su- mer ê pêşî. Dikeve nîvê li başûr mêtingeha sumeriyan Kargamiş, li rojhilat Riha-Bêleçûk, li bakur Samsat û li rojava bajarê Pere. He- rêma navendî ya Qerantiya Komagene ye. Mîsoger e ku BZ di sa- lên 2000an de şaristanî naskiriye. Ev yek jî dibêtiyeke xurt e ku 15 000 sal temenê civaka neolîtîk a berê jî jiyaye. Bûye şahidê şarista- niyên Asûr, Med, Pers, Sasanî, Helen, Komagene, Roma, Bîzans, Ereb-îslam û Osmanî-Tirk.

Taybetiyeke dîrokê ya din a li herêmê, mîna deriyekî derbasbû- na civakên etnîk ên curbicur û qewma ye. Civakeke etnîk û qew- mekî saf tine. Hêjî dewsa mozaîkeke ku ji têkeliya wan derketî ho- lê bi awayek

zexm xuya ye. Ji daneyên şûnwamasî, peyvnasî û dî- rokî tê fêhmkirin ku, yen li herêmê herî pêşî niştecîh bûne, Hûriyên ji binyata Aryen in. Şibandina damezraka zimanê kurdên îro û ya zimanê Hûriyan, vê yekê rast derdixe. Weke tê zanîn navê Hûrî, ji aliyê sumeriyan ve li wan ên ku li çiyayên bakur ên bilind bicîh bû- bûn, hatibû kirin. Dîsa sumeriyan carina jî ev gel bi navê Kurtî an- go 'gelê çiyayî' binavdikir. 'Kur' çiya ye û 'tî' jî xwemalîbûnê îfa- de dike. Li başûr jî civakeke etnîk a ku carcaran dikete herêmê cîh digire, ev jî Amorîtênji binyata Samî ne. Dibe ku navê Amara ji vê çandê bandor girtibe. Vê dawiyê ev komên ku bi ereban xwe xweyî dikirin, di bin fennandariya Saad Ibnî Waqas de, Îslamtî kişandine herêmê. Hêjî navê gelek mirov û gundan ji binyata Ereb î îslamê ne. Qayîşkêşiya Hûrî-Amorît a kevneşopî gengaz e ku li herêmê di- çe dîrokên gelekî kevin. Gelek bennayiyên asûriyan hê jî li herêmê tên dîtin. Gelek latên ku nîvîsandî hene.

Komeke etnîkî ya din ku herêm wan nasdike Lûwî û Ennen nin Di pêvajoya helandina ku ji aliye grekan ve ji BZ 1000 salan heta bi PZ 1000 salan domandî de, mîsoger e ku Lûwî li herêmê kome- ke etnîk a bandorker e. Hêjî peyva 'Gond' ku tê wateya gund, bi zi- manê Lûwî ye û di wateya 'girik' de ye. Sumerî van 'girik'an bi 'Ûr' binavdikin û Lûwî dibêjine wan 'Gond'. Gelekî Anatolya yê herî kevn e, herî bêhtir li Başûr û Başûrêrojhilata Anatolya cîwar bûne û ziman û çanda wan ji binyata Aryen e.

Ji bennayiyên çanda wan diyar e ku Ennen jî gelek ji yê herêmê herî kevn e. Gundê Cibin ê cîranê me ku pênc salan ez çûm û ha- tim û min dibistana seretayî lê xwendî, heta bi salên komarê jî gun- dekî ennenan bû. Qezaya ma ya rêveberiyê Xalfetî, dibêtiyeke xurt e ku navê xwe ji gelekî binavê Xal-Paû ku bi kankariyê dilebikîn standibe. Ev dibêtiyek e ku (di serî de hêsinkarî yên ku bi kanke- riyê re têkildar Ennen bûn û ez şahidê vê yekê bûm) ev kalikên er- menan bin. Hostatiya kankeriyê ya li herêmê karê ennenan bû. Ji PZ sedsala 2an ve, tê dîtin ku eşîrên tirkmenan jî têne herêmê. Ji- berku li rojhilat serdestiya kurdan a zêdekar hebû, tirkmen di roja- vayê Ferad re ber bi herêmê hatine.

Di bin ronahiya van rastiyan de, heger ku ez nexşeyeke derdora gundê me ya etnîk xêzk bikim, Li navendê Amara Kurd e. Li roja- va li

peravê Feradê gunde Ayno (ji erebî ji Ayn tê, ango tê wateya 'kanî') Tirkmen e. Li bakur Bazûr, Derto Gogan (navenda nehiye ye) Kurd in. Li rojhilat Arah Tirkmen e. Li başûr Aram Tirkmen e. Navên Arah û Aram, dibêtiyeke ku ji binyata Asûr-Amorît bin. Li başûr Cibîn heta dema komarê jî Ennen bû, bi komare re dibe Tirk. Em bi temamî di dorhêleke mozaîka etnîk û çandî de ne. Sê-çar ko- mên etnîk û çandî yên bingeha Rojhilata Navîn, li derdora me tev- lîhevbûneke sift jiyane. Bandora Samî, Amorît, Asûr û Ereb timî ji başûr, Ennen jî weke gelekî pîşekar, kanker û hesinkar ji bakur ha- tine. Tirk û Tirkmen komeke etnîk û çandî ku herî dawî hatiye he- rêmê ye. Kurd di herêmê de koma etnîk a bingeh e ku şoreş û çan- da neolîtîkê afirandine û rola navendî lîstine. Çandinî û ajaldarî leb- ka wan a resen e. Ereb û Amorît bi bazirganiyê lebikîne, Ennen bi kankariye û Tirkmen bi pey koçberî û şervaniyê ketine.

Taybetiya qadê ya bi vî rengî, destûrê nade serdestiya çanda qewmekî bi tenê. Ji demên dîrokê yên kevin ve, jiyandina çandî ya piranîparêz a bi xweşbînî ferz dike. Ji aliyê bawerî ve, herêmeke ku ji demên kevin ve îslamî û xiristiyanî di nava hev de dijî ye. Her- wiha pênasiyeke herêma herî kevin a ku piranîparêziya etnîk, çandî û bawerî hildigire. Di navbera komên etnîk de borîn pir sift in. Ze- wac çêdibin. Ev rewş dide nîşandan bê çima sazûmaneke çînî bihêz a çewsîner çênabe. Jiberku civakeke bi tenê ne serdest e, ji her ci- vakê komên etnîk hene û damezraka xwe ya hundirîn diparêzin, taybetiyên gund ên neolîtîk a bihêz, astengiyê dikin ku şêweyeke feodal û koledar, begîtî an jî dewleteke bihêz dexma xwe li herêmê bixin. Civaka gund a herêmê, bi hezaran salan hewl dide ku, sazû- maneke civakî ya nêzîkî malbatên gundî yên azad ku asta bavik û qebîle derbasnekirine, biparêze. Lewra qet bibîr nayê ku beg he- bûn. Ji dema sumeriyan ve, li gundên Bêleçûk, Xalfetî û Samsatê, hêza burokrasiyeke mêtingeh a bisînor ku bi serdestiyeke navendî ve girêdayî, heye. Ev burokrasî, biyaniyî çanda gelên herêmê ye, weke ku dîwarekî qalind di navbera wan de hatibe hûnandin. Ev taybetî hêjî berdewam dike. Çawaniya (wesfê) burokrasiyê ya mê- tingehperest, pêşî li çînçînîbûneke di vateya cîgeyî de girtiye, derf- et nedaye çêbûna burokrasiyeke cîgeyî. Herwiha ji

çanda çîneke xurt nayê behskirin. Çanda serdest, herî bêhtir çanda malbata gun- dîtiya azad e. Çandeke eşîrtî ya bihêz jî nayê jiyandin. Çanda kapî- talîst nû pêşvediçe. Ev rasteqînî rewşeke taybebnendiya vê qadê ye. Jiberku dewsên çanda çandiniya neolîtîkê yên bihêz hene, ev yek dibe sedema ku hestên wekheviyê û derawaya jinê ya nebindest hê jî bijîn. Bi kurtayî ez dikarim taybetiyên cîhê ez lê çêbûme yên dî- rokî û xwezayî, bi vî rengî terîf bikim.

Kartêkereke ku ji nêzîk ve diyarker dike zarok nasnameyê qe- zenc bike, malbat e. Malbat jî ya ku cîh di nav de digire, civaka gund e. Weke ku ji çarçowa tê xêzkirin jî were fêmkirin, civaka me ya gund, di bin bandora çanda neolîtîka beriya hezar salan de, bêyî ku baweriyên îslamtiya feodal fêhm bike dijî. Ji malbatên bi rewiş- ta xizan (hejar) yên ku di navbera wan de cudahiya çîn tine, xwedî milkê hindik ku têra wan nake û li derve karker û paletiyê dikin, tê holê. Eşîrtî hatiye derbaskirin, xizimtî û girêdanên malbatî liqasî ku têra qebîlebûnê jî neke, kêm bûye. Li hember têkiliyen kapîta- lîst ku xurt bûne, ketine derawaya kedkarên xizan. Biyaniyê vesaz- bûna komarê ya burokratîk in. Xwedî rêjeke xwendinê ya bisînor in. Hay ji çanda komarê tine ne. Dikare were gotin ku, civaka ne- olîtîk jî di nav de, bandorên civakên koledar, feodal û kapîtalîst, tev ji derve girtine û di veguherîneke diyalektîkê re derbasnekiri- ne, bi têgihîneke “qeder e, tişta were serî yê bête kişandin” peji- randine û pasîfîzmeke bi kûrayî jiyane. Zor e ku hemû çand jibo wan tiştekî îfade bikin. Weke tebeqeyên fosîlan ku di bin erdê de mabin, zenûn bûne. Ji aliyê hişî û giyanî ve, ti hêviya afirîneriyê ji wan nayê kirin. Em dikarin bibêjine vê yekê ‘mayina li derî demê’. Bi gelemperî taybetiyên bawerhişkî û bergirtîbûna ku civakên Roj- hilat ji salên PZ lOOOan ve dijîn, derbasdarin. Di vateya mîtoloji- yê de jî bîranînên xwe winda kirine, Hay jê nîne ku xwedayê ba- weriya wan pê heyî kîjan pêdiviyên wan pêktîne, weke civakeke marjînal rewşeke li herî jêr dijî û parvedike. Jiberku tevlî ti merha- leyên şoreşger ên sazûmana kapîtalîst nebûne, rewşa wan a marjî- nal hê bêhtir teng dibe. Civaka gund encex bi zorê xwe bi awayek fizîkî hildiberîne, ji aliyê bîrdoziyî ve biyanîbûna bîrayî û giyanî herî bi kûrayî dijî. Annanceke jiyanê cidî, ya civakî, siyasî û bîr- doziyî tine ye. Rizgarkerî

û ramana axretê jî vateya xwe winda di- kin. Encex bûyina kannendekî piçûk û karkeriya li Ewropa, hevi- yen bisînor dafirîne. Em bi rasteqîniya mirovekî tebatî (pasîf) re rûbirû ne ku, ne başiyên wî tine ne, lêbelê ti xêrên wî jî tine ne. He- mû tişt heşifandî (tine), vateya xwe winda kiriye, neçariyê weke qederê dibîne, ji afirîneriyê dûr, xwe kiriye mehkûmê jiyaneke di girtîgeha cîhanê ya servekirî de dîlgirtî.

Ez ji malbateke ku ev rastî parvekirine têm. Lêbelê dema bi hi- nek têgînan hizirîm ku genên civakî jî dikarin bandorker bibin, ez têgihîştim ku pêdiviya malbat hê ji nêzîk ve were lêkolîn. Di dane tinene ku ji binyata bavik an jî xanedanan be. Malbeteke di navbe- ra herdukan de ye, dibêtî heye ku malbateke esîl be. Bi Kurdî jê re “Mala Ocê” dibêjin. “Mal” weke malbatê dikare were bikaranîn, ‘Ocê’ kalikê me yê herî kevin ku tê zanîn e. Ez di wê baweriyê de me ku, paşnavê Ocalan ji ber vî kalikê me, li me kirine. Ji du lawên Ocê Hiseyn û Evdile, malbat têne holê. Bavê min dibe lawê Evdi- le. Navê wî Emere e. Navê min ji yê kalikê min tê. Tê gotin ku ka- likê min, zanyarek û siwariyekî hespê yê bi nav û deng bû. Ez jî bû- me şahid ku bavê min bintûte bû, lêbelê mîsoger bi baweriyên xwe ve girêdayî, dirist, binamûs bû, di rewişteke wisa debû ku, di der- barê kesekî de ne baş nedihizirî. Wilo bi min dihat, mirov digot ku derfet hebin, bi van taybetiyên xwe ji tevlîbûna derketinên dîrokî paşve nedima. Eslê wê zana bû. Di naskirina min de, di asta pêş de bû. Tê bîra min dema ku li bin dareke fisteqê, paqijiya karê min û şêweya min weke awayek fetihker anîbû zimên, êşa ne xurtbûna xwe ya kûr dikişand. Bîranîna xwe ya ku herî jibîmekim bînim zi- mên, yê di cîh de be. Dema ku ez li Amedê kannendê qedestro bûm, min ew li ser dîware wilayetê dît. Dema ku me petêxek şikand û xwar, xweşhaliya xwe nîşan da. Ez bi vê rewşa wî xemgîn bû- bûm. Qezenckirina bi kedê, mijara ku herî pûte pê dida bû. Dema ku ji me hêrs dibû, ev nifir timî li me dikir: ‘Nan bibe kîvroşk, hûn jî bibin tajî û pey bikevin.’ Dixwest ku şerê nên bide fêhmkirin. Lê- belê ew hêza tegihîna me nebû. Dema ku gotibû min “Ez bimirim rondikek ji çavê te nayê xwarê”, bi zanayî axiftibû û rast gotibû.

Di mijara din de evîna malbatê ya esîltiyê serdest bû. Tê gotin ku di dema osmanî ya kevin de, bi navê Osman Paşa burokratek ji mal- batê

derketibû. îsmet îmset jî, di derbarê jînenîgariya min de, di xe- batên ku kiribû de, bi Serfennandariya Artêşa Tirkiyeyê ve girê- dayî, gihabû encameke bi vî rengî. Ev dibêtî mezin e ku malbatê, li hember hêrîşên tirkmen û ereban, pêşevaniya kurdan kiribe. Ev yek ji zeviyên wan ên berfireh jî diyar dibe ku herêm, li hember erebên ji başûr û tirkmenên ji rojava hatine, parastine. Ji Eşîra Berazî ji baskê herî roj ava ji Beskiyan tên û malbata wan a herî mîlîtan tê he- sibandin. Tê zanîn ku beşek ji beraziyan li nêzîkî Sileymaniyê hi- nek jî li sînorê Iraq û îranê dijîn. Dema ku ez di nav de dijiyam, gi- rêdanên eşîrê bi temamî hatibûn jibîrkirin. Bi navekî gelemper, her malbatê digote xwe ‘Kunnanc”. ‘Kunnanctiyê’, kurdên ku ji eşîre qetiyayî û ketî pêvajoya gelbûnê îfade dikir.

Bi berfirehî Kunnancbûn, di dawiya sedsala I9an û di sedsala 20an de pêşvediçe. Ev jî jibo kurdan tê vateya gelbûneke sift. De- ma em li ber çavan bigirin ku ji hemû malbatên li derî qebîle û eşî- ran dimînin re, Kunnanc tê gotin, Ev pêvajoya ku li rasta şikandi- na bandora feodaliyê û derketina holê ya kedkarên gund û çolterê (rnirêba, nîvekar) hatî, dînamîkeke Kurd a girîng e. Weke ku ez ji vê dînamîkê hatime, PKK jî tevgereke Kunnanc e. Bingeha wê ya sosyoekonomîk bi giranî Kunnanc e. Kunnanc, kurdên di pêvajo- ya gelbûnê de îfade dike. Hestên qebîle û eşîrtiyê tine dibin, heger ku lawaz û ji ber xwe ve be jî, bîrûbaweriyeke qewm û gel cîhê vê dadigire. Li gor hişmendiya eşîrtiyê, veguherîna şêweya hişmendi- yeke civakî û neteweyî îfade dike. Ev orîjînaliya him di damezraka serokatiya PKK de û him jî ya di damezraka kadroyên bingeh de, wê ji hemû serok û rêxistinên Kurd ên din cuda dike.

Aliyê dayîkê bêhtir tevlîhev e. Diya bavê min Besê, ji eşîra Ge- dikan baskê Şabikan ên pir şerûd ku li başûre Xalfetî, ji dora Bêle- çûkê heta bi hêla ereban cîh digirin e. Jibo mirina ji ber xwe ve, di- bêjin ‘mirina mirdar a pîs’. Kalikê min Hemîd ango bavê diya min, ji gundê tirkmenan Arah bi Hawa re dizewice û diya min Ewêşa (Uweyş) ji wê çêdibe. Hawa û Ewêşa di malbatê de bi bandor in û jina hêzdar temsîl dikin. Xwe ti caran ji mêr piçûktir ne dipejiran- din. Dikare were gotin ku, têkoşîneke civakî ya ku ji nakokiya mêr û jinê derdikete holê, bi şêweya herî hoveber dijiyan. Teraza ku hatî damezrandin, ne bi şêweya serdestiyê bû, dişibiya lihevkirinekê. Lêbelê her kêlî jî tovê levdanê di nava xwe de radigirt. Malbata me ku zewac bi binyatên din re jî pêkanîne, ji ber pêdiviya lihevkirin û nêzîkayiyeke di navberê de ye. Rêyeke ku dawiyê li levdanên kev- neşopî bînin jî, danûstandina qîza ye. Tê fêhmkirin ku ev rêbaz ge- lekî hatiye bikaranîn.

Bi kurtayî di malbata ku ez dikarim çarçova wê wiha nîşan bi- dim de, dema ez çêbûme, min bennayiya dawî ya bavik û malbatê temsîl dikir. Dîrokeke etnîk a 15 000 sal, weke ku bi min re bidawî dibe. Pêvajoya erjeng a bîrdoziyî û siyasî ku ezê bikevime navê, di rewşa ku etnîsîteyê bi dawî bîne û serdema gel bide destpêkirin de ye. Derbasbûyina wê ya gelekî bi qolinc, ji vê taybetiyê dertê. Ezê weke çennsorê dawî bilîzim. Belkî jî mîsyona hêviya dawî ya ni- jad, pê demexistibin û li min bar kiribin. Piştî ku min qalikê mal- patê bi stemkarî parçekir, ez dû re pê derêxim ku ez zorê li mîrate- ya 15 000 salan dikim. Piştî ku dayîk û bavê min mirin, êdî nûka minê vateya xemgînî û rondikên çavên wan fêhm bikira. Lêbelê ali- yekî stemkar ê her şoreşekê heye. Viyana şoreşê ku hay ji hinek stemkariya namîne, weke xwezaya wê ye. Tenê mijara ku ez dilê xwe pê xweş dikim, hemû dê û bavên bi vî rengî ku bibînin, zaro- kên wan dema ya nû derdixin holê, qet xiyanetê li dema xwe ya borî nakin, berevajî vê xwedîlêderketina wan herî biêş û zor e, lê- belê weke rêya herî birûmet digirin. Ji ber vê yekê ew dikarin di tir- bên xwe de rihet rakevin.

Çawa ez hatim cîhanê û çawa min xwe naskir, min xwe di nîvê şoreşa malbatê û gund de dît. Ne armancên eşîrtî, ne yên çînî û ne jî yên neteweyî hebûn ku xwe bi wan ve girêbidhn. 01 bixwe jî, te- nê bi

jiberkirina erebî ji têrkirinê dûr bû. Mercên ku malbatê bi şê- weyeke xurt jinûve hilberînin, nebûn. Ti tiştî ku hestên bilindbûnê têr bikin, li holê tinebûn. Hê jî tê bîra min ku, dibistan weke cina- wirekî min daqûrtîne bi min dihat. Min bajar jî weke hebûneke ku ez pê nikaribim û yê min daqûrtîne didît. Civakên gund jî ti hêvî ne- didan. Ji seb, fitne û fesadiyê pêde ti erka wan a din tinebû. Di vê demê de çavên min tim yê li gundewariyê bûna. Heta wisa tê bîra min ku, diya min sê derî li ser min asê dikirin û sê caran ez nîvxe- niqandî kirim, dîsa dema ez derketim derve, min berê xwe da gun- dewariyê. Dibû virevira min û digeriyam. Diyar e ku ez li tiştna di- geriyam. Vê dawiyê derketinên gelek pêxemberî û feylesofiyan ku ezê hember bigirim, pêdivî bi meşên tenê yên bi vî rengî hebûn. Rizgarbûna ji tenikiya rojaneyîtî û siftbûna ber bi nûjeniyê, bi vê rêbazê bêhtir gengaz dibû. Ez li dij hemû rêzikên malbatê yên gi- rîng derketibûm. Nêrîna min bi gumanbarî û binpêkirina min a kev- neşopî û têgihîna wan a namûsê, çiqa diçû yê zêde bûbana. Dapîra min Hawa, dema ez bi hevalê min ê zarokatî Şehîd Hesen Bindal re dîtim ku ji gundewariyê vedigerim, qiyamet li serê min rakiribû. Lewra Hesen lawê dijminan bû. Ev wêrekiya min sûcekî erjeng bû. Hê jî tê bîra min, li hember dayîka min rawestiyabû û gotibû, “Ewêşa, ev lawê te bênamûs derket.” Digel vê hêrsa wan jî, yekîti- ya min a bi lawê dijmin re, jibo min bûbû azwerî. Reva min a ji za- rokên xiziman û yekîtiya min a bi zarokên ku digotin dijmin, jibo min bûbû meyldariyek. Vê dawiyê minê fêhm bikira ku rêxistinbû- na xwe bîrdoziyî û siyasî ya xwezayî, min bi vê rêyê pêşvebiriye. Hêmana pêşî ya pêşnûmayên min ên civakî, wiha derketibû holê.

Redkirina pratîk û hêmanî ya civaka gund û malbatê, timî pêşve- diçû. Min şêweya jiyana xwe ya nû, di lîstikên xwe de diceriband. Lîstik jibo min rastî bûn û rastiyên gund û malbatê benpêkê min ku pêwîst bû ji wan rizgar bibim. Ji ber vê yekê çawa bi xwe hisiyam, minê bi hewldaneke mezin komên xwe yên zarokan bafirandana. Hêmana wê lîstik û jêhatîbûn bû. Kî herî bêhtir bi min re bileyîsta- na û bêhtir qezenc bikira, ew zarok endamê rêxistina me yê herî hê- ja bû. Ji bûyera Şehîd Hesen Bîndal jî diyar e ku min, cihêbûna dost û dijmin nedikir, min di vî derbarî de bi hêman hereket dikir.

Di vî derbarî de hêmana min a dudoyan, min cihebûna zayendan nedikir. Qîzên ku di lîstikan de min behreyên wan didîtin, hê jî di bîra min de ne. Carina bi mehan li du wan digeriyam ku ez wan bi- kişînime lîstikê. Di vî derbarî de, bîranîneke zindî keçapa Hesen Elîf e. Dema dawî min bihîstibû, ev bîranîna xwe wiha anîbû zi- mên, “Rojên ku ez bûbûm bûk jî, Evdile nêzîkî mala me bûbû û ez vexwendî lîstikê dikirim.” Ev rast bû. Di vî temenî de û qîzê wiha bi behre, min nedipejirand ku bizewicînin. Di wan temenan de jî, tê bîra min ku bi jinên jîr û xweşik re, têkiliyên min ên resen hebûn. Li gor min a jîr xweşik bû. Ya xweşik divabû jîr be. Jinên ku ev meyldariya min fêmkirin, hê wê demê dihatin guhdariya min. Min li aqihnendên gund guhdarî dikir. Tê bîra min ku di wan temenan de, meleyê gund Muslim ku her car didît ez li pey sefê digirim, go- tibû “Tu bi vê lezê wiha berdewam bikî, tê mîna weliyan bifirî”. 01 kevneşopiyeke girîng bû. Lêbelê bû kartêkereke ku çiqas diçû, ez dibûm xwedî kesayetiyeke gumanbar. Cama di asta ku ez têkevim qeyranê de, li ser xwedê radiwestiyam. Encex ez dikarim bibêjim ku min di vê parêznameya xwe de, ev têgîn ji binyata wê ve dahû- randiye. Rêyeke ku zarok di rêxistinê de bihatana girtin, rakirina bi serê xwe ya nimêjê bû. Pir balkêş bû ku min xwe bixwe dikire me- le. Ji dêvla levdanê, ez bêhtir meraqdarê lîstikên ku behre dideran- dine holê bûm.

Çûna min a dibistanê, di nava hestên tevlî hev de pêkhat. Min dibistan di rewşa giyaneke bi fikar de pêşwazî kir. Lêbelê min fêmkiribû ku reya bilindbûnê, tenê di vir re derbasdibe. Ji roja pêşî ku ketim dibistanê û heta bi polê dawî yê zanîngehê, min bal kişand. Sazûmaneke serkeftinê ya li ristên pêş timî derbasdar bû. Lêbelê jiyana gund jî tevlî, hêrênayeke ku kesayetiya min ji wê rojê û pêde ketî navê, parçeyek ji yê rewişta min ku jê neqete ye. Li gor ku xuya dike, taybetiya min a bi gund, malbat, dewlet û statuya gelemper a gel re ahengdar, li binî jî taybetiya min a mîs- tîk ku min jê bawer dikir û min hewl dida ku jiyane bibîne, di na- va nakokiyekê de bûn. Li gor ku vê dawiyê min fêhm kiribû, ev nakokiyeke gerdûnî bû. Dema ku min xwe weke ji civaka fennî û ne fennî nîşan dida jî, ev nakokî derbasdar e. Di nakokiya takek- es û civakê de jî, ev rewş derbasdar bûye. Nakokiya olê fennî û olê

mîstîk jî, ji vê rastbîniyê tê. Ya jibo min cuda ev bû ku, ev he- rêna bi siftî û timî veguherî du berekên jiyanê yên cuda. Vê nako- kiyê, rê li ber kesayetiya min vekiriye ku di nava dudiliyan, fikar û gumanbariyan de pêşvebiçe.

Gundê Cibîn ku heroj ez peya diçûm û dihatime dibistana sere- tayî, gundekî ennenan ê kevin bû. Komar naskiribû. Malbateke wê ku bandorê komarên nîşan didan, guzîde bû. Min vê rastyê baş anî der. Wê hingê hestên kurdewarî, di rewşeke binehişî de bûn. Min tê anîbû der ku yê di warê bilindbûna min de, astengiya herî girîng de- rîne holê. Wekê ku ez peyvên 'Kurdê bi dûv' hisbikim bi min dihat. Peyvên şovenîzmê yên ku nerihet dikirin, hin bi hin dihatin. Pêdivî ye ez nîşan bidim ku min ev astengî weke guzîdeyê gelê Cibîn û mamosteyên xwe, derbaskirin. Digel hemû astengiyan, hê di wan temenan de, bi gundên ku Tirkî daxivîn re têkiliyên ku min çêkiri- bûn, mînakên herî baş ên biratiyê bûn. Ev gund hê jî bi giranî dost mane. Neketin şoventiyeke faşîst. Heta ji gundên kurdan bêhtir ne- zîkayiyek dabaşa xeberdanê ye.

Di civaka gundîtiyê û dema dibistana seretayî de, derbeya leşkerî ya 27 Gulan 1960an, dewsa xwe li ser min hiştiye. Têkiliya min a siyasî ya cidî, bi vê bûyerê re pêşket. Min tê derêxist ku hêza bin- geh artêş e. Min dardekirina Menderes bi reşbînî pêşwazî kir. Lê- belê vebizava min jî li hember 27ê Gulanê tinebû. Wê demê tê bî- ra min ku li ser dareke tokê ya mezin, min pêşniyareke wiha dabû hevalê xwe yê dibistanê yê binavêEzîz, "Tu fennandariyê hêzên bejayî bilîze, ez jî ezê hêza hewayî bilîzim. Herwiha em ya hê baş- tir pêkbînin." Ev taybetiya nêzîkayiyê, weke taybetiya şoreşgerî yê di pêşveçûna min a vê dawiyê de, yê timî bandorker bibe. Hêz û ve- guherînê weke kartêkerên azweriyê ez bemedidam.

Heta ku ez li gund bûm, çandiyarekî baş bûm û xwedî nêzîkayi-

yeke ku min ajal dost didîtin bûm. Min karê çandiniyê û çinînê weke perestîşê didît. Xweyîkirina ajalan zewq bû. Çêrandina wan a li derên têr giya, ez bextewar dikirim. Xwedîkirina daran min bi az- werî pêktanî. Şînbûn û qurafa rezan jibo min pîrozweriyek bû. Xwarin, tirî û fêkiyên daran, nîmetên pîroz bûn. Nanê zêdekirî qet nedihat avêtin, nexasim xwarina nanê genimî hntiyazek bû. Diyare ku bandoreke kûr a neolîtîkê dijiyam.

Li hember dayika xwe ku di angaşta xwedîtiya min de bû, min vebizava xwe nîşan dida. Ji min re annanc bû ku ez xwe bi xwe xwedîtiyê li xwe bikim. Ji ber vê yekê nakokiyên bi dayîkê re sift bûn. Angaştên bavê min bi sînortir bûn. Di derbarê kirina karê baş- tir de, bi birayan re nakok bûm. Me lihevdixist. Malbat ji bavkanî- bûnê dûr bû. Serhişkiya diya min, terazeke mîsoger damezrandibû. Vê terazê di gihîştina min a azad de, mercên kêrhatî afirandibûn. Serdestiya dê û bav ku di malbatê de kilît bûyî, valahiyek dideran- de holê. Sûdgirtina min a ji vê valahiyê, dikare weke fersenda pêşî ya meşa min a azadiyê were dîtin. Min xalên xwe weke çavkaniye- ke hêzê dîtin. Vebizava wan a li hember serdestiya gund, bandor li min kiriye ku ez li hember mercên gund rabim. Hatibû fêmkirin ku wêjeya xalan ne vala bû.

Qutbûna ji malbat û gund a pêşî û cidî, bi serhildana di nava malbatê de destpêkir. Vê dawiyê ligor ku min bihîstî, nivîskar Ah- med Kahraman ku xwestibû vê serhildanê bike roman, vê bi ‘Ser- hildana Pêşî’ binavdike. Jiberku bûyer dawiya demekê diyar dike, hêjaye ku were bibîranîn. Li nav rez bi keda xwe sazûmana ku min pêşêxistibû, piçûkê min Mihemed dikete nav û xira dikir. Min bi keviran beradayê. Heta bi cîhe ku savar lê dihat kelandin min da dû. Dema ku bavê min bersiv da vê yekê, li nîvê gund min bi bavê xwe re jî şerê keviran kir. Min ji vê levdanê vate derand ku êdî cîhê min di mal de tine. Êdî rûyê min nedigirt ku li gund jî bi- mînim. Levdana min a bi bavê min re, bûbû mijara henekan. He- man rojê bi dizîka çûme mal. Kîskê ku bavê min bi pûtepêdan hi- landî, min dît. Min deh lîrayên ku di wê demê de piçûk neyê gir- tin derandin. Bi tenê, bi awayek lezgîn, bi hêrs û girî ji gund der- ketim. Herî dawî li binê dareke givîjê ya piçûk rawestiyam û bi rondikên mîna baranê, cara dawî min li gund nêriya. Weke ku ez bibêjim

‘careke din ez li te venagerim’ û dema min pişta xwe da- yê, esle wê minê vê dawiyê fêlnn bikira ku ji çandeke hezar salan qut dibûm û diketim nava lêgerîneke nû.

Ev meşa min a dawî balkêş bû. Dema ku ez di nava gundê cîran Aram re borîm, qet min nehişt ku di xeyda min bînin der. Dema ez giham gundê duyemîn Karamezra, bi heman giraniyê ez mame li benda tirimbêla ku yê ji Xalfetî bihatana. Dema ez siwar bûm jî gi- raniya min li ser min bû. Di Bêleçûkê re û heta em gihan Pira Bê- leçûkê ya berhema Menderes ku nû vebûbû jî, bi heman rewşê bûm. Annanca min ku ez herim Nizîpê cem xwîşka xwe Hawa. Ez giham. Roja duyem bi çend xizimên xwe re, ez jî çûme Deşta Ba- rakê çinîna genim. Bi vexwarina dewê gerrn, heta ku dest li min werimîn, dû rojan min paleyî kir. Ya rast kar hewqas bû. Min 10 lî- ra qezenc kiribûn. Ev bûbû gaveke girîng ku min xwe dabû çespan- din. Bê gund û bê malbat minê bikariba bijiyama.

Bûyereke din ku hêjayî bîranînê ye, nêzîkayiyên gundiyan ên li hember min bûn. Meyla tevan ev bû: “Xwedê zarokên ti kesî neke mîna lawê Emer. Bûye dînê çolê. Edî xêr jê nayê”. Vê dawiyê bi serkeftinên xwe yên dibistanan minê tev di fedîkariyê de bihiştana. Ev şêweyeke bersivê bû.

Bîranîneke din a girîng, derketinên min ên li hember zarokên ne- tebte (neqeriyayî) Miho û Cumo bûn. Miho timî levdan dixwest. Rojekê li anîşka xaniyekî, min bi kevirên di dawa xwe de ew pêş- wazî kir, bêfersend min kevir lê barandin. Heta bi axûrê malê baz- da. Careke din jî levdan ji min nexwest. Cûmo jî, piştî teqîbekê ku min fersend lê dît, ji pesarekî raser dîsa bi dawa tije kevir min re- qandiyê. Wî jî heta bi axûrê malê bi şûn xwe ve jî nenêriya. Malba- ta wî bi zorê ji destê min derêxist. Jiberku dersa xwe wergirtibû, êdî ji xeterbûnê derketibû. Ji ber vê yekê xwedîlêderketin û pesindana diya min tê bîra min. Di pêşveçûna têgihîna min a dijderketinê de, bêçariyiya bavê min û serhildêriya diya min bêsînor a dema ku di- zanîbû mafdar e, bandorker bûn. Li gor ku vê dawiyê min bihîsti- bû, çavdêriyên diya min ên li hember min, bierênî û gihîştî bûn. Li ser pirsa Fennandarê Tugaya Rihayê, bi bersiva “Min gelekî hewl da ku wî di bin kaba xwe de zeft bikim, lê bisemeketim.” Rastiyek anîbû zimên. Şêweya min ku yê min bi tenê bihêle, pêşî wê tê

der- xistibû û ya ku gotibû dîsa ew bû. Wiha gotibû: “Herkes ê ji te sûd bigirin, lê weke te bi te re naxebitin” û weke wê jî derketibû. Ji ali- yê din ve, nirxandina wê ya dawî di derbarê min de, wiha bû, “Ew jibo min yek bû, ew û cîhê wî gelekî cuda bû”. Dema ku dimire, peyvên wê yên dawî dibine, “Timî dia bikin, xêran li her kesî bi- kin”. Vê dawiyê dema ku min rola wê ya di nirxandina jin û dayî- kê de hêjandî, min pêwîst dît ku ez wê hêsan negirim û mafê wê bi- dimê. Ev nirxandina wê ya di derbarê jinan de jî bizanayî bû: “Bi vî serî û vê kesayetiya xwe tê jinê (jibo zewacê) zor bibîne”. Pêwîst bû aqlê diya xwe ya ku min digo ji hêrs pê de ti taybetiyên wê ti- nene, bi pejirandana. Li ser rûyê dîroka ku mirov kor dike, em ji hev re bûbûn biyanî. Lêbelê dema ku ez bi şûn xwe ve dinêrim, bi mineteke mezin dipejirînim ku, ew dengekî esîl ê çanda dayîka xwedawend e û ev deng gihandiye min. Min serî ne li diya xwe, li sazûmana mêr a ku jin kiriye netitişt, zalim, biyanîker û durû hilda- ye. Digel ku me bi hev re pîroz nekiribû jî, min dabû çespandin ku ez lawê diya xwe yê baş bûm.

### 2- Civaka Burjûva û Hevnasîna bi Komarê re Guman û Helwesta Şoreşger

Di sala 1963an de, li Nizîpê destpêkirina min a dibistana navîn, destpêka jiyana min a dema duyemîn e. Di heman demê de li cem xwîşka xwe ya mezin Gulsum û dapîra xwe Hawa, minê hewl bi- dana ku li ser derfetên têkiliya xizimtiyê yên dawî, bimeşim. Nizîp cîhê ku xalên min û xaltîkên min lê dijîn bû. Bajarê herêmê yê ku herî bêhtir pêşvediçû bû. Bê vateya Kargamiş ji koledarên Sumer re çibû, vateya Nizîpa ku li nêzîkî wê hatî avakirin jî, ji komarê re wisa bû. Mêtingeheke kapîtalîzmê ya teze digihîşt. Lêbelê li ser mandeleya dema borî, encex minê xirbeyên Kargamiş û Belkis-Ze- ugma yên ku di bin guhên me de, ji xalê xwe Mistefayê nêçîrvanê entîkeyan ku bi dema elindê re, diçû ji wan xirbeyan parçeyên şû- şe û peykeran danîn, fêlnn bikira. Li dibistanê, digel min hisdikir ku biyekbûna bi derûn re bê behreme jî, ezê di xêzkeke ku bi şêwe herî li pêş de bimeşiyama. Helwestên dapîra min Hawa yên hişk û ku min zanîbû ezê nikaribim nanê wê zêde bixwim, xwe nîşan dan. Ez têdigihîştim ku ez bi cîhana berdêlan re rûbirû hatime.

Ez xwendekerê mamosteyan ê jêhatî û guzîde bûm. Min bala wan kişandibû û ewleyiya wan qezenc kiribû. Min li dû hev notên baş distandin. Lêbelê bennayiyên taybetiyên feodal, lawaziya tay- bitiyên min ên jiyana burjûva ku min tê derêxistibû ez ti carî minê- karî vê jiyanê nabim, hêviyên min kêm dikirin. Piştî dibistana na- vîn min ne dibistana mamostetiyê, lîse çêtir girtibû. Ji dennaf der- ketina bi diravan zor bû. Lîse û dibistana pîşe yên bêdirav, vebijar- kên li pêşya min bûn. Lêbelê azweriya min a bingeh lîse ya leşkerî bû. Jiberku temenê min ne girtibû, belkî jî mirada min a herî mezin di ber min de mabû. Ev bûyer weke ku li nîgaşên min ên veguherî- na civakê bûbe derbeyeke mezin. Piştî têgihîştim ku di warê leşkerî û olî de pêşvenaçim, min qada siyasî ji xwe re kire annanc. Bi vê annancê Lîseya Pîşe Ya Tapo Qedestro ku min qezenc kirî, yê bû- bana merhaleya derbasbûyinê. Ev dibistan li navenda Enqereyê bû. Min di salên 1966-69an de xwend. Biserkeftin ji polên xwe derbas- bûm. Heta bi polê duyemîn ê lîseyê, bîrdoziya olî bi giranî bû. Min komên xwe yen nimêjê di lîseyê de jî damezrandin. Ez çûme Ko- melên Ocaxên Mengî (Ulku Ocaklari) û Têkoşîna Bi Komunîzmê re. Hinek konferansên ku Sileyman Demirel jî dihat, min li vir guh- darî kirin. Di warê bîrdoziyî de ez di bandora konferansa Necîb Fa- zil Kisakurek de mabûm. Konferansa wî ku heta nîvê şevê min guh- darî kiribû, xeter bû. Bersiveke hestyarî dida vebizava min a li hember civaka burjûva. Rêyên din ên heyîn nîşan didan.

Vê demê mamosteyekî min ê herî hîkarîker, mamosteyê wêjeyê bû. Serdar (bînbaşi) Farûk Çaglayan ê ku di heman demê de ma- mosteyê wêjeya dibistana Herbiyeyê jî bû. Bi awayek derasayî tê- kilî nîşanî min dida. Nivîsê min ên kompozîsyonê di berîka xwe de digerandin, şanî mamoste û xwendekaran dida û ez mînak nîşan di-
dam. Ez birime bijîşkê xwe ye taybet. Têkiliya wî bû sedemek ku baweriya min bi min were.

Di polê lîse yê dawî de, tekiliya min bi çepê re pêşveçû. Çîroke- ke vê ya balkêş heye. Dema ku çepgirî û rastgiriyê weke modeye- kê dorhêl dabûn ber xwe, min hay ji xwe hebûm. Ez gihabûm hiş- mendiyeke bisînor ku heta ez tênegihîjim biryarê nedim. Rojekê pirtûka Alfabeya Sosyalîzmê ku min li ber serê cîhe xwe dîtî, piştî ku min xwend û

qedand, tê bîra min ku ev peyv ji nav lêvên min ri- jiyabûn: “Muhemed winda kir, Marks qezenc kir”. Zanînên min di herdu mijaran de jî bisînor bûn. Ez ne di hêza ku dogmatîzmê der- bas bikim de bûm. Lêbelê dîsa jî ez dikarim bibejim ku di sala 1968an de, ez hatibûm serê çata rê. Min bi tevlîbûna merasima ter- mê îmren Oktem ê serokê Dadgeha Bilind, bersiva aliyê çepgir da- bû. Êdî di pratîkê de jî ez çepgir bûm. Ev hemû pêşveçûnên dera- sayî di nava du salan de çêbûbûn. Mêjiyê min bi temamî bûbû na- vendeke gumanberiyê. Sempatîzantiya çep an jî rastê ez têr nediki- rim. Ez di nava birçîbûneke bîrdoziyî de bûm. Ez ne yekî ku bi di- rûşman hereket bike bûm.

Heta ku di têgihînê de qanî nebim, çi roja ku diçû jiyana min zor- tir dibû. Gumanberî gihabû asta herî bilind. Min ji her tiştî şik di- kir. Zanînên felsefî yên bisînor, şikbûna min zêdetir dikir. Ez nedi- bûm milîtanekî çep ê ketûber. Weke ku ez nebûm milîtanekî rastgir, di nava vê hewayê de, di sala 1970an de li Amedê weke Teknisye- nê Qedestro û Tapokirinê, min dest bi peywirê kir. Yekem car min gelek dirav qezenc dikirin.

Kurdayetî jî tevlî nîqaşên çepgiriyê bûbû. Amed bajarekî ku bi tevayî Kurd bû. Herwiha pirsgirêka neteweyî cidîbûna xwe bêhtir ferz dikir. Li wira annanca min dayina dersên cuda bû ku ez bika- ribim herim zanîngehê. Di vê de serkeftî bûm. Di heman demê de min dîplomaya Lîseya Zîya Gokalp a Amed stand. Min diravên ku têra min û zanîngehê bikin dane hev. Wê salê di ezmûna ketina za- nîngehê de, min Fakulteya Hiqûq a Stenbolê qezenc kir. Min tayî- na xwe kişande Stenbol Bakirkoyê. Dawiya sala 1970an û 1971an min li Stenbolê borand. Ez bûme endamekî DDKO (Ocaxên Çandî û Şoreşger ên Rojhilat) ê herî genn. Serokatiya ji binyata feodal pêşveçûn berbend dikir. Ez bi rexnegirî nêzîkî vê serokatiyê bûm. Digel vê yekê jî, gaveke cidî bû. Dema ku ez bûme endamekî gire- gir, Derbeya 12 Adar 1971an çêbû. Heger ev derbe piçekî din de- reng bihata, yê ez jî biribama. Herwiha terişand (zelitand) û çû.

Kesayetiyên weke Mûsa Anter û Hikmet Kivilcimli, min li Stenbolê naskirin. Mûsa Anter weke giyana DDKO bû. Tecrûbe- yên xwe vediguhastin. Digot “Neyên lîstikan”. Min bi xwe ji Hik- met Kivilcimli

peyvên “Zarokên Mezopotamya, di têkoşîna we de serkeftinê dixwazim” bihîstibû. Lêbelê ya ku ez bi çepê ve herî girêdam, peyvên Mahîr Çayan ên ku berî bikeve îlegalîteyê bi de- mekê, bi serê xwe derketibû ber kursiyê zanîngehê û bi dengekî tije bawerî gotibû: “ Revîzyonîzm rast e. Divê em li hember der- kevin. Pirsgirêka Kurd nayê nixûmandin. Pêwîst e were pejiran- din. Heger ku oportunîzm helwesta xwe bidomîne, pêwîst e em girêdanên xwe jê qut bikin.”

Di sala perwerdeyê ya 1971-72an de, Min qeyda xwe li SBF (Fa- kulta Zanînên Siyasî) ya ku di rêza 20an de min qezenc kiribû, bi bûrs çêkir. Êdî ez gihiştibûm annanca xwe. Ezê di SBF yê de fêrî siyasetê bûbama. Ne zor bû ku ez milîtanekî çep ê li pêş bûma. Bi derbeya 12ê Adarê, bi jiholêrakirina milîtanên pêşketî, pêşiya me vebûbû. Sê salên ku li Enqerê bi hişmendî û ezmûneke bisînor min borandibûn, yê tevkarî li bilindbûna min bikira. Bi awayek xwezayî minê weke sempatîzanekî THKP-C (Eniya Partiya Rizgariya Gelê Tirk) hereket bikira. Li fakulteyê giraniya wan hebû. Demeke dirêj ez mam li benda THKP-C yên rast. Dema derketinên ku min hêvî dikirin nedîtin, hêdî hêdî ez li ser rêya xwe sift bûm. Min dest bi amadekariyên pirsgirêka neteweyî ya Kurd kiribû. Ji ber nêzîkayi- yên wan ên şovenîst, meşa bi çepê tirk re zor bûbû. Şehîdbûna Ma- hîr Çayan û hevalên wî û boykota pêşî ya ku me ji ber vê yekê kirî, bû sedema 7 mehan girtina min. Ji ber kêmbûna şahidan, ez ji meh- kûmbûna 15 salan rizgar bûm. Dardekirina Denîz Gezmîş û du rê- hevalên wî, pêkhatibû. Îbrahîm Kaypakkaya bi êşkencê hatibû kûş- tin. Çep hatibû perçiqandin. Dema dawiya sala 1972an, ji Girtîge- ha Mamak derketim, êdî minê bitemamî xwe amadeyî derketina komeke serbixwe bikira. Civîna komê ya koma di derbarê çareseri- ya pirsgirêka Kurd de, bi şeş kesan di Avrêla 1973an de, li Enqerê Bendava Çûbûkê, me yê pêkbaniya. Min tezên mêtingehkariyê yên li Kurdistanê bingeh digirtin. Ev derketineke resen bû. Sala pêşî me qederê duwazdeh zanîngehî tevlî dozê kirin. Hakî Karer, Kemal Pîr û Dûran Kalkan jî wek binyata Tirk tevlî me bûbûn. Di salên 1974- 75an de, jiberku min serokatiya ADYÖD (Komela Xwendekarên Bilind ên Şoreşger a Enqerê) dida meşandin, şensê pêşveçûna ko- mê zêde dibû. Sala 1976an bi veqetîna ji binî ya ji çepê tirkan, me biryar da ku em ber bi Kurdistanê

ve biçin. Bi Civîna Dîkmen a 1976an, yekem car Hakî Karer ber bi Agirî û Mazlûm Dogan ber bi Babnanê ketin rê. Me pira di navbera xwe û sazûmanê de avêt. Hê wê demê em bi Apoperestan (Apociyan) hatin binavkirin.

Weke bersiveke komploya 1977an a ku Hakî Karer li Dîlûkê şe- hîd kirin, amadekirina bemameyê, bi Kesîre Yildirim re zewaceke xeter, hestyar û semcperest, ber bi Amedê bi annanca çûyina dawî, li Gundê Fîsê civîneke bi 23 kesan û biryara ku weke partiyê here- ket bikin, dawî li demekê dianî. Dema ku Tirkiye ber bi derbeya 12 Rêzberê ve diçû, an derketina derve an jî çiqas ku liberxwebidin jî, rûmetgirtina çend heyvan a li çiyan weke vebijarkan derdiketin ho- lê. Jevebûna Şahîn Donmez û Yildirim Merkît û xwestekên Kesîre, 2 Tînneh 1979an koçberiya Rojhilata Navîn mîsoger kir. Careke din em di rêya Hz Brahîm re diçûn, ji Rihayê û weke Rihayî, bi he- man annancên pîroz û li pey dadmendiyê, jibo wekhevî û azadiyê ber bi welatekî pîroz ê din diketime rê.

Li ser Komara Tirkiyeyê ya navbera 1960-80an, gelek şirove di- karin bêtin kirin. Dikare were destnîşankirin ku civaka Tirkiyeyê ji aliyê kapîtalîzmê ve tê hejandin, êdî dewlet û civaka klasîk li qali- bên teng nayên. Ev yek jî rast e ku lêgerîneke kûr a demokratîk ke- tiye rojevê. Zagona bingehîn a 27ê Gulanê, derfetên nîqaşa pirsgi- rêkan a bi awayek azad dida. Lêbelê di cîhaneke ku şerê sar berde- wam dikir de, li welatekî ku li cîhekî herî krîtîk, dînamîkên hundi- rîn nikarîbûn bi serê xwe encamekê bigirin. Encex şoreşeke gel a bihêz dikarîbû veguherîna olîgarşîk a komarê ku lezgîn bûbû, de- mokratîk bike. Terazên derve jî derfet nedidan şoreşeke bi vî rengî. Tevgera ciwanan a li ser navê gel û jidil, ji heza ku dîwarê statuko- yê brûxîne bêpar bû. Tevgerên ciwanên cîhanê, kin domandibûn. Heger ku bawerhişkiya di sosyalîzma reel de neyê derbaskirin, şen- sê derketinên demokratîk zêde tinebûn. Vê demê heke ku li Tirki- yeyê şoreşeke gel a berfireh hebûna jî, tepisandina wê ya bi alîka- riya emperyalîzma cîhanê yê ne zor bûna. Çawa ku tevgerên 12 Adar 1971an û 12 Rezber 1980an bi alîkariya hnperyalîzmê, bi ri- hetî hatibûn rûniştandin. Van derbeyan dhnenên welatekî bi pirsgi- rekên giran li holê hiştibûn. Têkoşîna şoreşgerî serkeftî nebûbû. Lê- belê

derbe, hikûmetên olîgarşîk û meclisan jî, dane çespandin ku nikarin Tirkiyeyê ji pirsgirêkên girantir dibin rizgar bikin.

Weke kesayetiyekî civakî û neteweyî, ez ketibûm nava aloziye- ke ku ne amade bûm. Ez ne di wê rewşê de bûm ku bi nasname, hiş- mendî û viyana xwe tevlî pêşveçûna Tirkiye ya 1960-80an a bi şê- weya burjûva, ne ji pêşveçûna şoreşgeriya wê ya serencperest, ji se- rokan bêpar ku xêzk û pratîka wan ne diyar, bûbama. Min behreya ku ez saziyên komarê bixûnifînim, nîşan ne dida. Weke ku pîvan gelekî cuda bûn. Perwerdeya ku min dîtibû hemû jiberkirin bû, te- nê bi annanca kannendiyê dihat dayin. Komara Tirkiyeyê bi man- delekirina nasnameya Kurd, eslê wê şensê ku xwe bide xûnifandin jî winda kiribû. Hûn dikarin çi bibêjine çêbûneke ku hûn tine ber- didin an jî bi viyaneke yekalî weke ku hûn bi birekê binicirînin, hûn bibêjin “Ezê te wiha bi şêwe bikim”, hûnê bi encamên bi çi rengî re rûbirû bimînin? Yê li hember we mirov e, ne dar e. Ev têgihîn encex BZ di salên 3000an de, jibo sazûmanên dewletên rahîb ên Sumer û Misrê ku nû hilatibûn derbasdar e. Ew jî rajêriyên (tebaa) xwe weke pêdiviya viyana xwedayî ya teqez, bi yekalî û bi têgihî- neke ku di nava marîjokan de derbasdar birêvedibirin. Bîrdoziya fennî ya bi mandeleyê ve girêdayî, çiqas ku navê wê komar be jî, negengaz bû ku vateyeke ji vê cudatir vehewîne. Heger ku bi şêwe- ya Rojava bi mêtingehkarî û pişavkirinê pêşveçûbana, belkî vateye- ke wê çêbûbana. Edî di sazûmanên rahîb ên Sumer û Misrê de, qe-

dexeyên zimên nedihatin aqilan jî. Di rêveberiya Tirkiyeyê de ev kar gihandibûn vê tewşê.

Zayîna bi pirsgirêk, li hember sazûmaneke mandeleyê ya ji alo- ziyê xirabtir, jixwe yê li hev gêj bûbana, yê biketana nava guman û fikaran. Heke ku piçekî jî taybetiya mirovekî bi rûmet hebe, li hem- ber tiştên diqewimin, yê lêpirsînan bike, yê hewl bide vateya bê çi- ma tê xwestin ku were mandelekirin, jevderbixe.Ev jî yê bihata va- teya pirsiyarkirina dewlet û civaka fennî ya li hember. Taybetiyên serhildêr ên kevneşopî yên li gor dogmatîzmeke zêdekar bûna. Yê biketana rewşa mirîdekî bawennend ê her derketineke bîrdoziyî ya ku bipejirîne. Levdana komara olîgarşîk a bi ciwanên şoreşger û nasnameya Kurd re, taybetiya demê ya bingehîn bû.

Encama vê yekê veavabûna faşîzmê ye. Bi zagona bingehîn a 27ê Gulanê, li pêşya komarê derfeta demokratîkbûnê diyar bûbû. Lêbelê jiberku mercên berbiçav bi têrayî negihîştibûn, ya rastir ji- berku viyaneke gel weke hêzeke hişmendî û viyanê ku bibe bersiv demeketiye holê, rê li ber xerckirina beradayî ya vê derfetê vekir. Olîgarşiya ku xeteriya hişyarbûna gel hiskirî, bi tecrûbeyên xwe yen dîrokî û hevgirtiyên xwe yên Rojavayî, veavabûneke ji ya ke- vin hişktir pêkanî. Edî sazûmana bi xwarin gelek qurbanan xweyî dibû. Çalakiyên komên şoreşger û şehîdbûnan, sedem ji tekûzbûn û xwarina olîgarşiyê re çêdikir. Netêrayiya şoreşgeriyê dihate vateya têrayiya şoreşa hember.

Li hember vê rasteqîniyê, lêgerîna lihevkirina bi olîgarşiyê re ne gengaz bû. Lewra bitemamî paşverû û mandeleker bû û bi xwînx- wariyê ve girêdayî bû.Bersiva vê yekê bi yek peyvê, li hemberî zo- rê çêtirgirtina ‘zorê’ bû. Derfetên ti bersivên din tine bûn. An bi te- mamî teslhnbûn an jî berxwedan weke rêya bitenê li hember me bû. Çepê Tirkiyeyê, bi damezraka xwe ya ku çiqas diçû belav dibû, ji bersiveke serkeftî ku bikaribe bide gelekî dûr bû. Bi levdaneke çep û rast ku ji rê hatibû derxistin, faşîzm birêxistin dibû. Çep çiqasî jî bi lehengî liberxwe bidana jî, ji Bedredînparêzî û Pîr SultanAbdal- parêziyeke hemdem wêdetir nediçû. Herwiha aqûbeta pêşevanên şoreşger ên mîna Denîz, Mahîr û Brahhn ên bihatana vê vateyê. Şi- deta şoreşger a ber bi sala 1980an, dubareyeke zêdekarî bû. Ji afi- randina encameke pêşveçûyî ya

1970an wêdetir neçû. Komara olî- garşîk, ji vê demê bi awayek serfirazî derket. Çêpê jî xwe bi dev ri- zîbûnê ve berda. Di sazûmanê de yê derfetên jiyanê li qasî ku bibî- ne geriyabana.

Jênerev bû ku weke kesayetiyê ez bi tenêbûneke kûr re rûbirû werim. Serencperestiya Kesîre jî yê bûbana kula li ser kulê. Tişta ku min pêkanî, bi hemû ezmûna neteweyiya demokratîk a hemdem, ez lêkolînê bikim bê nasnameya Kurd çawa ji danehevên çepên Tirk sûd bige û derfetê heviyekê bafirînim. Bersiva herî bi vate ya ku minê bidana hewldan û bîranînên ewqas şoreşgeran, ê ev yek ba- na. Eslê wê, afirandina xêzka bîrdoziyî, siyaset û rêxistinê ya li ser navê Kurdistan, ne cudabûneke stratejîk, weke amûreke taktîk a ye- kîtiyeke azad dihat ramandin. Jibo yekbûnê, hewceyiya dêrîna ji hev zelal bû. Yekîtiyeke bizorê ku bingeheke wê ya hemdem tine, ku ti hêman û rêzikan nasnake, ji Osmaniyan jî herî paşdetir, nedi- hat ti vateyan.. Komarê xwe mehkûmî dogmayeke neteweperest û mandeleker kiribû. Bi vê yekê ne gelbûneke bitendirûstî û ne jî ne- teweyîbûnek gengaz bû. Faşîzm jî herî bêhtir li ser şêweya şoven a vê neteweperestiyê bilind dibû. Mercên ku neteweperestiya M. Ke- mal bikarbîbin, girtibûn. Neteweperestiya M. Kemal jî dihat man- delekirin. Herwiha angaştên hemdem û danehevên komarê yên di destpêkê de jî, dikirin suxreya paşverûtiyê de. Ev komployeke olî- garşîk bû û xweş girtibû. Feodal û kompradorên Kurd jî, cîhê xwe di nava olîgarşiyê de zexm kiribûn.

Li hember van rastiyan, annanckirina komarê ya ne di derûn, ya di şêwe de jênerev bû. Ber bi sala 1980an, dema ku weke kes û PKK me şêwe girt, hebûna komarê ya li hember min, kartêkera di- yarker bû. Pejirandina nasnameya Kurd li dera han, hemû rê û rê- bazên ku di tirbê de veşêrin di rojevê de bûn. Li gor demê, bi hiş- mendiya min a çînî û çandî ku çêbûyî, xebata bivate ku minê biki- ra, derandina potansiyeleke Kurd a holê bû. Encex me yê girêdana xwe bi bîranîna şoreşgerên Tirk û bi taybetî ya bi şehîd Hakî Karer re, bi vî rengî biçespandana. Rewş dişibiya meşa di daristaneke ho- veber re ku qet rê tê re nebin. Di kêliyên dîrokê yên wiha de, tim derketinên bi vî rengî tên kirin. Ewqasî zêde amadekarî û strateji- yên wê tine ne. Hûnê gavekê bavêjine nediyariyê. Ya nû encex bi vî rengî bizê. Derketina Hz Mihemed a Mekeyê û meşa

Hz îsa ya Qudsê, de derûna xwe de tên heman vateyê. An hûnê teslhnî nezanî û mandelekeriya demê bibin û an jî hûnê bi meşine ser. Pêşveçûna dîrokê bi ti awayên din pêknayê. Derketina M. Kemal a Samsûnê jî bi vî rengî ye. Di serî de stratejî, bemame û rêxistina wî tine, lêbe- lê gava rast a ku dikare rêya dîrokî veke, di vê derketinê de veşar- tiye. Amadekarî, stratejî û rêxistin, encex dema ku derketin vate bi- gire ye gengaz be. Ya ku M. Kemal mezinkirî ne raye û derfetên wî yên leşkerî ne, ev mijar dezavantajên wî ne. Yê bi xwaze ku kêlîkê berî kêlya din ji van çawaniyan rizgar bibe. Ya ku ew biriye ber bi encamê, asoya derketinê û vateya wê ye. Di dîrokê de derketinên bi vî rengî pir in. Bi gelemperî ya ku pêşveçûnê gengaz dike, wêreki- ya van gavavêtinan e.

Herwiha çiqas ku mercên daringî li dij bin jî, Ramandina derke- tina PKK û wêrekiya vê yekê, çiqas ku were şewşandin jî, di derû- na wê de annanca wê komara demokratîk e. Annanca Kurdistane- ke azad û serbixwe jî, têgihîneke stratejî ya rast bû ku encex bi ko- mareke demokratîk ê pêkbihatana. Ev ê ji aliyê jiyanê ve jî bête rastkirin ku, li hember têgihîna yekîtiya paşverû ya hêzên olîgarşîk û komara olîgarşîk, têgihîna yekîtiya azad komara demokratîk a hê- zên demokratîk, îfadeya derketina me ya dîrokî ye.

Dihat xwestin ku rizgariya neteweyî ya sedsala 20an a di pêşe- vaniya tirkan de, bi pêşevaniya kurdan a rizgariyeke demokratîk were timamkirin. Yekîtiya diyalektîk a di navbera herdukan de, ni- çika pêşveçûna dîrokê jî û îfadeyeke wê ya hemdem bû. Helwesta bi hêman a li hember neteweperestiya hoveber a Kurd û netewepe- restiya şoven a Tirk, bi vê rastbîniyê ve girêdayî ye.

Ez kesayetiya xwe ya vê demê dişibînim qalibekî an defterekê ku fersendê nede çewtiyên dîrokî, li hember vê derfetê bide ku çend rastiyên gelemper werin nivîsandin. Wêrekiya min qet tinebû ku ez xwe bijîm. Li hember sedsala 20an, timî biyanîbûna min berdewam

kir. Jiber ku ez bitimamî neketime nava rojaneyiyê, sedemek ji ya ku min bûut qezenc kiriye. Ev dem weke demeke ku li ser navê ge- lê Kurd bi qupketinê (kurkbûn) ye. Min afirandina xwe ya bi gel re, tenê ne weke pirsgirêkeke hişmendî û felsefî, di heman demê de weke çawaniyeke sincî jî dît. Jiyaneke ji rasteqîniyên bingehîn ên gel veqetiyayî, bi min weke zebûnî, bêşerefî û bêsinciyê dihat. Gu- manberiya di derbarê xwedê ya di mêjiyê min de, cîhê xwe dabû gumanên pirsgireka neteweyî, rêxistinîbûn û polîtîkayê. Jibo ku ez hişê xwe têr bikim, van hebûnên daringî bêhtir kêrhatîbûn nîşan di- dan. Li dewsa metafîzîkê, rêbaza diyalektîkê bêhtir kişîner bû. Li hember rewişta şoven a civakên burjûva û komarê, berbiçavkirina min a nasnameya Kurd helbet gaveke girîng e. Ev ji aliyê komarê ve jî qezencek e. Dema ku demokratîkbûn bi hemû pîvanên xwe ji- yan bibîne, bêguman ev rola min ê were fêhmkirin. Min kêmasiya xwe ya ku ez dogmatîzm û rastiyê tevlî hev dikim, dereng fêhmkir. Lêbelê ev rasteqîniyeke ku hê jî civakên Rojhilat, di asteke pêş de vê yekê dijîn. Ev yek mirov şaş nake ku dogmatîzma sosyalîzma re- el, dewsa dogmatîzma olî digire. Dogmatîzm nexweşiyeke binge- hîn e ku pêwîst e di têgihînên hemû nasnameyên çep, rast û çanda wan de were derbaskirin.

### Xwe Afîrandina bi Şer: Lê Heta bi Kûderê?

Derketina şoreşger a ji axa Anatolya û Mezopotamya ber bi we- latên Rojhilata Navîn ên pîroz, mînakên dîrokî tîne bîra mirov. Ya ku hatiye pêkanîn nederketina komeke etnîk an jî qewmî ye, bi lix- webarkirineke bi baweriya ku bîrdoziya serdemê re, ezmûna xwe ji nûve jîndarîkirinê ye. Her şêweya koletiyê tê redkirin û ber bi aza- diyê gav dihatin avêtin. Di mercên herî zor de û bi pîrikîtiya zora şoreşgeriyê, jibo zayîneke nû qada ku hatî hilbijartin, di cîhanê de di serê cîhên herî bikêrhatî de tê. Weke tovên baweriyê ku di dîro- kê de haveyn girtine û ji wira li tevaya cîhanê belav bûne, mîsyona bûyina dendikekê kesayetî hemû wergirtiye. Di serî de taybetiyên neteweyî, çînî, çandî, bîrdoziyî û siyasî, taybetiyên dîrokî û nûjen di nava hev de weke hevîr tên vestirandin, tînin rewşa şaneke sere- ke û bi îfadeyeke xurt û azad, jibo zayîna nû hemû

hewldan bi pî- rozweriya rahîb û bawennend tê bicîhanîn. Weke ku ez hevalê Hz Brahîm ê rê bim, hewl didim ku rê vekim. Weke Hz Mûsa, jibo qewmê binalet ku naxwaze were rê qanî bikim, hêza hişmendiyê heta bidawî vedikim. Weke Ezîz Paûl, nûnerên baweriyê dişînime her aliyan. Jibo wijdanê mirovatiyê ji dest bemedim, ez heta bi nê- zîkî şêweya pêxemberiyê nêzîk dibim. Ezê li hember rastiyên sed- sala 20an ku ez ji wan biguman, têkneçûbama. Minê giyana miro- vatiyê, teslhnî wê nekiriba. Ji koka serhildanê bû, layîqî mînakên xwe yên dîrokî bû. Ji netewetiyeke teng û wêdetir, li ser navê mi- rovatiyê berpirsiyariya hêvîbûnê jî ji dest nedihat berdan. Pêşî ba- werî bi cîhana reel nedibû û nedihat teslhnbûn. Li pey utopya ku pêdivîbû bi rastiyê,dadmendî û rindîyê ve girêdayî be, bê çavtirsî dihat bezîn. Hêzên daringperest ên serdemê çiqas ku perçiqîner bin jî, afirandina utopîstên Rojhilata Navîn ên nû, ji rika tevan ve dibû rastiyek.

Di navbera salên 1979-1999an de, derxistina bîlançoyeke xe- batên min kirine him zor e û him jî ne pêdivî ye. Di pêşerojê de, dîrok ê li gor kereseyên di dest de yê bîlançoyeke rast derîne ho- lê. Dahûrandina xêzkên bingehîn ên rawestina min, yê bêhtir hîn- ker bin.

**a-** Pêwîst e viyana azadiyê neyê teslhnkirin û neyê şewşandin. Li Rojhilata Navîn ne rêyên siyasetê bitenê, coyên belavbûna bîrdozi- yê jî bi labîrent in. Behreyeke mezin dixwaze ku mirov bê şaşî jê derkeve. Ev rasteqînî ji dema ku rêyên metelhişt (şaşker) ên zîgû- ratên Sumer û pîramîdên Misrê hatin çêkirin ve, bi vî rengî ye. Bîr- dozî û polîtîka li gor ku metel dihêlin serkeftî dibin. Herwiha der- ketina Rojhilata Navîn û meşandina siyasetê, dişibe ketina labîren- teke ku fetlînokên wê bêsînor. Derûna sîstema labîrentê ev e ku mi- rov şaş û metel bihêle û bi xwe ve girêbide. Rahîbên Sumer û Mis- rê, hemû hêza xwe ji ezmûnên metelhiştina endamên di destê xwe de, werdigirtin. Hemû viyanên despotîk ên ku vê dawiyê derketin holê, bi teqlîdkirina van rêbazan, çi kesên ku derdiketên pêşya wan metel dihiştin û dikirin bin bandora xwe. Ev weke hînkirineke ser- lêtewandinê ye. Dema ku li baxçeyekî dewlemend digerînin jî, ar- manc ev e. Dema ku di sepîneke dojehî re derbasbikin jî, tişta dix- wazin bikin şikandina viyana azad û serlêtewandin e. Li Rojhilata Navîn damezraka genên rêveberiya siyasî

bi vî rengî hatine raye- xistin. Ya ku Komara Tirkiyeyê dike, tinekirina viyanê bi rêbaziye- ke bêteşe û hişk e. Lêbelê li Rojhilata Navîn nenntir, bi awayek xa- pînok û bi hesabê bazirganan tê meşandin. Herwiha gotina “Em derketin qada azadiyê, em rizgar bûn”, xwexapandin e. Jibo derke- tina Ewropa jî ev wiha ye. Derketina vira dilîniyeke azadî ya xapî- nok dide, lêbelê kesayetiyeke kûr û bi nexweşî dorpêç dike û li se- rê yên mayin dike bela.

Pêwîst e ez nîşan bidim ku, jibo viyana azad winda nekim, min gelekî hewl da. Li herêma ku neteweperestî herî pêşveçûyî, lêgerî- na li têkiliyen di çarçoveke demokratîk a hemdem de, hewldaneke vala ye. Ya ku tê ferzkirin, pêşî berjewendiyên bavik û qebîleyên wan di nav de, eşîrtiyeke hemdem e. Çiqas ku bi peyvên xemilandî were bilêvkirin jî, neteweperestî şêweyeke pêşveçûyî ya şovenîzma eşîrtiyê ye. îfadeya wê ya ku hê bêhtir hatiye mezinkirin û siyasî- bûnkirin. Ev jî tengnêrînek e û ji xwe pêde nedîtine kesên din e. Dema ku wiha be, viyana we ya azad jî timî jibo xwe gef dibînin.

Ez dikarim bibêjim ku, jibo min a herî zor, parastina viyana azad, herwiha mebesta teze ya rêheval û berendaman bû û ev bûye pirsgirêka herî bingehîn. PKK û dost hê jî nizanin bê ev yek tê çi vateyê. Ji ber vê yekê jî teng û yekaheng dimînin, xwe ji qurbanbû- na taktîkên hêsan nahêlin. Xebata min a herî binirx ku di ser tevka- riyên min ên pratîk re, bûye pêşlêgirtina şixulandina viyanên azad a ji aliyê xapînokên ku bi hijmareke zêde. Divê neyê jibîrkirin ku, dema ku hûn giyan û viyana azad winda bikin, li pey we dewleta we jî hebe, hûn ji hilweşînê rizgar nabin.

**b-** Parastina viyana azadî, bi serxwebûna bîrdoziyî û bi xurt- bûna rêxistinî gengaz e. Ji viyana azad a kesên ku serxwebûna raman windakirin û rêxistinî ji dest xwe berdan, nayê behskirin. Evan teqez ê bi derekê ve werine girêdan. Heger ku di sazûmana raman û rêxistinbûnê de valayî hebe, ji aliyê dijberan ve, teqez ê were dagirtin.

Min di xebatên Rojhilata Navîn de, jiboku dîlitiya raman û nerê- xistinî neyê kişandin, têkoşîneke mezin da. Di gelek kesên ku der- ketin dikirin de ya dihat dîtin, jibo ku kêlîkê berî kêlya din ji bando- ra zoriyan derkevin, beza li pey rizgarbûna takekesî, meyldariyeke ku mirov

nikaribe li hember raweste ye. Ketina vê meyldariyê, he- ger ku bi şêweyeke guherî be jî, destpêka veqetîna ji vateya derke- tinê ya bilind û ji nirxê wê yê azad e. Dema ku bêjin xan û man û zaro û zêç, li hember pirsgirêken debariyê, li derên ku neyê aqilê mi- rov û li ber destan ê serî bitewînin. Çi Ewropa û çi Rojhilata Navîn, di vê rêyê de ji bi hezaran şoreşger re bûne goristan. Yên ku di şer de têkneçûne, di van rêyan de mîna pelên daran weşiya ne. Jiberku min bi vê yekê dizanî bû, lebka min a herî mezin ev bû ku, jibo ke- sên xwedî viyana azad hwldanên ku li gor disiplîna partiyê û hêza raman bijîn. Jibo vê yekê, min di her tiştî de fedekarî kir. Çawa ku ew rêxistinên din hemû jevbelavbûn û hatin jibîrkirin, lê PKK hê jî xurt dibe û pêşvediçe, di bingeha vê de ev hewldan hene.

Min dixwest ku ev xweş were zanîn, pêşvebirina behreya rêxis- tinî û hişmendiya azadî ya xortekî yan jî qîzekê, herî zor e lê xeba- teke ku encamê diyar dike ye. Heta ku cîhê wê neyê xwe fedakirin, ketina şer û xebata barkêşiyê, ji feydê bêhtir zirarê dide. Heta beh- reyên rêxistinî û hişmendiya azad yên ku viyana azad xurt dikin ne- yên serdestkirin, xebatên pratîk ku werin meşandin bi gelemperî, yê belayê bînin serê mirov. Digel ku hewldanên min ên di vî derbarî de diyarkerbûn jî, aliyên ku herî kêm hatine fêhmkirin in. Kesayetiya Kurd, ji ber dema ku behsa xebatê tê kirin ew barkêşiyê tîne bîra xwe, nirxê ramana azad û rêveberiya rêxistinî zêde naecibîne. Di vî warî de min şerekî viyanî yê mezin, da meşandin. Heger ev şer ne- bûna, Her yekî PKK yî niha di destê hinek hêzan de, ya barkeşekî hêsan an jî yê nizanîbana ku bûye hevkar û yê bi xwexapandinê ke- tibana nava rewşeke reben. Ya ku ez bitenê hiştime jî ev rika min e. Li gor min bêpannayina ji rik û hewldaneke wiha, ji pêşkêşkirina nirxên herî pîroz, mînak ji pêşkêşkirina xwîşk û jinê xetertir e.

c- Parastina nasnameya Kurd a di bingeha azadiyê de jî, bûye xebateke herî zor a vê demê. Tenê ne di bîrdoziya fennî ya Tirk de, di bîrdoziya fennî ya ereb û farisan de jî Kurd, parçeyekî xirabûyî îfa- de dikin. Derketina hemberî wan a bi nasnameyeke birûmet û azad, ji li dijrawestîneke bi neyartî ne cuda ye. Nasnameya Kurd a ku bi sedsalane mandele dikirin û her şêweyên komployê lê danîn û kêm- dixistin, dema bi bi awayek azad derdikeve hember, jibo wan qehr- ker dibe. Herwiha pêwîst e were fêhmkirin ku, nasnameya Kurd a azad ne xeter e, pêdiviya jiyaneke bi biratiye, pejirandina vê yekê ya bi wan jî behre, sebir û hostatiyeke mezin dixwaze. Di mozaîka gelan a Rojhilata Navîn de, vekirina cîhekî birûmet a jibo kurdan, gelekî zor bû ye. Nasnameya Kurd a ku hevkarên Kurd weke tiştekî herî erzan kirine mijara danûstandinê, li Rojhilata Navîn bûye xe- bata min a herî zor ku ez wê bînime cîhê birûmet yê layîqê wê. Di vî derbarî de, ji PKK û gelek derdorên dost û yên ne dost weye ku, pêşveçûn ji ber xwe ve pêkhatiye. Bi tenê hiştina min a li Rojhila- ta Navîn jî, jiberku min rûmeta Kurd bilind dihişt bû. Hemû kes Kurdê xulam dixwaze. Dema ev yek were redkirin, vederkirin, lîs- tik û komplo li pey hev tên. Jiberku min kesayetiya xwe bi kesaye- tiya Kurd a azad re kire yek, min hemû xeteriyên dîrokê û yên ser- demê kişandin ser xwe. Naletîbûna di rasteqîniya Kurd de û neyar- tiyên pir, di çawaniyeke ku mirov bişewitînin de ne. Ji ber vê yekê ji sal û demên dirêj ve, ji nasnameya azad dûr mane û hevkarî ji xwe re kirine kar. Heger ev yek jî xeter hatibe, ketine her rengî û rola xulamtiyê jî pêkanîne. Parçekirina min a van kevneşopiyan, zindîgirtina min a nasnameya azad di ser wan re, bi damezrakên ku di kesayetiya xwe de demokrasî, wekhevî û azadî pêşvenebirin re rê li ber diltirsî û nerihetiyê vekiriye. Biryar dane ku nasnameya azad a bi min were temsîlkirin, ne li gor berjewendiyên wan e. De- ma ku min gotibû “Min weke kes winda kir lêbelê gelê Kurd ê azad qezenc kir”, min ev rastî nîşan dabû.

Dema ku li jiyan û xebata min a Rojhilata Navîn were nêrîn, yê were dîtin ku sê çêbûnên bi bingeh hatine pêkanîn:

Yekem, afirandina rasteqîniya gelê şervan e. Derûna bîrdoziyî û xêzka siyasî ku di mercên Tirkiyeyê de hatine afirandin, herçiqas ku di

bandora dogmatîzmeke giran de bin jî, di çareserkirina pirs- girêka neteweyî de, bi gelemperî ji sosyalîzma zanistî bandor girti- ye û lêanîna wê ya li mercên me yên berbiçav îfade dike. Li vir a girîng ev e ku, bêyî xwe li qalib û hêzên sosyalîst ên reel bigirin, bi hêza ramana derûn û hewldana xwe ya pratîk jibo gelê Kurd sîste- ma bîrdoziyî ya pêdivî pêkbînin. Ev peywir, herçiqas ku bikemasî be û aliyên wê yên dogmatîk jî hebin, esasê wê di dema ku ez li Tir- kiyeyê û di wan mercan de hatiye pêkanîn. Herçiqas ku gelek ge- lemperîkirinan vedihewîne jî, di xêzka siyasî de yekem car di bin- geha berjewendiyên derûnên Kurd de, weke viyana wî ya azad ku jê re suxreyê bike berbiçav bû ye. Pêşiya tevgera Kurd a dema nû ronahî bû ye û reya ku yê tê re bimeşe, diyar bû ye. Heta bi sala 1980an û çalakiya PKK ya li hember Siwêrek-bucakan a 30 Tînneh 1980an, ev dem gihaye xala bandevê. Ev dem dikare weke dawiya demekê û destpêka demeke nû were nirxandin.

Ya li Rojhilata Navîn hatî afirandin, li hember hêzên çewsîner ên der û hundir, li dij têkiliyên paşverû, bîrdoziyî û siyasî, bersiva gel a bi rêbaza şer e. Gelê Kurd yekem car di rêya ku ji aliyê viyana wî ya derûn û berjewendiyên wî ve hatî diyarkirin re, jibo mafê xwe yê jiyana azad bidest bixe, çi astengên li pêşya wî hebin bi biryara şer û pratîkê diçe ser, bi raman û hînbûnên xwe yên hezar salan re jî şer kiriye. Jibo ku mêjiyê xwe yê azad û baskên wî bafirîne, ev şer jênerev e. Ji neolîtîkê heta bi koledariyê, heta bi feodalîzm û da- wiyê heta bi kapîtalîzmê, ji hêrîşkirina hemû sazûmanên serdest ku telpên koletiyê li ser sînga wî dane hev paşde nemaye û hemû pa- qij kiriye. Şerekî hundirîn e ku pêwîst e jibo azadiyê were kirin. Heger ku gelek êşê jî bide, gelê Kurd ê bi vî şerî aliyên xwe yên ku tîrawî (kangren) bûn, jêbike û bavêje. Di dîrokê de yekem car bi awayek wergirî û birêkûpêk, hemû girêdanên xulamker, paşverû û bîrdozî û pratîkên ku fersendê nadin ronahîbûnê, hatine rûxandin. Heta ku ev şer neyê dayin û bisînor be jî serkeftî nebe, şerê azadiyê yê ku ber bi derve tê kirin jî, ne gengaz e ku biencam bibe. Di sala 1979an de bi çalakiya ku li hember M. Celal Bucak hate pêkanîn, daxwaza çespandina vê rasteqîniyê ye. Şerê PKK ku li hember çe- tegeriya nava xwe û neteweperestiya hoveber daye destpêkirin jî, dîsa ji ber vê rasteqîniyê ye. Eva ku viyana gel a azad demakeve holê û heger

derketibe holê jî, jibo tepisandinê ev hezên ku hevqasî bi awayek stemkar têne ser, jiberku bi taybetiyên wan ên dîrokî û berjewendiyên wan ên jiyanî ve girêdayî ye. Herçiqas ku ne di as- ta tê xwestin de be jî, dikare were gotin ku ev şerê gel hinekî ser- keftî bû ye.

Ev îfadeyeke herî rast e ku çalakiya 15ê Gelawêj, weke parasti- na derûn a rasteqîniya gelekî ku divabûn bidin xeniqandin, were te- rîfkirin. Heger ev weke hêrîşê jî were fêhmkirin, di derûnê de hiş- yarkirina “Ez gel im, min tine neke” ye. Bi taybetî vebizava li hem- ber hovîtiya zîndana Amedê û bersiva qêrîna “Em dev ji hebûna xwe bemadin” e. Li qasî peyva Mazlûm Dogan a “Pêwîst e cîhan dengê me bibihîze”, bersiva peyvên M. Xeyrî Dunnuş ku gotibû “Hûn nikarin hebûna me bidin mandelekirin” e û şerekî pêwîst bû bihata dayin ku vate bide peyvên Kemal Pîr ên “Ez rizgariya gelê Tirk di şerê azadiya Kurd de dibînim”. Ev pêngava şer, di serî de hêzên olîgarşîk ên Tirk û Kurd, li hember hemû hêzên din ên olî- garşîk û despotîk, bersiveke “Serdema çewsandin û kedxwariya we ya li ser gel derbasbû, dema jiyana me ya azad hatiye” ye. Jibo ji- yaneke hemdem û birûmet, dayina berdêlekî pêdivî bû. Ev berdêl şerê gel bixwe bû. Bi awayekî din ne gengaz e ku ji dorpêça hêzên olîgarşîk û despotîk rizgar bibe. Li hember hêzên olîgarşîk û des- potîk, li gor rêjeya şerê xwe yê derûn ku bide, rewşa wî ku bibe ge- lekî azad û birûmet ê rasteqîniyê qezenc bike.

Eş û windayiyên wî çiqas bin bila be, parçebûna sazûmaneke çewsandin, zorker û bişavtinê ya ku hebûna wî mandele dike, en- cex bi şerekî derûn ê gel ku heta bi mêjiyê xwe his bike, yê gengaz be. Heger şerekî bi vî rengî nebe, liqasî ku nabine xwedî ti mafan, ê rizgariya ji tinebûnê jî çênebe. Herwiha di mercên Rojhilata Na- vîn de, li hember hêzên der û hundir ên paşverû ku hebûna wî têxin xeteriyê, şerê gelê Kurd ji pêwîstiyê wêdetir, çalakiya pîroz a dom- kirina û azadkirina hebûna xwe ye. Çewtiyên wî, rasthatiniyên li xi- yanetê, pêşveneçûna fennandariya wî, dirêjbûn û kurtbûna wî, vê pîroziyê naguherîne û ji bivatebûnê naderîne.

Ji aliyê din ve ev şer ne yê veqetîna ji gelên cîrane û ne li dij wan e. Berevajî vê, şerên ku wan jî birûmet û dewlemend bike yê yekî- tiyeke azad û komara demokratîk e. Li hember neteweperestî, paş- verûtiya

olperestî û cudaxwaziya ku hêzên serdest û kedxwar ferz dikin, şerê gelan ê yekîtiya azad û pêşverûtiyê ye.

Ez bawer dikim, ev li hember gelên me peywireke ku çi teorîk û çi pratîk, jibo vî şerê gel ez her tiştên xwe deynim holê. Herçiqas ku şerekî gel ê wiha ne li gor daxwaza min jî hatibe meşandin, ba- weriya min a bi derûna wî û pêdiviya wî mîsoger e. Lêbelê ez ni- karim bibêjim ku li hember çetegerên hundirîn û heta bigihe hêzên împeryalîst ên ku xwestine vî bişixulînin, ez serkeftî bû me. Lêbe- lê pêwîst e ev ji ber çavan neyê dûrkirin ku, ev peywir dikeve ser milê gelê kû şer dike û hêzên serokatiya wî. Girêdana bi berxweda- na hezar salan a gelê me û ya gelên Rojhilata Navîn ve, hewldanên min ên ku derûneke hemdem û pêşverû bi wan bidim qezenckirin, pêdiviyeke rezgirtina min a ku ez ji vê axê û heyîneçandî re nîşan didim e. Xemgîniya min ev e ku, ez ji aştiyeke birûmet û yekîtiye- ke azad heta bidawî pêkbînim, dûr mam û min hewldaneke liqasî ku ez dixwazim pêşkêşnekir. Lêbelê ez di wê baweriyê de me ku gelên me û hêzên wan ên berpirsiyar, ê vê kêmasiyê ji holê rakin û serkeftinê mîsoger bikin.

Xebata duyemîn a bivate ku min pêkanî, afirandina mîlîtanê azadiyê ye. Gelê şer dike mîlîtanê şervan pêwîst dike. Di mercên Tirkiyeyê de, mîlîtanbûn kêmber û dogmatîk bû. Li ser navê PKK mîlîtanbûneke ku encex bikaribe çend çalakiyan pêkbîne û bi awayek bisînor birame, hebû. Meşandina şerê gel a bi milîtanên bi vî rengî, ne gengaz bû. Di dawiya hêza bîrdoziyî, sebir, wêrekî û hostayiya wî de, encex gengaz dibû ku hewldanên mezin pê bi- din qezenckirin. Afirandina mîlîtanê azadiyê, beşa hewldan û de- ma min a herî mezin standiye. Vê yekê weke ku ji çiqilekî hişk şitlekê bigihînim, nêzîkayiyeke derhozeyî (mûcîzewî) pêdivî kiri- ye. Ji takekesên ku bi paşverûtiya hezar salan xweyî bûn, yên ji hêza hest û ramana bi vate par negirtin, yên li hember xwe bûne şervanên kor û xayîn, afirandina milîtanên azadiya gel, birastî jî xebateke herî zor ku behre pêwîst dikir bû. Di pey re bi dewreyên perwerdeyê yên bi sedan, bi gotûbêjên bi dehezaran û bi axaftinên taybet, min xwest ku ez bigihîjim milîtanên azadiyê. Jê ber vê ye- kê jî bêhn li min çikiya. Dema ez di meşiyam û min xwarin jî dix- war, çav û zimanê min jibo vê yekê dixebitîn. Min dizanîbû ku peywira min zor

e, ev yek karê herî birûmet e û ji ber vê yekê mi- rin li qasî mûyekî sivik e. Lêbelê bi nirxê ku dîroka binalet der- basbikim û tevkariyê li dîroka azadiyê bikim, jiboku çend sal bin jî xwe bi awayek rast bide vê têkoşînê, ez gelekî bi ser vî milîtanî de çûm. Di dîrokê de li qasî ku ti pêxember, feylesof, leşker û si- yasetvanan nekirî, bi fedekarî min xebata milîtanê ku çendanî û çawaniya wî heyî kir. Lêbelê bitaybetî, çetegeriya hundirîn bi sex- bêriyeke hişmendî, ev ciwanên ku dilê gel û heyînên min ku min kedeke sift dabû wan, bi stemkarî xerc kirin û xwarin, him xem- gîniya herî mezin û him jî hêrseke berze bi min re çêkir. Lêferz- kirina xiyanet û komplokeriyên bi vî rengî yên li çalakiyên min ên afirandinê, ne weke ku werin femkirin û kişandin.

Lêbelê milîtan bi xwe jî, ji vê yekê berpirsiyar bû. Ma qet rêz- girtina wî jê re nebû? Gelo hevqas ked ne didît? Gelo fêlnn nedikir ku berxikê dê û bavê xwe yê ku hêvî pêve girêdane, an jî zaroka wan a weke şêrekî ye? Yê çiqasî li hewldanên min ku bandorê li yên herî bêwijdan jî dikin, xwedî derkeve, ji ber ve yekê jî yê kengî di pratîkê de vate bidana sozên ku didan? Herî di serî de yê çawa heyîn û pêşveçûna xwe domdirej bike? Milîtan ango şervanê azadi- yê, pêdivî bû bersivê bide van pirsan tevan. Rasteqîniya ku bi se- dan belgeyan were ronahîkirin ên hêzeke pratîk bidine perspektîfan ku wî ji amûrbûna fennandarê sexte û bêesil derbêxe, pêwîst bû wî temsîl bike. Min bawer dikir ku min gelek tişt dane berendamê mi- lîtan. Berdêla van dayinên min, bû kûştin û mirinên erzan ên ne di cîh de. Ti caran ji xwe re nekire peywir bê çawa li kûderê, çilo pê- diviye bijî û bide jiyandin. Min gelekî gihand. Wî jî gelekî şer kir, wêrekî û fedekariya bêsînor nîşan da, lêbelê nebû hosta. Qet nêzîk- nebû ku sazûmana xwe bafirîne. Ji hînbûnên jiyan û mirina hêsan rizgar nebû, biartêş nebû û fennandar nebû. Ez nirxên derketin ho- lê û lehengiyên wan mandele nakim. Lêbelê ev tenê besî nîşandana kêmasiya wî ye ku, li hember çetegeriya hundirîn û neteweperesti- ya hoveber, di dema wê de û biserkeftî helwest pêşnexistiye û en- cam negirtiye.

Ez timî vê dibêjime xwe: Gelo min ji serî de bizaniba ku yê wi- ha bin, minê destûr bidana ku şer bikin? Bi hindikayî minê berpir- siyariyên ji aliyê xwe ve bipejirandana? Lêbelê digel van xemgîni- yên min jî,

afirandina milîtanê azadiyê xebateke destanî ye. Layîqî vê nebûn. Tertûbelav kirin. Bi xayîntî û bêberpirsiyarî hate bikara- nîn. Lêbelê dîsa ez bawer dikim ku, di dîrokê de cîhê xwe yê layîq girt. Bîranîna bi hezaran şehîd, teqez ê jiyana azad bafirîne, yê ge- lê Kurd ê azad pêkbîne. Yên ku bi şûn ve man, di asta parastina re- wa de, yên hemû kêmasiyên xwe ji holê rakin, jibo aştiyeke birû- met û yekîtiyeke azad a gelên me yên bira, hêvî dikim ku yê hêze- ke çawanî û çendanî bigirin û bibine ewleyiya serkeftinê.

Li Rojhilata Navîn xebata min sêyemîn a destanî, ya di derba- rê azadiya jinê de ye. Li gor min ev xebata ku pêwîst e berî riz- gariya dayikniştiman û kedê bête kirin, ya herî zor bû. Jin çîna bindest, netewe û zayenda pêşî û herî kevin a paşverûtî û koleda- riyê ye. Li gor ku xûya dike jibo cudahiya zayend, newekhevî û çewsandinê dikine sedem. Dema ku bi kurayî li ser dîrokê were lêkolîn, yê were fêhmkirin ku, jin bitemamî qurbanên pêşî yên serdestiya civakî û siyasî ne. Çîneke pêşî ya newekhevî û koleki- rinê ku li mirovatiyê tê ferzkirin e. Piştî jin hatiye kolekirin û bû- ye tiştekî malê yê kedî û hêmin (semerm), dor hatiye afirandina civaka biçîn û dewletê. Mêrê derewîn û zalim piştî ku jin daxist, bi wêrekiya ku ji vê yekê girtî, dest bi çewsandin û dîlgirtina za- yenda xwe jî dike, mîtolojî û olên ku sazûmanên ramana derew ên herî mezin, dafirîne. Jixwe mîtolojî û olên ku gelan nêzîkî ras- tiyê dikin jî hene. Em behsa mîtolojî û olên serdest û kedxwaran ên derewîn dikin. Dema ku li van mîtolojî û olan tê nêrîn, tê dî- tin ku jin bi hezar xapan ji textê xwedawendiyê yê bişeml tê da-

xistin, tê bêqîmetkirin û herî dawî tê tinekirin. Ne gengaz bû ku ez bibim şervanê azadiyê û vê yekê nebînim. Weke zarokê azadi- ya vê axa ku olê dayîka xwedawend afirandî û ji xwedawendên evînê yên pêşî re bûyî wargeh, minê hewl bidana ku mezinên me yên pêşî û çavkaniyên azweriya me felnn bikim, lêbikolim û mi- nê sedemên hebûna wan bidîtana.

Rawestina min a li ser pirsgirêka jinê, ji pirsgireka rûmeta kesa- yetî wêdetir e. Li hember hewceyiyên hêsanî yên zayendî ne. Ev weke mêrxasiyeke rastî bi min hat ku, hevdîtina zayendan ji ajoya ajalî derînim û hildim asta dostanî û rêhevaltiya mezin û min fêlnn- kir ku destneavêtina jinê tirsonekî ye. Ev tirs ji aliyê mêrê serdest ve hatibû afirandin. Di bin navê namûsê de ev lîstik pêktanî. Dema ku digot “Ji te hezdikim” cara duyemîn kêr lêdixist. Bêmafiya wî bi awayek toqîn bû. Weke zayendekê jin hincirandiye, fizîka wê, zî- rekiya wê û hestên wê helikandine. Jin xistiye kûrahiyên ku neyê bawerkirin. Mêr û jinên sosyalîst yên ku digotin em bixwe jî, xwe ji fîgûrantiya vê lîstikê rizgar nedikirin. Bi hêza ku min ji tîbûna azadiyê girtî, ez çûme ser vê pirsgirêkê. Min gelek dahûrandin, guf- tûgo û peyvên bi kûrayî pêkanîn. Min ne weke xwediyekî wan we- ke hunennendekî destekerî li her tiştên wan kir ku, ji fizîkeke xwe- şik bibine çirûskên zîrekiyê, bi dengê zimanê xwe çêjeke ku ti da- ring nikaribe bide, bigihîne asta bilind. Gihîştin, mezin gihîştin lê- belê nezan bûn. Jiyana bi nalet û mêrên efendiyên wan li bin serê wan bûn. Ji ezmûn û hostatiyên ku şerê zayend ê derûn li hember wan û bi wan re bidin meşandin, bêpar bûn. Bi vê êşê xwe di ken- dalan werkirin. Xwe di agiran de şewitandin û xwe bi bombeyan parçe kirin. Wan li ser navê lehengiyê hertişt kirin. Lêbelê bi tenê bûn. Mêraniya li hember wan, ji nêzîkayiyeke bêteşe pêde nedix- west ku nezîkayiyeke rêhevalî û dostaniya mezin a wekhevan, bîne aqlê xwe. Weke çîçekan diçihnisîn û diçûn.

Ez giham hêza hezkirin û rêzgirtineke ku ji nava xwe, baweri- yê bi kulta xwedawendiyê bînim. Çiqas hewl dabin ku têkoşîna min ê jinê ji çavan bêxin jî, min mafê wê da. Him tê jibo jinê xi- yanetê li peywiren herî pîroz bikî û tê protestoker bijî, him jî tê jibo rêhevaltiya jinê ya esîl, tişta bikeve ser milên te pêkneyînî! Min hewl da nîşan bidim ku, di serî

de PKK û hemû derdorên tê- kildar, têkoşîna jinê hewqasî hêsan negirin. Bi hêmanî û cidîbûn heta bidawî min hewl da ez nîşan bidim û ferz bikim ku, bi hin- dikayî liqasî xwedayên mêr ên zorker û derewîn, cîhana xweda- wendê a hêza rastî û evînê were naskirin û hezkirin û rêzdariya pêdivî were nîşandan.

Herçiqas ku xayînen wan û hevkarên wan derkevin jî, ne gengaz e yen ku ji dil û can tevlî van hewldanan bûne, werin jibîrkirin. Ne- xasim şehîdên wan, yê timî weke ezîzeyên pîroz ên gelên me û yên vê axê werin bibîranîn. Ew di rewşa xwedawendên leheng ên rastî de ne. Min yekbûn û partîbûna yên mayîn bi rêzgirtin pêşwazî kir, bûm alîkar. Min timî got ku pêwîst e bibin ewleyiya jiyana azad û xweşik. Min bi bawerî hewldanên xwe heta bi dawî dan meşandin ku, yê rojekî teqez bigihin hêza jina ku mêrê paşverû, derewîn û zorker bîne rê. Mirov tenê bi jina ku milkê wan be mezin nabe, na- be mêr. Min nexwest wiha mezin bibim û ne jî bibim mêr, heta bû- yina bi vî rengî min bêşerefî dît.

Ez dizanim ku min jin kire astengiyê. Ez di zanim ku min ew ki- rine mîna perçek agir jî. Ez dizanim ku ji wan hinek dijminatiyê jî dikin û gelek bêfayian dikin. Ez dizanim ku min ew bi tenê jî hiş- tine. Lêbelê rastiyeke ku ez herî dixwazim bizanibin, pêdiviya xurt- bûna wan a ku bikaribin qedera him aştiyê û him jî şer diyar bikin. Heta ev nebe jiyan heram e. Heger ev nebe evîn nabe. Heger ev ne- be ti bêrîkirin ji holê ranabin. Tênêbûn û cudabûn, jibo ev mezinatî werin bidestxistin û serdestkirin, rêya ku pêdiviye pêde herin û da- yina fatoreyên deyna ne.

Ez hêvî û baweriya xwe diyar dikim ku, bihêza wekhevî û azadî ya li welatê dayîka xwedawend û xwedawendên evînê ku hezar sa- lan dane windakirin, di xebat û tekoşîna bi navenda jinê de xweşi- kayî û zîrekîtî yê ji nûve were afirandin, liqasî peymana nû ya ci- vakî ku heyî, derbasî jiyanê bike yê bigîhe hêza derûn. Ev mîsoger e ku di rêhevaltiya jinê ya tije hezkirin û rêzdarî de li qasî angaştê, weke karkerekî evînê heta bi nefesa dawî ezê hewldanên xwe bido- mînim. Li qasî ku vateyê bidin û hewceyiyê bibînin ezê yê rêheva- lên jin bim û bê guman ezê wisa bimînim.

Li Rojhilata Navîn xebatên din jî ên girîng pêkhatine. Pêwîst e baş were zanîn ku, bitaybetî li hember dîplomasiya hevkarên Kurd ên ku

gelê Kurd gelekî daxistine, jibo gelê me were cîhekî birûmet, gelek hewldanên dîplomatîk hatine pêkanîn. Pirsgirêk ne ew e ku bi giregirên mezin re, dîplomasiya fennî were pêşvebirin. Ya pêdivî ev e, bi hewldanan bi hêzên herêm û yên cîhanê bidine zanîn ku, gel ji amûra erzan a bazirganiyê were derxistin û nehêlin bibine amûrên lîstik û komployên siyasî. Bi dost û dijminan bidin nîşan- dan ku azadî û hebûna gelê Kurd, nabe mijara bazaran. Di dîrokê de her çiqas ku bi sînor be jî, gavên bi vî rengî hatine avêtin. Di en- cama van hewldanan de, gelê Kurd ji hemû deman bêhtir li nasna- meya xwe ya derûn û viyana xwe ya azadî, bûye xwedî. Hatiye nî- şandan ku bi lîstik û komployên hêsan nabe mijara qirkirin û çew- sandinan. Hatiye çespandin ku, ne bê xwediye û gihaye hêzeke wi- sa ku bixwe û hezên pêşevan, hemû komplo û lîstikan vala derbixe. Belkî me li ser navê gelê xwe ti peymanên dîplomatîk ên rewneq- dar çênekirin. Lêbelê ev mîsoger e, me peymanên nenivîsî di mêjî û dilê dost û dijminan de bî cîh kirin ku, Kurd di jiyana azad de bi biryar in, qet ji vê naqerin û pêdivî be jibo vê yekê yê hemû fede- karî û wêrekiyê nîşan bidin.

Qezencên hevkarên Kurd ên dîplomatîk ku vê dawiyê bidestxis- tin jî, li ser pişta hebûna me ya li Rojhilata Navîn hatine standin. Herçiqas ku di bingeha dijîtiya me de be jî, hemû peymanên hatine çêkirin û hemû berjewendiyên daringî ku pêkhatin, li ser xwîn û ke- da me bilind bûne. Emê îro vê ji van efendiyên hevkar re bibêjin. Gelê me jî yê lehengên kedê yên rast nasbike. Viyana Kûrd a aza- diyê, hemû sengergirtinên PKK ên der û hundir bi encamên van hewldanan ve girêdayî ne, bi zanîna vê yekê ez girîng dibînim ku layîqî wê bin. Ev daxwaza min e ku, jibo bi bigihin hêza xwe ya de- rûn ku li her qadê serkeftinê gengaz bikin, daxwaza min ev e ku sta- tuko wan xapîne û bigihine dîplomasiya rast.

Heger bi sînor be jî, girîngî û cîh bi xebatan hatiye dayin ku aka-

demiyên neteweyî werin pêkanîn. Bi baweriya ku di pêvajoya dîro- kê de, li qasî derya herikandina xwînê û hewldan têrê nake û ya pê- divî hêza vateyê û kûrayiya wê ye, jibo gel û pêşevanên wê dema dibistanan hatiye destpêkirin. Ev bûye parçek û taybetiyek ji jiyana min ku, çi mala ez lê jiyabim û çi qada ku ez lê bicîh bûbim, min veguherandine dibistanan. Weke feylesofên serdema pêşî, her ber dîwarekî, her binê darekê, bûye dibistanek. Bi zanîna ku aliyê gelê me yê herî lawaz hêza mêjî ye, zor li van xebatan hatiye dayin. Ez- mûna Akademiya Mahsûm Korkmaz, bi pêlan ber bi hemû qadan, ber bi hemû mirovên me hatiye kişandin. Tenê ne di warê leşkerî û polîtîk de, di warê dîrok, ziman û huner de jî, derbasbûyinê sazû- mana akademiyê, binesazî û bingeha hişî li holê hatiye danîn. Di rê- ya ku diçe heyîna çanda Kurd û azadiya wî de, sazûmana perwer- deya di asta akademiyê de ku demeke dîrokî bû, rastiyek e. Ya ku pêdiviye were kirin, derfetên ku di hemû qadên têkildar de bikine yek û bigihînin dibistana derûn. Ji polîtîkayê heta bi ziman, ji dîro- kê heta bi felesefeyê, ji huner heta bi aboriyê, li her qadê asta aka- demîk a neteweyî ku hatiye afirandin, derfeteke. Bi bawerî û hewl- daneke mezin, tevkariya li xebatên me yên bi vî rengî, yê kesan bi- lind bike û ji gelê me re jî azadiyê bîne. Yên ku di van xebatan de bisemekevin, gengaz nabe ku di nava şaristaniya hemdem de cîh bibînin. Serdestiya raman, behreya huner, serkeftina di pratîka jiya- nê de, başî û xweşikayî ye.

Weke encamê di jiyana Rojhilata Navîn de, jibo gelê me û dos- tan em bi afirandina utopyake azadiyê ku li ser lingan xwe digire bitenê, ranewestiyane. Liqasî bingeha dîrokî ku ev utopya pêve girêdayî, me derfetên azadiyê yên rojane ku bikaribin serkeftî bi- bin jî, pêşkêş kirin. Utopyayên ku gelên din bi sed salan bi hezar salan pêkanîn, me jibo gele xwe di nava 20-30 salan de, ji perçe- yên dema borî yên şikestî û belavbûyî û ji hêviyên pêşerojê yên lawaz, bi rasteqîniyeke ku bawerî û ewleyî pê were afirand. Pê- wîst e were zanîn ku ev utopya li qasî nan, av û hewayê pêdivî ye, gelê me dost rêheval ji xwe re bikin mal û di rêya jiyana azad a bêdawî de bimeşin.

## 4- Lêgerîna Aştiyê Rexne û Xwerexnekirin

Peyva "Her şerekî aştiyeke wî heye" rastiyeke gelemper e. Çiqas ku sedem, amûr û armancên şer hebin, hewqas jî sedem, amûr û ar- mancên aştiyê hene. Aştî weke ku tê zankirin, ne çalakiyeke pasî- fîst e, ne pêvajoyeke jiyanê ye ku bi rihetî gihabinê, xwezayî û ji xwe re hatibe. Aştî dikare weke demeke jiyana siyasî ya berî şer û piştî şer ku bi siftî tê jiyandin, bête terîfkirin. Dikare weke dema di navbera şer û aştiyê de ya bê biryar jî, were nirxandin. Lêbelê ev jî rast e ku, sazûmana nirxên mirûz ya di jiyana civakê de herî te xwestin û li ser rûyê wê şer tên kirin e. Pêwîst e ev yek ji ber çavan neyê dûrxistin ku, aştî çêbûneke dînamîk e û bi şer ve ji nêzîk ve girêdayî ye. Yê ku şerê wî nebe aştiya wî jî nabe. Berevajî vê, yê ji aştiyê fêhm neke ji şer jî tiştekî fêlnn nake.

Çêkirina dîrok û teoriya şer a dirêj, li derî mijara me ye. Lêbelê şerekî bi siftbûneke daketî ku di dema nêzîk de em jiyane, nêrîne- ke ku bi gelemperî hatiye pejirandin e. Pêngava PKK a 15ê Gela- wêjê, ya ku rayedarên KT (Komara Tirkiyeyê) weke dema çalaki- yên terorîst a herî mezin binavdike, ji salên 2000an û pêde bi kû- rayî ketiye lêgerîna aştiyekê. Ya ku were lêpirsîn ev e ku, gelo ev lêgerîn çiqasî bi rasteqînî ye. Naxwe di civaka Tirkiyeyê de, ji sed- salan ve ji ber gelek sedeman hebûna aştiyekê timî di rojevê de ma- ye. Şer û levdanek hebe, aştî hatiye xwestin, aştî hebe mafê jiyanê hatiye bikaranîn. Ji bûutên neteweyî heta bi nava malbatê civaka ku em tê de dijîn, bi hebûna şideta giran re rûbirû ye. Jiberku pirsgirê- kên civakî û neteweyî nehatine çareserkirin, timî hêrs û şidet dane hev. Rojek hatiye û ev danehevên şidetê teqîne, biriye ber bi serhil- dan û levdanan.

Pirsgirêka Kurd, ji ber neçareseriyeke ku dijî, hebûneke ku di wergiriya xwe de herî bêhtir şidet daye hev e. Ji ber vê yekêye ku bi sedan sal in serhildan hatine jiyandin. Jiberku serhildan bi aştiya bi rûmet û bi dadmendî bi encam nebûne, rewşa 'ne şer ne aştî' we- ke şêweya jiyaneke bêoxir berstika gelê me bemedaye. "Ne şer ne aştî", eslê wê şeweyeke rêveberiya civakê ya herî stemkar e. Bi vê polîtîkayê gêjkirina gelekî lawaz, tê vateya vekirî hiştina ji çewsan- dina bêsînor û kedxwariyê re jî. Li erdnîgariya ku Kurd lê dijîn, rê- veberiyên

neteweyên serdest vê polîtîkayê disepînin. Şêweyeke timî ya bi rêveberiya rewşa awarte (neasayî) an jî qeyranê, weke ku şêweya reveberiyeke xwezayî û timî be, nonnal tê dîtin. Sedsalên 19 û 20an, bi rêveberiyen bi vê şêweyê tije derbasbûne. Pêdiviya bi dawîanîna li van rêveberiyên li derî mirovatiyê, diyar e.

Çalakîtiya ku li dora PKK hatiye pêşvebirin, ji deranîna rewşa 'ne şer ne aştî' ya holê pêde ne tiştekî din e. Ev çalakîtî, ji xirabû- na statukoya şidetê ya yekalî, veşartî û nixûmandî -bêteraz be jî-derbasbûyina dorhêla şideteke vekirî û duserî, îfade dike. Ji statu-koyeke pir bêdad, zalim û ku dirizîne, derbasbûyina statuyeke ku li dadmendiyê digere, dixwaze zilmê ji holê rake û dixwaze ku di rê- ya pêşveçûna hemdem de bimeşe, ferz dike. Herwiha pêwîst e şerê li dora PKK pêşveçûyî, bi şerê rizgariya neteweyan ê klasîk an jî bi serhildanên şoreşger re tevlîhev nekin. Heta ku em xwezaya şeran nasnekin, em nikarin têxin reya çareseriyê jî.

Herwiha di pêvajoya ku em dijîn de, pirsgirêka ku herî bêhtir pê-wîst e were nîqaşkirin, şerê PKK ku nêzîkî 20 salan dayî meşandin û vê hingê derbasî parastina derûn bûye, rast were terîfkirin, ji vê terîfkirinê bikevin rê û liqasî ku em pirsa "Heger ku dewam bike şerekî çawa?" ronahî bikin, hewqasî jî pirsa "Heger dewam neke, wê demê rêyeke çareseriyê ya çawa ku here aştiyê?" nîqaş bikin. Rewşa 'ne şer ne aştî', ne rawestineke zexm û mirovatî ye. Ev en- cex weke demeke kin a derbasbûyinê vateyê îfade bike. Di encamê de yan ê bi şerekî nû an jî yê bi aştiyekê payîdar bi encam bibe. Di vê dorhêlê de rewşa 'ne şer ne aştî' ku tê jiyandin, yê xeter û bêe- silker be, ji pêvajoyeke ku bikêrî hêzên naxwazin civak pêşvebiçe û di nava aştiyê de bijî pêde, nayê ti vateyên din.

Tewşikiya angaşteke wiha li holê ye: Heger pêvajo xitimî be, - ev hisdike bila di rewşa şer de û hisdike bila di aştiyê de be jî- tiş- ta pêwîst e were kirin, heta ku biqede ne berdewamiya rewşê ye. Tê zanîn ku di dîrokê de şerên herî mezin bi lezgînî hatine bi encam- kirin. Şerên domdirêj çêbûne. Lêbelê di mantiqê van de jî, di enca- mê de ne xitimandin, derfetên çareseriyê hene. Domdirêjî ji ber se- demên stratejîk û û taktîk in. Gavek jê jî ber bi çareseriyê ye. Ya ne rast, ne şerê

bi vî rengî ne. Nepejirandina şerên ku tên dubarekirin û şêweya çareseriyê tine dikin, girîng e. Kêmasî li aliyê kîjan rexî (teref) be bila be, encam nayê guhertin. Derbaskirina van şer û lev- danên ku rê li ber êş û windakirinên mezin vedikin û bê vate ne, mi- rovbûn û xwedî rastîbûnê pêdivî dike. Di dîrokê de biwêjeke bi na- vê 'Serfiraziya Pîrûs' heye. Mijara vê biwêjê di heman mijara ku em dixwazin bînin ziman de ye. Şer hewqasî domandiye ku, di dawî de herdu aliyan jî bi windakirinên xwe qîrna xwe anîne. Ali- yek qezenc bike jî, tiştekî bidest naxe.

Çawaniya şerên ku li gelê Kurd tê ferzkirin jî, gelekî nêzîkî şêwe- ya vî şerî bû ye. Ev şerekî ku aliyê têkbibe jî tiştekî bidestneyêxe ye. Di sedsala 21an de, heta ku gelê Kurd ji holê neyê rakirin, ti vateya van şerên ku lê tên ferzkirin tine ye. Heger Kurd weke gelekî werin tinekirin, belkî wê hingê hineke din li dewsa wan werin bicîhkirin. Heger ev ne gengaz be, yê were dîtin ku ji azadiya hemdem pêde ti rêyên din tine ne. Nayê ramandin ku mafên mirovan ên hemdem bi dewletekê bide windakirin. Li derî yên ku daxwaza wan a şoven û faşîst heyî pêde, azadiyên hemdem dewlet û civakê zexm dike. Jibo gelê Kurd bi şideteke hêrîşa domdirêj, çûyina ber bi cudahiyê ne derfetê dide û ne jî pêdivî ye. Bi yekîtiya azad jiyana bi her gelî re, sûdmendiya gelê Kurd e. Bi vê vateyê, di roja me de ku derfetên azadiya hemdem ku derketine holê, vateya şerekî rizgariya neteweyî yê domdirêj tine. Berjewendiyên gelê Kurd, di aştiyeke bi rûmet û xebitandina sazûmana demokratîk re derbasdibe. Lêbelê ev mafekî gelê Kurd e, heta ku hebûna wî were mandelekirin û mafê îfadeya azadî bi heyîna wî ya çandî neyê dayin, derbasî rewşa parastina re- wa bibe, heger ku sed salan jî bidomîne heta ev rewş ji holê neyê ra- kirin û azadiyên hemdem neyên naskirin, berdewamiya parastina re- wa pêdiviya hiqûqê gerdûnî ye. Li qasî neparastina heyîna xwe û nirxên çandî, ti rewşên din ên birûmetî tine ne. Di ti rêveberiyên mi- rovatiyê de, li hember mandelekirina heyîn û qedexekirina nirxên çandî, bêdeng nayê mayin. Encex ji mirovatî were derketin êdî ev

rewş yê derkeve holê. Herwiha ne şerên domdirêj ên cudaxwaz, ne jî rejhnên zorker ên bi mandelekirina heyîn û qedexekirina çandî ve girêdayî, tiştekî didine qezenckirin. Heger bi van annancan levdan hebin, jêqerîna van, pêdiviya mirovbûn û rastiyê ye.

Ev yê helwesteke di cîh de be ku, PKK çalakiyên xwe yên dema bûrî ku ji parastina rewa bûrîbûn weke çewtiyê bi pejirîne û wan derbasbike. Xala ku PKK hatiyê, pêkanîna vê merhaleyê ye. Vegu- herîna ber bi xêzka parastina rewa him pratîk û him jî teorîk hatiye pêkanîn. Ji vê yekê zêdetir tiştekî ku PKK bike nemaye. Kar dike- ve aliyê dewletê. Mercên bingehîn ev in ku, Hebûna gelê Kurd we- re pejirandin, maf û derfetên îfadeya azad bidine nirxên wî yen çandî, sazûmana demokratîk bê cudahî bidin xebitandin û bi enca- mên wê efûyeke giştî were derxistin, bêmafî ji holê bête rakirin û aştî were pêkanîn. Heger dewlet û dewletên din van mercên aştiyê bicîh neyînin, peywira ku dikeve aliyê gelê Kurd û hêzên pêşeva- niyên wî, heger ku sed salan jî bidomîne amadekariyen şerekî pa- rastina rewa ye. Hemû qadên erdnîgariyê yên kêrhatî, têkiliyen dos- tanî û bingeha girseyê, li gora vê amadeyî bikaranînê dibe. Hijma- ra artêşa parastina rewa ku pêdivî be, yê derkeve sed hezarî. Mezin- kirina hêzê bi parastina xwe ve girêdayî ye. Heger ev bi beşekê we- re pêkanîn bi beşekê, bi sed hezar kesî were pêkanîn jî, ji berde- wamkirina parastina rewa pêde ti çareseriyên din tine ne.

Rewşa kurdan a heyî, derfetê nade şerekî hêrîşkirina stratejîk. Bi- de jî ev ne pêdivî ye. Windakirinên şerekî wiha yê ji qezenckirinên wî pir bêhtir be. Lêbelê ku bi salan jî bidomîne, di rewşeke wisa de ye ku dikare şerekî parastina derûn bidomîne. Di vê de tiştekî win- da nake. Dibe ku hinek windahiyên mirovan çêbibin. Jixwe winda- kirinên mirina xwezayî, ji yên şer ne kêmtir in. Lêbelê qezenckiri- nên wê yê pir bin. Yê rûmet, hebûn, çand, hişmendî, û viyana xwe, di dorhêla şerekî de be jî yê li ser dayîkniştimana xwe, parçe parçe jiyandina xwe rizgar bike. Çi roja ku here yê hişyar bibe û dostan qezenc bike. Rojekê yê gelên cîran û mirovatiyê jî qezenc bike. Her- wiha pêşeroja şerê parastina rewa heye. Astengiya wî tineye. Li hun- dir hewîna wan nebe li derve, li deştê nebe li çiyê, li çiyê nebe li ba- jêr, Bi çek nebe bê çek,

bê çek nebe bi çek, legal ne be îlegal, îlegal ne pêdivî be legal, bi ceribandina her şêweyî -aborî, civakî, siyasî û leşkerî- yê heyîn û çanda xwe biparêze. Jixwe em di serdemeke wi- sa de dijîn ku, dewletên herî xurt bin jî, dema hêrîşî heyînên çandî dikin û mafê mirovan nasnakin, ji aliye cîhanê ve tên cudakirin.

Ev hemû mijar heger ku dubare bin jî, ez ji ber vê yekê dinivî- sim: Ji aştiya bi kurdan re nayê revîn. Reşa 'ne şer ne aştî' nayê me- şandin. Şerên ku werine ferzkirin, nayê ramandin ku yê ji 'Serfira- ziya Pîrûs' bêhtir bidin qezenckirin. Herwiha bi rojevkirina aştiya pêngava 15 Gelawêj ku em dikarin bibêjin zêde jî domkir, pêdivî û rasteqînî ye. Dewleta ku weke gelek mînakên wê yên hemdem ga- van bavêje, jibo berjewendiyên wê ye. Tişta Kurd dixwazin, tenê rêzdariya ji heyîna wan re, azadiya jibo çanda wan û xebitandina sazûmana demokratîk a bitemamî ye. Çareseriyeke ji vê mirovatî- tir û bêwurşe (nefspiçûk) nayê ramandin. Sazûmana parastina rewa ku PKK ketiye navê, ji ber berpirsiyariya wê ya bilind e. Dewlet an jî dewletan divê ku bersivên pêdivî bidine vê yekê.

Min di pêvajoya berî Îmralî de jî nîşan dabû ku, di vê çarçova se- reke de, jibo min lêgerîneke li aştiyê ji pêşvebirina şerekî, binirxtir e. Di 1 Rezber 1998an de îlankirina agirbesta yekalî, nêzîkayiya erênî ya li gotûbêjên neyekser û nameya jibo rayedarên Tirk ên bi- lind hatî şandin jî, di vê çarçovê de bûn. Têkiliyên neyekser ên bi serokomar Ozal û serokwezîr Erbakan re jî, di vê çarçova lêgerînê de bûn. Min pir caran ev mijar nîşan dan. Di pêvajoya Îmralî de, li ser aştiyê hê bêhtir sift bûm. Min ev yek ne di berdêlên tawîzan de, weke peywireke siyasî û mirovatî dît. Teorî û pratîka aştiyê, bi hin- dikayî li qasî teorî û pratîka şer pêdivî ye. Heger ku aştî bisînor be jî ji derketinên azadiyê re vekirî be, pêwîst e ji şerekî ku qezencên herî mezin bide jî çêtir were girtin. Ez bawer dikim ku hest, hiş- mendî û viyana aştiyê bêhtir esîl û xurt in. Li gor baweriya min, ge- lekî ku aştiya xwe bi azadî pêkanîbe timî birêxistinî û hişmend e, yê bikaribe bêhtir mafên xwe di nava aştiyê de birihetî bidest bixe. Ez ne gumanber im ku aştî ne lawazî xurtbûn e. Ez îfadeyên dema- gojîk ên 'welatê pîroz, al, dewlet' ku di bin dîlbûna dogmayên ne-

teweperstî de tên bilêvkirin, weke derewên bi faşîstî dinirxînim. Ez bawer dikim ku, welatparêziya herî lihevkirî di rêzdariya ji hemû çandan re derbasdibe. Yên ku bixwazin ji neteweya xwe re sûdewar bin, encex bi rêzgirtineke ku li qasî ji çanda xwe re digirin ji çan- dên din re jî bigirin, vê yekê pêkbînin. Sedsala 21an ê bibe şahidê aştiya Kurd.

Di destpêka sedsala 20an de, kurdan û tirkan li hember lîstikên hnperyalîstan, bi hev re şerê rizgariya neteweyî dan. Kêmasiya wan - sedem çi be bila be- ev e ku, yekîtiya azad û sazûmana demokratîk bi komarê re peknanîne. Peywira li pêşya wan, vê carê di destpêka sedsala 21an de vê serkeftinê ji wan dixwaze. Ev serkeftin ê rê li ber pêşevaniya Tirkiyeyê ya li Rojhilata Navîn, Kafkasya, Balkanan û Navenda Asya veke. Pêvajoya jiyana min a Îmralî, di warê ramana min a aştiyê de tevkarî kiriye. Li gor derfetan min encamên vê yekê dane derve. Di van herdu salên dawî de, di nennbûna dorhêla Tirki- yeyê de, rola van hewldanên min diyarker bû ye. Bi taybetî gav ne- avêtinên giregiren siyasî, parlamento û hikûmetê yen di vî warî de, fersend nedaye tiştên zêdetir ku aştiyeke payîdar pêkwere. Ez bi tir- sa ji mirinê nakevime nava vê helwestê. Ez dizanim ku ev sûdmendî û çareseriyê jî nayîne. Ez bi girîngî nîşan didim ku, ji ber pêdiviya nasnameya min a bîrdoziyî, gavên ku ez davêjim çewt neyên şîro- vekirin û li ser wan hesaben çewt neyên damezrandin.

Ya ku li ser min tê sepandin sazûmaneke rizandinê ye. Jixwe tê zanîn bê ez bi komployeke çawa anîme vira. Ez bi biryar im ku, ji- bo fersendê nedim daxwazên komplokeran ên li ser Anatolya, Me- zopotamya û Tirkiyeyê, ji aliye din ve fersendê nedim beşên paşve- rû û şoven ku siyasetê li ser şer û xwînê didin meşandin, ezê hel- westa xwe ya aştî û yekîtiya azad a jibo sûdewariya gelê Tirkiyeyê, bidomînim.

Ji aliyê din ve min dabû nîşandan ku, tinekirina min ne tenê bi kesayetiya min bisînor bû, heger wiha bûna minê nekiriba gelemşe û zêde venekiribana. Lêbelê ji sedema komploya ku hê jî di meri- yetê de, jiberku min dizanîbû yê tinekirina min bi awayek zincîrkî, jibo tinekirina hemû rêhevalan, dostan û ji gelê me yên dirist û we- latparêz bi deh hezaran bikarbînin, dema ku dibêtiyeke wiha were rojevê û weke xeteriyekê derkeve holê, amadekariya bi tevayî, ra- bûna ji piyan û

ketina rewşa sazûmana parastina rewa, mecbûrî di- be. Ji yên ku jibo aştiye gavên maqûl navêjin, her tişt tê. Valader- xistina komployê hê bêhtir hawldanan pêwîst dike. Pêwîst e em baş hesab bikin, ku şêweya rizandinê dixwaze ber bi kûve bibe. Di destpêkê de şêweya xwekûştinê li min hatibû ferzkirin. Rewşa piştî min li gelek qadan hatibû plansazkirin. Ya Talabanî tenê yek e. Pla- nên bi Barzanî ve girêdayî jî hene. Plansaziya her hêzeke têkildar û bi angaşt heye. Ev plan ji navê ranebûne, li demê hatine belavkirin. Şêweye çareseriya Tirkiyeyê bi çi rengî ye, qet nayê zanîn. Lêbelê ev diyar e ku hewl dide birizîne û dema ku fersendê bibîne jî alter- natîfen xwe bikarbîne.

Helwesta me tê zanîn. Ev şert e ku hêzên parastina rewa di na- va çar dewletên cîran de, di çawanî û çendaniyê de bin ku bikari- bin aştî û çareseriya yekîtiya demokratîk pêkbînin. Aştiya herî bê- wurşe jî, hêza parastina rewa ya herî xurt û zexm pêwîst dike. Kî- jan dewlet an jî kîjan dewletan herîş dikin bila bikin, li hember te- van bi planên tekûz, amadekarî û binkegirtin, bi kûrayî û berfireh bin. Şensê aştî û çareseriya demokratîk, encex dema ku li pişt sa- zûmaneke parastina rewa ya ku li hember hemû hêrîşan raweste hebe, yê pêkwere.

Dubare dikim: Ev jibo her çar dewletan jî derbasdar e. Di vê bin- gehê de, hewceyî bi xebata civakeke şarwer a berfireh û xebateke siyasî ya bi hêzên çareseriya demokratîk ve girêdayî heye. Esasê wê xebatên civaka şarwer û hêzên pevrayiya demokratîk ê aştiyê û çareseriya demokratîk pêkbînin. Encex bi arîkariya derveyî welat û hêzên parastina rewa ku bidine van hêzên pevrayî, yê pêşveçûn bi erênî û lezgînî pekwerin.

Merc çiqas kû giran bin jî, ezê hewl bidim ku ragirim. Di jiyana xwe ya Îmralî de, yê ji min re ne zor be ku ez sebir, vate û wêreki- yê hilberînim. Zoriyên fizîkî li derî viyana min in. Ya erênîtir, ezê him dîroka gelemper û him jî dîroka Hereketa Azadiyê, bi hêza hest û ramana xwe ya li Îmralîyê, li ser hev binirxînim. Ezê hinek xeba- tên wêjeyî plansaz bikhn. Ez dikarim vê nîşan bidim: Têgihîştina hêza hest û ramanên min ên li pêvajoya Îmralî, di girîngiyeke dera- sayî de ye û yê bibe ber bi hêzeka derasyî. Mezinbûna dîrokî û me- zinatî, bi hevparkirin û temsîlkirina rasteqîniya min a li Îmralî ve hişk girêdayî

ye. Jiyandina dîrok û rojaneyiyê ya hevqasî bê eman û sift, çavdêrîkirin û encamgirtina vê ya li ser damezraka min, li- qasî ku hêzê bide yên ji xwe ewle, hewqasî jî peywirê li wan bar di- ke. Ez hez nakim ku xwe mezin bikim. Lêbelê ev yê sûdewar be ku, mînakên piştî îsa, Paulus, Mihemed, Lenîn, Stalîn ûwd. jibo hev- bergirtinan diberçavan re werin borandin. Ez bawerdikim ku, ev dahûrandina bi şêweya pareznameyê, yê bandoreke ku gelek aso- yan veke û hest û ramanan dewlemend bike bafirîne û bersivê bide gelek hewceyiyan. Lêbelê heger ku jibo xwe aştiyeke birûmet û ji- yaneke azad dixwazin, pêwîst e her kes hewldanên xwe yên li gor mercên demeke derasayî tevlî bike.

Hê jî ez ji sedî 90 barê gel, yê PKK û dewletê hildigirim. Ez vê jibo xwe weke rûmetekê dibînim. Lêbelê yên ku bar hilnegirin jî, ne xwedî şensin ku bilind û mezin bibin. Ji ber vê yekê pêdivî he- ye ku li ser şêweya fedekar, wêrek û serkeftî were rawestandin. De- mên bi vî rengî di giraniyeke wisa de ne ku dused salî diyar bikin. Nirxandina van a bi vê şêweyê, ye sedsala ji qambostiyê rizgar bi- ke, yê rê li ber demên ku em dikarin bibêjin layîqî dîrokê ne, hebû- na hêzên esîl û bi kesayetîbûna wan veke. Ji ber bikameanîna vî şensî ez ne li ser navê xwe, li ser navê herkesî xemgîn dibim. Ev xaka ku dikare bihişt jê were afirandin, pêwîst bû ku wiha hoveber û xwelî û xurde nemabana. Mezinbûna heviyên min, ji her demê bêhtir xurt in. Hevparkirina ne bi têrayî û netemsîlkirinê, li ser na- vê we û heta li ser navê mirovên xwedî tegihîn, weke çavkaniyeke windayî û xemgîniye dibînim. Ez ti vateyê nadime vê yekê ku, hev- qas rastî, azweriyên jiyana azad û yên ku li pey xweşikayiyê, bi awayek mezin bisemakevin. Herwiha heviyên min ên serkeftin û çareseriyê yên her dem, bilindin.

Rexne û xwerexnekirineke van demên jiyana min ku bi direjayî û siftiyeke piçûk neyê girtin derbasbûne, pêdivî ye û yê pir hînker

bin. Ezê hewl bidim ku di asta pêşnûma û bi şêweya terîfkirinan de di bin semifîsên sereke de birêzînim.

**a-** Di civakên Rojhilat de, zemîna jiyandina takekesîtiyê ji de- ma sazûmana rahîbên Sumer ve, timî hatiye bêweçkirin. Bê take- kes yê çawa bijî û biramê, beriya hezar salan berê hatiye biryar- dan û weke qederê hatiye pêşkêşkirin. Ev jî bi vê têgihînê ve gi- rêdayî ye ku, serdestiya koledar di derûna xwe de, sazûmana li ser rûyê erdê ya sazûmana ezmanan a sabît e. Şêweya ramana mîto- lojîk û olî timî ev sazûman tekûz kiriye. Ji ber mercên civakî yên koledar ên pêşî, giredana takekes a bi sazûmanê ve ku nikarîbû li siya xwe jî xwedî derkeve, hê ji serî de derbeyeke mezin li take- kesîtiyê daye. Ev mîsyona bêkesayetîkirinê ya ku mîtolojiya Su- mer daye destpêkirin, ji aliyê olên yekxweda bi rêzikên baweriyê ên hişktir ve hatine girêdan. Di derbarê mijarekê de takekesê ku xwe bi dev raman û hestên afirîner ve berde, dexmeya guneh dix- we û ji civakê tê vederkirin. Takekesê kû nikare bi vê yekê, tes- lîmî ramana serdest dibe. Despotîzma ku çiqas diçe kûr û berfireh dibe, têgihîna qedereke hêzdar li hemû takekesên Rojhilat serdest dike û rêveberiya xwe hêsan dike.

Takekesê ku ewlekariya wî bi ramana wî were li dera han, ketiye rewşekê ku nizanibe behreyeke wî bi vî rengî jî heye. Tiştê dikeve aliyê wî ev e ku, çi bidinê bi wê qayîl bibe. Di bin navê sazûmana ezman an jî sazûmana xwedayî de, sazûmana şaristaniya koledar hê- zeke bêhempa qezenc dike û takekes hêzê winda dike, ev yek jî êdî weke tiştekî xwezayî û qederê tê pêşwazîkirin. Çi dewlet û monar- ka ku nû tê, ji pêşvebirina vê sîstemê pêde tiştekî din nakin.

b- Di civaka Rojhilat de, bersiva ku takekes daye vê bîrdoziya fennî, ramana veşartî ya bi şêweya mîstîsizmê û bazdana bi dû wê de ye. Komên şîrovekirina olî yên fennî ku şêweyên pêşî yên terî- qetiyê, ti caran jibo sazûmanê nebûne altematîf. Dema ku bi rama- na felsefî bingeha şaristaniya Rojava hat avêtin, di şaristaniya Roj- hilat de ramana mîtolojîk ku timî pêşvediçû, bi daxistina asta bawe- riya olî re hê bêhtir bawerhişk bû ye. Gumanberiya di serî de ya bi- sînor, bi temamî cîhê xwe daye baweriya dogmayan. Piştî ku dibê- jin peyva xwedê, êdî vateya ramana serbixwe namîne. Xwe li vê yekê

qewimandin, rabûna li hember xwedê ye. Ti takekes ji peyva xwedê xweşiktir nikare baxive. Ramanên takekesê ji Rojhilat bix- we tine ne. Qalibên ramanên amade yên ku ji sedsalan ve hatine ji- berkirin hene. Ne pêwîst e li pey ramanên afirîner bête bezîn. He- mû di pirtûkan de nivîsîne. Kesayetiya herî zana yê ku zanînên di pirtûkan de herî bêhtir jiberkirine. Dema ku şîroveyên mîstîk hati- ne kirin, bi bêbawerî hatine tawanbarkirin. Serdestiya bîrdoziya fennî, li ser takekes qatqatî hatiye sepandin. Ev şêweya ku li teva- ya Asya û Rojhilata Navîn serdest, li nav grekan li şikestinê rastha- tiye. Civaka Grek zemîn nedaye ku ev şêwe were pejirandin û pêş- vebiçe. Taybetiya ramana felsefî ya pêşverû, hê bêhtir rê li ber pe- jirandinê vekiriye. Şaristaniya Rojava bingeha xwe bi ve ramana felsefî daniye. Di derûna vê de pêşikî bi ramana takekes tê dayin. Herwiha veqetîna di navbera Rojava û Rojhilat de, di bingeha take- kesîtiyê de destpêdike. Li Rojava takekes bi hêza aqil û afirînêriya xwe pêşvediçe, takekesê Rojhilat jî di nava dogmayên ku çiqa diçe bêvate dibin de, vedixeniqe û tê nûhandin.

Li Rojhilat bêweçbûn bi vê dogmatîzmê ve girêdayî ye. Êdî ta- kekes bi berçavka dogmayan a reş û spî yê li cîhan û gerdûnê binê- re. Bi van berçavkan bê takekes yê çi bi çi rengî bibîne, hê berê ha- tiye diyarkirin, bê kîjan hestî yê bi çi şêweyê bijî, bi rêzikan hatiye peytandin. Bê çawa yê bibîne û çawa bipeyive, jiberku ji hezaran salan ve hatiye biryardan, tiştekî ku kefş bike û bafirîne tine ye. En- cam nêrîna gêjgêjî ye. Hûnê cîhanê û welat bi rengekî weke avê bi- bînin. Hûnê di xwezayê de li zagon û kefşan negerin. Ev hemû tay- betmendiyên xwedê ne. Ew dirame û bi peyva xwe dide zanîn. Bi kinayî takekesê Rojhilatî, bi vê ramana bi vî şêweyî, hemû behre- yên xwe yên ramanî û hestyarî, qezencên mezin yên şaristanî win- da dike. Takekesê Rojavayî, weke ku nû derkeve nava daristanê û kefş bike, heroj bi raman û hesten nû cîhanê weke bihiştê dibîne û hewl dide ku weke çavkaniya hêzê ya bêsînor kefş bike.

c- Gunehê ku min ji zarokatiya xwe ve kirî, jiberku min serî li kevneşopiya 5000 salan hildabû. Lihevnekirinên li gund ên bi şîdet û gumanberî, sazûmana di kûrayiyê de têkildar dikin. Li nav civaka gund û li nav malbatê, rawestina min a li hember her tiştê ku dûrî aqil û

berevajî azadiyê, dihate vateya hejandina kevneşopiya 5000 sal. Derawaya resen a dayîk û bav, hevûdin bêbandorkirina wan, lawazbûna civaka feodal û li gund tineyiya serekî despotîk, dihate va- teya şikandina dorhêla kevneşopî. Rewişta dayîkê ya bi taybetmen- diya neolîtîkê, qalibên koledariyê bêhtir lawaz kirine. Bê angaştiya bav a li ser navê sazûmanê, qada li pêşya min hê bêhtir vekiribû. Ta- kekesîtiya min vê dorhêlê dinirxîne. Çiqas kû navberê digire bêhtir bi xwe ewle dibe. Tinazkeriya gundiyan min taxepaş nake. Ti otorî- teyên ku pêşya min bigirin namînin. Serhildana li nîvê gund a li hember bavê ku otorîteya herî mezin, sazûmana rahîbên Sumer a 5000 salan dihejîne. Hêza gund û malbatê têrê nake ku min hîn bi- kin. Êdî min ewlekariya ku di rêya xwe de bimeşim qezenc kiribû. Zaroka ku qaliben civakî yên Rojhilat hilweşandin, hêviyê dide.

Bi rastiya gotina ‘di heft saliya xwe de çibe, di heftê saliya xwe de jî ew e’, zore ku civaka burjûva û saziyên komarê min rawestî- nin. Êdî heger ku di teşe de be jî, ew bixwe jî ji gelek aliyan ve bi civaka feodal re di nava nakokiyan de ne. Ev yê bi kêrî min were. Meyldariya şoreşgerî ku ez li ber serê wê, yê vê hê bêhtir xweyî bi- ke. Dema ku ber bi Rojhilata Navîn ketim rê, weke ku Brahîm pût şikandin, min jî gelek kevneşopiyên 5000 salan şikandin. Êdî di rewşa mayinê de nayê man. An çûna çiyê, ya koçberî yan jî çalaki- ya lehengî aqûbeta li benda min bû. Piştre yê were fêhmkirin ku bi derengmayîna du hezar salan, karekî Brahhnî hatiye pêkanîn. Ji za- rokatiya xwe ve, di bin mercên taybetmendiya xwe de herçiqas ku min hay jê jî nebe, ev yek zelal dibe ku min serî li sazûmaneke şa- ristaniya 5000 salan hildaye. Ev rasteqînî di heman demê de, şoreş- geriyeke li gor taybetmendiya xwe ye.

**d-** Çepê Tirkiyeyê û Marksîzm şoreşgeriya demeke bisînor e. Têkoşîna wan li hember kapîtalîzmê, bi kesayetiya ku li nav meş- tela wê qezenc kirin, sedema semekeftina wan a bingehîn e. Di de- rûna xwe de ji sazûmana kapîtalîst veneqetiyane. Mebesta baş, an- tîkapîtalîstiya tundraw, bi serê xwe têra derbaskirina sazûmanê na- kin. Ne di wê hêz û behreyê de ne ku, jiyan û kesayetiyan û dewle- ta ku kapîtalîzm jî pê ve girêdayî derbasbikin û veguherînin. Ji şê- weya terîqetên serdema kevin ên mîstîk wêdetir naçin, lebelê hi- nekî din pêşveçûne, bingeheke

wan a zanistî heye û hemdem in. Ji bûyina serikê aliyê çepê yê kapîtalîzmê rizgar nabin. Şoreşgeriya kapîtalîst jî digel hemû dijberiya xwe ya li feodalîzmê, yê di meş- tela wê de bigihîje. Yê gelek qaliben bîrûbawerî û giyanî ji wira bi- gire. Şaristaniya ku teşeya gelemper a civaka biçîn, yê taybetiyên sereke ên hevpar bide tevan.

Şaristanî bixwe sazûmaneke tevdeyî ye. Tevgereke rast encex di rêjeya ku vê tevdeyîtiyê dahûrîne de, yê angaşt bike ku şoreşeke ci- vakî ya cuda ye. Her şaristaniya ku tê xwedî role ku ya kevin hil- neweşîne, pêdiviye tekûztir bike. Herî dawî ya ku sosyalîzma reel jî kirî ev e. Ev çespîneke ku sazûman derbasnekiriye. Ev sazûmana ku weke çep û rast li civaka Tirkiyeyê vedaye, yê bi awayek lawaz- tir û xirabûyîtir pêkwere. Derawaya min, him bi civaka burjûva ya fennî û him jî bi niçika wê ya çep re, encex pevratiyeke demî çêbi- ke. Nayê hêvîkirin ku herdu di nava hevûdin de bihelin. Ev mijara ku bi awayek teorîk rast, yê di pratîkê de jî pêkwere. Him ezê bi Marksîzm û sosyalîzma reel re bi navber bim, him jî ezê versiyona wê ya li Tirkiyeyê bi heman rengî pêşwazî bikim. Ev tiştekî xwe- zayî ye ku li hember jêgirtiyên (kopya) heşifandî yên Rojhilata Na- vîn, helwesteke bi vî rengî nîşan bidim. Ez ne di nav dewlet, ne jî di nav veavabûnên şoreşgerî û çepê wan de, diheliyam. Meşa min a di rêya min re jênerev bû. Çiqas ku ez bi tenê bim jî, bilindaya rê- ya ku hatî xêzkirin û kûrahiya vateya wê diyar e. Di civakên Roj- hilata Navîn de, yekem car hemû sazûmanên kedxwar ên kevin û nû têxime hemberî xwe û jêhatî dibûm ku heta bi sînorê dawî yê wekhevî û azadiyê herim. Lêgerîna min a sazûmanê, li qasî ku şa- ristaniya Rojhilata Navîn derbasbike kûr e. Li qasî ku sazûmana Rojava weke xwe nepejirîne, bi nasnameya xwe ve girêdayî ye. Di encamê de ev rewş, tevaya sazûmana cîhanê ya împeryalîst li hem- berî xwe dibîne. Ev mîsoger e ku li xaka Rojhilata Navîn, bi lêge- rîneke ku ji dogmatîzmê rizgar bûme dinêrim. Her çiqas ku bclirc-

yên dahênanî tine bin jî, rizgarbûna ji hemû şêweyên kevin û nû yên dogmatîzmê, raman û hestên guherî dide.

e- Min hêz û zewqa vî raman û hestê azadbûyî naskir. Belkî bi vegotinên dirêj ê bi şêweya romanan bergehên xwe û nîgaşên (xe- yal) jiyana xwe bikaribim dahûrînim. Encex girêka kor vebûye, berçavka hesp reş û spî hatiye avêtin. Dogmatîzma ku 5000 salan bi hêza xwedayî hatiye parastin, bi hemû pîroziya xwe bi awayek ku encex bibe malê muzeyê, hatiye daxistin. Nêzîkayî li zanyar û şoreşgerên rast ên Rojhilata Navîn herî kevin, hatiye kirin. Di nava dewlemendiyeke derasayî de, him bi herka hestên mîna şapê û him jî bi ramana ku mîna belediyan vedide, nezîkayî li dîrokê dibe. We- latê bêweç çûye, hemû aliyen wî gihanê pîrozweriya kevin û ji he- mû rengan xemiliye. Li her serê anîşk û kolanekê, weke ku bibêje 'were min jî fêhm bike û jev veke', bangewazî dike. Hemûyên di tirban de weke ku di roja mehşerê de zindî bûbin, nêzîktir bûne û geşedarî qezenc kirine. Eslê wê dema ku perdeya dogmatîzmê ya reş qetiya, hemû tişt bi rengên heyîn, bi deng, bi dewlemendiya va- te û di nava xweşikayiya xwe de, weke ku bangewaziyê dikin dixu- yênin. Dema ku em qetandina perdeyê bilêv dikin, belkî jî tişta di- vên bibêjin hemû li ber çavan e. Welatê ku xwedayan û zordestan qedexe kirî û mirovê ku ji hizr û ramanê wî dûrkirin, êdî bûne yên xwe. Edî bi cîhana pîrozweriyan a ku 5000 sal berê jê hatî qutkirin û bi mirovên dost re dibe yek. Rastiya ku weke hilweşîna rêzeyên (paradîgma) çîna serdest te gotin, yê ev be. Humanîzma nû û rone- sans wiha destpêdike. Ez fêhm dikim. Takekesên Ewropî jî dema ku şaristaniya xwe pêşvedibin, wiha destpêkiribûn. Lêbelê ev ne teqlîdkirineke, meşa li ser xaka Rojhilata Navîn e. Nabe dubareyi- ya Ewropa. Ew weke zaroka do ye. Ronesansa Rojhilata Navîn ê li ser bingeha koka wê pêkwere. Ewropa encex bibe beşek ji destana azadiyê ya vê pirtûkê.

Cîhana rexneyî wiha vedibe û pêşvediçe. Çiqil û çipil jê hêşîn di- bin. Ya girîng ev e ku, liberabûnên jiyana min veguherîne çekeke rexneyan a rast. Weke ez gihîştibim sazûmaneke hest û raman û utopya wê ku, li bingeheke zanistî rûniştibe, dogmatîzm parçe kiri- be, utopyayên vala hilweşandibin, bêhtir mirovhez be, bi pêşerojê ve bêhtir

giredayî be û berbiçavî bêhtir di nava dewlemendiya xwe de girtibe.

**f-** Ez xwe weke ku ji dogmatîzmê bitemamî rizgarbûyî, bema- dim. Mixabin ev rastiyeke ku demên dirêj, min di bin bandora dog- mayan de hereket kiriye. Herçiqas ku rast û pêdivî be jî, ez jî ketim wê şaşiyê ku min dogma danîn ber mirovan. Ev mîsoger e ku, hev- qasî girêdana bi meşandina mirovan a li gor rêzikan, kevneşopiye- ke ku ji sazûmana rahîbên Sumer maye. Dema were gotin ku ‘Ev zagon e, ev rêzik e, ev pergal e’, hûnê timî sazûmana benîkirinê bî- nin bîra xwe. Rêzik pêdivî ne, lêbelê pêwîst e ti caran destûr neyê dayin ku bi neberbiçaviyeke ku serdestiyê li mirov bike be. Belkî rêzik mezin dikin, rê li ber damezrandina dewlet û şaristaniyên herî mezin jî vedikin. Lêbelê ya di dawî de pêktê, kolebûna mirov a ni- jada me ye. Ti pêşveçûn nabin sedema parastina koletiye. Sazûma- neke ku cîhana mirovan a ku jixwe zore hêsan bike, encex nirx pê were dayin. Sazûmaneke ku li ser navê pêjerojê, li ser navê xwedê, li ser navê dewlet, netewe an jî mezinahiyekê, destûrê bide qurban- kirina mirovan, em li ser navê mirovatiyê vê sazûmanê napejirînin. Di van rojan de gotinên ku dibêjin, Zagon û dewlet jibo mirov in, ‘divê wilo be’, ji tevgerên xayîntî û wêdetir ti vateyên din nade.

Bi ketina min a nava vê kevneşopiya binalet, digel ku min ya herî baş jibo rêhevaltiyê xwestiye jî, nehesabkirina min a hêza vê kevneşopiyê yê weke xwerexnekirineke rast bimîne. Ma yê ku wi- ha dihizirî ne ez bûm, min rastiyên gelemper heta bi dawî dan, min perwerde kirin, ya şûn de êdî peywira wan e, nayê ramandin ku li qadên peywirê bisemekevin! Min ewlekarî bi hêza rêzikan anîbû. Ez ji tegihîştina mirovan a di nava rasteqîniya berbiçaviya wan de, dûr bûm. Heger di navê rêzika yê hember de bûna, ku firîşte be jî çi pê were kirin maf e. Ev jî baweriyeke ku ji kevneşopiya serdes- tan a bi nalet maye. Dogma bi xwe ye. Dema ku bi sedan kom bi kom rêheval dimeşiyan, ez weke yekî ku bawerî bi xwedê anî bûm. Ewan ê pêdiviyên fennanên bilind di her mercî de bicîh bianiyana. Dogmatîzm ev bû. Ez heta bi qirikê di nav de bûm.

Di serdema me de, yê xapandineke mezin be ku em bibêjin za- nistî ji dogmatîzmê rizgar bûye. Berevajî vê, dogmatîzma ku zan- yar li ser

navê zanistê dijîn, Ji dogmatîzma rahîban ku mîtolojiyê dihilberînin xetertir e. Çawa be, bombeyên atomê yên rahîban tine bûn. Ji aliyê din ve, ew bi encamên karê ku dikirin re pir têkildar bûn. Zanyar û profesorên ku rahîbên hemdem in, xîreteke wiha nî- şan nadin, dema em hevber bikin ku ji perestgehên zanistî, di serî de zanîngeh û ji dibistanan wêdetir bi tiştekî din re têkildar nabin, yê were dîtin ku ji rahîbên ku mîtolojî û pêxemberên ku ol deran- dine holê gelekî dûr û neberpirsiyar in. Pêwîst e rastiyeke din were dîtin ku, di serî de dewlet û di hemû saziyên din ên berpirsiyar de, nûnerên dogmatîzmê yen ku sift bûne, her yek weke dîlekî dilive an jî dîl kirine. Di serdema me de dogmatîzma herî xetemak a ku xwe bi zanistîbûnê dixapîne ye. Encam Hîroşhna ne, Halepçe ne. Dog- matîzm bi gelemperî berhemeke rasteqîniya civakî ye û bi taybetî jî berhemeke çêbûna çînçînîbûnê ye. Çek a herî bihêz a perwerdeyê ye. Nayê hizirandin ku bihêsanî dev jê were berdan. Tenê çeka ku li dij were bikaranîn, tişta ku dirame û ya ku dike bi takekes re he- ta ji dest were sift bikin. Heger em fonnule bikin, di vateya afirîne- riyê û bi erçên ku hemû encamên wê werin hesabkirin, ‘liqasî tu bi- ramê bike, liqasî tu bike birame’ ye. Li hember vê nexweşiya ge- lemper, ji hereketkirineke bi berpirsiyariya pêşveçûyî pêde, tiştekî ku bête kirin xuya nake.

**g-** Êdî pewîst e ez van pirsan li pey hev ji xwe bikim: Dema ku kendalên di navbera şêweya te ya pratîk û rastiyan de mezin bû, ge- lo guhertina senger û daketina qadên pratîk ne pêwîst bû? Ev yek ê ne rastir bûna? Bersivên gelemper ku ezê bidim, min hewl da ku di beşên têkildar de vekim. Heger ez her yekê bi hevokekê dubare bi- kim, li hember gund û malbatê serhildan pêdivî bû. Ezê vê çalaki- ya esîlker timî bi rêzdarî pêşwazî bikim. Ezê pêşikiyê bidime zaro- kên ku serî li dogmayên hezar salan hildane û nîgaşên wan. Dû re weke ku ez hewl didim bikim, ezê dewam bikim ku bersivan bibî- nim. Li hember civaka burjûva û saziyên komarê bi têgihîna lêge- rînên min ên lihevkirinê ku bi gelemper rast in û ez didomînim jî,

pêşvebirina altematîfên wê û aliyên ku pêwîst e werin rastkirin, ji dêvla çalakiyeke tundraw a hilweşandinê, bi hêza sazûmana paras- tina rewa ya pir zexm li hember rabim, lihevkirinê kûr bikim û ve- guherînim, yê bibe rê û rêbazeke rastir. Têgihîna min a mirovatiyê, li derî tegihîna parastina rewa û amûrên wê yên mecbûrî, destûrê nade ti amûrên şidet û dewletê. Li hember mirovan û civakê, ez xwe di amûra dewletê (weke awayek klasîk amûra rêvebiriya çînî) nagerînim. Di têgihîn û pratîka xwe de ez cîh nadim dewleta klasîk û şêweya rêvebiriya wê ya civakî. Bi hêzeke hember hilweşandina vê û damezrandina yeke nû ya li şûnê, xapandineke. Li hember vê, bi koordînasyona civakê ya gelemper û birêkûpêkirina wê ya tek- nîk ve girêdayî, bi komên şarwer ku qet çek û hêza fizîkî bikama- yînin re, ezê rêvebirinê bingeh bigirim. Ez nakevim jirêderketina sosyalîzma reel. Lêbelê li hember cîhanê tevî, ezê ji mirovekî dest- pêbikim û heta bi tevaya mirovatiyê û hemû gelan, dema pêdivî be û pêwîst be heta ku ez encamê bigirim, ezê parastina rewa ya pîroz bidomînim. Di vî babetî de ezê bi peyva “mirovek cîhanê têk dibe” ve girêdayî bimînim.

**h-** Netêrayiyên navenda PKK û ya asta kadroya pêş derketibû holê. Weke bersivekê, gelo gihandina bi hezaran ciwan ê besbû- na? Min hijmareke hindik ji wan bigirtana û bisiftî perwerde bi- kira yê ne çêtirbûna? Ev pirsên girîng in û bi pirsên berê ve girê- dayî ne. Bersiva ez bidim, ji aliyekî ve yekser daketina qada pra- tîk e, berpirsiyariya leşkerî û siyasî di pratîkê de jî bigirime ser xwe, an jî bi beşeke piçûk re bêhtir siftbûn bû. Eslê wê di van her- du vateyan de jî, ji yên ku pêdivî hebû re xebatên nêzîk hatin ki- rin. Bi pêwana teknîka heyî, bi nivîsê, di qasetan de bi peyvkî, bi bêtêl û têlefonan, bi siftbûnên mezin û roleke nêzîkî fennandari- ya qadê ya pratîk hate pêkanîn. Lêbelê damezrak ne hestyar û ne bitêrayî bû. Yên ku narkoza dogmatîk a 5000 salanxwarin, ne di- bûn bersiva qêrînên min. Xwe bi guregur dişewitandin, lê ne bi têrayî bûn. Jiboku bi têrayî bin, min qada leşkerî, siyasî û pratîk bi dev wan ve berdabû. Dibe ku ev yek çewtî ba? Perwerdeyeke wiha ku distînin a mînakên wê di dîrokê de tine bin, teqez ê hine- ke bi têrayî ji wan derkevin! Baweriyeke vê yekê bi min re pir zê- de bû. Lêbelê bûyeran nîşan da ku ne ez, têgihîna çeteger bihêz e. Li hember navend

û kadroyên ku di dema xwe de, peywirên xwe yên siyasî, leşkerî û fennande bi tekûzî nanîne cîh, têgihîna çete- ger bersiva herî stemkar dide, keda me ya li qasî çiyan li hember me birine xiyaneteke ku serfiraziyekê qezenc bikin. Eslê wê di vê vateyê de, herî bêhtir rexne û xwerexnekirin, nûbûn û veguherîn li navenda PKK û kadroyan dikeve. Tenê ez dikarim êşa mezin a ku layîqî keda min nebûna bikişînim. Ji aliyê din ve ez encamên dersên ku jê derdixim datînim holê û nîşan didim.

**i-** Pêwîst e nîşan bidim ku, ez cîh didim şêweya jiyanê, a we- ke hezkirin û rêzdariyê û hêmana mirûz û bedewkarî (estetîk). Girêdana min a bi hêmana "Jiyan an ê azad bibe, yan jî qet na- be" re, ji bûyinê heta bi mirinê yan jî heta bê dawiyê ye. Hezki- rin û rêzdarî bi sincê azad gengaz e. Bi rûniştandina jinê ya li na- venda vê, min rast kiriye. Min qet guman nekiriye, jina azad ku bi çalakiya azadiyê çêbibe û jiyana ku li dora wê pêşve biçe, yê herî xweşik û bi dostanî be. Ez neketim kompleksê. Li dewsa ol û civaka ku bi serdestiya mêr, min vateya mezin da olê bi girani- ya xwedawenda ku bi hindikayî wekheviya jinê li ber çavan big- re. Jiboku ev yek pêkwere, min karkeriya mezin a azadiya jinê û evîna wê da meşandin. Min li ti jinan herwiha li ti mirovan bi ça- vê milk nenêriya û nedanêrîn. Min di vê rêya xwe de jî, ji rasati- yê û nirxê bedewkariyê ti tawîz nedan. Meşa min a heta bêdawi- yê encameke xwezayî ya çêbûna rewişta min e.

Ji dêvla dahûrandina zêde ya bûyera rexne û xwerexnekirinê, di mijarên têkildar de, vedana wan a li çareseriyên pratîk girîng- tir e. Divê bête zanîn ku her dem min pûte bi vê yekê daye. Bi- taybetî bi pêvajoya Îmralî re, min bi kûrayî venêran li xwe kir. Min hewldanên xwe yên ku bigihîjim hişmendiya derûn, hestên azad û jibo hevparkirina van, berdewam kirin. Pêşveçûnên heyîn didin çespandin ku girêdayî destnîşankirina di derbarê peyva me ya pratîk de mane.

## PEYVA DAWÎ -I

Ev parêznameya ku min li hember şaristaniya Ewropa û li ser doza min a di dadgeha wê ya mezin DMME de tê dîtin pêşxistî, Bi teşeyekî cuda ye û pir reng e. Esasê wê ya ku qedera min girêdayî, şaristaniya Ewropa ye. Yê ku vê yekê nebîne, divê ku ehmeq be. Rola ku dewletên Ewropa ji Tirkiyeyê re amade kirine, tajîgerêni- ya di gotina 'kîvroşkê bireve, tajiyê bigire' de ye. Diyar e ku van ji mêj de Kurd kirine rewşa kîvroşkê. Angaşta bingeh a parêznameya min, di derbarê Ewropa ku di mijara kurdan de di nava bêmafî û di- rûtiyan de ye. Ev nêzîkayiya min ne dilînî (hestî) ye. Jibo ez biçes- pînim ku ne wiha ye, min pêdivî dît ku ez ji terîfkirina civaka mi- rov a zanistî heta bi dahûrandina dîroka şaristaniyê bikevime karekî herî zor. Herçiqas ku zanîna min a dîrokê rê li ber kêmayî çewtiyan veke jî, ez bawer dikim ku dahûrandina min kirî rast e. Yê were dî- tin ku di parêznameya min de, hinek nirxandinên wêrekî hene. Jibo ku parêzname di vateya dîrokê de rolekê îfade bike, ji bilî ku hesêb bi qada şaristaniya xwe re bibîne û bide, ti çareseriyê wê yên din ti- ne ne. Yê ku li hember Ewropa ketiye rewşeke rezîl ne ez im, şaris- taniya Rojhilata Navîn e. Ji vî alî ve min hewl da, ji rasteqîniya Rojhilata Navîn a dîrokî û rojaneyî ku mîna qambostên kenewer (komîk) dijîn û weke di tirbê de bin, bi dahûrandineke berfireh der- ketinekê bidim pekanîn.

Timî ez ji rêyekê bawer dikim: Weke di vê gotina gel de ku di- bejin, 'Kesên ku xwe venekiribin, ne xwedî maf in ku hêviya tiş- tekî ji kesekî din bikin.' bi alîkariya kesên din kesek nabe zava. Ev rastiyek e ku, yên Rojhilata Navîn û civakên cîhanê yên ji bilî bin- yata Ewropa, tenê ne bi arîkariya kesên din, ya xirabtir pêşî Ewro- pa di nivîna bûkê re derbasdikin, dû re xwe li nav nivînan gêr dikin û li bextewariyê digerin. Aliyên vê ne yên siyasî û ne jî yen sincî hene ku were pejirandin. Bersiva min a vê xeteriyê ya li gor min, meşa min a azadiyê bû. Min bendên

malbatê û yen gund bi hêsanî derbaskirin, min dîwarên civaka burjûva Tirkiyeyê û yên saziyên komarê, yan qulkirin û yan jî derbaskirin. Destên min ên lihevkiri- nê ku dirêjî çepên Tirkiyeyê, pêşverûtî û ronakiya wê bûn, timî li hewa man. Tirkiye bixwe bindest bû, weke çareseriyekê xwe li paş- verûtiya hundirîn dipêça. Neteweperestî çeke herî hîkarîker a çepên wê, rastên wê û navenda wê jî bû. Ne di wê rewşê de bûn ku dev ji vê berdin û vateyek û nirxekî bidine hiqûqê biratiyê. Jiberku digo- tin ê parçe bikin û dabeş bikin, ketibûne nava qeyranekê. Jibo xwe- parastinê, ji bertekiya (refleks) hêrîşê pêde ti behreyen wan ên ku têxine rojevê tine ne.

Heger bitenê bûma jî, ev rastiyeke ku li hember hevqas bêtêgi- hînî û bêmafiyê, ji serhildanê pêde ti çareserî nemabûn. Li cîhane- ke ku dengê ajalan jî nayê kêmkirin, hatina ji rasteqîniya gelekî ku heta bi qedexekirina zimên li çewsandinan rasthatî, pir bi êş bû. En- cex bi hinek vebizavan bersivdayina van, dikarîbû namûs û rûmeta mirovatiyê rizgar bike. Li ser navê kurdan, ji ve bertekiya berxwe- danê wêdetir bersiveke afirîner ku di mercên wan rojan de bihata dayin tine bû. îfadeya vê rasteqîniyê ya berbiçav, derketina PKK bû. Bi awayek lezgînî, bi girêdana dogmayên bîrdoziyî ku weke yên herî pêşverû dihatin dîtin, dema nû ku ketinê de êdî çêbûneke dîrokî bû. Di serdema hemdem de, me hewl dida ku tişta li ser na- vê hemû gelan dihate kirin, em jî wê bikin. Bi awayekî din, hem- demî gengaz nedibû. Mînaka vê ya herî nêzîk jî KT bixwe bû.

Liqasî ku pêngava hatî avêtin bi temamî ji rastiyan nedihat holê, nayê gotin ku bi çewtiyên mezin di nava nexweşiyan de jî bû. Gu- herînên rê li ber wan vekirî nîşan dide ku, di mêzîna dadmendiyê de, rastî bêhtir giraniyê dikişînin. Lêbelê rastî, jibo serkeftin û ça- reseriyê bi serê xwe têrê nake.

Di pêvajoya dîrokê de, dogmayên çîna serdest û kedxwar, jiber-

ku herî bêhtir di qada siyaset û leşkeran de sift dibe, siyaset û leş- ker dikarin rastiyan daqûrtînin û tine bikin. Ji ber vê yekê, dema li ser navê gelan û bindestan bîrdozî werin hilberandin, siyaset û leş- kerî bête kirin, pêwîst e pîvan û reseniya wan bi awayek bijûndar werin pêşvebirin. Bitaybetî li Rojhilata Navîn, bi vê annancê hewl- danên mezin hatin nîşandan. Bi awayek pûtepêdan hate berdewam- kirin ku, careke din viyana gelê Kurd a azad liqasî ku ne şike qayî- şok û payîdar be. Ber bi çiyayên wê û cîhana mirovatiyê, derketi- nên domdar û sift hatin kirin. Jibo qezenckirina dostan û şiyarkiri- na wijdanê mirovatiyê -herçiqas ku ne bi terayî be jî- hewl hatin da- yîn. Herçiqas ku êş û windakirinên mezin çêbûbin jî, li hember afi- randina viyan û hişmendiya Kurd a azad, ev yek weke berdêlekî ku pêwîst bû bihata dayîn tê pejirandin. Di encamê de, hebûna gelê Kurd a azad ku pêdiviye giramgirî jê re were girtin û pêre were li- hevkirin, derketibû holê. Heger ne bi devoka çîna serdest be, bi hin- dikayî be jî di çareseriya pirsgirêka Kurd de, vehebûnê têrayiyek pêşkêş dikir. Em ketibûn pêvajoyeke aştiyê ya nefspiçûk, lêbelê bi- rûmet. Cîhaneke aştî û biratiyê ya bivate, bi gelên cîran re dikarîbû were damezrandin. Rêveberiyên dewletan, êdî divabû jibo aştiyê gavan bavêjin.

Dema ku hatibûn vê xalê, komploya 15 Reşemî bi serê me de te- qiya. Ev komploya ku ji Tirkiyeyê zêdetir, di ser Ewropa, DYA û îsrael re hatî pêkanîn, tenê ne ez têkildar dikirim. Li hember saziya serokatiyeke ku ji aliyê gelê Kurd ve bi zêdeyî hatî pejirandin, ha- tibû pêşvebirin. Komplo di pratîkê de weke ku li hember “terorîs- tekî” be dihate nîşandan. Lêbelê annanc gelê Kurd ên welatparêz, girêdayî û dirist, temamê PKK û dostên wan bûn. Jiholêrakirineke tevayî hatibû plansazkirin. Pêwîst bû ez ne li gor dîlînên xwe û ve- tûrî hereket bikim, herwiha divabû helwestên hestyarî nîşan bidim.

Berjewendiyên Tirkiyeyê yên rast, bê bi çi ve girêdayî ne û terîf- kirina rast a yekîtiyeke biratiyê, di vê pêvajoyê de bi zelalî hate ki- rin. Têgihîn û sepîna parastineke rewa ya rast, him ji alyê gelê Kurd ve û him jî ji aliyê PKK ve hat pejirandin û derbasî jiyanê bû. Ev gav jî bi hindikayî liqasî pêvajoya şer bivate û liqasî ku di cîhê de werin avêtin binirx bûn. Ez bûbûm kesayetiya ku liqasî şer aştî jî lê kilît bûbû. Heger

pir giran were jî, ev yek diyar e ku bi têrayî ber- sivê didime dahûrandin û sepandina pevajoya aştiyê. Êdî ji vê û bi şûn de, bi helwesta KT û dewletên din ên cîran ve girêdayî ye. Di bin van mercan de, pêvajoya min a DMME ku destpêkirî, ne doze- ke wisa bû ku bi lêkolîneke hêsan were derbaskirin. Jibo bigîhine vê vateyê, dahûrandina şaristaniya Ewropa şert bû. Yê dihat dari- zandin û doza wî rojane bûbû ne ez bûm. Di bin berpirsiyariya Ew- ropa de, rasteqîniya gelê Kurd a ku ji mirovatî derketî bû. Heta ku ev rastî bi hemû aliyên dîrokî û rojaneyî ve demekeve holê û neyê terîfkirin, ev şaş e were zenkirin ku doz ê dadiyane derbas bibe. He- ta dikarîbû bibe ber bi encameke toqîn a weke amûrbûna dewama komployê. Jibervê yekê, jênerev dibû ku li ser rasteqîniya Kurd û pirsgirêka wî were siftbûn.

Di vî derbarî de peytandinên dîrokî û civakî ku min çêkirin, herçiqas ku rê li ber nîqaşan vekiribin jî, ez bawer dikim suxreyê ji agahdarbûneke ku hiş veke re dike. Heta bi bawer im ku di gelek mijaran de, tezên ku yên pêşî bin jî pêşvebirine. Bitaybetî dused sa- lên dawî, sedsalên 19 û 20an ku bi giranî di bin berpirsiyariya Ew- ropa de borîn, heger rast nehatibane dahûrandin, diyar e ku îro rast nedihat fêhmkirin. Heger bi xetên sereke be jî, rastiyên dahûrandi- nên vê sedsalê bêhtirin. Bêguman ê tevkariyekê li têgihîneke polî- tîk, leşkerî û pratîkê bike. Ez di vê baweriyê de me ku, di vateya vi- yana gelê Kurd a azad de, dahûrandina PKK a bi xetên gelemper jî, rast û hînker e. Di DMME de, di derbarê PKK de yekser û neyek- ser bi hezaran doz tên dîtin. Doza min jî yek ji van e. Jibo biryar û encamên rast, liqasî rasteqîniya gel ev yek diyar e ku pêwîst e ras- teqîniya PKK jî bi awayek berbiçav were nirxandin. Neberbiçavki- rina doza min a ji rasteqîniya PKK û gelê Kurd nedihat pejirandin. Ev yê bi awayek neyekser bi hata vateya amûrbûna komployê. Ji- bo ez rê li ber vê yekê venekim, ji mecbûrî bi piralî li ser nirxandi- nên PKK rawestiyam.

DMME berî ku di dermafê min de lêkolînê bike û biryarê pêş- bêxe, hewceyiya wê heye ku, ji aliyê demokrasî û hiqûqê Ewro- pa ve di derbarê rasteqîniya PKK û gelê Kurd de, lekolîneke za- nistî bike û biryarê bide. Ji aliyê din ve dozên takekesî yen ji hev qut ku ez wan bi neterayiyeke cidî dinirxînim, herwiha yê li pî- vanên hiqûqê demokratîk

ên rasteqînî werin rûniştandin. Dema ku min şaristaniya Ewropa nirxand, him jibo dahûrandina Rojhi- lata Navîn û roja me û him jî jibo têgihîna xwe ya sosyalîzmê de- rêxim ronahiyê, min girîngî dayê. Ewropa li kûdera dîroka şaris- taniyê ye? Bi çi deyndarê civakên Rojhilata Navîn û dîroka şaris- taniya wê ye? Guherînên gerdûnî ku wêna rê li ber vekiriye çi ne? Min hewl da ku bi vateyeke gelemper û di asta terîfkirinê de, hinek bersivan bidime van pirsan. Heta ku mirûz û bingeha fel- sefeya damezraka Ewropa nehatiba fêmkirin, bersiveke rast bi mêtingehkariya wê ya împeryalîst a di rabirdûyê de ku bi rewşe- ke sazûmanê ferzdikir, nedihate dayîn. Heta bi jevketina sazûma- na bi şêweya Marksîzmê ku rê li ber sosyalîzma reel vekirî, ge- lek şaşbûn û çewtiyên wê jî derketibûn holê. Pêwîst e nêzîkayi- yên li şaristaniya Ewropa, ya ku di roja me de weke serdema hi- qûqê demokratîk tê bi têgînkirin, çawa bûna? Dîsa nêzîkayiya Marksîst a dogmatîk ê bi têrayî bûna? Weke versiyoneke antîem- peryalîzmê, antîkadîperestiyê yê jibo rizgariya gel çi baniyana? Hewl hat dayin ku li gelek pirsgirêkên bi vî rengî, were hûmêrîn. Herçiqas ku bi mijarê re têkiliyeke wê ya yekser nebe jî, jibo em rastiyan bitemamî fêhm bikin, ji têgihîştina têgînan pêde ti çare- seriyen me yên din tine ne.

Şaristaniya demokratîk a hemdem ku di pêşvebirina şaristani- ya Ewropa de, tevkariyên wê yên girîng çêbûne, weke merhaleye- ke pêşveçûnê ya çareserker, bi erênî dinirxînim. Ez vê bitemamî di çarçova sazûmana kaîtalîst de nanirxînim. Weke mîrateya dîro- ka mirovatiyê ya hevpar, ez nirxên mezin pê didim. Ez bawer di- kim ku ji ber vê yekê, şaristaniya demokratîk gelek derfetên gi- rîng ên ku bersivê bidin tekoşîna kedkaran a bi hezar salan, vedi- hewîne. Bi taybetî pêwîst e çawaniya pêşveçûna sê nifşên mafê mirovan ên bingehîn ku çareserker, hêsan neyê girtin. Ez bawer dikim bi van mafan ve girêdayî yê bi erênî nezîkayî li pirsgirêkên berbiçav ên li her welatî tên jiyandin bikin. Dîsa ‘civaka şarwer’ a ku pêwîst e weke qada sêyemîn were ramandin, têgîneke ku ne- yê sersarîkirin e. Ne civaka dewleta fennî, ne jî civaka klasîk a fe- odal û burjûva, nimûnakên van herdu civakan ne çavkaniyên ça- reseriya pirsgirêkan e, dane çespandin ku çavkaniyen pirsgirekan çêbikin e. Herwiha bi şertê ku mafê parastina rewa veşartî bihê- lin,

rexistinên civaka şarwer ên aştîxwaz di çareserkirina pirsgirê- kênrojane de, di çawaniya amûrê jiyanî de ne. Hinek nêzîkayiyên çep û yên klasîk ku van amûran weke ‘amûrên împeryalîzmê yên nû’ di bin tawanbariyê de dihêlin, ez weke bêpirsiyariyan û hati- na lîstika hnperyalîzmê fêlnn dikim.

Digel vê yekê min li tegîna parastina rewa ji aliyekî berfireh ve nêriya. Piştî rewşa ‘ne şer ne aştî’ ya ku lê tê ferzkirin, weke pir aloz û rizîner diyar bikim, heger hêz, dewlet û hikûmatên berpirsi- yar gavên pêdivî navêjin, peywira ku bikeve ser milê gelê Kurd ev e ku, bikeve rewşa parastina rewa ya bi awayek berfireh, gelekî baş hatibe amadekirinji her alîve bersive bide her şêweya hêrîşan û he- bûna xwe biparêze. Jibo jiyaneke birûmet, ev weke vebijarkeke bi tenê li ber gelê Kurd e. Jibo dîsa fersendê nedine trajêdiyên hem- dem, pewîst e hemû alî vê yekê xweş felnnbikin û pêdiviyên ber- pirsiyariya xwe bi cîh bînin. Min ev baş bilêvkir ku, di bûutên Roj- hilata Navîn de bersiva ku pêwîst e bi şaristaniya Ewropa bête da- yîn, di pêşvebirina sazûmanên xwe yên demokratîk re derbasdibe. Ronesans û demokratîkbûna nû ya Rojhilata Navîn a bi bingeha şa- ristaniye ve girêdayî, jibo pirsgirêkên bi bûut ên dêwasa, weke rê- yên çareseriyê yên bitenê ne. Neteweperstiya sedsala dawî ya kêm- ber û berhema wê, trajediya îsrael û Filistîn, êdî ferzdike ku ji vê nexweşînê biqerin û li nirxê demokratîk vegerin û pêşikiyê bidine vê yekê. Êdî gelemşe ji siyasîbûnê derketine, gihane bûutên qeyra- na sincî. Min bawrî û hêviyên xwe danîn holê ku, Rojhilata Navîn bi heyîna xwe ya dîrokî û çandî ve girêdayî, vebijarkeke demokra- tîk pêşvebibe, yê antîtezan li tezên ku Ewropa bi awayek yekalî li cîhanê belavkirine ferz bike û yê tevkariyê li senteza mirovatiyê û utopya wê ya bivate bike.

Ev têgihîneke gelemper e ku şaristaniya Ewropa merhaleya dawî dijî. Xwestiye ku vê hilweşîna şaristaniyê bi faşizmê rawes- tîne, dema ku di vê de bisemeketiye, ji derbasbûyîna şaristaniya demokratîk a ku ji veguherîna aştîxwaz re vekirî pêde, ti şensên wê nemane. Herçiqas ya jihevketî sosyalîzma reel be jî, ev rasti- yek e ku kapîtalîzma Ewropa jî liqasî ku ji kapîtalîzmê derkeve, bi veguherînan re rûbirû maye. Hatina dawiya evîna Trîstan û îsolde. Meşa Parzîval a wêrek, afirîner û li daristanen ku kesek neketî nav, ji ber ixtiyarî û westandinê bi heman aqûbetê re rûbi- rû ye. Bêguman evîna dawî ya di rêya îştar a xwedawenda evînê de ye û diyar e ku pêdivî ye dorhelê ji evînên nû re bihele. Ev jî nayê nîqaşkirin ku meşa Parzival jî nûnera dawî ya lehengê Gil- gamêş e. Lêbelê ev jî mîsoger e ku, li welatê Gilgamêş, hewceyî bi meşvanên layîqî wî heye.

Pirsgirêka Kurd, hatiye rewşa kilîta ezmûna şaristaniya hemdem a Tirkiyeyê. Yan ê çareser bike û derbasî şaristaniya hemdem bibe, yan jî yê ji vê evînê biqere. Dûrketina ji perspektîfa hemdemî ya damezrînerê xwe M. Kemal, bihêsanî nayîne ber çavan. Heger zor be jî, çûyîna pirsgirêka Kurd a ber bi çareseriyê, di wergiriya têki- liyên Tirkiye û YE de, dibêtiyeke xurt e. Bêyî ku zora zêde li Ew- ropa bikin, çareseriyeke nava Tirkiyeyê ku neyê paşdeavêtin, him ji aliyê jiholêrakirina mercên ku rê li ber qeyranê vedikin, him jî ji aliyê ku dîrok bikeve pêvajoya bilindbûnê, weke şensekî dikare were nirxandin. Ji aliyê dewlet û welatên herî bihêz û pêşveçûyî ve tê rastandin ku, yekerbûna welatan a xurt û yekîtiya dewletan a zexm, di vê rêyê re derbasdibe.

KE weke hêza ku biryarên DMME disepîne, li gor PMME ya belgeya bingeh a hiqûq di derbarê doza min de, pêdivî dike ku bi destek û nêzîkayiyên pêşveçûna Tirkiyeyê di bereke hiqûqê demok- ratîk de, bêhtir bi berpirsiyarî û encamgirtin pêkbîne. Bêyî ku hêza zêde bide windakirin û wan bêxe rewşa zor, li herêmeke di dîrokê de herî girîng pirsgirêkeke ku veguheriye tîrawî, ber bi çareseriyê bibe, yê tenê bi hemû aliyan bide qezenckirin. Weke ku tiştekî bi kesî nede windakirin, gengaz dike ku mirovatiya xwe ya ji mêj de windakirin û ji bîra kirin, careke din qezenc bikin. Gelo ji vê qezen- cê binirxtir û pêdivîtir tiştekî din ê hebe?

Min di parêznameya xwe de herî dawî nasnameya takekesî û çîroka xwe bi dahûrandin anî zimên.Ev yek ji ber rexneyên erênî û neyînî yên di derbarê parêznameya min de ku dihatin, weke ber- sivekê ne. Di derbarê min de gelek pirtûk û nivîs hatin nivîsandin. Hê jî ez dibime mijara nîqaşên sift. Dema ez li derve ku min bi- zorê mafê bersivê radigihand, li hundir qet ne gengaz e ku ez ka- ribim bersivê bidim. Herwiha pêşkêşkirina birhaneke ku jibo ber- siva tevayî bibe zemîn, yê pir sûdewar be. Ez bi afirînerî nezîk bûm. Eslê wê di vê neynikê de, herkes ê bibîne bê li kûderê ye. Annanceke min a din jî ev bû ku, ez neynikeke dêwan bidim ber rûyê wanên di nêrîna çavwir (hewl) de bi israr û ez bibêjim: “Tu di vê neynikê de wihayî”. Ji aliyê din ve jibo yên ku bixwazin bi- bin dost û rêheval, min xwest ez bi hemû jidilbûna xwe nîşan bi- dim bê bi kesekî çawa re rûbirû ne. Dîsa jibo wan kesên ku di dij- minatiyeke bêwate de israr dikin, min xwest bi merdîtî nîşan bi- dim bê ez kîme, ez çi dikim, ezê bikaribim çi bikim û ezê bikari- bim rê li ber çi vekim. Ez guman dikim, hisdike bila kes bin û his- dike bila di asta rexistinan de bin, hemû kes ên bi diristî nezîkî rasteqîniya min bibin û yê bigihin encamên bixêr.

Bêguman pareznameya min hewl dide ku gelek mijaran, bi şê- wazên cihêreng bixebitîne û nîşan bide. Li wê derê bê mirovatiyek, gelek û rêxistinek çiye û dixwaze bibe çi, bi hemû vekirîbûn û ber- pirsiyariya xwe datîne holê. Vateyê dide gelek alî û têkildaran û ro- lê li wan bardike. Ez ji vê nêzîkayiyê nedireviyam. Min xwest ez peyva dawî, ya bi hezaran şehîdên di dîrokê de ku nikaribin bibêjin çima nefesa xwe ya dawî dan, ez bibêjim. Min xwest ez qêrîn û ras- teqîniya gelekî ku bêziman hatibe hiştin, bê ji kûderê û çawa tê lê- dan û ne diyar e bê ji kûderê mehkûmî beçareseriyê hatiye kirin, ge- lê di dîrokê de herî kevin lê herî bêhtir li xiyanetê rasthatî, nîşan bi- dana. Min hewl da ez PKK ya ku bi hezaran şehîdên wê hene, ji der û hundir li xiyanetên mezin rasthatiye, rêxistineke çawa ye û divê çawa be, bi berpirsiyariyeke mezin terîf bikim û biparêzim.

Bi temamî hay ji komploya ku li min kirin heme. Ev parêzname- ya min ne jibo min tenê, bersiveke li wan kesên ku hewldidin bi komployan li hember mirovan serdest bibin û rojên xwe bikin roj jî ye. Ez tolhildanê

layîqî xwe nabînim. Heger ji hezarî yek dibetiya ku bibe derûn hebe, ev rewişta mirovatiya me ya jeneqetîne ku em dijmin jî bikin dost. Lêbelê heger ku ez fersend û pêdiviyê bibînim, min dixwest bê ji komplokeran çawa tol tê standin, çalakiyên le- hengî û şervanî yên ku aqlê wan bîne serê wan, nîşan bidim.

MIROVATÎ Û AZADÎ YÊ QEZENC BIKE, HEMÛ DEREWÎN Û ZORDESTÊN KOMPLOKER ÊN WINDABIKIN!

## PEYVA DAWÎ -II-

Pêwîst bû ku ez parêznameya xwe, bi dahûrandina şaristaniyê ve girêbidim. Veguherîna ku civak di bingeha şêwegirtinên bilintir de dijî, derûna dahûrandinê tîne meydanê. Diyarkirina derûna diyalek- tîk a ku pêşveçûn pêve girêdayî, terîfa hebûna civakî ya mijara xe- berdanê dide. Bi nêrîna ku di bingeha şaristaniyê de çînçînîbûn û dewletbûn heyî ve, girêdayî dimînin. Dîrok bixwe bûyerên heta bi rojên îroyîn, weke xelekên zincîrekê, bi tevahiyeke lebatî (organîk) dijî. Têgihîneke dîrokê ya dînamîk û lebatî, weke pêvajoya diyalek- tîkê ya bi çînçînîbûnê ve girêdayî tê nirxandin. Weke encama xwe- zayî ya vê têgihînê, bi awayek teorîk tê derpêşkirin ku dûrayî û de- rûna di navbera rastiyên li do mayîn û rastiyên ku yên di pêşerojê de çêbibin de, hewqasî ji hev ne cûda ne.

Di xêzka min a dîrokî de du mijar girîng û di rola kilîtê de ne. Ya yekem çinçînîbûna bi berhema zêdek ve girêdayî û sîstema polîtîk bi çanda rahîbên Sumer a perestgehê ve girêdayî ye. Esa- sê wê şaristanî, vebûn û belavbûna vê çanda perstgehê ye. Di navbera mîtolojiya ku perstgeh pêve girêdayî û berhema zêdek de têkiliyeke hişk heye. Bi gotineke din hilberîna rahîban a mî- tolojiyê û hilberîna berhema zêdek, pêşveçûna ku herî dexmeya xwe li dîrokê daye. Hemû dîrokzan hemraman in ku di vê rêyê de, rahîbên Sumer orîjînala pêşî çêkirine.Ji ber vê yekê dahûran- dina çanda perestgeha Sumer, ji dahûrandina Kapîtala Marks jî pêşikîtir e. Dahûrandina Kapîtalê bi serê xwe, kêmasiyên mezin û nerêbaziyan vedihewîne. Nirxê zêdek kategoriyeke berhema zêdek ku vê dawiyê derketiye holê ye. Cudabûna çînên burjûva-

proleter ên ku li dora wê hatin pêşveçûn jî, di nava tevaya dîro- kê de di derawayeke bisînor de ye. Bi serê xwe ji terîfkirina ra- man, dewlet, sinc û huner dûr e. Têkoşîna çîn jî encex di nava mantiqê sazûmana serdest û kedxwar de li ber çav digire û di en- camê de, weke ku di sosyalîzma reel de tê dîtin, ji rêvekirina li ber sîstema nirxê zêdek, wêdetir naçe. Rêya ber bi sazûmana ci- vakî ku weke utopya komunîst tê binavkirin û nîgaşkirin, carekê jî venabe. Armanc bixwe, mezinaya hewldanan û lehengiya wî têrê nake. Di derketina ji vê astengiyê de, dahûrandin û derbas- kirina çanda perstgeha Sumer, dikare tevkariyekê pêşkêş bike. Bi hindikayî yê derfetê bide ku hemû pêşveçûna şaristanî rast were şîrovekirin û veguherîna civakî ya tevayî were terîfkirin.

Di vê rêyê de dahûrandina min a şaristaniyê ku gelekî bê ama- dekarî û bi şêweyeke ji mercên tenduristî bêpar hatine kirin, pê- wîst e weke gaveke ezmûnê ku davêjim were dîtin. Ev dikare weke pêşnûmayekê jî were dîtin. Lêbelê ez bawer dikim, têgîna ku tê pêşxistin û rêbaza ku pêve girêdayî dimînin, nirxên wan ên di girtina rastiyê de, zanistiyê herwiha raseriyên girîng digire na- va xwe. Dema di vê çarçovê de li dîrokê bête nêrîn, yê were dî- tin ku her tiştê diqewime, li dora perestgehê bi berhema zêdek û hilberîna mîtolojîk birêxistin dibin û di nava demê de bi kûrahî û berfirehî belav dibe pêkhatiye. Mînak, dema em şixulandina zayendî ya qada herî hindik tekilî pê re were dayîn ku weke pir tewş tê dîtin, binirxînin, yê rastiya vê nêzîkayiya dîrokî hê bêh- tir were dîtin. Saziya Holywood û Playboy a DYA, di çanda ra- hîbên Sumer a perstgehê de, ji şêweya beşa wê ya bin a rahîbên jin û mêr ku bêesil bûyî wêdetir, ti vateyên din îfade nake. Kar- xane, qesr û koşk, saziyên dewletê, hiqûq, bawennendî, mizgeft, dêr, kenîşte, hemû baskên huner û pîşeyî, di malzaroka dayîka çanda perestgehê de veşartîne. Dema ku çax û mercên wan ama- de bin, yê ji nû ve bizên û cîhê xwe bidine yên ji wan pêşdetir. Herwiha yê were dîtin ku roja me di dîrokê de û dîrok di roja me de veşartiye. Ev jî divê weke rastiyekê were dîtin ku, ne rast e ku em xwe raserî dîrokê an jî li derî dîrokê bibînin, dîrok ne te- nê li muzeyan û xirbiha ye, xwe di roja me de dide domandin û hewqasî jî rast e.

Li vira rasteqîniyeke ku derdikeve hemberî me, her dema dîrokê ya

bivate, her rêxistin, her raman û bawerî, taybetiyekê bingeh di- gire ku xwe orîjînal nîşan bide. Veqetîna di navbera rojaneyî û dî- rokê de, ji hêza propagandeya serdestiya fennî ya vê taybetiyê tê. Evan jiberku serdest bibin, mecbûrin ku xwe weke nû û herî pêşî nîşan bidin. Lêbelê pêwîst e li vira du mijar ji hev werin raqetand- in: Ev pir girîng e ku bi veguherîna rastî nûjeniya hatî pêkanîn û te- nê ya ku bi hêza propagandayê ve girêdayî, ya ku derew û demago- jiyê vedihewîne û restiya ku bêesil bûyî û bi mekyaj, ji hev bêtin veqetandin. Dema ku em di dîroka şaristaniyê de fersendê nedin xapînokiya çêbûnên ku demagojî û propagandayê mekyaj kirin, ya li paş bimîne, yê rasteqîniya dîroka zelaltir, rast û rojaneyiya wê di- yar bike.Ez bawer dikim ku min di dahûrandina xwe de, şaristanî li ser ve xetê rast daniye holê. Herwiha komploya sedsala 20an a herî dawî û berfireh ku li hember min hatî pêkanîn, yê rasteqîniya xwe di vê şaristaniyê de bibîne.

Şaristanî bixwe, bi xapandina rahîbên Sumer a di bingeha rama- na mîtolojîk û baweriyê de li hember mirovatiyê û civaka neolîtîk ku wê demê hê çînçînîbûn û dewletê nasnake, ya êdî ve dawiyê ku bi çewsandineke sazûmankirî û bi zora fizîkî ve hatî girêdan e. Dî- sa hiqûq di nava van pêşveçûnên şaristanî de, weke saziya herî ne- zîkî dadmendiye xuya dike. Li vira jî hiqûqê ku em behs dikin, hî- qûqê ku li dora berhema zêdek şêwe digire ye. Di şaristaniya Ew- ropa de, hiqûqê ku şêwya herî dawî girtî, bi hiqûqê demokratîk û di qada mafê mirovan de pêşveçûnên ku pêkanîn ve girêdayî ye.He- ger bisînor be jî, di sîstema hiqûqê Ewropa yê demokratîk û bi ma- fê mirovan ve girêdayî de, şensê takekes û gelan heye ku hinek ma- fen xwe bixwazin.

Di xêzka min a dîrokî de, bûutê duyemîn ê girîng, di derbarê de- rawaya beşên civakî yên ku berhema zêdek ji wan tê pêkanîn e. Te- beqeyên raser ên civaka biçîn, di pêvajoya dîrokê de li hember van beşan li hemû saziyên civakê yên seresazî û binesazî, serdestî qe- zenc kirine. Herçiqas ku van bi şêweya komên hindikayî hewldabin ku xwe biparêzin jî, bi çînçînîbûna ku di sînga wan de pêşveçûyî ve girêdayî, timî senger windakirine. Di ramanî û mercên daringî de paşvemayîna dhnaneyî (îzafiyî) û rewşa çewsandina timî, di pêva- joya dîrokê de rê li ber gel vekiriye ku di rewşa civaka neolîtîke de bimînin û bimînin.

Şaristaniyê weke civaka bajêr timî li hember ci- vaka gundî ya li çolterê hêz qezenc kiriye, li hember rasteqîniya ge- lan a gundewarî, civaka biçîn bi giranî di mercên bajarî de pêşve- çûn pêkaniye. Çînçînîbûna di rasteqîniya civakî ya gelan de, ji bilî hindikayiyeke piçûk, zêde şensê pêşveçûnê bidestnexistiye. Di vê de para berxwedanên li hember çewsandin û kedxwariyê diyarker in. Mirovatiyê ti caran saziyên koletiyê yên bêsînor, ji ber xwe ve ne pejirandine. Li hember van sazûmanên civaka biçîn ku timî bi- zorê û bi hewldanên bîrdoziyî lêferzdikirin, timî serî hildaye û li azadiyê geriyaye, dema fersend dîtiye ramana xwe ya azadî û sazi- yen wê pêşêxistine û îlan kirine.

Sosyalîzma zanistî ku bi dahûrandina şaristaniya kapîtalîst ve gi- rêdayî, yekem car jibo beşên civakê yên bindest û tên mêhtin, di tê- koşîna wan de rola rêberiyê lîstiye. Lêbelê sosyalîzma reel a ku di sînga civaka biçîn de şêwe girtî, jiberku bandora wê bitemamî der- basnekiriye, ev yek bûye sedema semekeftina wê. Ev rasteqînî, bi tevgerên civakî yên di lêgerîna azadî û wekheviyê de ku xala der- ketinê, bi mercên azadî û wekheviya hoveber a ku civaka neolîtîk ya ji ber xwe dijî ve girê bide, di bingeheke erênî de yê were der- baskirin. Rastiya gelên ku di mercên civaka neolîtîk de çikiyayî mane, di hemû merhaleyên şaristaniyê de zor lê hatiye kirin ku he- man qederê parve bikin, zayenda jinê ku te perçiqandin herî li bin û çewsandinên çînî, hindikayî (etnîk), çandî û neteweyî di nava hev de hatine hûnandin û heta weke îro dîrokeke xwe ya taybetmendî jiyane. Hinek hindik, hinek zêde, hinek demeke kin û hinek jî de- meke dirêj di bin vê zincîra çewsandin û kedxwar de, heyîna xwe ya çandî parastine û timî berxwedan pêşêxistine, aliyê dîrokê yê ne fennî pêkanîne. Herçiqas ku ev dîrok bi şêweya bintute û ji çav ha- tibe xistin jî, hebûna fonnên mîtolojîk, olî, felsefî, zanistî û ramanî

jî parastine. Li hember ramanên serdest ên deman, bi mezheben cuda yen nîv veşartî têkoşîn dane, ji lêgerîna azadiyê re bûne ronahî û ji viyanê re weke hêzekê suxre kirine.

Nêzîkayiya min bi vî rengî ya li dîroka şaristaniyê, bêguman ji ber sedema hebûna Kurd a ku li ser navê wî têm darizandin û bi pirsgireka wî ve girêdayî, heta ku cîhe kurdan ê di nava dîro- ka şaristaniyê de bi rastî neyê diyarkirin, ne gengaz e ku pirsgi- rekên wî jî werin fêhmkirin. Heger ku bi xêzkên qelind be jî, dî- roka kurdan hatiye dahûrandin. Kurd di serê gelên ku neolîtîk afirandin de tên. Bêguman herçiqas ku kategoriyên gel dawî jî derketiye holê, di wê rewşê de ne ku civakên hindikayî yên orî- jînal ji xwe re weke binyat bigirin. Bi vî aliyê xwe, rola şoreşa neolîtîk a di pêşveçûna civaka çandinî û ajaldarî de, mîsoger e. Hemû rastiyên şûnwamasî, peyvnasî û erdnîgarî, vê rolê rast derdixin. Tevkariya wê ya li dîroka mirovatiyê, ji zayina xwe heta bi roja îroyîn, nêzîkî 15 000 sal in ku weke civaka çandinî û ajal- darî timî suxreyê dike. Ev taybetiya wê di heman demê de, di he- mû pêvajoya şaristaniyê de, di çikandî mayina wê ya di mercên neolîtîke de jî hîkarîker bû ye.

Dîrok vê nîşan dide: Gel û çandên ku şêweyeke civakê herî bi kûrayî û domdirêj dijîn, ji şêwe yen ku pişt wan re tên re, weke navendî dergûşiyê nakin. Bandora sift a civaka kevin ku jiyan, fersendê nade ya nû. Civaka nû, bi antîtezên ya kevin ve girê- dayî, li qadên ku ev bandor herî lawaz û di wan mercan de pêş- vediçe. Bêşensiya kurdan, ji jiyandina neolîtîkê ya herî kûr û herî domdirêj tê. Cîhana kurdan a sereke, bi hezar salan li dora çan- dinî û ajalên kedîkirî şêwe girtiye. Ev rasteqînî di heman demê de tê vateya biyanîbûna civaka bajêr û mehkûmî jiyana eşîrtiyê ya timî. Kurd bi civaka bajêr a Sumer re ku ji zayîna wê re bûne dergûş, timî di nava tekilî û levdanê de ne. Hêza civaka bajêr ku zêde dibe, di demeke kin de re li ber serdestiya wê ya leşkerî jî vedike, êdî ji wê rojê heta weke roja îroyîn, 5000 sal in ku bi go- tina Sumer, Hûriyên ‘gelê girên bilind’ û Kurtiyên ‘gelê çiyayên bilind’ hebûna xwe bi vekişîna serê çiyan parastine û bi hêsanî fersend nedîtine ku bi awayekî din pêşvebiçin. Li hember çew- sandin û hêrîşên ku ji çar aliyan ve tên, encex bi heşîrên piçûk û li bandeva van çiyan

nijada xwe ji tinebûnê diparêzin. Di binge- ha dînamîkên xwe yen derûn de, encex bi awayek bisînor fersen- da bajarîbûnê dîtine. Dîsa dagirgeriyeke di demeke kin de bûye qedera wan.

Ev rasteqînî rave dike, bê çima Kurd hevqasî teng û bi yekîne- yên êşîrtî yên bihêz mane. Di heman demê de, ravedike ku ji bilî beşeke hevkar a teng di nava xwe de veneguheriye çînçînîbûnê jî. Çînçînîbûn weke çêbûneke derveyî pêktê. Him çina raser a hevkar û him jî ya bin ku tê mêhtin, di mercên şaristaniya biyanî de çêdi- bin. Ev yek weke sedema bişavbûneke sift ku ziman û çanda xwe bi awayek azad pêşvenebe, derdikeve pêşberî me. Dema em ji nê- zîk ve li rasteqîniya dîrokî ya ku dijîn binêrin, Statuya kurdan ne bi serdestiyeke hundirîn û ne jî bi serdestiyeke derveyî dikare were ra- vekirin. Çiqas ku ber bi derve ve diçe dihele û bişav dibe, dema ku ber bi hundir ve tê dikeve rewşa yekeyên êşîr û malbatên herî paş- vemayî û cudabûn û îzolasyonekê dijîn. Mehkûmî statuyeke civakî ya herî marjînal ku di xeteriyê de dibin. Weke pîrikeke ku mirovatî dabe zayîn û êdî li enîşkekê ketibe rewşa dapîreke ku tiştek ji zima- nê wê neyê fehmkirin. Ev diyar e ku vê rasteqîniyê rê li ber statu- yeke zalim û ne fêlnnbar vekiriye.

Dema ji aliyekî din ve nêzîkayî lê were kirin, em ji aliyê ol û sinc ve lê binêrin, mercên civakê yên ku pîrozî, guneh û naletî lê ten ji- yandin jî di sînga xwe de hildigire. Pîroziya wê jiberku yekem car hemû dexil, fêkî û ajal bi mirovatiyê dane qezenc kirin e. Pîroziya nan, şerab û şîr vî aliyê rastiyê dawer dike. Hebûn û jîndariya pî- rozweriyekê ya di genên Kurd de ku nepiçûk, nayê mandelekirin. Lêbele ev rasteqîniyeke ku herî li bin maye û xwe bitemamî nade îfadekirin. Gunehkariya kurdan ev e ku li pîrozweriya xwe bi awa- yek layîq xwedî demakevin. Digel hevqasî xwedî pîrozwerî û dîsa ku nabine civakeke azad, rewşeke gunehkariyê ya gelemper derdi- xe holê. 01 li nav kurdan ne jibo ku ji gunehên xwe paqij bibin e, jibo guneh werin nixûmandin pêktê. Ev jî ji ber mercen civaka ne- olîtîk ku piştî çanda dayîka xwedawend, hemû baweriyên olî ku ha- tine ji binyateke biyanî ne rolê dilîze.

Ev ol û xwedayên ku jibo civakên din bûne amûren bîrdoziyî yên belavbûn û mêtingehkariyê, hişmendiya Kurdan a derûn, vi- yan û

baweriya wan jî xirakirine û di qada ramanî û dilînî de jî gelekî li paş hiştine. Jibo xwe û mercên jiyanê ku pêve girêdayî- ne, raman û dilînên afirîner hilnaberîne, bêpariya daringî bi bê- pariya menewî biencam dibe. Naletîbûn jî, dibe bersivdayina sincî ya tevgerên hilweşîn, talan, vegirî û dagirkeriyên di pêva- joya dîrokê de hatine jiyandin. Ji aliye olî ve jî gunehkariya herî mezin îfade dike. Jiberku ti civakan di pêvajoya dîrokê de, hev- qas hilweşan, vegirî û dagirkerî di nava hev de û timî nejiyane, Kurd yen ku herî li naletbûnê rasthatine û bûne gelekî mehkûmê êş û tarîtiya bêbextiyê û bêpêşerojiyê. Naletîbûnê, ji aliyê hemû şêweyên şaristaniyê ve bi rêya hêzên wan ên herî bijarte, di rew- şa karesatên mezin de, bi sed salan pêl bi pêl heta weke roja îro- yîn rewşeke hîkarîker nîşan daye. Kurd di nava êşên civakeke mezin de ku li naletê rasthatî û di nava tarî û şennê de hatiye gir- tin. Ev rasteqînî îfadeya trajîk a pirozî, gunehkarî û naletbûna bi kurdan re mîna wêneyekî derdixe holê. Ronahîkirina pirsgirêka Kurd annanca bingehîn a parêznameya min e. Pirsgirêka Kurd ji pirsgireka neteweyî ya teng wêdetir, weke pirsgirêkeke mirova- tiyê ya ku bi aliyên dîrokî û civakî were dahûrandin derdikeve hemberî me, naşiba pirsgirekên neteweyî yên ku li derdora baza- ra neteweyî ya ku di sînga kapîtalîzmê de pêşvediçin. Bingeha wê ya dîrokî û civakî, fersendê nade ku şêweyeke bi vî rengî bi- gire. Di rewişta pirsgirêkeke wisa de ye ku bi zayîna civaka bi- çîn a Sumer re derketiye holê û hatiye heta bi roja me. Ji hemû sazûmanên koledar û feodal herî bêhtir bandor girtiye. Dikare were gotin ku, hemû şaristaniyên girîng ên li Rojhilata Navîn ha- tine damezrandin û pêşveçûyin, di çêbûna Kurd de rê li pirsgirê- ken kûr vekirine. Sumer, Babîl, Asûr, Hîtît, Greko-Romen, Bî- zans, Pers, Sasanî û hemû împeretoriyên bi îslamê ve giredayî, erdnîgariya kurdan kirine qada şer. Bersiva kurdan a li van hêzan ev e ku, bi şêweya eşîren piçûk xwe li çiyayên bilind girtine û ke- tine rewşa parastineke rewa, yên ku li deştan man jî, di nava hêz û çanda serdest de heliyane û ketine rewşeke bêkesayetî. Taybe- tiyeke vê pêvajoyê ya din jî ev e ku, tebeqeyên Kurd ên raser hel- westekê nîşan didin ku, ji yên hatin re dibêjin axayê min û ji yên diçin re paşayê min.

Di bin van mercan de, pirsgireka Kurd nayê asteke siyasî jî, li

hember vegirî û dagirkeriyen ku sînor nasnakin, encex heyîna xwe ya fîzîkî diparêze. Di bin gefa qirkirinan de, parastina heyîna xwe ya civakî bi awayek fîzîkî, weke annanceke bingehîn berbiçav di- be. Li derî ku bi pêngaveke serkeftin, çandî û siyasî ve girêdayî be, encex di pêşgiriya ku ji civakbûnê were derxistin de xwe nîşan di- de. Dema ku xwe di rewşa malbat, eşîr û qebîleyê de li ser lingan digire, sipasiya xwe bi vê tîne û weke serkeftinê dibîne. Lewra ji vê derawaye û wêdetir derketina ji civakbûnê ye, ketina rewşeke ni- jadkûjî (jenosîd) û komkûjiyê ye. Herênayî daxistine sînorên fizîkî ya hebûn û tinebûna fizîkî. Weke hêza rêxitinê, tegîn û siyasetê, ha- tina asta azadiya çandî û siyasî, rewşeke gelekî bisînor pêşkêş dike, encex di mercên roja me de, pêşveçûnên bi vî rengî tên jiyandin. Lêbelê ya herî xeter ev e ku, herçiqas ne bi qirkirineke fizîkî be jî, bi polîtîkayen zorê yên bişavker derketina ji kesayetiya xwe, weke taybetiya pirsgirêkê ya herî bingehîn derdikeve pêşberî me. Weke pirsgirêkeke azadî ku hebûna xwe dide hiskirin, piştî wê êdî vate- yekê îfade dike.

Pirsgirêka Kurd bi van taybetiyên xwe xwedî du vateyên binge- hîn e: yekem, berxwedana li hember ji kesayetiya xwe derketinê, duyem, gihîştina derfetên jiyana azad e. Tevlîhevî û piralîbûna pirs- girêkê, ji van taybetiyên wê yên dîrokî civakî tê. Mêtingehkariya ku bi kapîtalîzmê ve girêdayî peşveçûyî, çewsandina neteweyî, kedx- wariya aborî û bişavtina çandî, pirsgirekên Kurd ên di pêvajoya dî- rokê de ku bi giranî tên jiyandin, kûrtir kirine. Jixwe jiyana kurdan a zor ku mîna li ser Pira Siratê bin, li hember hêzên siyasî û nete- weyî yên ku di bin sazûmana kapîtalîst de birêxistin bûne, di rew- şeke destevala de ne. Li hember çewsandina kevneşopî, polîtîkayên helandin û kedxwariyê, pêkutiya hemdem û neteweyî ya herî bihêz, rasteqîniya ku di hebûna Kurd û pirsgirêka wî de tê jiyandin, ji tes- lhnbûnê wêdetir jî bêçareyî, devjêberdana xwe bi xwe, biyanîbûna li xwe û bi şêweya xwelêgirtina nasnameyên biyanî û dijminan pêş- veçûye. Hinek berxwedanên azadiyê bisînor ku derketine holê jî, di demeke kin de bi komployên der û hundir, ji encamên berevajî ku derkevin holê rizgamebûne.

Ev mijareke tê fêhmkirine ku kurdên di nava van rastiyan de di- jîn, ramaneke zexm, bawerî û behreyeke huner û polîtîk pêşvena- bin. Di

bin kulmiskên ên ku ten û diçin de, nikare nefesê bide û bis- tîne. Diyar e ku di bin van mercan de, nagihîje bergeh û berhemên zanistî û yên hunerî. Dînîtiya di bergeha Kurd de, bêçareyiya di na- va hev de, daxwaza dilovaniyê û serhildêriya hoveber a di nava hev de, dubareyên zêde yên mîna gêrê di jiyana wî de, veguherîna wî ya bêşêweyî û bêvateyiyê jî çavkaniya xwe ji vê rasteqîniyê digire. Gunehkarî û naletbûna ku ol dixwazin vebêjin jî, encameke din a vê rasteqîniyê ye. Di bûutê ku pirsgirêka Kurd gihîştiyê de, reva jixwe û kûrahiya xiyaneta berbiçav, xwelêgirtina li nasnameya bi- yanî û dijmin a bidilê xwe, encex di bin naletbûn û gunehkariyeke herî pêşketî de, gengaz be. Di vê avhewayê de û dorhêlê de, dengê xweş, reng û teşe pêşvenaçe. Bi hêza vateya ber bi rastî, rindî û ba- şiyê ve, nagihîjine kûrahiyên dilînî. Bi kinayî, ji ber tineyiya mer- cên daringî û menewî yên ku em bibêjin mirovatî ne, bi awayek rû- met û azad nayê jiyandin.

Dahûrandina di derbarê rastiya PKKê de ku di parêznameya min de cîhekî girîng digire, dide çespandin ku di pirsgireka Kurd de armanca PKK hema qet nebe jî, rawestaneke “ez mirov im” bide gotin. Herçiqas ku PKK negihabe kûrahiyeke bîrdoziyî ya berfireh û hêzeke pratîk jî, esasê wê di hebûna Kurd de li rawes- taneke mirovatî ya hevgirtî digere û hewl dide ku derêxe holê. Serîlêdana wê ya rêbaza şidetê ku ji sepîna wê ya serkeftî dûr, di derûna xwe de bûyina amûra parastina rewa wêdetir nabe xwedî roleke din. Li hember terorên tinekirinê yên piralî ku parastina rewa birêkûpêk nade meşandin, aliyê wê yê herî were rexnekirin û tawanbarkirin e. Rasteqîniya ku Kurd dijîn, di her qadê de, di bingehên bîrdoziyî, mirûz, siyasî, leşkerî û çandî de, parastineke rewa pêwîst dike. Berevajî vê, ne gengaz e ku xwe weke mirov jî nîşan bidin. Berî her tiştî berxwedana Kurd weke mirov û gel, digel bi israreke jiyandinê, ji bilî gelekî ku pêdiviye azadî û dad- mendî ji wan re jî were nasîn, nabine mijara ti nirxandinên din ên cuda. Şixulandina (îstîsmar) wî, amûrkirina jibo berjewendiyên takekesî û malbatî, weke qurbankirinê pêşkêşkirina ji lîstikên po- lîtîk ên mezin re, lêgerîna wê ya rast a di derûna wê de naguhe- rîne, terîfkirina bingehîn a pirsgirekê ji holê ranake. Ya ku PKK biserxistî ev e ku, pirsgirek derandiye holê, ji raya giştî ya welêt û ya navneteweyî re kiriye mal û rêyên çareseriyê

yên rast nîşan dane. Herçiqas ku xete û çewtiyên wê yen girîng hebin jî, ez di wê baweriyê de me ku rola wê ya dîrokî pêdiviye wiha were nîşandan. Ev ji ber çavan nayê dûrkirin ku PKK di salên 2000an de, bi veguherînên girîng re rûburû ye.

Di parêznameya min de hatiye nîşandan ku, çareseriya hem- dem a pirsgirêka Kurd di pîvanên dewleta hiqûq û demaokrasiyê re derbasdibe. Di sedsalên 19 û 20an de, çareseriyên netewepe- restî ku bingeh hatine girtin, daniye holê ku bêhtir ji anînê, biri- ne. Bîrdozî û rêbazên neteweperest hewl dane ku cîhê eşîr û olan bigrin, ji bingehên zanistî bêhtir bi dilîn û şovenîzmê ve girêdayî bimeşin, di encamê de bi du şerên cîhanê yên mezin û gelek şe- rên herêmî û cîgeyî qira mirovan aniye. Bi îflasa neteweperesti- ya faşîst a ku kapîtalîzmê weke derketina ji qeyranê ceribandî, di dawiya sedsala 20an de serkeftina sazûmana demokratîk, weke rejîmeke derbasdar mîsoger kiriye. Bêyî ku bi sînorên siyasî bê- te lîstin, bi şoreşên teknolojî û zanist ku vateya şidetê dane win- dakirin, derfetên lihevkirina demokratîk di pirsgirekên herî zor de jî çareseriya xwe daye çespandin. Weke qezenca şaristaniya Ewropa ya herî girîng, sazûmana demokratîk ku xurt dibe, bi aş- tiya herî domdirêj re ku derfetê dide pêşketina aborî, di cîhanê de rê li ber qezenckirina hêzeke kêşanê vekiriye. Terîfkirina ma- fê mirovan ê berfireh û wategirtina hiqûq a weke nirxê ku bilind

dibe, senteza dewleta hiqûq û sazûmana demokratîk a bihêz bi xwe re aniye. Di vê senteza dewleta hiqûq a demokratîk de, ça- reseriya hemû pirsgirêkên neteweyî û civakî ne zor in. Liqasî ku ezmûna şaristaniya Ewropa ya mezin rê li ber vê çareseriyê ve- kiriye, mîsoger bûye ku heza xwe ya bingeh jî ji vê reya çarese- riyê standiye.

Di erdnîgariya Rojhilata Navîn de, gelê Kurd di nîvê sê gelên mezin tirk, ereb û farisan de cîh girtiye. Ev yek di roja me de rê ne li ber bêavantajiyê, berevajî vê re li ber biavantajiyekê vedi- ke. Dema ku rêbaza neteweperstî bingeh were girtin, jênereve ku yê rê li ber encamên gewixandinên mîna di dîrokê de hatine dî- tin veke. Neteweperestî di pirsgireka Kurd de, weke gotina him neteweya bindest û him jî ya serdest, ji karesatê pêde tiştekî din neaniye. Di sedsalên 19 û 20an de, polîtîkayen li ser Kurdistan hatine meşandin, ev rastiya bi êş bi têrayî çespandiye. Levdana dawî ya Ereb û îsrael jî, mînakeke herî hîkarîkere ku di derûna xwe de îflas û stemkariya neteweperestiyê diçespîne. Di serdema şaristaniya demokratîk de, dîrok careke din li Rojhilata Navîn ro- leke girîng dide kurdan.

Çawa ku dema elinda şaristaniyê, dayîk û kalikên Kurd di kesa- yetiya sumeriyan de, di zayîna şaristaniyê de rola dergûşê lîstine û bûne bingeh, di roja me de jî di heman erdnîgariyê de, di zayîna şa- ristaniya demokratîk de yê heman rolê bilîze. Dema ku gelê kurd xwe demokratîk dike, di heman demê de li şaristaniya ji Mezopo- tamya dertê jî ferz dike ku li Rojhilata Navîn demokratîk bike. Ca- reke din ku di zayîn û mezinbûna şaristaniyê de rola dayîk û dergû- şê dilîze, dibe ewlekariya vê ku encex bi dadmendî û pîvanên de- mokratîk ên herî nêzîkî azadiyê yê pêkwere. Ev rol li Iraqa ku we- latê Sumer ê kevin, weke jênegeriya sazûmana navneteweyî li roje- vê rûniştiye. Heta ku negihe çareseriyeke demokratîk jî, ne genga- ze ku ji rojevê were xwar. Derketina kurdan a demokratîk û çarese- riya wan, qedera nû ya şaristaniya Rojhilata Navîn digire nava xwe.

Şoreşa îranê ku dixwaze bi îslama Demokratîk derketinekê bi- ke, rola kurdan dîsa bêhempa ye. Qedera demokrasiya îranê jî, di çalakiya kurdan de û di hişyarbûn û şêweya jiyana wan a nû de şîn dibe. Li Tirkiyeyê jî demokratîkbûn, him di dwelet û civakê de û him jî di hemû

rexistinên siyasî yên şarwer de, gihaye dera- wayeke ku nebe nabe. Ji serê sedsala 20an ve, neteweperestiya Tirkiyeyê ku bi bingeheke burjûva ya lawaz ve girêdayî, bi şêwe- ya xwe ya şoven û zêdekar şaristaniya Anatolya mandele dike, di pêşya pêşveçûna gelê Tirk a hemdem de ketiye derawayeke as- tengiyê. Neteweperestiya damezrînerê KT M. Kemal a bi çand û parastina welêt ve girêdayî, bi mandelekirinê re rûbirû ye. Nete- weperestiya Kurd ku hê lawaztir, digel sed sal in ji kurdan re ti hêvî nîşan nedane, ji amadekariya karesatên bi êş wêdetir ti rol ne lîstiye. Di nava herdu gelan de, navtêdanên neteweperestiyê ji amadekirina karesatên nû pêde bikêrî tiştekî din nayê. Hemû mercên herêmî, neteweyî û navneteweyî di salên 2000an de, li rojeva Tirkiyeyê demokratîkbûneke tevayî ferz dikin. Hatiye qo- naxeke wisa ku di serî de pirsgirêka Kurd, hemû pirsgirekên si- yasî, aborî û civakî, encex bi pîvanên dewleteke hiqûq û demok- ratîk çareser bibin. Ev diyar e, asta şaristaniya hemdem ku bûye dirûşma Tirkiyê, encex bi vê çareseriyê bikaribe bigihîjiyê.

Di dîroka tirkan de rola kurdan, xwe bi sê merhaleyên stratejîk ên girîng çespandiye. Bi awayek dîrokî li ber çavaye ku beyî kur- dan Serfiraziya Şerê Melezgirê yê 1071an, ne gengaz bû. Dîsa di mezinbûna împeretoriya Osmanî de ku bûye hêzeke cîhanê, teki- liyen kurdan ên di sedsala 16an de û di şerê Çildêran ê 1517an de, rola kurdan diyarker e. Di sala 1918an de bi jevketina împe- retoriya Osmanî re, ji rewşa xeter ku Tirk ketinê dîsa bi saya kur- dan rizgar bûne. Ev yek ji devê damezrînerê KT M. Kemal ve di gotar, stratejî û taktîkan de hatine ravekirin. Ev rastî dikarin çê- bûnên siyasî ku Tirk jiyane, weke rasteqîniya kurdan jî werin şî- rovekirin. Di van hezar salên dawî de, li Anatolya û Mezopotam- ya di çêbûnên siyasî ku bilind bûn de, para kurdan piştî tirkan di rêza yekem de ye. Çêbûna siyasî ku di roja me de tê jiyandin, re- wişta komara laîk û demokratîk e. Weke di dema damezrandinê de, heta ku Kurd nebin, yê ne gengaz be. Herwiha ev yek bi ser- hildanan, bi rêveberiya olîgarşîk û herî dawî bi serhildana PKK, bi têrayî hatiye çespandin. Komara Tirkiyeyê ya laîk û demokra- tîk encex bi tevkariya dadmendî û azadiya ku Kurd bijîn ê gen- gaz bibe. Li qasî binyatên dîrokî, rizgarbûna ji qeyranên ku roja- ne jî tên jiyandin

weke ku ve rasteqîniyê ferz dike, bilindbûna dî- rokî ya bihez a ji nû ve, di vê tevkariya demokratîk re derbasdi- be.

Di parêznameya min de pûte bi hêza hiqûq a çaresker tê dayîn. Hiqûqê ku tevaya rezikên bi mueyîde yên viyanên civakî, çiqas ku demokratîk be yê hewqasî çareserker be. Di şaristaniyên Roj- hilata Navîn de, hiqûqê ku bi çavkaniya xwedayî tê nîşandan, gengaz e were terîfkirin ku, di derûna xwe de despotîzma kole- dar û feodal a viyana gel jê hatî nûhandin, bi devê monark bi awayek yekalî were îfadekirin. Di hiqûqê Roma de yê ku binge- ha hiqûqê Ewropa, bi awayek vekirî viyana hêzên civakî diyar- ker dibe. Vebûna ji pêşveçûnên demokratîk re, taybetiya binge- hîn a sîstema vî hiqûqî ye. Hiqûqê Ewropa yê di roja îroyîn de, digel ku viyana çîna burjûva bingeh digire jî, di nûneriya gel de, gelek îradeyan û takekes jî digire nava xwe. Rewişta hiqûqê de- mokratîk bi van peşveçûnan ve girêdayî ye. Berjewendî û mafên bingehîn ên takekes û gelan çiqas ku di mijareya hiqûq de werin nîşandan, nirxê çareseriya pirsgirekan jî ewqasî zêde dibe. Jiber- ku pêşveçûna hiqûq a di vî alî de yê were vateya ewlekariya dad- mendî û azadiyan jî, aştiya civakî, pêşketin û hedarî yê statuye- ke vatedar qezenc bike. Şaristaniya Ewropa piştî ezmûnên girîng ku jiyayî, xwe bi şêweya YE weke hêzeke siyasî yekere dike, bingeha hiqûqî ya vê yekîtiyê jî bi PMME ku nirxê wê weke yê zagona bingehîn, binonn dike. YE di bingeha PMME de, yekîti- yeke hiqûq jî îfade dike. îfadeya PMME ya rêxistinî jî, Dadgeha Mafê Mirovan a Ewropa (DMME) ye. Bêguman, DMME di ew- lekariya mafê mirovan bingehîn ê takekes û gelan de, roleke gi- rîng dilîze.

Doza min ji ber nelêbûna gelek xalên PMME ku çûye DMME, ji binpêkirina mafen min ên takekesî wêdetir, ji aliyê mafen gelê Kurd ên bingeh ve bê di çi derawayê de ye, pir girîng e. Daxuyane- ke viyanê ya di derbarê binpêkirina mafe takekesî de, nezîkayiyeke teng e, xeteriya ku hiqûq mafên gelan ji ber çavan dûrbike û herwi- ha rê li ber bêdadiyê veke bi xwe re tîne. Pêwîst e DMME vê yekê çareser bike. Berevajî vê yekê, qalikekî hiqûqî li şêweya binçavki- rin û revandina min bîne ku ev yek berhema komployeke berfirehe û berevajî derûn û xalên PMME ye, wê hingê DMME jî yê bikeve rewşa amûreke vê

komployê. Ev yek yê pêdiviya dadmendî û hiqû- qê hemdem be, çalakiyên ku ji herdu aliyan ve weke şerê bi sift- bûna daxistî tê nirxandin, weke parastina rewa ya gelê Kurd bête nirxandin û heger di vî şerê parastina rewa de, çalakiyên şer ên ta- wanbar hatibin kirin, vê yekê di herdû aliyan dejî lêbikolin û di dadgeheke taybet de bidarizînin. Darizandina Îmralî ya li Tirkiye- yê, ji ber vê yekê him ji aliyê naveroka xwe ve û him ji aliyê hiqû- qê erênî ve ne li PMME ye. Weke ku di gelek mînakan de tê dîtin, pêşvebirina dadgeheke tawanbariyên şer a bêalî, peywira siyasî û sincî ya KE ye ku hêza birevebirina DMME ya û Tirkiye jî enda- meke damezrînerê wê ye.

Levdaneke ku rê li ber 40 000 kesên kûştî û 4000 gundên va- lakirî vekirî, weke terorîzmê nayê nîşandan û li yekî tenê , li min nayê barkirin. Li Tirkiyeyê Serokomar Sileyman Demîrel ku di- bêje “caman dibe ku derkevin derî rêzikan”, dîsa serokwezîra de- mê Tansu Çîller ku got “lîsteya yên ku werin kûştin di berîka min de ye”, ji aliyê din ve Wezîrê Karê Hundirîn ê demê Mehmed Agar ku ji ber bûyera Susurlukê got, “ bi hezaran çalakiyên me yên bi vî rengî çêbûne”, bi awayek vekirî nîşan dide bê hiqûq ça- wa û di çi astê de hatiye binpêkirin. Bi hezaran dozên ku hatine DMME, vê bêhiqûqiyê nîşan dide. Bi çend hezar dolaran xelefa bêhiqûqiyê nayê vegerandin. Heger bi vî rengî were derbaskirin, DMME û KE yê li dijî kurdan PMME bikin amûr. Yê derûna hi- qûq jî were perçiqandin. Doza min di vateya ku rê li ber vê bêhi- qûqiya giran venebe de, girîngiyê werdigire. Jiberku Tirkiye him damezrînera KE ye û him jî berendama YE ye, pêwîst e ku bi PMME ve girêdayî hereket bike. Jiberku dewleteke Kurdan tine, nepejirandina wî ya weke alîgirekî, nê nêzîkayiyeke dadmendî ye. Herwiha lêgerîna maf tenê ya di asta takekesî de, yê berevajî rasteqîniya PMME ku mafê berbiçav dane hemû gelan û ev bi na- vê ‘mafê sê nifşan’ binavkirî be. Jibo kurdên ku ji pirsgirekên li Balkanan tên jiyandin girantir xwedî pirsgirêkin, vekirina rêyeke dadmend a darizandinê yê li gor giyana PMME be. Ez parêzna- meya xwe di vê çarçovê de li ber çavan digirim û derûna wê bi bi vê rasteqîniyê ve girêdidim. Naxwe derîhîqûqiya ku li Îmralî ez jiyame, ez weke pirsgirêkên di pîleya duyemîn de dinirxînim. Bêguman di pêvajoya darizandina min de, li Tirkiyeyê peyanên lînça siyasî ku li ser

min dane meşandin, girtina min a bi serê xwe li giravekê û di mercên ku ne li gor tenduristiya min de, we- ke li çarsingê dabim û di tabûtgehekê de, berevajî rêznameya KPEE (Komîteya Pêşîgirtina Eşkenceyê ya Ewropa) ye. Pêwîst bû di derbarê van hemû mijaran de, pêşgiriyên li gor derûna hi- qûq werin girtin.

Ez dixwazim vê yekê nîşan bidim ku, di pêkhatina ve bêhiqû- qiyê de ne KT, di serî de Hikûmata Grekîstan a Rûsya û îtalya berpirsiyar dibînim. Weke ku min di parêznameya xwe de jî nî- şan daye, derî hiqûqî ji nêzîkayiyên van dewletan ên komployî derketiye holê. Li Ewropa penahiya min a siyasî hate binpêkirin. Weke ku ji aliyê nûnerê siyasî Blîndken ve jî di daxuyaniya ça- pameniyê de hat bilêvkirin, diyar e ku bi fennana serokê DYA Clînton ez teslîmî Tirkiyeyê kirim. Ji serê sazûmanê bigirin heta bi gelek hikûmat û sîxur ji vê behiqûqiyê berpirsiyar in. Heta ku DMME vê pirsgirêkê çareser neke, dawî li vê bêhiqûqiyê neyî- ne, herwiha doza Îmralî betal neke, qet nayê xeberdan ku hel- westa dadmendî nîşan daye. Dema ku DMME di vê doza min de rola xwe ya dîrokî bilîze, yê di veguherîna dewleta Tirkiyeyê ya dewleta hiqûq û laîk de, cîhê xwe yê rastî bigire. Di vî babetî de, bi rênîşandana dadgeha mezin, ez dixwazim vê yekê bibêjim ku ez ji rêbaza “çareseriya dostanî” re vekirî me. Ez dixwazim vê jî nîşan bidim ku, heger ku rayedarên KT jî bipejirînin, dest ji çe- kan were berdan, di bingehgirtina sînorên dewletê yên heyîn de, bi rêya guftûgoyan hewl bidin ku lihevkirineke di krîterên de- mokratîk de pêkbînin û PKK jî di vî babetî de daxuyaniyeke bi vî rengî daye.

Pêwîst e DMME û rêxistinên YE yên din ên rayedar, tenê bi mafê takekesan li pisgirêkê hewqasî teng nenêrin, têkiliya di navbera hiqûq û siyasetê de li gor krîterên demokratîk dahûrînin, herwiha yê him tirkan û him jî kurdan ji pirsgirêkên giran ku di- jîn, rizgar bikin. Pêşveçûneke bi vî rengî, yê di rêya yekbûna Tir- kiyeyê ya bi Ewropa de, bandorekê bike û pêvajoya tevlîbûna wê lezgîn bike. Ev mijareke pir caran hatiye dîtin ku, hiqûq di dîro- kê de bi dozên girîng, rê li ber veguherîna dewletan a bi erênî ve- kiriye. Di veguherîneke bi vî rengî de, hiqûqê Ewropa yê de- mokratîk dikare roleke erênî bilîze. Ez dîsa dixwazim nîşan bi- dim ku, jibo Ewropa pêşveçûneke bi vîşêweyî, di heman demê

de peywireke siyasî û sincî ye.

Di çavkaniya pirsgirêkên Tirkiyeyê û ya kurdan de, bandora nêzîkayiyên Ewropa yên dema mêtingehkariyê heye. Vê bando- re heta weke dema îro jî, bandora xwe domandiye. Dema ku min got pêdivî ye vê carê rola erênî bilîze, jibo ku vê bandora neyînî ji holê rake, peywirên xwe yên siyasî û sincî him jibo pêdiviya PMME û him jî li hember derûna rejîma demokratîk, bêyî ku bi- keve nava herênayê de, bicîh bîne. Ez bawerdikim parêznameya min ku min pêşêxistî, ye reyên çareseriyê ronahî bike. Weke xwediyê baweriyeke xurt nezîk dibim ku, tenê ne ji aliyê pirsgi- rêka Kurd ve, bi sentezeke di bingeha pîvanê demokratîk û ber- mayiyên şaristaniya Rojhilata Navîn de ku şaristaniya Ewropa jî berhemeke wê ya dawî ye, çûyina ber bi dahûrandineke erênî yê rasteqîn û rastir be.

Ez têgihîn û çalakiyeke neberbiçav a li dij hnperyalîzma Ewro- pa ku ji dema neteweperstiyê mayî û herî bêhtir ji paşverûtiya cî- geyî re suxreyê dike, rasteqînî û pêşverû nabînim. Ya ku were kirin, ne pêşkarîkirina dijminatiya şristaniyan, behreya senteza wan a bi aliyê wan ê cureyîn û azad ve girêdayî derêxin holê. Herwiha ev yek yê bibe tevkariya li meşa dîrokê ya azadker û dadmend. Encam û vateya ku parêznameya min gihayê ev e. Ez ne gumanbar im ku bi afirandina dîroka azadiyê re, yê mafdarî qezenc bike.

**SAZÛMANA BI ZORDARÎ U DEREWAN VE GIRÊDAYÎ YÊ WINDA BIKE!**

**SAZUMANA BI DADMENDÎ Û AZADIYÊ VE GIRÊDAYÎ YÊ QEZENC BIKE!**

*Abdullah OCALAN Girava Îmralî-*
*Girtîgeha Yek Kesî 11 Avrêl - 28*
*Gelawêj 2001*

# PARÊZNAMEYÊN

# RIHAYÊ

# Li Korta Dîcle-Ferad Dîrok, Pîrozwerî û Dawera Naletê

***Ji bo Serokê Dadgeha Cizayê Giran a 8emîn Enqere***

Dadgerên Birêz,

Jibo doza PKK ya Rihayê ku tevlî darizandina Îinralî nehatiye kirin, min du parêzname amade kirine. Ev parêznameyên min ku teng û di asta cîgeyî de, dikarin weke parçeyekî veser ê parêzname- ya DMME werin nirxandin. Parêznameya DMME ku min di çarço- va tevahiya dozê de pêşêxistî, jibo ravekirina pirsgirêkan a baştir, dahûrandineke dîrokî û şaristanî digire nava xwe. Herwiha wergiri- ya doza PKK a Rihayê ya teorîk û dîrokî diyarker dike. Beşek ji ya wê hatiye kutakirin. Ez van bi hev re pêşkêş bikim. Ezê beşa du- yem di dawiya Gelawêjê de biqedînim û bişînim.

Min ev yek bingeh girt ku di parêznameya xwe de, bêhtir ji xe- bitandina bûyeran, dersên pêdiviye werin girtin û piştî vê xalên em gihîştinê rave bikim. Di vê pêvajoya li Tirkiyê tê jiyandin de ku nû- saziyên hiqûq û siyasî di rojevê de, di pirsgirêkeke civakî ya girîng de weke alîgir, bi baweriya ku nêrînên min ên tevkariyekê pêşkêş bikin, min pûte bi amadekariya wan da. Bi vî rengî di têkoşîna ko- mara laîk û demokratîk de, bi lîstina rola erênî, min hewl da ku we- ke rêyeke derketinê di bingeheke zanistî de dahûrînim. Ez di wê ba- weriyê de me

ku ji aliyê rêxistinê û gel ve, min rawestana xwe bi awayek zelal ravekiriye.

Ez dixwazim baweriyên xwe diyarbikim ku dadgeha we, yê parêznameyên min ji niha û pêde, di derbasdariya pîvanên hiqûq ên li welatê me de, weke amûrekê binirxîne. Ez rezdariyên xwe pêşkêş dikim.

***10 Tîrmeh 2001***
***Abdullah OCALAN***
***Girava Îmralî***

Biwêja "dîrok li Sumer destpêdike" rast e. Lêbelê dîroka Sumer jî, li derên ku Dîcle û Ferad û baskên wan jêder tên destpêdi- ke. Evder Mezopotamya Jorîn a ku ji çiyayên bilind ên Toros û Zax- ros, ji penav û deştan hatiye holê ye. Di serî de sumeriyan û gelek gelên ku bi zimanê xwe ew bi "Gondwana", "Kardûnna" û "Ûrartî" ku dihate vateya "welatê bilind" binavdikirin. Lêkolînên dawî yên zanistî nîşan didin ku, şoreşa çandinî, cureyên ajalên kedîkirî û mer- cên erdnîgarî yen kêrhatî li vêderê derketine holê. Ji aliyê rîwekên ku hatin çandin û ajalên hatin kedîkirin ve, vêderê çandeke dewle- mend pêkaniye. Avhewa xwedî xwezayeke avdaniye ye. Him ji ali- yê danehevê û him jî ji aliyê nêçîrê ve, hê ji demên berê de herême- ke ku mirovên pêşî lê bicîhbûne, ji vê kêrhatiya wê tê. Beriya mîl- yonek, mîlyon û nîv salî koma mirovên pêşî ku bi texmînî ji Rojhi- latî Afrîka derketine, dema têne Rojhilata Navîn, vî cihî weke cîhê herî kêrhatî dinirxînin. Evder çiqas ku diçe dibe cîhekî ku payîdar dibe. Ti qadên din weke vira kerhatîbûnê nîşan nadin. Di hemû ser- demên qeşayî û yên navê de, ev erdnîgarî jibo jiyanê dide çespandin ku di cîhanê de cîhê bikêrhatî yê hatî ceribandin e.

Beriya 20 000 salan bi dawîbûna serdema qeşayî ya dawî re, ser- dema mezolîtîk a di navbera serdema kevirî ya kevin û serdema ke- virî ya nû de destpêdike. Li herêmê gelek bennayiyên şûnwamasî ku ji vê demê mane hene. Nêzîkî 12 000 sal berê ev serdem diqede û serdema neolîtîk (kevirê sîqalkirî) destpêdike. Di vê de destpêki- rine demeke mahçêtiyê roleke mezin dilîze. Ji ber tecrûbeyên zêde- bûyî û avhewaya ku guherîneke girîng derbasdike, şoreşa herî me- zin a mirovatiyê ku bi gihandina rîwek û kedîkirina ajalan ve girê- dayî tê pêkanîn. Bennayiyên vê şoreşê yên şûnwamasî dîroka herî kevin dibin heta bi BZ 11 000 salan. Li hemû qadên ku korta Dîc- le û Ferad bi çiyê re dibe yek, li bennayiyên vê şoreşê tê rasthatin.

Tê çavdêrîkirin ku sazûmana cîwarbûnê ya herî kevin, li dora Rihayê pêşketiye. Cîhên cîwarbûyinê pêşî ku li Newala Çorî û Girê Zikberdayî (GobekliTepe) hatin dîtin, diçine heta BZ 11 000 salan.Tê çespandin ku cîwarbûnên yekem ên bi perestgeh jî li vi- ra pêkhatine.

Bi giranî Riha Amed û Mêrdîn û derdorên cîranên wan navendên vê serdemê ne. Hêjî di rêwîtiyên ketûber de jî gir û tilên axî ku tên dîtin,

xizîneyên dîrokî yên ku ji vê serdemê mayine. Bi sedan ev gi- rik li benda kolanê ne. Xebateke şûnwamasî ya bi bal, dikare di van girikan de berhemên şoreşa mirovatiyê ya herî pêşî derîne holê. Ev rewş ne ji derasayiya herêmê, ji mercên erdnîgariya bikêrhatî tê.

Rîwek û darên jibo çandiniyê herî bikêrhatî û ajalên ku yê werin kedîkirin, him li çiyê û him jî li deştê pir zêde ne. Şikeftên xwezayî jî, weke cîhên cîwarbûnê yên ewlekar tên bikaranîn. Li her alî ji bilî çem û baskên wan, li her derî kanî jî hene. Dema ku bi baranê re ev çem kanî jibo avdanê bi rîwek, ajal û derfetên cîwarbûnê re dibin yek, rewşeke berhemdar derdikeve holê. Herêma ku ji mirovatiyê ra dergûşîtî kirî, ji ber van taybetmendiyên wê ye. Pêşvebirina çan- diniyê, jiyana gundê cîwarbûyî bi xwe re tîne, berî şoreşa bajêr şo- reşa gund tê pêkanîn. Ev şoreş di cîhana giyan û bîrûbaweriya mi- rovana de, rê li ber guherînên mezin vedike.

Xwarina pir, nifûsa zêde û qadên cîwarbûnê ku pêktên, aliyen hî- karîker ên dîroka vê herêmê ne. Hewqasî rahên xwe berdane ku hê jî çanda çandiniya neolîtîkê, di bîrûbawerî û helwesta bingehîn a mirovan de bandora xwe didomîne. Demeke dirêj çanda civaka daykanî hatiye jiyandin. Çandinî û kedîkirin esasê wê li derdora ji- nê pêşvediçe. Dîsa jiyana niştecihî jibo jinê pêdivî ye. Gihandina zarokê çanda zevî û hevşî, herî bêhtir cîwarbûyinê pêdivî dike. Ev merc rola jinê bêhtir mezin dikin, çanda xwedawendê pêktînin. Da- werên xwedayî yên pêşî ne bi şêweya mêr bi ya jinê ne. Di damez- raka zimên de damezraka mê serdest e. Xwedawendên jin ên pêşî bi stêrkan dihatin dawerkirin ku bi “stêrk” binavdikirin, ji vê demê maye. Peyva “star” ji “istark” dertê. Perestgehên pêşî jî li gundan tên avakirin. Ev di bennayiyan de tên çespandin.

Derdora Rihayê, di derawaya navenda herî mezin a vê şoreşê de ye. Ji BZ 10 000 salan ve, derawaya wê bikêrhatî ya jibo çandinî û ajaldarî, wê di van serdemên dîrokê de di derawaya dergûştiyê de dihêle. Bi sedan girên axê û şikeftên derdora çeman, hêz û berfira- hiya cîwarbûyine nîşan dide. Li ti deverên cîhanê yên din, cîwarbû- yinê bi vî rengî nayên dîtin. Dikare were gotin ku Riha û derdora wê, navendên neolîtîkê yên ku 10 000 salan domandin e. Çawa ku Ewropa navenda

serdema sazûmana kapîtalîst e, -ev jî encex diçe 500 salan-jiyana mirovatiyê ya herî domdirêj ku li vê xakê derbas- bûyî, jibo dîroka wê ya şûnde jî, dewsên ku neyên nûhandin dihê- le. Dîroka Misir û Sumer jî, niçikên xwezayî yen vê dîrokê ne. Piştî ku mirovatî li vir cîwarbûyinê, bi zanistî û teknîkê çandinî û ajalda- riyê, bi hêza bîrdoziyî û rêveberiyê tecrûbê distîne, ber bi jêr ve berbi axa berhemdar a lewe ve diçe û li peravên çeman nîştecîh di- be. Çiqas ku bennayinên şûnwamasî derdikevin holê, teçespandin ku çavkaniya çanda Misir û Sumer jî ev der in. Heçku şoreşa çan- diniyê yê ne li çolên Afrîka û Erebîstan pêşvebiçe. Ji aliyê din ve li cîhên çeman ê bi lewe, çanda rîwek û ajalan a ku cîwarbûyinê bide destpêkirin tine. Ev rasteqînî nîşan dide bê çima serdema ku dîrok daye destpêkirin, li korta Dîcle û Ferad a jorîn, bitaybetî Riha û der- dora wê pekhatiye.

Heger ku pedivî be careke din were vegotin, Ev serdem serde- ma çandinî, kedîkirin, bidarkirin, avakirina gundan, çêkirina pe- restgeh û bicîhkirina yekem dawera xwedayî ya li ezman e. Ev serdem şahidê civaka daykanî ya li dora jinê û zayîna çanda xwe- dawendê ya bihêz e. Bandora vê serdemê hê jî li ser tevaya mi- rovatiyê didomîne. Çanda çandinî, ajaldarî û ya dayîktiyê li kû- derê û çiqasî bibandor be, dexma cîhê orîjînal ku ev çand lê pêk- hatî hildigire, li ser dewsa vê şoreşa pêşî ya dîrokê ku pêl bi pel li her alî belav dibe, pêktê.

Jiberku Rihayê weke herêmekê navendî ji vê serdemê re kiriye, pêdivî dike ku em hinek têgînan bi giraniya wan vekin. Heger ku em têgînên dîrok, pîrozwerî û nalet bi awayek rast dahûrînin, emê bigihîjine ronahiya bîrûbaweriya ku pedivî ye bibe bingeha Rone- sansa Rojhilata Navîn. Weke ku me nîşan da, dîrok li Sumer, li Mis- rê destpêdike, lebelê Misir û Sumer jî piştî şoreşa çandinî ya vê erd- nîgariye destpêdikin. Piştî ku ev navendên şaristaniyê pêkhatin, weke işaretên şaristaniyê yên pêşî, rê û karwan di navbera vê herê- mê û van navendên bajaran de dixebitin. Hemû teknîk û ramanên ku rê li ber şaristaniyê vedikin, di van rêyan re pêşî ber bi Sumer û Misrê û dû re jî gav bi gav ber bi Bakur, Rojhilat û Rojava ve be- lav dibin. Hemû çespînên dîrokê nîşan didin ku, dema ku em BZ 10 000 salan bigeh bigirin, bi navberên 1000-2000salan ji vê herêmê ber bi çar aliyan ve belavbûn û cîgeyîbûn

pêkhatiye. Piştî Çanda Tel Khalaf a BZ di salên 6000an de destpêdike ku serdema çandinî ya herî gihîştî û birêxistin bi 2000 salan, nûka birhanên şaristaniya Sumer û Misrê xuya dikin. BZ salên 4000-3 OOOan demên ku Sumer û dû re jî Misir derketine holê ne. Hemû nirx û çandên şaristaniyê ji Mezopotamya Jorîn, ji qewsên hundirê sîstema Toros-Zaxrosan ber bi vira ve tên kişandin. Li Sumer şoreş û şaristaniya bajêr a ku BZ di salên 3000an de bilind dibe, piştî nêzîkî hezar salî, mêtinge- hên xwe yên pêşî ango Ûrên xwe (Ûr= bajarên ku li ser girikan ha- tin avakirin) ber bi Mezopotamya Jorîn, ber bi "Welatê Bilind" be- lavdike. Riha, Haran, Kargamiş û Samsat, navendên mêtingeh ên ku di dîrokê de yekem ten zanîn in. Riha bixwe li ser gire û li qira- xa avê ye. Gola Xelîl Relnnan ji vê kaniyê ye. Av û rehmet ten he- man vateyê. Di navbera wan de wekehevî heye. Herwiha ji serde- ma gund derbasî serdema bajêr tê kirin. Herwiha dîroka Rihayê ya nivîskî BZ di salên 2000an de destpêdike û heta bi roja me tê. Êdî piştî vê dîrok dikare hêsantir were kronolojîkirin. Ango li gor beşa dem dikare were peytandin. Hê hêsantir dikare were ravekirin bê dem bi dem çi îfade dike.

Dîrok di destpêka xwe de veşartiye. Zanîna dirokê ya kesên ku destpêk venekirine, bingeha nezanîna ku sedema hemû karesatan e. Dergûştiya ji mirovatiyê re ne tiştekî hêsan e ku bavêjin pişt guhên xwe. Kîjan mirov dikare bibêje ez di dergûşê de nehatime mezinkirin? Heger dibêjin na, wê hingê dergûştî neyê fêhmkirin û mafê wê neyê dayin, wî çaxî rastî û nirxê mirovatiyê jî nayê fêhm kirin. Dayîkek ê te bi hezar salan di dergûşê de mezin bike û tê bibêje "ev ne rabirduya min e. Ez nirxekî civaka biçîn ê ku li bajaran pêkhatî me, tenê ev min têkildar dike." Wê hingê ev ê ne dîroka mirovatiyê be, yê dîroka çîn be. Dema dergûştiyê ne te- nê dema girî û memikê ye. Dema ziman û ramanê pêşî, meşa pêşî, naskirina xweza û civakê ye. Demeke ku bi paqijiya xwe, bêperçiqandin, bêkedxwarî, bêdizî û tenê bi keda xwe dijîn û bi vî awayî pêkhatiye. Mîsoger e ku di erdnîgariya me de dîrokê wi- ha destpêkiriye û derûna wê bi vî rengî ye.

Herwiha ev yek rast e ku, mirovatiya nirxên bingehîn wergirti- ne, em ji dergûştiya xwe bidin destpêkirin. Ev yek di cîh de ye ku, bingeha

mirovatiyê bi me re ye û pêdiviye ji vê yekê guman neyên kirin. Dîroka çînan vê dawiyê hatiye nivîsandin. Li ser navên ke- san, xanedanan û nasnameyên xwedayî dîrok hatine nivîsandin. Ev dîrok ji dêvla rastiyan ve dîrokên ku çiqas çûye bêhtir derewan tê de cîh girtine. Pênebaweriya me bi vê dîrokê, ji ber rêzdariya me ya ji dîroka rast re ye. Dema ku Riha û dîrok tên hevberkirin, ev ras- teqînî û nakokî hîkarîker û hişyarkerin. Li Riha û derdoren wê hê jî du dîrok ten bikaranîn. Yek jê dîroka ku mirovên rast bi keda xwe afirandine û ya din, dîroka sexte ya yên ku hatine bi derewan û bi pêkutiyan di ser van nirxên afirandî de danîne. Ev herêm herî bêh- tir ji ber vê nakokiya dîrokê mêjiyê xwe venake. Lewra bi civaka biçîn mêjiyê wî hatiye rûgirtin û kilsînîbûn. Heta ev neyê vekirin, em kiryara têgihîştinê nikarin bidin xebitandin.

Dema em bibêjin Riha, têgîneke din ku pêwîst e were vekirin, ‘pîrozwerî’ ye. Pîrozwerî çiye? Têkiliya wê ya bi vir re çawa çêbû- ye? Çavkaniya me dîsa Sumer e. Ev peyv ji peyva Sumerî ‘kauta’ (kûtsal) te û vateya wê ‘xwarin’ e. Xwarin, her tiştê ku ji çandinî û ajaldarî tê bidestxistin e. Xwarin ji destpêka mirovatiyê ve, timî bi awayek sêrker hatiye pêşwazîkirin. Lewra mirovatî bi wê jiyana xwe berdewam dike. Li gor ku tiştekî din ji jiyanê binirxtir tine, tiş- tekî ji xwarinê ku jiyanê gengaz dike jî binirxtir tine. Her tiştê ku ji mirovatiyê re binirx, tên bilindkirin, tabûkirin, xwdayîkirin, ango ten pîrozwerkirin. Pîrozwerî nasnameya tiştên ku mirovatiyê dom- dar dikin e. Jiber ku xwarin di domdariya mirovatiyê de herî hêja ye, pîrozwerbûna wê xweş tê fêhmkirin. Li vira jî bilhnetiya Sumer ev xweş peytandiye û ev nav lêkiriye.

Li Riha û derdora wê pîrozwerî dîlîneke berfireh e. Her alî bi pî- rozweriyan tije ne. Ev mijar tê vê vateyê: Ji her aliyên herêmê xwa- rin dipijiqin. Li vê dere dîroka xwarinê veşartiye. Veşartî, lêbelê ji ber girîngiya xwe di hişê mirovan de gefeke ku neyê jibîrkirin û dewseke neyê nûhandin hiştî ye. Dîroka xwarinan, derûna têgîna ‘Riha ya pîroz’ e. Bi van xwarinan ne tenê mirovên herêmê, tevaya mirovatiyê xweyî bû. Hê jî xweyî dibin. Niha jî kî dikare dev ji xwarinên genim, ceh, garis (gilgil), nîsk, tirî, hejîr ûwd. Berde? Tiş- tên ku sumeriyan bi pîrozweriyê re yek girtine, xwedayî kirine û cejna wan çêkirine ev

xwarin in. Ev dîroka wan a veşartiye. Di bin- geha xwarinê de çi heye? Ked heye, keda dayîkê heye. Afirînera wê, dahênera wê û gihînera wê ew e. Kî dizane dema ku simbilên pêşî dane hev, çiqasî kêfa wê hatiye? Çawa kêfa wê neyê? Mirovatî tenê bi vê xwarinê nijada xwe didomîne. Kar û çalakiyeke ji vê he- jatir heye? Ma karê şer û êşkenceyan ê li vira hebe? Ew tenê bi hil- berandinê re tekildar dibe, wê nas dike, mirovatiye bi wê dide do- mandin. Mirovatiyê jî wiha felnn dike. Mirovatiya dayîkê, mirova- tiya jinê tê vê vateyê. Ev tegihîneke mirovatiyê ye ku tê vateya mi- rovatiya pîroz. Sumerî rast dinirxînin. Amûrên bingehîn ku xwarin bi wan tê bidestxistin jî pîroz in. Tevrik, halet, bivir, ga, ganêr ûwd.. jî pîrozwer in. Her yekî xwedayekî wan jî heye. Hemû xwarin û tiş- tên ku xwarin bi wan tê bidestxistin, ax, hewa, baran, roj, ba û ajal, an bi serê xwe tên xwedayîkirin, an jî bi xwedayekî ten temsîlkirin.

Têgîna me ya pîrozweriyê timî berfireh dibe. Lewra mirovatî bi rê û rebazên gihandina van xwarinan tê mezinkirin, pêşvebirin û domkirin. Hêsan nebûye ku ji mirovê doh ê nêçîrvan û komker (ber- hevker) derbasî mirovê hilberîner bibe. Ev şoreşeke derasayî û sêr- ker e. Ev rasteqînî te pîrozkirin û xwedayîkirin. Di bingeha xweda- yîkirinê dexwarina ku tê vateya pîrozweriyê heye. Xwedayên xwa- rinan ji ber sûdmendiya wan, xwedayên ku mirov nasname dane wan e. Weke dostên wan nasnameyên ku herî nêzîkî wan e. Dema xwedawendên ku mirovan naperçiqînin, dibin xwarin û xwe pêşkêşî mirovan dikin û dema xwedayên ku tînin cîhanê û xweyî dikin e. Pî- rozwerî taybehnindiya van xwedayan e. Ango pîrozwerî pêşkêşî ras- tiya xwarinên bingehîn dikin. Derew û çewsana van xwedayan tine ye. Dayîka van xwedayan jî dayîka xwedawend e. Dîrok û rastiya

xwedayan ev e. Bi awayek vekirî, ya ku di bingeha wê de keda mirov heyî, ya ku hewceyiyen jêneger pektîne, ji xwarinên pîrozwer re dibe nasname û vateya wiha qezenckirin, xwedayên pîroz in. Jiber- ku derdora Rihayê bi van pîrozweriyan tije ye, wiha tê dîtin ku bi xwedayiyan jî tije ye. Riha ya pîroz bixwe wiha ye.

Vê dawiye êdî sumeriyan ev xweda standin. Di perestgeha rahî- ban de anîne rewşa xwedayen civaka biçîn. Kişandin ezmên, ne fêlnnbar kirin. Kirine rewşa xwedayên ku ledixin, ciza dikin û to- fanê tînin. Evan çîna bilind dibin bixwe ne. Ev xwe xwedakirina çî- nê ye. Ev rewş yekem car rasthatina hişmendiya mirov û dîrokê ya li dagirkerî û li destdirêjaya mezin e. Destpêka ku derew, pêkutî û qedera ne baş tevna xwe vedidin ne. Detpêka ku derew û zilm tên xwedakirin e. Heçku xwedayên dayîka xwedawend li ber serê wê bûn. Dost û hilberîner bûn. Bi derew û pêkutiyê qet nizanîbûn. Di perestgehên rahîban de, bi vê şêweyê him jî bi awayek nivîskî, xwedayên derewker û cizaker afirandin û berdane ezmên. Edî pişt re bilind û hey bilind kirin. Hatin mezinkirin nodûneh nav lê kirin. Çîna efendiyan a ku mezin dibe, ciza dike, kedê dixwe, bêyî kar bi- ke xesp dike, bi vî rengî hat xwedakirin. Rahîbên Sumer ev kar bi awayek gelek vekirî pêkanîn. Ango jibo karê ku dikin em fêhm bi- kin, felsefe û zanista ku seriyan tevlîhev dike bikameanîn, bi awa- yek mîtolojîk û peyvkî pêkanîn. Edî vê dawiyê çiqas ku çîna ser- dest bisazî bû, çiqas ku gotin cîhan a min e, xwedayên wan jî gihan pênasiya ku bibêjin ‘em ji mêjîn hatin, diçin abadîn’. Lewra efendî mîsoger û rastiya herî mezin in. Eynî mîna ku xwedayên wan jî mî- soger û rastiya herî mezin bin. Weke ku xwe wiha bikin û li koley- en xwe ferz bikin.

Helwesta Hz Brahhnê ku weke ji Rihayê te zanîn, a li hember vê derewa zordar a mezin, bivate û bi naveroka pîrozwer e. Brahhn di- bêje: “Ev pût nabin xweda, yê herî mezin yê herî bingeha wan e”. Dema ku Nemrûd dibêje “Na”, Ew jî ve yekê dibêje, “Wê hinge min pût neşikandin, pûtê mezin şikandin.” Herwiha Nemrûd têxe xefikê. Ev şer bîrdoziyî ye. Di navbera sazûmana xwedayê gel û sa- zûmana koledar a sazûmana xwedayên Nemrûd de, levdan heye.

Yek xwedayê Brahîm, hebûn û yekîtiya gel, ya rastir yekîtiya qebî- leyê

û hebûna wê îfade dike.

Rizgarbûna ji pûtkirinê, li hember hêza derewên vekirî helwes- tek e. Têgîneke xwedê ya neberbiçav û gelemperî kirî, jibo wê de- mê gelekî sosret, pêkhêner û pêşveber e. Pîrozwerî dikeve rewşeke bêhtir ne yekser. Weke taybebnendiyeke xwedê, qada pîrozweriyê tê tengkirin. Lêbelê dîsa di bingeha wê de yekîtiya gel û hêza wî he- ye. Ev pîrozweriyên Rihayê yên di qonaxa duyem de û pêngava wê ya li hember xwedakirinên çînî, bi 'Pîrozweriya Brahîmî', pîrozwe- riya pêxemberî tê binavkirin. Li gor dema xwe pîrozweriyeke berx- wedanvan û pêşverû ye.

Ev, di şerê xwedayan de rawestaneke bêhtir nêzîkî rastiyê ye. Di bingeha ku Riha heta weke îro bi navê diyarê pêxemberan te bi bî- ranîn de, dîsa pîrozweriya xwarin û kedê û peyva pîrozweriyê ku pê tê binavkirin, heye. Gotina Riha ya pîroz, 'diyarê pexemberan Ri- ha', tê vateya Riha ya bi sazûmana xwarina çandinî ve girêdayî. Navlêkirina 'Riha ya diyarê pêxemberan', jiber ku navenda miro- vên sazûmana xwedayî ya gel temsîl dikine û li hember sazûmana xwedayên Nemrûd a derewker serî hildidin e.

Herwiha dîrok û pirozwerî li dora Rihayê bi vî rengî ye. Gelo tê- gîna din a girîng. 'nalet' çiye? Têgîneke kilît jî nalet bixwe ye. Da- hûrandina Rihayê bi dahûrandina naletê ve ji nêzîk ve girêdayî ye.

Ji her tiştê ku dîroka rast û pîrozweriyê xiradike re, nalet tê go- tin. Nalet hêrîşa zordest û derewker e. Dema naletiyê, bi hêrîşên zordest û derewkeran ku li ked û xwediyên kedê dikin, dest pêdike. Ji yên ku hêrîşî hemû berhemên kedê, gundan, bajaran, zeviyan û perestgehan dikin re, naletî tê gotin. Ev rewş ji nêzîk ve bi derbas- bûyina civaka biçîn ve girêdayî ye. Mirovatî, hemû çalakiyên da- girkerî, cizaker, talan, şewat û rûxandin, zordarî û derewan ku heta weke wê demê nebûye şahid, binalet tîne zimên. Diyar e ku nalet îfadeya berevajî pîrozweriyê ye. Li derdora Rihayê bi bilindbûna civaka biçîn re, di naletbûnê de jî teqîn çêdibe. Lewra çiqas ku di- çe berhemên kedê zêde dibin û dewlemendî çêdibe. Herwiha çînçî- nîbûn û hêrîş ê di nava hev de pêkwerin. Ev herêm ê careke din se- rê xwe ji hêrîşker, dagirker û talankeran rizgar neke. Nalet ê tevni- ka xwe li serê wî bihone. Cîhê

toreya pîroz û cejnan trajedî digire. Cejnên pîrozweriyê xiradibin, dema trajedî, giryanok û awazên ku naletiyê rê li ber wan vekirî, destpedike.

Li derdora Rihayê pêşî muzîka olî, awazên pîrozwerî derbasdar bûn. Heta ku weke di cîhanê de navenda mûzîka olî ya pêşî were binavkirin, di cîh de ye. Demeke dirêj jî wiha berdewam kiriye. Lê- belê dema ku serdema naletiyê destpêkir, vê muzîkê cîhê xwe da destan, giryanok û awazan. Pêvajoya ku dibêjin dîlokên Rihayê, destpêkir. Di bin dîlokan de, muzîka pîrozweriyê heye. Di bin vê de jî, şoreşa çandinî û ajaldarî ya yekem car mirovan derfet dîtine ku nijada xwe di nava ewlekariyê de bidomînin, heye. Di çanda Riha- yê ya bi bingeh de, bingeheke muzîkê ya wiha heye. Dema ku mi- rov hêza bidestxistina xwarina ewlekar qezenc bike, bikêf dibe, di- be deng û dîlok derdikeve holê. Pêşî ji pîrozwerî û xwedayên xwe re muzîkê çêdike. Pişt re bi awazan bersivê dide yên binalet. Dîlo- kên xemgîn û bieş jî, tevlî dîroka muzîkê dibin.

Bi van têgînên bingeh re, gengaz e ku gelek têgînên çandî werin zêdekirin. Rehmet, ziyaret, sebir, çêr, dia, leheng, perestîş, cejn, xi- zimtî, şeytantî, perestgeh ûwd. Çanda şoreşa çandinî û ajaldariyê kûr e. Li hemû parzemînan di hemû deman de, bandor li mirovati- yê kiriye.

Em dizanin ku sumeriyan, ji vî gelê ku ev serdem afirandî re, bi vateya haletvan ‘Aryen’, bi vateya yen ji welatê bilind ‘Ûrartû’, bi vateya yên ku biçêlek, ga û dewarên xwe re hereket dikin, ‘Gûtî’ gotine. Ev hemû bi tegînkirin ji aliyê sumeriyan ve hatine kirin û gelê li Mezopotamya Jorîn îfade dikin. Di dîrokê de ev çand, bi na- vê Çanda Îndo-Ewropî yan jî bi vateyeke tengtir, bi ‘Çanda Aryen’ tê binavkirin. Ev çand, heta BZ 4000an ji peravên Okyanûsa Me- zin, ji Çînê heta bi Okyanûsa Atlas, heta bi sînorê Ewropa yê dawî, belav bû ye.

Ev belavbûna çanda Aryen, bi kolanên şûnwamasî jî tê çespan- din ku ji yek navendê derketiye. Tê çavdêrîkirin ku dîroka bajarbûn û çînçînîbûnê, bi sumeriyan ve girêdayî, bi şêweyeke berevajî BZ di salên 2000an de bandorker dibe. Piştî wê, pêvajoya dîroka ni- vîskî destpedike. Lêbelê ya herî rast û dîroka herî kûr, serdema çan- dinî ya ku 10 000 salan domandî û beriya wê serdema danehevê ku bi sedhezar salan domandiye. Dîroka nivîskî nûye û bi giranî bi na- veroka çîn e. Ev dîrokeke ku rastiyan bi awayek girîng dişewşîne, bilindbûna serdestan a

siyasî û bîrdoziyî pîrozwer dike, dîroka na- letêye ku pîrozweriya rast û dîrokê xiradike.

BZ di serê salên 2000an de, li bakurê Babîl asûriyên ji binyata Amorît, weke qewmê çalak ê bazirganiya Mezopotamya Jorîn û Anatolya, bilind dibin. Di navbera Mezopotamya Jêrîn ku bajarvanî pêşketî û Mezopotamya Jorîn ku çandinî û kankerî pêşketî û Anatol- ya de, Asûrî bi rêya bazirganiyê pir xurt dibin. Asûrî ji BZ 1300an heta bi BZ dawiya 600an, hêza serdestî siyaset û bazirganiyê ne.

Riha li vê navenda çandinî û bazirganiyê çiqas ku diçe girîngiyê qezenc dike. Di dema hûriyên ji binyata çanda aryanên çandiyar û kanker û dewama wan mîtaniyan de, hinek deman Riha, rola pay- textê dilîze. Di navbera asûrî û hûriyan de dest diguhere. Dibe na- vendeke herî girîng a mîtaniyan. Di dema ûrartûyan de jî vê girîngi- ya xwe berdewam dike. Di navbera hûrî, hîtît û asûriyan de li lev- dan û destguhertinan rast tê. Piştî medan dikeve bin destê persan. Di dema Skender de, helenan nas dike. Ji BZ salên lOOan pêde dikeve bin destê Roma. Dîsa di ve demê de dibe navenda Dewleta Abgar a ji binyata Aryen û Asûr. Bi bîzansên ku ketin dewsa Roma re, bi lev- danên bi sasaniyan re destguhertin berdewam dikin. Dibe cîhekî ku xiristiyantî di nava asûriyan, ennenan û kurdan de peşvediçe.

Me berî anîbû zimên ku Riha, BZ di salên 1800an de bûbû na- venda tevgerên di pêşevaniya pêxemberan de. Bitaybetî li hember qeranen bi nave Nemrûd ên ji binyata Asûr, kevneşopiya pêxembe- ran ku berxwedana qebîleyên cîgeyî temsîl dikin, bi Hz Brahhn re demeke dîrokî didin destpêkirin. Ev kevneşopî, di derûna xwe de kevneşopiya berxwedana gel û qebîleyan a ku li hember sazûmana koledar azadiya xwe biparêzin e. Veguherîna bîrdoziyî ya ji totem- tiya qebîleyê ber bi yek xwedayî, ji mîtolojiya Sumer jî bandor di- gire û bi şêweya olên yek xweda peresînê nîşan dide. Esasê wê pê-

xember afirîner û nûnerên vê pêvajoya peresîna dîrokî ne. Aliyekî azadî yê beşkî heye. Derketina wan vebizava li çînçînîbûnê ye. Di şêwegirtina bîrdoziyî ya dema navbera organîzasyona dewletê û re-veberiyên qebîleyan ên jevbelavbûyî de, bandora sereke dilîzin. Di derketina hêzên nû ya holê de, bandora vê kevneşopiye mezin e. Qerantiya Îbranî ya pêşî ku BZ di sala lOOOan de hatî damezrandin, encama vê bandorê ye. Ev kevneşopiya ku bi Tewratê hatiye rewşa pirtûka pîroz, dawî bi Ehda Kevin gelekî pêşvediçe. Esasê wê hewl dide ku li hember Misir û Sumer tevgerên qebîleyan ên bêserûber, dîsîplîne bike. Di bandora mîtolojiyên Sumer û Misrê de ye. Van çandan li gor damezraka qebîleyan li veguherînê rastdike. îsrael bi Mûsa, ber bi olê qewm peresînê didomîne. Cihûtiya ku bi Hz îsa re bi awaya çînî dabeş bûye, bi Tewrat û Incîl an jî bi Ehda Nî û ya Kevin dibe du beş. Ehda kevin pirtûka olê qewmê Cihû ye, Ehda Nû ku Incîlê weke pirtûka hemû mirovên bindest te birêkûpêkirin û angaştê qezenc dike. Riha vê demê dibe navenda Xiristiyaniyê.

Tê fehmkirin ku ev tevgera bîrdoziyî ya li derdora Rihayê dest-pêkirî, ji weke tê gumankirin gelekî kûrtir e. Di vê yekê de derawa- ya wê rola girîng dilîze. Jiberku ji Misir, Asûr û Hîtît di heman dû- rayiyê de ye, di derawayeke terazê de ye û dorhêleke hîn azad dijî. Nûnerên navendên hnperetoriyan, li hember gelê xwecîhî zêde ne hezdar in. Di ve vateyê de Riha, piştî BZ 2000an, rola navendeke bîrdoziyî ya girîng dilîze. Damezraka gel jî bingeheke zexm pêş- kêşî vê yekê dike. Him qebîleyên Amorît û him jî yên Aryen di na- va hev de dijîn. Iro jî ev damezraka demografîk berdewam dike. Tê peytandin ku li başûrê wê Ereb û li bakurê wê Kurd, ji 5000 salan ve ev tevgera nifûsê didomîne. Vê dawiyê Tirk û Ennen jî, tevlî vê damezraka demografîk dibin.

Him ji aliyê erdnîgarî ve, him demografîk û him jî ji aliyê aborî û bazirganî ve, dibe navendeke gelekî cidî. Li hember sê navendên mezin ên koledar, ango Anatolya, Misir û Sumer, di rewşa zemîna tevgera nû ya bîrdoziyî û siyasî de ye. Vê reseniya xwe jî, di bin na- vê ‘Diyarê Pêxemberan Riha ya Pîroz’ de, dide pêşandan. Vebiza- va hemû gelên derdor ya li hember koledariyê, di vê derketina bîr- doziyî de, rê li ber dengvedaneke xurt vedike. Bi awayek lezgîn gir- seyî dibe, tê rewşa

tevgereke siyasî. Di derketina holê ya dewletên pîleya duyem de, rola girîng dilîze. Car caran dibe navenda dewle- tan. Vê derawaya xwe heta bi serê sedsala 20an didomîne.

Piştî xiristiyaniyê, PZ di salên 640an de îslamtiyê nasdike. Îslamtî di dema feodal de, tevkariyê li çanda bajêr a bazirgan û pî- şekariya ku bi bazirganiyê hêz qezenckirî û mezin bûyî, dike. Li derdor, rêyên bazirganiyê yên bakur-başûr û yên rojhilat- rojava, pir çalak in. Çalakiya çandinî û ajaldarî ya ji hezar salan ve, gengaz dike ku weke navendeke bihêz derawaya xwe bidomîne. Bi îslam- tiyê re, rola wê ya navendî bi zêdebûn berdewam dike. Heta PZ sa- la lOOOan di bin destê ereban de dimîne. Di navbera PZ 990- 1080an de di keve bin destê kurdên Merwanî. Pişt re dikeve bin destê Artukoglu yên ji binyata Tirk, di salên

1200an de dikeve bin destê xanedaniya Eyûbiyên Kurd û piştî 1500an jî dikeve bin destê osmaniyan. Weke gel Kurd li plana pêş in, suryaniyên bennayiyên Asûr, Ennen, Ereb û Tirk jî tên rewşa gelên cîwarbûyî. Di rewşa navendeke çandên hemû olan û damez- rakên hindikayî de, damezrakeke kozmopolît pêşandan dike. Tê çavdêrîkirin ku, çandek bi serê xwe ne serdest û piranîparêziya çandî bi demên herî kevin ve girêdayî ye. Bi gelemperî pîrozweri- ya wê di her demê de derbasdar e. Weke hatî ravekirin, ev yek ji- berku navenda şoreşa çandinî û bîrdoziya pêxembertiyê ye.

Ev vegotina kin jî nîşan dide ku, Riha û derdora wê xwedî dîro- keke tevlîhev e. Çanda hindikayî û olî ketiye nava hev û di derûna xwe de, çandeke bi aborî û bazirganiyê ve girêdayî serdest e. Li qa- dên gundewarî yên fireh sazûmana eşîrtî yên çandiyar û koçber ku hinekî bi bazirganiyê dilebikin serdest in. Li navenda bajêr, nifûse- ke bi damezraka hindikayî ku bi bazirganiyê re têkildar serdest in. Ev rewşa ku dişibe taybetiyên bajarên Sumer, heta bi roja îroyîn bandorker dibe. Herêmeke ku Nemrûdên serdestên dema koledari- ye û serdestên dema feodaliyê yên weke mîr, beg û efendî, pirr nas- kirine. Bûyera ku bi manciînîqê davêjin êgir a ji dema Nemrûd mayî, pêwîst e weke dawereke vî şerê bîrdoziyî û aborî were fêhm- kirin. Jibo Riha ya ku bi pîrozwerî û naletiya xwe hatî sedsala 20an, têgînên nû yên vegotinê ne pêdivî ne. Lêbelê veguherîna herî hîka- rîker, di navbera nalet û pîrozweriyê de

derbasbûye.

Hê jî di çanda Rihayê de ya ku jibo pîrozweriyê li ber xwe dide, tê fêlnnkirin ku xiyaneta herî mezin pîrozweriye dîtiye. Zordariya koledar û feodal û sazûmana derewker, nava pîrozweriyê valakiri- ne. Ev têgîna mezin û bi vateya bêhampa barkirî, li dagirkeriya bi- naletên ku rewişta wan a serdest û kedxwar timî pêşvediçe, rastha- tiye. Rewşeke ku berevajîkirî derketiye holê. Naveroka pîrozweri- yê weke naletî te dexmekirin û naletiyên rast jî kemna pîrozweriyê dikişînin ser xwe. Xwediyên kedê dixin derawaya naletiyan, pey- hatiyên Nemrûdan jî xwe bi postikê pîrozweriyê ve dizeliqînin. Na- va bajêr û hevkarên wan ên derve, bi hezaran sal in ku li hember nirxên pîrozweriyê û xwediyên wê, hevgirtineke xayîn pêkanîne. Pêwîst e ev hevgirtin baş were dahûrandin. Heta ku ev hevgirtin ne- yê dahûrandin, gengaz nabe ku Riha û derdora xwe bi mirovatiya xwe ya bişeml, bi hemû pîrozweriyên xwe, bi pexemberên xwe û şopînerên wan re bigihe hev.

Dijminên pîrozweriyê, di bin postikê pîrozweriyê de li hember ked û gelan, di nava xiyaneteke çawa de ne? Ji dema sumeriyan ve ev lîstik çawa berdewam dike? Me xwest em birhanên vê nîşan bi- din. Ev kesên xayîn ên ku çiqa diçe marjînal dibin e. Xiyanetê him li hember komên gel ên hindikayî ango kedkaran û him jî li hember çanda ku bi pîrozweriyê barkirî dikin. Hêza wan hemû, hevkariya ku bi navendên koledar re dikin e, rêbazên pêkutî û êşkenceyê ne, gefa ku bi mencenîqê bavêjin êgir e. Vê hêzê ji valakima bîrdoziya derûn û ku şêweya xwe derbasî seriyan dikin, distînin. Têkiliya van qet ne bi olê dayîka xwedawend û ne jî bi yê Brahhn re heye. 01 qet nasna- kin. Evan ol anîne rewşa amûrekî tirsandinê. Ji rahîbên Sumer xeter- tir li pey xwedayên sexte ne. Herî bêhtir navê ol û xwedê tînin ser zi- mên. Bi vê yekê dixwazin xiyaneta xwe ya dîrokî veşêrin.

Têkiliya Riha ya bi ol re, bi serê xwe divê ku bibe mijara lêkolî- nê. Pêwîst e ez vê yekê bi rihetî diyar bikim: Rastiyên pîroz hewqasî li xiyanetê rast hatine ku pêwîst e ev bajarê oldar ji oldarên sexte were paqijkirin. Pêwîst e bibêjin xiyaneta hevqasî ya li ol bes e. Pê- wîst e dawî li sazûmana rahîbên Sumer were kirin. Ev qet ne girîng e ku hişmendin an na. Ev rewşeke ku qat biqat bûye. Xelekeke herî bihêz e.

Navend û hevkarên wan ên derve, bennayiyên axa, mîr, se- rek, û şêx, di vê dergûşa mirovatiyê de, weke dûpişken bijehr, jeltrê hildiberînin. Jehrdana wan êdî bes e. Digel ku ev tiştekî nadine wan mirovên rind ên herêmê û çanda wan, timî di nava mandeleyê de ne. Bi hezar salan e digel ku timî dixwin, ti tiştî nadin. Xwarinên Riha- yê yên bi çêj, timî ji navendên koledar re dikin diyarî. Edî niha bi fi- rokan ji tevaya cîhanê re jî dikin pakêt. Lêbelê Riha û derdora wê heta bi mêjiyê xwe, xizan, birçî û bêkar e. Li xaka ku di cîhanê de herî kevin û herî berhemdar, ev rewş tê jiyandin. Li cîhê ku ziman û çand lê pêşketin, ziman û çanda gel nayê nasîn û nayê îfadekirin. Lêbelê xayînên wê mîna bilbil daxivin û şampiyontiya çandî ya bê- esliyê dikin. Dengê xwedayan ê xwedawendan, muzîka wan, trajedî û awazên wan dixin rewşa malê mazatê yê erzan.

Xiyanet nepixî hey nepixî ye, dewlemend û hey dewlemend bûye. Gel xizan û bêziman ketî hey ketiye. Li derdora Rihayê ev nakokî li pîleya herî bilinde û xwedî taybetiyeke qat bi qat e. Biyanîbûna gel a li heyîna wan a derûn, di merhaleyeke herî tarî de ye. Vateya pîroz- werî û naletê ya di destpêka dîrokê de, hatiye berevajîkirin. Dîrok ne weke destpêka pêşveçûnê, li dawiya çûna berevajkî rawestiya ye. Pî- rozwerî ketiye şûna naletiyê û naletî ketiye rola pîrozweriyê. Ev na- kokî bi sedsala 20an re, yê qat bi qatir berdewam bike. Yê weke sed- saleke bi nalet, yê xwe li ser hemû çavikên jiyanê gêr bike.

Bi hilweşîna împeretoriya Osmanî ya feodal re, Tirk di bin sero- katiya Mistefa Kemal de, berê xwe dane damezrandina KT yê. Kur- dên Rihayê ev pêvajo destek kirine. Kurdan bi tevayî, weke hema- neke stratejîk tevlî şerê rizgariya neteweyî û damezrandina komarê jî bûne. Para Rihayê di vê de, bi lehengî hatiye xelatkirin. Lêbelê bi bandora serhildanan, vedana komarê ya erênî nehatiye dîtin, bloka hevkar a ji sumeriyan mayî, ji vê yekê sûd digire ji xwe re li cîh di- gere û dibîne. Berdestîkên rejhna benî ku bi nirxên komarê re ti te- kiliyên wê tinene, bi tecrûbeyên xwe yen dîrokî, beyî ku ji nirxê de-

mokratîk ê neteweyî yê di sedsala 20an de, girêdayîn û rêzdariyê nîşan bidin, weke bloka serdest xayîn a cîgeyî karê xwe meşandine. Têkiliya wan qet bi ti ronahîbûna komarê re tine. Di bin maskeya pîrozweriyê de, ji feodalîteyê jî paşdetir, bi kesayetiyeke marjînal û mandeleker şebekeya berjewendiyê, li bajêr û derve dane meşandin. Damezraka gel a hindikayî û ya civakî, veneguheriye ber bi vebûne- ke pêşketî. Kincên kevin hê bêhtir ew şidandiye. Li welatê xwarinan ketiya rewşa herî xizan. Di nava çanda herî dewlemend de, xistine valahiyeke herî kûr. Di çaryeka dawî ya sedsala 20an de, jê re bûye weke qederê ku li kevneşopiyeke pêxember a nûjenkirî rast were.

Em gihan derketina PKK a Rihayê. Bingeha PKK weke ku li Enqerê hatibe avêtin tê xuyakirin. Heçku ji neteweparêziya hemdem û sosyalîzmê pir tê behskirin. Hewl tê dayin ku weke bînaniyên xwe be. Di dawî de xwîn jî tê rijandin. Di derbarê PKK de, nirxandinên min ên berfireh çêbûne. Min hewl da ku nirxandinên dawî di dari- zandina Îmralî de bikim. Ti vateya dubareyê ya zêde tine. Lêbelê ez pirseke weke “Têkiliyeke wê ya çawa bi rasteqîniya Rihayê ya ber- biçav û dîrokî re heye?” timî ji xwe re dibêjim. Weke damezrînerê PKK, li xala herî serik a Rihayê, li bakurê wê, nêzîkî Feradê bûyina yekî weke ji gundê Amara, rê li ber bandoreke çawa vekiriye? Ya derbasdar gelo çanda gunde, ya Rihayê ye, yan jî nirxên gerdûnî ne? Weke te angaştkirin, gelo weke tevgereke hemdem biserket?

Dema ez li paş vedigerim û dinêrim, rasteqîniya ku dexma xwe li pratîka min xistî, şêweya pêxemberiyê ya hatî nûjenkirin û rojaneyîkirin, bêhtir giraniya xwe nîşan dide. Têkiliya min herwiha ya PKK bi sedsala 20an re tine. Di asta peyvê de weke ku têkiliya wê bi sedsalê re heye. Weke takekes divê bibêjim ku ez qet negihame giyan û kesayetiya sedsala 20an -heger ku hebe- min fêlnnnekiriye û ne xûnifandiye. Herwiha wê demê ez ji derawayeke ku KT, Ew- ropa û YKSS (Yekîtiya Komarên Sosyalîst ên Sovyetê), bivate bi- ke pir dûr bûm. Weke şareza tên xuyakirin. Kincên wan hatine lix- wekirin. Lêbelê diyar e ku ji giyana wan û hişmendiya wan bêxe- ber û dûr im. Ya balkêştir, cîhana feodal a ku hatî derbaskirin jî min fêhmnekiriye û nexûnifandiye.

Taybetiya wê çandê jî ti vate nedîtiye. Bi cîhana ku nû tê damezrandin re ti têkilî nayên danîn. Ji serdema feodal ku tê derbaskirin jî, min ti tişt fêlnnnekiriye. Ez zarokeke ku bi tenê mabûm. Alyê vî karî yê sosret, li nava malbatê, gund û dibistanê jî rewş bi heman rengî bû. Navê dayîk û bav ên ku hatin hînbûn, tegînên bira, jin, mêr, ma- moste û xizim, herî bêhtir weke peyvan dihatin dubarekirin. Ev der- dikeve holê: Li vê cîhanê ezê ti tiştî fêhm nekim. Ezê jibo tişta bix- wazin bidin hînkirin, behreyê nîşan nedim ku fehmbikim. Lêbelê li gorî xuyabûnê, hewl didim ku weke bînaniyên xwe bim. Ya herî baş çi be, ji wê re rêz tê girtin. Lêbelê dîsa bêparbûna ji derûn, bingeh e. Bi mebesta PKK mîna bînaniyên xwe were damezrandin û jibo kar bike, bi hewldanen pedivî tê damezrandin û tê pêşvebirin. Heta di- be rêxistineke ku di cîhanê de herî balê dikişîne. Hemû jibo xatrê sedsalê tê kirin. Dema ku kar cidî bû û giha sînore jiyanê, diyar di- bû ku ev rasteqînî yê li dijwariyên mezin rast were.

Di dawiya sedsala 20an de, her kes bi têrayî rola PKK ya xwe di- lîst. Berbiçaviyan bi hemû giraniyê xwe nîşan didan. Min careke din bi kûrayî his dikir ku dîsa bi tenê mame. Min taybetiyike zila- mê bi tenê li derî serdeman, lê ku bi hemû serdeman re ye bi lêv kir. Min diyarkir ku ev yek min fêhmkir. Ez dizanim, yên ku dikevin pêvajoya bilindbûnê, nêzîkî vê taybetiyê dibin. Çiqas ku tu ji ser- dem û dema têde dijî qut bibî, tê hewqasî dirêjî nava hemû deman bibî. Min ev yek di berbiçaviya PKK de jiya. Mîsoger e ku ev di- bistaneke erjeng e.

Li qasî nepejirandina taybetiyên wê yên cudaxwaz û alîgirê şide- tê, ez dizanim ku di vî babetî de daxwaz û meyldariyên min pêşne- ketine. Herî bêhtir ya dihat xwestin û hêvîkirin ev bû ku, hemî tişt bi awayek azad were nîqaşkirin û encama ku hatî pejirandin were sepandin. Ev yek li xweşiya min dihat. Di annanca çalakiya xe de min ev timî çavdêrî kir. Dema ku min got “Ez li berwêderekî (mu- xatab) digerim”, min ev yek nîşan dabû. Jiber rasteqîniya Tirk ku ketibû rewşeke girtî, min qet dibêtî nedida ku yê bikevin nava guf- tûgoyan. Min qet bawerî bi wan nêzîkayiyên dema Ozal û yên di pey re ku bi vî rengî, neanî. Heta were fêhmkirin, tegihîna vî aliyê
çalakiyê jî girîng e. Angaştên din ji teşeyîbûnê wêdetir rolê nalîzin.

Ez hewldaneke mezin didim ku pêvajoya Îmralî şîrove bikim. Dikare were gotin, ev dema min a bi awayek birêkûpêk ku herî kûr bû- me. Ez vê girîng dibînim ku behreya têgihîştina min pêşvediçe û ji gerdûnê heta bi kêzikekê hemû tiştî fêhmdikim. Heta min hay ji vê yekê heye ku, şerê herî mezin kûrkirina tegihînê ye û werin asteke wisa ku sazûmana di derûna her tiştî de bi yek carê fêlnnbikin. Min xwest ez vê yekê bidim PKK. Min diyar û pêşniyar kir ku, heta bi dawî tenê ne bi yekerbûna Tirkiyeyê ya siyasî û welatî, bi hemû we- lat û gelên cîran re, heger ku liqasî serê derziyê derfet hebe, yekîti- yeke ligor giyana zagonan yê ji şerê herî mezin ku were qezenckirin binixtir be û ev yek hêjayî çêtirgirtinê ye. Tenê bila herkes, hemû alî wê hêzê nîşan bidin ku bi têgînên hiqûq ên gerdûnî ve girêdayî bi- mînin. Piştî ku ev hate pêkanîn, yekîtiya bi hemû gel û welatan re, daxwaza min e. Bê dudilhnin berê xwe da vê sexbêriyê.

Ez timî baweriya xwe bi parastina rewa tînim. Ez bawer dikim ku ev zagoneke xwezayî ye. Herçiqas ku hêrîşkerî di xwezayê de hebe jî, ya bingeh zagonên hebûnan ên çêbûna xwezayî ne. Paras- tina rewa tê vê vateyê. Bêguman di vê vateyê de, kesek jî li hem- ber tevaya cîhanê yê bikaribe parastina rewa bike. Ya li vir derbas- dar, ne giraniya fizîkî ya hêzên hember e, zagona di derûna pêşve- çûnê de ye. Herwiha rewşa PKK ya parastina rewa, mîsoger pedivî ye. Heta ku rê li ber sazûmana hiqûqê gerdûnî û yekîtiya azad ve- be, ez bawer dikim ku ev ji herkesî re ji hemû gelên cîran re û ji he- rêmê re pêdivî ye. Ya piştî ve yê bi helwesta dewleta têkildar ve gi- rêdayî be. Heger ku hêrîş zorê li parastina rewa bikin, ev yê rê li ber dorhêla şidetê veke. Hêrîşa li ser parastina rewa tiştekî bi dewletê nade qezenckirin. Lêbelê yê kesên di parastina rewa de hêzdar bi- ke. Sexbêriya herî rast ev e ku, derî ji demokratîkbûneke tevayî re vekirî bimîne helwestek were nîşandan ku hemû pirsgirêk bi levha- tineke demokratîk werin çareserkirin. Ev diyar e ku parastineke re- wa ya timî, ye rê li ber nexweşiyê veke û di rewşên xafil de, rew- şên fikaredar bi xwe re bîne.

Di derbarê çalakî û sepînên PKK ên dema borî de, min rexneyên xwe yên tund nîşandan. Min hewl da ku bikişînhne xêzka parasti- na rewa. Lêbelê pêwîst e diyar bikim ku li qasî daxwaza xwe ser- keftî nebûm.

Di derbarê şidetê de encama ku ez gihîştimê, heta ku berê xwe nedin mafê jiyanê û îfadeya azad a hebûnê, qet hêrîşeke hember neyê kirin û dilopek xwîn jî nerije ye. Ev pêdiviyeke felse- feya min a jiyana azad e ku hewl didim pêve girêdayî bimînim.

Heger ku mirov hişmendiya xwe winda nekin û bizanibin dersan bigirin, yê pêvajoyên veguherînê yên herî girîng, di bûyerên ku herî zor dijîn de pekbînin. Bawer dikim ku ez pêvajoyeke bi vî rengî, di nava bûyerên herî stemkar de bi salan jiyame û min pêkaniye. En- camên ku ez gihîştimê, min bi awayek berfireh di vê parêznameyê de anîn zimên. Heta bi cîhanê, Rojhilata Navîn, welat, civak û dew- letê, min dahûrandinên xwe danîn holê. Di bin ronahiya van de, ca- reke din bi nêrîna li derdora Rihayê, ez peywir dibînim ku jibo sed- sala 21an perspektîfeke pêşvebibim.

Riha dîsa bi lîstina roleke dîrokî re rûbirû ye. Dîsa pêwîst e dî- rokeke nû bide destpêkirin, pîrozwerî û naletiyê deyne cîhên ku maf dikin. Riha di berbiçaviya welêt de, di derawayeke cîhekî de ye ku kevneşopiyên feodal lê herî xurt in. Heta di damezraka bîrû- baweriya wê de, bennayiyên sazûmana Sumer ne kêm in. Li qada gundewarî, bi rejeyeke mezin bîrûbaweriyeke neolîtîk derbasdar e. Di derûna xwe de nirxdaraziyên kapîtalîst ne hatine xebitandin, bi awayek teknîkî tên xebitîn. Bi derdoren xwe re, weke welatekî di nava welêt de ye. Di damezraka wê ya hindikayî çandî de, piranî- parêzî hebûna xwe didomîne. Weke mînakeke piçûk a mozaîka ge- lê Rojhilata Navîn e. Di gelemperiya cîhanê de Rojhilata Navîn çi îfade dike, di nava gelemperiya Rojhilata Navîn de jî Riha, wê gi- rîngiyê û cihî îfade dike. Mijara ku em dibêjin di dîrokê de lîstina heman rolê, ev e. Bi Pêşnûma ya PBA (Pêşnûma ya Başûrêrojhila- ta Anatolya) re, ev rola wê ya girîng zêdetir bû ye.

Bêguman pirsgirekên Rihayê yên aborî, civakî, û çandî hene. Lê- belê pirsgirêka wê ya derûn ne ji van mijaran tê. Pirsgirêka bingeh di derbarê qada bîrdoziyî de ye. Di damezraka wê ya bîrûbawerî de, taybetiyên kevneperest ên herî kûr ku bandorê li tevaya welat dike, serdest in. Di vê vateyê de, ne tenê kevneperestiyên feodal, kevne- perestiyên ku ji hêzên serdest ên hemû serdeman mîrate mane ber-

dewam dike û li derdora xwe jî belav dike. Ji aliyê têgihîna bîrdo- ziyî û siyasetê ve, ji komara laîk û demokratîk re girtiye. Heta ku ev bîrûbawerî û têgihîna siyasî neyê derbaskirin, li derdora PBA ye, kevneperestiyeke pêşdetir ê derkeve holê. Encamên ku ev derîne holê, yê li qasî mînaka PKK girîng be.

Berî her tiştî, pêwîst e têkoşîna nasnameya bîrdoziyî bête meşan- din. Şoreşa bîrûbawerî pêwîst e ku peywira herî di serî de be. Gi- rîngiya vê di kûştinên toreyî de derdikeve holê. Heger helwesta ji- nekê ku pêwîst e mafe wê yê herî xwezayî be, ji aliyê malbatê ve bi kûştinê were biryardan, li wê derê rewşeke pir xetemak heye. Te- nê ne ji aliyê bêpariya azadî û mafê jiyanê ve, jiber dudiliya kevne- perestiya herî giran ku li nava civakê belav dike, nahêle potansiya- la herêmê derbasî jiyanê bibe. Di rewşeke ji hezaran nijdevanên se- rê çiyê xetertir de dihêle. Kevneperestî beguman hêza xwe ji raste- qîniya çina serdest û kedxwar a ku hezar salan berdewam kirî, di- gire. Têkiliyen kapîtalîst ku yên ji nû ve peşbikevin, ji afirandina bandora ku jeveke bêhtir, ê di bingeha ku bêhtir hişk bike de bikar- bîne. Tecrûbeya dîrokî ya di vî alî de, hêzeke mezin dide.

Destekariya ku di asta bîrdoziyî de li herêmê were kirin, pêwîst e di nava pîvanên demokratîk de be. Pêdivî ye herêm di Ronesansekê re were derbaskirin. Jibo Rihayê ti tişt ji demokratikbûnê ne hêjatir e. Li qasî PBA yê, hewceyiya wê bi pêşnûmayeke demokratîkbûnê heye. Pêwîst e were zanîn ku, ev ne yê bi tevgereke ku ji civaka kevin we- re û ne jî bi destekariyên dewletê yê were meşandin. Bêguman dew- let û civak ranawestin. Yê rola xwe di pêşveçûnan de bilîzin. Lêbelê ya herî pêdivî, pêşnûmayeke civaka şarwer a berfireh e. Li hember dewlet û civakê, lêbelê bêlevdan, heger derfet hebe bi piştgiriya hev, rêxistinên civaka şarwer ku bi azadî werin pêşvebirin, yê bikaribin ro- la şoreşa demokratîk bi serkeftin bînin cîh. Rêxistinên civaka şarwer ku li her qadê û li gor hewceyiyan hatin damezrandin, yê bîrûbaweri- ya kevneperest bişkînin. Dema ev yek were pêkanîn, tevgera ronahi- yê ya mêjîyên ku tiyên azadiyê, yê lezîneke mezin qezenc bike.

Eslê wê, taybetiyên ji sazûmana daykanî mayin ên di bîrûbawe- riya gelê herêmê de û pîrozweriyên ji çanda pêxemberan mayin ku bi

pîvanên hemdem ên demokratîkbûnê re bibine yek, ê şoreşeke tevayî ya ronahîbûnê pêkwere. Jiberku ev yekbûn ê bandorê li sinc jî bike, yê şens bide pêngava hêza helwesta azad. Ji ber vê yekê, hişmendiya dîrokê ya rast û bi terayî, zanistîtî, felsefeya diyalektîk û perwerdeya di derbarê takekesîtiyê de, girîngiyeke mezin e. Pê- wîst e bi annanca perwerdeyê gelek komel vebin. Jibo gel di der- barê huner de jî, pêngavek pêwîst e. Heta ku bandora hunera heyî ya bêesilker û tevzîner neyê şikandin, ronahîbûn û azadbûna giyan û hiş gengaz nabe. Nîqaşeke di derbarê dîroka vê derdorê, huner û seresazî û binesaziyên civakê de, yê encamên sûdmend bide. Di derbare bîrûbaweriyê de, hewceyî bi pêngaveke Brahhnî ya nûjen- kirî heye. Pûtên niha hê bêhtirin û he bêhtir bi awayek hişk hatine rûniştandin. Serî û dil şehitandine. Herwiha bi kesayetiya Hz Bra- hhn, pêwîst e em tevir (rnenewî, ramanî) bi şideh lêbixin. Rêzdari- ya ol a rast û giredana bi nirxên pîroz ve, bersivdana pêngaveke bi vî rengî pêwîst dike. Soreşeke şikandina pûtên nû, yê jibo Rihayê bibe Ronesanseke rast.

Demokratîkirina siyasetê, di nirxê gava duyemîn ê girîng de ye. Bi taybetî hewceyî bi tevgereke partîbûna demokratîk heye. Bi rê- xistineke bihêman, xwedî kadroyên bi terayî, azweriyî demokratîk- bûnê, xwedî bawerî û hişmendî, yê bikaribe pêşevaniyê ji civaka şarwer re bike. Komelên mafên mirovan, malên azad ên jinê, ko- melên ciwanan ên ku werin damezrandin, ê pêşiyê li demokratîk- bûnê vekin. Di van rexistinan de, yên ku nirxên mezin bi hişmen- diya demokratîk û girîngiya sazîbûnê didin, pêwîst e peywirdar bi- bin. Yên ku bawerî û hewldanên wan ne bi têrayî, ev kar nayên me- şandin. Ti xebat, ji xebatên demokratîk ên derdora Rihayê binirxtir nabin.

Hinek ji rêxistinên aborî û civakî jî girîngiyê hildigirin. Jibo gel saziyên tenduristiyê yên erzan, koperatîfên berxwarinê, çend cotge- hên hilberînê yên mînak û dalanên spor û perwerdeyê jî, rêxistinên ku rola erênî bilîzin in. Bitaybetî di qada hiqûqê mafe mirovan de, pêdivî bi nûneriyên hiqûq ên ku heta bi gund û taxan belavbûyî he- ye. Bi hindikayî li qasî hişmendiya dîrokê, xebateke ku rê li ber hiş- mendiya hiqûq veke, jiyanî ye. Saziyên civakên şarwer ên bi vî rengî ku hê jî werin vekirin, yê zorê li dewlet û civakê jî bikin, ji- bo ku paş de nemînin

pêwîst bikin ku gavan bavêjin. Heger tevge- reke civaka şarwer a bi vî rengî biserbikeve, Riha yê di dîroka xwe de tevkariyekê li ronahîbûneke rast û rêveberiya demokratîk bike. Bi binesaziya teknîk a ku pêşvediçe re, ev veavabûnên bîrdoziyî û civaka şarwer, dikarin Rihayê ji aliyê siyasî, aborî û civakî ve, bi- xin rewşa hêzeke pêşevaniyê. Bi axa xwe ya dewlemend, ê rê li ber dewlemendiyeke mezin veke. Bêkarî, xizanî, nexweşî ye ji qeder- bûnê derkevin. Ê bibe xwedî roleke li qasî welatekî Eropa yê nav- çe yan jî welatekî Rojhilata Navîn. Rihayeke demokratîk ku Ji her komên hindikayiyên Rojhilata Navîn a Demokratîk weke çîçekan lê vebin, bi xweşbîniyeke mezin nezîkî hev bibin, li ser navê miro- vatiyê jî yê bibe qezenceke mezin. Di vê bingehê de, yê vateyeke rast bi pîrozweriya pêxemberan were dayin, ê bibe cîhekî kişîner û cîhê heceke duyemîn. Yê dema Riha ya demokratîk a Rojhilata Na- vîn a Demokratîk ku herî bêhtir hêzê bide, destpêbike.

Ji diyarê êşên mezin, ji bûyerên herî qehrker ku ez û PKK jiya- ne dersên derandin û di derbarê Doza Rihayê, darizandin û daraza wê de, encamên ez gihîştimê ev in.

Baweriya min mîsoger e ku, daraza dîrokê yê bibe fîhilbûn (be- raet), qedera welat û gelê min jî yê bibe serfiraziya demokrasiyê.

***10 Tîrmeh 2001***
***Abdullah OCALAN***
***Îmralî***

# Rojaneyîkirina Kevneşopiya Hz Brahîm Tê Çi Wateyê?

Derdora Rihayê bi gelemperî weke kevneşopiya pêxemberan û bi taybetî weke cîhê ku kevneşopiya Hz Brahîm lê çêbûyî tê pîrozkirin. Sedema bingeh a di bin vê çêbûnê de ev e ku, çandinî, koçberî û yekem car civaka bajêr di nava hev de, herî sift û bi şe- weyeke herî berhemdar, li vê erdnîgariyê hatiye pêkanîn. Riha di derawaya navenda serdema neolîtîk de ye. Dema em derdorên wê jî tevlî bikin, hê jî bi sedan girên bilind ên ku cîhên cîwarbûnên ne- olîtîkê û hê nehatine kolan, vê rasteqîniyê diçespînin. Qada herî berhemdar a di navbera Torosan, Dîcle û Ferad de, Deşta Rihayê ye. Ev berhemdarî di wergiriya cîhanê de ye û ev taybetiya wê hê jî berdewam dike. Bi vê ve girêdayî koçberî, damezrakeke civakê ya din e ku di navbera çiya û deştê de pêşveçûye. Koçberî û cîwar- bûna gund, ji demên dîrokê yên herî kevin ve, di nava hev de ne. Diçe heta bi BZ salên 10 OOOan.

Damezrandina Rihayê ya weke bajar, bi şêweya mêtingeheke Sumer e. Peyva ‘Ur’ bi Sumerî tê vateya bajarê ku li ser gir hatî avakirin. Li derî Mezopotamya Jêrîn, mêtingehên Sumer ên pêşî, li dora Rihayê tên çêkirin. Riha weke navendê, Haran, Samsat û Kar- gamiş herêmê dorpêç dikin. Ber bi Bz 2000an, li derî Sumer naven- da duyemîn a herî girîng Riha û derdora wê ye. Qada bingeh a be- lavbûnê ye. Weke derdor û mêtingehê, bi qerantiyên Sumer ên ba- jêr ve girêdayî ne. Cudahiya damezraka hindikayî, berxwedaneke li hember serdestiya Sumer jênerev dike. Şaristaniya Sumer, şarista- niyeke ku yekem car civaka biçîn lê pêşveçûye û pêl bi pêl li hawir belavbûye. Damezraka civaka çandinî û koçber a wekhevparêz û azad, bi hêsanî ji vê çînçînîbûnê re serî danayne. Lêbelê rewişta ba- jarîbûnê ya pêşverû, di dema dirêj de yê serdestbûna wê jênerev bi- ke. Herwiha ezmûnên sumeriyan ên mêtingehkimê yên

pêşî, ji BZ 2000an pêde, berxwedanên hişk jî bi xwe re tîne.

Li herêmê, komên Aryen ên ku civaka çandiniyê pêkanîn û ko- mên Semîtîk ên koçber, di nava hev de û li hember hev in. Di nav- bera wan de têkiliyên bazirganî ên sift pêktên. Aryenî herî bêhtir li bakur, rojhilat û rojavayê herêmê bicîh bûne, lê komên Semîtîk li başûrê herêmê diçin û tên. Bajarê Rihayê di nîvê wan de hatiye ava- kirin. Vê çawaniya xwe niha jî diparêze. Her wiha Riha weke bajar û derdor, BZ di salên 2000an de ji aliyê çandinî, bazirganî, pîşekarî û ajaldarî ve, gihaye derawayeke îdeal. Piştî Mezopotamya Jêrîn, ketiye rewşa metropola duyemîn a herî mezin. Erdnîgariyeke ku pir geş, ji guherînan re vekirî, civakên gund, bajêr û koçber di nav hev de vedihewîne, du gelên mezin Aryen û Semîtîk bi hev re dijîn, di derawaya welatekî nû de ye. Ev taybetî pir girîng in û pêwîst e çan- da xwe ya resen bafirîne. Di ve de hewqasî demg namîne. Herî bêh- tir di bingeha parastina li hember rêveberiya mêtingeh a Sumer de, ev çanda ku yê pêşkeve, yê berxwedêr, cîgeyî û taybetiyên hindika- yiyên cuda hilgire. Herwiha kevneşopiya Hz Brahhn, ango çanda wî, van taybetiyan bi awayek hîkarîker nîşan dide.

Çanda Hz Brahhn, li hember Nemrûdên ku qeranên bajarên Su- mer bûn, berxwedan û cudayetiyê temsîl dike. Çîrokên binavûdeng ên şikandina pûtan û avêtina êgir, vegotina dawerî ya vê berxweda- nê ye, Rasteqînî hê bêhtir tevlîhev û domdirêj e. Heta bi roja îroyîn tê. Ev çand, li hember rêveberên Sumer ên di derûna xwe de kole- darên hişk ku xwe xweda-qeran îlankirin, berxwedana gelê herêmê ya li hember mêtinkeriya koledarî û baweriyeke xwedê ya mirovatî û bi berjewendiyên wan re ahengdar, bingeh digire, diyar dike ku mirov herwiha qeran nabin xweda. Vê demê ji totemtiya qebîleyê nûka derbasî ramana xwedê ya hildikeve dibin. Di vê de bandora mîtolojiya Sumer jî girîng e.Totemtiya kevin a hoveber, ango dûr- ketina ji têgihîna ku her qebîle heta her malbatek xwedî totemek be, hemû qebîle derbasî têgihîna yek xwedayî, ango li dora xwedayê mezin “El” bigihin hev, pêşveçûneke ku ji yekîtiyê re suxreyê bike û li gor berjewendiyên wan e. Tewhîda ku ji Hz Brahîm re dikin mal, ango têgihîna olê yek xweda, vê pêvajoyê îfade dike. Bi ge- lemperî saziya pêxemberî, vateya nûsaziya olî vedihewîne. Di wan dîrokan de, ev nûsaziyeke olî gelekî

bivate, heta şoreşeke. Pêxem- bertî, di vê rewşê de him li hember çanda Sumer a xweda-qeran, him jî li hember têgihîna ol ê totemperestiya qebîle ya kevin, tê va- teya saziya ku çand olê nû pêktîne û encamên wê di dîrokê de pir bandorker dibin. Riha û derdora wê ku ji vê sazîbûnê re navendiyê dike, ji ber taybetiyên wê yen ku hildigire ye. kûrahiya diyarê pê- xemberan Riha ya pîroz a dîrokî, heta bi van rastiyan diçe. Rewşên mandele û naletiyê ku vê dawiyê pêşveçûyin, cemserê dij ê pêşve- çûna diyalektîkê tîne holê.

Çanda Pêxembertiyê, berevajî ku tê gumankirin, ne ji Erebîstanê tê. Ev rasteqîniyeke dîrokî ye ku, Riha û derdora wê, saziyên ba- werî yên Sumer û neolîtîkê di nûsaziyê re derbas dike û vediguhe- rîne, ji BZ salên 2000an pêde, li her alî di vê navberê de li nîvgira- va Erebistanê jî belav dike. Bi vê vateyê ve girêdayiye ku Riha di- yarê pêxemberan e. Ev li gor dema xwe ronesansek e. Ji dêvla ku perestinê ji beniyan û pûtan re bikin, li gor dema xwe girêdana bi xwedayekî wekhevparêz ku aliyê wî yê azadî heyî ve, gaveke ber- bipêş, dîrokî û bivate ye. Demeke nû vedibe. Li herêmê ne tenê Brahîm, Îdrîs, Eyûb, Yûnis û Nûh hê gelekî berê gavên ku ev kev- neşopî pekanî avêtine. Evan herî bêhtir, li hember koletiya Babîl, Asûr û Sumer, weke kesayetiyên zanyarên gel in. Ligor dema xwe tekoşîna çînî didin meşandin, azadiya qebîleyên hindikayî ku nef- sek ji yê wêne temsîl dikin. Ji merhaleyên dîrokî dikare were behs- kirin. Jiberku Hz Brahîm kalikê herî mezin ê vê kevneşopiyê ye, ev yek merhaleya ku pêvajo diyar dibe û bandorkerdibe, nîşan dide, serkeftin û bandorkeriya berxwedanê îfade dike.

Cîhgirtina wê ya hevqasî di hişê mirovan de, jiber tevkarî û gi- rîngiya ku daye rûmeta mirovatiyê ye. Dema berê tegihîna xweda- qeranan û kolebûna teqez a mirovan derbasdar e. Şikandina vê bî- rûbawerî û dîlbûnê, gava şoreşgerî ya demê herî mezin e. Şikandi- na pûtan, tê vateya ku derbeya pêşî ya herî bandorker û serkeftî, li sazûmana koledar a bêhampa tê dayin. Pêxemberî, kevneşopiya vê pêvajoyê an jî îfadeya wê ya rêxistinî ye. Gavên di pey re, mezin- kirina olê yekxweda, pêşvebirina çawaniyên wî û cîgeyîkirina wî ye. Pêvajoyeke ku di her çandê de tê jiyandin, di kevneşopiya Bra- hîmî de jî tê jiyandin. Çûyina Brahîm a diyarê Kenan, îsrael û Fi- listîna îro, him

jiber pekutiyên zêde dibin û him jî jiber bazirgani- ya zêde dibe ye. Bi vê pêvajoya ku BZ di salên 1700an de hatiye ji- yandin re, pêxemberî li Erebistanê belav dibe. Gelek qebîleyên ji binyata Aryen, Horît, Semîtîk û Amorît, di nava tevgereke bi vî rengî de ne. Di navbera şaristaniyên Sumer û Misrê de bazirganiyê dikin, dema fersendê dibînin begîtiyên piçûk dadimezrînin. Ev rewş hewcebûna serokên cîgeyî û bîrdoziyê nîşan dide. Peydakiri- na hewceyiya herî gelemper, bi nasnameya bîrdoziya nû ya ku bi “El” tê îfadekirin û ber bi ole yekxweda ve diçe, tê pêkanîn.

Qebîleyên ku Hz Brahîm serokatiya wan dike, di nava pêvajoye- ke ku 400 salan didomîne, diçin heta bi Misrê, hewldidin ku weke karkerên Îbranî (peyva Îbranî ji vateya abirû ango zilamê çolê yê bitoz, di zimanê Misrê de ‘zilamên qilêrî bi toz’ e.) yên xizan cîwar- bibin. Jiber astengiyên ku zêde dibin û jiber ku arîkariyê didin ser- hildanekê, di dawiya BZ salên

1300an de, di bin serokatiya Hz Mûsa de derketina Misrê ya dî- rokî pêktînin. Ev derketina ku 40 salan didomîne, bi cîwarbûna li cîhê îsrael a îro bi encam dibe. Bi qebîleyên cîgeyî re weke îro di- kevin nava levdanekê bişidet, heta ku nîştecîh dibin. Mûsa, kevne- şopiya olê yek xweda bi ‘Deh Fennan’ ên binavûdeng û girîng, tî- ne qonaxeke nû. Dawûd û Silêman, di BZ salên lOOOan de, vê kev- neşopiyê digihînin qerantiyê. Hz Mûsa yekem car olê yek xweda neteweyî kiriye û di rola pêxember de ye. Qewmê Cihû di bingeha kevneşopiya vî olî de dike yek. Damezrakên qebîleyên ji hev bela-

wela ku bi hêsanî bi navendî nedibûn, bi xwedayê ku herî mezin dikin bi “Yehuda” yê ku “El” ditirsîne û wan digihîne hev.

Ev çalakî jî yê di dîrokê de encamên mezin bafirîne. Bi taybetî li dora Qudsê, piştî Rihayê yê navendeke pêxemberiyê ya duyem we- re pêşvebirin. Bajarê Qudsê ku ew bixwe tê vateya pîrozweriyê, de- rûna xwe ji çanda Rihayê digire. Lêbelê veguherînê dijî û di cîwar- bûnê de biserdikeve. Çêbûna qerantiya pêşî, cudahiya serdestî û bindestiyê bi xwe re tîne. Beşek ji cihûyan dewlemend dibin û di- gihîjin pêşgoyiya fennî, beşa xizan tên vederkirin û li wan tê ferz- kirin ku terîqetên dijber damezrînin. Di vê pêvajoyê de Hz îsa, Ji terîqeta Essenî ya ku xizanan temsîl dike bandor digire, bi pîrozki- rina Hz Yehya pêngava xwe ya ku tê zanîn pêktîne. Ev pêvajoya ku tê vateya zayînê, ango Mîlad, di dîroka olan de ji merhaleya qewm û qebîleyan, qevastina merhaleya gerdûnî îfade dike.

Hz îsa di dîroka olan de, yekem car veqetîna qebîle, qewm û çîn nake û bi tegihîna sêbareya xwedê, demeke nû mizgîn dide. Herî bêhtir di nava beşên xizan de deng dide. Felsefeya Grek û yekîtiya Roma ya siyasî, jibo vê yekê dorhêla ramanî û daringî ya pêdivî, ji mêj ve afirandine. Bi awayek berbiçav Hz îsa dibe sembol û xiris- tiyantî ji van hersê çavkaniyan xweyî dibe, weke olê nû pêşveçûne- ke mezin nîşan dide. Hevqas bandorkeriya wî, ji ber van mercên bi- kêrhatî ye. Dibe pêngaveke ku herî bêhtir bandorê li dîroka cîhanê dike. Di çêbûna wijdanê mirovatiyê de, cîhe îsa gelekî mezin e. Berî ku li çarsingê were dayin, tê zanîn ku vexwendî Rihayê kiri- ne. Lêbelê ew jibo ku sextekariyen pêşgoyên fennî yên Cihû derxe holê, bi zanîn yê bimeşe Qudsê. Heger ev meş nebûna, dikare bi ri- hetî were gotin ku meşa dîrokê yê bi awayek din bûna. Derûna bin- geh a olê îsa, bi wijdan ve girêdayî ye. Armanc dike ku, mirovati- ya bindest û ya di nava êşê de jibîmeke, wan bîne cem hev û bigi- hîne azadiyê. Dema ku BZ di salên 400an de dibe olê fennî yê Bî- zans, xiristiyantî vateyeke berevajî qezenc dike û yê suxreyê bike ku bindestan bi dewletê ve girêbide. Pêşverûtiya wê ber bi hêlên dûr ve diçe û li navendên şaristanî û dewletê paşverû dibe.

Pêngava sêyem ya kevneşopiya Brahîm a cîgeyîbûn û veguherînê ku

ji çavkaniya Rihayê, li Mekke û derdora wê tê avêtin. Ev pênga- va ku Hz Mihemed davêje, bi du şêweyên olên yek xweda yên pêşî, bi cihûtî û xiristiyantiya ku di nûsaziyeke hişk re derbasdike, pêktî- ne. Qada sêyemîn a pîrozweriyê li Mekke û derdora wê çêdibe. Berî vê, Mekke û perestgeha wê Kabe ji 360 pûtan re navendiyê dike. Tê- kiliya wan bi olê yek xweda re qet tinebû. Jiyana olekî bi totemtiyê re tevlîhev û gelekî hoveber, dabaşa xeberdanê ye. Bi Hz Mihemed, navenda sêyem û pêvajoyeke dîrokî ya nû destpêdike. Hz Mihemed vê yekê bingeh digire ku, qebîleyên Ereb ên ji binyata Semîtîk ku paşdemayî, li dora têgîna 'Xwedayê yek û yê bê hevpar' bike yek. Bazirganiya zêde dibe, li derdor Imperetoriyên Bîzans, Hebeşîstan û Sasanî yên bihêz, yekîtî û bihêzbûna qebîleyên ereban ferz dike. îsla- miyeta weke nasnameya nû, berhemeke vê hewceyiyê ye.

Têgîne xwedê, jibo ku taybetiyên jiyana qebîleyan ên belavbûyî û dijî navendbûnê derbasbikin û bigihîjin çalakî û hêza navendî, ferz dike ku bi pûtebêdayin û kûrayî were pêşvebirin. Hostatiya Hz Mihemed an jî pêxemberiya wî di dîtina vê hewceyiyê û pêkanîna wê de ye. Hewqasî kûr û pêngavavêje ku, bi lezgîniyeke di cîhanê de mînakê wên nebin, rê li ber pêkhatina serdema feodal vedike. Herwiha pêngava herî mezin a serdema navîn tê avêtin.

Hz Mihemed bixwe îlan dike ku serdema pêxembertiye bi dawî bûye. Agahiyê dide ku serdema aqil hêzdar bûye û mirovatî gihîş- tiye. Pêxembertî, kesayetiyên serok ê merhaleya ku herî bêhtir riz- gariyê ji hêza xwedayî, ji ol hêvî dike, îfade dike. Pêşveçûna felse- fe û zanistê, xwedanasiyê dixe plana duyemîn. Şêweya ramana olî, herî bêhtir şêweya ramana serdema koledarî û ya serdema feodal e. Derketina felsefeyê ya holê, dide çespandin ku di dîrokê de ev dem hatiye derbaskirin. Hz Mihemed, pêxemberê ku herî bêhtir bal da- ye şîroveya aqlî ya ol e. Bi vê rewşa xwe, aliyen ol yên lawaz xweş dizane. Ji zoriya pratîka xwe derdixe ku êdî bi wehiyan mirov têr nabin. Bi vê pratîka xwe bandeva dawî ya ramana ol e. Piştî wê ke- tin û serdema aqil e.

Mixabin zanistên îslamê ev rastî ne lipeytandine. Rewişta nûsa- zîparêziya di olê Mihemed de ku Mihemed bixwe jî nûsazîparêzekî ol bû, nedîtine û ev yek domdar nekirine. Berevajî vê di ola îslamê de, rê

li ber kevneperestiya herî mezin vekirine. Hê di mirina Hz Mihemed de, kevneperestiya ku destpêkirî, di nava pêvajoyeke çend sed salan de, li goristana Rojhilata Navîn ketiye dema paşde- çûyina herî kûr. Pêşveçûna mirovatiyê ya 15 000 salan, êdî dest bi çûyineke berjêr dike. Piştî aloziya PZ 800-1200an, ketina paş, qey- ran û jevketin çiqas ku diçe lezgîn dibe. Şaristaniya ku bilind dibe, li parzemîna Ewropa, bi zanista ezmûnî destpêkeke nû pêktîne.

Bi gelemperî Mezopotamya, bi taybetî dîroka Riha û derdora wê, di nava vê çarçovê de pîrozweriya xwe ya kevin winda dike û li naletîbûnê rast tê. Diyarê Pêxemberên pîroz, êdî ketiye dema ta- rîtî û qambostbûnê. Dîrokeke bêesilbûn û paşdeçûyinê ya biêş lêbe- lê rast, weke ku qeder be tevnika xwe vedide. Çand û xaka ku tev- kariya herî mezin li şaristaniya cîhanê kiriye, ji aliyê xwediyê wê yên nû ve, li pey hev li xiyanetan rast tê.

Pêla xiyanetê ya pêşî, bi xanedaniyen emewî û ebasiyan herêm vegirtiye. Dogmeyeke olî ya nava wê vala û axatiya şer ku ji zore- ke vekirî pêde ti nirxên wê yê hêmanî tine, mîna dûpişk herêm da- ye ber xwe. Pêvajoyên vegirtinê yên pişt re jî, bi heman şêweyî ji dubarekirineke xirabtir wêdetir naçe. Riha û bajarên mîna wê, ji Nemrûdên Misir û Asûr bi hezar caran xerabtir, bi Nemrûdên nû ti- je dibin. Kuklayên ji pûtan xirabtir yê derdor dagirin. Dema feoda- liyê, seranser û bi kûrayî yê rola ku hişmendiya mirovan tarî bike û wijdanê wan kor bike bilîze. Êdî Mînakeke serdema “Lanetkirina Agade” tê jiyandin. Awaz, giryanok, waweylê û hemû dîlok, êşên ku ev naletî derdixe holê tînine zimên. Ê taca mandele û naletiyê bikişînine serê kevneşopî û pîrozweriya Brahîm.

Bi vî aliyê xwe çanda serdest a feodal, ji çanda mirovatiya pîroz tolê digire. Çespîna herî hîkarîker ev e ku, lêgerîna jinekê li jiyana azad ya herî piçûk, weke sûcê herî giran tê dîtin, qaşo bi biryara meclisa malbatê, bi awayek hovane serê keçikên 15 salî diteqînin. Qaşo namûsa ku di mêr de sift bûyî, di derûnê de bênamûsiya herî mezin e, azadiya zayend a herî pilûç (jirêketî) jibo xwe weke maf dibîne, lêbelê jibo jinê lêgerîna azadiyê tawanbariya herî mezin e.

Ev çêbûneke ku gelemperiyê dawer dike ye. Eslê wê di tevaya ji- yanê

de, ev rasteqîniya binalet tê jiyandin. Herkes divê ku îsot û dî- lokên Rihayê veke. Derûna wê di vê rasteqîniyê de ye. Hezar sal in ev qemûşkgirtina paşverû, bi kemna kapîtalîzma sedsala 20an, herî bêhtir giran bûye. Bi zewaceke qirêj a kapîtalîzm û feodalîzmê, dixwazin ku rewşeke ji nav neyê derketin derxin holê.

Heçku dema ev kemna paşverû were tevdan, ê were dîtin ku di bin de di her xaleke wê de, mirovateiyeke rast dinive. Du rûyên ma- dalyon ên bi vî rengî hene. Di rûyekî wî de mandelekirina hemû nirxên nijad, veavabûnên binalet ên ku bi ruxandin û rizîbûna wê ve girêdayî, bîrûbawerî, giyan û sazî, di rûyê din de hê di kûrtir de, nirxên mirovatî, bîrûbawerî û giyana rast sazîbûna di pîroziya pê- xember de. Em bi diyalektîkeke dîrokî ya gelekî zor, biêş, tevlîhev, lêbelê rast û ligor xwe re rûbirû ne. Pirsgirêka herî bingeh ku pê- wîst e were çareserkirin, ev girêdanên diyalektîkê ne. Rêya vê yek e. Ew jî bi hemû nazikiya xwe di zanistiyê re derbas dibe.

PKK di berbiçaviya Rihayê de, belkî bi kûrayî hay jê nebû û ne di wê hişmendiyê de bû, ketiye vê ezmûnê. Ev rasteqîniyeke neyê nîqaşkirine ku, mebesta wê ber bi azadî û ronahiyê ye. Çalakiyên wê yên pêşî ku ne li hember saziyên komarê, li hember feodalên paşverû tên kirin, vê yekê rast derdixe.

Bi vî aliyê xwe, gelo PKK tevgereke Brahîmî ya hemdem e? We- ke mebestê, şibandinê hîkarîker nîşan didin. Bi vê ya ku diçe ser dorhêla binalet û Nemrûdan, tenê ne li ser navê neteweyetî û de- mokratî, jibo mirovatiyê jî gaveke pêşverû ye. Ev berevajî komar- parêziyê nabe. Pêdiviyeke wê ya xwezayî ye. Pêwîst e ku komar antî-feodal be. Heger bixwaze ku weke sextekar neyê nirxandin, bi rastî bixwaze bi rewişta laîk û demokratîk pêşvebiçe, dikare were gotin ku PKK û KT gihane hevgirtineke xwezayî. Hevgirtina Tirk û Kurd a ku di 1920an de bi awayek berbiçav û bi bawerî hatî da- mezrandin, li dora Dîlûk, Riha û Mereş(Girgum) xwedî vateyeke bi vî rengî ye. Ev hevgirtin xwedî derûneke biratiyê ya ji hemdemî û azadiyê re vekiriye. Ji ber sedema serhildanên dawî û neteweperes- tiya zêdekar, nexebitandina hiqûqê biratiyê, bêşensiyeke mezin e.

Ev pêşîlêgirtina pêşveçûna pêvajoyeke dîrokî ya gelekî girîng e, ji- bo feodalîzinê şensekî jiyanê ye.

PKK bi vî aliyê xwe, li rewişta komarê ya biratî û azadiyê dige- re. Bê vê bi çiqas hostatiya hişmendî û siyasetê dike, aliyê wê yê herî were rexnekirine. Lêbelê bi tevaya derûna wê ku cudaxwaz tê dîtin, nirxandineke pir zêdekar e. PKK ev yek weke dirûşmekê he- ta bi mêjiyê xwe jî pejirandiye ku, heger azadî nebe yekîtî jî nabe. Lêbelê gotina ku ew di bin her mercî de dewleteke Kurd a netewe- perest dixwaze, mîsoger nayê pejirandin. Kêmasî û çewtiya wê ev e ku, rexistinbûnek û çalakiyeke ligor yekîtiya azad, di xêzkeke rast de bi hostayî pêşve nebiriye. Derfetên vê yekê hebûn. Bêyî ku xwe li şideteke zêdeyî parastina rewa biqewimîne, di vê rêya rast de ji- bo komara laîk û demokratîk, belkî suxreya herî mezin yê tevgera herî cidî be. PKK encex di vê xalê de dikare were rexnekirin û ta- wanbarkirin. Naxwe weke mebest, hewldan û fedekarî, ji bi Riha û derdora wê ya sedsala 20an, tevgera rast a pîrozwer e.

Li ser navê PKK mijarên ku min di parêznameya gelemper de anîne zimên, dubare nakim. Ez diyar dikim ku ev jibo Rihayê jî derbasdar in.

Ji aliyê Riha û derdorên wê ve, ya girîg ev e ku, di sedsala 21an de, gelo yê pîrozweriya Brahîm bibe destpêk an na. Ev yek hê gi- rîngtir e ku, veguherîna PKK jiyayî gelo jibo vê peywirê, hişmendî û wijdan pêkaniye an na. Pêdivî ye ez vê yekê birihetî diyarbikim ku, PKK bi navê xwe û nasnameya xwe ya kevin, li herêmê vê ve- guherînê careke din pêşan nade. Ev yek ji aliyê dîrokê ve jî ne bi- vate ye. Bi heman rihetiyê pêwîst e ez vê jî diyar bikim ku, KT jî bi têgihînên kevin, bi hevgirtinên bi feodaliyê re xwe li herêmê re- wa nake. Komar encex karibe bi yekîtiya jidil ku 1920an bi giyana vegera rizgariya neteweyî bi hev re hatî pêkanîn û xebatbariyeke hemdem bi komarê bide qezenckirin, ê vê rewabûnê pêkbîne. Bi ki- şandina damazraka feodal a sedsala 21an û bi qedexekirina îfadeya çandî, encex jibo cudaxwaziyê zemîn were amadekirin. Yekîtiyeke xurt, di berjewendiyên hevpar û azadiyê re derbasdibe. Ev raste- qînî, dikare ji êşên çaryeka sedsala dawî, yekîtiyeke biratî derxe ho- lê. Şideta hember, guman û mandelekirin, ji jelrrdana dorhêlê û rê- vekirina li ber pêlên şideta nû û

wêdetir encaman nade.

Weke li gelemperiya Rojhilata Navîn û Tirkiyeyê heyî, Riha û derdora wê ku cîhekî herî girînge, encex pîvanên şaristaniya demokratîk bipejirîne, demborîna xwe bi van pîvanan geş bike û ji nû ve û bi azadî bikeve pêvajoya zayînê. Dema ku bi demokratîkbûna gelemperî re di nava girêdaneke hişk de were hereketkirin, dikare bibe xwedî roleke ku hêjayî dîrokê be. Herikandina Feradê ya deşt û beriyan, jibo pêngava şaristaniya nû zemîneke daringî ya bihêz pêktîne. Hê ji niha de naskirina teknolojiya pêşketî, di rêya şarista- niya demokratîk de, gaveke mezin îfade dike. Astengiya herî girîng a di pêşya pêşveçûnê de, Bîrûbaweriya feodal û komar û saziyên ku negihîştine xebatbariyeke demokratîk in.

Di dema pêşya me de dema PKK xwe nû bike, vê yekê encex bi derbaskirina kêmasî û çewtiyan pêkbîne. Pêwîst e ku PKK xwe li sazîbûneke demokratîk û zagonî biguncîne. Bi pêşnûmayeke çiva- ka şarwer a wergirî, dikare tevkariyekê him li aştiyê him jî li demokratîkbûnê bike.

Ji bo derdora Rihayê, pêşnûmayên civakên şarwer xwedî girîngiyeke jiyanî ne. Bi têgihînên dewlet û civakên klasîk pêşveçûn li dera han, encex bikaribin ji paşverûtî û kevneperestiyê re suxre were kirin. Hisdike bila civak bi tevayî bikeve bin fennana dewletê û hisdike bi- la dawlet bi her tiştî xwe ve bikeve suxreya civakê, ev şêwe fersenda zêde nade pêşveçûn û veguherînan. Lewra rêbazeke ku ji înisiyatîfa takekesî bêpar û bi civakên şarwer ên hemdem ve negirêdayî, ne afi- rîner e. Şêweya rantperest timî têgihîneke siyasî di dewrê de dihêle. Rantperestî jixwe berevajî hilberînerî û afirîneriyê ye. Gelek saziyên civaka şarwer ên bi koordîne ku li qadên civakî yên altematîf, li dora programeke resen birexistin bûbin û bi têgihîneke xebata rast hereket bikin, dikarin herêmê bêxin pêvajoya demokratîkbûnê. Jibo PBA (Projeya Başurêrojhilat a Anadolê) pêşketina daringî ya pêdivî, encex bi pêşnûmayeke demokrasî ya bi vî rengî bigihîje wateyeke rast. De- mokrasî û pêşketina daringî mîna goşt û neynûkê bi hev ve girêdayî ne, heke ku bi hev re pêşbikevin ê re li ber encamên bijîndartir vekin.

Herwiha dema ku em li xwe vegerin û li Rihaya dema Hz Bra- hîm

binêrin, em di roja xwe de çi dibînin?

Çûyina Hz Brahhn a ber bi diyarê Kenan, ji pêşveçûneke dîrokî ya mezin re bûye destpêk. Di çanda pêxember de olê yek xweda û bawerû û cîhana sinc a bi xwedê ve girêdayî derandine holê. Di vê bingehê de bandor li dîroka tevaya mirovatiyê hatiye kirin. Mirova- tiya ku li dora Rihayê zayî, bu gerdûnîbûnê çespandiye ku layîqî vê ye. Niha herî li paş bi awayek li naletê rasthatî radiweste û bi rone- sanseke nû bi zayînê re rûbirû ye. PKK peywirên ku dewletê bicîh nanîn girtin ser milên xwe û xwest ku vê rolê bilîze. Encex nayê go- tin ku bitemamî serkeftî bûye. Serkeftin encex dema ku xebatbari- yeke bi rastî bi hemanên komara demokratîk were qezenckirin û di nava aştiyê de bi giyaneke biratî were hereketkirin ê were, bi hewl- daneke hevpar ê were afirandin. Pêwîst e ku hevgirtina yekem û bingeh di vê çarçovê de û bi girêdaneke jidil a bi bîranînên 1920an ve, di navbera gelê Kurd û Tirk de careke din were pêkanîn. Hev- girtineke bi yekîtiya azad ve girêdayî ku azadiya îfadeya heyînên çandî bingeh digire, yê hevgirtineke bingehîn û bencam be.

Bala qada navneteweyî jî, jibo herêmê çiqas diçe zêde dibe. Şî- rovekirina vê yekê ya bitemamî bi annanca mêtingehiyê herçiqas çewt be jî, qet nayê jibîrkirin ku ji dema sumeriyan ve mêtingehka- riyek timî di nava pêşveçûnê de ye. Bala navneteweyî encex bi pî- vana nirxên şaristaniya demokratîk werin pejirandin, bi hevparî û piştgiriyê yê rast be. Herwiha çespandina ku Riha û derdora wê yê bibin cîhê şaristaniyeke raserî neteweyan, ê hêjayî dîroka wê be. Bi vê annancê xwedîlêderketina mîrateya herêma ku şaristanî weli- dandî ye. Yê rê li ber derketina şaristaniyeke nû veke û di zemîna xwe de careke din pêşveçûnên ku Rojhilata Navîn bixe bin bando- ra xwe, bide destpêkirin.

Dîsa levdanên di navbera qebîleyên Îbranî û qebîleyên Semîtîk de ku di dema Hz Brahîm de destpêkiribûn, di roja me de bi şêwe- ya levdana Ereb û îsrael berdewam dike. Herdu alî qet lihev nayên. Sedema vê ku ji olê Brahîm û ji derûna wî dûr mane. Riha û derdo- ra wê, dikare di çareserkirina vê lihevnekirina dîrokî de jî rolê bilî- ze. Pirsgirêkên mirovatiyê, di mercên dergûşa ku ew welidandin de, çêtir dikarin bigihine çareseriyên bivate. Ji dema kevin ve, angaş- tên mafê li ser herêmê yên Ereb û îsrael jî kêm nebûne. Hê jî ereb- tiya Haranê

rastiyeke. îsrael bi rêya PBA, teknolojiya cîhanê û ser- miyanê darayî jî dide pişt xwe, hêdî hêdî li herêmê binke digire û cîwar dibe.Senniyanê Ereb jî di nezîkayiyeke bi vî rengî de ye. Hevgirtiyên herdûyan jî yên bihêz li hundir hene. Navbeynbûna van bikartînin. Lêbelê pêwîst e ev ji niha de bizanibin ku mêtingeh- kirineke bi şêweya Sumer, bêvate ye. Gelê herêmê ku xizan û bi- rîndar, bila wan nekişîne nîgaşên çewt. Ya rast ev e, bikevin reyeke ku di navbera hemû gel û çandan de aştî û xweşbîniyê bingeh bigi- rin, li Rojhilata Navîn bi pîvanên demokratîk li çareseriya pirsgirê- kan bigerin û bi vê tegihînê werin herêmê.

Li herêmê gelek keda gelên Asûr û Ennen jî çêbûye. Pêwîst e rêzdariyeke mezin ji keda wan re jî were girtin. Di çanda Rihayê de, dewsên Asûrî û Ennenan ên ku neyên nûhandin hene. Herwiha bi van hemû hêmanên bingeh ve girêdayî piştgiriyeke şaristaniya demokratîk a navneteweyî him yê girtina serdemê pêkbîne, him jî demokrasiya hoveber a ku ji dema civaka çandiniya neolîtîk ve hatî windakirin bi demê re bike yek û di asta bilind de bike parçeyekî senteza şaristaniya nû. Careke din bi vê rêyê, kevneşopiya Hz Bra- hhn di nava pîvanên hemdem de dikare gerdûnî bibe û veguhere xezîneya mirovatiyê ya hevpar. Rihaya nû, Rojhilata Navîn a nû, di vê bingehê de dikare bigihe derawayeke hêjayê rola xwe ya dîrokî.

Weke encamê, kevneşopiya Hz Brahhn ku weke kalikê afirînerê çanda pêxembertiyê tê zanîn, şîrove û sepînên hemdem pedivî di- ke. Dema ku cîh û girîngiya Riha û derdora wê ya di nava dîroka mirovatiyê de rast li holê were danîn, derfetên nirxandina roja me a di bin ronahiyê de jî derdikevin holê. Heta ku dîrok rast neyê da- hûrandin, xêzkkirina perspektîfên girîng ên di derbarê pêşerojê de jî, ne gengaz e.

Çavkaniyên çanda pîrozweriyê ku hê jî li herêmê nirx pê tê da- yîn û perçeyek ji yê vê pêxemberî û kevneşopiya Brahhnî, diçe he- ta bi şoreşa çandiniyê ya kevin. Li herêmê dewsên vê demê yen kûr hene û tên jiyandin. Pirozwerî, vedana vê rasteqîniya ya li cîhana giyan û bîrûbaweriyê ye. Di derûnê de, gihandina rîwek û ajalan herwiha dilîn û ramanên ku yekem car digihin çavkaniyên xwari- nên dewlemend, îfade dike. Di vê bingehê de rê li ber mîtolojî û ra- mana olî û helwesta sincî vedike.

Serdestiya Sumer a li ser berhema zêdek hatî damezrandin û ye- kem civaka biçîn, dema ku bi şêweya mêtingehkarî pêşveçû, vebi- zava gelê herêmê, bi berxwedaneke şêweya pêxemberiyê û sazîbû- nê bûye bersiv. Pêşveçûnên vê dawiyê yê bi vê diyalektîke dîrokî bimeşin. Nêzîkayiyên mêtingehkariyê yên ku bi Sumer destpêkirin û di roja me de jî berdewam dikin, di derûna xwe de bi çanda pî- rozweriyê re nakok dibe. Yek bi kedê, xwêdanê, piştgiriya mirova- tiyê ya kûr û bivate û biratiya wê ve girêdayî ye, yê din jî bi destli- serdanînê, serdestiyê û pêkutiyê ve girêdayî yê. Dîrok ji vê nakoki- yê ketiye rê û hewl daye ku cîhekî herî kûr ê pêşveçûnê xêzk bike. Di roja me de ev yek bi xitimandin û neçareseriyê bi encam bûye. Perpitîna li ser navê jiyanê, paşvemayîneke mezin a hişî û giyanî, bêesilbûn û bêteşeyîbûn (defonnasyon) tê jiyandin.

Ev rasteqînî, zayîna ji nû ve, ronesansê ferz dike. Vedana şaris- taniya demokratîk a hemdem li herêmê, pêknehatiye. Bandorên ku ji derve tên, bi taybetî bi PBA yê re, ji dubarekirina metingehkari- ya Sumer wêdetir, ti vateyê îfade nake. Senniyanên Ereb û îsrael ên ji heman binyata Semîtîk ku di navbera xwe de levdaneke sift dijîn, weke di dîrokê de dîsa dixwazin ku herêmê dagirbikin. Bi hevkarên xwe yen bihêz gav bi gav pêşvediçin.

Burjûvaziya Tirk ku hêza siyasî û leşkerî ya herêmê ye, hê ge- merdana xwe ya aborî weke ku dixwaze danemezrandiye. Dixwa- ze ku vê yekê bi hevgirtiyên xwe yên derve re pêkbîne. Gelê Kurd ê kedkar ê 15 000 salî, bitemamî li derveyî dewrê tê hiştin. Heçkû Kurd hêza bingehîn a hindikayî, civakî, çandî û aborî ye. Digel wan jî, pêwîst e were zanîn ku mêtingehkariyeke hemdem jî naye me- şandin. Pêwîst e hişmendiya heyî ya paşdemayî, çelexwarîbûn û bêrêxistinî kesekî nexapîne. Dîsa oldariya sexte û terîqetbûn, di na- va jevketineke lezgîn de ne, saziyên wiha ne ku eniya mêtingehkar

demeke direj nikare xwe bispêre wan. Ev jî rastiyeke ku nêzîkî hezar sal in li herêmê, Tirk û Kurd di nava hev de ne. Ev jiyana di nav hev de ku hê bêhtir bi yekîtiya azad ve girêdayî ye, di sala 1920an de tevkariyeke mezin li pêngava rizgariya neteweyî ya antî-împer- yalîst kiriye. îlankirina komarê ku di Rojhilata Navîn de yekem ga- veke şoreşgerî û kûr, jiberku spartî serhildan û rêxistinên feodal bû, jibo veguherîneke demokratîk xebatbarî qezenc nekiriye. Vebizava ku bi vêna hatiye dayin, çêbûna PKKê ye. Ev pêvajoya ku rê li ber demeke bi êş vekirî, ne li pey veqetînekê li pey yekîtiyeke hemdem û azad e.

Ji doza Rihayê dersa herî girîng a were girtin ev e ku, bi hev re ji helwestên ku şidet û cudahiyê pêşkarî dikin, dûr bimînin, nezîka- yiyen ku derfetê bidine yekîtiyeke biratiyê, bi lezgînî têxin rojevê. Rêya vê yekê jî ev e ku, nirx bi dorhêla aştiyê were dayin, derfetê bidine îfadeya azad a heyîna çanda gelan, di çareseriya hemû pirs- girekan de pîvanên şaristaniya demokratîk bingeh werin girtin. Di- yar e ku ev nêzîkayî, pêdiviyeke damezraka komarparêziyê ya de- mokratîk û laîk e.

Di serî de PKK, ya ku dikeve ser milê hemû hêmanên hişmend ên Tirk û Kurd, jibo komareke demokratîk û laîk, bi pêşnûmayeke civaka şarwer a berfireh ve giredayî, pêkanîna vebijarkeke çareser- ker û sepandina wê ya li jiyanê ye. Divê xweş bête zanîn ku, rêya herî rast a çareseriyê ev e, rê û rêbazên ku herin derî vê yekê, yê cu- datiyê, şidetê, mandeleyê û êşan zêde bikin. Hemû tişt di rêya rast a çareseriyê de, ku êşên dema borî veguherînine hişmendiya azad û hêzê, jibo afirandina pêşerojeke tije hêvî, seferberiyeke demokratîk a mezin û tevgereke aştiyê were destpêkirin û pêkanîn.

Herwiha, pirsgireka herêmê ya bingehîn û di vê çarçovê de terîf- kirina rêya çareseriyê, şîrove û ravekirineke hemdem a Hz Brahhn tê çi wateyê?

1- Berî her tiştî pêwîst e ku li gor derûna olên yekxweda, bi kû- rayî were pirsiyarîkirin. Olên Brahhnî jibo nêzîkbûna rasteqîniyê û azadîbûnê ne. Naxwe bûyina nasnameyeke bîrdoziyî ku berjewen- diyên hemû serdest û çînên kedxwar binixûmîne, nayê vateya olên
Brahîmî. Di vê bingehê de, perstina di mizgeftê, dêrê û kenîştê de, nayê vateya ku di derûnê de bi Mihemed, îsa û Mûsa ve girêdayî bin. Ev

pêxember kesayetiyên ku şîroveya aqilî û helwesta sincî di dema xwe de gihandine bandevê ne. Giredana bi wan ve, tê vateya ku nirx bidine hêza aqil û sincê azad ê dema me, vana bingeh bigi- rin û ya pêdivî bînin cîh.

**2-** Jiber vê yekê perestina rast, ne ku li cîhên pîrozwer ji hezar salan ve, tevgerên ku vateya xwe windakirine werin dubare kiri- nê. Perestina rast, nirx dayina bi zanistî, azadî û huner e, him di dorhela civakî û him jî ya takekesî de, birêkûpêkirina jiyanê ya bi van rastiyan ve girêdayî ye. Zanista perestinê ya herî mezin, bi serdestkirina azadî û huner a li her aliyê jiyana takekesî û civakî re derbasdibe.

**3-** Êdî mercên baweriyê bêhtir ji nimêj, rojî, qurban, zikat û pey- va şehadetê ku pîvanên klasîk in, êdî di sinc de gihîştina hişmendî û helwesta azadiyê, di huner de gihîştina tegihîna rindiyê û bicîha- nîna pêdiviyên van ê jidil in. Êdî di mizgeft, dêr û kenîşteyan de, fêrkirina rêya van û ji vê yekê re pêşevanîkirin, di serdemên rast de bi bingehgirtina van rastiyan ve girêdayî ye. Bi tevger û helwestên bêvate, tê vateya berevajîketina derûna wê.

**4-** Perestiya rast, di qada peywirên pratîk û berbiçav de, pîvanên şaristaniya demokratîk fêrbibe û jibo pêdiviyên wê derbasî jiyanê bike, hewl bide ku hemû hêza xwe bi bawerî û bi hostayî bikarbî- ne. Êdî sibe û êvarê bi besmele û anîna peyva şehadetê, di vê bere- kê de gotina ku ev peywira her kesan e û bicîhanîna wê şertên bin- gehîn ên bawennendiyê ne, nayêne vateyê girêdaneke bi olê Bra- hîmî ve. Olên Brahîmî ti caran napejirînin ku, heta mirov vateya tiştekî nizanibe, bi jiyana rojaneyî ve girênede û sazîbûnê biseme- xe, yê bi bawerî û perestin bin. Fêrbûna felsefe û ramana zanistî herî kûr a serdemê, dîtina helwesta azad a weke kiryara herî pîroz, bi huner gîhîştina îfadeyên jiyanê yên herî rind, tê vateye ku ji olê Brahîmî yê rast in.

**5-** Jiber vê, jibo ku bibine xwedî pratîk, bi vê yekê gengaz e ku her kes,bi hindikayî di nava 3-5 pêşnûmayên şarwer ên rizgarkiri- na derdor û dîrokê de, cîh bigirin. Ji rêxistinbûna aştiyê heta bi ma- fê mirovan, ji partîbûna demokratîk heta bi civîn û pêşandanên gir- seyî, ji yekîtiyên jina azad heta bi yekîtiyên ciwan, zarok û ixtiya- ran, ji dezgehên çapemenî û weşanê heta bi yekîtiyên bazirganî û darayî, ji sporê heta bi rêxistinên huner, ji dibistana seretayî heta bi perwerdeya akademîk, ji

weqfên derdor heta bi weqfên parastina dîrok û çandê, ji zanist heta bi teknîkê, di her qadê de, her kes û her kom ligor hêza xwe, bi hindikayî di nava 3-5 rêxistinan de hereket bike, yê bi rastî jî were vateya ku xwedî pratîk e. Dema ku li derî van bimînin, ev ê were vateya bêpratîkbûnê, herwiha yê bêperestin û bêbawerî bijî û bimire.

**6-** Vateya jiyana bi heram û helal hatiye guhertin. Dema ku mi- rov di hişmendiya rastiya dîroka xwe û serdemê de be, xwedî îfa- deya azad a çand û zimanê xwe be, berdêla keda xwe pêkbîne, sa- zûmana civakî û siyasî ya ku vê pêktîne bingeh bigire, ew yê xwedî jiyaneke bi bawerî, bi helal û pîroz be. Dema ku mirov li derî van nirxan bijî, ango ji hişmendiya dîrok û serdemê bêpar be, çand û zi- manê xwe bi azadî nejî, berdêla keda xwe pêkneyîne, sazûmana ci- vakî û siyasî ya ku van pêkbîne bingeh negire, yê were vateya ku bêbawer e, di nava jiyaneke heram û naletkirî de mehkûm bûye ye. Pêxemberiya rast û kevneşopiya Brahîmî, encex di vê çarçovê de heram û helal terîf dike, pêdiviyên wê bicîh tîne. Naxwe jiberkiri- na diayên bi zimanekî biyanî ku nizanibe vateya wê, nizanibe bê ji- bo kû serdemê derbasdare û perestiyê bike, dijîtiya li derûna ol e. Tevlîhevkirina kûklabaziyê û xwedîbûnê wijdan e. Avjeniya di lîta- veke jiyana kufrî de ye.

**7-** Nasnameya derdora Rihayê ya rast ku lê were xwedî derketin, di vê çarçova sereke de û di pîrozweriya sê olan de îfadeya xwe dî- tiye û tê vateya bi hev re jîyîna keda afirîner, jiyana bi rûmet û azad, rindî û aştiya wê, rastî û pîvanên wê yên baqil û wijdan. Peyva şe- hadetê, nimêj, rojî. Qurban, hemû karên xêrê, encex bi tevgera li gor vê terîfkirinê, yê bawennendiyê gengaz bike. Yê bide çespan- din ku di rêya pêxemberan de ne. Cîhada rast, bi lebikandina mezin a di vê rêyê de yê vateyê qezenc bike. Çalakiyên li ser navê ol ên di terîqetên çi fennî û çi li derî fennî de, ji nezanînê pêde nayên ti vateyên din. Ji sicûdkirina ji Neinrûdên hemdem û pûtên wan pê- de, nayê ti vateyên din. Tenê peyva xwedê û Nemrûd cîh guhertine. Bi şêweya heyî, nirxên ku li ser navên xwedê perestiyê jê re dikin, li gor serdema xwe Nemrûdiyekê îfade dikin. Nezanîna herî mezin ev e ku di dema me de, nirxê sazûmana xwedayî didine rasteqîniya Nemrûd. Bîrûbaweriyên olî û sepînên ku perstiyên din dikin û yên ku ji rahîbên Sumer paşverûtir û di suxreya

zalim û kedxwaran de, lêbelê qaşo gelek dia û sureyan jiberdikin, ji hadîsan behsdikin, en- cex ji taîfeya Nemrûdan û Ebûcehilan bin.

Perçekerina van pûtên nezanînê yên ku bi sedan sal in berdewam dikin, di çarçova hatî diyarkirin de, ango di pîvana şaristaniya de- mokratîk de, ligor şêweya dîroka ked û azadiyê, bi hişmendî û ça- lakiya parastina rewa, yê were vateya girêdaneke rast a bi pîrozwe- riya Brahîmî re. Dema ku Nemrûdiya hemdem û pûtên wan bi vê têgihînê werin nirxandin û pêdiviyên wan werin bicîhanîn, encex wê hingê dikare were behskirin ku di rêya pêxemberan û kesayeti- yên pîroz re tê meşandin. Encex wê hingê dikarin bibin xwediyê bawerî û sinc.

Weke berpirsiyarekî li pêş ê PKKê û jiyana Rihayê, ez bawerdi- kim ku min li hember dîrokê xwerexne û li hember serdemê paras- tina xwe bi awayek rast kiriye. Ez hêviya xwe bi lêv dikim ku, li herêmê min rêya jibo mirovatiyê sûdewar ronahî kiriye, ji niha û pêde jiyan ê hê bêhtir bexşîner û azad pêşvebiçe, ked ê nirxê ku ma- fê wê yê bibîne, di vî derbarî de dîrok ê şahidê rast be, banga min li her kesî ye ku tişta bikeve ser milê wan bicîh bînin, rêzdariyên xwe pêşkêş dikim.

*10 Tîrmeh 2001*
*Abdullah OCALAN*
*Îmralî*

# FERHENGA PARÊZNAMEYÊ

**Amadekar: Jîr DILOVAN**

# A

Kurdî Tirkî

abadîn
aborî
aborîzan
afîran
afîrandin
afîrîde (dehbe)
afra (guleş)
afragir
ahengî
ahengdar
ajal
ajaldarî ajo
(dozîn) alav
aloz
amûr (amraz)
angaşt
aqlî (beraqil)
arastin
argûr
arîşetî
arizîkirin
asa (norm)
asaw (girêba)
asêyî

ast

asteng (berbest) asîk
(reşik) aştî
aştîxwaz aştiyane
avhewa (sirişt) awerte
awir (nêrîn, mêzakirin)
azwerî (hêrs, çavsorî)
bac
bacgir
balme (berik) ban
bandev (navser) bandor
bajarvanî (şaresazî)

B

başkirin
bavik
bavkanî
bedewkarî
behre
behredar
belên (newîn)
benî
benpêk
beralîkirin (berhêlkirin)
berbaz (binefser)

eng
silu
ban
ban
ban
ikli
isti
bak
hirs

ver
saç
çat
zirv
etk
şeh
ted
kla
ata
est
yet
yet
vaa
kul
aya
yön
ast

kösteklemek
rekabet
somut
somutlaştirmak
uygun
öngörii
verimli
us
îstikamet, dogralhi
kapsamli
bakiş açisi
kapsamli
îçe kapanrk
karşilik
uran
arthirtin
verimli
körtikleyici, bozgun
bozgunculuk
istikamet
çrkar
çrkarcilik
kalinti
refleks
af
afetme
ttiketim
direnişçî
ttiketici
ilham
ilham almak
muhatap yatay
verîmsiz

bêesil
bêesilkirin
bêgiramî
bêperoş
bêrêz
bêserûberî
bêsinc
bêteşeyîbûn
bêweç
bêwurşe (nefspiçûk)
bêxatirî
bêzarbûn
bibandor
bihestyarî
bijarte
bijarteker
bijûndar (tendurist)
bikitekit bilêvkirin
bilîmetî
bilîn (bilîn bûn)
binehişî
binesazî
binisandî
binkî (xwecîh)
bintûte
biqupketin
biserûber (birêkûpêk)
bişavtin
biveguhêzî
bizav
bînanî
bîrayî
bîrbir yoz
yozlaştirma
saygisizca

heyecansiz
saygisiz
başibozuk
ahlaksiz
deformasyon
çorak
mutewazî
dûşkûnlûk
bikmak
etkili
duyarltkli
elit, seçkin
eklektîk
saglikli
ayrmtili, detayli
söyleyiş
deha
ugraşmak
bilinçalti
altyapi
bastirilmiş
yerli
silik (kişilik olarak)
kuluçkaya yatmak
sistemli
asimilasyon
aktarmali
tepki, akim
benzer
zihinsel
bilinçli

| | |
|---|---|
| bîrdarî | amt, abide |
| bîrdozî | ideoloji |
| bîrdoziyî | ideolojik |
| bîrewer | bilinçli |
| bîrî | zihni |
| bîrûbawerî | zihniyet |
| bote | pota |
| bûut | boyut |

# €

| | |
|---|---|
| candarîtî | animizm |
| cemser | kutup |
| cihê | ayn |
| cihêreng | degişik |
| civakparêz | toplumcu |
| civat | cemaat |
| ciyawaz | degişik |
| cîgeyî | yerel |
| co (coh, cok) | kanal |
| cuda | ayn |
| cudayî | degişiklik, ayrilik |
| cure | çeşît |
| cureyîn | özgûl |

# Ç

| | |
|---|---|
| çalak | aktif |
| çandinî | tanm |
| çandiyar | tarimi |

| | |
|---|---|
| çarenûs | ahnyazisi |
| çarmend | dörtlû |
| çatarê | yol ayrimi |
| çavdêr | gözlemci |
| çavdêrî | gözlem |
| çawahînî | nitel |
| çawanî | nitelîk |
| çendanî | nîcelik |
| çendaniyî | nicel |
| çeq | bileşke |
| çerx | dongu |
| çerxa bêweç (bêsûd) | kisir döngû |
| çeteger (çetevan) | çeteci |
| çêker | yapici |
| çin | simf |
| çinçînîbûn | simflaşma |
| çivdan | sivişmak |
| çivok | dönek |
| çolter | kir |

| | |
|---|---|
| dabelandin (daqûrtandin) | yutturma |
| dabînkirin | giderme |
| dadmendi (dad) | adalet |
| dadwer | adil |
| dadwerane | adilane |
| dahênan | icat |
| dahêner | icatçi |
| damezrak | yapi |

damezrandin
dane
darayî
daraz
darizandin
daring
daringî
daringperestî
dawer
daxwazname
daykanî
debeng
dekbaz (komploker)
demingirtin
demî
depreş
derasayî
derav (rêav)
derawa
derbasdar
derbasgeh (gêduk)
derbejêr (berjêr)
derbejor (betjor)
derbend (git)
derhoze
derpêşî
derpêşkirin
derûn (dil, nefs)
destegeh
destekarî (destlêwerdan)
desthilatdar
desthilatî
destnîşankirin
destpênebûyî kurmak
veri

mali
yargi
yargilama
madde
maddi
materyalizm, maddecilik
sembol
dilekçe
anaerkil
aptal
komplocu, entrikaci
koşullanma
geçici
karatahta
olaganûstû
mecra
konum
geçerli
geçit
iniş
çrkiş
darbogaz
mucize
öngörii
öngörme
öz
imalathane
mûdahale
yetkili
yetki
belîrlemek
bakir

| | |
|---|---|
| destrêjk | kiskaç |
| devjêbemedan (jêneger) | vazgeçilmez |
| dêran | ayrişim |
| dibetî | olasilrk |
| dikirandin | söz açmak, laf etmek |
| dilgirtin | öze dokunmak |
| dilîn (hest) | duygu |
| dilpakî | erdem |
| dilniwazî | çekici |
| diltepîn (diltirs) | tedirgin |
| dirûv (manend) | benzer |
| dirûvtî (manendî) | benzerlik |
| di xwe de bihartin | kendîsîne yedirmek |
| diyarkirin | belirlemek |
| dîmaneyî (îzafiyî) | görecelî |
| dîmendar | göriinûm |
| dorhêl | ortam |
| dozîne | kuram |
| dudilî | tereddût |
| dulibî (dubare) | ikili |
| dûreperêz dûrkirin | çekince |
| dûvelang | tenkîl |
| | uydu |

| | |
|---|---|
| ecizbûn (bêzarbûn) | bikmak |
| efsane | söylence |
| elind (berbang) | şafak |
| embrîyon (goştpere) | raşeym |
| encam | sonuç |
| endezyar | mûhendi |

erjeng
erênî
erk
esehîkirin
ewiqandin
ewlayî (pêbawerî)
ewlebûn
ewledar
ewlemend
ewlemendî
ewletî
eznavendparêzî
ezmûn

feraset (pêhesî)
ferwerde
fetsînok
fêmdarî (têgihanî) fikare
fikaredar (bifikare)
firîşte
fihilbûn gelemper gelemşe (gelş) gelo

tezgî
korkunç
hakem
ölümlü
bunaltici
işlev
anlayislilik
dogralamak
sakmça
oyalamak
sakmçali
güvence
melek
güvenmek
beraat
güvenli
gûvenilir
gûvenirlik
gûven
benmerkezcilik
deney, smav
genel
mesele
acaba

| | |
|---|---|
| gelparêz | halkçi |
| gemerdan | tekel |
| gemerdêr | tekelci |
| gengaz | mumkun |
| gengeşî | munazara |
| gerdîş | töre |
| gerdûnî | evrensel |
| gerdûnîtî | evrensellik |
| gerînek | anafor |
| gerînende | mûdûr |
| geşdarî | refah |
| geşt | seyahat |
| gewretirîn | muazzam |
| gewixandin | boguşmak |
| gêrevêre | karman çorman |
| gihanî | ulaşim |
| gihîner | yetiştirici |
| gihîştî | yetişmiş, olgun |
| gilûr (qerebalix) | kalabalrk |
| girambar | saygm |
| giramgir | saygili |
| giramî | saygi |
| giregir | bûyiiklcr |
| girêba (ûr) | ur |
| girêçk (movik) | eklem |
| girêçkkirin | eklemleme |
| girsegir | muazzam |
| girtina navaxwe | kapsama |
| givrikîbûn | palazlanma |
| giryanok | agit |
| giyan | nih |
| giyanwer | animist |
| giyanwerîtî | animizm |
| gîhanek | evre |

| | |
|---|---|
| goştpere | embriyon |
| gotar | söylev |
| gotegot | söylenti |
| guheran | degişim |
| guhêrbar | degişken |
| guftûgo | diyalog |
| guherînêr | degiştirici |
| gumanberî | kuşkuculu |
| gumlat | kûrne |
| guncan | mûsait |
| guncîn | uymak |
| gundewarî | kirsal |
| gurîf | yumak |
| guzîde | gözde |

## H

| | |
|---|---|
| hedarî | istikrar |
| hefşî | agil |
| helikandin | mahvetm |
| heman | aym |
| hember (hevrik) | muariz |
| hemdem | çagdaş |
| hemta | çap |
| hemzayend | hemcîns |
| herêm | bölge |
| herêna | ikilem |
| hermono | dişlama |
| hermonobûyî | dişlanmiş |
| hest | duygu |

| | |
|---|---|
| hestyar | duyarli |
| heşifandî (heşifi) | silik |
| hevberkirin (kempirandin) | kiyaslama |
| hevgirtin | birlik |
| hevkêşe | denklem |
| hevşibîn | benzeşme |
| hewandin | barmdrrmak |
| hewing | barmak |
| hewisîn (hînbûn) | bellemek |
| hêvişandin (parastin) | saklamak |
| hêvotin | terbiye |
| hêvojkar (hêvojer) | terbiyeci |
| hêman | ilke, eleman |
| hêza kar | işgûcû |
| hijmakarî | gipta, özenmek |
| hilatin | dogma |
| hilberîn | ûretim |
| hilberiner | ûretici |
| hilweşin | yikdma |
| himbiz | srk |
| hincirandin | zedelemek |
| hingofi (fikra sabît) | saplantr |
| hiş (hişmendî) | bilinç |
| hişmend (hişyar, hişdar) | bilinçli |
| hişwer | makul |
| hîkarîker | çarptct |
| holik | kulûbe |
| holk (seha) | saha |
| honawer | ibret verici |
| honawerî (zende) | ibret |
| hov | vahşi |
| hoveber | ilkel |
| hûrlênêrîn | irdelemek |

| | |
|---|---|
| îzafi | rolativ |
| jêgirtî (jibergirtî) | kopya |
| jêneger | vazgeçilmez |
| jêneqetîn | ayrilmaz |
| jênerev | kaçmilmaz |
| jihevcihêkirin | ayrrtetmek |
| jihevderxistin | ayrrtetmek |
| jihevveqetandin | ayrrtetmek |
| jirêderxistin | saptrrma |
| jirêketin | sapma |
| jiyan | yaşam |
| jiyanbar | yaşanabilir |
| jiyanî (jîndarî) | yaşamsal |
| jiyîn | yaşanmak |
| jîndarî | yaşamsal |
| jîndewar | yaşiya |
| jînenîgarî | biyografi |

# K

| | |
|---|---|
| kadî | kûresel |
| kadîbûn | kûreselleşme |
| kadîparêzî | kûreselcilik |

| | |
|---|---|
| kadîperest kakil (pûxte) | kûreselci |
| kan | nûve |
| kanker (berbesvanî) | maden |
| karesat | madenci |
| kargêr | felaket |
| kartêker | yönetici |
| kartik | etken |
| kaşker | pim |
| kaşkirin (xiriqandin) | siiriikleyici |
| keleş | siiriiklemek |
| kemn | eşkiya |
| kemperandin | örtû |
| kenewer | kiyaslamak |
| kenîşte | komik |
| kerese | havra, sinagog |
| kesanî | malzeme |
| kesayetî | kişisel kişilik |
| keştiya bixêlî | yelkenli gemi |
| ketandî | yatalak |
| ketîbûn | dûşkûnlûk |
| ketûber | srradan |
| keval | tablet |
| kevneperest | tutucu |
| kevneşop | gelenek |
| kevneşopî | geleneksel |
| keyîtî | monarşi |
| keys (fersend) | firsat |
| keysperestî | firsatçilrk |
| kilîl | anahtar |
| kirarî | işlem |
| kirde | özne |
| kirêt | çirkin |
| kirmişîn | bûzulmek |

| | |
|---|---|
| kiryar | icraatçi |
| kiryarî | icraat |
| kitekit | ayrmti |
| kizmik (armûşk) | posa |
| koçberî | göç |
| koçrevî | tehcir, göç |
| kojtin (koştin) | kemirmek |
| kurtayî (kurte) | özet |
| kuştinxwazî | suikast |
| kûklabaz kûzik (dîzik) | kuklaci |
| kûzker | çömlek |
| kûzkerî latimandin | çömlekçi |
| (têgerandin) | çömlekçilik |
| lebatî | |
| lebikandin | |
| lebikîn | |
| lebk | |
| lewe | |
| lêguncandin | bulaştrrma |
| lêhatin (pevhatin) | organik |
| lêrastanîn | ugraştirma |
| lêvegerandin | ugraşma |
| liberabûn | graşi |
| lihevhêner | alûvyon |
| lihevkirin | uyarlamak |
| lihevkirî | bagdaşma |
| lihevxistî (têkel) | zamanlama |
| lîtav | indirgemek |
| | itiraz |
| | uzlaşmaci |
| | uzlaşma |
| | tutarli |
| | karma |
| | bataklik |

| | |
|---|---|
| malîkxane | yurtluk |
| malnişîn (teqawîd) | emekli |
| malnişînbûn | emekli olmak yadsima |
| mandele | yadsimak, inkar etmek |
| mandelekirin | benzer |
| manend | benzerlik |
| manendî | mantikçilik |
| mantiqiyet | siiriingen |
| marîjok | göstermelik |
| mastere | niyet |
| mebest | erozyon |
| mehan | susuzluk, kuraklik |
| mehteşî (bêavî) | koşul |
| merc | aşama, evre |
| merhale | yiiriirlûk |
| meriyet | fîdelik |
| meştel | şaşirtici |
| metelhişt (şaşker) | torpu |
| mevred | muazzam |
| mezintirîn | ezel |
| mêj | ezeli |
| mêjîn | vaftiz |
| mêrûn (tehfîl) | vaftizci |
| mêrûnker (tehfilker) | sömûrge |
| mêtingeh | sömûrgeleşme |
| mêtingehbûn | sömûrgeci |
| mêtingehkar | sömûrgecilik |
| mêtingehkarî | mevzuat |
| mijare | sömûriicû |
| mijok | |

| | |
|---|---|
| mijokatî | sömûrii |
| mikur | itiraf |
| mikurhatin | itiraf etmek |
| minêkarî | gönûllûlûk |
| miqatebûn | gözetmek |
| mirovnasî | antropolojî |
| mirûz | moral |
| mîrate | miras |
| mûştaq | tûrev |

| | |
|---|---|
| namilke | merkeziyetçilik |
| navbeynkar | kişkrrtma |
| navendparêzi | soyut |
| navtêdan | yontmak |
| neberbiçav | anlaşilmaz |
| necirandin | nefret |
| nefêmbar | ulaşdmaz |
| nefrîn | yadsimak |
| negîhêj (dûrîdest) | laf anlamaz |
| nehebandin | kuşak |
| nehisguh nehiye | figûr |
| (jibo cîh) nemîş | illet |
| nexweşîn (êşik) | vaat |
| newîn (wad) | dolayli, zimnen |
| neyekser | olumsuz uzanti |
| neyînî | aşilamak |
| niçik | |
| niçilandin broşiir | |
| araci | |

| | |
|---|---|
| nifş | kuşak |
| nihiçk | dûrtii eşkiya |
| nijdevan | model |
| nimûnek | deger |
| nirx | degerlendirmek |
| nirxandin | deger yargisi |
| nirxdarazî nirxê | artideger uyutmak |
| zêdek nivandin | örtmek, bûriinmek |
| nixûmandin | metin |
| nivîsar (deq) | kitabe |
| nivîstek nîgar | resim, figur |
| nîgaş (xeyal) | hayal |
| nîvend (nîskok) | odak |
| notirvan | bekçi |
| nuwaze | harika |
| nûgihiştî | yeni yetme |
| nûsazî | reform |
| nûsazîparêz | reformcu |
| nûvedan | buluş, icat |

# O

| | |
|---|---|
| Ocaxên Mengî | Ûlkû Ocaklan |
| | şirket |
| | beradayî |

# F

(kesên li Hindistanê li derî kastan)

pargîdanî
parya

| | |
|---|---|
| paşdeavêtin (taxpaşkirin) | erteleme |
| paşverû | gerici |
| pelandin | yoklamak |
| pelos (zişt) | igrenç |
| penaber | siginmaci |
| penah | siginma |
| penav | plato |
| pençeşêr | kanser |
| pençik | kiskaç |
| perav | kiyi |
| perçiqîner | ezici |
| peresanparêz | evrimci |
| peresîn | evrim |
| perestîş | ibadet |
| perestxane | ibadethane |
| pergal | aygit, nizam |
| perizîn | kult |
| peroş | heyecan |
| peroşdar | heyecanli |
| peroşîner | heyecan verici |
| pesend | onay |
| pevhatin | bagdaşma |
| pevratî | ittifak |
| peyan (teşebus) | girişim |
| peyaner | girişimci |
| peyhatî | ardil |
| peyman | sözleşme |
| peyîtandin (helsingandin) | saptama |
| peytandin | tespit etmek |
| peyvnasî | etimoloji |
| peywir | görev |
| peywirdar | görevli |
| peywirdarkirin | görevlendirme |
| pêçoke | sarmal |

| | |
|---|---|
| pêker | faktör |
| pêketî | uygun |
| pêkhatî | yatkm |
| pêkhatin | oluşum |
| pêşkarîkirin | köriikleme |
| pêkutî (çewsan) | baski |
| pêkvedayî (amêjen) | alaşim |
| Pêling | kademe |
| pênas | unvan |
| pêrkit (pêşqertef) | önek |
| pêşandan | sergilemek |
| pêşande (pêşanî) | gösteri |
| pêşander | gösterici |
| pêşangeh | sergi |
| pêşbînî | öngörii |
| pêşdarazî | önyargi |
| pêşdatir | öncelikli |
| pêşdestî | inisiyatif |
| pêşeng | öncû |
| pêşenimûne | prototip |
| pêşgirî | tedbir |
| pêşikî | öncelik |
| pêşverû | ilerici |
| pêveberdan | taviz |
| pêvek (veser) | ek |
| Pêwendî | ilgi |
| Pêwendîdarbûn | ilgi duymak |
| pêşniyar (pêşniyaz) | öneri |
| pêşniyazname | önerge |
| pêşnûma | proje |
| pêzan | ehil |
| pilûç | saprk |
| piranîparêz | çogulcu |
| pirejmarî | ÇOgul |

| | |
|---|---|
| pirole | mubalaga |
| pirsyarî | sorgu |
| pirsyarîkirin | sorgulama |
| piştgirî (piştevanî) | dayamşma |
| pîşe | meslek |
| pîşesazî | endûstri, sanayi |
| puxtedar (bipuxte) | özlii |
| pûte | özen |
| pûte pê dan | özen gösterme |
| pûtperestî | fetişizm |

# Q

| | |
|---|---|
| raberkirin | |
| qad | alan |
| qambost | cûce |
| qanî | ikna |
| qayîşok | esnek |
| qaqibokirin | meydan okuma |
| qesirbendî | mimarlrk |
| qeyran | bunalim |
| qilqal (heytehol) | telaş |
| qirase | kaldiraç |
| qup | kuluçka |
| qurf | panik |
| qurifin | paniklemek |
| qutebir (mîsoger) | kesin, kati |

# R

öngörme

| | |
|---|---|
| raborî (rabirdû) | geçmiş |
| raçandin ragihan | dokuma |
| (ragihîn) | iletişim |
| ragihandin rajêrî | iletmek |
| rakêşer (kişîner) | tebaa |
| ranavîş kirin | çekici |
| rantperest | telkin |
| raperîn | rantçi |
| raselitîn | ayaklanma |
| rastîbîn | musallat |
| rasyonalîzm | gerçekçi |
| rave | akdcilik |
| ravekirin | izah |
| rawêj (hipotez) | izah etmek |
| raye | varsayim |
| razdarî | yetki |
| resen | mistisizm, tasavvuf |
| reşbînî | özgiin |
| rewa | karamsarltk |
| rewşedar | meşni |
| rewşeparêz | muhteşem |
| rewişt | statiikocu |
| rexneyî | karakter |
| rêbaz (rêûdirb) | eleştirel |
| rêgeh | yöntem |
| rêje | rota |
| rêveberî | nispet, oran |
| rêvebirin | yönetim |
| rêwerz | yiiriitme |
| rêxistin | talimat |
| rêz | orgut |
| rêzdarî | saygi |
| rêze | saygi |
| | paradigma |

rêzik
rêzikparêz
rêzikperest
rêzname
riba
rik
rikdar
rîwek
rojaneyîtî
rojanî
rojev
rolativ
rûmetgiran (rûmetbilind)
rûxalî (serveyî) rûxîner

kural
kuralci
kuralci
yönetmelik
faiz
kin, inat
inatçi
bitki
gûncellik
akûiel
gûndem
izafi
saygideger
yûzeysel
yikici

net
buzdolabi
korkunç
yamlsama
kunim
kummlaşma
sistem
duyu
tahammûl
uygulama
uygulamali
binbaşi

sêrebend
serenc
serencperest
seresazî
seretayî
sergerde
serheng
serhildêr
serkar
serkî (ne kûr)
sermiyan
serpel (sitvan)
serpeyî (demdemî)
serveyî
serwerti
sexbêrî
sêbare (sêlibî)
sêwiran
sêwirandin
sift
silûk
sixre
sîqalk
sîqalkirî
sîqilandin
sîqilandin (navtêdan)
sosret (seyr)
spartek (spartin)
spekulatîf
sulav
suxre
suxrevan
sûd
sûdeperest bûyiicû
macera

maceraci
ûstyapi
ilk
elebaşi yarbay isyanci
şef, taşaron sig
sermaye
yiizbaşi
muvakkat
yiizeysel
hûkûm
tuûim
ûçlii
tasarim, tasawur
tasarlamak
yogun
inziva
kurak
akbaba
cilali
tahrik
kişkrrtma
dûşiindûriicû, ucube
istinat
kurgusal
çaglayan
hizmet
hizmetçi
yarar
faydaci

| | |
|---|---|
| sûdmend | yararli |
| sûdmendbûn | yararlanma |
| sûtal | lûmpen |

| | |
|---|---|
| şalyar | vezir |
| şan | belirti |
| şane | hûcre |
| şanaz | gururlu |
| şanazî | iftihar |
| şanîder | gösterge |
| şaristanî | uygarlrk |
| şarmend (şareza) | medeni |
| şarwer | sivil |
| şaşî | yamlgi |
| şehitîn (şehtbûn) | felç olmak |
| şehitandin (şehtkirin) | felç etmek |
| şelipîn | yamlma |
| şeml | muazzam, görkem |
| şerûd | kavgaci |
| şêlandin | soygun |
| şelipandin | yamltma |
| şewşandin | çarpitma |
| şêwandin | şekillendirme |
| şêwaz | ûslup |
| şêwe (teşe) | şekil |
| şêwedarbûn | formasyon |
| şêwegirtin | şekillenme |
| şêweparêz | şekilci |
| şiltax | iftiraci |

| | |
|---|---|
| şiltaxî | iftira |
| şiyandar | kadir |
| şopîner | takipçi |
| şoreş | evrim |
| şorind (waz) | vaaz |
| şûm | şimarrk |
| şûnwamas | arkeolog |
| şûnwamasî | arkeoloji |
| şût | kaypak |
| şûtî | kaypaklik |

| | |
|---|---|
| takekes | birey |
| takekesîtî | bireysellik |
| takekesparêzî | bireycilik |
| tamandin (ji bo daran) | aşilamak (agaçlar için) |
| taybetî | özellik |
| taybetmendî | özgii |
| tebatî (pasif) | edilgen |
| tehev (komînak) | toplam |
| tek û bertek | etki-tepki |
| tekûz | yetkin, mûkemmel |
| temizandin | kaynaştrrma |
| teorî | nazartye, waz, teori |
| tepisandin (tepeserkirin) | bastirmak |
| teqemenî | patlayicr |
| teqez | mutlaka |
| teraz | denge |
| terazdar (biteraz) | dengeli |

| | |
|---|---|
| terazîker | dengeleyici |
| teriqet | tarikat |
| term | ceset |
| termisandin (binisandin) | sindirme |
| teşe (şêwe) | şekil |
| tevdeyî (sehî) | bûtûnsel |
| tevdeyîtî | bûtûnsellik |
| tevger | devinim |
| tevkarî | işbirligi |
| tevlihev | kanşik, karmaşik |
| tewş (yawe) | zirve |
| tewşikî | saçmalik |
| texpaşkirin (paşdeavêtin) | erteleme |
| tevînek (vehûn) | doku |
| têborîn | vazgeçme |
| têderxistin | sezme |
| têgerandin | bulaştrrma |
| têgihanî | anlayişlilik |
| têgihîn | anlayiş |
| têgihîştin | anlamak |
| têgîn | kavram |
| têkbirin | yenme |
| têkçûn | yenilme |
| têkdan | çökertme |
| têkel (lihevxistî) | karma |
| tênegihînî | anlayişsizlik |
| tênegihîştin | anlamamak |
| tiral | tembel |
| tirsdêr (çavşikên) | korkutucu |
| tirsnak (erjeng) | vahim, korkunç |
| tirûş | direnç |
| tirûşdar | dayanrkli |
| tîkane | dikey |
| tîrawî | kangren |

| | |
|---|---|
| tolgir | intikamci |
| tolgirî | intikamcilik |
| tomerî (pêkveyî) | toplu |
| totemtî | totemcilik |
| hindraw | radikal |
| tûre | sinir |

# û-u

| | |
|---|---|
| utopia | ûtopya |
| utopîst | utopyaci |

| | |
|---|---|
| veavabûn | yapilanma |
| veberdêr | yatmmci |
| veberhênan | yatirim |
| vebijark | seçenek |
| vebizav | tepki |
| vegirî | istila |
| vegirtin | istila etmek |
| veguhastin | aktarma |
| veguherîn | dönûşûm |
| veguhêzîn | aktarilma |
| veguhêzkar | aktarmaci |
| vehewandin | banndrrmak |
| vehewîn | bannmak |
| vehûn (tevînek) | doku |

| | |
|---|---|
| velîsk (şok) | şok |
| venêr | denetimci |
| venêran | denetim |
| venêrîn (venihêrtin) | denetleme |
| veqetîn | ayriliş |
| veser (pêvek) | ek |
| veserbûn | eklenme |
| veserkirin | eklemek |
| vetûrî | basmakalip |
| viyan (vîn) | irade |

# W

| | |
|---|---|
| wekhevî | eşitlik |
| wekhevîxwaz | eşitlikçi |
| werçerx | dönûm |
| wergirî | kapsam |
| wesf (çawanî) | nitelik |
| westar | duragan |
| wezandin | estirmek |
| wêrek | cesaretli |
| wêrekî | cesaret |
| wîre | azim |

| | |
|---|---|
| xala werçerxê | dönûm noktasi |

xarûf
xasûk
xebatbarî
xelwetxane
xemilandin
xemsarî
xepirandin
xepirî (hilxepirî)
xêlî
xiniz (zexel)
xizm (lêzim, nêzîk)
xulam
xumam
xumamî
xurifin
xûnifandin (xûnaftin)
xûnifin
xwedan (xwedî)
xwedanî (xwedîtî)
xwedawend
xweferzkirin xwemalî
xweperest (ezperest)
xwepêşan
xwespêr
xweşbêjî
xweşnedîtin
xwetêdan
xweyîbûn
xwezî çanak
kumaz
işlerlik
manastir
donatim, sûslemek
ihmal
deşme

deşilmek
örtû
sinsi
akraba
uşak
muglak
muglaklrk
bunamak
özûmsemek
özûmlenmek
sahip
sahiplik
tanriça
dayatma
aidiyet
bencil
gösteri
teslimiyetçi
retorik
yadirgama
yeltenme
beslenme
öykûnme

| | |
|---|---|
| yawe | safsata |
| yekaheng | tekdûze |
| yekbûnî | ittihad |
| yeke | ûnite |
| yekîtîxwaz | ittihatçi |

## Z

| | |
|---|---|
| zanakî | bilgece |
| zanist | bilim |
| zanistî | bilim |
| zanko (zanîngeh) | universite |
| zanyar | bilim adami |
| zarê hal (ligor xuya dike) | göriinûşte |
| zayend | cins |
| zebûnî | diişkûn |
| zelal | duru, net |
| zemkirin | kotûleme |
| zende | ibret |
| zenûn | donuk |
| zenûnbûn | donuklaşma |
| zerengî | kapasite |
| zevî | tarla |
| zexel (xiniz) | sinsi |
| zîlal | şeffaf |
| zordest | zorba |
| zorlêker | zorlayici |

HINEK KURTKIRIN

| | |
|---|---|
| DYE | Dewletên Yekbûyî yên Emerika |
| YE | Yekîtiya Ewropa |
| KYD | Koma Yekbûna Dewletan |
| DMME | Dadgeha Mafê Mirovan a Ewropa |
| PMME | Peymana Mafê Mirovan a Ewropa |
| KE | Konseya Ewropa |
| BZ | Berî Zayînê |
| PZ | Piştî Zayînê |
| KT | Komara Tirkiyeyê (TC) |
| CHP | Partiya Komara Gel |
| MHP | Partiya Hereketa Neteweperest |
| DP | Partiya Demokrat |
| AP | Partiya Dadmendî |
| ANAP | Partiya Dayîk Niştiman |
| IMF | Fona Dravan a Navneteweyî |
| MGK | Lijneya Ewlekariya Neteweyî |
| ADYOD | Komela Xwendekarên Bilind ên Şoreşger a Enqere |
| DEV-GENÇ | Federasyona Ciwanên Şoreşge |
| DDKD Komela | Çandê ya Şoreşger a Demokratîk |
| TUSIAD | Komela Pîşesaz û Karsazên Tirk |
| DGM | Dadgehên Ewlekariya Dewletê |
| TBMM | Civaka Dewletên Serbixwe |
| TBBM | Meclisa Mezin a Gelê Tirkiyeyê |
| DDKO | Ocaxên Çandê û Şoreşger ên Rojhilat |
| SBF | Fakulta Zanînên Siyasî |
| EPRGT | Eniya Partiya Rizgariya Gelê Tirk (THKP-C) |
| KPÊE | Komiteya Pêşigirtina Êşkencê ya Ewropa (AIOK) |
| YKSS | Yekîtiya Komarên Sosyalîst ên Sovyetê (SSCB) |
| PBA | Pêşnûmaya Başûrê rojhilata Anatolyayê (GAP) |